ABDULLAH OCALAN

# MANÎFESTOYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

## Pirtûka çaremîn

# LI ROJHILATA NAVÎN KRÎZA ŞARISTANIYÊ Û ÇARESERIYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

Weşanên Mezopotamyayê

**ABDULLAH OCALAN**

**MANÎFESTOYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK**

**Pirtûka çaremîn**

**LI ROJHILATA NAVÎN KRÎZA ŞARISTANIYÊ Û ÇARESERIYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK**

**Weşanên Mezopotamyayê**

**Werger: Rêşad Sorgul**

**Sererastkirin: Luqman Guldivê**

**Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê:**

**Rêvan Mehmûd**

**Weşanxana Şilêr**

**Qamişlo – Nîsan / 2018**

**weshanashiler@gmail.com**

**weje.vejin@gmail.com**

# NAVEROK

**Li Ser Wergerê .................... 9**

**PÊŞGOTIN.................... 17**

**Beşa Yekemîn:**

**DESTPÊK .................... 23**

**Beşa Duyemîn:**

**DÎROKA GERDÛNÎ û ROJHILATA NAVÎN.................... 35**

**Beşa Sêyemîn:**

**PÊXÎRTENGÎ û PIRSGIRÊKÊN DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE......... 61**

***1-Di Civaka Rojhilata Navîn De Pirsgirêka Jinê ....................64***

***2-Pirsgirêkên Qewm, Etnîsîte û Qebîleyan ....................65***

***3-Pirsgirêkên Dîn û Mezheban....................67***

***4-Pirsgirêkên Bajêr û Hawîrdorê ....................69***

***5-Pirsgirêka çîn, hiyerarşî, malbat, desthilatdarî û dewletê....................73***

***6-Di Civaka Rojhilata Navîn De Pirsgirêka Exlaq, Polîtîka û emokrasiyê ....................78***

***7-Di Civaka Rojhilata Navîn De Pirsgirêkên Ekonomîk û Îdeolojîk........81***

***8-Pirsgirêka Şoreşê Ya Civaka Rojhilata Navîn ....................86***

**Beşa Çaremîn:**

**DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE BERXWEDANÊN DÎROKÎ û LÊGERÎNÊN ÇARESERIYÊ ........ 89**

**A- Pêxîrtengiya Şaristaniyê û Di Nava Xwe De Lêgerînên Wê Yên Çareseriyê ........ 96**

**B- Berxwedanên Qebîle, Eşîr û Qewman (Etnîsîteyan) ........ 102**

**a- Berxwedana Qebîleyên Bi Koka Xwe Semîtîk û Êrişên Wan Ên Dijber ........ 103**

**b- Berxwedan û Êrişên Hûrriyan ........ 107**

**c- Berxwedan û Êrişên Qebîleyên Ûral-Altay ........ 114**

**d- Di Sîstema Şaristaniya Navendî De Berxwedana Dînî Yan jî Şerên Çînî ........ 122**

**a- Çîn û Dînî ........ 125**

**b- Derketina Holê ya Dînê Brahîmî ........ 129**

**c- Berxwedana Xirîstiyantiyê û Şerê Çînî ........ 140**

**d- Berxwedana Zerdeşt: Li Dijî Şaristaniyê Şerê Exlaqî ........ 147**

**e-Berxwedana Îslamî û Rastiya Wê Ya Êrişê; Şerê Dema Feodal A Çîna Navîn (Bazirgan) ........ 150**

**f- Rola Derketina Dîrokî Ya Dînên Brahîmî ........ 172**

**Beşê Pêncemîn:**

**DI SÎSTEMA ŞARISTANIYA NAVENDÎ DE MODERNÎTEYA EWRÛPAYÊ û HÊZÊN NÛ YÊN HEGEMONÎK ........ 177**

**A- MANEYA DÎROKÎ û CIVAKÎ YA ŞOREŞA EWRÛPAYÊ ........................................................................................................ 179**

**a- Şerê Hegemonîk ê Bajarê Venedîkê ................................................... 183**

**b- Serdema Derbasbûna Ji Dewleta Bajêr Ber Bi Dewleta Netewe ve: Ezmûnên Amsterdam-Hollandayê ............................................................ 185**

**c- Ezmûna London-Brîtanyayê û Împaratoriya Roj Lê Naçe Ava ...... 191**

**B- QABÎLEYETA ÇARESERIYÊ YA MODERNÎTEYA EWRÛPAYÊ ........................................................................................................ 203**

**a- Kapîtalîzm ........................................................................................... 206**

**b- Dewleta Netewe ................................................................................... 210**

***1- Dewleta Netewe, Welat û Sînor ............................................................. 212***

***2- Civaka Neteweyî ya Homojen a Dewleta Netewe ................................ 213***

***3- Navendên Çêkirina Hemelatiyan ên Dewleta Netewe ........................ 214***

***4- Burokrasiya Dewleta Netewe ................................................................. 215***

***5- Cinsperestî û Dewleta Netewe ............................................................... 215***

***6- Milletperestî û Dewleta Netewe ............................................................ 217***

***7- Dewleta Netewe, Desthilatdarî û Faşîzm .............................................. 218***

***8- Dewleta Netewe, Civaka Exlaqî û Polîtîk (Demokratîk) .................... 219***

***9- Dewleta Netewe, Civaka Sivîl û Hawîrdor ........................................... 221***

***10- Dewleta Netewe, Zanist, Huner û Heqîqet .......................................... 221***

**c- Şoreşa Pîşesaziyê ................................................................................... 223**

*1- Îndustriyalîzm û Hilweşîna Civaka Gund-Cotkariyê ........................... 227*

*2- Îndustriyalîzm û Înkara Bajêr ........................................................... 231*

*3- Îndustriyalîzm û Dewleta Netewe ....................................................... 232*

*4- Îndustriyalîzm û Faşîzm ...................................................................... 233*

*5- Îndustriyalîzm, Malbat û Jin ............................................................... 233*

*6- Îndustriyalîzm û Ekolojî ...................................................................... 234*

*7- Îndustriyalîzm, Zanist û Medya .......................................................... 235*

**C- KRÎZA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST û ÇARESERIYÊN MUHTEMEL ................................................................................................................ 236**

**Beşê Şeşan:**

**DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE KRÎZ û ÇARESERIYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK ........................................................................................ 243**

**A- LI ROJHILATA NAVÎN RAST PÊNASEKIRINA JIYANÊ ................................................................................................................ 243**

**a- Jiyan ...................................................................................................... 244**

**b- Jiyana Civakî ........................................................................................ 246**

**c- Hiyerarşiya Civakî û Dewlet ............................................................... 250**

**d- Nasnameya Civakî ................................................................................ 251**

**e- Pîroziyên Civakî .................................................................................... 252**

**f- Heqîqeta Civakî û Ji Destdana Wê ........................................................ 254**

**g- Heqîqeta Civakî û Şêweyên Xerîbketinê ............................................... 257**

**h- Di Moderníteya Kapîtalîst de Heqîqet û Xerîbketin ........................261**

**B- ÊRIŞA HEGEMONÎK A MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST û KRÎZA ROJHILATA NAVÎN ........................................................................................273**

**C- LI ROJHILATA NAVÎN ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK ........................................................................................................................293**

**a- Li Dijî Kapîtalîzmê Civaka Ekonomîk..................................................303**

**b- Li Dijî Îndustriyalîzmê Civaka Ekolojîk-Ekonomîk ..........................313**

**c- Li Dijî Dewletdariya Netewe Civaka Exlaqî û Polîtîk ........................323**

**d- Li Rojhilata Navîn Li Dijî Modernîteya Kapîtalîst Modernîteya Demokratîk..................................................................................................336**

**D- DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE HIN PIRSGIRÊKÊN ROJANE û RÊYÊN ÇARESERIYÊ YÊN MUHTEMEL......................................................345**

***1- Pirsgirêkên Neteweyên Pirranî û Hindikayî ne, û Çareseriyên Muhtemel .........................................................................................................347***

***2- Çînên Civakî û Pirsgirêka Burokrasiyê ..................................................363***

***3- Hiyerarşî, Desthilatdarî, Pirsgirêka Dewletê û Şoreş.........................366***

***4- Li Rojhilata Navîn Bajar, Çîna Navîn û Di Civaka Gund-Cotkariyê de Pirsgirêkên Hilweşînê û Çareseriyên Wan ...............................................370***

***5- Pirsgirêkên Xwecihî û Herêmî û Çareseriya Neteweya Demokratîk ........................................................................................................................375***

***6- Li Rojhilata Navîn Jin, Xanedantî, Malbat, Pirsgirêka Şêniyan û Şoreşa Jinê ...........................................................................................................378***

***7- Divê Mirov Çawa Bijî, Çi Bike û Ji Ku Dest pê bike?*..............................*386***

**ENCAM........................................................................................................393**

# Li Ser Wergerê

Bi karê wergerê re nexasim jî bi wergera pirtûkên rêzdar Ocalan re gelek mijar û pirsgirêkên wergerê dikevin ber destê min. Gelekî baş e ku ez bi van pirsgirêk û dabaşan re rûbirû dibim, li wan rast têm, bi ser wan ve dibim. Ji ber ku bi saya wan firsend û keysa min çêdibe li ser gelek mijarên girîng ên wergerê ji awirên cihê binêrim û li ser wan rawestim, bi ser wan de biçim. Di serî de ji gotinan bigirin heta awayê hevokdanîn û maneyê, gelek xalên sereke ji bo guftûgoyê dikevin rêzê. Di destpêka wergera cilda yekemîn de jî firsenda min çêbûbû ku ez hin xalan destnîşan bikim û li ser wan rawestim. Ez ê xalên berê dubare nekim û weke dewama wan bi hin dabaşên nû dakevim û li ser wan rawestim.

Zimanê Kurdî yek ji zimanên herî kevin ê Mezopotamyayê ye. Ji ber vê, mirov wexta bi kurdî binivîsîne yan jî wergerê bike, divê vê kevinbûn û serhatiya zimanê kurdî li ber çavan bigire. Naxwe wê her teksta bê nivîsandin ji rewanbêjî û ciwanbêjiya resen a cewherê kurdî dûr bimîne. Ango wê bêtehm û rijî be. Tevî vê, hewce ye ku mirov hindik be jî haya xwe ji şêweyê beridîn û bergirtina diyalektîka zimanan hebe. Na eger nebe, heye ku mirov di têgihiştin û serwextbûna li ziman û zimanan de şaşiyên mezin bike. Ya ez behsa wê dikim, bi pirranî di xebatên li ser zimanan de rê li ber şovenîzmê vedike. Ev jî dihêle ku zimanekî ji civakê dûr û têkiliya xwe jê qut çêbibe. Ji ber ku zimanê kurdî çavkaniya xwe gelê Kurd e, mirov dikare hewldaneke bi vî rengî li dijî gelê Kurd bibîne. Zimanên ku hîmê wan ê dîrokî qels in, dikarin ji xwe re li hev bînin û çêkin. Ya diafirînin bi sîstema desthilatdariyê dikarin li ser gelan an jî qaşo gelê xwe, ferz bikin. Lê ji bo gelê Kurd tiştekî wisa bibe, rast û durist nîne. Min ji lewra di destpêkê de kevinbûna zimanê Kurdî destnîşan kir. Ez vê nuqteyê gelekî girîng dibînim. Eger ev nuqte baş neyê fêhmkirin, heye ku di xebatên zimanê kurdî de şaşiyên girîng bêne kirin. Dibe ku tebeqeyeke jor çêbibe ji

xwe re zimanekî biafirîne û bi vî awayî ji gel qut bibe, mîna zimanê elîtan an jî qesran. Wekî din dibe ku bi navê kurdiya xwerû zimanekî din çêbibe, dîsa bi tenê ehlê wî fêhm bike û ne bi tenê ji gelê Kurd dûr bikeve, di heman demê de bi dinyayê re jî sînorên ji striyan li dora xwe çêke.

Beriya her tiştî divê ez bibêjim, divê Kurdî li ser kokên xwe heşîn bibe. Mebesta min ji vê çi ye ez ê rave bikim. Ziman weke xwediyên xwe zindî ne. Ji lewra jî bi dewrûbera xwe re didin û distînin. Cewherekî xwe hene, lê dikarin yên digirin jî li gorî vî cewherî di hinavê xwe de dawerivînin. Zimanên cîran ji zimanê Kurdî girtine û zimanê Kurdî ji wan girtiye. Ev gelekî bûyereke xwezayî ye, qewimiye û diqewime. Mirov bi gotin, biwêj, mamik û meselokên bi wan mezin dibe ditamije û di bin qurma ziman û mejiyê wî/wê de cih digire. Di vê nuqteyê de mirov fêhm dike ka çima di warê ziman de her kes ji ya xwe nayê xwarê. Lê divê neyê jibîrkirin ku ziman xwe bi xwe jî li bêjing an jî seradê dixin. Ji nava xwe zîwanê diavêjin. Ji bo mijar baştir bê fêhmkirin, ez dixwazim ji mijara gotinan mînakan bidim. Ji hin zimanan hinek gotin derbasî nava Kurdî bûne û hin gotin jî niha derbas dibin. Bi ya min, belkî hin ne têde, avêtina van gotinan ji nava Kurdî rast nîne. Mîna zimanzanekî gotî; kesek piştî sê rojan êdî mêvan nîne, ji malê ye. Gotinek jî piştî evçend sal nabe ku mêvanê zimanê Kurdî be. Jixwe eger kirasê kurdî lê neyê wê xweber ji nava kurdî biçe. Ya din jî zêde rehkolana gotinan rast nîne. Eger wisa bibe, weke koka mirovan xwedê dizane wê koka kê biçe kîjan deverê, diyar nîne. Belkî li zimanan jî divê ne etnîk, bi awayekî çandî mirov temaşe bike.

Di vê çarçoveyê de mirov dikare li aliyê din binêre. Ango aliyê dixwaze her tiştî xwerû bike Kurdî. Li gorî vê têgihiştinê jî divê mirov li şûna her gotina ji derve ketiye nav Kurdî, gotineke resen a kurdî bibîne. Îcar kesên bi vî rengî tevdigerin diçin gotinek di bin kevirekî de mayî digirin û tînin dixin şûna gotineke bi sed salan tê zanîn datînin û dibêjin ev kurdî ye. Ya îdîa dikin ku resen kurdî ye jî xwedê dizane reh û rîşên wê ji ku ve tên. Pîvana kurdîbûn û nekurdîbûnê jî têra xwe şîlo û ne zelal e. Ez careke din neçar im ku bi bîr bixim çavkaniya kurdî gelê Kurd e. Bêguman wê rêzik û pîvanên zimanê kurdî bêne diyarkirin, rêzimana kurdî wê di çarçoveyekê

de were diyarkirin. Lê rêzik û pîvanên rast û durist bawer nakim ku rê li ber şovenîzmê vekin. Di vî warî de dixwazim mînakeke rojane bidim. Gelek kes niha li şûna gotina 'qanûn' gotina 'zagon' bi kar tînin. Gotina 'zagonê' jî ji Rûsî girtine û dibêjin ev gotin bi eslê xwe aryenî ye. Gotina bextreş 'qanûn' a hezarê salan li vê herêmê ji aliyê her zimanî ve hatiye bikaranîn niha ji nava malê tê qewitandin. Sedema qewitandina wê jî erebî tê nîşandan. Li gorî ferhengan ev gotin gelekî kevn e. Hin ferheng wê weke gotineke aramî û hinek jî weke latîniya kevin destnîşan dikin. Bi ya min ew her çi be, gotineke kevin a herêmê ye, û ya her kesî ye. Ji ber van têgihiştinên ez behsa wan dikim bi navê xwerûtiyê zimanê kurdî dirûvê xwe wenda dike û xizan dibe.

Di wergerandina kitêbên rêzdar Ocalan de ez zêdetir hewl didim maneya ew dixwaze bide, diyar bikim. Ji lewra jî carnan ez di warê ziman de paşve gavê diavêjim ango ji wêjeyê wêdetir, guh didim aliyê naverokê. Ji ber ku fikar û merama nivîskar ev e. Lê ya rastî, di wergerê de mirov divê hewl bide bi zimanê tu werdigerînê çawa tê gotin, wisa îfade bike. Di vî warî de jî zimanê Kurdî gelekî dikeve bin bandora hevoksazî û awayê gotinê yê zimanê jê werger tê kirin. Bi qasî ku mirov dişopîne, ya xuya dike ew e, di zimanê kurdî de her diçe biwêj, îdyom û gotinên pêşiyan pirr kêm têne bikaranîn. Ji lewra jî zimanê Kurdî gelekî tehmsarkî dibe. Gelek kes gazin û giliyê xwe dikin ka çima Kurdî nayê xwendin. Rast e, berhemên kurdî li gorî berê gelekî zêde bûne, lê yên bixwînin ewçend zêde nînin. Bi ya min di vir de mafê nivîskaran nîne ku gazinan bikin an jî bikin jî divê ji xwe bikin. Yanî divê em li xwe mikur bên ku em nikarin berhemên baş pêşkêşî xwendevanan bikin. Ez gelek caran di vî warî de Cîgerxwîn mînak didim. Di dema derketina holê ya Seydayê Cîgerxwîn de hejmara xwendeyên kurdî bi qasî hejmara tiliyên destan kêm bû, lê tevî vê yekê jî gelek kesan helbestên wî ji ber dizanîbûn. Ji ber ku Seyda şerbeta xwe li gorî dilê wan amade kiribû. Ma kî dikare di gotina Kurdî de ciwanbêjî û rewanbêjiya Seyda înkar bike. Ez xwediyê van gotinan jî li xwe mikur têm û dibêjim; dilê min bi vê kurdiyê xweş nîne. Her kesê malê xwe dixe

piyaseyê divê yê-ya malê wî bigire ji bîr neke. Dilniya bin, em hewcedarê wan in, naxwe ew hewcedarê me nînin.

Di warê têgînan de jî hin pirsgirêkên me hene. Di jiyana rojane de hem di warê axaftinê û hem jî di warê nivîsandinê de em têgînan kêm bi kar tînin. Ji lewra jî di warê maneya hevpar a têgînan de em ji hev dûr dikevin. Pêwîst e ku em têgînan xurt û zêde bi kar bînin. Em niha hin têgînan ji derve digirin. Ji ber ku ew diafirînin û di piyasê de serdest in, em têgînên wan digirin. Lê xwediyê têgihiştinên li jor min behsa wan kirî, radibin li şûna wan gotinên bi kurdî li hev çêdikin. Bi ya min hewce bi vê nake. Ango hewce nake ku mirov îdeolojî, materyalîst û erotîkê wergerîne kurdî. Eger têgînek di kurdî de weke têgîn tinebe û mirov neçar bimîne gotineke kurdî li şûna wê bi kar bîne, divê pisporê mijarê vê yekê bikin û ew jî vê li gorî cewherê zimanê Kurdî bikin. Di vî warî de min jî zêdegaviyek kir û ji bo mijar bê fêhmkirin dixwazim wê weke mînak nîşan bidim. Têgînek heye bi ingilîzî 'evolution' û bi tirkî jî 'evrim' dibêjin. Min têgîneke Kurdî ji bo wê nedît. Belkî jî hebe haya min jê tinebe, lê tevî hemû hewldanên min ên lêgerînê min nedît. Min jî ji bo wê gotina 'beridandin-beridîn' bi kar anî. Yên cotkarî kirine yan jî li gund mezinbûne dizanin; çilrojiya genim heye. Di van çil rojan de genim roj bi roj diberide û di dawiyê de jî diseride. Bûyera di vir de diqewime bi naveroka têgînê re li hev dike.

Di warê hin têgînan de zimanê kurdî û tirkî jî li hev nakin. Ji ber ku zimanê Kurdî bi demê re beridiye û rengê xwe girtiye, zimanê tirkî jî bêtir li hev hatiye çêkirin (ji bo piçûkxistinê nabêjim ev rastiya zimanê tirkî ye) û ruh pêve anîne. Mînak; di zimanê tirkî de 'toplumsal artik' dibêjin, ev gotina 'artik' hûn dikarin weke 'zêdeyî' wergerînin, lê wexta hûn di çarçoveya mijarê de li bûyerê temaşe bikin hûn ê bibînin ku kurd di berdêla vê gotinê de 'maye' bi kar tînin. Wexta ku mirovên bi mayeyê xwe xebatê dikin û ji vê zêdetir bi destdixin ew jî sermayeyê pêk tîne. Bi vî awayî naveroka sermayeyê di dîrokê de bi vê têgînê zelaltir dibe. Lê ya rastî di wergerê de cewherê heqîqetê hinekî jî ji ber qelsiya têgînên tirkî bi ber bê dikeve diçe. Bi vê mînakê jî mirov dikare hêza têgînên çavkaniya xwe ji kûrahiya dîrokê û gel digirin, bi hêsanî bibîne. Zimanê kurdî yê di

çarçoveya jiyana kurdan de reng û ruh girtiye, gelek têgînan li gorî cewherê xwe bi kar tîne. Mînak di jiyana Kurdan a gundewarî de xebata bi hev re bi şêweyê palûte û zibareyê tê kirin ango bi peran ji hin kesan re karkirin şerm û kêmanî ye. Kurtûkurmancî mirov dikare bibêje karkeriya di berdêla tiştekî de li cem Kurdan şerm e. Dîsa herçiqas îro kêm mabe jî li cem Kurdan hin bîrûbawerî mohra xwe li jiyan û têgînan dixin. Mînak, Kurd beriya tiştekî bixwin heta bi hin kesên din nedin xwarin ango nedin helalkirin, naxwin. Dîsa Kurdan ji mirovên berjewendîperest re digot 'de here tu mîna bazirganan î.' Ango ez bi van mînakan dixwazim bidim nîşan ku gelek têgînên di şaristaniya mirovên şareza de weke qencî û başî xuya dikin, di jiyana komin a Kurdan de (bermahiyên jiyana xwezayî) xirab in. Ji lewra jî di warê têgînên cîhana Kurd û cîhana derveyî wan de jî alozî, gengeşî û arîşeyek heye.

Ez dixwazim li ser hevoksazî û ristina wê ya di dema wergerê de çend rewşan jî destnîşan bikim. Ez di hevokê de bicihkirina gotinan girîng dibînim. Hosteyên xaniyan dema dîwarên xwe lê dikin, çi bi keviran çi jî bi kerpîçan, herrî û xerca xwe datînin, çavên xwe li kevirên dewrûbera xwe digerînin û kevirekî li gorî qorê dîwarê xwe dibînin û bi cih dikin. Gotindanîna di hevokan de jî dişîbinim rewşa hosteyên xaniyan. Hosteyên xaniyan weke dengbêj û şivanan diçin gelek xaniyan li deverên cuda lê dikin, haya wan ji dinyayê çêdibe. Li gorî mirovên din zêdetir weke kesên dinya dîtî û maqûl têne qebûlkirin. Ew jî bi vê giraniya xwe radibin. Bi çavekî din li xwe dinêrin. Ji cixare pêçana wan bigirin, ji her gotina bi kar tînin, ji şêweyê peyivînê bigirin heta bi yê rabûn û rûniştinê bi giraniyekê radibin. Bêguman li civatên gundan mirovên xweşzar û xweşsohbet jî hebûn bi vî rengî tevdigeriyan. Hemin di vê rewşê de mane û nirxdayîneke gotinê balê dikişîne. Ji lewra ez gelek caran dibêjim mirov di karê wergerê de divê weke hosteyê xaniyan tevbigere. De îcar dibe ku carnan hûn xaniyekî ji rêzê lê bikin, carnan dibe ku ji we lêkirina qesrê were xwestin. Ez wergera vê pirtûkê weke lêkirina qesrê dibînim. De îcar di çîrok û çîvanokên Kurdî de keya lêkirina qesran dixwazin. Wexta dixwazin jî vê yekê di demeke kin de ferz dikin. Belkî keyayên li ser me karekî welê ferz

bikin nînin, lê zeman û rewş xwe li ser me ferz dikin. Ji lewra ev pirtûka di destê we de li binya çiyayê Şekîf di nava du meh û deh rojan de hatiye wergerandin. Ez bi destnîşankirina vê yekê dixwazim girîngiya zeman û mekan di karûbarê mirov de bînim ziman. Erê, bi gotindanîna di hevokê de zeman diçe û ji temenê we naçe li temenê we zêde dibe. Li gotinan maneyê hûn bar dikin. Bi awayê hûn gotinê di hevokê de bi cih dikin, gotin bi fikra xwediyê nivîsê maneyê digire. Di vê nuqteyê de tirsa min heye ku ez baş ji heq nehatibim der û min gotindaneriyeke baş nekiribe. Ji ber ku di babeta fikrî de têkiliyên gotinan xwe li gorî sîstematîkekê li hev dialînin, hevdu digirin. Di wergerandina vê sîstematîkê de dibe ku kêmasî hebin. Di hevoksaziyê de gotin dikarin li gorî cihê digirin reng biguherînin ango cihê xwe bi gotineke din a nêzî xwe din.

Roja min ev nivîs amade dikir û li ber nuqtedanîna wê ya dawî bûm hevalekê pirseke hêja kir. Pirsî; gelo di wergerê de teknîkeke tu dişopînî heye? Ez vê bersiva xwe jî li vir binivîsînim û tecrubeyên xwe vê carê bi kurtî be jî bi dawî bikim. Berî her tiştî di warê wergerê de nemaze der barê wergerandina Kurdî de nivîsek, belgeyek an jî ezmûneke din li ber destê min nîne û ez lê jî rast nehatime. Belkî jî ez bi pey neketime. Bi xebata salan tecrubeyeke çêbûyî heye. Bêguman ev tecrubeya min encama sêzdeh salan e. Ez ê niha bi xetên sereke û stûr van tecrubeyên xwe vebêjim. Berê pêşî ez li ser vê xebata li ber destê we, rêbaza xwe ya wergerandinê bînim ziman, paşê jî ez ê behsa rêbazên din ên wergerê bikim. Zimanê jê wergerê dikim zimanê Tirkî ye. Pirtûka rêzdar Ocalan ji rêzê nîne û ji aliyên hezaran kadro, meraqdar, dewlet, dost û dijminên wî ve tê xwendin, şopandin. Ji lewra jî gotin bi gotin maneya peyvên Ocalan ji bo xwendevanan girîng e. Ez vê rewşê li ber çavan digirim û hevok bi hevok werdigerînim. Ez bi giranî hewl didim şêweyê wî di kurmancî de nîşan bidim. Hinek caran hin hevokên wî parçe dikim; dikim duqet û heta carnan sêqet. Kêm caran jî hinek hevokên wî yên qetqetî bi hev ve dikim û dibin yekqet. Lê bi giranî hevok bi hevok diçim. Rêzdar Ocalan zimanê Tirkî pirr bi hosteyî bi kar tîne û di hin gotinan de bi taybet israr dike û giraniya xwe dide ser maneyê. Wexta ez vê rewşê li ber çavan digirim ez ji awayê

îfadekirina Kurdî wêdetir, wê xwesteka wî di Kurdî de bi cih tînim. Gelek hevokên anîna wan a ziman zehmetbûyî, bêguman mirov dikarîbû bi awayekî din ango bi awayekî zêdetir kurdewarî û bihata fêhmkirin îfade bikira, lê wê wextê jî dibe ku giraniya xwe ji dest bidana û ez ji merama nivîskar dûr biketama. Ji ber ku min berê jî got, parêznameyên Ocalan nivîsên îdeolojîk, polîtîk, felsefî û civaknasî ne, xwendevan ê li gotinan bipirsin, ka bi rastî rêzdar Ocalan ew gotin bi wî rengî bi kar aniye yan na. Ev jî mafê wan e ku bi pey bikevin. Ez jî bi vê fikarê rabûm û min werger li gorî wê kir.

Di wergerandinê de rêbazên din jî mirov dikare pêk bîne. Li gorî dabaş û mijaran rêbaza wergerandinê jî dikare biguhere. Eger mirov nivîseke wêjeyî wergerîne divê mirov wêjeya werdigerîne li ber çavan bigire. Ango tehma di wêjeya zimanê wergerandî de xwendevan divê zimanê pê werger hatiye kirin jî bike. Ji lewra di wergereke bi vî rengî de yek bi yek werger di cih de nîne. Jixwe hinek werger dibe ku ji hevok bi hevokê wêdetir, paragraf bi paragraf bêne kirin. Belkî gelekî klasîk be, dîsa jî ez bibêjim, divê wergêr herdu zimanan jî baş zanibe. Lê dîsa ez bibêjim û lê zêde bikim, divê civakên wan jî kêm û zêde nas bike. Ji bo van xalên ez destnîşan dikim, bêguman gelek mînak hene bidim, lê hingê nivîs ê ji cironeka xwe derkeve û berê xwe bide aqarekî din. Ez bawer dikim ku xalên sereke yên ez destnîşan dikim – ji akademîkbûnê wêdetir tecrûbe ne – wê bi kêra kesê bi mijarê re serê xwe diêşînin bên.

Ez bi du-sê rêz û xetan jî dixwazim merama xwe ya ji vê nivîsê diyar bikim. Mirov karek kir, divê armanc û encama wî karî, tecrubeya wî parve bike. Nexasim jî ev yek ji bo Kurdan gelekî girîng e. Di warê berhemên nivîskî de kulîn û xizna Kurdan qels e. Çanda Kurdî zêdetir ji aliyê zargotina devkî û rêûresmî ya jiyanê ve xurt e. Lê di roja me ya îro de arşîv bi qasî dilê civakan girîng e, û pirrî caran welê tê destnîşankirin. Ji lewra ez jî dixwazim tecrubeyên xwe çi şaş û çi rast ji hemkarên xwe re bihêlim, parve bikim. Ser xêrê be.

**Rêşad Sorgul**

# PÊŞGOTIN

Ez di vî beşê parêznameya xwe de çanda Rojhilata Navîn hûrdikolim. Eger mirov vê çandê fêm neke ku di dîroka mirovatiyê ya gerdûnî de timî bi rola çavkaniyê rabûye, xwenaskirin û binavkirina ferd jî wê seresere be, û wê bêmane be. Divê mirov hay jê hebe ku çanda Ewrûpayê ya hegemon a hemdem jî di bingeha xwe de varyanteke çanda Rojhilata Navîn e. Tevî ku ji xwe re qonaxeke pêşketî ya zanistî pêk aniye jî çanda Rojhilata Navîn hê jî li pêşiya vê çandê bi roleke diyarker a çarenûsî radibe û ji vê paşve namîne. Badilhewa nîne ku wexta roja me ya îro behsa lihevkirin û pevçûna di navbera çand û şaristaniyan de tê kirin, tavilê ev herdu çand têne bîra mirovan. Ev tesbîtên me kirî, li aliyekî têgîna şaristaniya navendî jî piştrast dikin.

Min di beşên pêşî yên parêznameya xwe de hewl dabû gerdûnîbûnê bi nav bikim û bidim naskirin. Beşê Rojhilata Navîn bi tenê di nava vegotina gerdûnî de dikare bê îfadekirin. Jixwe ew bi xwe reh û damara sereke ya gerdûniyê ye.

Çand û dîroka ferdî bi tenê di nava gerdûnîbûnê de dikare manedar bibe. Wexta ez dibêjim ferd, ez ji şexsekî heta neteweyekî di çarçoveyeke berfireh de behsa taybetîbûnê dikim. Min weke ferdekî di mijara xwenaskirin û binavkirinê de gelekî hewl da. Di vê hewldanê de ez çiqasî ponijîm min zêdetir dît ku mirov nikare ji gerdûnîbûnê bireve. Ez hîç guman nakim ku ferdê pûç ê lîberalîzmê nirxekî mîtîk e ku bi qasî mîtolojiyên kevin jî maneyeke xwe nîne. Berevajî kolektîvîteyên civakî yên herî hişk îdeayên wan ên daqurtandina ferd jî ji aliyekî din ve dîsa mîtîk in. Di vê nuqteyê de neçar im, dîsa gotineke xwe dubare bikim. Her tim potansiyel heye ku mirov karibe di ferd de dîrokê analîz bike. Ferd

berhemê dîrokê ye, rewşa berçav a dîrokê ye, eger bijî roja îro ya dîrokê ye. Wexta ez dibêjim dîrok bêguman di maneya civaka dîrokî de bi kar tînim.

Ji vê dîroka min hewl da bidim naskirin encama pêşî û herî girîng min derxistî ew e ku di asta klanekê de be jî hem di çarçoveyeke teng de û hem jî di çarçoveyeke fireh de mirov heta civaka mensûbê wê ye ji hev dernexe wê nikaribe bibe insên. Îro di civakê de înkar û asîmîlasyona bi darê zorê timî li ser kar e. Ev jî dibe çavkanî û sedem ku mirov maneyê ji dest bide. Kom û ferdên di van pêvajoyan re derbas dibin mirov dikare ji wan re kom û ferdên negatîf bibêje. Li gorî min zehmet e ku mirov ji van kesan re insên bibêje.

Her diçe ez zêdetir yeqîn dikim ku rastî civakî ye. Kesek bi tenê dikare maneyê bide çavkaniya rastiya civakî û bi vî awayî xwe bigihîne asta herî jor a zanînê. Ji ber vê yekê, reva ji civakê di heman demê de tê maneya reva ji mane û zanyartiyê. Lîberalîzm bi israr ji civakê direve, ji ber ku hem seresere nêzî rastiyê dibe, hem ji ber têkiliya wê ya bi rastiya xwezaya kapîtalîzmê re heye, hem jî ji ber îfadeya wê ya îdeolojîk e. Kapîtalîzm û civaka di bin hegemonya wê de her diçe zêdetir serî li reklam û derewê didin û ev jî dîsa vî aliyê rastiyê destnîşan dike.

Hem pêşketina min a teorîk, hem jî rola min a di pêşketina pratîk-siyasî de her dema dibihure rastiya parastinê bêhtir rohnîker (serwextker) dike. Tê zanîn û yan jî divê bê zanîn ku şert û mercên min ên mehkûmiyetê hêsan nînin û mehkûmiyeta min hêsan nabihure. Eger were pirsîn ka ez çawa xwe li van şert û mercan radigirim, yekser ez ê bi biwêjekê bersivê bidim: Ez bi tenê mehkûmê rastiya civaka xwe me. Li pêşiya min baxçeyên cennetê hebin û ez bixwazim jî di nava vê rastiyê de nikarim bi awayekî azad bijîm û haya min bi temamî ji vê yekê heye. Yên di nava heman rastiyê de ne, û îdea dikin ku dijîn, bi gotineke herî sivik divê yeqîn bikin ku xwe dixapînin. Bêguman ji bo mirov sedemên dîrokî û rojane yên mehkûmiyeta civakî bîne ziman, vegotineke dirêj a diyalektîkî hewce dike. Ya girîng ew e ku mirov xwe bigihîne vê maneyê û serwext bibe. Kengî mirov xwe gihand vê maneyê, piştre di nava zeman û mekan de dikare dest

bi meşa azadiyê bike. Ev meş bi qasî ku ferdî ye, civakî ye, bi qasî ku hundirîn e, derveyî ye.

Wexta ku min gelek caran jiyana xwe xist ber lêpirsînê, min hewl da ez fêhm bikim ka zêdetir min bi çi awayî li ber xwe daye, ka reviya me yan jî min qebûl kiriye. Eşkere ye ku wê parêznameya min ji vê çîroka jiyana min wêdetir maneyek xwe nebe. Ez yeqîn dikim ku ev çîrok ê hînker û balkêş be. Ji vê jî girîngtir xweparatina min di pratîkê de bi parastina civakê re pêk tê. Jixwe ji vê wêdetir jî parêznameyeke azadiyê zêde mumkîn nîne, mumkîn bibe jî ez yeqîn dikim ku wê ji parêznameya azadiyê cihêtir, buhayekî xwe yê parêznameyê hebe.

Weke ferd û civak di dergûşa Rojhilata Navîn de, di dergûşa şaristaniya navendî de ango li Mezopotamyayê em bûne xwedî hebûn. Meşa vê şaristaniyê ku weke çemê Firatê herikî, timî her çû bala min kişand ser xwe. Ji vê baldariyê zivêr û bêzar nabim. Bi jeolojî, nebat û heywanên xwe, bi awayekî nedîtî bi civak û mirovê xwe re bûye yek, ketiye zikhev û eşkere ye ku ev çavkaniya tevahiya rastiyan e. Bi van rastiyan, ez ê ne bi tenê xwe manedar bikim; ez ê tevahiya mirov û mirovê gerdûnî di zeman û statuya herî hosteyane de pênase û fêhm bikim. Ev beşê parêznameya min zêdetir xizmeta vî aliyê rastiyê dike. Mûsa, Îsa û Muhemmedên ji cem Firewn û Nemrûdan reviyan û paşve zîvirîn li ber xwe dan, mirov xwe nêzî wan bike, cewherê peyama wan fêhm bike, bigire û bide, ev yek wê serhatiyeke kêmheyecan û kêmgirîng nebe.

Ez hînê jî ji aliyê heman şaristaniya navendî ve tême şopandin û ez ji aliyê vê şaristaniyê ve girtî me. Ez hem ji wê direvim hem jî li dijî wê li ber xwe didim. Girîng e ku mirov çîroka hemşehriyê min Brahîm û Nemrûd rojane bike, îro wê ji nû ve pêk bîne.. Li dijî Firewn û Nemrûdan di dînê berxwedanê de taybetmendiyeke girîng e ku mirov jê re rêz bigire. Şer û qirkirinên di dema qonaxa şaristaniya Ewrûpayê de aliyekî din ê rastiyê ne. Li Rojhilata Navîn, dewleta netewe, îndustriyalîzm û kapîtalîzmê, civak û xweza kirine rewşekê mîna ku anîbin ber întîharê û bi vî awayî dimijin, dikojin. Parastina ez ê bikim, neçar e ku bersiva vê rastiyê jî bide. Kengî

rastî bi xwe ev bû, hingî vegotinên siyasî, bûyerî û ferdî bi tenê dikarin bibin beşekî xemil û rewşa wêjeyane.

Min timî şik û guman kir ku ez parêznameyên xwe bisipêrim fenomenên Tirkîtiyê û pêşde bibim. Gelekî girîng bû ku mirov fêhm bike, bi tevahî pîvanên heqîqetê yên netewiyetên Rojhilata Navîn heta dawî ji cewher bêpar in, û ji aliyê dîrokî ve bêbingeh hatine avakirin. Dewleta netewe li Rojhilata Navîn bi hegemonya kapîtalîst (Ewrûpa) hat çêkirin û ji vê jî wêdetir ji aliyê dîroka civakî ve jî berevajîkirineke dijwar e; ji lewra jî tê wê maneyê ku beşekî mezin ê rastiyê hatiye înkarkirin.

Pêvajoya min a Îmraliyê ji serî heta binî di kontrola nûnerên fermî yên rojane yên şaristaniya Ewrûpayê DYE û YE'yê de hatiye pêşdebirin û xistine ser sahneyê. Di vê çarçoveyê de mirov rola dane fenomenên Tirkîtiyê binirxîne wê maneyeke xwe hebe. Ez jî hewl didim di vê çarçoveyê de pê dakevim û li ser bisekinim. Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê DMME wexta biryara xwe ya der barê 'jinûvedadgehkirinê' de da, rastiya ez hewl didim wê bi nav bikim, zimnen qebûl dike. Wexta ku fenomena dadgeriya tirk newêrîbû ji nû ve dadgeh bike û dosya dozê li Konseya Wezîran a Yekîtiya Ewrûpayê vegerand ket nava hewldaneke bi heman rengî û bi vî awayî zimnen li rastiyê mikur hat. Konseya Wezîran dosya doza min ji nû ve li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê vegerand. Ev yek jî li DMME'yê bûye mijara dozeke nû. Ev bû nêzî deh salan, ne weke ku di destpêkê de mirov difikirîn, ne li Dadgeha Romayê ya Ceza yan jî Îstînafê, ne jî li Dadgeha Strasbûrgê ya DMME'yê rastûdurist dikarim bêm dadgehkirin. Ji vê jî sosrettir, Hukûmeta Yewnanistanê (Hukûmeta Simîtîs) bi tevahî huqûqa navneteweyî û huqûqa YE'yê binpê kir û ez revandim Efrîka-Kenyayê, ji ber vê, pêvajoya proto-Guantanamo serdest bû, tevî vê yekê, doza li Dadgeha Atînayê ya hewldanên wê dewam dikin, hê venebûye, bi ti awayî venabe. Dadgeha Îstînafê ya Atînayê biryar da ku ketina min a nava sînorên Yewnanistanê sûc nîne û bi vî awayî min mafê xwe yê penaberiyê bi dest xistiye, bi kar aniye. Li gorî vê biryarê, ez hê jî di nava sînorên Yewnanistanê û huqûqa wê de me. Lê rastî tiştekî din e, ya rast ew e ku di çarçoveya rêxistiniya Gladio ya NATO'yê de piştî

şopandineke mezin êsîr bûm û li hucreyeke Girtîxaneya Girava Îmraliyê ya gelekî taybet a yekkesî û proto-Gûantanamo tême ragirtin. Li Tirkiyê ji bo tevahiya hukimxwarî û girtiyan rêzikname, qanûn û Destûra Bingehîn tê bicihanîn, lê ez li derveyî van bi rejîmekê tême birêvebirin.

Li pişt vê huqûqa seyr a sedsalê rastiyên civakî-siyasî û herweha yên dîrokî û civakî hene, ji lewra jî divê ez van rastiyan rave bikim. Careke din wê hatibe fêhmkirin ku ya di şexsê min de tê dadgehkirin bi qasî rewşa taybet a gelekî herweha dîrokeke gerdûnî ye. Şaristaniya fermî ya Ewrûpayê ku hêza rêveber a dîroka gerdûnî ye, divê karibe cesaret bike ku li dadgeha xwe li ser hîmê rastiyan min dadgeh bike. Divê DMME li erka xwe xwedî derkeve û biryara der barê min de hînê zêdetir dereng nexîne.

# Beşa Yekemîn:

## DESTPÊK

Em pê dizanin ku Karl Marks bi berhema xwe **Kapîtal**ê xwestiye felsefeya Hegel a serberjêr, rast bike û wê li ser lingên wê bide sekinandin. Ji bo vê yekê jî ji fikriyata demê ji du aliyan ve sûd wergirtiye. Berê pêşî di çarçoveya teoriya beridînê ya Darwîn de xwestiye teoriya civakî ya li ser xeteke rast bi pêş dikeve pêş bixe. Ji rehên sereke ku baskê materyalîst ê felsefeya pozîtîvîst xwe disipêrê, yê pêşî ev e. Ji Hegel jî di bin têgîna 'nasînê' de diyalektîk girtiye û di dîrokê de vê diyalektîkê rê li ber teoriya dewleta herî bi qabîliyet û homojen vekiriye. Ji dualîteya efendî-kole daye rê, rola efendî daye kole (karker) û bi vî awayî yeqîn kiriye ku felsefeya xwe qaşo li ser lingan sekinandiye; bi vî awayî ji dil bawer kiriye ku di bin navê 'diyalektîka materyalîzmê' de bi Çepgiriyeke Hegelwarî ketiye ser rêya heqîqetê, 'zanista civakî' ava kiriye û qet nebe di vî warî de destpêkeke ciddî kiriye. Sûdwergirtina wî ji sosyalîzma Franseyê û polîtîka ekonomiya Ingilîzan jî bi roleke talî rabûne. Pêşketina diyalektîkî wê paşê van herdu diyardeyan zelal bike ku sosyalîzma fransî komargeriyeke laîk a zêde ye, polîtîka ekonomiya Ingilîzan jî tê maneya ferdperestiya lîberal a kapîtalîst.

Felsefeya Hegel girîng e, û hê jî aktuelbûna xwe diparêze. Ya rastî weke felsefeya şêweya hêz û daneheva kapîtalîst li ast û qonaxa herî bilind e. Ev gotina dawî ya sîstemê ye. Paşê yên li ser navê felsefeya çepgir û rastgiran têne kirin ji propaganda û bernameyên xebatê yên berfireh û hûrûkûr wêdetir naçin. Her cure îdeolojiyên Marksîzm, lîberalîzm û konservatîzmê

jî di nava vê de ne. Fîlozof Nietzsche ekoleke cihê ye. Li gorî qenaeta min a şexsî, li dijî ewrên reşûtarî yên sîstema kapîtalîst, Nietzsche hewar û ‘qêrîneke’ rastî ya serhildanê ye. Lê negihiştiye û nebûye sîstemeke azadiyê û ji vê yekê dûr e. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ekola felsefeyê ya fransî bi vê wezîfeyê rabûye, xwe lê ceribandiye, lê serketina wê bi sînor çêbûye.

Hê jî wezîfeyeke bingehîn û rojane ya îdeolojîk e ku mirov Hegel fêhm bike û ji Hegelparêziyê hesab bipirse. Tevî sûdwergirtina ji Nietzsche û ekola fransî, hewcedarî bi xebatên hê afirîner ên felsefeyê hene. Hegel di şexsê Napolyon de desthilatdarî xistiye rengê dewleta netewe, û hewl daye wê weke dawiya dîroka siyasî bi nav bike. Bi îfadeyên sergirtî, xwestiye bêje ku xwedê weke dewleta netewe bi nasnameya Napolyon daketiye ser rûyê erdê, bi vî awayî hem bûye mirov yan jî ji mirov pêk tê, hem jî miriye ango bi mirovbûnê miriye. Ev tez îdeayên girîng in. Hewce dike ku ji nû ve û bi girîngî di ber çavan re bêne derbaskirin û ravekirin.

Xebata sereke ya Hegel kirî ew e ku gotin û îfadeyên (dîn, huner, zanist û felsefe) çanda maddî û manewî ya heta dema wî hatî, bi rêkûpêk dane serhev û senteza wan kiriye. Dema 1800’î kevirê çarqozî yê felsefeya dewleta netewe ya vê xebatê û temamkirina vê kulliyatê îfade dike. Ev dîrok di heman demê de dîroka vebirrî ya hegemonya Rojava ya kapîtalîst e. Fenomena jê re Şoreşa Pîşesaziyê tê gotin jî mora vê dîrokê lê heye. Di navberê re nêzî dused sal derbas bûne. Hegemonya şaristaniya Ewrûpayê, xwe amade dike serdema fînansê ku sêyemîn pêla mezin a globalbûnê ye, bi krîzeke global li pey xwe bihêle. Hegemonya kapîtalîst a di nava xwe de tê dabeşkirin û jê re tê gotin kapîtalîzma bazirganiyê û mêtingerî (sedsalên 15-18.), kapîtalîzma pîşesaziyê û emperyalîzm (sedsala 19.), kapîtalîzma fînansê û globalîzm (sedsala 20.) di qadên îfadeyê (dîn, huner, felsefe û zanist) yên maddî û manewî yên Hegel de êdî dema wan hatiye li dawiyê bêne hiştin. Di salên dawî yên 2000’î de krîzên çavkaniya xwe fînans in, îflasa avahiya kapîtalîzmê îfade dikin. Ji bo ev yek pêk bê ya kêm, têkoşîna pratîk siyasî û xebatên felsefeyê yên antî-Hegelîst in.

Ez çalakî û rexneyên dîroka dused salên dawî li çanda maddî û manewî ya şaristaniya navendî ya pênc hezar salî kirî, ti carî piçûk nabînim. Her cure sosyalîzm, anarşîzm û berxwedanên çandî jî di nava vê de ne. Her weha ekolên femînîst û ekolojîk ên demên dawî jî wekî din gavavêtinên hêjayî qalkirinê ne. Lê dîsa jî eger rejîma talanê ya ji parçeyên kaxizan hatibe pêkanîn, bi awayekî di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin, tevahiya nebatan, heywanan, mirovan û heta atmosfer xistibe tehlûkeyê û li ser jiyanê weke ewrên reşûtarî jixwe piştrast hukmê xwe bi cih tîne, ev yek piştrast dike ku di bereyê dijber de kêmasî û şaşiyên ciddî hene. Di ti dema dîrokê de mirovatî weke vê demê ji mêtinkarî û zordariyê re evçend kêrhatî nehatiye kirin.

Çanda Rojhilata Navîn a ketiye bin hegemonya şaristaniya Ewrûpayê ya du sedsalên dawî pêş ketiye, ji îflasê jî wêdetir li ser xeta întîharê ye. Ev gotineke nepixandî nîne. Ji Hindistan, Çîn û Afganistanê heta bi peravên Okyanûsa Atlasê li qadên di bin bandora vê çandê de rojane çalakiyên întîharê pêk tên û ev yek jî rastiyek e. Ji pirranî û hindikayiya çalakiyan wêdetir, analîzkirina çanda di hîmê wan de wê karibe rave bike çi dibe, diqewime. Ravekirinên çandî kevneşopî (dînên Brahîmî yên yek Xwedayî) û daxuyaniyên oryantalîst ên şaristaniya Rojava xwediyê wê hêzê nînin ku vê krîz û diyardeya întîharê rave bikin. Jixwe ew bi xwe hem sedem û hem encamên vê krîz û întîharê ne. Bi vê rolê radibin û parçeyekî sedem û encamê ne.

Ji Îmamê Xezalî ve (wefata wî 1111) alema jê re Îslam tê gotin – li gorî min ev biwêj bi armanca propagandayê ye – felsefe terikandiye. Li beramberî vê heta roja me ya îro bi giranî li ser dewleta despotîk sekiniye, bi şerên desteserkirina nirxên zêde yên civakî di warê zevtkirina civakan, îmhakirin û rêvebirina wan de bêhejmar fenomen çêbûne.

Wexta Hegel felsefeya xwe ya dewletê pêşde bir, ji dewleta bajêr a Grek heta bi dewleta netewe ya Napolyon avahî û fikrên siyasî-desthilatdarî yên çêbûne û derbasbûne kirine esas. Li Rojhilata Navîn ji bo pêşdebirina felsefeya dewletê, li şûna dewleta bajêr a Grek, bi dewleta bajêr a Ûrûkê destpêkirin ji aliyê rêbazê ve rastir e. Herçiqasî min beşekî pirr hindik ji

destana qral-xwedayê pêşî Gilgamêş û xwedawenda bajarê Ûrûkê Înannayê xwendibe jî ez bi ber cazîbeya xwe xistime. Felsefeya Sokrates û Arîsto ji bo rizgarkirina dewleta bajêr a Atînayê, têrê nake fenomenên hiyerarşî û desthilatdariyê rave bike. Felsefeya Hegel tevî ku kulliyateke bi heybet e, bi tenê karîbû ji bo derketina dewleta netewe rê veke. Efendiyên esas ên dewleta netewe kapîtalîst in, û dewleta netewe zarokê wan ê rastî ye. Kapîtalîst bi xwe jî êdî dewleta netewe weke astengekê dibînin (herî kêm ji aliyê şêweyê klasîk ve) û dixwazin li pey xwe bihêlin. Ev pratîka wan jî kêmasiya di vî warî de piştrast dike.

Karl Marks hê ji destpêkê ve li kêmasiyên Hegel ên di warê ravekirina felsefeya dewlet û huqûqê (huqûqa dewletê) de hayil bû û ev yek bêguman girîng û erênî ye. Lê bersiva wî da vê kêmasiyê jî mirov dikare weke kêmasiya kêmasiyê bi nav bike û ev mirov difikirîne û ya divê mirov jê dersê bigire ev bi xwe ye. Bi vê bersivê ji Hegel nabihure, wî dewam dike. Di dualîteya efendî-kole de, kole dike efendî û wî bêefendî dike, ev jî weke sosyalîzm û kominîzmê tê nirxandin. Di vê çareseriyê de civakeke çîn têde nîne xuya dike û di hedefa wê de civakeke têde mêtinkarî nîne, heye. Wer xuya dike. Lê wexta were pirsîn wê ev yek bi kîjan amûran pêk bê, bersiv ji dewleteke hê bi plan û rasyonel a kapîtalîzmê wêdetir tiştekî din nîne. Ev kapîtalîzmeke welê kolektîf e ku ji sosyalîzma firewnan zêdetir paşverû û rizîner e. Çi parêzvanên Marksîzmê û çi jî rexnegirên wê, tevî ku xwe weke ellameyan dibînin jî bêyî ku şerm bikin hê jî tewşo mewşo û bêhurmet dipeyivin.

Di serî de ezmûnên sosyalîzma pêkhatî ya Sovyet û Çînê di pratîkê de du sedemên girîng hatin piştrastkirin û wexta mirov rastî van encaman tê, fêhm dike. Ya yekemîn, avakirina teoriya “ked-nirx” bi awayekî pozîtîvîst e. Ji bo karkerekî dema xebata wî ya rojane weke pîvana nirxa rastî ya keda wî tê qebûlkirin. Karkerekî bi vî rengî çi dîrokî û çi jî civakî nîne. Fenomena jê re ‘karker’ tê gotin mirovekî pêkhatî nîne. Ya rastî weke tê gotin ango wekî di Kapîtalê de hatiye binavkirin pêk nehatiye. Mirov an jî ferdekî bi vî awayî çênebûye. Eger ferd civakî ye, wê wextê ti carî karkerê di **Kapîtal**ê de pêk nayê. Ji bo teoriya “ked-nirx” a Marks rastiyê îfade bike,

divê pêşî ferd ji civakbûnê derkeve. Bi tevahî lêkolînên civaknasiyê yên heta niha hatine kirin piştrast dikin ku ferd ti carî bê civak nikare çêbibe. Civaknasiyê ev yek bi zêdeyî piştrast kiriye.

Ji dubarekirina vê rastiya besît gelekî hêrs dibim. Eger ferd civakî be, û ji ber ku civakî ye jî dîrokî ye, hingî nabe ku mirov ked-nirx (heqdest, kar, rant, faîz û hwd.) bipîve. Lewma mirov nikare bipîve ka civakbûyîn di kîjan dîrokê de û bi keda kê ya kumulatîf hatiye avakirin. Civak bi keda daweriviye hinavên wê, hatiye avakirin, lewma ji aliyê çawatî û çendayetiyê ve, ango kurtûkurmancî pîvandin û wezinandina wan bêîmkan dibe. Bêguman civak bi kedên ferdî yên ti carî nayên pîvan, misêwa bi civakbûnê pêk tê û ew jî beşeke vê keda bi ser hev de kombûyî û bi sazî bûyî dide ferdekî xwe, weke mînak dide karkerekî û bi vê yekê wî dike mirov. Di serî de saziya malbatê, ne bi tenê keda di malzarokê de, ne keda ji bo mezinkirina zarok û heta pêvajoya dîrokî ya nivîskî têrê nakin ku karibin buhayê vê keda cemidî destnîşan bikin. Eger bi rastî em pîvaneke adil a kedê dixwazin hingî divê em bi tevahî serhatiya civakî ya cinsê mirov tevlî vî nirxî bikin.

Nuqteya min matmayî dihêle ev e: di serî de Marks evçend fîlozofên xwe alîgirê kedê didîtin û milîtanên kedê çawa bû ku nikarîbûn vê rastiya hêsan bikin dabaşa fikrê; herçend hin caran kirin jî çawa nikarîbûn encameke bi kok û adil jê derxin? Mirov dikare bi hêsanî ispat bike ku keda dayikekê çil carî ji heqdesta karkerekî bi nirxtir e. Dîrok, felsefe, dîn, huner û zanista ku ew karkerê ferd aniye dinê, em ê çawa para heqdestê wan hesab bikin û bidin? Ma qey dibe ku em bibêjin xwediyên wan mirine û em xwe ji navê derxin. Gotina 'xwediyên kedê namirin' bi herhalî yek ji prensîpên bingehîn ê sosyalîzmê ye. Naxwe pirsa karker û heqdestê wî, li ber rohniya vê binavkirin û danasînê jî ji vegotineke mîtolojîk û wêdetir tiştekî din nîne.

Ji ber vê yekê, mirov felsefeya pozîtîvîst bi rewşa wê ya diyardetiya çor weke metafizîka pûç şirove bike, wê vegotineke herî zêde nêzî heqîqetê be. Di vê kategoriyê de divê 'civaknasiya' pozîtîvîst a Marksîst bi xurtî bê rexnekirin û rexne lê bê girtin. Di vê mijarê de rola bingehîn a exlaqê

civakê jî tê pêşiya me. Exlaq her tim weke pîvaneke civakî bi normên xwe yên qenc û xirab, ji bo keda nekeve ber pîvana civakî, bi rola qentara dadê rabûye. Ya rast jî ev e. Di teoriya exlaq de pozîsyona Marksîzmê bi sînor e, û ev yek jî bi têgihiştina wê ya ked-nirx û heqdestî ve ji nêz ve têkildar e. Sosyalîzma pêkhatî bi hêsanî ji hev de ket û di vê de rola exlaq girîng e. Di hîmê wê de exlaq kêm bû û ev yek di hilweşîna wê de diyarker bû. Ji lewra jî mirov jihevdeketina wê dikare bi hêsanî fêhm bike û mirov dikare vê yekê weke hêmanekî girîng ê rexneyê bibîne. Rizgarkirina civakê ji kapîtalîzmê bi sendîkavanî û partîgiriya dewletê nabe, divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku bi civaka polîtîk û exlaqî mirov dikare li ber kapîtalîzmê rabe û bisekine.

Çi weke pirtûk **Kapîtal**, çi jî weke sîstem kapîtalîzm, duyemîn çewtî û şaşiyên der barê pênasekirinên wan de li ser desthilatdarî, hiyerarşî ango der barê têkilîdanîneke rast a diyalektîkî di navbera daneheva nirxê zêde û zorê de ye. Bi tevahî çavdêriyên der barê civaka dîrokî de, ji bilî pêdiviyên mecbûrî di danehevên zêde yên civakî de rola zorê weke diyarker nîşan didin. Maye, danehev û berhemeke zêde ya civakî ya têde zor tinebe nîne. Di binê tevahiya sedemên avabûna desthilatdarî û hiyerarşiyan de desteserkirina danehevên civakî heye. Bi tevahî şêweyên avabûna desthilatdariyan yekser an jî neyekser têkiliya xwe bi danehevên civakî re heye. Eger em bi awayekî hê mucered bînin ziman, em ê bibêjin; pirraniya desthilatdarî û hiyerarşiyan, keda civakî ya zêde ketiye ser hev îfade dikin. Nabe ku mirov desthilatdariyê ji keda civakî ya zêde ketiye ser hev û bi sazî bûye bişo. Hê ji dema nêçîrvanî û berhevkirina nebatan û vir ve, ‘zilamê bi hêz û xasûk’ di serî de jin, çavê xwe berda nirxên encama hewldanên komên klanan û ji wir jî weke rêxistina zorê ya kapîtalîst dewleta netewe bi gewde bû ku berhemên zêde yên civakî yên pêşketî desteser kirin, ew roj ev roj e ku ti danehev di wê hêzê de nîne ji desthilatdariyê şuştî pêk bê. Pêvajoya şaristaniya navendî ya pênc hezar salî bi xwe daneheveke civakî ya bi sazîbûyî û zêde ketiye serhev e. Ev daneheveke civakî ye ku para bêhtir bi şerên di asta hovîtiyê de, bi saziyên hêzê û dewletan hatiye rêvebirin.

Hin sosyalîstên akademîk ji bo kapîtalîzmê dibêjin; 'li derveyî saziya dewletê, şêweyê hilberîna pêşî ya xwe disipêre bazarê ya bi destdayîna hev a karker-patron bi riza xwe dikin', ev îfade dereweke mezin e, propaganda ye, û bi vê jî payeyê didin kapîtalîzmê. Şêweyekî bi vî rengî yê hilberînê nîne. Berevajî, di dîrokê de sîstema ku şêwazê danehevê û berhemê zêde li ser hîmê herî pêşketî û bi sazîbûyî yê zorê kirî, kapîtalîzm e. Bila tevahiya dîrokê hûrûkûr bê kolan, wê bê dîtin; ji berhemên zêde yên civakî yên pêşî yên Sumer û Misriyan heta danehevên civakî yên xwe disipêrin pîşesazî û bazirganiyê her tim di bin kontrol û îcrayeke rêveberiyê ya bi rêkûpêk a desthilatdarî û hiyerarşiyê de bûn. Li deverên ku amûrên zorê li ser kar nebin, faîz jî çênabe ango bi pereyan bi destxistina pereyan û mirov dikare bi hêsanî weke rastiyeke civakî li vê hayil bibe. Ji lewra jî mirov dikare dîrokê weke rastiyeke bênavber û xwedî danehev, bi her qada civakî ve zincîrwarî girêdayî bi nav bike. Tevî ku dîroka kapîtalîzmê di vê mijarê de rastiyeke herî zêde tê zanîn îfade dike jî pirraniya gotinên der barê Kapîtalê de ji vegotinên mîtolojîk ên bi berevajîkirinên bi zanebûn hatine hûnandin û ji propagandayê wêdetir tiştekî din nînin.

Mirov ji niyeta baş a Marks û Marksîstan nikare şik û gumanê bike. Lê belê avakirinên wan ên dewlet-desthilatdariyê û ked-nirxê ji kapîtalîzma lîberal zêdetir a weke kapîtalîzma dewletê tê naskirin ji sîstemê re xizmet kiriye. Ezmûnên Çîn û Rûsya Sovyetê bi tena serê xwe ji bo piştrastkirina vê rastiyê bes in. Hegelparêziya Rastgir dewletên netewe yên Ewrûpa û Elman ava kirin, Hegelparêziya Çepgir jî di serî de Rûsya Sovyetê û Çîn, dewletokên netewe yên dewrûberê ava kirin. Eger di encamê de herdu jî bi dewleta netewe ya kapîtalîzmê re bûne yek, bi herhalî di vê mijarê de şaxê bi felsefeya Hegelyanî ya di hîmê meseleyê de wê neyê înkarkirin. Herçiqasî gelekî hejiya be jî ya rojane diqewime jî felsefeya dewletê ya Hegel e.

Di serî de anarşîzm rexneyên ekolojîk û femînîst ên li vê sîstema weke modernîteya kapîtalîst tê binavkirin, gelekî girîng in. Lê divê mirov fêhm

bike ku rexneyên wan jî ji yên çîna navîn a bajarê di pêxîrtengiyê de nebihuriye.

Ez dema li ser krîza civak û dewleta li Rojhilata Navîn radiwest im, ez gelekî îhtîmamê nîşan didim ku bi giştî şaşiyên rexne û berxwedanên pênchezar salî û bi taybetî yên pêncsed û dused salî dubare nekim. Em neçar in ku vê îhtîmamê nîşan bidin. Di vê mijarê de ne ji bo paşerojê, zêdetir qîmet pê didim ku ji bo rêûresma rabihuriyê bijîm. Dîrok herî zêde ji bo vê, zanist û felsefeyeke hewce ye. Dîrok behsa miriyan dike, lê ji bo jiyaneke mirovane behsa wan dike. Divê baş were zanîn ku yên li dîrokê serwext nebûyî jiyana wan a civakî ti maneyê îfade nake. Ji lewra divê neyê jibîrkirin ku mirov çiqasî li dîrokê serwext bibe, ev yek ê ewqasî bersiva jiyaneke civakî ya manedar bide. Bêguman ne bi tenê ev; serwextbûna li dîrokê di jiyanê de biqasî maneyê çiqasî weke avahiyên çandî û maddî bi cih bê, mirov ê karibe hêjabûna jiyana civakî jî îfade bike.

Bêguman karekî zehmet e ku mirov hem ji Hegel û hem jî ji K. Marks bibuhire, çanda Rojhilata Navîn, krîza civak û dewleta rojane analîz bike. Li dijî ezmûna hegemonya kapîtalîst a dused salên dawî li ser herêmê, hem ji derve û hem jî ji hundir ve gelek berxwedan û rexne hatin kirin. Aliyê hevpar ê van berxwedanan ew e ku bi serneketin. Ji Îslama hişk heta bi ya nerm, ji komînîstê wê heta bi milletperestê wê, ji lîberalê wê heta bi muhafezekarê wê, hêzên curbicur dîroka herêmê û rewşa rojane analîz dikin û dixwazin sîstemê ava bikin, lê ji serketina vî karî dûr in. Bi xebatên oryantalîst ên ji şaristaniya Ewrûpayê vediguhêz in, dixwazin berjewendî û ber dilê her kom û beşên ji dîrokê mayî xweş bikin, lê bi van veguhestinan ne karîbûn sentezeke felsefî, ne jî karîbûn teorî û pêşketineke siyasî ya serketî û azad pêk bînin.

Di çarçoveya maneya van berxwedan û rexneyan de pêşdebirina sîstematîka şaristaniya demokratîk xwe weke rêya rast a heqîqetê, ferz dike. Ez yeqîn dikim ku hersê cildên pêşî yên parêznameya min ber û îstîqameta hewcedariya me pê heye, nîşan daye. Di vê beşa parêznameyê de ya ez bikim ew e ku ez li ser rewşa berçav a Rojhilata Navîn zêdetir biponijim, nexasim jî ez ê di warê dîrokî de giraniya xwe bidim ser

çareseriyê. Ji lewra jî min hewcedarî bi gerdûnbûna dîrokê dît. Ji bo mirov li herêmê serwext bibe û fêhm bike, çareseriya gerdûnî şert e. Jixwe bi qasî dîroka pênc hezar salî ya şaristaniya navendî ya dîroka gerdûnî, herî kêm bi qasî wê girîng, herêmê xwe bi serdema neolîtîkê ya deh hezar salî xwedî kiriye û ev yek jî statu û girîngiya herêmê xurtir û balkêştir dike. Rojhilata Navîn herî kêm bi qasî Ewrûpayê di çareserkirina pirsgirêkên global û sentezên nû yên şaristaniyê de xwediyê giraniyekê ye. Hegemonya DYE'yê di salên 2000'î de Projeya Rojhilata Navîn yekalî xwest pêşde bibe, lê têra xwe derket holê ku ev proje wê yekalî kêrhatî nebe. Dibe ku Rojhilat û Başûr-Rojhilatê Asyayê tevî Başûrê Emerîkayê bi sîstemê re bi yek bin. Lê divê mirov li bendê nebe ku herêma bi rola şaristaniya navendî ya dîrokî rabûye, bi hêsanî bi sîstemê re bi yek be. Bi temamî qutbûneke ji sîstemê jî muhtemel nîne. Jixwe xisleta şaristaniyan a bi tevahî yekbûn û qutbûnê bi sînor e. Hewldanên ji bo avakirina sîstemê wê ji avakirina li Girava Gronlandê wêdetir, xwediyê ti rolê nebe.

Şaristaniya demokratîk hem weke rêûresmeke dîrokî, hem jî di nava şertên kûrbûna krîza rojane de alternatîfek e ku wê her biçe girîngiya xwe bide hiskirin. Di çarçoveya dewleta netewe de jinûveavakirin di wê karekterê de ye ku wê krîzê kûrtir bike. Rastiya çandî ya herêmê hem di qadên maddî û hem jî di qadên manewî de bi dewleta netewe re di nava nakokiya diyalektîkî de ye, û ev nakokiya kûr dibe mîna volkanê dikeve nava hereketê çalak dibe. Çi şîrketên kapîtalîst, çi jî dewletokên netewe bi qasî mîregtiyên herêmî yên di dîrokê de bi hezaran ji wan çêbûn û bi hezarên salan dewam kirin, nikarin bi roleke çareserker rabin. Li şûna ku ji pirsgirêkên civakî re bersiveke wan hebe, bi gavavêtinên xwe yên pratîk û îdeolojîk pirsgirêkan hem zêde, hem jî pirr dikin. Li Rojhilata Navîn her sîstema ku dixwazim şensê wê yê çareseriyê hebe, pêşî divê bi milletperestî, cinperestî, dînperestiya siyasî û zanistperestiya pozîtîvîst re bikeve nava hesabpirsîneke îdeolojîk û bi awayekî serketî ava bike û bimeşîne. Li ser dika siyasetê ya pratîk jî divê bi awayekî dewlemend cih bide xebatên civakî yên demokratîk ên bi navenda dewletê ve nînin. Ez behsa civakparêziya sivîl a nava wê pûç, nakim. Divê têgihiştina çanda

rastî ya demokratîk a herêmê weke pêdiviyeke mîna nan, av û hewayê bê fêhmkirin û pêşdebirin. Erk û wezîfeya pêşî ya divê serketî were bicihanîn ew e ku mirov xwe ji ferdê bi navenda çanda dewlet û desthilatdariyê ve ku weke miqnatîzê dikişîne, rizgar bike. Ev rêûresma hezar salî li pêşiya çanda demokratîk kelemê herî girîng e. Divê duruşmeya me ya bingehîn ev be: Ti xebata civakî bi qasî xebatên civaka demokratîk hêja û bi xwestek nabin.

Di vê cilda parêznameya min de piştî **Destpêk**ê di **Beşa Duyemîn** de dîroka gerdûnî û Rojhilata Navîn didim ber hevdu. Rastiyên herêmê yên civakî, jeolojîk û biyolojîk di zikhev de dinirxînim. Maneya dîroka gerdûnî û ravekirina wê ya ji bo herêmê bi awayekî şematîk tê destnîşankirin. Ez hewl didim Serdema Neolîtîk û derbasbûna şaristaniyê tevî têkiliya di navbera wan de, rola hegemonîk a şaristaniya navendî li herêmê, bidim fêhmkirin. Şaristanî bêyî şer û desthilatiyan nabe û weke xwezaya wê têne pênasekirin û di vê çarçoveyê de qala dewletan tê kirin ku çawa şêwe digirin. Helwestek e ku şaristaniya navendî û şaristaniyên din muqayese dike tê pêşkêşkirin.

Di **Beşê Sêyemîn** de di civaka Rojhilata Navîn de çavkaniyên pirsgirêkan û pêşketina wan tên nirxandin. Çalakî û îdeolojiyên şer ên timî li ser maye û nirxê zêde yê civakî mezin dibin weke bingehê pirsgirêkên civakî têne nîşandan û texrîbatên rê li ber vekirine û pêvajoyên pêxîrtengiyê yên kûr dibin li pêş çavan têne raxistin. Desthilatdariya hegemonîk a li herêmê êdî nikare û cih dihêle û bi vê sedemê encamên rê li wan vedike di vî beşî de têne nirxandin.

Di **Beşê Çaremîn** de çareserî, îdeolojiyên rizgariyê û hêza wan a berxwedanê tê guftûgokirin. Sîstemên qebîleyan û rola dînên yek xwedayî û qabîliyeta asîmîlekirinê ya sîstemên şaristaniyê tê lêpirsîn. Sedemên serneketina hêzên berxwedanê û îdeolojiyên rizgariyê di hîmê tevahî mijarên nirxandin, guftûgo û lêpirsînê de hene. Di vê çarçoveyê de pêkhatina eşîran û şêweyên pêkhatinê yê dînî têne pêşkêşkirin. Mijareke din a girîng ew e; sîstemên nikarin çareseriyê di nava xwe de çêkin çawa bi

derbên hişk ên ji derve ve ji hev dikevin û qadên nû yên hegemonyayê derdikevin holê.

Di **Beşê Pêncemîn** de ez li ser daneheva kapîtalîst a serketin bi destxistî disekinim û weke hêzeke nû ya hegemonîk çûna wê ya peravên rojava yên Ewrûpayê û rola wê ya dîrokî hûrdikolim. Paşvemayîna şaristaniya Rojhilata Navîn û pirsgirêkên civakî yên timî di asta krîzê de mayî têne guftûgokirin. Hegemonya Ewrûpayê mezin dibe û bandoreke şok li ser wan derdoran dike ku xwe weke civaka Îslamî bi nav dikin.. Têkiliya tevgerên Islamî ji nû ve bi modernîteya kapîtalîst re mijareke girîng a guftûgoyê ye. Kapîtalîzm weke sîstemeke karê, misêwa û timî tengavî û pêxîrtengiyê diafirîne, hem weke dewlet û hem jî weke saziya ekonomîk li şûna bibe çavkaniya çareseriyê dibe çavkaniya pirsgirêkan û ev yek jî dihêle ku li herêmê krîzên dewlet û civakê di zikhev de çêbibin. Întîharên çalakî û îdeolojîk di vê çarçoveyê de têne nirxandin.

Di **Beşê Şeşemîn** de şaristaniya demokratîk weke alternatîfa çareseriyê rola wê ya di dîrokê de û rola wê ya îro tê guftûgokirin. Tevî mîrasa çandî ya dîrokî destketiyên demokratîk ên şaristaniya Ewrûpayê ji bo ji nû ve avakirina şaristaniya demokratîk weke îdeolojîk û polîtîk têne nirxandin. Konfederalîzma demokratîk, civaka exlaqî û polîtîk, pergaleke aboriyê ya navenda wê jin û ekolojî weke saziyên çareseriyê yên girîng têne pêşkêşkirin.

**Beşa Encamê** bi xulaseyeke kurt ji bo têkilîdanîna bi mijara piştre bi rola pirekê radibe.

# Beşa Duyemîn:

# DÎROKA GERDÛNÎ Û ROJHILATA NAVÎN

Dîrok ne bi tenê ji bo civaka mirov, ji bo tevahiya pêkhatinên gerdûnî bi roleke afirîner radibe û ev heqîqetek e ku tevahiya zanistan li ser hemfikir in. Ew zeman pêk tîne. Rola afirandinê ya ji bo îlahan vedibêjin zeman bi xwe bi wê rolê radibe û ev yek mîna sirrekê ye. Em ji leza pêkhatinê re zeman dibêjin. Pêkhatin nebe zeman jî di çarçoveya 'tinebûnê' de ye. Xisleta wê ya sirrê û razê bi vî awayî xwe di hişê mirov de nîşan dide. Ji lewra rast nîne ku mirov pîrbûnê bi bandora kujer a zeman ve girê bide. Ji ber ku bandora kujer a zeman tineye, ev binavkirin jî ti qîmeta xwe nîne. Lewma mirin tineye. Mirin bîranîneke mirov e ku bi awayekî sosyolojîk hatiye avakirin. Hiseke lihevçêkirî ye. Lê ji bo jiyanê bîranîneke gelekî hêja ye. Ya rastî bandoreke hişyarker e. Ez weke Hegel hewce nabînim derkevim 'Rêwîtiya Tînê (cewher)'. Lê ez fêhm dikim ka Hegel bi vê yekê xwestiye çi bike. Herçiqasî bi teoriya 'bîng bang' temenê gerdûnê li derdora 13 mîlyar salî were destnîşankirin jî bi îhtîmaleke mezin ev jî vegotineke nû ya mîtolojîk a şaristaniya Rojava ye. Tevî zanistîbûna wê hemûyî jî weke çîrokên afirandinê yên di Pirtûkên Pîroz de, bi roleke civakî radibe. Lê ji ber ku ev wisa ye, zeman nayê înkarkirin. Bi tenê tê îdîakirin ku xisleta xwe ya sirrbûnê diparêze. Ez weke şensekî mezin dibînim ku karibim di nava civaka mirov de wê hinekî û qismî keşif bikim.

Dîroka civakî di çêkirin û pêkanîna mirov de rola xwe heta dawiyê girîng e. Eger sirra zeman wê bê jihevderxistin, em dikarin vê bi tenê di van pêvajoyên kinik ên pêkhatinê de keşif bikin. Hêza civaka mirov a

çêkirina ferdê xwe ji texmînan wêdetir jî nebûye xwediyê maneyê. Eger mirov li ser gelekî bixebite wê karibe di warê manedanê de kûr û serwext bibe. Naxwe em nikarin di ti fenomenî de hêza zeman keşif bikin. Ji lewra ez zanista civakî weke xwedawend an jî melîkeya sereke ya zanistan hemûyan dibînim. Dîsa divê ez weke tespîteke girîng destnîşan bikim ku ji tevahiya zanistên xwe nasipêrin zanista civakî şik û gumanê dikim. Rêya rasterast biçe zanistên din hemûyan wê di pêkanîna me ya zanista civakî re derbas bibe. Em çiqasî zanista civakî pêşde bibin em ê karibin ewqasî xwe bigihînin hin agahiyên din. Civaknasî çiqasî pêş bikeve, em ê ewqasî bigihêjin zanista pirtikên jêr-atoman ên maddeyê û ya gerdûna kozmîk ku tê îdeakirin hê fireh dibe.

Ne bi tenê Hegel, Xwedayê di Pirtûka Pîroz de jî wexta dest bi serhatiya afirandinê dike, wê bi xwesteka 'fêhmkirinê' girê dide ango vê weke 'fikir dest pê dike li xwe difikire' tîne ziman û ev tespîteke girîng e. Fikra dest pê dike, hewl dide xwe bifikire, cewherê heqîqetê ye. Bi qasî ku em dizanin, ev yek jî li derveyî civaka mirov, bûyereke me şahidiya wê kiriye, nîne. Xwefikirîna mirov bingehê afirandinan hemûyan e. 'Gelo bi qasî atomê, di nava gerdûna kozmîk de jî fikir heye?' Hêja ye ku mirov pirseke bi vî rengî bike û pirseke dijwar e. Ez divê bibêjim ku ez cesaret nakim yeqîn bikim hem gerdûnên makro û hem jî gerdûnên mîkro, bêfikir pêk tên. Têgîna 'maddeya bêcan' ku em wer hînkirine, êdî têra xwe derketiye holê ku têgîneke gelekî pûç a sosyolojîk e. Ji ber vê gotina min divê neyê hişê ti kesî ku Hegelparêziyê dikim. Têkiliya fikrê bi pêlên di mejiyê mirov de tespît bûye; hema hema mirov jê piştrastbûne ku tiştekî mîna enerjiyê ye. Li vir pirsgirêk ew e ku ev rastiya hatiye piştrastkirin, em çiqasî dikarin cesaret bikin li ser xwezaya li derveyî mirov nîşan bidin.

Bi van gotinan dixwazim vê bibêjim: Em neçar nînin 'axa mirinê' ya civakbûna negatîf reşandiye ser çavên me, qebûl bikin. Civakbûna pozîtîv, bi gotineke din civaka misêwa azad dibe, yekane zemînê heqîqetê ye. Danasîna herî zelal a dîroka gerdûnî weke zemînê heqîqetê pêşketina civakî ye. Di vê çarçoveyê de civaka mirovî bi tenê dîroka mirovî nîne, ya rastî dîroka gerdûnê ye. 13,8 mîlyar salên bi rengekî sivik weke temen tê

gotin jî tê de, ev dem dîroka gerdûnê ye. Ji ber vê yekê jî divê mirov girîngiyê bi insên, civaka wî û dîroka wî bide.

**a-** Serdema Qeşayî ya Dawî li derdora bîst hezar sal berê bi dawî bûye. Bi vî awayî destnîşankirina vê serdemê di pêşketina dîroka civakî de qonaxeke girîng e. Di dîroka Rojhilata Navîn de ku bi vê dîrokê dest pê dike, nexasim di dema destpêkirina vê dîrokê de sîstema li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê û herêmên çol ên cîran ji bo cinsê mirovî bi awayekî awarte derfetên qût û zad, ewlehî û îmkanên zêdebûnê hêsan dike. Wexta ev hersê hêman têne cem hev an jî bi hev re peyda dibin, ji bo cinsekî zindî şensekî awarte yê jiyanê tê hesibandin. Cinsê mirov ê ji Efrîka Rojhilat derketiye û beridandina wî li derdora heft mîlyon salan tê qebûlkirin, seranserê Efrîka Rojhilat derbas dike, ji Deryasor di qûntara çiyayên Rojhilatê Deryaspî re heta Rîfê (qelşa kutleya du erdên sereke pêk tînin) diçe Torosan xeteke belavbûnê ya xwezayî xêz dike. Bi qasî ku tê tespîtkirin herî kêm ji mîlyonek salî ve timî mirov bi vê rê çûne Asya û Ewrûpayê. Kevana Toros-Zagrosan di vê rêwîtiyê de misêwa bi rola stasyoneke bingehîn rabûye. Bi vî awayî em girîngiya jeolojiyê baştir fêhm dikin. Herî kêm bi qasî van qûntarên çiyayan, çolên cîran ên di dema xwe de gelekî bi bereket jî bi roleke bi heman rengî rabûne. Bi dawîbûna Serdema Qeşayî ya Dawî re şert û mercên mayînde yên mayînê li van stasyonan peyda dibin û ev yek dihêle ku di dîroka pêşkketina cinsê mirov de qonaxeke nedîtî dest pê bike. Em îro ji vê cografya û erdnîgariyê re Rojhilata Navîn dibêjin. Girîngiya herêmê ya jeolojîk, biyolojîk û civakî ji ber vê rastiya nêz a dîrokî ye. Rojhilata Navîn êdî parçeyekî cografyayê yê ha yellah nîne, wî mekanî pêk tîne ku li ser dika wê dîroka gerdûnî wê bê lîstin.

Li gorî qenaeta hevpar a zanistî cinsê mirov heta piştî serdema qeşayî ya dawî bi rêxistineke tîpa klan a ji 25-50 kesî pêk hatî ye, û ji vê nebihurîye. Civaka klan weke yekîneyên pêşî yên komin piçûkdîtin, 'şovenîzma şaristaniyê ye' ku piştre derketiye holê. Mirovatiyê ji sedî 98'ê dîroka xwe bi civakeke bi vî awayî derbas kiriye. Klan, di pêkhatin û çêbûna civakê de bi rola hucreya dayik an jî mak radibe. Çawa ku di

pêkhatina zindiyan de bi hewldana mîlyaran salî ya hucreya dayik gav ber bi pêkhatina tîpên nebat û heywanan hatiye avêtin, serhatiya jiyanê ya mîlyonan sal a civaka klan jî derfet daye ku gav ber bi civaka heterojen ve bê avêtin. 'Şoreşa Civaka Pirranî' yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye. Kengî 'zimanê sembolan' şûna 'zimanê îşaretan' girt, mirovatiyê ev qonax derbas kir. Zimanê sembolan ê mirov, ji ber awayê xwe yê qirik û bedenê, xwediyê potansiyeleke mezin a pêşketinê ye. Derfeta zimanê sembolan wê şoreşa fikrê jî mumkîn bike.

Dîroknas herçiqasî di çarçoveya avahiya jeobiyolojîk a Efrîkayê de texmînî behsa bikin ku zimanê sembolan beriya serdema qeşayî ya dawî li derdora 100.000 salî B.Z. pêk hatibe jî şoreşa rastî ya zimanê sembolan girêdayî avahiya jeobiyolojîk a Rojhilata Navîn piştî serdema qeşayî ya dawî li derdora 20.000 salî B.Z. pêk hatiye. Di vê mijarê de zanyar hemfikir in. Agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî yên zelal hene ku komên weke Semîtîk têne binavkirin li derdora şeş hezar sal berê ji Sehra Mezin heta bi çolên Erebistan û Îranê yên ji aliyê dar, pel û pincaran ve dewlemend li dora zimanê Samî 'sîstema qebîleyan' bi awayekî berfireh pêk anîne. Ji zimanên Efrîkayê yên îşaretan ên gelekî dewlemend, derbasbûna sîstema qebîleyan a xwe disipêre awayê zimanê sembolan ê Semîtîk, yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye. Ev koma çand û ziman, çi di şoreşa cotkarî ya neolîtîk û heywan xwedîkirinê de û çi jî di şoreşa bajêr de (medeniyet, şaristanî) wê bi roleke mezin rabe.

Duyemîn şoreşa mezin a zimanê sembolan li ser avahiya jeobiyolojîk a sîstema çiyayên Toros-Zagrosan komên sîstema qebîleyên Aryenîk pêk hatiye ku weke koma Hind-Ewrûpa jî têne binavkirin û ev yek jî dîsa bi xebatên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hê zelaltir hatiye piştrastkirin. Rola vê komê di şoreşa bajar û cotkariyê de jî sereke ye ku ev jî xisleteke girîng a rastiya piştrastkirî ye. Vê rola xwe li ser bingehê qadên cihûwarbûnê yên girêdayî avahiya jeobiyolojîk pêk aniye.

Sêyemîn koma mezin a zimanê sembolan li başûrê daristanên Sibîryayê ji aliyê sîstema qebîleyên weke koma zimanê Ûral-Altay têne binavkirin pêk hatiye. Ev komên behsa wan têne kirin, piştî serdema qeşayî heta bi

Çîn, Moxolîstan, Tirkîstan û Fînlandiya îro belavbûne û bi qasî herdu komên pêşî nebe jî di dîroka gerdûnî de hem di warê şoreşa neolîtîk û hem jî di warê şoreşa bajêr de, kêrhatîbûna wan girîng e.

Li Qafqasan, Emerîka û hin komên din ên îzolebûyî bi awayekî marjînal be jî çi di warê zimanê sembolan, çi jî di warê şoreşa bajêr û cotkariyê de rola wan heye û di vî warî de agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hene.

Bi tevahî xebatên zanistî yên jeolojîk, arkeolojîk, antropolojîk, etnîsîte û zimên piştrast bûye ku şoreşa gund-cotkariyê bi awayekî bingehîn li sîstema qûntara çiyayên Toros-Zagrosan ku di dîrokê de weke 'Hîlala Bi Bereket' jî tê binavkirin, li ser avahiya jeobiyolojîk û girêdayî cureyan pêşketiye. Ev qonaxa şoreşê di dîroka gerdûnî ya mirovatiyê de bingeh e. Ez neçarim careke din destnîşan bikim ku mebesta min ji şoreşê ew e; cewherê wê û çawa pêk hatiye. Girîngiya vê şoreşê pirralî ye. Yekemîn, civak ji qonaxa civaka klan a demdirêj (komên piçûk ên homojen-yên dişibin hevdu) derbasî qonaxa 'sîstema qebîleyan' a heterojen (pirraniyên cihêreng) bûye. Sîstemên qebîleyan ên xwe disipêrin zimanê koka wan hevpar, nîvkoçer û nîvbicihbûyî ne, di nava xwe de tiştên weke diyariyan pevdiguherin, perestgehên wan ên hevpar hene û bûne xwediyê mekanên lê miriyên xwe veşêrin, şêweyekî civakî yê demdirêj in. Erdkolanên arkeolojîk ên li Xirabreşka nêzî Ûrfayê ye, ji bo rohnîkirina dîroka mirovatiyê weke 'supernovayê' tê qebûlkirin. Di erdkolanên li Xirabreşkê de kevirên tîk ên perestgehê yên 10.000 salan B.Z. hatine avakirin, nîşan didin ku sîstemên qebîleyan ên berî şoreşa cotkariyê weke têne zanîn ewqasî paşvemayî nînin, berevajî, avahiyên civakî yên têra xwe pêşketî ne, û ev yek jî weke keşfeke girîng a dîrokî derdikeve pêşberî me. Ev kevirên tîk ên perestgehê yên hatine verotin û bi awayekî xelekwarî li kêleka hev hatine danîn, nîşan didin ku li Xirabreşkê jiyaneke xurt a fikir û hisan pêk hatiye. Divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku jeobiyolojiya Ûrfayê ji bo pêşketina sîstema van qebîleyan, rewşeke îdeal pêşkêş dike. Li ser vê sîstema qebîleyê û çanda wê, divê xebatên dîrokî û analîz ji sedî sed bêne

kirin û ev xebat çiqasî bêne kirin, bêguman wê dîroka gerdûnî hê baştir zelal bibe.

Duyemîn, pêkhatina gundan heta niha bi şoreşa cotkariyê ve girêdayî hatibû nirxandin. Bi perestgeha Xirabreşkê ya Ûrfayê piştrast bûye ku mirovan ji sîstema qebîleyên nîvkoçer gav avêtine avabûna gundan û ev rastiyeke din a civakî ya girîng e. Berê min derketina bajêr û dewletê bi perestgehên rahibên Sumeran ve girêdabû. Bi heman awayî divê ez bi giringî diyar bikim ku rêveberiyên komin û gundan ango demokrasiya destpêkê ya resen û orjîn jî li dora sîstemên hevpar ên perestegeha van qebîleyan pêk hatiye. Her perestgeha hevpar a bicihbûyî, dibe hîmê danûstendina destpêkê û şoreşa fikir (huner) û hissa hevpar.

Hingî xusûsa sêyemîn a mirov dikare bîne ziman jî ew e; şêweyê bazirganiyê yê destpêkê û orjîn bi danûstendina diyariyan, di hevdtînên li perestgehên hevpar de pêşketiye. Ya çaremîn, di çavkaniya derketina dîn û huner de jî perestina li perestgehên hevpar heye. Ev herdu kategorî di destpêkê de bi hev re ne, û hêmanê bingehîn ên çanda manewî ne. Li Xirabreşkê wêneyên perestgehê yên gelekî nêzî nivîsê bûne, asta pêşketina fikir û hissan piştrast dikin. Hunerekî welê heye, mîna ku ji mêj ve xeber didin ku wê nivîsên Sumer û Misriyan bên. Mirov hê jî dikare xusûs û şîroveyên bi heman awayî pêşde bibe û bike.

Xusûseke din a girîng ku divê mirov destnîşan bike ew e; ev çand ji ber xisleta xwe ya nîvkoçeriyê xwediyê karektereke gelekî nerm û zû belavbûnê ye. Ev çand di dîrokê de di navbera salên 15.000 û 10.000 B.Z. de di serî de Rojhilata Navîn di asta gerdûnî de belav bûye. Bi vî awayî destnîşankirina vê xusûsê wê vegotinên dîrokî têra xwe rohnî bike. Li gorî qenaeta min a şexsî, vê çandê tevahiya Asya, Efrîka, Ewrûpa, Emerîka û heta Awûstûralyayê ji aliyê çandî ve fetih kiriye.

**b-** Şoreşa cotkariyê xwe spartiye sîstema qebîleyên nîvbicihbûyî (nîvdêmanî) û pêşketiye. Dîroknas û jiyan bi xwe xwedî hukmekî hevpar in ku ev yek xwedî maneyeke şoreşî ye. Mirov qada berfireh a jeobiyolojîk a Ûrfayê weke herêma bi bereket a Hîlala Bi Bereket qada navendî ya şoreşa

cotkariyê ya herî demdirêj (texmînî 10.000-5000 B.Z.) bibîne, ev yek ê vegotina dîrokî ya herî nêzî rastiyê be. Çi girtina nebatan ji bo cotkariyê, çi jî ji bo kedîkirina mîh, bizin û dewaran qadên behsa wan têne kirin xwedî derfet in, û ji aliyê cûrbicûriyê jî nêzî îdealê ne. Awayên erd, bereketa erd, şertên avhewayê, hebûna nebat û heywanan (flora û fauna) li gorî dema xwe, herî îdeal e. Mîna xwedî şert û mercên avdaniyeke xwezayî be. Her weha erdên avdaniyê yên berfireh li ser Dîcle-Firat û şaxên wan her hebûn. Lêkolînên li qadê herroja derbas dibin rola herêmê di vî warî de derdixin holê.

Ev dem yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye, û der barê wê de jî mirov dikare xusûsên bi heman rengî diyar bike. Yekemîn, di pêkhatina perestgeh û gundan de ji aliyê çawayetî û çendayetiyê ve pêşketin hene. Çandên Bismil-Kortiktepe, Çemê Hallan, Erxenî-Çemê Kotber (Çayönü) û Swêreg Newala Çorî hêza belavbûn û bicihbûnê ya çanda Ûrfa-Xirabreşkê (Göbeklitepe) nîşan didin. Di dema 10.000-7000 B.Z. de ku weke qonaxa bê kûz û dîzik tê hesibandin di tevahiya xususên diyarkirî de pêşketin hene. Divê mirov diyar bike ku vê demê di serî de cografya Rojhilata Navîn di karektera belavbûnê ya gerdûnî de rê li pêşketinê vekiriye.

Duyemîn xusûsa girîng ew e ku piştî salên 7000'î B.Z. qonaxeke di ser neolîtîka bi kûzik û dîzik re pêş dikeve û pêşketineke welê civaka mirovî tîne ber bajarbûyînê. Tevahiya erdkolanên arkeolojîk vê rastiyê piştrast dikin. Mirov dikare bibêje; li heman qada navendî, nexasim ji salên 5000'î B.Z. û pêve belavbûneke çandî ya bi lez di serî de li Misr, li Mezopotamya Jêr Sumer, li nava sînorên îro yên Hindistan-Pakistanê Pencabê (pêncav) û heta bi Amûderya Tirkistan û geliyên Sîrîderyayê li qadeke berfireh a jeobiyolojîk rê li ber pêşketineke gihiştiye ber proto-bajarbûnê, vekiriye. Li gorî demê, bi awayekî sîstema navend-hawîrdorê cara pêşiye bi şêweyekî were dîtin, sîstemeke global pêk tîne. Eger mirov destnîşan bike ku ev çand ji Çînê heta Ewrûpayê ango di navbera du okyanûsan de bi roleke sereke rabûye û belavbûneke nifşê duyemîn di dema 4000-2000 B.Z. de zêdetir bûye, ev ji aliyê dîroka gerdûnî ve gelekî girîng e. Globalbûn fenomenek e ku bi tenê di roja me ya îro de nîne. Belkî jî globalbûna herî

demdirêj, ne zordest, ne mêtinkar (îstîsna pîvanê xira nakin) û herî girîng di van deman de pêk hatiye. Xusûsa divê ji dîroka gerdûnî were fêhmkirin ev e. Hem maddî û hem jî manewî belavbûneke global û pêkhatineke çandî ya hevpar ji bo vegotineke manedar a dîrokê bingeh e. Ya divê ji dîroka gerdûnî were fêhmkirin ev e; bi tevahî fikrên civakan û pratîzekirina wan xelekên wekhev ê obje-sûbjeyê ne. Di serî de dîrokên neteweyan, vegotinên dîroka mîkro hemû eger di nava dîroka gerdûnî de neyên bicihkirin, wê bi tenê bi qasî çîrokekê maneyeke wan hebe.

Ya rastî cureyekî vegotinê bi navê dîroka mîkro nîne. Pêdiviya yekdestdarên kapîtalîst bi propagandayê, dîroka mîkro derxistiye holê. Ji bo mirov dîrokê fêhm bike serwextbûna li vê xusûsê gelekî girîng e. Cinsê mirov tenê bi xwe nîne, ew dîroka tevahiya gerdûnê ye. Ya di mirov de ji nû ve pêk tê, asta yekparebûna tevahiya herikînên madde û enerjiyê ye. Li derveyî mirov çi hevgirtina enerjî, madde û parçeyê gerdûnî nîne weke hiss û fikir ji nû ve di mirov de neyê cem hev û ava nebe. Yekemîn, eger em dibêjin dîroka gerdûnî, mebesta me jê ev e. Rastiya panteîzm jî hewl dide haya xwe jê hebe ev e. Wexta em dibêjin dîroka gerdûnî vegotina din a divê bê fêhmkirin; pêşketina çanda maddî û manewî ya xwezaya civakî ye ku weke Xwezaya Duyemîn jî tê binavkirin. Mirov vê dîrokê dikare ji klanan ku bi awayekî weke hucreya mak a civakê bibîne û weke çemê sereke an jî çemê dayik ê civakan ê diherike binirxîne. Di vê vegotina dîrokê de têgîna mak, çemê sereke, mezin an jî dayik, girîng e. Çawa ku ji bo qalkirina dîroka gerdûnê ya ne mirov e, hewce bi tevahiya koma madde-enerjiyê nîne, bi tenê hewcedarî bi qalkirin û fêhmkirina gavên derbasbûna mekanîzmayan (li cem Hegel mentiq û moment) û xelekên sereke (fizîk, kîmya, biyolojî) heye, ji bo dîroka civakê ya weke Xwezaya Duyemîn jî tê binavkirin vegotineke bi heman rengî hewce ye. Bêguman mebest ji dîroka civakê, sosyolojî ye. Vegotinên cihê yên dîrok û sosyolojiyê jî hewcedariyeke hegemonya îdeolojîk a yekdestdariya kapîtalîst e ku timî yekparebûna maneyê parçe dike.

Di vê rewşê de li gorî herdu maneyan jî dîroka gerdûnî yekpare ye. Bêguman ev nayê wê maneyê ku di vê vegotinê de cihê ferd, diyarde û

bûyeran nîne. Bîleqis ferd, diyarde û bûyer kengî di nava vegotina gerdûnî de rol bigirin, wê manedar bibin. Dîroka mîkro bi dîroka makro (gerdûnî) bi tenê di nava têkiliyeke diyalektîkî de dikare cihê xwe bibîne. Dîroka mîkro bi serê xwe tê wê maneyê ku vegotinên wêje û sosyolojiyê bê felsefe bin, di dawiya dawî de bi awayekî herî çor wê veguherin gotinên tewş ên pozîtîvîst.

Li Hîlala Bi Bereket di dema 6000-4000'î B.Z. de ji bo derbasbûna şaristaniyê hêmanên hewce yên maddî û manewî yên sereke hemû pêk hatibûn, li ser vê tespîtê jî dîroknasên girîng xwedî qenaeteke hevpar in. Têra xwe çavdêrî, lêkolînên arkeolojîk û etnîk hene ku vê qenaetê piştrast dikin. Di serî de di warê xwenixumandin, xwedîkirin û deverên starê de amûrên çanda maddî bûn îndustrî û gihiştin asta hilberînê. Ji bo demên xela û felaketên cuda karîbûne berhem û mayeyê civakî komî serhev bikin. Hîmê bazirganiyê hatiye danîn. Ji çanda diyarîdayînê wêdetir êdî ji bo pêdiviyan berhem têne serbiserkirin. Gelek hêmanên çanda manewî jî hatine bidestxistin. Di rewşên resen ên pêşî yên dîn, xweda, huner, zanist û teknîkê de pêşketinên mezin hene. Ji madenê derbasî teknîkê bûne. Tekelik tê bikaranîn. Ji veguherîna enerjiyê sûd tê wergirtin. Bêguman ji texmînan wêdetir, zêde keşif hene. Ji vê jî girîngtir di jiyanê de jin serek e, û di jiyanê de nakokî bi hawîrdorê re nînin. Wexta ku mirov bi roja me ya îro re dide berhevdu, ev xusûs bi tenê jî ji bo ravekirina serdestiya civaka wê demê têrê dike. Şaristaniya me ya îro gelekî zordestiyê li jin û hawîrdorê dike, ji lewra mirov ti carî nikare civakeke welê serketî û pêşketî bihesibîne. Eger mirov ê behsa tenduristî û serdestiya civakekê bike, divê krîterên me yên bingehîn femînîst û ekolojîk bin (ne di maneya bûrjûwa de). Ji vî alî ve, civakên roja me ya îro bi rastî civakên nexweş in.

**c-** Derbasbûna bajêr û civaka şareza ya xwe disipêre wê, bi nirxên çanda maddî û manewî yên Hîlala Bi Bereket ên bi rêûresma civaka hezar salan ketibûn serhev, bi pêşdebirina kalîteya wan pêk hat. Hêmanên çanda heyî yên li devê çemên bi aluviyon ên Dîcle, Firat, Nîl û Pêncavê kengî bi hêmanên din re sentez çêkirin hingî bajêr bivênevê wê pêk bihata. Ev sentez tê wê maneyê ku berhem jî wê gelekî zêde bibe. Divê mirov vê

xusûsê bizane ku di ser heman qadên bi aluviyon re bi sed hezaran salan mirov hatin û çûn. Lê van mirovan, bihêlin ku bi hêza xwe ya bingehîn bajaran ava bikin, di wê qabîliyetê de nebûn ku civaka klan jî li ser piyan bigirin. Li van qadan ji bo gavavêtina şaristaniya bajêr, diviyabû têkiliya wan a diyalektîkî bi civakeke neolîtîk a pêşketî re hebûya; ev şertê pêştir e. Li Çînê jî wê li ser hîmê heman diyalektîkê pêkhatineke bi heman rengî çêbibûya. Di mijara bajarê pêşî de bi giranî dîroknas li ser Ûrûkê hemfikir in ku li qada bi aluviyon a Dîcle-Firat xwe digihîne deryayê ava bûye. Ji ber ku dema Ûrûkê (3500-3000 B.Z.) destpêka şaristaniyê îfade dike, ji bo dîroka gerdûnî girîng e.

Destanên li ser navê qralê pêşî yê qehreman Gilgamêş û xwedawenda bajêr Înannayê hatine gotin, çanda Ûrûkê nîşan didin û mirov yekser dikare ji bo van destanan bibêje; vegotinên xulase yên dema xwe ne. Van destanên resen ku bi awayekî nivîskî gihiştine heta roja me ya îro mirovatiya beriya xwe bi fikir, bawerî û xwestekên wan nîşan dane û der barê paşerojê de hesretên xwe yên bêmiriniyê weke bîranînekê bi me didin hiskirin. Dîroka gerdûnî ev e. Di destana Înanna de behsa 104 pîvan, teknîk û saziyên civakî yên bi afirêneriya keda jinê ya hezarên sala hatiye hilberandin tê kirin. Mêrên xasûk û bi hêz ên dibin xweda ji bo van berhemên jinê jê bistînin serî li her dekûdolabê didin û destan behsa van zordarî û hîleyan dike. Di destanê de qala serhatiya Gilgamêş jî tê kirin ka çawa cara pêşî jiyana qraltiyê bandor lê kiriye, lê wexta dîtiye wê alîkarê vê jiyana wî Enkîdo bimire û ev jiyan ê ji dest biçe, gelekî xemgîn bûye û bi pey wî gihayî ketiye ku mirovan dike nemir.

Koletiya jinê ya her ku çû zexm bû û rewşa qral-xwedê ya bi gavavêtinên desthilatdariyê veguherî nexweşiyê, nakokiya diyalektîkî ya pêşî û mezin a şaristaniyê ye. Çavkaniya nakokiya kole-efendî jî bingeha wê ev nakokî ye. Di roja me ya îro de wê ev çîrok weke karker, bêkar û heta bi koleyên ji her kokê ku têne xizankirin, dewam bike, reh û rîşên xwe yê zêdtir berde. Diyarkirina momentên sereke û binavkirina qonaxa şaristaniyê ya dîroka gerdûnî, gelekî girîng e. Bajar di destpêkê de pêdiviyên bazirganiyê yên warên li derveyî bajêr baş bi kar tîne û ji bo

bersiva vê bi hilberîneke bi bereket bide li ser pêşnûme û teknîkê tê avakirin û ji lewra jî bajar di destpêkê de bi roleke neyênî ranabin. Berevajî bajar bi qadên li derveyî xwe re bi awayekî lihevkirî û di nava hevkariyê de pêşketina civakî bi lez dike. Lê belê li ser mayeyê civakî yê zêde dikeve serhev û rê lê tê vekirin, şer û têkoşîn tê meşandin, ev jî dihêle ku qonaxa çînîbûnê ya xwe disipêre bajêr û dewletbûnê, her biçe ji bo tevahiya sîstemên qebîleyan, kedkarên bajaran, gundiyan û mirovên li derveyî bajaran dimînin, bi tehlûke bibe. Bi gotina Hegel civak bi giştî bi têkilî û nakokiya kole-efendî re rûbirû tê hiştin. Qonaxa şaristaniyê ya dîroka gerdûnî wê timî bi şerên ji vê nakokiyê peyda dibin û bi van şeran re bi şêweyên dewletên ava dibin dewlemend e. Di vê çarçoveyê de dîrok 'selexaneya mirovî' ye.

Di civakên şaristaniyê de hiyerarşî misêwa rê li ber dewlet û desthilatdariyê vedike, divê mirov vê rewşê rast analîz bike, ji ber ku ev yek ji bo vegotineke rast a dîrokê xusûseke din e ku gelekî girîng e. Pêvajoya civaka desthilatdar ji aliyê çawayetiya xwe ve ji civakên berê gelekî cihê ye. Saziya efendiyan an jî desthilatdarî di tevahiya dîroka şaristaniyê de xwedî karektereke welê ye ku timî mezin dibe, pêşde diçe û xwe berfireh dike. Fena nexweşiya kansêrê ye; belav û zêde nebe nikare li ser piyan bimîne. Saziya desthilatdariyê weke nexweşiya yekdestdarên kapîtalîst e, divê misêwa karê bike û bide serhevdu. Di cewherê xwe de herdu jî bi mayeyê zêdebûyî yê civakê pêk tên. Diyardeya çînayetiyê bi mayeyê civakî dikare bimeşe. Ev maye çiqasî qut yan jî kêm bibe, ewqasî jî krîza civaka dewletdar bivênevê wê pêk bê. Encam, şerê xwe timî hildiberîne û dewleta nû, li desthilatdariyê digerin û dixwazin bibin parçeyekî wê. Sazî û elîtên desthilatdariyê mîna nêçîrvanên li pey nêçîrê ne. Divê mirov dewletan jî weke şêweyê vê meseleyê yê rewakirî bi nav bike û bide naskirin.

Bêguman di rewakirina dewletan de pêdiviyên giştî yên rêveberiyê yên civakan bi temamî weke maskeyekê têne bikaranîn. Rêveberên dewletan hemûyan di tevahiya dîrokê de bi îhtîmameke mezin hewldane, xwe bi vê maskeyê bidin naskirin. Mirov dikare hin rêveberiyên civakî weke

pêdiviyekê rewa bibîne: mînak weke ewlekarî, avdaniya mezin, hewldanên îndustriyê û karûbarên dadgeriyê. Lê rêveberiyên dewlet û desthilatdariyê van karên civakî her di dereceya duyemîn de dibînin û di çarçoveya rewakirina xwe de bi kar tînin. Civakên desthilatdar civakên serwer ên zilam in. Der barê rêveberan de weke Pirtûkên Pîroz jî gelek caran tînin ziman di civakê de têkiliya 'şivan-kerî' xwedî hukim e. Ev têkilî wexta ber bi roja me ya îro tê, bi awayekî welê dimeşe ku kedkar û hawîrdor ber bi pîrekbûnê ve diçin. Ev yek bi karektera desthilatdariyê ya mêr pêk tê. Di civaka neolîtîk de rêveberî pirranî bi giraniya jinê radibûn û bi armanca hilberandin, ewlekarî û zêdekirina nifşê mirov tevdigeriyan, lê di civakên şaristaniyê de armanca rêveberiyên desthilatdariyê li hundir û derve mêtinkarî û şer in. Ji lewra jî di rêza pêşî de girîngiyê bi teknolojiya desthilatdarî û şer didin. Herweha hawîrdorê timî weke qadeke mêtingeh a divê bê fetihkirin dibînin.

Di çanda desthilatdariyê ya Rojhilata Navîn de mirov dikare van rewşên mucerred, bi awayekî dewlemend û pircure di rewşa berçav a Rojhilata Navîn de bibîne, ne tenê dîtin, ev norm û pîvanên meseleyê ne. Divê mirov sîstema şaristaniyê bi tevahî û navendî bibîne û nêzîk bibe, ev ji bo rastfêhmkirina wê şert e. Di nava demên dirêj de valatiyên parçebûyî û qutbûn nabin. Ji lewra biwêja ''Desthilatdarî valatiyê qebûl nake'' ji vî alî ve rast e.

**d-** Şaristaniya navendî pişta dîroka gerdûnî ye û çavkaniya wê ya sereke Mezopotamya ye. Ji pênc hezaran salan zêdetir temenekî wê heye. Ji van hezarê salan diherike û tê. Ji lewra gelekî girîng e ku mirov ji aliyê metodolojiya bingehîn ve şaristaniya navendî weke hîmê bingehîn ê dîrokê bibîne û lêbikole. Di vê mijarê de ji rêbazên nêzîkatiya çînî ya ekonomîst a teng bigirin heta bi rêbazên huqûq, nêzîkatiyên di mîhwera dewleta netewe de û nêzîkatiyên xwe disipêrin sîstema hilberînê di wê rewşê de nînin ku dîrokê yekpare bibînin û lêkolin. Nexasim rêbazên dîrokê yên mîkro pozîtîvîst ku her diçin belav dibin, mîna ku bi temamî bi rola tevkujiya maneyê radibin. Eger mirov rabe dîrokê di serî de bi hêmanên ferd, bûyer, xanedan, netewe, dewlet, çîn û ekonomiyê analîz

bike, ango bi hêmanên tekane bi awayekî reduksiyonîst rave û qal bike, ev wê bê wê maneyê ku rastî bi parçekirinê tê kuştin. Ev vegotinên mîtîk ên di bin hegemonya îdeolojîk a yekdestdarên kapîtalîst de têne kirin, bi giranî bi rola propagandayê radibin. Bêguman vegotina beşan pêwîst e, û girîng e. Lê eger di nava herikîna dîroka gerdûnî de bi awayekî yekpare cih negirin wê ji bo tevahiya serwextbûna li rastiyê bi kêr neyên. Di roja me ya îro de vegotina dîrokê mijareke gelekî bi pirsgirêk e. Ji vegotineke rast re hêz û hewldaneke mezin divê. Ez hem behsa hewldana fikrî û hem jî behsa hêza çalakiyê dikim. Heta mirov serwext nebe ku xisleteke desthilatdariyê ya weke sermayeya timî li pey karê heye, mirov nikare civakên şaristaniyê ji hev derxe û analîz bike. Ya rastî mirov heta desthilatdariyê weke sermayeya herî xas a rêxistinkirî nefikire, wê bi temamî wê fêm neke. Rast nîne ku mirov sermayeyê bi temamî ekonomîk (weke Marksîst û Lîberalan) û bi temamî jî polîtîk (weke alîgirên dewleta netewe) bifikire. Yek bê ya din nabe, yek a din çêdike, ango mirov wan weke cêwiyên bêyî hev nabin bike têgîn, wê encamên hê nêzî rastiyê derxe holê.

Mirov dikare sîstema şaristaniya navendî di çarçoveya van binavkirin û danasînan de weke sîstemeke civakî û dîrokî ya bêhtirî pênc hezar salan dewamkirî, binirxîne. Em dikarin weke sê versiyonên sereke û gelek komên jêr şematîze bikin. Yekemîn, derketina resen a Sumerîk e. Mînaka Ûrûkê xwe zêde kiriye, vê yekê hiştiye ku bajarên mezin weke gidîş û lodan pirr bibin. Qada navendî Mezopotamya Jêr e. Hêza hegemon dewleta sîte ya Ûrûkê ye. Bi qasî pêncsed salan dewam kiriye, her cihê gihiştiyê lê nîv-kolonî û dewrûber çêkirine. Em dikarin bibêjin, tevahiya Hîlala Bi Bereket weke navend û dewrûber bi rêxistin kiriye. Di encama pêxîrtengiya konjonkturel a sîstemê de salên 3000'î B.Z. hêza hegemonîk ketiye destê sîteya Ûrê. Serdema Ûrê ji ber pêxîrtengî û tengasiyên cûrbicûr qetqetî be jî hezar salî dewam kir. Em dema 3000-2000 B.Z. dikarin weke Serdema Ûrê binirxînin. Bi tevahî rola navend û dewrûberê ya Ûrûkê girtiye ser xwe, zêdetir berfireh kiriye û bajarên xwe pirr kirine. Bajarbûn li navend û dewrûberê gelekî di ser dema Ûrûkê re pêşketiye. Em dibînin bi dehan bajar têne avakirin. Di nava civakê de hem ji jor ber bi jêr

ve, hem jî ji jêr bi awayekî berfireh rêxistinî zêde bûye. Nivîs pêşketiye. Perwerde û zanist bi sazî bûye. Nîppûr mîna bajarê zanîngehan e. Li rojhilatê wê cîranê wê yê nêz li herêma Elamê bajarê Sûsê, li rojavayê wê Heleb û Ebla, li bakurê wê Marî û Kazaz û dîsa li peravên Firatê gelek kolonî hatine avakirin.

Mirov dikare bajarbûna li geliyên Misr-Nîl û Pêncavê weke komên jêr ên dewrûberên dûr binirxîne. Geliyên Nîl û Pêncavê ji bajarên xweser zêdetir dişibin mîna koloniyan. Şaristaniya Misrê di sêgoşeya qesr, qebr û perestgehên Firewn de dişibe komineke mekanîk a koleyan. Nekarîbûye xwe bigihîne bajarvaniya xweser û reqabetvan a şaristaniya Sumerê. Gundekî mezin ê kollektîfbûyî bi bîra mirov dixîne. Ji ber vê xisleta wê jê re sosyalîzma firewnan tê gotin. Cihûwarên Mohenjodaro û Harappa yên li Pêncavê zêdetir koloniyekê tînin bîra mirovî. Heye ku koloniyên Sumeran bin. Piştre şaristaniya Çînê ya di salên 1500'î B.Z. de li devê Çemê Zer (*Huáng Hé*) pêk hat, fena duyemîn mînaka Misrê be.

Em bajarvaniya li Bakurê Mezopotamyayê bi rengekî cihêtir dibînin. Komên li vê qadê bi hêza ji salên 3000'î B.Z. ve derbasî bajarvaniyê dibin, li dijî kolonîzasyonên Ûr û Ûrûkê (di dema 4500-3500 B.Z. de li dijî belavbûna çanda El Ubeyd) xwe diparêzin û xuya ye ku di nava demeke kin de van hêzên kolonîzasyonê di nava xwe de dihelînin. Li herêmê sîstemeke xurt a qebîleyan, avahiya gund û cotkariyê heye û ev dihêle ku karibe hêzên kolonîzasyonê di nava xwe de bihelînin. Dişibe Ewrûpaya li hemberî DYE'yê. Ji komeke jêr an jî dewrûberê zêdetir rewşa wê bêhtir nêzî rola navendeke duyemîn e.

Sîstemên hegemonîk ên Ûrûk û Ûrê di nava xwe de bi reqabetên bajaran (di serî de Babîl û Nînova), ji derve jî bi şerên êriş û parastinê yên ezbetên aryenîk ên li bakur-rojhilat (yên sereke Gotî û Aqad in) û bi êrişên Amorîtên bi koka xwe semîtîk, di dawiya salên 2000'î B.Z. de hêza xwe neman. Hêzên nû yên hegemonîk Babîl û Asûr in. Babîl salên 2950-1600'î B.Z. di dema xwe ya pêşî de bi awayekî gelekî bi heybet derketiye ser dika dîrokê. Hemmûrabûyê navdar nîşandeya vê serdemê ye. Dema duyemîn bi ezbetên bakur û rojhilat re bi awayekî hevpar derbas bû (hevgirtinên Hittît

û Hûriyan vê yekê tîne ziman) û salên 1600-1300 B.Z. ne. Di encama koalîsyona bi Medan re hegemonya Asûran hilweşandin û piştî vê jî dema dawî ye, ango ev dem salên 600-540 B.Z. ye. Nebûqetnezar ê ku cara pêşî Cihû mişextkirin nîşaneya vê demê ye. Babîl di tevahiya demên xwe de navendeke hegemonyayê ye. Hegemonya kapîtalîst a London û Newyorkê tîne hişê mirovan. Navenda pîşesazî, bazirganî, dîn, huner û zanistê ye. Lewma bi nav û deng e. Gotina 'Heftê û du millet' ji Babîlan maye. Ti qebîle û ezbet nemaye ku wê ew nekişandibe cem xwe. Ji bo Yewnaniyên demê Parîs û London e. Fîlozofên wê yên pêşî di ekola Babîlê re derbas bûne. Bi kurtî di dema xwe de bajarê hegemonîk ê dinyayê ye.

Hegemonya Asûrê jî mirov dikare li sê deman dabeş bike. Salên 2000-1600 B.Z. dema koloniyên bazirganiyê yên bi ser Babîlê ve, salên 1300-1000 B.Z. bi temamî dema hegemonîk e. Dema dawî jî salên 900-600 B.Z. ye. Ji Zagrosan heta bi Deryaspî, ji Anatolya Navîn heta bi Misr û Ummanê li cografyayeke berfireh karîbûye bibe hêzeke hegemonîk. Di pîşesazî û bazirganiyê de rê li pêşketinê vekiriye. Malê mamûl firotiye û maddeyên xam veguhestine metropolên xwe. Gelek xisletên kapîtalîzmê weke muhasebe, wezn, pîvan, kredî, pere û wekî wan pêşde birine. Di dema dawî de herçend Ûrartûyên navend Wan weke hevrikekî ciddî derketin pêşberî Asûrê jî heman serketin bi dest nexistin. Ya rastî gelekî girîng e ku Ûrartû weke hêza bi tenê karîbûye li dijî Asûran li ser piyan bimîne. Asûriyan di tevahiya demên xwe yên hegemon de koloniyên bi hêz pêkanîne. Koka têgînên kar, karxaneyê ji karûmê (acente) tê. Li rojhilat Med û Pers, li rojava Misr, Îsraîl, Fenîkî û heta bi nava Anatolyayê karîbûn gelek begtî û mîregiyan bikin kolonî û wan bikin bin destê xwe.

Hêzên Hûrrî û Hîtît yên bi ser qebîleyên Aryen, çawa ku di dema Ûrûk, Ûr û Babîlan de li dijî hegemonyayê di berxwedanê de bi serketin, ev yek li dijî hegemonya Asûrê jî dubare kirin. Em dizanin ku Qralê Hîtîtê Mûrşîlî yê yekemîn tevî hevgirên xwe yên Hûrrî di sala 1596'an B.Z. de Babîl jî di navê de navenda hegemonîk bi tevahî hilweşandin. Şaxê Hûrriyan, Mîtaniyan di dema 1500-1250'î B.Z. de ji Kerkûkê heta bi Deryaspî li herêmeke berfireh hêzeke mîna împaratoriyê pêkanî. Med û Ûrartûyên ji

heman kokê ne jî di dawiya berxwedanên salên dirêj de sala 612'an B.Z. kirin ku Asûr bi awayekî stratejîk têk biçe. Lê mirov têkçûna Asûrê bi tenê bi şerên derve ve girê bide nêzîkatiyeke kêm e. Sedema bingehîn ew e ku di şer de êdî kar û destketî nîne. Çawa ku wexta kara sermayê kêm dibe rê li pêxîrtengî û krîzê vedike, ji bo şeran jî qanûn e ku wexta kar û destketiyên wan kêm dibin bi krîz û têkçûnan bi encam dibin.

Piştî Asûran li Rojhilata Navîn hêza nû ya hegemon împaratoriya Pers a xwe disipêre hevgirtina Pers û Medan e. Împaratorên Pers ên bi rola hegemonê dinyayê rabûne, di dema 550-330 B.Z. de di avakirina sîstema herî berfireh a global de bi ser ketin. Qada wan a desthilatdariyê ji peravên Egeyê digihêje Pêncavê. Ji wan hat ku ji bilî Çînê tevahiya qadên dinyayê yên ku li gorî wê demê şaristanî ne, di bin hegemonya heman hêzê de bikin yek. Di vê serketinê de weke çanda manewî, para Zerdeştiyê diyarker e. Sîstem bi serhildanên dewamî yên hêzên hê kevintir hêzên şaristaniya Misrê û hêzên di pêvajoya şaristaniyeke nû de, hêzên şaristaniya Îon ve hat hilhilandin û peritandin. Babîl a mîrateya Mezopotamya Kevin dewam dikir jî tim û tim isyan dikir. Ezbetên Skîtan ên li bakur mîna gerîllayên demê bi şerê êriş û parastinê herî zêde sîstem êşandin û peritandin. Mekedonya bi bandora çanda Grek bi lez pêşde diçe û li serê wê qralekî nû û gelekî ciwan Skender heye. Ev qralê ciwan şagirtê Arîsto ye ku serdestiya wî ya îdeolojîk û taktîk dawî li hegemonya Persan tîne. Bi vî awayî şaristaniya nû ya Grek bi serketî xwe dide qebûlkirin.

**e-** Hêza nû ya hegemonîk dikeve destê şaristaniya Helen a serdestiya xwe daye qebûlkirin û hêzên temsîla wê dikin yên Greko-Romen. Ev cara pêşî ye ku hêz bi awayekî ciddî dest diguhere û ji Rojhilat derbasî Rojava dibe. Şaristaniya Greko-Romen a xwe disipêre çanda bajêr a Îonê a li peravên Egeyê (600 B.Z. - 500 P.Z.), di dîroka gerdûnî de rê li duyemîn gava mezin a bajarbûnê vekir. Çavkaniya hêza vê şaristaniya bajêr çanda ketiye serhev a maddî û manewî ya Misr, Babîl, Hîtît, Grît û Med-Persan e ku belkî bi sedsalan hatiye girtin û qebûlkirin. Hema bêje zanyarên sereke yên Îonê nînin (Solon, Thales, Pîsagor) ku li qesrên Misr, Babîl û Persan negeriyabin û zêde zêde li çanda wan çav negerandibin û lêkolîn nekiribin.

Bêguman ji gelek aliyan ve feydeya Greko-Romenan jî li şaristaniyê bûye. Ya girîng ew e ku şaristanî bi awayekî zincîrwarî bandorê li hev dikin. Di bingehê wê de jî bi destxistina mayeya civakî heye. Şerên desthilatdariyê û saziyên wê timî weke mîraseke rêûresmê yek dewrî ya din dike. Kî desthilatdariyê zêdetir bike, ew xwe herî zêde serketî dihesibîne. Ev jî bi mezinkirina berhemê zêde û bi destxistina wî ve têkildar e.

Şaristaniya Ewrûpayê di sedsalên 9.-13. de çawa ku çanda maddî û manewî ji şaristaniya Rojhilat veguhest, bi heman rengî şaristaniya Greko-Romen jî di salên 1600'î B.Z. de pêşî bi mînaka Mîken-Hellas a li Nîvgirava Yewnan, û paşê di salên 1000'î B.Z. de jî bi Etruskan li Nîvgirava Îtalyayê çanda maddî û manewî ji şaristaniya Rojhilat veguhest. Veguhestina çanda Neolîtîk jî ji demên 7000-4000 B.Z. misêwa dewam kiriye. Ji dîroka gerdûnî veguhestina çandê yekalî nabe, timî bi awayekî hewcedariya beramberî hevdu pêk hatiye û tê. Di demên şaristaniyan de belavbûna xwe disipêre tehekumê ji texmînan wêdetir, bi sînor e. Dîrok jî her tişt nîne; em nikarin propagandaya dîrokên fermî weke dîrok qebûl bikin. Belavbûna şaristaniyên bi koka xwe desthilatdar perçeyekî bi sînor ê dîroka gerdûnî pêk tînin. Di binî de jî rola bingehîn a dîroka civakî ye ku ji gelan û qebîleyan pêk tê. Gelekî zehmet e ku mirov navê dîroka desthilatdar li dîrokê bike. Eger mirov dîrokê di çarçoveya civakî de bişopîne ev yek wê cewherê dîroka gerdûnî bide me. Divê ez careke din destnîşan bikim ku ev pirsgirêk hê jî bi tevahiya giraniya xwe têne guftûgokirin.

Bajarvaniya li herdu keviyên Derya Egeyê (700-500 B.Z.) û tevgera çand û şaristaniyê ya xwe disipêre wê ji aliyê dîroka gerdûnî ve sentez û momenteke nû îfade dike. Di pêkhatina şaristaniya Ewrûpaya Rojava de mirov dikare vê sentez û momentê weke gavavêtin û derketineke orjînal binirxîne. Ji bo nêrîna ji hemû aliyan ve li dinyayê weke destpêkekê tê pejirandin. Şaristaniya navendî ya Ewrûpayê di vê mijarê de tevî îdeayên felsefîk û zanistî hemûyan jî para bêhtir nêzîkatiyeke mîtolojîk nîşan dide û dema vê dike dîroka gerdûnî gelekî berevajî dike.

Ji vegotinên heta niha gelekî baş tê fêhmkirin ku çanda li peravên Egeyê pêşketî, heta bi dema xwe ji tevahiya çandên bi koka xwe Rojhilata Navînî

bi veguhestina sedsalan û heta hezar salan dewam kirî, wergirtiye û sentezeke gelekî girîng a vê veguhestinê ye. Hewce nake ku mirov dûr biçe. Bi tenê senteza ji salên 600'î B.Z. ji têkiliyên Pers-Helen pêkhatî (eger em Medan jî li vê zêde bikin) heta bi hilweşîna Romaya Rojava dewam kirî, ango em li encama têkiliyên heta salên 500'î P.Z. (em Sasaniyan jî lê zêde bikin) dewam kirî, şahidiyê dikin û ev yek rastiyê piştrast dike. Mirov bi tenê çavekî li panteona xwedayan a li çiyayê Nemrûdê yê li Semsûrê bigerîne, têrê dike ku mirov li vê rastiyê serwext bibe.

Tevgera bajarbûnê ya Grekan sentezeke serketî û qonaxeke li jor e. Atmosfera çandî ya rê li ber vekir, hişt ku îdeolojiyên dînî yên bi giranî koka wan mîtolojîk in, ji hev derxîne û bi vê re kir ku felsefe û zanist bibin xwedî gotin. Ji bo vê yekê gelekî bikêrhatî bû. Ji bo ku hîmê vê felsefe û zanistê deyne, rola vê kêrhatîbûnê diyarker e. Ji lewra, dîroka gerdûnî bi awayekî ciddî bi lez kiriye. Rê li pêşiya zanista biyolojî, kîmya û fizîkê hatiye vekirin, bingeha felsefa civakî û dîrokî jî bêhtir bûye xwediyê pîvanên zanistî. Di hunerê de jî nexasim di mîmariya bajêr, heykeltraşî, şano û vegotina destanan de mînakên bi heybet derketine holê. Bêguman li pişt serketinên mezin ên Skender ev serdestiya çandî heye. Dîsa ya hegemonya eskerî û siyasî ya Romayê derxist holê jî ev serdestiya çandî bû. Roma çi di qonaxa komarê û çi jî di qonaxa împaratoriyê de veguhestina çanda Grek ji bo qada eskerî û siyasî îfade dike. Roma li derdora hezar salî xwediyê serhatiyeke hegemonîk e (508 B.Z.-495 P.Z.), bi vê jî hem niyetên Atînayê rast derketine, hem jî bi cih hatine. Ji lewra, mirov nikare weke sentezeke din an jî weke orjîn bihesibîne. Bêguman ji aliyê çendayetiyê ve gelekî mezin bûye, ji aliyê çawayetiyê ve jî (di warê hegemonya eskerî û siyasî de) hewl daye xwe bigihîne mukemmeliyetê. Di warê huqûq, mîmarî û retorîkê de mînakên vê hatine nîşandan.

Hegemonya Romayê gerdûnîbûn û dîroka gerdûnî têra xwe tengav kiriye. Ji vî alî ve alîkarî û kêrhatina wê girîng e. Lê divê neyê jibîrkirin ku bi giranî di qada çandî ya Rojhilata Navîn de bi vê rolê rabûye. Mînaka Romaya Rojhilat (Împaratoriya Bîzansê) vê rastiyê pirr eşkere îfade dike. Hewl daye xwe bigihîne şaristaniya Ewrûpayê, hewl daye bibe Rojava. Di

vê hewldana xwe de li dijî Gotan (qebîleyên Germenîk) ji bo seferên eskerî ji çêkirina hin rêyan, kelheyan û bircên parastinê wêdetir neçûye. Di gerdûnîbûna wê de ji sedî sed aliyên rojhilatî serwer in. Demeke dirêj Dîcle û Firat sînorên wê yên Rojhilat bûn. Ji mînakên Grekê zêdetir bûye Rojhilatî. Hem di qada maddî de û hem jî di qada manewî de bi vî awayî bû, di warê çendayetî û çawayetiyê de jî sentezeke bi vî awayî îfade dike. Bêguman di pêkhatina şaristaniya Ewrûpayê de qonaxeke dîrokî û pêşezmûnek e.

Di dema hegemonya Romayê de li şûna Persan (xanedanên Hêxamenîş) çanda Rojhilat xanedanên Part û Sasaniyan ên şûna wan girtî, hewl dane temsîl bikin (li derdora salên 250 B.Z.-650 P.Z.). Wexta ez dibêjim temsîl, ez îşaret bi rehên eskerî û siyasî yên çanda desthilatdariyê dikim. Di vê temsîlê de çawa ku piştî Skender li pişta hegemonya Greko-Romen cîhana çanda Helen hebû, li pişt desthilatdariyên hegemonîk ên bi giranî Pers-Med bûn jî çanda Zerdeşt a li qûntara çiyayê Zagrosan li dora agirên Magan (agirê kuçikê) ên vêketî pêkhat, rola xwe ya diyarker heye. Di navbera du hêzên hegemonîk de li derdora hezar salî şerên serdestiyê yên eskerî û siyasî dewam kirine û pê re, di navbera herdu çandan de bi heman awayî şerekî îdeolojîk dewam kiriye. Di senteza çanda Rojava de rola van pevçûn û şeran diyarker e.

Pêwîst e, ez vê xusûsê bi girîngî destnîşan bikim ku çanda civakî ya xwe disipêre qûntara çiyayên Toros-Zagrosê di ti demê de bi temamî resenî û orjînaliya xwe wenda nekiriye. Radestî hegemonyayên siyasî û eskerî yên ji nava wê derketî û heta rahibên dînî nebûye. Weke civaka dîrokî her hebûna xwe dewam kiriye. Tevahiya dîrokê ji çar aliyan ve êrişên dagirkeriyê bi ser de hatine û tevî vê yekê karîbûye hebûna xwe ya civakî dewam bike. Di vê yekê de rola sîstema qebîleyan a kokên wê kûr in (ji salên 15.000'î B.Z. heta roja me ya îro), û ekonomiya xwedîkirina heywên diyarker in. Di vê çandê de ji mirov wer tê du alem hebin. Yekemîn, cîhana civakî ya gel û qebîleyên di kûrahiya dîrok û axê de veşartî ne; duyemîn, cîhana dewlet, pevçûn û şerên hegemonya desthilatiyê ya bêhejmar hêzên dagirker, mêtinkar, mêtinger û îmhakeran e. Ya ez dixwazim qal û behsê

bikim ew e ku ji aliyê dîroka gerdûnî ve pêşketina diyalektîkê ya heta roja me ya îro dewam dike, xeta sor a di navbera herdu cîhana de ye. Çanda herêmê qet nebe di warê kirdarbûnê de hîç dewrûberî qebûl nekiriye, nexwestiye vê bîne bîra xwe jî û herçiqasî di warê xwesteka navendbûnê de çîrokên wê yên trajîk û komîk hebin jî timî di navendmayînê de israr kiriye. Wexta ku mirov ji vî awirê gerdûnî ve li dîroka me ya mîkro binêre dikare bi hezaran mînakên hem rûmetê hem rezîliyê, hem êşê hem coşê, hem komediyê hem trajediyê bibîne û em ê di fêhmkirina vê de zehmetiyê nekişînin. Em ê li xwezaya xwe ya civakî (tevî xwezaya fizîk, kîmya û biyolojîk a yekpare jê nabe) zêdetir serwext bibin û ji bo paşvexistina neyêniyan em ê zêdetir ber bi çalakî û îradeya wê ve bibezin.

**f-** Pêngava gerdûnî ya dawî ya şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn di sentez û momenta şaristaniya Îslamî de pêk hatiye. Di bin navê Îslamê de berevajî yeqîn û texmînan îdeolojiyeke dîn a rafîne bûyî nîne, senteza tevahiya varyasyonên îdeolojîk ên heta wê demê ye. Îslam orjînalîteyek nîne, di herikîna çanda gerdûnî ya Rojhilata Navîn de û di şaristaniya wê de, demek e, kêliyek e. Di heman demê de sentezeke îdeolojîk a gelekî tevlîhev e. Bêşensî ew e, Ewrûpaya Rojava senteza Xirîstiyaniyê ji nû ve analîz kir û bi vê yekê di zanist û felsefeyê de rê li ber pêngaveke dîrokî gerdûnî vekir, lê analîzên felsefeya zanistî bi sentezên Îslamê dest pê kirin, hînê negihiştin encamê, hatin tepisandin û ev jî bû yek ji sedemên girîng ku şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn destbiguhere û bikeve destê Ewrûpayê.

Şaristaniya Îslamê, di destpêkê de tevî hemû naverok û temayên xwe yên rizgarîxwaz di demeke pirr kin de (Xanedaniya Emewî, 650-750) veguherî şaristaniyeke hegemonîk. Di demên dawî de xwelihevrakişandina Bîzans-Sasaniyan a gelekî dejenerebûyî û ya kar têde nîne, gelên herêmê û komikên civakî têra xwe hilhilandin. Ya rastî, li dijî vê bihevketina asêbûyî û çareserneker, Îslamiyetê xwe weke gaveke dijber û çareseriyê pêşkêş kiriye. Çawa ku ji navê wê jî tê fêhmkirin ev peyam Selam e, ango dînê aştiyê ye. Koka têgîna Îslamê ji selamê tê. Lê çawa ku dibêjin ê hatî xweziya mirov bi yê çûyî tîne, bi Xanedaniya Emewî (Muqawela – peymana

– Medîneyê ya Muhemmed heta 650 dewam kiriye, di xwelihevrakişandina Muawiye-Elî de ji qebîleya Qureyşan Xanedaniya Emewî bûye aliyê serketî) şerên şaristaniyê yên li Rojhilata Navîn hînê zêdetir bûne. Bîzans û Sasanî gelek caran hatine têkbirin, dor li Konstantînopolîsê hatiye girtin, bajarên Sasaniyan bi tevahî hatine girtin. Lê li sînorên Çînê (750) hatine rawestandin. Ji Hindistanê heta bi Nîvgirava Îberê û dewrûbera Efrîkayê bi cih bûne. Piştî ku ezbetên Tirkan misilman bûn li nîvê dinyayê yê Bakur, ji Ewrûpaya Navîn heta bi tevahiya Başûrê Sîbîrya û Asya Navîn belav bûye. Di qadên desthilatdarî-dewlet-şaristaniyê de gelekî berfireh bûye.

Di dema Xanedaniya Abbasî de (750-1250) gihiştine asta herî jor a hegemonyayê. Navê têgîna Împaratoriya Cîhanê gelekî tê hildan. Çanda Grek, Hind û heta ya Çînê bi lez tên tercumekirin û telîfkirin, bi vê dixwazin Îslamê di warê çandî de serdest bikin. Kapîtalîzma bazirganiyê xwe gîhandiye qonaxa herî pêşketî ya dîrokê. Ya rastî, bixwaze dikare Ewrûpaya ku wê paşê di warê hegemonîk de wê têk bibe, bixe bin destên xwe û heta hêza wê heye ku wê dagir bike. Ji ber ku kar têde nîne, qîma xwe bi fetheke bi sînor a Ewrûpayê tîne. Berevajî yeqînan dagirnekirina Ewrûpayê bi sedema berxwedana wê nîne, çawa ku di dagirkeriyên Romayê de hat dîtin, bi sedema bêbereketbûnê dagirkeriyên wan nîvco man. Dîsa dagirkeriyên Hûn û Cengiz Xan ji ber heman sedeman nîvco hatine hiştin. Şensê Ewrûpaya heta sedsala 15. ew e; hê nebûye qadeke bi bereket û bi kar ku hêzên mezin (yên bi koka xwe ji Rojhilata Navînî) dilê xwe bibijîninê. Wexta ku Ewrûpa hatiye wê astê jî ji sedsala 19. û pêve jêhatiye bi pêngaveke dijber hegemonya xwe pêk bîne û mayînde bike.

Dema weke şaristanî hilweşîna hegemonîk a Îslamê tê analîzkirin, ji derve êriş û dagirkeriyên Xanedaniya Cengiz Xan a Moxol û li hundir jî pevçûnên mezheban weke sersebeb têne nîşandan. Ev vegotin û ravekirineke kêm e. Çawa ku tê gotin, sedema bingehîn ew e ku nekarîbûye Ronesansa çandî pêk bîne. Haya rêveberiyên serdema Abasiyan ji vê rastiyê heye. Baş dizanin ku wê bi tenê bi peyama aştî û rizgariyê ya Îslamê û kêrhatina wê ya dînî nikaribin împaratoriyê li ser piyan bigirin. Bi rastî di dema 800-1200 de hewldanên nêzî Ronesansa

Îslamî gelekî hatine nîşandan. Di zanist û felsefeyê de gavên ciddî hatine avêtin. Di warê bijîşkî, biyolojî, matematîk, fizîk, kîmya, dîrok û zanistên civakî de li pêşiya Ewrûpayê ne. Di warê felsefeyê yê zanîn, tesewif, mentiq, îlahiyat û edaletê de gavên gelekî ciddî têne avêtin. Lê di encamê de bi giraniya dogmatîzma dînî re ev xebat korkirine û heta lanet li wan anîne û bêkêr kirine.

Ewrûpa jî berevajî li aliyekî hewl dide yekser xwe bigihîne çavkaniyên Greko-Romen, li aliyê din jê hatiye ku tevahiya çavkaniyên li welatên Îslamê bigewdebûne û dikare sûdê ji wan bigire, di vê demê de veguhezîne. Ronesansa li Rojhilata Navîn înqîta bûye (qut bûye) li Ewrûpayê gav diavêje. Sedsalên 14. û 15. li Ewrûpayê sedsalên Ronesansê ne. Şensê Ewrûpayê ew e ku tevî dogmatîzma Xirîstiyaniyê, karîbûye Ronesansa xwe dewam bike û li tevahiya Ewrûpayê belav bike. Di sedsala 16., 17. û 18. de bi şoreşên Reformasyon (di dîn de reformên bi kok), felsefî û zanistî pêvajo rohnî kiriye û jê hat bi awayekî serketî pêşde bibe. Di encamê de wexta em tên serê sedsala 19. serketina şoreşa çandî (zêhnî) ji sedî sed e. Di warê destguhertina hegemonyayê de serketina şoreşa çandî bi roleke diyarker rabûye. Ango ji ber vê yekê şaristaniya Îslamî hegemonya xwe ji dest dide û hegemonya dikeve destê Ewrûpayê.

Di mijara destguhertina hegemonyayê de sedemeke din a divê di rêza duyemîn de bê qebûlkirin ew e ku kapîtalîzma bazirgan bi şêweyekî bi heman rengî serketî veguhestin Ewrûpayê. Di serî de Venedîk, Cenova û Floransa bajarên Îtalyayê ji sedsala 11. û pêve bi Seferên Xaçperestan pêngava mezin a bazirganiyê ya ketin navê, bi tenê bi armanca kar û qezencê nebû. Herweha karîbûn, bi tevahî pêşketinên kapîtalîst (cotkarî, pere, bazirganî, îndustrî) yên bi hezarên salan li cîhana Rojhilata Navîn çêbûbûn, tevî karê weke çandekê veguhêzin. Tevî mal tevahiya teknîk û usûlên vî malî hildiberînin jî vediguhêzin. Divê mirov teknîkên weke kaxiz, barûd, çapxane, top û hwd. yên ji şaristaniya Çînê hatine girtin jî li ser veguhestinan bihesibîne. Nexasim di rêza sêyemîn de mirov veguhestinên teknîka eskerî û fikra siyasî 'Bi Rêya Moxol' dikare bibîne. Ewrûpayê xweber teknîkên dewlet û desthilatdariyê û fikra li pişt wan ava nekiriye;

para bêhtir jê re mîras maye. Lê ji sedsala 16. ve karîbûye alîkarî û kêrhatina xwe li vê çandê zêde bike. Divê mirov di rêza çaremîn de veguhestinên huner û wêjeyê bi cih bike. Di van veguhestinan de dewletên bajêr ên Îtalyayê û Dewleta Îslamê ya Endulusê bi rola sereke rabûne.

Di dawiyê de mirov dikare Xirîstiyantiyê jî weke amûrekî veguhestina moral û manewiyatên bingehîn binirxîne. Piştî hilweşîna Romayê, Xirîstiyantiyê Ewrûpa ji aliyê moralê ve rakir ser piyan. Ji vê jî girîngtir, pêngava nû ya bajarvaniyê pirranî li dora perestgehên Xirîstiyantiyê bi pêş ket. Tevgerên nû yên bajarbûnê yên ji sedsala 11. ve li peravên Îtalya û Ewrûpaya Rojava bi lez bûn, ji aliyê gerdûnî ve piştî pêngava Sumer û Îonê pêngava sêyemîn a sereke ye. Ev pêngavên dîrokî yên hem çanda li pişt wan û hem jî şêweyê avabûna wan cihê, aliyê wan ên wekhev jî gelek in, bêguman gelek komên wan ên jêr jî hene.

Çîroka şaristaniya pênc hezar salî di heman demê de çîroka pêşketina varyasyonên bajêr e. Bajar weke qayişên hem maddî û hem manewî yên çandê di dîrokê de bi roleke domdar û mayînde rabûne. Qonaxa bajarbûnê ya Ewrûpayê hê jî dewam dike û nayê zanîn ku wê çawa bi encam bibe, ji ber ku pêxîrtengiyên dijwar û bi awayekî kansêrwarî mezinbûna bajêran dibe mijara guftûgoyên mezin û lêgerînên nû yên çareseriyê. Xirîstiyantî bi van aliyên xwe di warê veguhestina hêmanên çanda maddî û manewî de bi rola pêşengtiyê ya stratejîk û taktîk rabûye. Wexta mirov kokên Xirîstiyantiyê yên ji Rojhilata Navîn li ber çavan bigire, mirov ê baştir fêhm bike ku Ewrûpaya ji sedsala 16. ve derbasî şaristaniyeke nû bûye, çawa derketiye holê. Şaristaniya Ewrûpayê ya mîrateya şaristaniya Greko-Romen wergirtî, bi van veguhestinên nû xwe nû kiriye, xwe gihandiye sentezeke çandî ya bi hêz û bi veguherînên radîkal ên di şêwazê hilberîndanehevê de karîbû bi awayekî serketî hegemonya xwe ava bike.

Di avakirina hegemonyayê de dewletên bajêr ên Îtalyayê, tevgerên jinûvefetihkirinê yên Qraliyetên Spanyayê û ceribandinên Împaratoriyê, bilindbûna Ingilîstan û Hollandayê, hevrikiya Franse û Elmanyayê bi vê re talî dimînin. Divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku di vê bilindbûna hegemonîk de hêmanên maddî û manewî yên çanda Cihûtiyê di warê

rolgirtina stratejîk de herî kêm bi qasî Xirîstiyantiyê bi tesîr bûne. Ji cîhana Îslamê di veguhestina tevahiya hêmanên çandî de rola pêşengiyê ya Cihûyan, ji sedî sed e. Di hînkirina Ewrûpayê ya pere û bazirganiyê de ew timî bi rola sereke rabûne. Di her tevgera fikir, zanist û felsefeyê de Cihûyan şopên mayînde hiştine. Di pêşengiya taktîk û teorîk a hemû şoreşan de misêwa hebûna xwe dane hiskirin. Di şaristaniya nû de bi rola xwîn û mejî rabûne, nayê înkarkirin ku herî kêm di pêşketina vê şaristaniyê de xwediyê pareke sereke ne.

Weke encam mirov dikare bibêje; dîroka gerdûnî ya Hegel bi dewleta bajêr da destpêkirin û xwest bi dewleta netewe ya Napolyon bi dawî bike, gelekî eşkere ye ku hîç wekî ew vedibêje nîne. Felsefeya lîberal a bi Hegel re di nava dijberiyê de jî bi jihevketina Yekîtiya Sovyetê re kehaneteke bi heman rengî ya 'dawiya dîrokê' kiribû. Li vir 'dawî' heye; lê ev, dawiya dîroka gerdûnî nîne, dawiya dîroka şaristaniya navendî, desthilatdarî û şêwegirtinên dewletên wê ne. Dewleta netewe heta bi çaviya herî mahrem a civakê ve çizirî ye, di heman demê de bi vî awayî pirsgirêkbûyîna desthilatdarî û dewletê bi dawî kiriye. Ango heke felsefeya Hegel bi vî awayî li ser piyên wê bê danîn (ne ku weke Marks kirî) hingî mirov wê karibe zêdetir jê hîn bibe û ew ê kêrhatî be. DYE'yê di dawiya salên 2000'î de wexta ku di pêngava li Rojhilata Navîn de serê Saddam Husên birrî, min timî ji xwe pirsî gelo haya wê jê heye ku bi vî awayî dawîanîna li dewleta netewe îlan dike. Bersiv ewçend girîng nîne, rastî bi xwe girîng e. Min şibandineke wisa jî kiribû: Ji bo avakirina dewleta netewe di Şoreşa Franseyê de serjêkirina Louîsê 16. çiqasî girîng be, serjêkirina Saddam jî herî kêm di dawîanîna li dewleta netewe ya Rojhilata Navîn de ewçend girîng e. Yên dizanin hûrûkûr û rast li dîroka gerdûnî binêrin, ji niha ve dikarin gelek îşaretên dawîlêhatinê bibînin ku xelekên dewletên netewe yên ji Afganistanê dest pê dikin û heta bi Fasê dirêj dibin, çawa diqurifin û dişkên.

Lê belê bi dawîbûna fenomenên şarisanî-dewlet-desthilatdarî yên bi şêwazê Hegel, dawîlêhatina dîroka gerdûnî nîne, maneya wê ji paradîgmayeke din destpêkirineke nû ye. Dîroka civakî ya li herî binî ya

dîroka gerdûnî ye, lê timî mîna damara sereke misêwa hildiavêje, piştî navberên dirêj ji nû ve serê xwe derdixe rûyê erdê û xwe amade dike ku bi rola xwe ya dîrokî rabe. Di tezên şaristaniya demokratîk de li ser avakirina dewletan û hilweşandina wan zêde îdea peyda nabin. Şaristaniya demokratîk bi şaristaniya dewletdar û hiyararşîk re timî hewl dide xetên taktîk û stratejîk ên di navbera xwe de zelal bike. Ev herdu şaristanî di dîroka gerdûnî de her hebûn, niha jî hene. Wezîfeya me jî ew e; em şaristaniya xwe ya demokratîk, tevahiya bernameyên siyasî û îdeolojîk, amûr û prensîpên taktîk û stratejîk pêşde bibin, belê ne weke ku K. Marks Hegelparêziya Çepgir kir, em ê bi tevahî felsefeya wî rexne bikin jê bibihurin û em ê felsefeya şaristaniya xwe ya demokratîk pêk bînin.

# Beşa Sêyemîn:

# PÊXÎRTENGÎ Û PIRSGIRÊKÊN DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE

Pêxîrtengî yan jî tengaviyên civakî ew dem in ku sîstem nikare xwe dewam bike. Pirsgirêk li gorî têgîna xwe zêdetir xwedî maneyeke giştî ye. Pêxîrtengî zêdetir xwedî karektereke dewrewî ye, lê pirsgirêk di bûyer, diyarde, têkilî û saziyan de rojane diqewimin. Pêxîrtengiyên di nava heman sîstemê de weke 'konjonkturel' tên binavkirin, ji pêxîrtengiya sîstemê bi xwe re jî têgîna 'avahî' tê bikaranîn. Sedemên pêxîrtengiyên civakî pirralî ne. Pêxîrtengiyên ji ber qadên siyasî, ekonomîk û demografîk hene, her weha yên sedema wan jeobiyolojîk jî hene. Civakên di nava wan de hiyerarşî û dewlet (bi giştî saziyên desthilatdariyê) pêş neketine bi giranî jeobiyolojîk in. Erdhejeke xwezayî yan jî hişkesalî dikare rê li ber pêxîrtengiyeke ciddî ya civakî veke. Bi awayekî kes ne li bendê hawîrdor xira bibe, encamên wê, wê bi heman rengî bin. Çawa ku şêniyên zêdebûne û nikarin xwe xwedî bikin, şêniyên hejmara wan kêmbûyî jî dikarin bibin sedema pêxîrtengî û tengaviyê.

Kengî misêwa rêjeya karê ya bi teknîka şer an jî bi amûrên malî, bazirganî û îndustriyê tê kirin, kêm dibe, hingî pêxîrtengiyên çavkaniya xwe desthilatdarî ne, pêk tên. Lêçûna şer kengî ji hatina wî bibihure û eger ev yek bi amûrên din tedarik nebe, pêxîrtengî û tengaviya civakî bivênevê wê pêk bê. Wexta ku rêjeya karê ya yekdestdarên pîşesazî, bazirganî û malî li ser piyaseyan timî kêm bibe û eger ev rêjeyên karê bi şerên nû şûna

wan neyê dagirtin, pêxîrtengî û tengaviyên nava sîstemê ferz dibin. Pêxîrtengiyên çavkaniya wan konjonktur e (di sîstemên kapîtalîst de bi giştî demên pêxîrtengiyan di navbera 5 û 100 salî de diguherin), eger zêde dirêj bikudînin vediguherin pêxîrtengiya sîstemîk. Êdî di bin sîstemê de civak nikarin dewam bikin. Avahiya sîstemê belav dibe û ji bo avahiyên nû yên sîstemîk pêş bikevin, rewşeke kaotîk derdikeve holê. Di nava hêzên civakî de yên li gorî amadekariyên xwe yên îdeolojîk û avahiyê xwediyê bersiveke pêşketî bin, di avakirina sîstema nû de mîsyon an jî şensê rola sereke digirin, bi dest dixin.

Pirsgirêka belavbûna her sîstemê û li şûna wê avakirina ya nû, di têgihiştina zanista pozîtîvîst de rê li ber binavkirinên çeloxwarî vekiriye. Nexasim têgihiştinên dîrokê li ser xeteke rast dibînin bi têgihiştineke nû ya çarenûswarî hewl didin şêweyên nû yên civakan destnîşan bikin û van hewldanan encamên gelekî neyênî dane. Eger mirov xwezayeke gelekî tevlîhev a mîna civakê bi xebatên muhendisî bi proje bike, di tevahiya dîrokê de bihêlin bibe çare, vê yekê pêxîrtengî hînê zêdetir kûr kirine. Çi nêzîkatiyên metafizîk (Îslam, Xirîstiyan, Hindû hwd.), çi jî nêzîkatiyên pozitîvîst (netewe, ekonomî, huqûq) bi tevahî diçin ser heman riyê. Hetta mirov dikare bibêje; rêbazên pozitîvîst weke ku di diyardeya faşîzmê de derdikeve holê, ji pêxîrtengiyê wêdetir rê li qirkirinên civakî vedikin. Mirov dikare bibêje; piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn di encama şoreşên felsefî û zanistî de li ser mijara xwezaya civakî guftûgoyên zêdetir hûrûkûr hatin kirin. Bilêvkirina ekolojî, femînîzm, çand û demokrasiyê ji bo rohnîkirina xwezaya civakî kêrhatî ne, dihêlin ku mirov derfet û îmkanên çareseriyê rast diyar bike û şensê çareseriyê zêde bike.

Teoriya Marksîzmê ya pêxîrtengiya kapîtalîst herçend diyardeyê resim neke jî çareseriya li bendê ye, her dema diçe nêzî wê nabe, zêdetir jê dûr dikeve. Ev rewş bi qasî ku bi nasîna çewt û kêm a xwezaya civakê ve têkildar e, ewqasî jî bi modelên çareseriyê yên hatin pêşniyarkirin re têkiliya xwe heye, ji ber ku modelên çareseriyê yên hatin pêşniyarkirin ji utopîkbûnê wêdetir ti maneyê îfade nakin. Ji vê jî xirabtir, amûr û rêbazên çalakiyê yên hatin pêşniyarkirin bivênevê ketin pozîsyonekê ku ji

xurtbûna kapîtalîzmê re xizmet kirin. Dîrok di vê mijarê de bi çareseriyên xeyalî û perpitînên bêhevî yên dawî li wan nayê, tijî ye. Di mijara çareyan û pêxîrtengiya civakî de tevahiya dîrokê, rastiya herî girîng ew e ku divê mirov çalakiya zanîna encamê hûrûkûrtir bike; pêdiviya bi vê his bike. Felsefe û zanist, heta huner û dîn di vê çarçoveyê de ji bo ji pêxîrtengiyên giran ên civakî re bersivekê bibînin pêşketine.

Karekterê pirsgirêkên civakî cuda ne. Bêguman di çarçoveya çavkaniya wan a mêtinkarî û desthilatdariyê de aliyên wan ên hevpar hene. Lê aliyekî wan ê cuda heye, ew jî ew e ku timûtim rojane diqewimin. Herweha ya ji bo hin kom û ferdan pirsgirêk e, ji bo hin ferd û koman çareserî ye. Ji bo pêxîrtengiyê ev xusûs hînê giştî ye. Bi tevahî beşên civakî ji pêxîrtengiyan bi awayekî neyênî bi tesîr dibin. Lê hin dijminên civakî yên marjînal dikarin di encama pêvajoyê de feydeyê bikin. Eger çavkaniya xwe ji derve nebe, pirsgirêkên civakî bi awayekî bingehîn çavkaniya xwe ji mêtinkarî û zordestiya kulmozên desthilatdariyê ne. Jin ji nêregiya mêr û hiyerarşiya wî, kole ji efendiyê xwe, gundî ji axayê xwe, memûr ji amîrê xwe, karker ji patronê xwe, bi tevahî civak ji amûrên mêtinkarî û zordestiya yekdestdariya desthilatdaran bi awayekî neyênî bi tesîr dibin. Zirar li wan dibe, têne mêtin; dibin mexdûrê êşkence û zordestiyê. Di encamê de wê hemû pirsgirêkên civakî bibînin. Ya ku yekdestdarên desthilatdarî û mêtinkariyê weke çareseriyê pêşkêş dikin jî şêweyên şidandîtir ên desthilatdarî û rêbazên mêtinkariyê ne. Ji ber vê sedemê ye ku şêweyên mêtinkarî û dewletê timî pêş dikevin. Li hemberî vê rewşê jî timî berxwedan, serhildan û şerên dijber hene. Ji ber ku gelek caran dikevin ber balkêşiya mêtinkarî û mentiqê desthilatdariyê, encam mîna ku çarenûsekê be, bi awayekî herî bêrûmet li bin pirsgirêkên mêtinkarî û zordestiyê mane. Dîroka şaristaniya dewletdar, bi awayekî din, mirov dikare bibêje; ew dîrok e ku rêbazên mêtinkarî û zordestiyê timî xwe nû dikin û pêşde dibin, li hemberî vê jî dijberên li ber xwe didin, azadî û felsefeya wekheviyê û çalakiya wê pêşde dibin.

Civakên Rojhilata Navîn di tevahiya dîrokê de ji wî parçeyê mirovatiyê ne ku herî zêde bûne xwedî pirsgirêk û ketine tengavî, pêxîrtengiyê.

Bêguman sedema vê ya bingehîn ew e, di tevahiya demekê de ku ji pênc hezar salî zêdetir e, misêwa di bin mêtinkarî û zordestiya şaristaniya navendî de neçar man. Li ti devera dinyayê şêweyekî mêtinkarî û zordestiyê bi vî awayî zêde û dewamî bi vî rengî nehatiye dîtin.

## 1- Di Civaka Rojhilata Navîn De Pirsgirêka Jinê

Pirr girîng e ku mirov pirsgirêkên jinê yên di nava civakê de berê pêşî ji aliyê civakî-dîrokî ve lêkole û li ser bisekine. Pirsgirêka jinê pirsgirêkek e ku di çavkaniya tevahiya pirsgirêkan de ye. Em dibînin ku mirovatiyê hê gav neavêtiye civaka dewletdar a çînî li ser jinê hiyerarşiyeke hişk a mêrê serwer (bavikan) bi sazî bûye. Ji bo sedemên pêkhatina serweriya mêr serî li gelek vegotinên dînî û mîtolojîk dane. Destana Xwedawenda Ûrûkê Înannayê vê pêvajoyê nîşan dide. Di vê destanê de mirov ji bo xwezayê, xwedawenda dayik û pîroz a berê hesreteke mezin dibîne. Di nava pergala dewlet û hiyerarşiya bavikan de hatiye asêkirin û ji ber hîlekarî, xasûkî û zordariya mêrê serwer nalenala wê ye. Di Destana Babîl de ev rastî hê zêdetir eşkere û bi tesîr tê ziman. Ango pevçûna Mardûk û Xwedawend Tîamatê. Di mîtolojiya Sumeran de tê gotin jin ji parsûyê mêr hatiye afirandin. Ev îfadeyeke sembolîk e. Dînên yekxwedayî jî vê helwestê dewam dikin. Jina weke xwedawend diket zîggûratên Sumeran weke orûsipiyekê ji perestgehê derdiket. Kerxaneya pêşî li bajarên Sumeran tê vekirin. Payeya jinê ji orûsipîtiya perestgehê ber bi carîyetiya qesrê ve tê bilindkirin. Li bazarên bazirganiyê objeyeke kole ye ku dest jê nabe. Di şaristaniya Greko-Romen de bi tenê koleya suxreyên nava malê ye. Di nava polîtîkayê de cihê wê nîne. Di şaristaniya Ewrûpayê de objeyeke cinsî ye ku bi peymanekê bi mêr ve hatiye girêdan. Di şaristaniya kapîtalîst de orûsipiyeke giştî ya gerdûnî ye. Dîrok bi mêrê serwer re bi temamî bûye xwediyê avahî û maneyeke cinsperest. Dîrok êdî weke mêr dimeşe.

Pîrekkirina jinê (tê maneya kolekirina jinê), piştre di civaka zordestî û mêtinkar de pîrekkirin li ser objeyên mêr jî tê meşandin. Klîka jor a siyasî, eskerî û rahib a civakê dikeve pozîsyona cinsên serwer û beşên jêr ên têne

rêvebirin jî her diçe dibin pîrek. Di civaka Greko-Romen de mêr ji ciwaniyê ve bi helwesteke cinsperest a zêde tê perwerdekirin. Di tevahiya serdemên şaristaniyan de helwestên çeloxwarî yên cinsî weke encama helwestên cinsperest ên ji jinê re, pirr têne dîtin. Êdî jin çiqasî kole be, mêrê kole jî ewqasî jin an jî pîrek e.

Di civaka Rojhilata Navîn de li van pirsgirêkên koka xwe dîrokî wexta pirsgirêkên îro yên çavkaniya xwe amûrên kapîtalîst ên mêtinkarî û zordestiyê jî zêde dibin, ya rastî ji bo jinê jiyaneke kabûswarî bivênevê pêk tê. Dibe ku maneya jinbûnê, mirova herî zêde di zor û zehmetiyê de be. Mêtinkarî û zordestiya çor a li ser civakê, qatbiqat li ser ked û bedena jinê pêk tê. Hê nû hay jê çêdibe ku jin jî mirov e. Helwesta bêrûmet a cinsperest a hişk hatiye wê astê ku şûna xwe ji lêgerîna hewcedariya bi dostek û hevrêyekê re bihêle. Qet nebe êdî guftûgoya vê tê kirin. Divê baş bê zanîn ku di civakê de jiyaneke rast bi jinê re pêk neyê, jiyaneke manedar jî wê çênebe. Em divê zanibin ku jiyana herî xweşik û manedar bi jineke azad a bi temamî bûye xwedî rûmet re pêk tê û bi vê zanînê divê em vegotin û çalakiyên xwe pêşde bibin.

## 2- Pirsgirêkên Qewm, Etnîsîte û Qebîleyan

Di civaka Rojhilata Navîn de ji dîrokê heta roja me ya îro di serê pirsgirêkan de pirsgirêkên timî tên pirsgirêkên qebîle (eşîr), etnîsîte û netewe ne. Şaristaniya dewletdar çendîn pêşketiye, pirsgirêkên bi vî rengî jî hem berfirehbûne hem jî zêde bûne. Berî şaristanî pêş bikeve, mîna jinê qebîle jî têra xwe xwedî jiyaneke azad a xwezayî bû. Exlaqê qebîleyê gelekî serdest bû. Ferd ji bo qebîleya xwe, qebîleyê jî ji bo ferdê xwe dikarîbû her fedekariyê bike. Civatparêzî û ferdparêziyeke rastî hebû. Kengî şaristaniyê dest avêt qebîleyan û xwest wan bike kole, bi vî awayî di dîrokê de pêvajoya berxwedanên mezin û berfireh dest pê kirin. Nakokiya sereke têkiliya qebîleya li dijî koletiyê li ber xwe dide û dewletê ye. Çol û çiya bûne wargehên berxwedanê. Şertê dest jê nabe yê xwe xwedîkirin û zêdebûnê, parastin e. Divê mirov baş zanibe ku piştî kolekirina jinê, rûyê

herî hov ê dîrokê di kole peydekarina qebîleyan de hatiye dîtin. Qebîle dibin eşîr û bi vî awayî berxwedana xwe hê mezin dikin û dixwazin ji vê pirsgirêkê rizgar bibin. Lê hêzên şaristaniyê bi teknolojiya sîleh û rêxistiniya xwe bi pirranî bi ser ketine.

Di serdema navîn de organîzasyonên eşîr û qebîleyan bi rêxistiniyeke heta asta milliyet-qewm hevalbendî kirine. Ber bi netewebûyînê ve gaveke din hatiye avêtin. Li rêxistinî û îdeolojiyên qebîle û eşîran, rêxistinî û îdeolojiya qewman jî zêde bûye. Dînên yek xwedayî yên Çîn, Hind û Rojhilata Navîn bi awayekî bi dînên qewmî radibûn. Şerên dîn û qewman di zikhev de dimeşiyan. Qewmên Grek, Ermenî, Asûrî, Ereb, Fars û Kurdan dînê xwe li gorî berjewendiyên xwe yên qewmî hildibijartin. Hin ji wan dibûn Xirîstiyan, hin ji wan dibûn Misilman. Jixwe dînê Cihûyan hê ji destpêkê ve weke senteza dîn û qewm şikil girtibû. Lê ne qebîle û îdeolojiyên eşîran, ne jî dînên qewman di wê qabîliyetê de nebûn ku pirsigirêkên heyî çareser bikin. Cihûtî ji serî ve pirsgirêk bû. Gelên ji destpêkê ve dest ji pûtperestiyê kişandin, gelên Asûrî, Ermenî û Helen yekîtî, biratî û aştiya di Xirîstiyantiyê de lê digeriyan bi ti awayî nikarîbûn bi temamî di jiyanê de bi cih bînin. Vê rewşê wê rê li ber bûyerên bêtalih vekira ku ji ber xirîstiyaniyê bi sedsalan hatin serê van gelan.

Îslam a li ser hîmê dijberiya pûtperestiyê mezin bû, herçend ji qebîle û eşîrên Ereban re aştî, yekîtî û serdestî anî jî di demeke kin de xwe bi Cihû û Xirîstiyanan re di nava şer de dît. Dînê Îslamê hewl dida ji beşekî pirsgirêkan re çareseriyê bibîne, lê di heman demê de bi xwe re gulokeke pirsgirêkan jî anî. Nexasim qewmên Ermenî, Asûrî û Cihû yên di Anatolyayê de asê bûbûn, hinekî jî bûn qurbanên pêşketina xwe ya pêşwext û li hemberî Ereb, Tirk, Fars û Kurdên Îslamiyet naskirî, diketin pêvajoyeke wê têde gelekî zehmetî bikişandana. Li van pirsgirêkan kengî şerên mezheban ên dawî li wan nedihat jî zêde bûn, êdî her diçû pirsgirêkan wê rê li ber tesfiyeya wan vekirana. Li Nîvgirava Spanyayê tesfiyeya bi serê misilmanan de dihat, di heman demê de û bi heman rêbazan li Anatolyayê bi serê Xirîstiyanan de jî dihat.

## 3- Pirsgirêkên Dîn û Mezheban

Li pirsgirêkên dînî yên di nava qewman de wê pirsgirêkên mezheban jî zêde bibûya. Sozên dînan ên ji bo biratî, hevgirtin û aştiyê didan li hemberî berjewendiyên maddî xwedî bandoreke bi sînor bûn. Çînbûna di nava civakê de pêş dikeve, ji mêj ve heman qewm veguherandibû kulmoza pirsgirêk û pevçûnê. Di nava qebîleyeke piçûk û hişk hevgirtî ya mîna Cihûyan de, hê di dema Mûsa de di nava xizmên wî yên herî nêz de rê li ber pevçûnên dijwar vekiribû. Berberiya di navbera Musa û xwîşk û birayên wî Harûn û Maryamê de balkêş e. Nexasim di şerê wî yê bi xwîşka wî re ji aliyê jinê ve şikestinek pêk tê. Îsa berê pêşî bang li Mûsewiyên xizan dikir. Muawiye hê Muhemmed wefat nekiribû li dijî Ehlê Beytê dest bi şerê xanedanî û serdestbûnê kiribû. Di Îslamê de Xariciyan wê biryara kuştina wan bidaya da ku xelîfetiyê ji du serî û heta sê seriyan ango Elî, Muawiye û Emr Îbn-Ul As rizgar bikin. Kurê Muawiye Yezîd wê li Çola Kerbelayê ewladên neqane yên Ehlê Beytê weke berxikan serjê bikira. Her gelê dibû misilman wê hem di nava xwe de û wê hem jî di navbera xwe de pirsgirêkên nû yên weke lod û gidîşan mezin dibûn, bi xwe re bianiyana. Şaristaniya Îranê ya bi kok wê bi çêkirina mezhebê Şîa hewl bida bersivê bide têkçûna xwe ya li hemberî Misilmanên ereb. Begên ezbetên serdest ên Osmanî û Selçûkiyên tirk wê berjewendiyên xwe di rêûresma serdest a Îslama Sunnîtiyê de bidîtana. Tirkmenên ku beşa xizan bûn, wê bêhtir Şîa û Elewîtî hilbijarta. Kurd jî wê bi awayekî bi heman rengî dabeşbûna. Begên desthilatdar Sunnî bûn û bi siltanên tirk û ereb re hevkarî bingeha têkiliyên wan bû, lê beşên bi rûmet û xizan wê bûbûna Elewî û Zerdeştî.

Sêsed salên pêşî yên Xirîstiyantiyê bi dabeşbûnên mezheban tijî bû. Qewm û çîn neçarbûn berjewendiyên xwe di bin perdeya mezheban de dewam bikin. Her qewmek mezhebekî xwe çêbûbû. Latîn bûbûn Katolîk, Grek û Slav bûbûn Ortodoks, Ermenî bûbûn Gregoryan û Asûrî bûbûn Nastûrî. Bi gelek mezhebên ji hev parçebûyî li rizgariyê digeriyan. Her weha wê bibin dînê împaratoriyê yan na, di vî warî de jî gelek pirsgirêkên ciddî yên parçebûnê çêbûbûn. Cihûtiyê bi awayekî giştî ne bi tenê

Xirîstiyanî û Îslam ji nava xwe derxist; di nava xwe de jî dabeşî qebîleyan bû. Mîna ku dabeşbûna Yahûdiye û Îsraîliye têrê nekiribe weke alîgirên Fars û Grek jî dabeşbûn. Piştre weke Cihûyên Rojava û Rojhilat ango Aşkenaz û Sefarat careke din dabeş bûn. Di serdema şaristaniya kapîtalîst de jî laîsîst û rewşenbîrên sekuler ji nava wê derketin.

Di vê demê de Xirîstiyantî di reformasyoneke mezin re derbas bû. Protestantî çêbû û dêrên neteweyî pêk hatin. Li şaristaniyên Rojhilata Dûr di serî de li Hindistan û Çînê dabeşbûnên bi heman rengî yên dînî û mezhebî belav bûn û bi xwe re pirsgirêkên nû anîn. Em dema bingehê maddî yên tevahiya van pirsgirêkên dîn û mezheban lêbikolin, em ê bi hêsayî bibînin amûrên mêtinkarî û zordestiyê yên belav dibin û zêde dibin bi rola sereke radibin. Yekdestdariyên îdeolojîk û maddî yên ketine zikhevdu, şerên mêtinkarî û zordestiyê li dijî civakê dimeşînin. Hê ji dewleta rahib a Sumer û Misrê ev pirsgirêk hatine çêkirin û bi şer bêtir hatine mezinkirin. Bûda piştî ezmûna xwe ya mezin, wexta got 'Nabe tu agir bi agir vemirînî' rastiyeke mezin dianî ziman. Desthilatdarî dihat maneya şer û şer jî mêtinkarî bû. Ev jî tê wê maneyê ku desthilatdarî bi tenê dikare bi desthilatdariyê re şer bike. Ji ber ku rêyeke din a xwe gihandina kara şîrîn tineye.

Bi vî awayî dîroka şaristaniyê ya ji pênc hezar salî zêdetir ji aliyekî ve dîrokeke rojane pirsgirêkan çêdike, ji aliyê din ve jî çareseriyên xeyalî yên bi navê amûrên çareseriyê diavêjin naverastê, bi tenê pirsgirêkan zêde dikin û belav dikin. Ne mîtolojiya xwedayan a bi heybet a rahibên Sumeran, ne pêxember û dînên yek xwedayî yên ji heman çavkaniyê, ne jî dabeşbûna mezhebên gelek-serî, ji koletiya reh û rîşên xwe kûr çûyî re dibûn çare. Çareseriyên xeyalî venediguherîn çareseriyên maddî. Yekdestdarên mêtinkarî û desthilatdariyê ne bi tenê ketin nava tevahiya qewman, li ser hîmê dewleta netewe çizirîn heta hucreya herî bingehîn a civakê û wexta ev tablo pêk hat, ev jî dihat wê maneyê ku pirsgirêk li tevahiya civakê belav bûne. Li gorî ku ti çaviya civakê ya yekdestdarên mêtinkarî û zordestiya pênc hezar salî pirsgirêkan biçizirîninê nemaye ango cihê lê kara xwe zêde bikin qediyaye, bi rastî wê wextê yan dawiya

wan hatiye yan jî dawiya wan xuya dike. Di vê çarçoveyê de wexta em dibêjin dawiya dîrokê hatiye, belkî jî em ji her demê zêdetir nêzî heqîqetê ne.

## 4- Pirsgirêkên Bajêr û Hawîrdorê

Ji serê şaristaniyê ve di civaka Rojhilata Navîn de pirsgirêkên bajêr û hawîrdorê dest pê kirine. Wexta ku mirov li çîrokên damezrandina bajarên pêşî yên Sumeran temaşe dike, mirov dibîne bajar di nava xwe de û di navbera bajarên din de di rewşeke çawa de pêş dikeve; rewşeke bi pirsgirêkan tijî ye. Çavkaniya van pirsgirêkan koletî ye. Bajarbûn di hinavê xwe de kolebûnê, ango dewletbûnê jî dihewîne. Bi avabûna bazarê re pirsgirêka ekonomiyê jî peyda dibe. Guhertina rêjeyan, ango biryara buhayê alavan wê kê bidaya? Di vê mijarê de wê bi hêsanî lihevhatin nebûya. Parastin û debara bajêr bi serê xwe pirsgirêk bû. Klîkên desthilatdariyê (rahib, rêveber û fermandar) yên pêk dihatin, timî di nava xwe de xwe li hev radikişandin, rê li ber pirsgirêkên şoreş û dij-şoreşê vedikirin. Herweha pirsgirêkên bajaran ên mezinbûnê, hebûn.

Dewlet û rêveberiya bajêr yên ku bi bajêr re bi pêş ketin, di tevahiya serdemên şaristaniyê de her bûn fenomenên dest ji wan nedibûn. Dewleta bajêr şêweyê herî belav û kevin ê desthilatdariyê ye. Împaratorî û dewletên netewe gelekî paşê derketine holê. Di dîrokê de şêweyê bingehîn bajêr ê bi giranî hatiye dîtin, bi pirranî rêveberî û dewleta bi bajêr û bi dewrûbera wê ya nêz bi sînor e. Ji ber ku di nava bajaran de hevrikiyeke zêde heye, ev yek dihêle ku di navbera wan de timî şer biqewime. Di van şeran de derfet û îmkanên bajaran têk diçûn. Çareya hat dîtin jî têgîna bajarê metropol û hegemon bû. Ûrûk, Ûr, Babîl, Asûr, Persepolîs, Atîna û Roma ji vî cureyê bajarên hegemon in. Paşê jî weke navendên împaratoriyan rol girtin.

Em weke împaratorê pêşî yê dîrokê damezrînerê xanedaniya Akadê, Sargon dibînin. Sargon qîma xwe pê neanî, bajarên Sumeran bixe bin hegemonya Agade û ya xwe, li gorî dema xwe ev derbasî tevahiya qadên

şaristaniyê kir. Împaratorî di vê rewşê de tê maneya bajarên hegemon (metropol) li ser bajarên din û dewrûbera wan serdest dibe an jî parê ji mayeya civakî digire. Ji ber ku bazirganî, cotkarî û îndustrî bi derfetên maddî û yên bazarê tê meşandin, gelekî karê tîne. Ango bi rêxistiniyên desthilatdariyê yên tîpa împaratoriyên berfireh têra xwe kar tê bidestxistin. Em vê meylê di împaratoriyên Sargon, Babîl û Asûr de bi hêsanî dişopînin. Nexasim împaratoriya Asûr di bazirganiya maddeyên xam û maddeyên mamûl de bûbû pispor û hoste. Bi awayekî bi hêz xwesteka parastinê ji bo çavkaniyên karê, dihêle ku desthilatdarî xwe ji nîşandana sahneyên herî hov paşve nedin. Asûriyan bi serbilindî vedigotin ka çawa ji serê mirovan dîwar û bircan ava dikin.

Persan di heman îstîqametê de, lê bi rêbazeke hînê exlaqî û nerm dixwestin encamê bigirin. Di vê de jî bi ser ketibûn. Bajarê super ê van deman Babîl bû. Li vî bajarî heftê û du millet pevkeliyabûn û ev bajarê bi heybet hem bi pirsgirêk û hem bi berpirsiyarî bû. Bajarên Persan, Babîl ji xwe re mînak digirtin. Pêngava bajarbûnê ya Greko-Romen tevî ku çareseriyeke li pêş bû, di serî de debar, parastin û rêveberî xwediyê heman pirsgirêkan bû. Li Rojhilata Navîn senteza Helenîk di mîmariya bajêr de qonaxeke li pêş bû. Di vê mijarê de em avakirinên bi heybet dibînin. Lê zehmet nîne ku mirov tespît bike, perestgeheke bajêr bi serê xwe jî li ser civakê rê li ber gelek pirsgirêkan vedike. Di vê çarçoveyê de mirov dikare li piramîdeke firewnên Misrê binêre gelekî balkêş e, û mirovê bibîne piramîdekê bi tenê çawa bêhn li civakê çikandiye û xelas kiriye. Atîna û Roma jî weke bajarên metropol heta bi qirikê noqî nav pirsgirêkên civakî bûbûn.

Di dema Îslamê de bajarên Rojhilata Navîn herçend mezin bûbin jî ji aliyê mîmarî ve ji dema Helenîstîk gelekî paşvemayî bûn. Her ku diçû kesayeta xwe ji dest didan, di nava xwe de û ji bo dewrûberê vediguherîn çavkaniya pirsgirêkan. Ji ber ku nikarîbûn derbasî şoreşa pîşesaziyê bibin, pirsgirêkên wan girantir dibûn.

Pêngava bajêrbûnê ya şaristaniya Ewrûpaya Rojava, li ser hîmê bazar û bazirganiyê ew gihand bajarên aboriyê. Li ser vê pêngavê ji destpêkê ve

mohra kapîtalê hebû. Li hundirê bajêr û li derveyî bajêr her tim hewl dida li ser beşên zenaetkar hegemonya xwe çêke. Vê rewşê bi xwe re têkoşînên dijwar ên çînî anîn. Hevrikiya di nava bajêr de û ya di navbera bajaran de pêşî meylên ber bi împaratorî û qraltiyê sor kir, bi şoreşa pîşesaziyê re jî neçar ma xwe radestî dewleta netewe bike. Bajarên elman û îtaliyan di dîrokê de ji wan bajaran in ku herî dawî xweseriya xwe terikandine û herî dereng xwe radestî dewleta netewe (heta bi sedsala 19.) kirine.

Li gorî min şoreşa pîşesaziyê ne çareserî, destpêka dawî û mirina bajaran bû. Burokrasî û îndustrîvanî bi sedsala 19. re bajêr mîna lod û gidîşan mezin kirine û ev mezinbûna kansêrwarî ya ti maneya xwe nîne, ji bo hawîrdorê bi felaketekê bi encam bûye. Bajar xwe bi tenê nakuje; hawîrdorê ango civaka li derveyî bajêr jî rastiya panzdeh hezar salî ya dîrokê, hêza wê ya hilberîner, çavkaniya çanda maddî û manewî ya li derveyî bajaran bêhnçikandî dike û dikuje. Encam, civak di nava pirsgirêkên mîna gidîş û lodan de digevize, û bajar navend e ku xizanî û bêkariya giştî hildiberîne. Bajarê Rojhilata Navîn ê hegemonya xwe ji dest dayî bêbajarbûn e; ango ev tê wê maneyê, yek ji amûrên herî girîng ê civakîbûnê bajêr dibe navenda misêwa mirin û kuştinê.

Dîroka şaristaniya Rojhilata Navîn dîroka înkar û hilweşandina hawîrdorê ye. Nirxên şaristaniyê weke çanda maddî û manewî ji ber ku bi înkara (di çaçroveya maneya diyalektîkî de neyênîkirin) nirxên civaka neolîtîkê re pêk tên dîrok bi vî awayî dimeşe. Jixwe civaka neolîtîk ji bo nirxên herdu çandan jî ekolojîk e. Di cîhana wê ya manewî de û di dînê wê de hawîrdor zindî ye û weke nirxê herî bilind tê pîrozkirin. Derfetên xwedîkirinê yên li dora jinê pêş dikevin destpêka ekonomiyê ne. Xweza û jin di nava aheng û hemahengiyeke lihevkirî de ne. Têgihiştineke dînê xwezayî yê zindî bi dayika xwedawend tê sembolîzekirin. Beşekî mezin a amûrên maddî yên hilberandinê, vedîtinên jinê ne. Li ser çanda xwedîkirin û cilûbergan jî mohra jinê heye. Bi şaristaniyê re ev nirx hemû wê bêne înkarkirin û di bin hegemonya zilam de veguherin amûrên zordestî û karê. Erdên dayik in, wê piçûk û haqîr bêne dîtin. Pirtûkên Pîroz wê weha bang li zilam bikin: ‘Jin zeviyê we ne, hûn çawa dixwazin wisa biajon.’ Ji vê jî

xirabtir, ji ber ku bajarên Sumeran bi armanca kar û qezencê timî erd bi kar dianîn, axa zeviyan diriziya û vê yekê rê li ber çolbûnê vedikir û ev yek bi çolbûna lihevçêkirî re mezintir kirine. Di çolbûna Mezopotamyayê de rola şaristaniyê gelekî balkêş e.

Ji awirê şaristaniyê ve xweza, hawîrdor û ax timî piçûk-heqîr têne dîtin. Ya rastî ev helwest îdeolojîk e. Şaristanî weke dijberê civaka gund û cotkariyê pêş dikeve û ji bo vê civakê piçûk bixîne û bi hêsanî bi rê ve bibe, serî li rêbazeke bi vî rengî dide. Şaristaniyê ji aliyê îdeolojîk ve îmajeke welê ya Dinyayê afirandiye, mîna ku dijmin e, û divê timî hesab bide. Dîsa Pirtûkên Pîroz weha dibêjin 'Ew der bi tenê cihê we yê îmtîhanê ye.' Li aliyê din, dewletdaran li vê dinyayê cenneta xwe afirandiye û ji dînên îcat kirine jî hîç bawer nekirine. Lewma wan baş dizanîbû ku wan dîn afirandiye. Li aliyê din, pêşketina civakî ya bi atmosfera jeobiyolojîk re di zikhev de dibe, dîroka şaristaniyê her pêşde diçe (ya rastî diviyabû timî paşde diçû bihata nivîsîn), neçar tê hiştin vî cewherê xwe yê îdeolojîk înkar bike, bi xeyal û îmajên mucered û dinya din vediguhere berevajiyê xwe.

Cewherê pirsgirêka ekolojiyê di vê rastiyê de ye. Ango em bi tevahî xeternakiya wê fêhm dikin ku tam pirsgirêkeke civakî ye. Civakeke welê neçar hatibe hiştin ku cewherê xwe înkar bike, mumkîn nîne ku mirov karibe ji bo demeke dirêj wê li ser piyan bigire. Mentiqê karê yê desthilatdariyên mêtinkarî û desthilatdariyê û şerên eskerî û îdeolojîk ên ji bo pêşxistina wê antî-ekolojîk, antî-biyolojîk û antî-civakî ne. Di roja me ya îro de, pêxîrtengiya di serdema fînansê ya hegemonya kapîtalîst de, van rastiyan hemûyan mîna li çav û zêhnê tevahiya mirovatiyê niqirandibin; bi awayekî zelal nîşanî herkesî dide ku êdî ev dinya sexte ya vê hegemonya afirandiye, ji tomarên kaxizan bi tenê pêk tê. Mirovatî di ti dema dîroka xwe de ev çend ji xweza, jiyan û civakê re xerîb neketiye. Civaka Rojhilata Navîn demeke dirêj barên talanker û qehar ên şaristaniya navendî hilgirtine û ji ber jeobiyolojiya xwe hem ji ber sedemên xwezayî û hem jî ji ber sedemên çêkirî, di serê wan herêmên nêzî çolbûnê de tê, lê civaka Rojhilata Navîn bi tenê ji ber van sedeman xwedî pirsgirêk nîne; bi qasî ku

çareseriyê di întîharê de bibîne ji jiyanê dest dikişîne. Ya rastî pê dest didin kişandin.

## 5- Pirsgirêka çîn, hiyerarşî, malbat, desthilatdarî û dewletê

Civaka Rojhilata Navîn di dîrokê de civaka herî zû pirsgirêkên çîn, hiyerarşî û desthilatdariyê naskirî ye. Em dizanin, berî desthilatdariyê pergala hiyerarşiya pêşî li ser ciwan û jinan hatiye sazkirin. Hevgirtina ji zilamê xasûk û zordar + rahib û şaman + pîremêrên bi tecrûbe pêk hatî, ji tevahiya hiyerarşiyan, desthilatdarî û dewleta piştre pêş bikeve, prototîpek e. Malzarok û serçaviya tevahiya pirsgirêkên civakî ye. Li Mezopotamya Jêr berî hegemonya bajarê Ûrûkê em şahidiyê li dema Hiyerarşîk a El Ubeyd (5000-3500 B.Z.) dikin. Hiyerarşiyeke li tevahiya Mezopotamyayê belavbûyî heye. Pergalek e ku li dora malbat û xaniyekî mezin xwe hûnandiye. Destpêka pergala xanedaniyê ye. Li derveyî jin, ciwan û tebeqeya jor a hiyerarşîk ên din bi awayekî sîstemîk têne kolekirin, ango pratîk û awayê dinyayeke welê tê çêkirin ku cara pêşî lê hîmê pirsgirêka civakî tê danîn. Wekî din jî rastiyeke din heye ku Mezopotamya pêşengê vê sîstema global e. Koka îdeolojiya malbat û xanedaniyê ye. Li Rojhilata Navîn ev herdu sazî hê jî gelekî bi hêz in, û ev yek ji nêz ve bi vê rastiya dîrokî re têkildar e. Ev saziyên herî kevin ên civakê yên bi pêşengiya mêr tevahiya dîrokê timî bi pêş ketine. Xanedanî vediguhere nêrega bingehîn a desthilatdariyê û şêweyê dewletê, malbat jî bi temamî vediguhere şaneya bingehîn a fermî ya civakan. Di tevahiya dîrokê de ji bo damezrandin û hilweşandina xanedan û malbatan şerên desthilatdariyê yên hatine kirin hed û hesabê wan tineye. Bi van şeran ne ku civakan bi tenê vedugerînin çavkaniya pirsgirêkan, di heman demê de bêhnê li wan diçikînin.

Divê pergala xanedaniyê weke îdeolojî û avahîsaziyeke ketiye zikhevdu, yekpare bê fêhmkirin. Tevî ku ji nava pergala qebîletiyê derketiye jî înkara

wê ye, û xwe weke kakilê malbata rêveber a tebeqeya jor pêk tîne. Hiyerarşiyeke wê ya gelekî hişk heye. Çîna serdest a li pêş e. Prototîpa desthilatdarî û dewletê ye. Xwe disipêre mêr û kuran. Di xanedaniyê de pirrbûna mêran ji bo desthilatdariyê gelekî girîng e. Vê xusûsê rê li ber zewaca bi pirr jinan, jiyana hareman û sîstema cariyan vekiriye. Ji lewra hinek mêr bi dehan jinan re zewicîne û bi sedan zarokên wan çêbûne û ev yek bi îdeolojiya xanedaniyê re têkildar e. Desthilatdarî û dewlet berê pêşî ji nava xanedaniyê tê derxistin. Ya girîngtir jî ew e, xanedan ew sazî ye ku di serî de qebîle û eşîra xwe, pergalên din ên qebîleyan hînî koletî û çînîbûna pêşî dike. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de hema bêje mumkîn nîne ku mirov desthilatdarî û dewleta bê xanedanî bibîne. Ev rewşa wê ji ber bi kokbûna rastiya wê ye, û ji ber pozîsyona wê ye ya ku ji desthilatdarî-dewletê re dibe dibistana amadekariyê.

Xanedantî vediguhere îdeolojiya fermî, û ev yek mohra xwe li avahiya malbatê dixe, bi vî awayî jî weke îdeolojiya jêr rê li ber 'malbatgiriyê' vedike. Malbat ji hev cuda ne. Di tevahiya dîrokê û beriya wê de şêweyên gelekî cuda yên bihevrebûna mêr-jinan hebûn. Nexasim tîpa malbatê ya klan a bi giranî têde jin xwedî gotin, gelekî belav bû. Di vê tîpa malbatê de mêr-zilam wer nayê naskirin. Xal û xwarzê bêtir girîng in. Tîpeke din a didutiya jin-mêr tîpa di weznekê de ye. Ev tîp jî berevajî yeqînan di dîrokê de gelekî hebû. Sîstema bi reîstiya mêr a malbatê, gelekî paşê weke xanedanî-desthilatdarî-dewletê tê resimkirin û pêşdebirin. Hedefa bingehîn jî ew e, jin û zarokên xwe ji bo berjewendiyên tebeqeyên jor xanedan, desthilatdarî û dewletê bigihînin û kesayetên peyk, girêdayî û hewcedar bi afirînin. Tevî ku hîç hewce nake û rê li ber pirsgirêkên giran ên civakî vedike, zewaca bi gelek jinan re û çêkirina zahf zarokan têkiliya xwe bi berjewendiyên desthilatdarî û dewletê re heye. Her sermiyanê malbatê jî dilê xwe dibijîne xanedan û ji lewra jî weke wî gelek jinan tîne û dibe xwediyê zahf zarokan û vê yekê weke misogerkirina jiyanê û bi hêzbûnê dibîne. Zêhniyeta serdestî civakê misêwa vî aliyê mijarê teşwîq dike. Lê ya rastî, bi vî awayî ji çareseriyê wêdetir li tevahiya pirsgirêkên civakî derî tê vekirin. Eger mirov zanibe ev rewş ji ber îdeolojiya fermî ye,

û ji aliyê dînî ve jî destekê didinê û dixwazin bi hev temam bikin, ev yek ji bo serwextbûna li pirsgirêkên civakî gelekî girîng e. Çanda malbatgirî û xanedantiyê ku li Rojhilata Navîn a roja me ya îro hê gelekî bi hêz e, ji ber şêniyên zêde yê rê li ber vekiriye, desthilatdarî û sedema hêrsa parxwestina ji dewletê, çavkaniya sereke ya pirsgirêkan e. Piçûkxistina jinê, newekheviya wê, bêperwerde hiştina zarokan, pevçûnên nava malbatê, pirsgirêkên namûsê timî bi malbatgiriyê re têkildar in. Mîna ku makêteke piçûk a pirsgirêkên nava desthilatdarî û dewletê di nava malbatê de hatibe sazkirin. Ji bo jihevderxistina desthilatdarî-dewlet-çîn û civakê jihevderxistina malbatê şert e.

Eger navend desthilatdarî hatibin sazkirin, mirov fêhm dike ka çima malbat û xanedan ji bo pratîk û îdeolojiya desthilatdarî û dewletdariyê mijarên nedîtî ne. Sedema timî hebûn û peydabûna pirsgirêkên dewlet û desthilatdariyê li Rojhilata Navîn ew e ku civaka ew li ser bilind dibin, bi malbatgirî û xanedanparêziyê hatiye rapêçan. Ev pirsgirêkên welê ne ku hevdu xwedî dikin. Di vê mijarê de gelekî girîng e ku mirov aliyê îdeolojîk ê pirsgirêkan fêhm bike. Lê zêhniyeta civaka Rojhilata Navîn ji fêhmkirinê hê gelekî dûr e, û nizane ku hêza dewlet û desthilatdariyê ya weke amûrê çareseriya pirsgirêkan têne fikirîn, encamên berevajî didin; civakê bêhêz dikin, ji afirandinê qut dikin û jiyaneke tijî koletî ferz dikin. Ji lewra em guloka van têkiliyan weke çavkaniya sereke ya pirsgirêkan şîrove dikin û ev yek gelekî girîng e. Ji ber ku ez gelekî zû li vê rewşê hayil bûm, min eleqeyeke mezin nîşanî îdeolojiyên demokratîk û rêxistinkirinan, guftûgo û çalakiyan da. Jiyan herroja diçe zêdetir min hîn dike ku rêya çareserkirina pirsgirêkên civakî di vir re derbas dibe.

Dîsa berevajî yeqînan, dewlet û desthilatdarî ji çînayetiyê peyda nabin. Berevajî dewlet û desthilatdariyên li ser xanedanî û malbatgiriyê (saziyên hiyerarşîk) avabûyî rê li çînîbûnê vedikin. Pratîk û îdeolojiya dewletgir û hiyerarşîk li pêş in. Mumkîn e ku mirov tespît bike ev pêvajo di dîroka şaristaniya Rojhilata Navîn de gelekî meşiyaye. Meylên çînîbûnê ne ku ji jêr ber bi jor zêdetir meylên ji jor ber bi jêr ve xurt in. Ji vê jî girîngtir, ji têkiliyeke çînî û dewletê ya li derveyî wan zêdetir weke îdeolojîk û pratîk

fenomeneke çîn-desthilatdarî û dewletê ya ketiye zikhevdu tê dîtin. Ev pêvajo têra xwe sergirtî û nuxumandî dimeşe. Lê wer kirine ku ji ber formên îdeolojîk ên qebîleyî, malbatî, xanedanî û dewletî ku hema çîn neyê dîtin. Bi vî awayî hewl didin pêşî li serwextbûna çînî bigirin. Wexta ku mirov analîzên çînî dike, girîng e ku mirov analîzên berçav bike. Di dîrokê de çawa çêbûye divê mirov wilo nêzîk bibe. Li Rojhilata Navîn wexta ku civak bi çîn dibe, bi malbata fermî, xanedanî, desthilatdarî û dewletdariyê re di zikhev de pêk tê. Koletî bi tenê li ser keda maddî çênabe. Berê pêşî li ser zêhniyet, his û bedenan tê avakirin. Koletiya îdeolojîk heta pêk neyê, koletiya kedê ya maddî pêk nayê. Ji bo mirov pirsgirêkên çavkaniya wan xisletên çînî ne û gelekî zêde hene, bibîne, divê mirov helwestên bi vî rengî yên temamker nîşan bide ku wê bêtir hînker bin.

Eger mirov avahiyên dewlet û desthilatdariyê yên li ser civaka Rojhilata Navîn weke ranta siyasî (afirandina hêzê ya karê) bibîne, ev yek wê zêdetir me nêzî rastiyê bike. Danehevên civakî ji têkiliya efendî-kole wêdetir weke desteserkirina nêregên dewlet û desthilatdariyê pêk tê. Desthilatdarî diyardeyek e, ji dewletê zêdetir heye. Dema dewlet tinebe jî desthilatdarî dikare pirr hebe. Ango mirov dikare kulmozbûna desthilatdariyê bi awayekî weke yekdestdarên kapîtal (sermaye) binirxîne. Eger kar nebe, ti maneya desthilatdarbûnê tineye. Hedefa bingehîn a pêkhatina desthilatdariyan kar e. Eger mirov desthilatdariyê weke saziyeke ji karê cuda bibîne, ev yek ji rê derketine. Yek ji mijarên girîng ên ku civaknasiya Rojava ji rohnîkirina wê reviyaye, ev e. Yekdestdarî bi tenê bi sîstema kapîtalîst û weke sermaye nayên avakirin. Di dîrokê de bi giranî yekdestdariyên desthilatdariyê weke komên wê têne avakirin. Mumkîn nîne ku mirov desthilatdariya bêkar bifikire. Ev tespît ji bo şaristaniya Ewrûpayê jî wisa ye, û kengî em yekdestdarên desthilatdariyê zêdetir rafîne û weke amûrên karê yên klasîk bifikirin, em ê karibin dîrokê baştir şîrove bikin.

Dewlet diyardeyek e, ji desthilatdariyê cuda ye. Ew jî xwe disipêre desthilatdariyê, lê weke şêweyekî cuda xwe pêk tîne. Serê pêşî gelek kulmozên desthilatdariyê dibin yek û li ser îhtîmala wê gelek karê bikin,

dewletbûnê weke xwestekeke dijwar dikin armanca xwe. Dewlet her tim weke rêxistineke karê ya hevpar a ji kulmozên cihê yên desthilatdariyê ava dibe. Ango di nava xwe de ji ber parvekirina karê timî xwe li hev radikişînin, pev diçin û heta heta di nava xwe de şer dikin. Herweha ji ber ku xwediyê rêûresmeke hatiye rewakirin û gelekî zelal in, tevahiya yekdestdarên karê weke îfadeyeke berjewendiyên xwe yên giştî her tim dibin alîgirên dewletê. Lê eger rewşeke bi giranî zirarê bide berjewendiyên dewletê derkeve holê, hingî parçekirina dewleta heyî, lêgerîna li desthilatdarî û avakirina dewleteke nû dikeve rojevê. Şaristaniya Rojhilata Navîn tevahiya dîroka xwe di vî warî de xwedî ezmûn û tecrûbeyên bêhejmar e.

Analîzên desthilatdarî û dewletê di pêvajoya şaristaniya navendî de ya ku ji pênc hezar salan dibihure, bêne kirin, hingê ev analîz wê bêhtir bi rastî bêne kirin. Dîroka pêncsed salî ya şaristaniya Ewûpayê ji bo analîzên desthilatdarî û dewletê zeman û mekanekî kêm in. Ji ber vê, analîzên der barê desthilatdarî û dewletê de bi hosteyî nayên kirin. Marksîzm di vê dabaşê de bi temamî mînakeke cehaletê nîşan dide, helwestên lîberalîzm jî mîna ava bin kayê ne, hûrûkûr mirovan ji rê derdixîne. Hêzên muhafezekar bi rastiyê baştir dizanin, lê îfadekirina wê ji bo berjewendiyên xwe li cih nabînin. Zimanê îdeolojîk-mîtolojîk tercîh dikin û bi vî awayî vegotina mirovan ji rê derdixe kûrtir dikin. Di civakê de eger herî zêde pirsgirêkên desthilatdarî û dewletê li derveyî rastiyê dimînin, ev yek bi rêjeya karê ya di cewherê wan de têkildar e. Wexta ku têgînên xweda û dîn ên tevahiya dîroka şaristaniyê hatin pêşdebirin bi awayekî rast ê sosyolojîk hatin şîrovekirin wê bê dîtin ku şemayeke dewletê ne. Ji aliyê îdeolojîk ve bilindkirin û mezinkirina pratîka qral-xwedê ye. Mirov dewleta netewe ya roja me ya îro weke xwedayê daketiye ser rûyê erdê şîrove bike, yan jî bi îfadeya laîk weke heman rêxistina ji xwedê hatiye kirin binirxîne, di cewherê xwe de heman tişt e. Di vê mijarê de Hegel dîrokê ji Marks zêdetir hûrûkûr dixwîne.

Li Rojhilata Navîn pirsgirêkên civakê ji her demê zêdetir di roja me ya îro de bi awayekî berfireh û zêde pirsgirêkên malbat, xanedan, çîn, desthilatdarî û dewletê ne.

## 6- Di Civaka Rojhilata Navîn De Pirsgirêka Exlaq, Polîtîka û Demokrasiyê

Eger mirov pêvajoya şaristaniya navendî ya ji pênc hezar salan zêdetir li ser hîmê têgînên exlaq, polîtîka û demokrasiyê analîz bike, wê gelekî bi kêr bê û mirov ê karibe pirr jê hîn bibe. Di beşê berê de min anîbû ziman ku xwezaya civakî weke diyardeyên exlaqî û polîtîk pêş dikeve. Bi kurtî be jî ez neçar im dubare bikim ku exlaq û polîtîka nebin, civak nabe. Eger bibe jî ji lod û gidîşeke bêserûber (amorf) zêdetir tiştekî îfade nake. Eger civakên welê hebin jî bi tenê ji bo civakên din dikarin bibin objeyên alav û eşya yên bikaranînê.

Mirov dikare exlaq weke tevahiya helwestên di dema avabûna civaka pêşî de hatine nîşandan, bi nav bike. Ev jî tevahiya tevdîr, çalakî û karên civaka destpêkê ne ku ji bo parastin, debar û zêdebûnê kirine. Ev tevahiyên me destnîşankirî çendîn dibin rêûresm û kevneşopî, ewçend exlaq têne hesibandin. Li gorî ku civak bê parastin, bê debar û bê xwezêdekirinê nikare dewam bike, ji ber vê jî ez dibêjim civaka bê exlaq nabe. Têgîna polîtîkayê tevî ku têgîneke hinekî cihêreng e jî ji nêz ve bi exlaq re têkildar e. Cudahiya xwe ji exlaq ew e ku çalakiyeke rojane ye. Exlaq weke qalibên strandart kar pê dibe û bi rola xwe radibe, polîtîka ji bo pirsgirêkên rojane derdikevin pêşiya civakê biryaran dide, ji tevahiya van biryaran re polîtîka tê gotin. Tevahiya van biryaran çiqasî bibin rêûresm û kevneşopî, ewçend jî bi rêûresmên exlaqî re dibin yek û bi xwe dibin rêzik û pîvanên exlaqî. Ango herdu hevdu xwedî dikin. Exlaq weke rêûresm, çarçoveyekê dide polîtîkayê, polîtîka jî bi biryarên nû yên kar pê tê kirin, vê çarçoveyê misêwa fireh û kûr dike. Ji lewra mumkîn nabe ku mirov herdu têgîn û diyardeyan bi temamî ji hevdu cihê bike.

Demokrasî weke têgîn û diyardeya sêyemîn a girîng divê li du têgîn û diyardeyên pêşiyê bêne zêdekirin. Di vê çarçoveyê de mirov nikare li civakeke bê demokrasî jî bifikire. Eger mirov civakeke wisa bifikire jî ew objeyeke malzemeyê civakî ye, nikare xwe îfade bike. Nikare nebe weke amûrên giştî yên bikaranînê yên civakên din. Di vê rewşê de kêrhatina demokrasiyê ew e ku wexta polîtîka tê kirin û biryar têne dayîn, weke tevahiya hêza rêxistinî û îfadeya civakê ya têkildar tevlîbûna nav pêvajoyê îfade dike. Di vê çarçoveyê de polîtîka di cewherê xwe de demokratîk e. Polîtîka rastî, polîtîka demokratîk e. Polîtîka ne demokratîk, biryarên yekalî yên îdare yên hêzên desthilatdariya hiyerarşîk û dewletê ne ku gelekî paşê pêşketin. Ji 'biryarên îdare' yên van hêzan re polîtîka nayê gotin, mirov dikare wan weke rêzikên îdare bi nav bike.

Polîtîka rastî ji sedî sed a bi tevlîbûn û guftûgoya demos (tevahiya saziyên civaka netewe hemû weke qebîle, malbat, eşîr û qewm) tê pêkanîn e. Polîtîka diyardeyeke welê nîne ku bê gel, civak û tevlîbûnê pêk bê. Ango polîtîka neçare demokratîk be, ji lewra jî divê exlaqî be. Civaka demokratîk nebe nikare polîtîk, ya polîtîk jî nebe nikare exlaqî be. Ev hersê îfadeyên têgînî û diyardeyî bivênevê hebûna hevdu yek ji bo ya din hewce û ferz dikin.

Şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn bi van sê îfadeyên bingehîn ên têgînî û diyardeyî yên civakê di nava nakokî û dijberiyê de pêş ketiye. Di navbera wan de têkiliyeke bingehîn a diyalektîkî heye. Civaka şaristaniyê (bajar-çîn-desthilatdarî) çiqasî pêş bikeve, exlaq, polîtîka û demokrasî jî ewçend paşve dikevin. Di heman demê de ewçend jî di navbera wan de tengezarî û têkoşînek heye. Di destanên Sumer de nexasim jî bi vegotinên der barê jin, cotkar û şivan de mirov dikare vê pêvajoyê bişopîne. Ev yek rastiya tengezarî û têkoşînê tîne ziman. Em paşê di metnên dînî û destanan de dengê van sê stûnên civakê zêde nabihîsin. Ev jî nîşan dide ku di têkoşînê de têkçûne. Li hemberî vê, destanên qebîle û eşîran hê jî zindî ne, û gihiştine heta roja me ya îro. Ev jî nîşan dide ku wan rêûresma exlaq, polîtîka û demokrasiyê bi tevahî ji dest nedaye. Dînên yek xwedayî weke muceredkirineke di asta hê jor de gelekî behsa Firewn û Nemrûd dikin.

Dîsa ev jî nîşan dide ku herî kêm di dema destpêkê de xwediyê gavên exlaqî, polîtîk û demokratîk in. Vegotinên exlaq, polîtîka û demokrasiyê yên xwe disipêrin şaristaniya Ewrûpayê, gelekî kêm, bêbingeh û bûrjûwazîwarî ne. Bi awirê çîneke egoîst mîna bûrjûwaziyê temaşekirina li pêşketina dîrokî ya îfadeyên têgînî û diyardeyî yên exlaq, polîtîka û demokrasiyê ango di nava tevahiyê de serwextbûna li rastiya wan, mumkîn xuya nake. Divê mirov zanista Rojava ya di vî warî de têra wê rexne bike.

Tevahiya civakbûnên li derveyî sîstema şaristaniya navendî dimînin, bi rengekî kategorîk ji aliyê diyardeya exlaq, polîtîka û demokrasiyê ve bi hêztir in. Di vê çarçoveyê de mirov tevahiya komên bêkar û nîvkoçer ên tîpa mezheb, eşîr û qebîleyan ku li ber xwe dane, xwe vekişandina çol û çiyan, dîsa komên cotkar û şivanan weke hêzên hê nêzî têkoşerî, azadîxwazî û wekhevîxwaziyê bibîne, rasttir e. Hêmanên bi kûrahî hatine kolekirin di rêza duyemîn de û bi awayekî berçav mirov dikare di vê projeyê de binirxîne. Ji bo azadiyê, ji bo wekheviyê, ango ji bo pirsgirêkên exlaq, polîtîka û demokrasiyê ya girîng koletiya objektîv nîne; çiqasî teslîm nebûye, çiqasî li ber xwe dide, çiqasî koçer e, çiqasî ji bo baweriyên xwe şer dike, çiqasî bersiva van pirsan dide, ya girîng e.

Di civakên Rojhilata Navîn de bêguman pirsgirêkên ciddî yên exlaqî, polîtîk û demokratîk hene. Li gorî pêvajoya şaristaniyê ev pirsgirêk gelekî berfireh in jî. Lê girîng e ku mirov zanibe huqûq, polîtîka û demokrasiya şaristaniya Ewrûpayê bi zêdeyî bûrjûwazî ye, diyardeya exlaq, polîtîka û demokrasiya civak-dîroka gerdûnî temsîl nake, nîşan nade. Ya bûrjûwaziyê demokrasî nîne, îdareya dewletê ye. Eger mirov, yên li ser navê demokrasiyê têne kirin, bi giştî yek nehesibîne jî bi giranî bi rola veşartina îdareya dewletê ango bi rola 'pelê mêwê yê ewretan dinuxumîne' radibin binirxîne, nêzîkatiyeke rasttir e. Heman pîvan ji bo mafê mirovan jî bi heman rengî ne. Nemaze rastiyeke berçav e ku huqûq bi tevahî şûna exlaq girtiye. Huqûq lodeke peymanan a der barê dewlet û desthilatdariyê de ye, û ti carî nikare şûna exlaqê zindî bigire. Divê mirov baş fêhm bike ku ji îdareya dewletê, xebatên ji bo karên derve û hundir ên dewletê, biryar û

kirinên wê re polîtîka nayê gotin. Belkî mirov karibe bibêje polîtîkaya dewletê, lê polîtîkaya civakê nayê gotin. Yên li ser navê demokrasiyê têne kirin gelekî li derveyî civakê ne, û ji dikên temsîlê wêdetir zêde fonksiyona xwe nînin.

Li ser hîmê vê rexneya kurt, mirov bi hêsanî dikare bibêje; civaka Rojhilata Navîn xwediyê potansiyeleke bi hêz a exlaq, polîtîka û demokrasiyê ye. Hebûna pirsgirêkên ciddî yên exlaqî, polîtîk û demokratîk hêza potansiyela wê nîşan dide. Hê jî bi hêzbûna meylên dewlet û desthilatdariyê, li rûyê wê yê din pirsgirêkên bi hêz yên exlaqî, polîtîk û demokratîk, hewcedarî û heta hebûnê tîne hişê mirovî. Li gorî nakokiya diyalektîk a di navbera wan de mirov dikare bi vî awayî rastiyê îfade bike.

## 7- Di Civaka Rojhilata Navîn De Pirsgirêkên Ekonomîk û Îdeolojîk

Di çarçoveya pirsgirêkan de ya rastî, bi tevahiya vegotinan me hewl da em aliyên îdeolojîk û ekonomîk jî nîşan bidin. Di çarçoveyeke teng de ji bo em pirsgirêkên di vî alî de weke hêmanên maddî û manewî zêdetir bidin xuyakirin, min li cih dît ku em şemaya xwe dewam bikin. Ez ê sernavên girîng deynim.

Polîtîka ekonomiya Rojava kehanet û berevajîkirinên xwe yên zanistî der barê şaxên din ên civakê de pêşde biriye, pêşî bi wan dadikeve û li ser wan disekine. Hewcedariya wê bi vê heye. Heddekî wan ê karê û daneheveke wan a sermayê ya hê pêşketî, lê cuda heye. Zanista ekonomî-polîtîkê ji eşkerekirina vê rastiyê zêdetir ji sergertina wê re navgîntiyê dike. Mirov dikare vê yekê weke vegotina mîtolojîk a versiyona hemdem binirxîne.

Pirsgirêka ekonomîk bi awayekî bingehîn kengî jin ji nava ekonomiyê tê derxistin, dest pê dike. Ekonomî bi xwe jî her tişta dibe mijara xwedîkirin û debarê, digire nava xwe. Li gorî polîtîka ekonomiyê jî (Kapîtala K.Marks jî di navê de) li piyaseyan di çarçoveya hilberînê de kar, faîz, rant û

heqdestên têne bi destxistin bingehê mijara ekonomiyê pêk tînin. Ne zanistî, lê belê disîplînek heye ku bi temamî li gorî jiyana bûrjûwaziyê ya li ser karê hatiye avakirin e. Jiyana aborî ya ku nîzama wê li ser hîmê karê tê danîn, pirsgirêka herî binî ya civakê ye. Li gorî karê sererastkirina jiyana mirovan, tê maneya desthilatdariya herî hovane. Têgîna biyo-desthilatdariyê hinekî jî vê rastiyê îfade dike. Tevahiya dîrokê, ji bilî pêdiviyên mirovan, civakan hemûyan bi guman li danehevên weke mal û pere yên ji bo dewlemendbûnê nêrîne, çawa ku keysa xwe lê anîne ev danehev li hewcedaran belav kirine. Bê sedem nîne ku wexta danehev ne ji bo felaketan, lê ji bo dewlemendbûna çend kes û koman pêk hatiye, ev yek bi bêexlaqiyê hukim lê hatiye kirin. Mirov nirxekî pîroz ê mîna jiyana mirov bi sermayedaran bide îpotekkirin, bêexlaqiyeke mezin hatiye hesibandin. Diyardeya ku modernîteya Kapîtalîst a Rojava bi hezar huqûq û amûrên hêzê dixwaze rewa bike, ev e. Levîathan ê di Pirtûka Pîroz de navê wî derbas dibe, di cewherê xwe de îşaret bi vê diyardeyê dike. Li dijî civakê cinawirekî sembolîze dike. Ya ku ekonomî nîne û berevajî, koma diyardeyên ruhê ekonomiyê distîne, di bin navê polîtîka ekonomiyê de weke zanist tê pêşkêşkirin. Di rasyonalîzekirina ekonomî-polîtîka ingilîz de hewldana Marks a ne kêm bû, ne ekonomiyê, belê antî-ekonomiyê îfade dike. Ew ji vê re ekonomî bêje, ne di civaka sosyalîst de, di kîjan civakê de dibe bila bibe, nabe etîk were qebûlkirin. Kengî xwestiye Hegel rake, li ser piyan bisekinîne, ew bi xwe serberjêr çûye yan jî ketiye. Bi kurtî, operasyonên karê û danehevên sermayê yên bi piyaseyan hatine meşandin di dîrokê de bi awayekî hemtayê wan nedîtî, bingehê pirsgirêkên ekonomiyê ne.

Pêwîst e, ez vê xusûsê careke din diyar bikim ku heta ji pêdiviyên mirovan ên debar, kinc lixwekirin, çûnûhatin û cîhwarbûnê re xizmetê bike, dijbertiya piyaseyê û ew weke amûrekî fetîşîzma metayê nirxandin, helwesteke hevgirtî û maqûl nîne. Di vê çarçoveyê de piyase pêdiviyek e, û amûrekî baş ê ekonomiyê ye. Ya dijbertiya wê tê kirin, ev nîne. Bi rêya piyaseyan bi buhayên alavan tê lîstin, ji aliyê din ve jî bi sedema mesafeyên dûr, sîstema kareke zêde ango kapîtalîzm pêk tê. Di vir de dijbertiya

kapîtalîzmê tê kirin. Dijbertiya kapîtalîst a vê sîstemê, bêguman dihêle ku mirov li dijî her tiştê vê sîstemê li ser piyan digire, derkeve. Rastiya piyaseyê li derveyî vê çarçoveyê ye. Bîleqis, yekdestdarên sermayê timî bi buhayên alavan dilîzin û bi vî awayî derfet û îmkanên karê zindî dihêlin, bi vê jî li piyaseyan pêkhatina pevguhertineke adil û têkûz asteng dikin. Ango kapîtalîzm ne bi tenê antî-ekonomî ye, antî-bazare jî. Eger wisa nebûya, ma mumkin bû ku jiyana civakî misêwa bi lîstikên fînans û tengezariyê were serûbinhevkirin? Di serî de zêdebûna şêniyan a sînorê xwe derbaskirî, bêkarî, xizankirin û talankirina hawîrdorê, pirsgirêkên gefan li mirovatiyê dixwin û jê re tehlûke ne, tevî evqas zanist û teknîkê, ma wê evçend mezin bibûna?

Rolgirtina jinê di navenda ekonomiyê de xusûsek e ku tê fêhmkirin. Ji ber ku zarokan tîne û wan xwedî dike. Ma jin ji ekonomiyê fêhm neke, kî wê fêhm bike! Bi giştî di dîroka şaristaniyê de, bi taybetî jî di modernîteya kapîtalîst de wexta jin li derve hat hiştin, ekonomiya ku zilamên tirtire li ser herî zêde lîstin, veguherî guloka pirsgirêkan. Ev lîstika ti têkiliya xwe ya organîk bi ekonomiyê re nîne, bi tenê bi hêrsa hêzê û kara zêde radibe, di serî de jin dixwaze tevahiya hêzên ekonomîk bike bin destê xwe. Di encama vê lîstikê de her cure hiyerarşî, desthilatdarî û hêzên dewletê weke ûr û girêkekê li ser civakê mezin dibin û ev yek jî dihêle ku ev lîstik bigihîje qonaxekê dewam neke û neyê lîstin.

Piştî jinan di serî de cotkar, ji yên bi ekonomiya rastî re têkildar şivan, zenaetkar û bazirganên piçûk jî ji aliyê amûrên yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê ve gav bi gav ji ekonomiyê hatin dûrxistin û bi temamî atmosfereke xenîmetê hat afirandin. Em bi mijarekê re rûbirû ne ku divê herî zêde bê rohnîkirin. Pêvajoyên şaristaniyê yên ku bi awayekî talana qadên jiyana ekonomîk û objeyên wê ne, çawa bû ku hatin rewakirin û heta roja me ya îro anîn? Hêzên ekonomî tesfiye kirin, çawa çêbû ku weke hêmanên bingehîn ên ekonomiyê hatin pêşkêşkirin? Eger em bibêjin di civaka Sumer de rahibên xweda avakirin ji vê zêdetir durist û rastbûn, bawer dikim ku em ê nexapin. Tevî van rexneyan hemûyan jî K. Marks hay jê hebû ku di bin navê ekonomiya kapîtalîst de dehşet û felaket tê

pêşkêşkirin. Lê belê eger em bibêjin; di demekê de ku modernîteya kapîtalîst hegemonya xwe heta mirov bêje bes ava kiriye, analîz û çalakiya wî ya şoreşgerane evqas dibû, wê hê rastir be.

Di civaka Rojhilata Navîn de cudahiyeke girîng jî ew e, mayeyên ekonomîk bi destê dewletê di binî re tê dayîn. Ya rastî, wexta ku em li ber çavan bigirin ku di şaristaniya Ewrûpayê de bêyî dewletê kar bi destxistin xeyal e, em ê bibînin ku di tehlîla dawî de dewlet xwediyê bi tenê û rewa yê mayeyên civakî ye. Jixwe ev sedem têrê dike ku xwe xwediyê milk bibîne. Li derveyî dewletê qala karê kirin ji xapandinê û wêde tiştekî din nîne. Weke encam mirov dikare bibêje; dîroka şaristaniyê dîrokeke antî-ekonomîk e. Tevahiya pirsgirêkên ekonomîk weke encama vê nakokiyê derdikevin holê. Çîna serwer, bajar û dewlet çiqasî destê xwe ji ekonomiyê bikişînin, bi gotineke din çiqasî piçûk bibin û ekonomiyê ji berpirsiyarên wê yên rastî re bihêlin, pirsgirêkên ekonomîk jî wê ewçend bikevin rêya çareseriyê. Ev tespîta ji bo ekonomiya global, tespîta herî rast e; ji bo jiyana ekonomîk a Rojhilata Navîn hê rastir e.

Weke hêza çandî ya manewî civak bêîdeolojî nabe. Tevî ku îdeolojî bi zêhniyetê re têkildar e, lê têgîneke hê cudatir e. Heywan, heta bi nebat û atoman jî mirov dikare behsa zêhniyeta wan bike. Lê îdeolojî xweserî civaka mirov e. Wezîfe û erka wê ya bingehîn ew e ku jiyanê manedar û sererast bike. Eger ev mane û sererastkirin nebe, civak nikare li ser piyan bimîne û wê bikeve dehşetê. Ji lewra îdeolojî têra xwe pirsgirêkeke balkêş e. Maneya wê ya peyvê; mentiqê fikran e. Civaka mirov, ji bo bi mentiqê fikran şêwe û awayekî bigire, û were azadkirin, xwedî xwezayeke nerm e. Lê bi vê xisleta xwe ya nerm li kolekirinê jî vekiriye. Hem çareserkerê pirsgirêkan e, hem jî çavkaniya pirsgirêkan e, ev jî têkiliya xwe bi şêweyê avabûna mirov re heye.

Di şaristaniyên Rojhilata Navîn de îdeolojî bi roleke mezin rabûne. Şaristanî bi xwe bi gelek tiştan deyndarê afirîneriyên mîtolojîk ên rahibên Sumeran e. Panteona xwedayan a hatiye avakirin bandora xwe li dînan hemûyan kiriye. Bi şaristaniya maddî re di zikhev de timî şaristaniyeke manewî jî hatiye avakirin. Hêza xanedanî û qraltiyê ya li ser rûyê erdê

mezin û bilind dibe, xwe weke sembol bi xwedê pêşkêş û bilind dike, û ev yek jî kiriye wezîfeya bingehîn a îdeolojiya xwe. Nîşanên qralê li rûyê erdê weke formên xwedayî li ezmanan hatin nîşandan. Ji wê demê ve felsefe, zanist, huner û dîn timî li van xwedayan geriyane. Ya dîtin li aliyekî cîhana rastiyan bû, li aliyê din jî cîhana xeyalî ya rastiyên ji rê derxistî bû.

Ya ji bo cîhana îdeolojîk a Rojhilata Navîn girîng ew e; zanibe bişopîne îdeolojiya mîtolojîk çawa veguheriye îdeolojiya dînî, ya dînî çawa veguheriye îdeolojiya felsefî û herî dawî jî çawa veguherîne teoriyên zanistî; karibe bişopîne û bibîne çi beramberî cîhana pirsgirêkên maddî tê. Pirsgirêkên jiyana civakî û ekonomîk ji sedî sed di îdeolojiyê de beramberê xwe wê bibînin: yan weke rastî yan jî weke ji rêderketî. Saziyên xanedan, desthilatdarî û dewletê xwe bi awayekî gelekî tîpîk di cîhana îdeolojiyan de bi awayekî xwedayî ava dikin û pêşkêş dikin. Eger ji van aliyan ve analîzên îdeolojîk bêne kirin, mirov dikare der barê civakê de rast rohnî û serwext bibe. Cîhana tevahiya dîn û xwedayên serdema destpêkê û navîn, cîhana hiyerarşî, xanedanî, desthilatdarî, dewlet û sermayedarên mezin û bilind dibin nîşan didin û mirov şopên wan ên hatine rewakirin dikare bi hêsanî bibîne. Pevçûn û pirsgirêkên di navbera wan bi xwe de jî çawa bûne, wisa di şopên wan de jî qewimîne. Ji bo mirov li pirsgirêkên maddî serwext bibe qada îdeolojîk çiqasî hewce bike, berevajiyê wê jî ewqasî hewce dike. Bi qasî ku mirov karibe herdu alî û rûyan ji hev bike, divê mirov timî li têkiliya di navbera wan de bigere û bibîne.

Di momentên şarisaniyan de hêzên avaker haya wan bi temamî ji karektera xeyalî ya îdeolojiyan hebû. Wexta ku cîhana xeyalî weke rastiyê pêşkêşî cîhana koleyan dikirin, hem kole sernermî dikirin, hem jî arezû û xwestekên wan gem dikirin û bi xeyala jê re dinya din digotin, hêvî dikirin ku kole pê ber dilê xwe xweş bikin. Ango cîhaneke îdeolojîk a gelekî bi pirsgirêk, dibû kevneşopî û rêûresm. Ji ber vê rastiyê ye ku dîroka şaristaniyê timî di bin siya xweda û dînan de hatiye pêşkêşkirin.

Di roja me ya îro de pirsgirêkên civakî yên giran vediguherînin pirsgirêkên îdeolojîk ên bi vî rengî. Belkî jî ji ber ku bawer dikin, wê pirsgirêkan bi vî awayî hêsantir çareser bikin, ev wisa ye. Ji nû ve geşkirin

û zindîkirina îdeolojiya Îslamî, hebûna pirsgirêkên civakî yên zêde dibin, nîşan dide. Ji ber ku îdeolojiyên modernîteyê nikarin bibin amûrên çareseriyê û nikarin têkiliyeke rastî bi pirsgirêkên civakî re deynin, ev yek wisa ye. Çi serneketina îdeolojiyên rêûresmî, çi jî serneketina îdeolojiyên modern, bi rastnîşannedana pirsgirêkên civakî re têkildar in. Çareserî bi şêwazên şoreşgerane û beridandinê, hem di gotinê de û hem jî di çalakiyê de bi cihanîn û pêkanîna rastiyê ferz dike.

## 8- Pirsgirêka Şoreşê Ya Civaka Rojhilata Navîn

Pirsgirêkên civakî, yên me hewl da di vê çarçoveyê de şemaya wan pêşkêş bikin, bêguman mirov fêhm dike ka çima bi tevahî bi pirsgirêka şoreşê ve tên girêdan. Ez ê hewl bidim şoreşê cihê pênase bikim. Dîroka şaristaniyê ya Rojhilata Navîn ji aliyekî ve mirov dikare weke dîroka dij-şoreşê şîrove bike. Li beramberî çi dij-şoreş? Li dijî tevahiya hêmanên civakî yên li derveyî sîstema şaristaniyê têne hiştin, dij-şoreşek. Li dijî jinê, ciwanan, civaka gund-cotkariyê, eşîr û qebîleyên koçer, ehlê mezheb û baweriyên veşartî, û kolekiriyan, dij-şoreşek. Şaristanî ji bo hêzên xwe yên berjewendiyê şoreş an jî nîzamekî nû ye, lê ji bo hêzên dijberî wê, talan û dij-şoreşeke nû ye. Ji bo min jî maneya şoreşê ev e: sîstema şaristaniyê timî qad û kirinên civaka exlaqî, polîtîk û demokratîk tengav kirine, ji nû ve û bi awayekî hê berfirehtir paşvedayîn an jî lêvegerandina van xisletên civakê, şoreş e. Ji bo şoreşgerekî sosyalîst ê Marksîst şoreş ‘civaka sosyalîst’ e. Ji bo şoreşgerekî Îslamî ‘civaka Îslamî’ ye. Ji bo bûrjûwayê jî ‘civaka lîberal’ e.

Ya rastî civakên bi vî awayî tinene. Ev bi tenê binavkirin in: çawa ku di Serdema Navîn de jî wisa bû. Mirov etîketeke îdeolojîk bi civakan ve ke, civak naveroka xwe naguherin. Mînak piştî hilweşîna Sovyetê pirr baş hat fêhmkirin ku di navbera mirovekî sosyalîst ê Sovyetê û mirovekî lîberal ê Ewrûpayê de cudahiyeke zêde nîne. Di navbera Misilman û Xirîstiyanekî de jî cudahiyên ji ber dîn hene, bandora wan li ser jiyanê zêde cuzî ye. Eger civak ê ji aliyê naverokê ve ji hev bêne cihêkirin, ev yek bi tenê li ser hîmê binavkirina civaka polîtîk, exlaqî û demokratîk dikare pêk were. Me hewl

da bû vê binavkirinê pênase bikin. Mirov cudahiyên bi kok, dikare bi van têgîn û diyardeyên, wan nîşan didin, bi awayekî hê rastî diyar bike. Bêguman civakên exlaqî, polîtîk û demokratîk hê xwedî derfet û îmkan in ku bi jiyaneke azad û wekhev bi tamijin. Yên bixwazin dikarin ji vê re civaka sosyalîst jî bibêjin.

Şîroveyeke rastî ya civaka Rojhilata Navîn, di warê tespîtkirina xisletên exlaqî, polîtîk û demokratîk ên şoreşa divê pêk bê de, zehmetiyê nakişîne. Rewşa tevahiya îdeolojiyên modernîst û rêûresmî yên hatine ceribandin, mirov dikare ji bûyerên kirine pirsgirêk, fêhm bike. Ev encam, bivênevê rastiya demokrasiya exlaqî û polîtîk piştrast dikin. Siyaseta bê demokrasî, ango civaka ji exlaq jî mehrûm pirsgirêka wê ya bingehîn a şoreşê, bi destxistina van xisletan e. Kengî pirsgirêka şoreşê li ser vî hîmî hat danîn, bernameya siyasî, çeperên taktîk û stratejîk û gavên pratîk ên rast jî wê li gorî vê bêne diyarkirin. Têgihiştineke şoreşê ya bi vî şêwazî, ji helwestên şoreşê yên Îslamî, sosyalîst û milletperest gelekî cuda ne. Ev helwest di nava modernîteya kapîtalîst de li gorî tehlîla dawî, nemaze bi dewleta netewe bi encam dibin. Modernîteya kapîtalîst jî amûrê çareseriya pirsgirêkan nîne, amûrê mezinkirin û belavkirina pirsgirêkan li tevahiya civakê ye.

Şoreş çiqasî di qadên exlaqî, polîtîk û demokratîk de rêya li ber xwe bikudîne, wê ji modernîteyê dûr bikeve û wê dest pê bike modernîteya demokratîk berçav bike, pêşde bibe. Girîng e ku mirov der barê pirsgirêka şoreşê de cudahiyeke din di şêwazê jiyan û çalakiyê de diyar bike. Helwestên li ser xeteke rast çiqasî şaş bin, zêde ji hevkirina teorî-pratîkê jî wê mirov ber bi çalakiyên şaş û çewt ve bibe. Divê baş bê zanîn ku ji bo berî û paşê şoreşê şêweyên jiyanê yên cihê tinene. Nexasim ev ji bo şoreşgerekî/ê wisa ye. Mirov xwe bi teoriyê gurçûpêç bike, dibe mirovê çalakiyê. Ji kesê/a xisletên exlaqî, polîtîk û demokratîk di jiyana xwe ya rojane de bi gotin û çalakiyê nîşan nede, şoreşger nayê gotin. Kesên bi vî rengî, jiyaneke wan a mîlîtanwarî û şoreşgerane nabe. Her weha bi tenê bi berxwedaniyê, bi parastina civakê, mirov nabe çalakger. Eger bi avakirina civaka exlaqî, polîtîk û demokratîk re neke yek, her cure berxwedanî û

şerê xweparastinê şensê xwe yê serketina mayînde nîne. Pirsgirêkên civakê çawa yekpare ne, divê şoreş û şoreşger jî di tevahiya gotin û çalakiyên xwe de bernameya siyasî, plansaziya taktîk û stratejîk di zikhev de pêk bîne. Hînbûyîna jiyanê yekpare ye. Divê mirov yeqîn neke ku mirov dikare qonaxan ji hev qut bijî. Eger hewce dike ku em ji hin mînakên dîrokî dersê bigirin, mirov dikare têra xwe ji mînakên Zerdeşt, Mûsa, Îsa û Muhemmed hîn bibe û dersan bigire. Mînakên em behsa wan dikin, ji bo şoreş û şoreşgerên civaka Rojhilat Navîn ji beriya hezar salan ve me hişyar dikin ku divê mirov çawa bi tevahî rahêje meseleyan, bi tempoyeke çawa bimeşe, çawa bi pratîk û pîvan be. Şoreşên Rojhilata Navîn eger ne li gorî qalibên modernîteya kapîtalîst, belê li gorî nirxên xwe yên dîrokî rabûn û bi zanista aktuel re bûn yek, şensê wan ê serketinê mumkîn e ku hebe.

Weke encam mirov dikare pêxîrtengî û pirsgirêkên civaka Rojhilata Navîn di sê qonaxan de xulase bîne ziman. Qonaxa yekemîn, di salên 3500 B.Z. de bi xanedan, hiyerarşî, bajar, dewlet û diyardeya çînî yên ku hebûna xwe baş diyar kirine li dora sîstema şaristaniya navendî pêş ketine. Bi vî awayî sîstema şaristaniya navendî mezin û xurt bûye. Ev sîstem çavkaniya pirsgirêkên civakî ye. Ji derve bi sîstema qebîleyan, ji hundir ve jî bi sîstemên dînî yên Brahîmî û Zerdeştî ji bo bersivdanê hewldan çêbûne. Qonaxa duyemîn, sîstema şaristaniya navendî gava xwe ya dawî bi şaristaniya Îslamê avêt û ber bi salên 1200'î ve li dijî pirsgirêkên ketin serhevdu hewldana Ronesansê ket rojevê, lê ji ber ku ev hewldan tam bi serneket û pêşengî bi destê gavavêtinên şaristaniya bajêr a li Nîvgirava Îtalyayê berda, vê yekê hişt ku pêxîrtengî û pirsgirêk bikevin pêvajoyekê têde girantir bibin.

Qonaxa sêyemîn a ber bi roja me ya îro ve di bin navê 'Pirsgirêka Şerqê' de tê, kengî sîstema şaristaniya navendî ya Ewrûpayê hegemonya kir destê xwe û berê xwe da herêmê, ji salên 1800'î ve dest pê kir. Lêgerînên çareseriyê yên modernîst û kevneşop ên xwe disipêrin modernîteya kapîtalîst jî bi girantirkirina pirsigirêkan bi encam bûne; rê li ber neyêniyên welê vekirine, rewş gihandine ber krîz, qirkirin û întîharan.

# Beşa Çaremîn:

# DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE BERXWEDANÊN DÎROKÎ Û LÊGERÎNÊN ÇARESERIYÊ

Zanistên civakî yên navend şaristaniya Ewrûpayê, şaristaniya Greko-Romen orjînal qebûl kirine û li ser vî hîmî hatine pêşdebirin, ji lewra vê yekê nivîsandin û xwendina dîroka gerdûnî di asteke pêş de berevajî kiriye. Li ser zanistên civakî bi xwe şopên kûr ên van berevajîkirinan hene. Bêguman her serdema bi îdeal yan jî şaristanî bi îhtîrasa xwe navend û orjînal hesibandinê, barkirî ye. Lê şaristaniya navendî ya Ewrûpayê dîsa jî di vê mijarê de bi fazîlet rabûye û zû xwe rexne kiriye. Pêşketina ekola rexnegir, nivîsandin û xwendina dîroka gerdûnî zêdetir nêzî rastiyê –nêzî heqîqetê- dike. Lêkolînên zanista civakî yên di vî warî de bi awayekî berbiçav hûrûkûr bûne. Lê belê weke di zanistan hemûyan de hat dîtin zanistên civakî jî zêde veguherîn disiplînan, û vê yekê jî kir ku rê li ber tehlûkeya belavkirin û parçebûna yekparebûna rastiyê veke. Hukmê Hegel ê weke ‘Rastî yekpare ye’ li hemberî vê reaksiyona Adorno ‘Rastî yekpare nîne’ vê rewşê xulase îfade dike. Reaksiyona ji dîroka gerdûnî ya makro û di serî de ‘dîrokên neteweyî’, zêde himbêzkirina dîrokên mîkro, yekparetiya heqîqetê xira kirine û neyênîtî zêde kirine. Helwesta yekpare, ji ber ku pêvajoyên bûyer, diyarde û têkiliyên wan zêde piştguh dike, di vê encamê de xwedî rol e. Ya rast lê ya zehmet ew e ku mirov helwestên yekpareyî û parçeyî (makro û mîkro) çawa di rastiyê de diqewime, di zikhev de bi rêbaza sentezkirinê ji hev derxe û pêşkêş bike. Ez jî di

hewldanên xwe yên xwendin, nivîsandin û pêşkêşkirinê de girîngî û îhtîmamê bi van nêzîkatiyan didim.

Têgîna felsefeya dîroka gerdûnî ya Hegel weke têgîn pêşdeber e. Hegel felsefeya dîrokê disipêre şaristaniya Greko-Romen û bi giranî metafizîk e, ji lewra ev yek bi dijwarî tê rexnekirin. Rexneya F. Nietzsche li Hegel kirî hînker e. Bi tevahiya hêza xwe û bi awayekî eşkere li dijî îdeayên (Geist) mucered jiyana berçav ferz kiriye. Xwestiye bêje 'rastî berçav e.' Wexta vê dikê, dîroka gerdûnî, muceredê bi tevahî ji nedîtî ve nayê. Ji Greko-Romengiriyê dibihure, heta bi Zerdeşt diçe. Li wir li dijî metafizîka dîndar a yek xwedayî dest bi lêkolîna felsefeya exlaq dike. Dixwaze felsefeya coş û êşê bike.

Me hinekî behsa Hegelgiriya Çepgir a K. Marks kiribû. Herçiqas xwe weke materyalîst pêşkêş bike jî mirov nikare bibêje Marks ji metafizîka pozitîv bihuriye. Zanistperestiya civakî ya Fransiyan (bingeha dîroknasiya neteweya mîkro) bi tevahî mîkroperest e. Di vê de para Şoreşa Fransî, dewletdariya neteweyî ya zêde û komargeriyê, gelek e. Ekola dîroka ingilîz a li ser hîmê ekonomî-polîtîka ingilîz pêş ket jî heta dawiyê pragmatîst e. Armanca wê hemû ev e, ji Împaratoriya Ingilîz re ya mezin û xurt dibe, peydakirina palpiştiya dîrokî ji hegemonya vê împaratoriyê re û ji bo wê hîmdanîna îdeolojîk e. Ji ber têkiliya wê ya zêde bi pratîkê re ji gavavêtinên elman û fransî serketîtir e. Sîstema serketî be, felsefeya wê jî serketî dibe, lê ev nayê wê maneyê heqîqetgir e. Çawa ku her heqîqet serketin nîne, her têkçûn jî ispata çewtî û şaşiyê nîne. Eger em vê rastiyê baş nizanibin, em nikarin li ser şopa heqîqetê rast bimeşin.

Sîstema şaristaniya navendî ya çavkaniya wê Sumer a meşa wê ji pênc hezar salî zêdetir, ji bo dîroka gerdûnî di serê argumanên herî girîntir de tê. Sedema ku Hegel ev arguman bi kar neaniye, nejîrbûn yan jî korfêhmiya wî nîne, sedem ew e ku wê demê lêkolînên Sumerîk hê dest pê nekirine. Materyalên der barê derketina çavkaniyên dînên Brahîmî de gelekî kêm û bi sînor bûn. Girîngiya sîstema qebîleyan jî pirr baş nedihat fêhmkirin an jî bi sîstema neolîtîk re rola gerdûnî ya pê radibû, tam nedihat nirxandin. Di dema Şoreşa Fransî û piştî wê de, naverast bi temamî li lêkolînên dîroka

milletperest (argumanên nû yên dînî) û dewleta netewe hatibû vekirin. Her rewşenbîr, dîroknas bi pey dîroka xwe ya neteweyî ketibû. Wer xuya dike ku ji ber karekterê şoreşa pêk tê (hegemonya bûrjûwa) ev nivîsên li ser dîrokê bi awirekî dijwar ê çînî barkirîbûn. Rewşenbîrên bûrjûwayê di dîroknasiya dewleta netewe de bi rola sereke radibûn, yên muhafezekar jî ji nû ve ji arîstokrasiya feodal re li bingehekî dîrokî digeriyan, yên demokrat û sosyalîst jî bi pey lêkolînkirina dîroka gelan û kedkaran ketibûn. Xwezaya civakê jî bi qasî ku bi awirekî çînî neyê şîrovekirin tevlîhev û nerm e, û herweha yekpare ye, lê helwesteke girîngiya parçeyan jî datîne holê, ferz dike. Di serê sedsala 20. de bi doktrîna rexnegir Ekola Dîrokê ya Annales (Dibistana Frankfûrtê), helwestên yekpare û parçeyî hûrûkûr lêkolan û li ser sekinîn. Şoreşên zanistî yên di nîvê duyemîn ê sedsala 20. de bandora xwe li ser zanista sosyolojiyê jî kirin, derfet û îmkan dan ku lêkolîn û vegotinên hê bi tewazun, bêne kirin. Em dikarin bibêjin, di roja me ya îro de em hê zêdetir nêzî heqîqeta gerdûnî û dîrokî ne, ango nêzî heqîqeta civakî ne. Eger em ji diyalektîkê tiştekî fêhm dikin, divê em baş zanibin, li ber serê nêzîkbûna li heqîqetê, şaşiyên mezin jî hene.

Hegel, wexta nasnameya Napolyon û meşa wî ya dîrokî ango tevgerên wî yên eskerî û siyasî dinirxandin, ji aliyê cewherî ve ji xelekeke rast û girîng dest bi mijarê dikir. Dîsa wexta ku Napolyon weke xwedayê daketiye rûyê erdê û sîstema wî jî (sîstema dewleta netewe) weke şêweyê dawî yê dewletê yê herî îdeal û herî homojen hukim dike, weke vegotin xwedî xisleteke hînker û pêşdeber e. Heqîqetparêzî di vê mijarê de divê neke ku mirov Hegel ji nedîtî ve bên. Napolyon weke kes, dîrok bi xwe ye ku heta wê demê hatiye. Eger hêmanên maddî û manewî yên ew derxistine holê bêne lêkolînkirin wê zehmet nebe mirov bigihîje vê encamê. Eger em bi kurtî şîrove bikin em ê weha bibêjin; Xirîstiyantiya di hîmê şaristaniya Ewrûpayê de û sêberiya 'Bav-Kur-Ruhê Pîroz' ê di cewherê wê de xwe di Napolyon de nîşan dide û ev yek tê fêhmkirin. Xirîstiyantî çiqasî dibe dewlet, xwedayetiya di hinavê wê de şêweyê berçav ê dewletê digire. Jixwe mirov dikare şîroveyên bi vî rengî ji bo Cihûtî û Misilmantiyê jî bike.

Dema ku dêrên neteweyî û xwedayê bûye dewlet dibin yek, hingî 'dewleta netewe' dikare weke xweda bê şîrovekirin. Ya Hegel jî kirî ev bû.

Mirov dikare vê şîroveyê hê jî pêşde bibe û bi awayekî berfireh bi kar bîne. Herweha ji bo mirov baştir serwext bibe şîrovekirina têgîna xweda, gelekî girîng e. E. Durkheim jî dema xweda weke 'forma nasnameya civakî' şîrove dike, sosyolojiyeke baş kiriye. Têgihiştina li xwedê ji aliyê sosyolojîk bi awayekî herî rast ew e ku wî weke forma giştî ya civakê şîrovekirine. Ya ez jî bi tenê dixwazim li vê zêde bikim ev e; ez li şûna form weha dibêjim 'Xweda bernameyeke siyasî-civakî ye.' Ez wexta behsa têgihiştina Hz. Muhemmed a li Ellah bikim, ez ê hewl bidim vê xusûsê bi firehî şîrove bikim. Ji vê jî girîngtir, ev xusûsên şîroveyê der barê dînê Brahîmî de ne. Mirov vegotinên mîtolojîk ên Misr û Sumeran û panteonên wan ên xwedayan weke agahî-dane bi kar neyîne û behsa sosyolojiya dînên Brahîmî bike, tiştekî bê îmkan nebe jî wê gelekî kêm bimîne.

Eger em meşa xwe ya berepaş dewam bikin, em ê ji belgeyên nivîskî yên şaristaniya Sumer gihiştine ber destên me, destanên Înanna û Gilgamêş bibînin. Ji şîroveyên li ser van destanan mirov dikare baştir hîn bibe. Ji bo nivîsandina dîroka gerdûnî ev arguman bi tenê nebe jî di vî alî de yek ji rêbazên girîng e ku nayê redkirin. Mirov dikarin bibêjin ku bi şîroveyên bi metafizîkê dîrok nayê nivîsandin. Ev îdeayeke gelekî pûç û zuha ye. Ji bo vê jî bersiva min weha ye: 'Çanda mirov bi pêşketina xwe ya heta niha, bi giranî metafizîk e.' Jixwe, ne rast e, ne jî mumkîn e ku mirov metafizîkê bi tevahî li derveyî heqîqetê bihesibîne. Hatiye fêhmkirin ku pozitîvîstên xwediyê vê îdeayê bi xwe metafizîkvanên herî çor in. Di vê mijarê de nirxandineke Nietzsche pêşiya mirovî rohnî dike û ew jî ev e: 'Ya girîng, kirin an jî nekirina metafizîkê nîne, ya girîng kirina metafizîka baş e.' Di jiyanê de metafizîka êşê kêm dike, coş û şahiyê zêde dike, metafizîka baş e. Ji bo metafizîka xirab jî mînaka herî bi tesîr dewleta netewe û faşîzm in ku bi têgihiştina pozîtîvîst a gerdûnî hatine vejandin.

Eger em car din li mijarê vegerin em ê bibêjin, mirov heta sîstema şaristaniya navendî fêhm neke, têgihiştina li dîroka gerdûnî jî wê pirr kêm be. Mirov dîroka gerdûnî jî fêhm neke, wê têgihiştina wî ya dîrokên

civakan ne tenê kêm be, ji ber ku wê danaberhev nebe, wê bê mane be. Di vê mijarê de divê ez têbîniyeke kin jî ji bo sîstema qebîleyan li mijarê zêde bikim. Rast nîne ku mirov qebîleyê piştî klanê weke mijara herî bingehîn a vegotina mîkro bibîne. Klan jî weke qebîleyê avahiyeke sîstemîk e, û xwedî xisletên gerdûnî ye. Eger mirov sîstema klan û qebîleyan li vegotina dîroka gerdûnî zêde neke û şîroveyan bike, wê şîroveyên mirov ne tenê tijî şaşî bin, wê gelekî jî kêm bin. Çawa ku di roja me ya îro de bêyî dîroka neteweyî qala dîroka gerdûnî nayê kirin, bêyî klan û qebîleyan jî qala dîroka gerdûnî û parçeyî nayê kirin. Bi vedîtina nivîsê destpêkirina dîrokê bi temamî tercîheke mîtolojîk e. Mirov bibêje, tercîha mîtolojiya pozîtîvîst hê rasttir e.

Ev ravekirina kurt a der barê lêgerîn û berxwedanên dîrokî de weke pêşek ji bo serxwetbûn û têgihiştina li mijarê girîng e. Pêvajoya şaristaniya navendî wexta bi rewşa xwe ya orjînal dest pê kir dinyaya ew li dijî wê pêş diket, ew dinya bû ku serdema civaka neolotîk bi tevahiya heybeta xwe hebû. Di navbera herdu pêvajoyan de mirov dikare diyalektîkeke bêqusûr deyne. Mirov nikare gumanê jê bibe ku li perestgehên rahibên Sumeran tevahiya planên hûnandina vê diyalektîkê, proje û bingehê bi cihanîna wê, hatine danîn. Em çi belgeyî-empîrîk, çi jî rasyonel-mucered bifikirin, têkiliya diyalektîkî ya hatiye danîn bi bûyerên mezin avis e. Bi tevahî nirxên çanda maddî û manewî ya herêma herî bi xêrûbêr Hîlala Bi Bereket a Mezopotamya Jor, bûye yedekê Şaristaniya Sumer (guloka ji bajar-çîn-dewletê pêk hatî) û weke malzeme, kirine xizmeta wê. Bi xebitandin û veguherandinê mekîneya jê re şaristanî tê gotin wê bê afirandin. Divê ez bi bîr bixim ku dîroknas Gordon Childe çanda Mezopotamya Jor, bi çanda Ewrûpayê ya piştî sedsala 16. re hevnirx dibîne.

Divê mirov li ser gotinên şaristanî û mekîneyê rawest e. Li ser sekinandina wan jî hewcedariyeke girîng e. Şaristanî ji ber ku bûye sîstema serdest, gotinek e ku propagandaya wê gelekî hatiye kirin. Gotin bi maneya 'bajarîbûn' û 'sivîlîzasyonê' tê. Şaristanî di heman demê de navê jiyana nû ye, û bi gotin û sifetên weke medenî, modern, centilmen, rasyonel, birêkûpêk, kibar, delal, bi hesêb, bi plan, ewle, aştiyane û hwd. misêwa tê

mezinkirin û bilindkirin. Bandora çanda maddî di jiyanê de bi van gotinan tîne ziman û çanda xwe ya manewî jî bi panteona xwedayên nû û teswîrên cennetê dikemilîne, gurçûpêç dike. Çanda manewî bi van têgînan ji hêzên şaristaniyê re bernameyên wan ên mezin ên bi bêmirinî û mukemmeliyetê barkirî, pêşkêş dike. Gotinên der barê çanda maddî de bi kêmanî bernameya ji bo jiyana rojane pêşkêş dikin, vegotinên çanda manewî bernameya mezin a îdealên jiyanê û mirov karibin xwe bigihînin wan, pêşkêş dikin. Ji ber ku karîbûn bernameyên mezin û yên herî kêm pêşde bibin, divê mirov perestgehên rahibên Sumeran girîng bibîne. Perestgehên di roja me ya îro de bi tenê bi kêra propagandaya nîzama heyî tên.

Perestgehên orjînal ên Sumeran paşê wê di pêkhatina fenomenên şaristaniya ji pênc hezar salî zêdetir xwedî temen re, malzarokiyê bikin. Rahibên Sumeran destpêkê di avakirina bajar, çîn, dewlet û tevahiya sazî û îdeolojiyên wî de bi xwe cih girtine û meşandine. Ango şaristaniya jê re mekîne tê gotin rewşa wê ya acente afirandine. Divê mirov hîç gumanê jê nebe ku koka têgîna ‘afirêneriya xwedayî’ têkiliya xwe bi afirêneriya mekîneya şaristaniyê re gelekî heye. Têgîna şaristaniyê weke mekîne hêjayî jihevderxistin û analîzkirinê ye. Gotina mekîne hem nav e, hem jî sifet e ku ji amûrên weke otomobîlan ên xwe bi xwe dimeşin re tê bikaranîn. Pirsa divê were pirsîn ew e ku ev mekîneya civakê ya hatiye avakirin maneya wê çi ye. Eşkere ye ku pê dixwazin civaka kontrol kirine û li ser xwedî hukm in, bi lez bixebitînin û bi vî awayî zêdetir mayeyên civakî bi dest bixin û desteser bikin. Erê, bikêrhatin û fonksiyona dîrokî ya vê mekîneyê wisa ye. Fonksiyon ji wezîfeyê cuda ye, têgîneke têkiliya xwe bi cewher re heye. Wezîfe tê terikandin, lê fonksiyon nayê berdan. Ji ber ku xusûsek e, bi binye û cewherê amûr an jî organê pêwendîdar re têkildar e. Eger amûr belav bibe, wê wextê fonksiyon û kêrhatina wî jî diqede. Şaristaniya bi bajar-çîn-dewletê hatiye hûnandin mekîneyeke bi vî rengî ya fonksiyonel e, lê civak nîne. Civakê dixebitîne, hem jî bi lez dixebitîne. Wexta ku li hesabê wê nayê naxebitîne, bêkar dihêle. Bi vê jî qîma xwe nayîne, dest datîne ser mayeyan. Ji bo vê jî her cure tevdîra xwe ya îdeolojîk û eskerî dike. Levîathanek e (cinawirek e) ku bi hezar hîle, derew

û bêrehmiyê xwe li ser serê civakê digire. Li qadên herî baş ên jeobiyolojiya bi mîlyonan salî dewamkirî li ser çanda civakê afirandiye, rûdinê û bi xwedayetiyê (afirînertiyê) radibe an jî xwe dihesibîne. Bi pêkanîn an jî afirandinê xwe afirîner an jî xweda dihesibîne.

Di vê rewşê de divê mirov vê pirsê bike: yên weke barbar û cinawiran e, kî ne? Gelo civakên bi xwezayê re di zikhev de weke zarokê li ber pêsîra diya xwe jiyanê dewam dikin an jî yên li pişta wan suwar dibin û nirxên wan desteser dikin, barbar û cinawir in? Eşkere ye ku wext e, mirov têgînê berevajî bike, belkî jî ji mêj ve ji bo vê yekê dem hatiye û derbas jî bûye! Hêzên cinawir û barbar ên şaristaniyê ne. Yên ku mirovên rastî ne, bi xwezayê re û di nava xwe de weke zarok-dayikê bi hezkirin û evîn in. Yên di civakekê de dijîn ku bi giranî jin xwedî rol in. Yên ku hawîrdorê xira nakin û qirêj nakin, jiyana xwe dewam dikin. Yên ku mêtinkarî û zordestiyê ji xwe re xerîb dibînin. Ev pênase û danasîn dibe ku besît xuya bikin. Lê belê ji bo ku mirov bi awayekî eşkere li dijberiya diyaletîk a şaristanî bi civakê re ketiye navê serwext bibe, mirovî rohnî dikin, wî bi ser xwe ve tînin û vediguherînin. Divê em ji bîr nekin ku pirraniya me ya mirovan, şaristaniyê em ehmeq kirine, û ji vê jî wêdetir nikarin biçin. Ango em ew in ku mekîne me dixebitîne. Weke her mekîneyê, şaristanî jî di dema xebata xwe de dikarin bihilhil in, û pêxîrtengî bibin. Pêxîrtengiyên giran û pirsgirêk ti carî kêm nabin. Lewma di encamê de civakên zindî yên mirovan yên ku li wan tê hukimkirin, xwedî mejî û xwestek in. Ji lewra ev hebûnên civakî xwedî xisleteke nerm in, nikarin demên dirêj li zehmetî û derewan xwe ragirin. Dikarin li ber xwe bidin, serî rakin, xeyalên jiyanê yên manedartir, azad, wekhev û biratiyê bikin. Ji bo jiyaneke bi vî rengî jî dikarin xwe bi rêxistin bikin û heta şer bikin.

Em mijara xwe li ser vî bingehî di bin sê sernavên sereke de dewam bikin.

## A- Pêxîrtengiya Şaristaniyê û Di Nava Xwe De Lêgerînên Wê Yên Çareseriyê

Wexta em behsa şaristaniyê dikin û sîstema şaristaniya navendî weke xeleka bingehîn dikin mijara xwe ya lêkolînê, ev nayê wê maneyê ku em şaristaniyên din înkar dikin an jî wan ji nedîtî ve tên. Herweha em nabêjin ew girîng jî nînin. Ez dixwazim bibêjim, têgîna çemê sereke yê herikîna dîrokê bêtir mirovî pêşde dibe û hîn dike. Şaristaniyên din weke rûbarok an jî şax in, diherikin ser çemê sereke û mezin. Herikîna çemê sereke boş û bi hêz dikin. Lê cewherê şaristaniyê nikarin biguherînin. Mirov, sîstema herî zêde serdem û roja me ya îro diyarkirî weke sîstema cîhanê ya navendî bike mijara nirxandinan, wê ji bo nirxandinên şaxên din jî kêrhatî be. Bêyî ku wesfê xwe yê herikîna dîrokî gerdûnî wenda bike, herikîna dîrokî ya di zeman û mekanên cuda de jî mirov dikare rast fêhm bike. Tevahî dikare parçe rave bike, lê parçe di wê kapasîteyê de nîne ku tevahiyê rave bike. Ji ber van sedeman e ku em helwesta sîstema dinyayê an jî şaristaniya navendî ya ji pênc hezar salî dibihure, tercîh dikin.

Şaristaniya bajêr a Sumeran li gorî destpêkê têra xwe kêrhatî dixebitî: mîna her amûr an jî erebeya ji acenteyê derketî ye. Xwe pirr bi lez zêde kir. Li pey hev bajar hatin avakirin. Di serî de ji Mezopotamya Jêr heta bi Mezopotamya Jor li her deverê belav bû. Lewma her bajar dihat maneya hê bêtir nirxê zêde. Li ser vî hîmî, diviyabû mirov li bendê be ku hiyerarşiyên bicihbûyî bi lez veguherin dewletên xanedan. Maddeya xam û maddeya mamûl bazirganî bi lez dikir, bajar jî neçarî reqabeta hegemonîk dikirin. Hêza hukim li bazirganiyê dikir, şensê xwe yê hegemonyayê zêde dikir. Li qadên teng avabûna gelek bajaran dîsa yek ji wan sedeman bû ku şerê hegemonyayê û reqabet sor kir. Herweha ji ber ku di destpêkê de hejmara hewce ya şêniyan ji sînorê xwe bihurî, vediguherî pirsgirikê. Hatina aborî dihat maneya zêdebûna şêniyan. Çiqasî erd û zevî zêde bibûna û derfetên avdaniyê çêbibûna ev sîstem ê bi awayekî serketî bimeşiya. Lê belê qadên bi bereket bi derdora Dîcle-Firatê sînordar bûn. Kengî ev qad ketin ber

pêvajoya bajarbûnê, hingî digihiştin ber şert û mercên berbiçav ên pêxîrtengiyê.

Ûrûkê serdema xwe bi qasî pêncsed salî dewam kir û di encama reqabetê de cih û hegemonya xwe bi destê sîteya Ûrê berda. Pêxîrtengiya Ûrûkê rê li derketina holê ya sîteya Ûrê vekir. Bi pêxîrtengiyên di dema li derdora 3000-2000 B.Z. de sê Xanedanên Ûrê, di dema 2350-2150 B.Z. de Xanedaniya Akad a semîtîk û dema 2150-2050 B.Z. de Xanedaniya Gudea ya aryanîk ketinê, ev dem jî bi dawî bûye. Belgeyên gihiştine destên me nîşan didin ku di vê demê de di navbera bajaran de gelekî zêde şer qewimîne. Em dizanin hin bajar bi tevahî ji holê hatine rakirin. Mînak, em bi çîroka '**Lanetkirina Agadeyê**' dizanin ku paytexta Akadê bi awayekî kezebşewat ji dîrokê hatiye rakirin. Gelek çîrokên bi vî rengî hene. Ev rastiyek e ku krîz û reqabetên ji yên roja me ya îro ne kêmtir, çêbûne. Kar her tim tê maneya berhemê zêde. Ji lewra şerên li ser têne kirin, her tim wê mîna hev bin û wê timî heman encaman bidin. Eşkere ye ku pêxîrtengiya şaristaniyê pêşde diçe. Bajarên têne hilweşandin û şerên bêrehm ên mîna li Iraqa îro, bi tenê vê rastiyê piştrast dikin. Eger em bînin bîra xwe Iraq ji Ûrûkê tê, em ê karibin çêtir serwext bibin ka dîrokeke çendîn xembar (dîroka şaristaniyê) diqewime.

Çareya ji pêxîrtengiyê re hatiye dîtin jî rêûresmî ye. Şaristaniyê ji leza xwe û zêdebûna xwe ya heta roja me ya îro ti tişt kêm nekiriye. Hê bêtir qada mêtinkariyê keşif dike û ji bo vê mêtinkariyê jî dixwaze zêdetir bibe xwediyê hêz, desthilatdarî û dewletê. Ya di dawiya salên 2000'î B.Z. de ji pêxîrtengî û buhranê bi hêz derket, Babîl bû. Hê bêtir xwediyê hêz û derfetên mêtinkariyê ye. Di bazirganî û pîşesaziyê de ketiye pêşiyê. Herçend hin caran hegemonya wê qut bibe an jî hin caran li ser kar be jî heta salên 300'î B.Z. bi tesîr bûye. Tevahiya hegemonên vê demê (Hegemon weke peyv dibe ku ji koka fermandar be), herî dawî di mînaka Skender de hat dîtin, dixwazin li Babîlê bin. Yên pêxîrtengiyên Babîlê herî baş bi kar anîne, yên mîna gurên bazirganiyê ku li ber serê wê bûn, bazirganên Asûrî û koloniyên wan in. Asûrî bi awayekî mîna Fenîkiyên li bejahiyê ne. Ya Fenîkiyan li Deryaspî di bazirganiyê de dikirin Asûriyan jî

di bejahiya Rojhilata Navîn de wê pêk bianiya. Asûriyên bi Babîlan re di nava reqabeteke dijwar de bûn (Hê jî reqabeta Suryanî-Kildaniyan vê rêûresmê nîşan dide), di hegemonya Babîlan de (2000-1600 B.Z.) bi tenê karîbûn yekdestdariya bazirganiyê di destên xwe de bigirin.

Piştî Hemmûrabî, ji pêxîrtengiya Babîlê du hêzên dîrokî derketin û gav avêtin: ji nava wê derketina Brahîm (li gorî texmînan di salên 1700-1600 B.Z. de), wekî din Hûrrî jî ji xweparastinê derbasî qonaxa êrişê bûn. Di sala 1596'an B.Z. de xanedanên bi koka Hûrrî (Hîtît û Kassît ên ji wan têne zanîn) û Babîl weke rêveberiya Bexdayê ya îro, derbasî rêveberiyeke hevpar dibin.

Kengî Babîlê hegemonya xwe ji dest da du hêzên nû yên hegemonîk derketin ser dikê. Li Anatolya Navîn Hîtît ên navenda wan Hattûşaş (li Çorum-Bogazkoy a îro) û Mîtaniyên navenda wan Waşûkaniyê (Serêkaniyê li ser sînorê Tirkiyê û Sûrî). Herdu jî ji ezbetên qebîleyên Hûrriyan e (proto-Kurd) ku ji aliyê mîregtiyên wan ên di asta keyatiyê de (1600-1250 B.Z.) têne avakirin. Dema Xanedaniya Nû ya Misrê, di şaristaniya Rojhilata Navîn de qonaxeke nû ya rohnî temsîl dike. Di navbera sê navendên şaristaniyê de dîplomasiyeke gelekî zindî heye û di navbera qesran de bi dayîn û berdêlîkirina jinan, weke şêweyekî enternasyonala destpêkê demeke têkiliyan pêk tê. Ji ber pêxîrtengiya rêûresmî hegemonya Hîtît û Mîtanî (Pêxîrtengiyên vê demê navberên xwe dirêjtir in, di navbera sed û çarsed salî de dihugerin) di hundir de ji ber şerên xanedaniyê, ji der ve jî ji ber êrişên qebîleyan hildiweşe û xanedanên Asûr ên li benda keyslêanînê, bilind dibin. Du deman (1300-1000, 900-600 B.Z.) li Rojhilata Navîn dibin hêza hegemonîk a herî bi hêz.

Tê gotin hêza herî xedar û zalim a dîrokê nas kiriye, ya Împaratoriya Asûr e. Eger mirov bi koka meseleyê ve dakeve mirovê bibîne têkiliya xedariyê bi kara yekdestdariyê re heye. Weke gel di cewherê xwe de ti cudahiya Asûran ji gelên din nîne. Lê ji ber ku hegemonya Asûr xwe disipêre yekdestdariya bazirganiyê, ev yek jî şîddetê ji bo karê ferz dike. Çawa ku li cem yekdestdarên cotkariyê (rêveberiya erd a Sumeran) bêyî şîddetê kar nayê bi destxistin, ev yek li cem yekdestdarên bazirganiyê jî bi

heman rengî ye. Di bingehê şîddeta Asûrê de ev rastî heye. Nûbûna hegemonya Asûrê ji aliyê şaristaniyê ve aniye, bi tenê ji bo kara zêde, bêtir desthilatdarî û ji bo bêtir desthilatdariyê jî hê zêdetir şîddet e. Eşkere ye ku di çarçove û mekanê şîddetê de mezinbûn heye. Ji lewra di dîrokê de analîzên li ser Asûrê weke analîzên sereke yên li ser koka şîddetê têne hesibandin. Ev rêûresma hê jî li Rojhilata Navîn ji bo çareserkirina pirsgirêkan tê fikirîn, pirr tiştan deyndarê hegemonya Asûrê ye.

Şîddeta Asûrê û hêrsa karê (ez yeqîn dikim ku koka têgînên şîddet û karê Asûrî-Aramî ne) ya di bingehê wê de di wijdanê mirovatiyê de birînên mezin vekirine. Ne tenê rê li ber pêxîrtengiyê vekiriye, hiştiye ku Asûrî hem weke eskerî-siyasî, hem jî weke gel-civak careke din nikaribin pişta xwe rast bikin. Şîddeta Asûrê kir ku gelên Rojhilata Navîn pirr nifiran li wan bikin, bi lanetkirinê wan (yekdestdarên bazirganî û desthilatdariyê) bi bîr bînin û ji bo azadiyê rewan bibin. Efsaneya Kawayê Hesinkar û 'berxwedana sêsed salî' ya navdar a Med û Ûrartûyan berhemên vê demê ne. Ji vê jî girîngtir, di dîrokê de rê li ber dema jê re serdema hîkmetan (600-300 B.Z.) tê gotin, vekiriye. Di vê demê de ku em dikarin weke serdema zanyariyê jî bi nav bikin, ji bo jihevderxistina felaketa mezin a Asûrê ya bi serê gelan de hatiye, hewcedarî bi ponijînê û fikirîna mezin peyda bûye. Hem serhildana fikrê û hem jî serhildana wijdanî, hêza afirîner a vê serdemê ye. Di navenda vê serdemê de Zerdeşt rol digire. Li Rojhilat, li Hindistan û Çînê di sedsala 6. B.Z. de Bûda û Konfûçyûs nûneriya vê serdemê dikin, li Rojava li nava Grekan, Sokrates vê serdemê temsîl dike. Pêxîrtengiyên mezin tevî berjêrçûn û şîddetên mezin, dikarin ji bo bilindbûna wijdan û fikrên mezin jî şert û mercan amade bikin.

Hegemonya Asûrê ya bi hevgirtina Med û Babîlan di dîrokê de dawî lê hat anîn, piştî demeke kurt Med û Babîlan jî (600-550 B.Z.) şûna xwe ji xanedaniya Persan re hişt (550-330 B.Z.). Rîwayet tê kirin ku di çareseriyê de Persan rêbazeke berevajî ya Asûran şopandiye. Ji awirê diyalektîkî jî dibe ku ev rast be. Ji ber ku xweşbînî ew rêbaz e ku behsa wê tê kirin; gelan ji hev cuda nake azadiyê ji bo tevahiya çandan nas dike û di rêveberiyê de edalet û gotina rast ji ti kesî mehrûm nake. Mirov dikare

bibêje ku ji vî alî ve jî gelên Rojhilata Navîn ew weke ehwen-î şer pêşwazî kirine. Hegemonya herî berfireh a dîrokê hat avakirin. Ji Hindistanê xwe heta bi Makedonyayê dirêj kir. Bi tenê Çîn û Komara Romayê li derveyî wê man. Her çi be, dîsa jî hêzeke şaristaniyê bû. Nakokiya wê ya bingehîn wê di demeke kin de bandora xwe nîşan bidaya û wê pêxîrtengî dijwar bûbûya. Ji hundir ve şerên dijwar ên xanedanan, ji der ve jî êrişên qebîleyan wê hêdî hêdî dawiya wê bianiyana.

Stûna hêzê ya Skender jî xwe dispart esilzadeyên qebîleyan. Şûrê Skender bahane bû. Berevajî yeqînan, ji şerkeriya mezin a Skender wêdetir, rizîna hundir dawî li hegemonya Persan anî. Serdema Helenîzmê (300 B.Z. – 300 P.Z.) di demeke li derdora pêncsed salî de sentezeke rastî ya Rojhilat-Rojava çêkir. Ya Persan ji Rojhilat pêşde bir, Helenan jî bi pêşdebirina wê ji Rojava bersiv dan û vê yekê jî kir ku di dîroka mirovatiyê de sentezeke mezin çêbe. Şaristaniya Grek (600-300 B.Z.) bi vê pêvajoyê xwe xwedî kiriye û bi Helenîzmê gaveke mezin avêtiye. Herçiqasî Roma hegemonê eskerî û siyasî be jî nûneriya pêşdebirina çandî Helenan kiriye. Xanedanên Part û Sasaniyan ên dewama Persan in, ji aliyê dîrokî ve li çandê tiştek zêde nekirine. Şerê hegemonîk ê bi Romayê re kirin, li civaka Rojhilata Navîn ji nû ve rê li ber berxwedan û lêgerînên mezin vekir. Xirîstiyantî û Manîzm weke encama van lêgerînan derketine holê. Derketin û gavavêtina Îslamî weke dewama vê pêvajoyê ye.

Dema hegemonîk a Romayê sîstema şaristaniyê gaveke din pêşde biriye. Heta bi Girava Ingilîstanê beşekî girîng ê Ewrûpayê cara pêşî şaristanî nas kir. Êdî bandor li jêrê parzemîna Efrîka û Hindistanê tê kirin. Hem Sasaniyan, hem Romayiyan, hem jî Hebeşiyan bi kêmbera şaristaniyê dor li Nîvgirava Erebistanê girtiye. Li aliyê din, Çîn, şaristaniya xwe bi berfirehî û bi kûrahî belav dike. Eşkere ye ku wexta em tên salên mîladî, hêzên şaristaniyê çendîn civakên mirovan tevlî pêxîrtengiyên xwe yên binyewî dikin, hinekî temenê xwe dirêj bikin jî nikarin çareseriyeke mayînde bibînin. Gotina navdar a Bûda vê rastiyê îfade dike: “Nabe ku tu agir bi agir vemirînî.” Mirov bi zêde desthilatdariyê ji desthilatdariyê bibihure, çareserî nîne. Ev rewş mîna ku qada agir pêketî ye, mirov bi

agirekî hinekî zêdetir agirê din wê gurr bike. Hilweşîna Romayê vê pîvana me piştrast dike. Di hundir de xwelihevrakişandinên mezin ên Împaratoriyan (Di demên dawî de di heman beşa zeman de pêvajoya împaratoriya pirrserî pêkhatiye), kengî ji derve jî ref bi ref bi êrişên sîstema qebîleyan re bûn yek, bivênevê hilweşîn ferz dibe. Di vê de para tevgera wijdanî ya Xirîstiyantiyê jî bi roleke girîng rabûye.

Sasanî jî di pêvajoyeke bi heman rengî de ne. Xwelihevrakişandinên hundirîn kengî bi tevgerên dînî û qebîleyî re bibin yek, dijwarbûna pêxîrtengiyê û hilweşîn bivênevê pêk tê. Sedsalên 4. û 5. ji bo Sîstema Navendî ya Şaristaniyê (Sîstema Dinyayê) dema pêxîrtengiya global e. Di bîlançoya çar hezar salên derbasbûyî de jin weke fahîşeya taybet û giştî bi temamî hatiye girtin, kirine mijara milkê taybet û giştî, bi vê jî ew kirine obje û kirine meta. Gundiyên bicihbûyî û beşê zenaetkaran ê bajêr piştî jinê û weke jinê hatine kolekirin ji bo xûkî, bac û şer veguherandine amûrê zurriyetê. Ji bilî tebeqeya jor a kirine xwedayî, bi tevahî hêmanên civaka fermî yên di kontrolê de bi pey koletiya giştî xistine û herkes bi vê bawer kirine. Şaxên şaristaniyê yên Çîn, Hind û heta gavavêtinên wê yên teze Efrîka û Emerîka hê bêtir di bin nîzamekî hişk ê 'kastîk' de ne. Berxwedan û lêgerînên li dijî vê sîstemê wê bi pêşkevin.

Mîna pêxîrtengiyên binyewî yên kapîtalîzmê, pêxîrtengiyên şaristaniyan hemû sê xisletên bingehîn ên sîstemê piştrast dikin. Ya pêşî, têkiliya navend-dewrûberê ye, tevî ku guherbar e, domdar e. Ya diduyan, di nava hêzên sîstemê de ji ber karê timî reqabet û pevçûn heye. Ya sisiyan, weke encama du xisletên pêşî, sîstem neçar e ku misêwa di pêvajoyên pêxîrtengiyê re geh bi ketin û geh bi rabûna ser xwe, derbas bibe. Encama xwezayî ya sê xisletan jî ew e, rêveberiyeke sîstemê di karekterê hegemonîk de bivênevê ye. Şaristanî bêhegemonya nikarin bimeşin. Encama hevpar a yekbûyî ya tevahiya van xisletan jî ew e ku globalbûyîn timî bi berfirehî û bi kûrahî belav dibe. Ev xisletên bingehîn şaristaniyan ji destpêkê ve neçarî globalbûnê dikin. Çavkaniya vê rastiyê ji xwezaya yekdestdarên desthilatdarî û sermayê tê. Çiqasî ji jor ber bi jêr ve û berfireh belav bibe ewqasî kar û hêz hevdu xwedî dikin û desthilatdarî

mezin dibe. Ji sedî sed di navbera wan de korelasyon ango têkiliyek heye ku alî bêyî hev nabin. Eger di roja me ya îro de şaristaniyê jiyan gelekî tengav kiribe (tevahiya daneyên civaknasiyê vê rastiyê piştrast dikin), pêxîrtengî bi mirovan bi sînor nemabe û avahiya ekolojîk jî xistibe tehlûkeyê, sedema rastî ya vê yekê ji xisleta şaristaniyê ya hilweşîner û barbartiyê tê ku ji destpêkê ve di binyeya xwe de wan dihewîne. Ya diqewime nîşaneya yên di hinavên wê de diqewimin in, û ev derdikevin holê.

## B- Berxwedanên Qebîle, Eşîr û Qewman (Etnîsîteyan)

Tevî ku sîstema dinyayê di awayê hûnandina îdeolojiya xwe de gelekî îdea dike, nîzam li gorî fermana xwedayî nexebitiye û nemeşiyaye. Eşkere ye ku ferman û nîzama xwedayî (Tevî hewldanên îdeolojîk ên piştperdekirinê hemûyî jî ji bo min maneya ‘ferman’ û ‘nîzamê’ eşkere ye) rêzik û fermanên tebeya rêveber (rêveber + esker + rahib) a li ser mayeyê civakî rûniştî, temsîl dike. Ji jor heta bi evdê herî li jêr bi hezar salan pirrî caran hûr ajotine, pirrî caran dugêsinî kirine (çawa ku mirov çil carî ji kesekî re bibêje tu dîn î, ew dîn bibe) û weke ferzeke xwedayî û mîna rastiyek be, ev hegemonya îdeolojîk dawerivandine hinavên civakê, lê tevî vê yekê, ev nîzama zilm, zordarî û talanê nikarîbûye bi temamî xwe veşêre û xwe bide qebûlkirin. Yên li derveyî sîstemê mane û timî bi ‘sefer’ên kolekirin û talanê yên sîstemê re rûbirû mane, yên di nava sîstema qebîleyan de ne. Ji lewra serhildanên eşîr û qewman li dijî van êrişan di nava pêvajoyê de mîna sîstema şaristaniyê domdar bûne. Sîstemê propaganda kiriye û navê ‘barbartiyê’ li van tevgeran kiriye. Ji ber sedemên min rave kirî, berevajiyê vê rast e; nîzama şaristaniyê ‘mekîneyeke barbartiyê’ ye. Ya naxwaze ji jiyaneke mirovane qut bibe jî nîzama komin-qebîleyan e.

Ji aliyê dîrokî ve gel hebûn, karîbûn xwe bidin nîşan û wenda nebin, lê belê divê mirov nexasim destnîşan bike ku pirraniya gelan di vê de bi serneketin. Ya rastî, divê dîrok weke ku hatiye nivîsandin nebûya. Ez ji xwe

piştrast dibêjim ku dîroka rastî ew dîrok e, nikarîbûye xwe bide xuyakirin û nivîsandin. Timî kirine ku ked, berxwedan, afirênerî û vedîtinên pirraniya civakê neyên dîtin. Bi zanebûn an jî xweber wisa bûye. Destketiyên civakî hatine desteserkirin. Kirine ku xwediyên wan ên rastî neyên naskirin, nikarîbûne binivîsînin û bidin nivîsandin. Nexasim vedîtin û keşfên jinê, tevî vedîtin û keşfên cotkar, şivan û zenaetkaran hema bêje tevahiya vedîtin û keşfan pêk tînin, lê dîsa jî dîrok heqê vê rastiyê nade. Xwedawend Înanna wexta bang li qral û xwedayên mêr dike yek bi yek vedîtin û keşfên xwe dijimêre û weha dibêje: 'Ma we 104 Me'yên (rêzik, vedîtin û keşfên civakî) min ji min ne dizîn?' Belkî ev vegotin gelek hejar û bêmane xuya bike (guh wisa hatine hînkirin), lê vegotina destana dawî ya dîroka rastî ye. Di Destana Dûmûzî û Enkîmdû de cîhana şivan û cotkaran girîngiya ked, vedîtin û keşfên xwe bi destanên bi vî rengî tînin ziman û bi vî rengî bi herhalî dîrok zêdetir nêzî rastiyê ye. Di roja me ya îro de dîrokên neteweyî yên pozîtîvîst tevî hemû gotinên xwe yên zanistî, mînakên xirab ên metafizîkê ne, û ji heqîqetê herî dûr in. Eger em sosyolojiya zanistî-pozîtîvîst a navenda wê Ewrûpa ye, bi mîtolojiya dema Sumerê re bi şîrove û lêkolînan bidin ber hev, wê nêzîkbûna heqîqetan li cem mîtolojiya Sumerê bin. Qet nebe ev pêşbîniya rasyonalîte û baweriya min e.

**Em niha berê xwe bidin mînakên berbiçav ên berxwedanên dîrokî.**

## a- Berxwedana Qebîleyên Bi Koka Xwe Semîtîk û Êrişên Wan Ên Dijber

Beriya şeş hezar salan li qada ji Sehraya Mezin heta bi rojhilatê Nîvgirava Ereb, hebûna devereke hêşîn û têrbaran bi delîlên zanistî jî tê piştrastkirin. Me gotibû sîstemeke berfireh a qebîleyan a bi navê Semîtîk, li vê atmosfera jeobiyolojîk di zikhev de pêşketiye. Ev sîstem ji salên 4000'î B.Z. ve di bin zexteke dualî de dimîne. Bi destpêkirina dema hişkesaliyên xwezayî û çolbûyînê, şaristaniyên Misr û Sumerê bilind dibin û ev herdu

rewş hêmanên zextê ne. Ango qebîleyan li hundir xwe li qadên waha digirtin, ber bi derve jî xwe li qadên hêşîn û têrbaran digirtin ku van hêmanan tevgerên mezin ên dîrokî ferz dikirin. Dîrok van tevgeran bi belgeyan piştrast dike. Belgeyên Sumerê û Misrê hertim behsa van ‘tehlûkeyan’ dikin. Misriyan navê ‘Apîrû’ ango ‘mirovên tozgirtî’ li van koçberan dikir. Ez yeqîn dikim ku Sumeriyan jî yan di heman maneyê de yan jî bi maneya ‘Yên Ji Rojava Tên’ ew weke Amorît bi nav kirine û ew weke kesên ‘Bi Tehlûke’ bi nasname kirine. Beşekî mezin ji wan dikin kole û dixin xizmeta xwe. Çawa ku di kolekirina reşikan de jî tê dîtin, em dizanin ev yek jî heta roja me ya îro bi awayekî bêrehm, dewam dike.

Sîstema kolekirinê ya li derdora şeş hezar salî, gelo di berdêla çiqas êşan de hat meşandin? Ji encamên wê kê çawa sûd wergirtin? Bi herhalî eger mirov bersiva van pirsan nede, mirov ê nikaribe dîrokeke rast binivîsîne. Ji ber ku pozîsyona wê ji bo parastinê di cih de bû, xwe ji koçberî û êrişên van qebîleyan, di heqîqetê de ji berxwedana wan, Misrê dikarîbû xwe biparêze. Sumerî li hemberî berxwedan û êrişên van qebîleyan di pozîsyoneke hînê bêparastin de bû. Qebîle û berxwedanên wan ên ref bi ref çêdibûn, em dibînin ku ji salên 1400’î B.Z. ve encam didin. Kengî êriş û berxwedanên van qebîleyan parastina Sumeran hilweşand, hingî xanedaniya bi navê Akad kete dîrokê, li sîstema desthilatdariyê rûnişt. Vê dema qral xanedantiyê di salên 2350-2150 B.Z. de hukmê xwe meşand û damezrînerê wê Sargon weke ‘împaratorê pêşî’ yê dîrokê hat binavkirin. Mirov vê rejîmê dikare weke rejîmeke ‘Proto-Asûr’ destnîşan bike. Bi nasnameya Sargon rêzikek di dîrokê de çêbû. Serekên qebîleyan di atmosfera şaristaniyan de wexta keysê lê bînin çawa vediguherin zordarên xweziya mirovan bi kefen dizan bînin. Rêzika dîrokî vê rastiyê îfade dike. Di vê de bi qasî zehmetiyên dikişînin, çavbirçîtiya wan û serxweşbûna wan li ser textê nû yê desthilatdariyê, bandorên girîng in.

Piştî duyemîn pêla qebîleyên Semîtîk dema Asûr û Babîlan pêk tê. Dema Asûr û Babîlê demeke welê ye ku bi qralên xwe yên nîv-xweda navdar e ku Sargon tînin bîra mirovan. Ji aliyê dîrokî ve li pêşketina saziya desthilatdarî û bazirganiyê zêde kirine. Bêguman di pêşdebirina saziya

koletiyê de jî ji xanedanên orjînal ên Misr û Sumerê rola wan ne kêmtir bû. Di sazîbûna klasîk a zordestî û mêtinkariyê de Babîl û Asûr bi roleke gerdûnî rabûne û mirov nikare ji vê guman bike. Mirov diyar bike ku ev ji yên Greko-Romen ne kêmtir bûn, ji aliyê rastnivîsa dîrokî ve girîng e. Demên Akad, Babîl û Asûran çand û zimanê Sumeran dawerivandin nava xwe û bi vî awayî xistin dereceya duyemîn, zimanê hevpar ê fermî kirin Akadî û Aramî. Nexasim zimanê Aramî weke Latîniya Rojhilata Navîn dihat bikaranîn, heta zimanê Erebî weke zimanê fermî yê şaristaniyê cihê xwe girt. Ji ber ku yekdestdariyên bazirganî û desthilatdariyê yên beriya xwe bi bîr dixin, ev rewşa wî girîng e. Herweha zimanê hevpar ê îdeolojîk-îlahiyatê ye. Zimanê fermî yê çanda maddî xwe weke zimanê fermî yê çanda manewî dide qebûlkirin û rewakirin.

Sêyemîn pêla mezin a şervaniya qebîleyên Semîtîk li ser navê Erebtiyê tê dewamkirin. Ji beriya Îslamê li derdora salên 500'î B.Z. êriş û berxwedanên xwe weke antî-şaristanî bi nasnameya ereb nîşan dan, bi Îslamê re di asta gerdûnî de bi rolekê rabûn. Li tevahiya Bakurê Efrîkayê, li derdora Sehraya Mezin û ji Nîvgirava Erebistanê heta bi qûntara sîstema Toros-Zagrosê belavbûn. Tevgereke mezin a qebîleyan e. Du hezar û pêncsed sal in, bêyî ku ji leza xwe tiştekî kêm bike, di heman mekanî de dewam dike, xwe dimeşîne û vediguherîne. Pêvajoya veguherîna Erebtiyê nemaze hêjayî lêkolînê ye. Ji bo fêhmkirina dewlet û desthilatdariyê, li tebeqeya jor bi sazîbûna siltantî, mîrnîşînî û şêxtiyê girîng in, û mirov dikare ji wan hîn bibe. Koka têgînên siltantî, mîrnîşîn, şêxtî, desthilatdarî û dewlet Erebî ye. Mînak koka peyva dewletê ji gotina tê maneya 'şeva şabûna bi jineke girtî re' zêde bûye. Pirr balkêş e ku dewlet weke peyv jî têkiliya xwe bi destavêtin û kolekirinê re heye. Di erebî de bi tevahî sazî û têgînên desthilatdariyê tînin hişê mirovî, maneya wan tazîbûn, zewq û dewamkirina kêfê tîne bîra mirov.

Di Ahd-î Atîkê de (Tewrat) lîsteyeke berfirehtir a qebîleyên semîtîk tê pêşkêşkirin. Çîroka qebîleya Ibranî bi xwe bi awayekî berfireh tê vegotin. Der barê vê mijarê de ku wê di beşa dînên yek xwedayî de dûrûdirêj were analîzkirin, encama mirov dikare li ser beşa pêwendîdar derxe ev e: Em bi

tabloyeke qebîleyên Semîtîk a tevlîhev re rûbirû ne. Mînak Kenanî mil û şaxek in. Aramî jî milekî din in.

'Bedewî' tebeqeya jêr a qebîle û eşîrên Semîtîk pêk tînin. Mirov dikare wan weke Erebên gundî, yên li waha û çolan şîrove bike. Bedewîtî bi qasî aliyê xwe yê qebîleyî, kategoriyek e ku maneya xwe ya civakî û çînî jî heye. Di vê çarçoveyê de Bedewîtî, Erebtiyeke cihê ye. Çawa ku li cem Tirkan Tirkmen û li cem Kurdan jî Kurmanc maneyeke xwe ya çandî û civakî heye. Ereb qewmek in, sîstemeke wan a qebîleyan heye ku weke tebeqe hem jêr hem jî jor ji dîrokê ve heta roja me ya îro di serî de Rojhilata Navîn dîroka gerdûnî herî zêde bi xwe re lebikandine û bandor lê kirine. Guhertin û veguherîna wan bi tevahiya leza xwe dewam dike. Ereb-Îsraîl herdu jî bi koka xwe Semîtîk in. Şerê wan jî dorfireh nîne, lê wexta mirov bandora wî li dinya û herêmê li ber çavan digire, wê rastiya behsa wê tê kirin baştir bê fêhmkirin û wê bê zanîn çend girîng e. Mirov heta guhertin û veguherînên di diyardeya Ereb de dibin, fêhm neke, bi temamî fêhmkirin û serwextbûna li Rojhilata Navîn û dinyayê wê kêm û zehmet be.

Ka mirov divê tevgerên lêgerîn û berxwedanê yên qewm û qebîleyên semîtîk, bi taybetî jî yên ereb di kîjan maneyê de antî-şaristanî û nava şaristaniyê binirxîne? Ev mijareke bi pirsgirêk e. Pirgirêkeke ciddî ye ku mirov a dînî û ya etnîk ji hev cihê bike. Di qebîle û qewmên din de jî pirsgirêkên jihevcihêkirinê yên bi heman rengî hene. Lê di nav Ereban de mijar tevlîhev e. Li dinyayê mijara dijbertiya sîstemê yan jî di nava sîstemê de timî di rojeva tevahiya tevgerên bi heman rengî de bû. Hem di dîrokê de hem jî di roja me ya îro de vê pirsgirêkê hebûna xwe her parast û dewam kir. Tevgerên qewm û qebîleyên Ereb û Semîtîk herdu aliyê xwe jî hene û girîng in. Li cem qebîle û qewman hem aliyê antî-şaristanî, hem jî aliyê şaristaniyê timî di nava têkoşîneke nakokî û têkiliya diyalektîkî de ne. Etnîsîte zêdetir bi aliyê xwe yê antî-şaristanî xwe nîşan dide, aliyê dînî jî zêdetir xwe weke şaristanîparêz nîşan dide. Lê mirov dikare bibêje, di navber û nava herdu tevgeran de meylên şaristanîparêz û antî-şaristanî gelekî li guhertin û veguherînê vekirîne. Şîrovegerên rêûresmî û modern di navbera van herdu aliyan de vegotineke gelekî tevlîhev pêşde birine.

Tevlîheviya vegotinê û rastnîşannedana wê ya diyardeyan li qada çalakiyê dikare rê li encamên gelekî şaş veke. Eger mirov qebûl bike vegotin bi çalakiyê re wekhev e, û bi pirranî pêştirê xwe bi xwe re hildigire, wê bê fêhmkirin ku vegotinên me yên der barê mijarê û pirsgirêkan de çiqasî di cihê xwe de ne û çiqasî girîng in.

## b- Berxwedan û Êrişên Hûrriyan

Ji aliyê etîmolojîk ve peyvên Arî, Ûr û Hûrrî koka wan Sumerî ne, û ez yeqîn dikim ku bi maneya gir, plato û koma çiyayî ye. Sumeriyan ji cîranên xwe yên li Bakur-rojhilat re ji ber cografya û erdnîgariya lê dimînin, mumkîn e ku gotibin ‘qewmê çiyê an jî xelkê li serê giran’. Jixwe ji Kurdan re ku hê jî li heman cografyayê ne, bi maneya ‘qewmê çiyê’ gelek şêweyên bilêvkirinê têne bikaranîn an jî nav li wan têne kirin. Bilêvkirina ‘Kart-kurt’ jî ji vê rêûresmê tê. Ji ber van sedeman bilêvkirina Kurdan weke ‘qewmê çiyê’ tê fêhmkirin.

Herçend Hûrrî ji aliyê etîmolojîk ve di nava koma qebîleyên Hind-Ewrûpî de bêne bicihkirin jî ji van koman hemûyan zêdetir otantîk e, ango xwedî karektereke xwecihî ye. Şîroveya min ev e, ji dema dawî ya Dema Qeşayî ya Çaremîn ve li heman herêmê dimînin û di şoreşa neolîtîk de bi rola sereke rabûne. Tevahiya lêkolînên jeobiyolojîk, arkeolojîk, antropolojîk, etîmolojîk û etnîk li ser karektera otantîk û pirr kevin ê gelê Kurd ê li heman herêmê hînê jî mayî hemfikir in.

Zanist jî tespît dike ku komên dema neolîtîkê li navenda Kevana Bi Bereket, ji Pencabê heta bi Nîlê ji bo pêşketina şaristaniyê hêmanên çandî yên maddî û manewî ku hewce dikin, şeş hezar sal berê gîhandine, stewandine. Min berê anîbû ziman ku Gordon Child, ev dema neolîtîkê ya gihiştî şibandibû Ewrûpaya piştî sedsala şanzdehmîn. Gelek lêkolîn xwe digihînin encamên bi heman rengî.

Li herêmê şopên çanda El Ubeydê di salên 4000’î B.Z. de têne dîtin. El Ubeyd çanda Mezopotamya Jêr e. Şopên wê yên di wê demê de danûstendina wê ya zêde bi çanda herêmê re nîşan dide. Ji vê jî girîngtir,

bermahiyên dema Ûrûk, Ûr û Asûrê têra xwe zêde ne. Li perav û navberên Dîcle û Firatê tevgerên koloniyan ên wê demê gelekî zêde belav û berfireh têne dîtin. Di vî warî de bermahiyên arkeolojîk berçav in. Eger wisa be, ji aliyê dîrokî ve bi qasî ku tê tespîtkirin, li ser herêmê û gelê herêmê, ji şeş hezar salî ve gefxwarineke bi kolonîkirinê û pratîka wê heye. Ji aliyên din ve jî gefxwarin û tehlûkeyên bi heman rengî pêkan û gengaz in. Nexasim di ser Qafqasan re misêwa tevgerên dagirkeriyê têne dîtin. Ji ber ku deverên şoreşa neolîtîkê lê pêşketine, deverên herî kevin û gelekî bi bereket in, çawa ku roja me ya îro mirov ber bi YE û DYE'yê ve koçber dibin, tê payîn ji her aliyî ve şêniyên deverên din berê xwe bidin herêmê. Her tim herêmên bi bereket û dewlemend bal kişandine ser xwe. Ji vî alî ve Kevana Bi Bereket heta dawiyê xwedî xisletên balkêş e.

Heye ku rewş berevajî jî bûbe. Piştî dema gihiştina sîstemê, dibe ku ji ber şêniyên zêde bûbin dever li wan teng bûbe. Ji lewra jî di serî de cîranên nêz û qadên bi bereket ên muhtemel, bibe sedem tevgerên dijber pêk bên. Belgeyên dîrokî di vê mijarê de agahî û daneyan pêşkêş dikin. Herêm nîşan dide ku çanda wê ji qonaxa xwe ya gihiştî û pêve (7000-5000 B.Z.) xwe li her devera dinyayê hem çandî (bê mirov) hem jî fizîkî (bi mirov) li gorî dema xwe bi lez belav dike. Piştî van deman hinekî bi derengî be jî ji nava Ewrûpayê heta bi hundirê Hindistanê (Koma ziman a Hind-Ewrûpî vê rastiyê piştrast dike), ji Misrê heta bi Sumeran ev nirxên çandî bi van herdu rêyan belav dibin û ev êdî rastiyeke zanistî ye. Naxwe peyvên gelê otantîk ê neolîtîkê li Hind û Ewrûpayê çi digerin! Dîsa bi sed hezaran sal in ku Nîl, Firat, Dîcle û Pêncav xwedî heman erdên bi bereket in, û em li ser erdên wan ên aluviyon ên nêzî devê deryayê çima şopa şaristaniyê nabînin. Eger em rast nêzî mijarê nebin, em nikarin bersiva van pirsan bidin. Bi qasî têgîna şaristaniya navendî, têgîna 'serdema cotkariya navendî' jî ji bo rast xwendin û nivîsandina dîroka mirovatiyê hewce ye.

Em behsa mijara gelê otantîk bikin, ya rastî mîrasa duwanzdeh hezar salî ya Perestgeha li Ûrfayê li Xirabreşkê her tiştî rave dike. Gelê herêmê yê xwe disipêre sîstema qebîletiyê, xwediyê çandeke gelekî kevin û pêşketî ye. Arkeologên bi xwe li deverê erdkolanê dimeşînin, fikra xwe tînin ziman

û dibêjin, şert e ku dîrok ji nû ve were nivîsandin. Ez bi taybetî divê destnîşan bikim ku ez di vê mijarê de xwedî nêzîkatiyeke şoven nînim. Li vir mijara em behsa wê dikin, ji bo tevahiya mirovatiyê rastnivîsandina dîrokê ye. Rastnivîsandina dîrokeke rast ji bo mirovatiyê ji her tiştî zêdetir hewce ye, û nîqaşa vê jî nayê kirin. Ji ber ku dîroka rast, mirovê rast e, mirovê rast jî jiyana rast e.

Ji ber ku bi ser wan de çûn û zordestiya li ser wan zêde bû, em dibînin ku Qebîleyên Hûrriyan di 4000-3000 B.Z. de ber bi eşîretbûnê ve diberidin. Bêguman bi belgeyên dîrokî em van dibînin. Em di van deman de li şopên çanda eşîran rast tên. Belgeyên nivîskî yên Sumeran zêdetir agahiyan der barê cîranên xwe yên li bakur-rojhilat de didin. Di beşên berî niha de kêm be jî min behsa koka Sumeran kiribû. Qenaeta min a şexsî ew e ku di encama belavbûna fizîkî û çandî ya Mezopotamya Jor de Sumeriyan hin komên Semîtîk jî girtine nava xwe û weke sentezeke çandî pêşketine. Ez hê jî xwedî li vê dîtina xwe derdikevim. Bi veguherînê Hûrrî ji aliyê eşîrî ve pêş dikevin û ev jî piştrast dike ku ew ji aliyê siyasî ve jî pêşketîne. Gavavêtina forma eşîrê bi pirranî li ser hewcedariya hevpar a rêveberî û parastinê, qonaxeke îcbarî ye. Pirsgirêkên hundir ên zêde dibin û nexasim jî yên derve ji sedî sed eşîretbûnê bi lez dikin. Dema 3000-2000 B.Z. nîşan dide ku eşîr ber bi pêkhatinên tîpa konfederasyonan ve diçin ku girêdana wan a bi hev re sist e. Pêkhatina elîtên siyasî çi di çanda Sumeran de (Dema Gudea-Gotî, 2150-2050), çi jî di çanda Anatoliya Navîn a berî Hîtîtan de (ji herêma Elbîstana îro ji Anûm Harbî ji Begên Neşali – Kultepe – nameya hatiye nivîsandin) tê dîtin. Nivîsên li ser kevalan bi zimanê Hûrrî ne.

Ji belgeyên di dest de hene em dibînin ku elîtên Hûrriyan di wê pozîsyonê de ne ku hem dikarin belav bibin û hem jî dikarin xwe biparêzin. Li hemberî zordestiya Asûran timî hewceyî berxwedanê ne. Ji ber ku li ser kanên dewlemend ên kereste û madenê ne, ev yek dihêle ku qralên Asûran timî êrişan bibin ser wan. Di encama van zordestiyan de ji du milên girîng ve bersiv ê bê dayîn. Pêşî li Anatoliya Navîn Neşa, paşê Konfederasyona Hîttîtan a navenda wê Hattûşaş (1650-1200 B.Z.), û

Mîttaniyên navenda wan Waşûkanî (1500-1250 B.Z.). Mirov bi hêsanî dikare bibêje, pêngavên zordestî, mêtinkarî û kolonîkirinê yên Babîl û nexasim jî yên bazirganên Asûran rê li ber konfederasyonê vekiriye. Em vê encamê dikarin ji dagirkirina Babîlê di sala 1596 B.Z. de ji aliyê gelên van herdu konfederasyonan, derxînin. Ez divê bi girîngî diyar bikim ku bi termînolojiya netewegir a roja me ya îro em nikarin pêkhatinên siyasî û civakî yên beriya çar hezar salan, şîrove bikin. Ya em dikin, li şûna em ti tiştî nekin û nenivîsînin, ji bo pêkanîna formeke dîrokî qet nebe vegotinan bikin ku zêde ber bi şaşiyê ve ji rê derneketibin. Divê nêzîkatiya me ya ji bo mijarê wisa bê fêhmkirin. Naxwe em bi awayekî din nikarin meylên înkar û berevajîkirinên dîrokê bişkînin.

Wer xuya dike ku Hûrrî ber bi salên 2000'î B.Z. ve hema hema li ser erdên îro Kurd lê dimînin, xwedî ne, yan jî di wê pozîsyonê de ne ku dikarin hukim lê bikin. Nemaze di encama erdkolanên til û giran de em dibînin ku hin caran koloniyên Sumer, Babîl û Asûran şewitandine, hilweşandine. Li navçeya Ûrfayê Hewengê li Girê Tûtrîşê di salên 2000'î B.Z. de deverên pêkan e ku kolonî bin, şewitandî û hilweşandî hatine dîtin. Ez hê behs dikim, divê ez bibêjim, her kesekî ji rêzê xebateke etîmolojîk dike dikare bi hêsanî bibîne ku zimanê Hûrrî, Proto Kurdî ye, ango Kurdiya Pêşî ye. Zaravayên Kurdî yên di kûrahiya çiyan de bêyî xira bibin hê li Dêrsim, Çewlîk û Zagrosan mane, nêzî zimanê Hûrrî ne, û ev jî vê rastiyê bêtir piştrast dike.

Eşkere ye ku dema 2000-1000 B.Z. li dijî kolonîtiya Babîl û Asûrê demeke berxwedanê ye. Nexasim di dema 1300-1000'î B.Z. de hegemonya Asûrê ya gelekî zêde dibe li deşta Bismil a îro (jê re Tashan tê gotin) navenda eyaletekê pêk tîne û li herêma Licê-Dara Hênê li dijî qebîle û mîregên Hûrriyan ên dewamî li ber xwe didin, seferên eskerî pêk tîne. Fîgurên qralê Asûr ê li ser tehtên nêzî Licê hatine kolan, vê rastiyê bi awayekî bi tesîr piştrast dikin. Em dibînin misêwa seferên bi heman rengî birine ser Zagrosan jî. Di belgeyên Asûran de behsa gelê Naîrî (bi maneya nehîr û çem) û Konfederasyona wî (1200 B.Z.) tê kirin. Deverên behsa wan tê kirin peravên Dîcle-Zê ne. Divê ez vê xusûsê bi girîngî destnîşan bikim

ku ev pevçûnên di navbera qral û elîtan de li ser mayeyê civakî ye. Tevî vê yekê jî Asûrî û Hûrrî weke gel timî di nava hev de bi awayekî aştiyane jiyane. Di navbera komên qebîle û gelan de bingehê şerekî sîstemîk tineye.

Hûrrî navlêkirineke Sumerî ye, lê kengî bandora zimanê Sumerî kêm bû û bandora zimanê Babîl û Asûr, Akadî û Aramî serdest bû, em dibînin ku ezbetên Hûrriyan bi navên cihê têne hildan. Wexta ku hem ziman û hem jî zêhniyeta demê guherî, bêguman di binavkirinan de jî cudatî wê bibin. Di wan deman de ti kesî ti qebîleyê ji xwe re 'Ez Ereb im, Asûr im, Kurd im' nedigot. Herî zêde bi qebîleya xwe û xwedayê pêve girêdayî bû, xwe bi nav dikir. Wisa dixwest were binavkirin. Piştî salên 1000'î B.Z. binavkirinên Hûrrî bi zimanê Sumerî şûna xwe ji binavkirinên Asûrî-Aramî re dihêle. Navên Med û Bîanîlî (Wan a îro û gelê Medyayê) di termînolojiya Asûrê de zêdetir derbas dibin. Heye ku Ûrartû navekî hê kevintir be, û ji termînolojiya Sumeriyan mabe.

Salên piştî 1000'î B.Z. dema alet û amûrên hesin in. Hesin madenek e ku peyda nabe, hemtayê xwe nîne. Mîna petrola îro li ser şer dikin. Kanên hesin û hesinkarî li rêze çiyayên Toros-Zagrosan mîna kanên sifir, gelekî zêde ne. Şaristaniya Ûrartû (900-600 B.Z.) weke şaristaniyeke hesin, hêza bi tenê ye ku karîbû li hemberî qraltiya Asûr li ser piyan bimîne. Mîregî û keyatiyên Medyayê tevî ku timî di nava berxwedanê de bûn, karîbûn di salên 612'an B.Z. de li dijî Dewleta Asûr an jî şaristaniya wê bi ser kevin. Berxwedana Medan girîng e. Li serê rojhilat ê Ûrartiyan e, wê jî li derdora sêsed salî dewam kiriye. Medan heta serweriya xwe bi destê Persan ve berda, ango heta 550 B.Z. konfederasyona xwe dewam kirin. Piştî vê jî êdî demeke cuda ye. Arîstokrasiya Medan bi Persan re di nava hevgirtinê de bi rewşa xwe ya di rêza duyemîn de razî bû û hebûna xwe welê dewam kir. Ev, di hevkariya Kurd a rêûresmî de qonaxeke bi kok e. Di **Dîroka Heredot** de bi temamî wisa tê gotin: Keyayê dawî yê Medan Astiyag weha ji fermandarê xayîn Harpagos re dibêje "Rezîlo! Te ez ji text xistim, min ew fêhm kir. Çima tu bi xwe nebûyî keya yan jî te çima Mediyekî din nekir keya, te xulamtiya ji esilzadeyên Persan re tercîh kir?" Ev îro jî pirsek e ku rastiya wê heta dawiyê di cih de ye.

Ezbetên qebîleyan ên li sîstema Toros-Zagrosan di dema Pers-Sasaniyan de êriş û lêgerînên wan ji du aliyan ve dewam dikin. Li aliyekî li dijî hevkarên xwe û li dijî arîstokrasiya Pers-Sasaniyan vedikişin qalikê teng ê qebîleyan û pê hewl didin pozîsyona xwe dewam bikin, li aliyê din jî li ser hîmê cotkarî û şivantiyê bi awayekî bicihbûyî û nîvbicihbûyî hewl didin hebûna xwe ya civakî dewam bikin. Mîna Bedewiyên Ereb bi temamî şêwazekî jiyanê yê îzolekirî li derveyî şaristaniyê heye. Serektiyên di asta eşîran de bi hêzên şaristaniyê re îdare dikin û pirsgirêkên di navbera eşîran de çareser dikin, ji bilî van fonksiyoneke wan a girîng nîne. Ji bilî avakirina begtiyên piçûk, meyleke wan a ciddî ji bo desthilatdariyê zêde xuya nake. Dema dewlet tê gotin, hevkariya bi Îran, Helen û Romayê re û helandina di nava wan de tê hişê wan. Demeke dirêj di serdema destpêkê de bi serê xwe erk ava kirin, lê tevgerên wan ên di vî warî de têra xwe vemirî ne ango êdî nikarin bi serê xwe bibin xwediyê erkê.

Ji aliyê din ve, meyla duyemîn a pêşdikeve bi koka xwe îdeolojîk e, û aliyê wê yê dînî giran e. Herçî eşîr jî hertim îdeolojiyên xwe hene. Ya behsa wê tê kirin, li ser hîmê eşîran nîne, tevgera di ser eşîran re ye. Nexasim Mîtratî, Xirîstiyantî, Cihûtî û Manîtî ji wan ekolan in ku dixwazin bi tesîr bibin. Zerdeştî-Êzîdî ya dewama Zerdeştîtiyê ye, weke şaxekî cihê ye. Ev tevger jî di çarçoveya berxwedanê de ne. Zêdetir jî di nava ref û bereyê xizanan de bi bandor in.

Di dema belavbûna Îslamê de berxwedanên gel ên bi koka xwe Hûrrî-Med cara pêşî bi navê Kurd derdikevin ser dika dîrokê. Berxwedana eşîr û qebîleyan li hemberî tevgerên dînî di dereceya duyemîn de dimînin. Piştî ku Sasanî di 650'î P.Z. de ji dewletbûnê derketin û Romaya Rojhilat (Bîzans) xwe ji Torosan dûr kir, ji aliyê berxwedan û qebûlkirina Kurdan ve demeke nû dest pê kir. Beşên hevkar ên ji rêûresmê tên, ji bo bibin xwediyê begtiyên xwe yên piçûk bi tevahiya xanedanên Îslamê re (Emewî, Abbasî, Selçûkî, Osmanî û hwd.) hevkariya xwe dewam dikin. Mîna Merwaniyan hewldanên rêxistiniya ji bo dewletê, zêde dirêj dewam nakin. Mirov Selahaddînê Eyyûbî weke Kurd, belê damezrînerê xanedaniyeke Ereb rêvebiriye, bibîne, wê bêtir li cih be. Ji ber ku ez wî piçûk dibînim vê

nabêjim, lê bi awayekî din nikarîbû bikirana. Berxwedana wî li ser navê malbatê qels, lê belê li ser navê Îslamê bi hêz e. Di vê demê de Kurdên xizan bi navê Kurmanc zêdetir li derveyî sîstema şaristaniyê dimînin. Kurmanc hem ji qebîleyê, hem jî ji sîstema şaristaniyê qut bûne û weke malbatên piçûk li bajar û gundan, zêdetir jî bi nîv-koçeriyê, bi cotkarî û rêncbertiyê debara xwe kirine û bi vî awayî bi berxwedanê xwestine hebûna xwe dewam bikin.

Malbatgirî û qebîleparêzî di asta îdeolojîk de hê jî gelekî bi hêz e, û di çarçoveya vê qalkirinê de mirov dikare vê yekê fêhm bike. Nûnerê dawî yên komên timî mîrasa qebîleyên herî kevin û otantîk ên dîrokê dewr wergirtiye, Kurd in, û ji lewra jî mirov dikare cîhana vê zêhniyeta wan fêhm bike. Ewqas li derveyî şaristanî û diyardeya siyasetê hatine hiştin, diyarde û têgînên bi vî rengî zêde nas nakin, fêhm nakin. Ya rastî, hegemonyayên îdeolojîk û bermayên wan derfet û îmkanên fêhmkirinê nadin. Rewşa tebeqeya jor a hevkar cuda ye. Şaristanî û siyasetê nas dikin. Di pratîkê de kî destê xwe nade berjewendiyên wan, bi wî re dimeşin. Ti pîvana wan nîne. Yek pîvana wan a bi tenê heye: hêz û berjewendî. Kî li desthilatdariyê dibe bila bibe, eger ji berjewendiyên wan re bibêje erê, ti nirxa civakî nîne ku pê re xiyanetê nekin. Bi kurtî, li ser hîmê xiyaneta bi tevahiya nirxên civaka exlaqî û polîtîk re bi têkiliyên berjewendî û hêzê, jiyana xwe ewle û misoger dikin; ev yek xisletek e ku di kêm civakan de tê dîtin, belê weha xuya ye ku di hevkariya Kurd de weke pêkhatineke dîrokî ye.

Eger mirov Hûrriyan weke milê Aryenan ê Rojava bi nav bike, hingî dikare qebîleyên Persan jî weke Aryenên Rojhilat bi nav bike. Nêzîkbûnên wan ên civakî, dîrokî hene. Jixwe ev rastî di organîzasyona Med-Persan de berçav e. Ji lewra der barê Persan de, der barê Îraniyên îro de hewce bi analîzeke cihê nabînim. Heye ku komên Aryen ên li Belûcîstan, Pakistan û Afganistanê rolên bi heman rengî di dîrokê de parve kiribin. Gotinên der barê Hûrriyan de mirov dikare berbiçav bike û ji bo tevahiya ezbetên qebîleyên Aryen vebêje. Cudahiyên di navbera wan de her pêşde diçin û bi vî awayî tabloya îro derdikeve holê. Eger berxwedana dîn û qebîleyan hê

evçend gurr û geş be (mîna li Afganistan û Pakistanê), ev nîşan dide ka hîmên wê yên dîrokî çiqasî kevn û bi hêz in.

## c- Berxwedan û Êrişên Qebîleyên Ûral-Altay

Xeleka dawî ya çanda Ûral-Altayê mirov di ezbetên qebîleyên navbera Çiyayên Ûral-Altayê de dikare bibîne. Herçend ji dûr ve nêzîkatiya wan bi Çîniyan re hebe jî ji aliyê pêşketina çandî û sedema nakokiya şaristaniyê ve veguherîne komeke gelekî cihê. Ji pêkhatinê ve bi şaristaniya Çînê re ketiye nakokiyê. Mîna nakokiya Hûrrî-Sumer, nakokiyeke qebîle-şaristaniyê çêbûye. Ev komên Hûn û Moxol ên Proto-Tirk di navenda wan de hene, ji salên 1000'î B.Z. ve li qadeke seriyekî wê digihêje herêma şaristaniya Çînê, seriyê din digihije şaristaniya Romayê, li başûr jî digihîje şaristaniya Persan, timî di nava tevgerê de bûne. Mîna li Erebistanê li vê herêma bi navê Asya Navîn jî ji ber çolbûn û ji ber zordestiyên çavkaniya xwe hêzên şaristaniyê ne, jiyaneke berxwedan û têkoşeriyê mecbûrî bûye.

Çavkaniyên Çînî di sedsala 3. B.Z. de balê dikişînin ser tehlûkeya ji Hûnan çêdibe. Behsa Xanekî navê wî bi Tirkî kirine Mete Xan, dikin. Bi pêşengiya Mete Xan di 209'an B.Z. de behsa êrişên qebîleyên Hûn tê kirin. Dibe ku ya rast ew be, mirov vê pêvajoyê heta salên 1000'î B.Z. bibe. Şaristaniya Çînê heta salên 1500'î B.Z. diçe. Ji ber ku nakokiyên qebîle-şaristaniyê misêwa hene, mirov dikare bibe heta salên destpêkê. Jixwe benda Çînê vê rastiyê nîşan dide.

Em dizanin ku ev kom ji salên 7000'î B.Z. ve ji Başûrê Sibîryayê daketine. Milekî wan jî di dîrokeke nêzî vê demê de ji Tengava Bering derbasî parzemîna Emerîkayê dibe û ev yek jî bi lêkolînên etîmolojîk û antropolojîk tê piştrastkirin. Dibe ku di salên 4000'î B.Z. de civaka neolîtîk nas kiribin. Şaristaniya Çînê û hişkesalî, di rewşa wan de rê li ber guhertinên bingehîn vedike. Ji ber van şert û mercan weke komên Semîtîk dikevin pêvajoyeke heta dawiyê bi liv û lebat, û ev jî vê fikrê piştrast dike. Kengî di êriş û berxwedanên xwe yên li beramberî Çînê de zêde encamê nagirin, em dibînin ji sedsala 3. P.Z. ve berê xwe didin Rojava. Em ji

çavkaniyên Îranê dizanin ku ji mêj ve weke 'Tûranî' behsa van koman hatiye kirin. Ji ber ku cîranê başûr-rojava yê Îranê ne, heye ku têkiliyek wan a xurt çêbûbe. Împaratorê Pers Îranê Kyros di nava tixûbên Qazaxistana (Masagete) îro de bi van komên ji wan re Skît dihat gotin, bi milekî wan re şer kir û kuştina wî ya di şer de karekterê têkiliyê têra xwe nîşan dide. Eger em bînin bîra xwe Skîtan ji bakurê Çemê Tûnayê heta bi herêma Asya Navîn di navbera sedsalên 8.-6. B.Z. de konfederasyoneke bi hêz ava kiriye, em dikarin çarçoveya nakokiyan baştir texmîn bikin.

Ji ber ku Skîtî bi koka xwe Qafqasî û Asya Navînî ne, rewş naguhere. Hêzeke girîng a antî-şaristaniyê ye. Baş ji hev nayê derxistin, gelo ji ber zordestiyê ketine nava tevgerê, yan jî çav berdane herêmên dewlemend ên şaristaniyê û tevgeriyane. Di navbera herdu mijaran de rewşek heye ku heta dawiyê derbasbûna ji aliyekî ber bi aliyê din ve dide. Şaristanî hemû dixwazin berfireh bibin. Encam zordestî ye. Serhildan jî ji bo serketinê nexasim xwe neçar dibîne amûr û rêbazên eskerî û siyasî yên şaristaniyê bi kar bîne, herî kêm elîtên ezbetên têkoşer xwediyê vê helwestê ne, û bi vî awayî dixwazin an şaristaniyê xira bikin an jî parçeyekî wê jê veqetînin. Di herdu rewşan de jî rê li ber belavbûna sîstema şaristaniyê vedikin. Mîna ku li cem Akadan hat dîtin. Serekên qebîleyan ên xwîna teze ne, ji ber ku hînî nîmetên şaristaniyê bûne yan wê tercîha xwe ji bo helandina nava şaristaniya li dijî wê şer dikin, bikin an jî wê tercîha xwe ji bo avakirina şaristaniyeke nû bikin. Jiyana serekên qebîleyan bi sînor be jî li ser heman nîmetan ava bûye. Ango jiyaneke pêş-şaristanî ye.

Di Destana **Şehnameyê** ya navdar de dûrûdirêj behsa şerê Îran û Tûranê tê kirin. Peyva Tûran bi tenê Proto Tirkan nagire nava xwe, mirov dikare bibêje ku tevahiya komên li herêmê îfade dike. Çawa ku tê zanîn ezbetên Tûranan car caran heta bi Hindistanê diçin û dikevin herêmê. Dîsa tê zanîn ku gelek caran dikevin herêmên Îran, Afganistan û Pakistanê, û konfederasyonên demî ava dikin. Konfederasyona qebîleyan a Hûnan di serê sedsala 5. B.Z. de li Macaristana îro ava kirin, bi pêşengiya Atîlla heta ku bi ber deriyê Romayê ve biçe, bi tesîr bûye (453 P.Z.). Eger Papa lavahî nekirana, belkî jî berî Gotan (ezbetên Germenan) wan Roma bigirtana.

Dîsa hatibûn ber deriyê Romaya Rojhilat. Ji heman koman Avaran tevahiya Başûrê Rûsyayê kiribûn bin tesîra xwe. Herweha hê tevgerên gelek komên bi heman rengî hene. Kîmmer û Skîtan di sedsala 6. B.Z. de heta ber deriyên Ûrartûyan û sînorê Lîdyayê (Qraliyeteke di sedsalên 7.-6. B.Z. de li Rojavayê Anatolyayê hatiye avakirin) her dever serûbinîhev kiribûn. Bi awayekî komên Semîtîk çawa li hemberî şaristaniya Sumer êriş û berxwedan pêk anîn, van koman hemûyan jî li dijî şaristaniya Pers-Romayê bi awayekî bi tesîr berxwedan pêk anîn. Kîn û rika xelkên qebîleyan li dijî şaristaniyê rasterast bi 'barbartiyê' tê gunehbarkirin, bi ya min, li şûna helwesteke bi vî rengî hewcedarî bi şîroveyên zanistî hene.

Di nava sînorên Moxolîstana îro de cara pêşî em dibînin ku bi navê Goktirkan di salên 550 P.Z. de begtiyek tê avakirin. Em cara pêşî li vir li peyva Tirk rast tên. Begtiya li vir hatiye avakirin dişibe konfederasyona eşîran. Ji ber nakokiyên navxweyî temen kin e. Ûygûrî jî ezmûneke din a pêş-şaristaniyê ya berî Îslamê ye. Di vê pêkhatinê de ku salên 750'î P.Z. hat avakirin, dînê Bûdîzm û Manî bi tesîr in. Şaristaniyeke bi Çînê re reqabetê bike, xuya nake. Heta ku Îslamiyet bikeve herêmê, li naverastê qebîleyên antî-şaristanî serwer in. Ev rewşa koçer-bicihnebûyî bi ketina herêmê ya Îslamê re bi awayekî bi kok vediguhere.

Derketina Îslamê bi maneya dawîhatina li şaristaniyên serdema destpêkê û gavavêtina şaristaniyên serdema navîn, bi awayekî bingehîn rê li veguherînan vekir. Di destpêk û derketinê de li dijî şaristaniyê bû, lê piştî demeke pirr kin bû bingehê şaristaniyê, ev guhertinek e ku divê mirov bi girîngî li ser raweste. Tevî ku xwe spartiye Bedewiyên Ereb ên dijî-şaristaniyê û bûye hêza hegemonîk a serdema navîn, di sîstema qebîleyan a Asya Navîn de ku lê gelek şerên navxweyî hene, veguherînên kirine hêjayî lêkolînê ne. Belavbûna şaristaniyê ya Şaristaniya Çînê bi hezarên salan nikarîbû bike, Îslamiyetê di demeke pirr kin de heta bi sînorên Çînê kir û mirov dikare vê yekê weke şoreşa şaristaniyê bibîne. Mîna navê Kurd û Kurdistanê, navên Tirk û Tirkistanê jî di dema Îslamê de hatine bikaranîn. Ev diyarde rola Îslamê ya di qewmkirinê de eşkere li pêş çavan radixe. Ji qebîleyê derbasbûna qewm navê welat û qewm ferz dike. Di

sedsala 10. de pirraniya ezbetên Tirkan berê xwe dan Îslamê. Di Îslambûna Tirkan a bi awayekî lezgîn de du hêmanên girîng rola xwe hene: Îslamiyet mîna Çînê koleker nebû, û Îran li pêşiya wan bendeke girîng bû, bi hilweşîna împaratoriya Îranê re rêya Îranê vebû. Di dîroka Tirkan de qonaxa herî girîng bi gavavêtina wan a şaristaniya Îslamê pêk hatiye. Ji ber ku arîstokrasiya qebîleyan bi lez ber bi dewletbûnê ve diçe, pê re Tirk û Tirkmenî jî ji hev dibin. Ev jihevbûn dişibe ya Ereb û Bedewiyan û ya Kurd û Kurmancan. Tirk nav û nîşana beşê dibe şaristanî, Tirkmen jî dikeve rewşa antî-şaristanî û dibe nav û nîşana beşê misilman ê sîstem wî li derve dihêle. Nakokiya qebîle û çînan ketiye zikhevdu.

Divê mirov baş fêhm bike ku Îslamiyet di heman demê de tevgereke çînî ye (tebeqeya navîn û jor). Tirkan ne bi tenê li Tirkistanê pozîsyona xwe qehîm û têkûz kirin; bi Xanedaniyên Selçûkî û Osmanî di salên 1000-1900'î de bi rola hegemonîk rabûn. Berxwedan û êrişên xwe zêdetir li dijî Împaratoriya Bîzansê meşandin. Anatolya bû Tirk-Îslam, Tirkmen li Rojhilata Navîn û heta li gelek deverên Balkanan nexasim li deverên ji heywan xwedîkirin û koçeriyê re baş bûn, belav bûn. Bi awayekî bingehîn Tirkmenan qebîletî meşandin. Di belavbûna Tirkan a Rojhilata Navîn de nakokî û şer di navbera Tirkên bi pey erkê ketibûn û hêzên qewmên din ên erkê de qewimî. Pozîsyona Tirkmenan bêtir aştiyane bû û ji lihevkirinê re vekirîbûn. Di şaristanîbûna Tirkan de mirov bi hêsanî dikare bibîne ku çavkaniya şer diyardeya hêzê ye. Piştî ezbetên Tirkan li herêmê ango Asya Navîn duyemîn tevgera mezin a berxwedan û êrişan, xizmên wan ên nêz ezbetên Moxolan meşand. Hem jî bêyî Îslamê meşandin. Sedsala 13. ji awirê dîroka gerdûnî sedsaleke Moxolan e. Hêzên Moxol ên ji Rojhilata Dûr heta bi Ewrûpayê tevahiya Avrasyayê fetih kirin, bi karektera xwe ya dijî-şaristaniyê balê dikişînin ser xwe. Li tevahiya Rojhilata Navîn jî belav bûn. Eger bixwestana dikarîbûn şaristaniya Ewrûpayê ya hê nû bi pêş diket bi tevahî xira bikin. Şaristaniya Çînê jî kirin destê xwe. Lê li gora heman qaîdeyê, ew jî di nava sîstema şaristaniyê de heliyan. Tîmûr gavavêtineke bi heman rengî bi hêzên nîv-Tirk û nîv-Moxol di tevahiya sedsala 14. de pêkanî. Herdu hêzan, Abbasî jî di navê de, Xanedanên Selçûkî û Osmanî jî

têkbirin. Lê belê hêza bi hezarê salan ceribandî ya mekîneya şaristaniyê, serekên pêşketî yên van qebîleyên cîhangîr kirin nava xwe, û karîbû bi awayekî hosteyane xwe zêde û mezin bike.

Di çarçoveya Rojhilata Navîn de li peravên Egeyê di dawiya salên 1200'î B.Z. de bi şikestina Troyayê tevgerên qebîleyên Trak ên dest pê kirin heta bi nava Anatolyayê belav bûn, hin qraliyetên mîna Frîgyayê pêkanîn, ezbetên ji wan re Qewmên Sû tê gotin Hîtîtî hilweşandin û heta bi şaristaniya Misrê çûn. Ev jî ji êriş û berxwedanên girîng ên qebîleyan in. Qebîleyên Îyon (Ion) Aîol (Aeol) û Dor ku Helen wan weke pêşiyên xwe dibînin di salên 1200'î de şaristaniya Mîken hildiweşînin, piştî demeke dirêj li herdu aliyên Egeyê dewletên bajaran ên ji aliyê dîrokî ve gelekî girîng in, ava dikin (700-500 B.Z.) û Anatoliyê ji nû ve kolonîze dikin. Ev gavavêtinên girîng in. Ev gavavêtinên welê ne ku li ser çanda Rojhilata Navîn û şaristaniya wê şopên mayînde dihêlin. Qebîleyên Trak di nava çanda herêmê de heliyan, lê ezbetên qebîleyên Helen mohra xwe li çanda herêmê xistin. Helenîzm di şaristanî û çanda Rojhilata Navîn de damar û reheke bingehîn e.

Qebîleyên bi koka xwe Qafkasî, bêguman têkiliyên wan bi Rojhilata Navîn re zêde bûne. Li dijî şaristanîbûnê, berxwedan û êrişên girîng kirine. Ji bilî Skît û Kîmmeran jî mînak hene. Heye ku Gurcî û Ermenî jî serhatiyên xwe yên bi heman rengî hebin. Li Qafqasan ku mîna welatê jiyana qebîleyan e, komên qebîleyan ên li vir, ji Sumeran ve misêwa çûne herêmê û hatine. Li rengên çanda herêmê reng zêde kirine û di dijberiya şaristaniyê û bi hêzbûna wê de bi roleke girîng rabûne. Di rêza çaremîn de weke hêzeke êriş û berxwedanê ya qebîleyan, mirov dikare wan di dîroka herêmê de bi cih bike. Bûyerên di roja me ya îro de diqewimin, vê rastiyê piştrast dikin.

Weke encam sîstema qebîleyan, hem ji aliyê sîsteman ve bi giştî, hem ji aliyê şaristaniya navendî ve bi taybetî, bi karektera xwe ya derveyî sîstemê û karektera xwe ya dijî-şaristaniyê misêwa ji sîstemê re bûye xwîna teze û bi vî awayî di dîroka gerdûnî de pozîsyona xwe dewam kiriye. Di pêkhatin û dewamkirina sîstemê de bi awayekî bingehîn ketiye nava nakokiya

diyalektîkî. Timî ji bo şênî û nufûsê bûne çavkanî, ber bi malbatgirî û xanedantiyê ve veguherî ye. Veguherîna sîstema qebîleyan ber bi xanedanî û saziya malbatî ve ji alî civakî ve ango ji aliyê dîrokî ve yek ji veguherînên girîng e. Malbatgirî û xanedantî ew sazî ne ku li ser hîmê înkara sîstema qebîleyan bi pêş ketine. Divê mirov van xisletên wan baş fêhm bike. Lê li ser hîmê vê veguherînê xizmeta şaristaniyê kirine û xwe bi wê xwedî kirine. Di cewherê sîstema qebîleyan de têkiliyên azad-wekhev û antî-şaristanî serdest in. Malbatgirî û xanedantî vî cewherî (hebûnê) înkar dikin, û ji ber ku saziyên alîgirê şaristaniyê ne, hewl didin bi îhtîmam qalikê qebîleyê (Emewî, Abbasî, Selçûkî, Osmanî û hwd.) biparêzin. Di dewamkirina şaristaniyê de li serê herî jor û li jêr hêza beşekî mezin ê çavkaniyên têkiliyan pêk tîne, ev herdu sazî ne. Ango ev herdu sazî nebin şaristanî bi hêsanî nikare hebûna xwe dewam bike.

Hey cihê wê hatiye, xusûseke din a girîng heye ku divê ez balê bikişînim ser: Rêxistiniyên tîpa qebîleyan xisletên civakbûyînê ne ku dest ji wan nabin. Ji ber ku klan jî bi pêş xistiye û girtiye nava xwe, tevlî xwe kiriye, rêxistiniya mirov a bingehîn a gerdûnî ye. Mirov şêweyên riziyayî û veguherî yên modernîteya kapîtalîst, malbat û xanedan ên tîpa 'şîrket' jî lê zêde bike, mirov ê xisleta wê ya gerdûnîbûnê baştir fêhm bike. Herweha me bi awayekî pirr eşkere nîşan da ku tevahiya pêkhatinên hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê bêyî malbat û xanedantiyê nabin. Lê divê mirov karekterên sîstema qebîletiyê yên weke antî-şaristanî û azadî-wekhevîxwaziyê ji şêweyên 'şîrketkarî', 'malbatgirî' û 'xanedantiyê' yên çavkaniya wan rizîn, hêz, koletî û kar e, bi girîngî ji hev cihê bike. Şaristaniya kapîtalîst (modernîte) jî di navê de, guherîn, veguherîn û jêbihurîna tevahiya sîstema şaristaniyê jî di navê de, di her cure sazîbûna civakî ya nû de ku wê bê avakirin, sîstema qebîleyan belkî jî di atmosfera pêşketî ya zanistî de wê hê bêtir bi awayekî wekhev û azad cihê xwe biparêze.

Pêkhatinên tîpa dewletên bajaran, împaratorî û dewletên netewe, tevî ku îdeolojiyên fermî gelekî propagandaya wan dikin jî avahiyên civakî yên bingehîn nînin û nabin avahiyên civakî. Li gorî şêweyên mezinbûnê hatine

rêzkirin û navendên hêz û karê ne. Ango rêxistiniyên bingehîn ên şaristaniyê ne. Mekîneyên kar û zorê yên li ser civakê ne. Tîpa dewleta bajêr hindik be jî dikare li civakê kêm tiştan zêde bike. Ji ber ku bi pirsigirêkên piçûk û civakî di navhev de ye. Ango hinekî dikare bibe hêza çareseriyê û hestyar be. Bêguman eger ew jî li demokrasiyê vekirî be. Di vê mijarê de mînaka dîrokî demokrasiya Atînayê ye. Tîpên împaratorî û dewletên netewe, bi giranî hêmanên xwe bi armancên şîddet û karê (bac, rant, faîz û heta heqdest) ve hişk girêdayî ne, û organîzasyonên li derveyî civakê yan jî di ser wê re ne. Beşekî mezin pirtûkên dîrokê ji macera û serhatiyên van ên xwînrij re hatine veqetandin û ev jî li gorî hegemonya îdeolojîk e. Dîroknasê mezin Fernand Braudel bi awayekî mafdar di dawiya pirtûka xwe ya bi navê '**Di Dema Felipe'yê II. De Deryaspî**' de dibêje ew naxwaze bibe destikê vegotineke bi vî rengî ya dîrokê, lê erkeke mecbûrî ya dîroknasiya heyî bi cih tîne. Braudel wexta vê dibêje hê zêdetir nêzî vegotina rast e. Di nava helwesteke welê kêrhatî de ye, rê nîşan dide ku dîroknasiyeke rast ka wê çawa be. Zanista dîrokê li ser rêya pêşketinê ye. Lê divê hê gelek qonaxan biçe. Dîroka bi hegemonya îdeolojîk a şaristaniyê barkirî, rastiya civakî-dîrokî rohnî nake, xwedî fonksiyoneke serkorkirinê ye, bêyî ku em vê ji bîr bikin, divê em xebatên xwendin û nivîsandina dîrokê bikin.

Ez bawer dikim ku pirtûkên dîrokê yên ji nû ve bêne nivîsandin, wê nexasim qîmeteke mezin bidin pêşketina sîstemên qebîleyan. Jiyana malbatê jî di navê de, xebatên ekonomîk, civakî, siyasî û îdeolojîk (dînî, hunerî û zanistî jî di navê de) bi şêweyekî li cih û nûkirî di çarçoveya qebîleyan (komin) de pêşketina wan, ji bo pêşketina jiyana civakî bi awayekî têkûz wê destjênebûna xwe dewam bike. Sazîbûna şîrketkar, malbatî û xanedantiyê ya her tiştê wan ji bo karê û modernîteya bi tenê qalikê wê maye, mirovatî nikare demeke dirêj hilgire. Mirovatî nikare razî bibe ku vê xwedatiya 'bûyî Zeus' dewam bike, ji ber ku saziya saziyan a dijberê jiyanê û lihevçêkirî ya dewleta netewe ye.

Berxwedan û êrişên sîstema qebîleyan bi sîstema şaristaniyê re kirî ji aliyê naverok û çarçoveya wan a demokratîk jî pirsgirêkeke girîng e.

Xulase, gelekî girîng e ku mirov rola van berxwedan û êrişan ji aliyê demokratîk û şaristaniya dewletdar ve hûrbikole. Ji aliyê şaristaniya dewletdar ve rola wan têra xwe hatiye ravekirin. Serektiyên qebîleyan hê di pêvajoya 'qebîlegiriyê' de veguherîn hêzên proto şaristaniyê (berşaristaniyê), bi jiyana qebîleyê ya wekhev-azad re timî di nava nakokiyê de bûn, ji ber vê yekê şerên nava qebîleyan gelekî diqewimîn, wexta bi şaristaniyê re diketin têkiliyê pêşî van hêzan di rewşeke têkçûyî de zû xwe radestî hêzên şaristaniyê dikir, tevî xwe, hewl didan qebîleyên xwe jî neçarî teslîmiyetê bikin, eger bi ser bikevin jî yan weke xanedanekî nû diçin serê şaristaniya kevin an jî bi damezrandina xanedantiya xwe şaristaniyeke nû pêşde dibin, bi gelek mînak û bi awayekî bi tesîr me hewl da vê hemûyî nîşan bidin. Lê çîrok, dîrok bi tenê ev hemû nîne.

Em dema hewl bidin mijarê ji awirê şaristaniya demokratîk analîz bikin, em ê bibînin û fêhm bikin ku hêmanê sereke yê dîroka gerdûnî di karektera demokratîk de ye. Di dîrokê de timî şaristaniyên dewletdar weke rastiya bi tenê hatine pêşkêşkirin. Nexasim di vê mijarê de dewleta netewe ya pozîtîvîst û dîroknasiya neteweyî ya bi wezîfeya korker rabûye xwediyê roleke diyarker e. Me di vê xebata xwe ya parêznameyê de hewl da dîrokê bi şemayeke kurt pêşkêş bikin û ev xebata me ya xulase jî têrê dike ku piştrast bike, cuda û rast xwendin û nivîsandina dîrokê mumkîn e. Berevajî yeqînan, dîrok zêdetir di karektera demokratîk de ye. Wexta ku li ser vî hîmî were xwendin, ne bi tenê materyalekî zêde, wê herweha were dîtin ku têra xwe pêkhatinên sîstemîk, organîzasyon û hûnandinên îdeolojîk hene. Divê neyê jibîrkirin ku nivîsandina demos, komên ne dewlet, paradîgma civakî yên dîrokê yan hîç nehatiye kirin yan jî weke boxçika pînekirî hin reşnivîs hatine nivîsandin. Herweha yên hatine nivîsandin û yên xwestine binivîsînin hatine qedexekirin, reşkirin û pirranî jî hatine astengkirin. Li ser mijara nivîsandina dîrokê ji yeqînan jî wêdetir têkoşîna îdeolojîk hatiye meşandin. Divê baş were zanîn ku dîroka heyî bi temamî dîrokeke fermî ye ku di parzûnkê îdeolojîk ê sîstemên şaristaniyê re hatiye derbaskirin. Ev neyê kirin, xwendinên dîrokê wê ne bi tenê zêhnê mirovî ango jiyanê, jiyana civakî ya manedar tengav bikin, wê di heman

demê de bikin ku ne mumkin bin. **BI DÎROKA ÇEWT JIYANA RAST NABE. YÊN NIKARIBIN DÎROKA AZADIYA XWE RAST BINIVÎSÎNIN, NIKARIN AZAD BIJÎN.**

Berxwedanên qebîleyan tevî hemû xiyanet û têkçûnan ji hêzên motor ê dîrokê ne, û eşkere ye ku bi avahiyên azadî-wekhevî yên şaristaniya demokratîk timî tahmijî ne. Qebîle bi xwe çavkaniya naqede ya kominalîzma demokratîk e. Wexta ku em têgihiştina xwe pêşde bibin, divê mirov bi tenê li avahiyên kevneşopiyê asê nebe û nemîne. Bi tayên xizmtiyê hatina cem hev nayê maneya qebîletiyê. Bi tenê xizmtiya li ser xwînê ji bo qebîlebûnê têrê û hewce nake. Nîşaneya bingehîn a civakî qebîle ye. Ji bo jiyaneke manedar a civakî şêweyekî bingehîn e. Ji bo mirov baştir fêhm bike, wexta mirov Marks jî bixwîne, bi çavê qebîleyekê nirxandin wê hê encamên nêzîktirî rastiyê bide. Anarşîst jî rêxistinên tîpîk ên qebîleyî ne. Tevgerên femînîst û hawîrdorparêz hê zêdetir nêzî vî sifetî ne. Saziyên civaka sivîl û partiyên ji navendê ve bi ser dewletê ve, xisletên wan ên antî-qebîleyî dike ku ew bibin rêxistinên bi tenê rûkeş û bi vî awayî veguherîna wan têra xwe bala mirov dikişîne, mirov difikirînin û hîn dikin.

Bi şertê ku qebîle xwedî karekterê azadî û wekheviyê be mirov dikare jê re komin bibêje. Çawa ku di dîrokê de bû, di roja me ya îro de jî şaristaniya demokratîk bi avahiyên nû yên li ser vî hîmî bê pêşdebirin, wê manedar bibe. Dîrok bi tenê meşa şaristaniya dewletdar nîne. Jê zêdetir meşa komin a demokratîk e. Jiyana hezar salan a sîstemên qebîleyan, tevahiya dîroka şaristaniyê êriş û berxwedanên wan ên serî netewandin, vê rastiyê têra xwe piştrast dikin. Ya teoriya wê divê were pêşdebirin û ji nû ve were avakirin, ev meşa bi rûmet a dîrokê ye.

## d- Di Sîstema Şaristaniya Navendî De Berxwedana Dînî Yan jî Şerên Çînî

Sîstemên şaristaniyê ji çîn û tebeqeyan pêk hatine. Hem berhema çînîbûn û tebeqebûnê ne, hem jî bilezkerên wan in. Ji tespîta diyardeya çînî

wêdetir a girîng ev e: şêweyê çêbûna wan û çawa fonksiyonel hatine kirin. Di rastiya çînî de nasname ti carî bi awayekî tazî nabêjin ‘ez çîn im’ û xwe nîşan nadin. Nexasim bi termînolojiya çînî ya Marksîst nabe ku rastiya çînî rast were pêşkêşkirin. Nêzîkatiyên zanistperest û pozîtîvîzmê weke di tevahiya diyarde, bûyer û têkiliyên civaknasî de di têkilîdanîn û diyardeya çînî de jî bi rolekê rabûye ku korker e, û ji rê derdixe. Marksîzm di vî warî de bi awayekî xurt kete bin bandora modernîteyê. Hê jî serwext nebûne ku yek ji sedemên bingehîn ên serneketina wan têkiliya wê bi vê nêzîkatiyê re heye.

Pirsgirêka tebeqe û çînên civakî hem ji aliyê têgîn-teorîk hem jî ji aliyê siyasî-pratîk girîngiya xwe diparêzin. Hewcedarî ji aliyê îdeolojîk û pratîk ve bi nûbûneke bi kok heye. Analîzên bûrjûwa-proleter bi serê xwe nikarin rast nîşan bidin ka ji aliyê çînî ve di dîrokê de çi qewimî ye. Serneketina pratîkî (ji aliyê sosyalîzma pêkhatî) têkiliya xwe bi têgihiştina dîrokî re heye. Analîzên çînî yên Marksîst ên pozîtîvîst, ji dînên klasîk ên ku gelekî rexne dikin, ti cudahiya xwe nîne û ne ev bi tenê, hê gelekî dûr in, ji bo fêhm bikin ka çima bi ser neketine. Ezmûna Sovyetê ev mînak an jî teşbîh piştrast kir: Hûn dikarin avahiyeke sed qatî ava bikin, lê eger hîmê rast û durist nehatibin danîn hûn nikarin pêşiyê lê bigirin ji bo di rojekê de hilneweşe. Kes nikare înkar bike ku rastiyeke welê neqewimiye. Berevajî ku gelekî tê îdeakirin, nêzîkatî ne zanistî bû. Eger zanistî bûya wê jihevdeketinên bi vî awayî nebûna. Mînakeke din a bi tesîr nîşan dide ku ezmûna sosyalîzma pêkhatî ji helwestên dînî zêdetir bi ser neketiye, serhatiyên Partiya Kominîst a Afganistanê ne. Li beramberî vê Talîbana dîndar hê bi hêz e, û dikare bi avakerê xwe DYE’yê û hevgirtiyên wê re şer bike.

Divê mirov çawa li xwezaya civakî binêre? Di vê mijarê de ji aliyê rêbazê ve pirsgirêkên mezin hene. Tevahiya rêbazên hatine ceribandin nikarîbûne maneyê bidin şerên mezin ên hilweşîner ên dîrokê, krîzên wê, pirsgirêkên wê yên hawîrdorê, bê karî û birçîbûnê. Mirov dikarin bibêjin; di vê de çi berpirsiyariya xwediyên rêbazê heye. Mirov dikare vê bersivê bide: Rastiya civakî yekpare ye. Bereyê zanistî jî herî kêm bi qasî bereyê

şer ji tevahiya bûyeran berpirsiyar e. Eger bi vê berpirsiyariyê nahise, wê wextê jixwe ji exlaqê zanistê mehrûm û bêpar e. Amûrekî besît ê sîstemê ye. Hingî li ser navê şerên çînî axaftinê bidin aliyekî, mafê wî tineye bi îdeaya zanistîbûnê jî rabe. Nîşaneya bingehîn a zanistê îdeaya wê ya rastiyê ye. Abîdeya dîrokî ya exlaqê zanistî Brûno; bi temamî di cih de ye ku mirov li vir wî weke mînak nîşan bide. G. Brûno di 1600'î P.Z. de li Romayê hat şewitandin. Eger bi baweriya rastiyê rabe û nikaribe di rêya wê de şewitandinê li ber çav bigire ti carî nikare behsa eşqa zanistê bike. Eşqa zanistê şertê bivênevê yê ehlê zanistê ye. Eşqa zanistê nebe mirov nabe zanyar.

Mirov dikare Hellacê Mansûr jî weke mînakeke cuda nîşan bide. Her mirovê zanistê yê di dema xwe de ji pirsgirêkên heyatî re nebûye çareserî, divê bi kêmanî bi qasî eskerekî li bereyê şer biexlaq be ango qet nebe bi qasî eskerekî li bereyê şer berdêla serneketina xwe yan bi mirinê yan jî bi êsîrketinekê nîşan bide û qebûl bike, naxwe mafê wî tineye vî sifetî hilgire. Ev rastiya me bi lêv kir, ji bo siyasetvên jî bi heman rengî ye û heta zêdetir wisa ye. Ji ber ku siyaset biryargeha sereke ya çareserkirina pirsgirêkên civakî ye, ne amûrê rant û kurtêlxuriyê ye. Eger ê ketibe vê rewşê bi rastî siyasetvan be (eger karmendekî besît ê dewletê nebe), ne bi tenê qewitandinê, Sisyphosek e ku encameke ji mirinê jî xirabtir li ser pişta xwe hildigire. Mirovatiyeke derba bombeya atomê xwariye, eger hê encameke rast dernaxe, ew mirovatî mirî ye. Yên berevajiyê wê îdea dikin, ew in ku jiyana civakî ya mirovane ti carî nas nakin.

Ne bi tenê diyardeya netewe û çîn, berê pêşî yên têra xwe xwezaya civakî nas nakin divê baş zanibin ku ne dibin mirovê zanistê, ne jî dibin siyasetvan. Ya ez dixwazim bibêjim ev e; berpirsiyarî û exlaqê siyasî û zanistî gelekî girîng e. Ez van hevokan di nava hucreya herî zor de di nava şertên cezayê hucreyê de dinivîsînim. Ji ber ku deynê mirovatiyê ye, divê ez diyar bikim ku nirxa bi tenê ya min li ser piyan digire, eşqa zanistê ye, ji bilî eşqa zanistê mirin jî di navê de ti çareyeke din nîne êşên giran ên jiyanê bidebirîne.

## a- Çîn û Dînî

Ji bo rastiya berçav a di navbera çîn û dînî de bikim têgîn, ez ê dîsa dakevim çavkaniya orjîn û resen. Bi qasî pêkhatina bajar û dewletê, mînaka Sumer ji aliyê çîn û îdeolojiyê ve jî gelekî bi tesîr û hînker e; ji çavkaniya Greko-Romen hê berfirehtir û di asta jortir de xwedî hêmanan e ku mirov ji wan hîn dibe. Kapîtalîzma Ewrûpayê weke orjîn qebûl dikin, çîn û îdeolojiya wê dixin ber lêkolînê û ev ne bi tenê ji bo Marksîzmê, ji bo tevahiya kesên xebatên îdeolojîk (zanist û felsefe jî di navê de) dimeşînin, handîkapeke mezin e. Ji encama herî dawî ya rastiya civakî wê bi qasî ya orjînal encameke rast neyê derxistin; ev yek eşkere ye. Ji gotina rahib zêdetir, ez ê hewl bidim ji kesên bi îdeolojî, zanist û felsefeyê re mijûl dibin, gotina îdeologên Sumer bi kar bînim. Li cem Sumeran di warê çîn û dînî de çi qewimî, mirov dikare jê çi dersan bigire? Ez ê di nirxandina xwe de rêbaza ji berbiçaviyê ber bi mucerediyê tercîh bikim.

Di heman demê de li zîggûratên biryargehên îdeolojîk bûn, wexta karûbarên siyaset, ekonomî û parastinê dihatin kirin nedigotin 'Ev karê ekonomiyê ye, ev jî siyaset û parastin e.' Ev kar ji hev cihê nedikirin. Mirov dihatin xebitandin, qadên hilberînê dihatin parastin. Plansaziya siyasetê jî (bi zimanê rojane yê polîtîka ekonomîk) dihat kirin. Şêwaz gelekî berçav e. Hemû di nav tevahiyê de ye. Xuya ye ku bêyî zîggûratê hebûna ekonomî, siyaset û parastinê nedianîn hişê xwe. Zîggûrat beriya her tiştî navendeke hilberandina îdeolojîk e. Li vir bawerî û têgîn dihatin avakirin. Bawerî û têgîn bi îhtîmaleke mezin ji Kevana Bi Bereket a jê hatibûn digirtin ango ji civaka neolîtîk a hezarê salan dihûnandin. Lê pirsgirêkên wan ên karibin ji wê civakê bibihurin hebûn. Ango nikarîbûn têgînên bawerî û rêzikên wan weke ku girtibûn bi kar bînin. Diviyabû veguherînin. Di avakirina civakî ya li pêşiya wan de ji ber bereketê, berhemê zêde ji aliyê hin kesan ve dihat desteserkirin û yên bi nanozikê dihatin xebitandin jî hebûn. Herweha hewcedarî bi parêzvanan jî hebû. Her kêlî dibû ku ji hundir an jî ji derve asiyek li dijî sîstemê derketibûya. Nîzama hatibû avakirin, tiştekî welê bû.

Cihgirtina di vê nîzamê de berpirsiyariya wê giran bû. Ji her alî ve ji civaka qebîleyê ya azad û wekhev gelekî cuda avahiyeke civakî mewzûbehs e.

Ferd û civaka mirov, civaka zêhniyet û baweriyê ye. Ti carî civakeke mirov a bê zêhniyet û bawerî nebûye. Eger wisa ye, hingî mijara li pêş her tiştî zêhniyet û bawerî ye. Mirov di vî alî de serketî nebe, nikare civakê bixebitîne. Afirîneriya îdeolojîk di vê wezîfeya li pêş her tiştî de bi ser dikeve. Vedîtinên îdeologên Sumerî têne zanîn. Ji dînê dayik-xwedawendê ber bi dînê bav-xweda (nîşaneya civaka mêr têde serwer), ji totemê li erdê ber bi xwedayê li ezmên, ji xwedayê her qebîleyê ber bi xwedayê bajaran, ji nûneriya yekîtiya bajaran ber bi xwedayê giştî yê erd û ezmanan, veguherînek pêk tê. Kirasê maneyê yê li têgîna xwedê hatiye fesilandin bi du qadan xwe xwedî dike: Formên ku ji hertişta ji bilî mirov û civaka wî ya em weke Xwezaya Yekemîn bi nav dikin, peyda dibin û fikir û baweriyên der barê Xwezaya Civakî de. Hêmanên çanda manewî ya kevin ji vê re pêşengiyê dikin. Amûrên nû yên rewakirinê, ango hêmanên dîn û mîtolojiyê xwe bi van çavkaniyan xwedî dikin û pêdiviyên avakirina nû ya civakî datînin naverastê. Heta bi serketinê xebatên îdeolojîk dewam dikin. Kengî bêne qebûlkirin têne bi sazîkirin, bi rêûresm dibin, mirovên wezîfedar têne diyarkirin, qurban têne pêşkêşkirin û perestgeh têne avakirin. Ev xebat hemû ji bo civaka nû ya kar û bereketê dewam bike, têne kirin. En, Enlîl, Enkî, Nînhûrsag, Înanna, Îştar, Mardûk û panteon welê dewam dike, ev der cihê wê nîne mirov behs bike. Lê eşkere ye ku xebata tê meşandin, bi armancên rewakirina civakî ne. Li vir a girîng ew e, li şûna nîzama xwedayên kevin (panteon) nîzama xwedayên nû yên ketine şûna wan, çi temsîl dike yan jî nîşan dide.

Dinyaya manewî (çand) çanda maddî nîşan dide, ev tespîteke şaş nîne. Lê çawaya wê girîng e. Ma ne em nabêjin, ga xwe di avê de dibîne, behsa mîsaleke bi vî rengê nayê kirin. Diyarbûna manewî bi awayekî pirr cuda pêk tê. Diyarbûneke besît nîne. Avakirineke rastî ye ku mirov dike mirov. Avakirin û nîşandanên çor, têgînên cihê ne. Ez timûtim hewl didim gotina xwedê analîz bikim, ji hev derxînim. Ji ber ku têgînek e, li gorî zeman û mekan maneya wê diguhere. Nêzîkatiyeke hûrûkûr a sosyolojiyê dikare

xwedê weke forma nasnameya civakî qebûl bike. Divê em forma nasnameya civakî besît nebînin. Şopandina vê formê heta bi perçikên jêr atoman çûye. Heta aniha li laboratûwarên CERNê li ‘perçikê higgs’ ango ‘perçikê xwedayî’ yê avahiya maddeyê pêk tîne, digerin. Behsa çîroka wê bê kirin wê bi cildan pirtûkan tijî bike. Ez li vir sosyolojiya pozîtîvîst nakim. Ez civakê jî weke komeke mirovên maddî yên besît nabînim. Pozîtîvîst nêzîk nabim. Haya min ji min heye ku ew nêzîkatî dîndartiyeke herî çor e. Ez dikarim bibêjim ku Xweda weke forma nasnameya civakî tevahiya gerdûna 13.8 mîlyar salî ye. Mumkîn e ku mirov bibêje; ew a tine nabe ew e. Dilê min nîne ez metafizîkeke zuha û hişk jî bikim. Ez ji bo kesên mijarê sivik bibînin hişyar bikim, vê dibêjim. Civak çawa mejiyê herî nerm ê herikîna enerjî-maddeyê ye, têgîna xwedê jî têgîna herî nerm a mane-enerjiyê ye. Kî çiqasî dixwaze, ewqasî dikare maneyê lê bar bike. Kesên hunerê maneyê kirine pîşe (em dikarin ji wan re fîlozof bibêjin) mîna ku pisporê vî karî bin. Pêxember jî herî kêm bi qasî fîlozofan hosteyê çêkirina mane û têgînan e.

Avantaja me ya der barê şaristaniya Sumerê de ew e, meşandina karan bi vî awayî hema bêje ripîrût eşkere nîşan dide. Ti mînak bi qasî şaristaniya Sumerê pêşketina çanda maddî ber bi qada manewî evçend besît û bi qasî besît jî evçend bi heybet nîşan nedaye. Îdîaya min ev e; yê-ya naxwaze bawer bike, bizane, mecbûr nîne. Panteona Sumer çîna nû ya bilind dibe û xwe dike xweda nîşan dide. Ez bi israr destnîşan dikim ku ev xusûs gelekî zelal e. Paşê di tevahiya dîroka şaristaniya navendî ya pênc hezar salî de ji tevahiya dîn, felsefe, huner û lêgerînên zanistan re bi erka kok û bingeh rabûye. Zîggûrat bi xwe vê rastiyê rave dike. Qatê herî jor panteona xwedayan e. Qatê navîn ê rahiban e, yê qasidên xwedê ye, yên hunerê maneyê pêk tînin, qatê herî jêr jî yê evd û koleyên têne xebitandin e. Ma di tevahiya dînan de em li vê sêberiya wan rast nayên? Nîzama xwedê-qasid-evd. Ma nîzama bingehîn a çînî wisa nîne? Esker + rêveberê siyasî + rahib tebeqeya jor pêk tînin, tebeqeya navîn jî ango xeleka navberê çîna navîn + burokrasî + saziyên rewakirinê (zanîngeh, perestgeh û

medya) pêk tînin. Yên herî li jêr jî her kesê li derveyî herdu çînên din dimînin, pêk tînin. Proleter, gundî, karmend, xwendekar, jin, bêkar û hwd.

Sumerî ji bo damezrînerên maneyê yên piştî wan bên nikaribin zêde derewan çêkin, cewherê meselê bi awayekî besît û bê fêhmkirin avakirine. Ez wexta dibêjim besît, mebesta min lîstika şanoyê nîne, ez dixwazim bibêjim, hunerê têgînan bi qabîliyeteke mezin pêk anîne. Wexta em tên dema împaratoriyên Akad, Babîl û Asûran em dibînin ji nav panteona pirrxwedayî xwedayek bilind dibe, derdikeve ser hemûyan û yên din dike alîkarê xwe. Eşkere ye ku erk û hêz çendî dibe navendî panteon jî ewçend navendî dibe. Wexta ku dor tê qralên her gotina wan qanûn û rêzik e, êdî derî li baweriyên mutleq û yek xwedayî vedibe. Di civaka neolîtîk de her klan û qebîle xwedayekî xwe hebû. Çiqas klan û qebîle ewqas jî xweda. Civak çendî mezin û yekbûyî bibe, çînayetî pêş bikeve û rêveberiyên jor pêk bên, heta rêveberiyên yek kesî pêk bên, hejmara xwedayên me jî wê ji pirraniyê ber bi yekî ve kêm bibin. Temsîl gelekî zelal tê kirin. Herweha di civakê de jin çiqasî bandora xwe ji dest dide, cinsiyeta xwedayên me jî diguhere. Xwedayên mêr, bav, bavpîr peyda dibin.

Ya em xêz dikin şemayek e. Bêguman pêvajo hê bêtir tevlîhev û bi şeran derbas dibe. Rahib dema dînên xwe nêzî mîtolojiyan ava dikin, asta baweriyê ya mirovên di dema xwe de li ber çavan digirin. Ya di bin hîmê serketina wan de ew e ku tiştên ava dikin li gorî dema xwe pêk tînin. Ferd û civaka wan çendî biguheriya, wê dîn jî veguheriya. Ji aliyê din ve, yên vê hûnandina xwedayan li gorî berjewendiyên xwe nebînin, li gorî bawerî û fikra xwe ya ferdî nebînin, wê hebin. Şerê berjewendiyan hem di hundirê civakê de hem jî li derveyî wê bandorê li baweriyan neke, nameşe. Şerê ferd û çînan wê xwe di şerê dîn û xwedayan de nîşan bide. Divê mirov vê rêzika civakî baş bizane: şerekî mezin ê hunerê maneyê neyê kirin, ti şerekî ciddî yê çînî nayê kirin. Bi dest û dilên tazî şerên bi hêz û mayînde nayên meşandin. Berevajiyê wê rast e. Aştî û ahengên mezin ên civakî, bi aştî û ahengên di navbera hunerên mezin ên maneyê de pêk tên.

Mekîneya me ya şaristaniya navendî wexta ku ji bajarên Sumeran bi rê diket, xwedayên xwe jî bi xwe re barkiribûn, hilgirtibûn. Bêyî ku di xetên

sereke de guhertineke ciddî bibe, salên 1600'î B.Z. di dema pêxîrtengiya Babîl de guhertina li cem hêzên desthilatdariyê ji aliyê dînî ve jî rêveqetîneke bi alternatîf ferz dikir. Pêxîrtengî û ketin, gumana ji nîzamê û ketina şikê ya ji wê bû. Guman û ketina ji baweriyê ya der barê xwedayên panteonê de, nedibû ku xwe nîşan nede.

## b- Derketina Holê ya Dînê Brahîmî

Mirov dikare texmîn bike ku Nemrûdên (qral û rêveberên payebilind) Babîlan jî li demeke bi vî rengî ya pêxîrtengiyê rast hatine. Di dest de dîroka rast nîne. Rîwayetên der barê hezar salan berê de hene. Lê em dikarin bi krîterên zanistî yê manedar ên roja me ya îro şîroveyên nêzî rastiyê weke bingeh pêşde bibin. Eger em qebûl bikin ku dîrok hunerekî şîroveya dîrokê ye, hêza her şîroveyê bêguman wê bi nêzîkbûna wê ya rastiyê were pîvan.

Devera Brahîm jê xurûc kiriye ango jê hîcret kiriye an jî derketiye Ûrfa ye. Şîroveya civakî-dîrokî ya Ûrfayê dikare me nêzî rastiya dînê Brahîmî bike. Herweha eger em dema derketinê ya tê texmînkirin û dema wê ya bihurandî li ber rohniya dîroka gerdûnî şîrove bikin, em ê karibin gaveke din nêzî rastiyê bibin. Divê em bi tevahî nebin hezkirekî çavkorî yê rastiyê. Ji ber ku rastiyeke bi vî awayî tineye.

Devera Ûrfayê bi jeobiyolojiya xwe ya berfireh, piştî Dema Qeşayê ya Çaremîn ji bo komên mirovan weke buhuştekê xuya dike. Rewşeke welê ya avhewayê lê heye ku bi awayekî xwezayî tê avdan. Em ji xebatên zanistî yên pêwendîdar wer fêhm dikin ku bi flora û fauna xwe devereke balkêş e. Di qonaxekê de ku mirovatî piştî sedhezar salan bi zimanê sembolan dipeyive, mirov dikare li vê deverê li bendê be ku mirovatî gavên mezin biavêje. Herweha ji ber Rîfa Rojhilat a Efrîkayê çavkaniya rêya mezin a derketina mirovan e, mîna stasyona belavkirinê ya mirovan e. Şert û mercên wê hene ku mirovên xwedî ezmûn jî wê teqdîr bikin. Mirov dikare bibêje ji bo insanê wê demê ji aliyê debar, cihûwar, parastin û zêdebûnê gelekî di cih de ye.

Kevirên tîk ên di erdkolana li Xirabreşkê de hatin dîtin, bi awayekî vebirrî zelal bû ku yên perestgehekê ne, û herî kêm dîroka wan duwanzdeh hezar sal berê ye. Mirov dîrokê bibe 15.000 salan wê zêdegavî nebe. Ji ber ku avakirina perestgeheke bi vî rengî, li pişt wê çandeke hezar salan nebe, nayê lêkirin. Ev tespîta zanistî û şîroveya jeobiyolojîk li hev dikin. Ji panzdeh hezar salan zêdetir demek e, sîstemeke bi hêz a qebîleyan heye. Ji ber ku perestgeh temsîla sîstema qebîleyê dike. Her qebîle perestgeheke xwe ya çemberwarî ya piçûk heye. Dibe ku di bin erdê de mînakên wê yên din jî hebin. Mînak li ser girên nêzî Harranê jî bermahiyên perestgehên bi heman rengî yên nîv-çember têne dîtin. Gundiyên îro û heta bajarî jî xwedî teknîka çêkirina kevirên tîk nînin. Wê wextê mirov dikare bibêje ku insanên wê demê di rewşeke pêşketî de ne. Mezinahiya perestgehê çil qat ji ya Mekkeyê (di dema derketina Îslamê de) mezintir e. Jixwe perestgeha li Mekkeyê avahiyeke besît a bi keviran e. Hingê mirov dikare pîroztiya Ûrfayê û rola wê ya navendî bibe demekê ku herî kêm bi qasî panzdeh hezar salan wêdetir e. Di wê demê de ne bi tenê Mekke, ji aliyê mezinahî û zeman ve ji Quds (Di dawiya salên 1000'î B.Z. de hîmê perestgeha pêşî ji aliyê kurê Dawid, Silêman pêxember ve hat danîn) û bi tevahî deverên pîroz ên bi heman rengî gelekî mezintir û kevintir e. Şîroveya min a şexsî ev e; dever heta bi dema Brahîm herî kêm bi qasî deh hezar salan weke qada navendî maye.

Ev dema weke neolîtîkê tê binavkirin tê maneya navendeke dinyayê ya deh hezar salî û li vir têgîna navendê girîng e. Em ji têgîna şaristaniya navendî ya pênc hezar salî zêdetir jî dizanin ku têkiliya navend-dewrûberê di dîroka gerdûnî de dewamî ye. Dîroka bê navend nabe. Di dîroka şaristaniyê de têkiliyên navend û dewrûberê gelek caran cih guhertine. Ti mekan bi hezarên salan rewşa xwe ya navendî nîne. Devera Ûrfayê ji ber ku navenda pêşî ya mirovatiyê ye, û ji aliyê zemanê bihurandî ve mekanekî bêhemta ye. Xisleteke wê ya din jî otantîkbûna mirovên li wir in. Belkî jî yên ji derve hatibin û li wir bicih bûbin hebin. Lê gelê perestgehên li wir avakirin her tim li wê deverê man. Di dîrokê de qebîleya cara pêşî navê wê hatiye hildan Hûrrî, yek ji devera bingehîn a lê bicihbûyî Ûrfa ye. Paytexta

Împaratoriya Mîtannî (Waşûkanî-Serêkaniyê-Ceylanpinar) ya bi koka xwe Hûrrî li vê herêmê mezin bû û ji bo serwextbûna me li nasnameya gelê otantîk derfet û îmkanan dide. Herweha navenda Kevana Bi Bereket e. Gavavêtinên çandî yên çavkaniya xwe Kevana Bi Bereket her alî û dever nexasim jî şaristaniya Sumer û Misrê xwedî kirine û ji sedî sed di vê de bi rola sereke rabûne. Rîwayeta sefera Brahîm a Misrê û têkiliya wê bi Babîlê re vê rastiyê piştrast dike. Hîksosên li Misrê xanedanî ava kirin (salên 1800 B.Z.), tê zanîn ku çavkaniya wan dîsa ev dever e. Perestgeh rastiyeke din derdixin holê. Mirov dikare texmîn bike ku çanda diyarî û ziyafetê yek ji karên girîng ê perestgehê ye. Ev rastî îşaretên piçûk ên derketina holê ya bazirganiyê jî dide. Ji perestgehên Sumeran jî em dizanin ku perestgeh bi rola navendê ya pevguhertinên pêşî radibe. Wexta ku mirov wesfê bazirganiya dema derketina Brahîm li ber çavan digire, ev rastî wê berçavtir bibe. Ez pirr girîng nabînim ku argumanên piştî Brahîm bijimêrim. Ji ber ku baş têne zanîn.

Ûrfaya salên 1600'î B.Z., di nava sê hêzên dîrokî yê wê demê de ye: Mezopotamya Jêr a di bin destê Sumer-Babîl-Asûr de, Anatolya Navîn a Hîtît lê mezin dibin û Misr a firewnên Xanedaniya Nû lê bi heybet bi hêz dibin. Devera Ûrfayê hê di wê demê de tevî ku navenda jeobiyolojiyeke herî bi bereket e, ber bi navendbûna herî girîng a jeopolîtîk ve jî dimeşe. Mîtanniyên keysa xwe li vê valatiya jeopolîtîk tînin, wê mezin bibin. Yên hûrûkûr li dîrokê temaşe dikin wê bibînin em li destpêka qonaxeke dîrokê ne ku têde cara pêşî di navbera şaristaniyan de demeke bi heybet a têkilî û dîplomasiyê heye. Di nava çandan de danûstendineke zêde heye, di warê bazirganiyê de her tişt çirrik e, ango bazirganiyê her tişt daye ber xwe. Demek e, bazirganî weke çandekê dibe rêûresm û bi sazî dibe. Qesr di nava xwe de gelekî jinan didin hev. Dîn, îdeolojî têkelî hev dibin, vediguherin. Hîtîtî xwe weke 'welatê hezar xwedayan' bi nav dikin. Di wê demê de pêdivî gelekî bi hespan heye û navenda 'hesp xwedîkirinê' dîsa li vê deverê ye. Di destanan de seyîstiya navdar a bi navê 'Kîkulî' derbas dibe li vê deverê ye. Sîstema qebîleyan li qonaxa xwe ya herî jor e.

Ûrfa bi tenê ji aliyê pîroztiya dîn ve girîng nîne; li pişta hunermendiya stranbêjî, klambêjî, sazbendî, dahol û zirneyê jî ev bereyê çandî yê dîrokî heye. Li pişt derketina Brahîm jî ev rastî heye. Yê xurûc kiriye kesek e, an jî hezar Brahîm in, ev jî hê mijareke zelal û eşkere nîne. Ev ewçend jî ne girîng e. Ya girîng ew e ku di wê demê de meyleke xurt a bi vî rengî heye. Naverast gelekî bi liv û lebat e, bazirganî bûye zenaetkariyeke gelekî kar têde heye. Brahîm bi tenê ferdekî çîna bazirgan e ku bi sazî dibe. Ya girîng, bazirganiya di navbera şaristaniyan de bi sazî dibe. Bazirganiya heywanan gelekî gurr û geş e. Dever di vî warî de jî şert û mercên wê gelekî li cih in. Jixwe Brahîm tevî kerî û colên xwe tevdigere. Eşkere ye ku bazirganekî heywanan e. Seferkirina Misrê ya bi hezaran bazirganên bi vî rengî di xwezaya bazirganiyê de heye. Bazirganiya koleyan jî heye. Firotina Yûsiv weke kole, manedar e. Bazirganiya cariye-jinan jî heye. Brahîm Hacerê dikire û ev yek jî vê mijarê rohnî dike.

Herweha qebîleyeke bi hêz a Brahîm heye. Ew bi xwe serekê qebîleyê ye. Ji çanda perestgehê ya bi heybet baş tê fêhmkirin ku her qebîleyek xwedayekî xwe heye. Eşkere ye ku xwedayê qebîleya Brahîm wê bi xwedayên Babîlan ên herêmê di bin destê xwe de digirin, xwe li hev rakişînin. Berjewendiyên maddî yên xwe li hev radikişînin, di çanda xwedayan de ku xwe li hev radikişînin, wê xwe nîşan bide. Peyva Ûr a di navê Ûrfayê de ji aliyê etîmolojîk ve ji gotina Sumerî Ûr ji rengdêrê ‘gir’ yan jî îhtîmaleke xurt e, ji navê Ûr zêde bûye. Heye ku Ûrfa xwedî maneyeke ‘cihûwarê li ser girik’ be. Ev binavkirineke rast e. Mijareke din a tê guftûgokirin koka etnîkî ya Brahîm e. Gelo Hûrrî ye, yan jî Semîtîk e, ev hê bi temamî zelal nebûye. Dever ji vî alî ve îro jî bi temamî herêmeke têra xwe têkel e. Hema bêje qebîle û çanda wê ya têkelîhev nebûye nîne. Zimanê Ibrî ji aliyê etîmolojîk ve zimanekî têkel tîne hişê mirov û di vî warî de bi mînakan tijî ye.

Çîroka der barê Brahîm de ku bûye malê Pirtûkên Pîroz jî em tev ji ber dizanin. Tê gotin xwe li Nemrûd rakişandiye, pûtên wî şikandine, xwestine wî biavêjin agir, bi mûcîzeyê rizgar bûye, hîcret kiriye, koçî Îsraîl-Filistîna îro kiriye, cariye Hacer (heye ku ji çanda xwecihî nêzî Ereban be) piştî ku

Simaîl aniye neçar hatiye hiştin koçberî devera Mekkeyê bibe, ji Saraya esîl Îshaq welidiye, Yaqûb yek ji du kurên Îshaq e, kurê Yaqûb Yusiv weke kole tê firotinî firewnên Misrê, di encama dekûdolab û eşqên qesrê de heta bi wezîrtiyê mezin dibe û hwd. gelek hêmanên çîrokê di vê çarçoveyê de ne.

Eşkere ye ku çanda Brahîm ne çanda şaristaniya Sumer, ne jî ya Misrê ye. Çanda qebîleyê ya hezar salan a Ûrfayê ye. Lê bi awayekî gelekî girîng veguherî ye, di serdemeke tevlîhevkirî de çandeke sentezkirî ye. Eger em çîroka wê şîrove bikin, em dikarin xwe bigihînin encamên girîng. Nemrûd tê zanîn, pênaseyek waliyên rêveberiya kolonî ya Babîlê ne. Cihê pût lê bi awayekî komî hene, temsîla Panteona Babîlê ya li Ûrfayê ye. Bavê Brahîm di xizmeta Nemrûd de ye. Lê pirsgirêk û nakokiyên wî pê re hene. Her çi be jî li herêmê esilzadeyekî qebîleyê ye. Mirov dikare texmîn bike ku baweriyên wî yên dînî yên xweser û xas hene. Brahîm li pey berjewendiyên bavê xwe ango berjewendiyên qebîleyê ye. Encam pevçûn û xwelihevrakişandin e. Şikandina pûtan û ceribandina avêtina agir, vê rastiyê eşkere nîşan didin. Wê wextê ne bi tenê qebîleya xwe, ji bo berjewendiyên tevahiya qebîleyên bi heman rengî pêşengiyê dike û têdikoşe. Bi awayekî li dijî kolonyalîzma Babîlê têkoşîna xwecihtî û welatperweriyê dike. Panteona Babîlê bereyê maneyê yê vî şerî ye, biryargeha îdeolojîk e, û dixwaze bi rola hegemonîk rabe. Bereyê îdeolojîk ê Brahîm jî çanda manewî ya qebîleyê ye, ango dînperestî û xwedaperestiya qebîleyê ye. Li gorî ku serektî û pêşengiyê dike, xwedayê wî yê qebîleyê jî wê ji xwedayên qebîleyan re pêşengiyê bike. Jixwe wisa jî dibe. Ji ber ku dewlet e, Nemrûdê Babîlan di du şerên bereyê maneyê de hê bi hêz an jî serketî derdikeve. Ji aliyê Brahîm ve ketina ser rêyên koçberiyê ferz dibe. Ji bo Brahîm hem sal û hem jî rê ferz dibin. Ji ber ku şerê ketiye navê, ciddî û ji dil e. Li ber rêûresma şaristaniyê radibe. Pût şikandin, redkirina sîstema şaristaniya fermî ye, ango modernîteya fermî ya demê ye.

Bêguman bi sedan qebîle û kesên bi vî rengî hene bi şaristaniya fermî re pevçûne. Babîl û Asûr di dema xwe de bi 'qirkirina qebîleyan' navdar in. Mirov dikare behsa demeke têde pevçûn û nerehetiyên mezin hene, bike.

Hemmûrabiyê navdar qralekî bi heybet ê vê demê ye. Tê gotin rêzikên pêşî yên huqûqî wî danîne. Têkoşîna Brahîm bi vî aliyê xwe ve bi awayekî dişibe şerên rizgariya mêtingehan li dijî şaristaniya kapîtalîst a roja me ya îro. Berê xwe dide Misrê, sedema pêşî bazirganiya pez e, lê sedema duyemîn a girîng, heye ku gera li hevalbend û hevgiran e. Ji sedî sed mirov dikare ji çîroka Yûsiv vê encamê derxe. Ji ber ku di vê demê de reqabeta di navbera şaristaniyan de xurt û dijwar bûye. Xwelihevrakişandinên Hîtît-Misr, Babîl-Hûrrî (Hîtît) û Babîl-Misrê di gelek qeydan de tê dîtin. Ya mirov fêhm dike ew e, Brahîm li dewrûbera Qudsa îro bi cih dibe û ev der ji aliyê bahewayê ve hinekî dişibe Ûrfayê û li derveyî kontrola sê şaristaniyan dimîne. Li vir jiyana xwe weke koçberekî derbas dike. Bi zor û zehmetî ji xwe re cihekî qebristanê kirriye. Têkiliyên wî bi Ûrfayê re dewam dikin. Nêviyê wî Yaqûb ji vir bi xizmên xwe yê nêz bi keçên Lavan, Rahel û Lea'yê re dizewice.

Ji aliyê mijara me ve ya girîng veguherîna dînê Brahîm e. Diyar e ku Brahîm ketiye şik û gumanekê. Şikandina wî ya pûtan gumana wî ya dînî piştrast dike. Temsîla xwedayên dînekî din be jî şikandina pûtên wan di warê guman birina ji dîn de îşareteke eşkere ye. Di rêûresma fikra wê demê de 'dengên ji xeybê' tên, xwedî cihekî girîng in. Dengên ji xeybê di encama zêde fikirkirin û ponijandina hin awayên wecd û îlhamê de pêk tên. Zimanê îlhamê ye. Li gorî tê gotin, rojekê dengekî bi vî awayî bihîstiye. Dengê hatiyê yan jî îlhama hatiyê (dengê ji xeybê) weha şîrove dike: "Wa Hewe!" Dibe ku ev şêweyekî îfadeya Hûrrî be. Maneya wê 'Ev Ew' e, bi kurtî 'Ew' e. Ango senteza xwedayê nû yê li hêviyê ye, li bendê ye. Mûsa û Muhemmed jî wê bi vî awayî xwe bigihanda xwedê. Yanî ev rêûresm pirr kevn e. Etîmolog hê jî li "Ew e" lêdikolin. Şîroveya min a şexsî ev e. Her çûye ev şêweyê îfadeyê bûye 'Yahweh', ji vê jî veguheriye 'Yahûdî' (Cihû) û di vî warî de gelek qenaet hevpar in. Bi kurtî çîroka xwedayê navdar ê Ibraniyan bi vî awayî bû.

Min berê gotibû peyva Ibrî ji binavkirina Misriyan 'Apîrû' ya bi maneya 'mirovên tozgirtî yên ji çolê hatine' tê. Dibe ku Brahîm ji qebîleya ji nû ve ava kir û jê re pêşengî dikir Ibrî û ji dînê xwe re yê ji aliyê maneyê ve ji nû

ve ava kir, Yahûda gotibe. Divê em bi bîr bixin ku di cewherê Yahûda de xwedê heye, çawa ku di navê Îsraîl de heye. Ji aliyê dîrokî ve bi vî awayî analîzkirina koka dînê nû û bi serhatiya wî ya kurt anîna ziman a pêşketina wî, li gorî min gelekî manedar e. Em bi dînekî nû yê xwe ji nû ve avakirî û dînekî qebîleyê re rûbirû ne ku xwe bi tenê his dike. Dînperestî û xwedaperestiya qebîleyekê veguherî eger şoreş nebe jî ji sedî sed weke Îslamê û weke Protestaniyê reformeke ciddî ye. Sedema bi awayekî hişk parastina qebîle û xwedayekî ji nû ve hatine avakirin û veguherîne, dibe ku şert û mercên jiyanê yên zor û zehmet bin. Cihû çima girîngiyê didin bazirganî û pereyan, di heman demê de çawa li gelemperiya dinyayê di vî warî de bûne pispor, ev yek kengî weke qebîle gav diavêjin bazirganiyê, gelekî baş tê fêhmkirin. Manûnemana qebîleyê bi baziganiyê ango bi pereyan ve girêdayî ye.

Brahîm dixwaze Simaîl bike qurban û bi dengê ji xeybê tê, ji kirina vê yekê digere. Ev bûyer hêmanekî girîng ê temamkerê vî dînê nû ye. Rêûresma qurbankirinê gelekî kevn û belav e. Qurbankirina zarokan jî yek ji van e. Heye ku rêûresmek e ku heta wê rojê bi cih tê anîn. Brahîm û maneya wî ya xwedayî li hev dikin ku êdî modaye vê rêûresmê derbas bûye. Xaleke girîng a reformê, ev e. Qurbankirina heywanên têne zanîn, şûna wê digire. Ji çîroka Hacer û Simaîl şîroveya mirov derxîne ev e, dînê nû di nava qebîleyên Semîtîk-Ereb de pirr bi xweşî nayê pêşwazîkirin. Gelekî zû derketiye, mirov dikare weke ezmûneke 'Pêş Îslamê' binirxîne. Lê zêde nikarîbûye belav bibe. Hê di wê demê de Mekke girîngiya navendbûna xwe nîşan dide. Panteoneke cuda ya qebîleyan heye. Paganîzm (pûtperestiya qebîleyan, xwedaperestiya qebîleyan) hê gelekî bi hêz e. Navê Îsraîl ê di dema Yaqûb de bi gewde bû, bi awayekî balkêş diberide, bi pêş dikeve. Daçeka 'El' ji Kenaniyan (Qebîleyên Semîtîk ên li devera Filistîn û Lubnanê) hatiye girtin. Ev têgîna bi koka xwe Semîtîk e, maneya xwe nêzî 'bilindî' û 'meznahiyê' ye. Di nava qebîleya Ibraniyan de weke 'Elohî' tê bilêvkirin. Bi Îslamiyetê re vediguhere û weke 'Ellah'tê gotin. Mirov dikare weke xwedayê giştî yê qebîleyên Semîtîk qebûl bike.

‘Got’ di nava qebîleyên Hind-Ewrûpî de û ‘Gudea’ yê di nava zaravayên Kurdî-Îranî de heman maneyê temsîl dikin. Bi maneya pêşî yan jî xwedayê hevpar ê qebîleyan tê. Ji ber vê yekê di sala 2150’î B.Z. de hegemonya Gotî û Gudea ya li Sumerê, manedar e. Bi maneya qral-xweda tê. Nîşaneke qralan e ku di wê demê de gelekî tê bikaranîn. ‘Îsraîl’ bi maneya ‘kesê bi xwedê re gulaşê dike’ tê. Hinekî bêhna şovenîzma qebîletiyê jê tê. Xwe ewqas bi hêz dibînin ku dikarin bi xwedê re jî gulaşê bikin. Ya rastî bi xwedê re şer dikin. Mîna dewameke pûtşikandina rêûresma Brahîm xuya dike. Mirov ji bêhejmar pêngavên wan ên îdeolojîk dikare fêhm bike ku tevahiya dîrokê bi gelek xwedayan re gulaş kirine. Divê em ji bîr nekin ku her gava îdeolojîk a ji bo nûbûnê avêtine, tê maneya ‘gulaşa bi xwedê’ re. Ez ê piştre behsa hostetiya maneyê (têgîn, teorî, teolojî) ya rewşenbîrên Cihûyan bikim.

Çîrokeke koçberiyê ya qebîleyê ya ber Misrê ve heye ku li gorî texmînan di navbera salên 1600-1300’î B.Z. de pêk hatiye. Serhatiya Mûsa û Yûsiv di encama vê koçberiyê de derdikeve holê. Li gorî rîwayetê, li Misrê serhatiyeke wan a demdirêj heye, di şert û mercên nîvkoletiyê de ne, hewl didin yekîtiya xwe biparêzin, ber bi çînayetiyekê ve diçin, heye ku Mûsa yek ji giregirên vê bermahiya qebîleyê be, û mîna nakokiya Brahîm bi Nemrûd re ketiyê Mûsa jî bi Firewnê Misrê re ketibiyê û ev bûyer jî li dema Akhenaton dînekî yek xwedayî îlan kirî, rast hatibe. Li gorî rîwayetê hîcret jî salên 1304-1280 B.Z. di dema Firewn Ramsesê II. de pêk tê. Gavavêtin û derketina navdar a Mûsa di Tewratê de dûrûdirêj heye. Hem berxwedana wî li beramberî şert û mercên xwezayê (şert û mercên xwezayî yên Nîvgirava Sînayê dijwar in), hem jî nakokî û şerê wî bi gelek qewm û qebîleyên ne dost ên li dewrûberê, di Tewratê de cih digirin. Berxwedaneke çil salî û êşeke mezin a koçberiyê. Li Tûrî Sîna (tûr-çiya) rêûresma ‘dengê ji xeybê’ tê, careke din xwe dubare dike. Deh Ferman (wehî, fermana xwedayî) têne girtin.

Peyva Ibranî heye ku berhema vê demê ye. Der barê xwedê de li şûna navên kevin navên nû yên weke ‘Reb’ (efendî) tên danîn. Ev yek çînîbûneke diyar nîşan dide. Hê bi dijwarî li ber pûtperestiyê rabûn heye.

Li dora sindoqa Deh Ferman (rêûresma Pirtûka Pîroz) têde têne veşartin û hilanîn kulteke nû (şêweyê perestin û îbadetê) tê pêkanîn. Di Tewratê de dabeşkirineke deman tê çêkirin. Termînolojiyeke bi awayê dema Derketinê-Kahînan-Rêberan-Qralan-Pêxemberan-Nivîskaran tê bikaranîn. Divê neyê jibîrkirin ku ji salên 1600'î B.Z. dema Brahîm jiya, heta bi salên 600'î B.Z. li naverastê belgeyeke nivîskî ya behsa Cihûyan bike nîne. Bi devkî veguhestina hinek rêûresman heye. Ez yeqîn dikim ku rêûresma nivîskî bi Pêxember Îşaya di van deman de tê destpêkirin û pêşdebirin. Di dema esareta Babîlan de (596-540 B.Z.) gelek hêman ji Zerdeştiyê têne girtin. Her diçe ji fikra Grekan jî bi tesîr dibin. Pirtûka Pîroz a jê re Ahd-î Atîk tê gotin timî bi pêşdebirinê derdikeve holê. Cildên wê yên stûr û şîroveyên wê hatine çêkirin. Ji ber ku encama kombûneke rêûresma parastinê ye, girîng e. Piştre bandorên wê yên dînî, felsefî û wêjeyî û îlhama da huner gelekî mezin bû. Herweha hejmareke zêde şîroveyên wê hatin kirin.

Tevî ku çîroka kurt a têgîna yek xwedayî bi vî rengî ye, di dînên Brahîmî de bi vî awayî behs û qal nayê kirin. Eşkere ye ku xwestine wê weke hegemonya nasnameyeke îdeolojîk pêşde bibin. Yek ji fikrên sereke der barê 'projeya' avakirina qraliyeteke piçûk a Cihûyan de ye. Spînoza jî bi xwe şîroveyeke bi vî rengî dike. Têgîna dînê yek xwedayî jixwe li Misrê hatibû îlankirin. Li cem Sumeran, Babîlan û Asûran li gorî rêzê 'En', 'Mardûk' û 'Asûr' nîşaneya xwedayê herî mezin, pirr ji mêj ve girtibûn. Weke ku ez gelek caran bi girîng dibêjim dîsa dubare dikim, ev têgînên sembol, bandor û otorîteya saziyên qraliyetê û qralan a zêde dibe, nîşan didin. Mirov wan dikin pût û li ser navê wan kultan (îbadet) pêşde dibin, ev beşek ji hewldanên rewakirinê ne. Di tevahiya şaristaniyan de bi heman awayî hewldanên hegemonyayeke îdeolojîk hene. Ji ber ku amûrekî xurt ê rewakirinê ne, her şaristaniyê hewl daye vê rêbazê an jî dînî bi heybet bike. Qebîleya Ibranî yan jî qewmê wan di bin bandora vê rêûresma dîrokî de amûrê rewakirina qraliyeta xwe ya piçûk a qewm ava kirine, ji lewra jî mirov dikare li benda hewldaneke wan a bi vî rengî be û ev xusûsek e ku

mirov dikare fêhm bike. Rêûresmeke belav e, û ev jî beşê para Ibraniyan dikeve, nîşan dide.

Projeya qraltiyê ya bi îdeolojiya Ibriyan timî di xeyalên xwe de zindî digirtin, di dema salên navbera 1020-950'î B.Z. de berçav dibe. Saûl, Dawit û Silêman di dîrokê de weke sê kesayetên girîng ên qraltiyê têne nîşandan. Pêxember û qral in. Em cudahiya wan ji Misrê û ji Sumeran yekser dibînin. Ne xweda qral in, pêxember-qral in. Ji lewra di xwendina Tewratê de lêgerîna li qraliyeteke Cihû û bi vî awayî şîroveyên têne kirin, divê piçûk neyên dîtin, neyên piştguhkirin. Bêguman mirov bi tevahî weke projeyeke qraliyetê şîrove bike jî rast nîne. Lê dîsa jî divê mirov têkiliya yek xwedayî ya her qewmî bi dewlet, qralê wî yê xwecihî û millî re bibîne û ev pirsgirêkeke girîng a rêbazê ye ku di dema xwendina Pirtûka Pîroz de divê mirov xemsar nêzîk nebe. Ji ber jiyana wan a bi êş, zor û zehmetiyên rûbirû dibûn, dîsa ji ber pirrbûn û mezinahiya qebîle û şaristaniyên bi wan re şer dikirin, karîbûn sentezên xwe hûrûkûr, pîroz û bi îhtîmameke mezin, cuda bikin. Ez divê dubare diyar bikim ku li pişt vê dînperestiya qebîletiyê bandora çandeke qebîleyan a bi rola navendî rabûye û herî kêm deh hezar salan kudandî heye. Di parastina hêza xwe de para vê çandê gelekî girîng e. Divê mirov li pişt bihêzbûna rêûresma dînî ya li Rojhilata Navîn jî misêwa li vê bandorê bigere.

Dînê Ibranî heta Xirîstiyantî weke şax an jî milekî jê qut bibe bandoreke xwe ya ciddî nîne. Bandoreke kêm li gelên din kiriye. Jixwe ji ber ku dînê qewm e, nikare belav bibe. Gotina 'qewmê hilbijartî' vê tektî û tenêtiyê xurt dike. Girîngiya wê ya bingehîn di derketina Xirîstiyantî û Misilmantiyê de û di têkiliya wê ya milletperestiya modernîteya kapîtalîst de xwe nîşan dide. Têkilî zêdetir di çarçoveya têgîn, teorî û teolojiyê de ye. Avahiyên teolojîk û hêmanên îdeolojîk ên şaristaniya Sumer û Misrê yên du şax û milên girîng ên şaristaniya navendî ne, reforme kirine û ev jî yek ji xisletên wê yên girîng e. Eger ev reform nebûna, dîroka Rojhilata Navîn ango dîroka gerdûnî wê bi rengekî din biqewimiya. Girîngiya detaya wê ev e: Yek ji prensîpên bingehîn ên dînê Ibranî ew e ku mirov ti carî nabin xwedê.

Mirov bi tenê dikarin bibin pêxember ango dikarin bibin qasidê xwedê yan jî nûnerê wî.

Ev bûyereke gelekî girîng e. Qralên Sumer û Misrê xwe bi hezarên salan weke qral-xwedayan rewa kiribûn. Rêûresma Brahîmî bi awayekî sîstematîk li ber vê yekê rabûye. Di çanda Grekan de bi felsefeyê li ber teşbîhkirina mirov-xweda radibin, li Rojhilata Navîn jî bi dînên Brahîmî li dijî vê yekê derdikevin. Bêguman li pişt vê nêzîkatiyê bûyerên ekonomîk, civakî û siyasî bi rolekê rabûne. Têgihiştina ekonomîk a di şexsê Brahîm bi xwe de gelekî dişibe lîberalîzmê. Kolektivîzmên Firewn û Nemrûd, xwe dispartin xebitandina koleyan. Li ser koleyan nîzamekî mekîneyan hatibû avakirin. Têgîna evd-xweda (hê jî têgînek e, tê bikaranîn) ji dema koletiya bûye mekanîk, maye. Dînê Brahîmî herçend ev têkiliya bi kok xira nekiribe jî têra xwe nerm kiriye, reforme kiriye. Di bandorbûna wê de rola wê ya li vir diyarker bûye. Qebîleya Ibranî bi xwe hem li cem Nemrûd (qralên Babîl) hem jî li cem Firewn (Qraliyeta Misrê) li dijî vî şêweyê xebitandinê gelekî li ber xwe daye. Çanda qebîleyê, bi temamî kolekirin qebûl nekiriye. Di bin hîmê diyardeya şerê çînî de berxwedana hezarê salan a çanda qebîleyan li dijî kolekirinê heye. Ya li vir behsa wê tê kirin bi tenê berxwedaneke etnîkî nîne. Xusûsa ez weke têgîneke cihê girîng dibînim, di vir de ye. Ne şerê çînî, şerê çînînebûnê, qebûlnekirina çînîbûnê girîng e. Hem a di dîrokê de derdikeve pêşiya me ev e, hem jî ya rast ev e.

Xusûsa Marks û Marksîst hîç fêhm nakin ev e. Ew çînîbûnê erênî û weke xeteke dîrokî ya pêşketî dibînin. Bi qasî şaşiyên wan di hîmê serneketinên wan de ev têgihiştinên wan, bi roleke gelekî neyînî rabûne. Berxwedanên hezarê salan ên qebîle, eşîr û qewman, heta şerên rizgariya neteweyî bi hin aliyên xwe li dijî modernîteya kapîtalîst di heman demê de şerên berxwedanê yên li dijî çînîbûnê ne. Di dînên Brahîmî de ev xislet bi hêz in. Piştre jirêderxistina wan û veguherandina wan a dînên şaristaniyê divê weke diyardeyeke cuda were nirxandin. Liberrabûna koletiyê di her sê dînên Brahîmî de rewa ye, û tê teşwîqkirin. Di ekonomiyê de jî rê li ber reformên ciddî vekirine. Avahiyeke wekhevîxwaztir kirine hedefa xwe. Sedeqe, zekat û weqif amûrên girîng in. Di hedefa wan de nermkirina

sînorên hişk ên ekonomiyê heye. Di qada siyasî de demokrasî û komarê neke hedef jî otorîteya xwedê-qral hatiye nermkirin. Têgîna ‘Qralê siya Xwedê’ hatiye çêkirin û pêşdebirin. Jiyana komin, hem manedar hatiye dîtin û hem jî hatiye bicihanîn. Eşkere ye ku di qada ekonomîk, civakî û siyasî de ne şoreş lê reform hatiye kirin. Lê divê mirov van gavên hatine avêtin li gorî dema wan piçûk nebîne. Min ev gavavêtin di sîstema şaristaniya navendî de weke helwesteke ‘sosyal-demokrat’ a dema wê nirxandibû. Yên weke vê, tevgerên sosyo-ekonomîk in. Min beşê wê yê xwe di çanda manewî û dîn de nîşan dide gelekî lêkola û li ser sekinîm. Lê dîsa jî mirov bibe cîgirê xwedê û wesfê qasidê wî bigire, şoreşeke teolojîk e. Li ser dîroka gerdûnî bandora wê mezin bûye. Ez ê di beşa Îslamê de hewl bidim hinekî din li ser vê xusûsê rawestim.

Îdeolojiya Ibranî yan jî Cihû têkiliya wê bi milletperestiyê re ango bi dewleta netewe re tevî ku min di parêznameya xwe ya bi navê Modernîteya Kapîtalîst de analîz kiribû jî divê tavilê bê diyarkirin ku ev têkilî û bandora wê gelekî girîng e. Encamên wê yên herî xeternak bi ‘qirkirina Cihûyan’ li ser gelê Cihû bi xwe pêk hat.

## c- Berxwedana Xirîstiyantiyê û Şerê Çînî

Di dîrokê de yek ji tevgerên civakî yên ciddî û pêşî ya bingehê wê yê etnîk nîne, Xirîstiyantî ye, ji ber vê wesfê wê derketina Xirîstiyantiyê girîng e. Di derketina wê de, ne avakirina şaristaniyeke nû, zêdetir aliyê wê yê azadî û wekheviyê li pêş e. Li Rojhilata Navîn di sîstema şaristaniya navendî ya li derdora sê hezar û pêncsed salî de pêvajoya tebeqebûyîn û çîna jêr di Împaratoriya Romayê de gihişt asta herî jor û derketina Xirîstiyantiyê weke nerazîbûneke li dijî vê, pêşket. Ji xisletên çînî yên tevgerên dînî yên di dema Brahîm û Mûsa de, zêdetir xwedî xisletên qebîle û qewman bû. Dema îsewiyetê hem di ser xisletên qebîle û qewman re ye, hem jî dînekî nû yê civakîbûnê ye ku tevî bêkar û xizanên li derveyî sîstemê hatine hiştin hemûyan, qebîleyên teslîm hatine girtin, terîqetan (Nû derdikevin. Mîna Essenî), kesên ji eskerî û ji gundikên koleyan

reviyayî, ber bi refên wî ve baz didan. Qebîleyek an jî dewlet nayê avakirin. Ji nava her qewmî û her dewletê cemaeteke civakî ya kominî tê pêkanîn. Ji vî awirî ve hêja ye ku mirov bala xwe bidiyê. Ji ber ku ne tevgera qewm û ne jî ya tevgera şaristaniyê ye, bi lez berfireh û mezin dibe, û li pêşiya tevlîbûna desthilatdarî û şaristaniyê jî timî bendekê çêdike. Îro jî di nava dualîteyeke bi heman rengî de ye. Tevî ku aliyê wê yê komin demokratîk bi hêz e, pêşketina wê ya di vî warî de bi sînor bûye. Ev aliyê wê yê di destpêkê de bi hêz bû di derbasbûna pêvajoya şaristaniyê de ev aliyê wê di dereceya duyemîn de maye. Herweha ber bi milletperestiya qewmî ve jî beridiye.

Di derketina wê de giraniya rîwayetan heye. Hebûn û nebûna Îsayekî rastî jî tê guftûgokirin. Çawa ku gelek Brahîm hene, gelek Îsa jî çêbûne. Ji ber ku Roma gelek mirovan li çarmîxê dixe û ceza dike. Bîranînên tevgera Spartakus teze ne. Li gorî rîwayetê di dema vê tevgerê de li ser rêyên Romayê pênc hezar kes li çarmîxê têne xistin. Kirinên bi heman rengî li eyaleta Qudsê jî gelek caran têne dîtin. Di Încîlê de (Ahd-î Cedîd) çîroka Îsa bi firehî tê gotin. Încîl bi awayekî mîna Romana Îsa ye. Di çanda Ewrûpayê de nivîsandina romanê dibe ku ji Încîlê bi tesîr bûbe. Tê gotin, ji dînê Mûsewî bûye, ew jî ji tebeqeya jor a zanayên dîn nerazî bûye, gavavêtiye şêweyekî cihê yê perestgehê, xwestiye li Qudsê bi tesîr bibe, ji terîqeta demê Esseniyan û Waftîzvan Yehya (pêxember) bi tesîr bûye. Di çarçoveya vê vegotinê de behsa dijberiya wî ya Waliyê Romayê û Qraliyeta Yehûda ya hevkar jî tê kirin. Çîroka Duwanzdeh Hewariyan bandora sînorên wî nîşan dide. Ji bo ti serhildanê hewldanek wan çênebûye. Bi awayekî, mîna koma propagandayê xuya dike. Dişibe dema propagandaya Muhemmed li Mekkeyê. Tevî ku xwediyê gotin û bilêvkirineke cuda ye, Ahd-î Atîk bi awayekî mîna şîroveyeke ji bo xizanan e. Wexta ku li çarmîxê tê xistin (mîlladî 34) koma li dora wî bi lez belav dibe. Tê gotin li ser giliyê Hewariyê Sêzdehmîn Yehûda Îskaryot tê zevtkirin. Bi vê mînakê jî tê fêhmkirin ku îstîxbarata Cihûyan xwe disipêre dîrokeke gelekî kevin. Bi îhtîmaleke mezin di nava cemaeta wî ya piçûk de bandora wî çêbûye. Lê

weke ku tê diyarkirin a diyarker atmosfera afirîner a civakî ye. Rastiya Îsa bi rola katalîzor a vê atmosferê rabûye.

Piştî wî navê bi tenê yê bi tesîr Ezîz Paul e. Li Tarsûsê ji dayik bûye û dibêje li Şamê gihiştiye hîdayetê. Yê tevger bi serhev de aniye Paul e. Di sedsala pêşî de bi awayekî fermî Încîleke nivîskî tineye. Încîl di sedsala duyemîn û sêyemîn de têne berhevkirin. Gelek mînakên wê yên nehatine erêkirin jî hene. Încîlên hatine qebûlkirin çar in. Mijar nêz hev in, lê uslûb cuda ne. Yekser mîna gotinên xwedê nehatine tomarkirin. Wexta qala bûyeran tê kirin car caran gotinên xwedê jî di nav re derbas dibin. Ji fikra wê demê ya Grek jî sûd hatiye wergirtin. Teolojiya wê vegotineke têkel a Grek û Ibraniyan di nava xwe de dihewîne. Têgîna herî girîng Bav, Kur û Rûh-ul Quddûs e. Şopa panteona xwedayî ya sêber a dîroka wê gelekî kevin, li ser heye. Di dîrokê de li cem gelek sîstemên şaristaniyan temsîla panteona sêber an jî teslîs heye. Panteona Romayê di vê xusûsê de eşkere ye. Dîroka dînî teşbîhên bi vî rengî têra xwe nîşan dide. Gelekî tê guftûgokirin, gelo Îsa xwedê ye, yan jî ji xwezaya mirov e, û ev xusûs jî têkiliya xwe bi vê dîrokê re heye. Dînê Cihûyan xwedabûna mirov qedexe dike, lê gelek dînên şaristaniyê vegotina xwedê-qral bi awayekî guhertî, dewam dikin. Di Îsewiyetê de mirov wer fêhm dike ku dixwazin sentezekê bikin. Lê tê zanîn ku vê cihêbûnê rê li parçebûnên mezin ên mezheban û şeran vekir. Di bingehê wê de rola cihêwazbûna civakî jî heye. Mînak wexta ku Arîûsgiran karekterê Îsa yê mirov dikirin bingeh, tebeqeyên xizan temsîl dikirin. Kesên çerxa desthilatdariyê ya Romayê digerandin, zêdetir xwe bi koka xwedabûyîna Îsa ve girê didan, dialandin.

Heta bi nivîsandina Încîlê Xirîstiyan li çol û çiyan di nava jiyaneke înzîwayê de bûn. Tevgerên mezin ên perhîzê (rojî) pêk dihatin. Ezîz û ezîzeyên navdar di vê demê de derketine. Gava duyemîn jî bi avakirina keşîşxaneyan avêtine. Sedsalên 3. û 4. qonaxa avakirina keşîşxane û xelwetxaneyan e. Li her aliyê Rojhilata Navîn belav bûne. Yên ji şerê Roma-Sasaniyan bêzar bûne, tirsiyane û ji eskeriyê direvin kom bi kom tevlî nav refên wan dibin. Ji sedsala 4. ve hem dibe dînê fermî yê Romaya Rojhilat (Bîzans), hem jî di serî de Asûrî, Ermenî û Grek, dibe dînê gelek qewman.

Ev qewmên piçûk ên ji zilm û mêtinkariya Roma û Sasaniyan zivêr bûne, di dema xwe de ji aliyê çandî ve ji wan gelan in ku herî pêşketî ne. Divê mirov li van qewman Qiptiyan jî (Gelekî ji dema Firewnên Misrê mayî) zêde bike. Serê tevgerê Bavên Dêrê dikişînin. Ji aliyê Împarator Konstantîn ve (kesê di 312'an de Romaya Rojhilat li Bîzansê, Stenbola îro îlan kirî) îlankirina Xirîstiyantiyê weke dînê fermî û civîna Konsula Îznîkê ya di sala 325'an de qonaxeke nû ye.

Meylên şaristaniyê û antî-şaristaniyê rê li pêkhatina gelek mezheban vedikin. Dêrên Suryanî û Ermeniyan (Nastûrî û Gregoryan) têne avakirin. Di îdeaya Roman-Latîn ekumenîk (gerdûnîtiyê) de îşaretên pêşî yên parçebûnê bi vî awayî derdikevin holê. Sedsalên 5. û 6. dema belavbûna tevgerê li tevahiya Ewrûpayê ye. Sedsalên 7. û 10. dema belavbûna li Ewrûpaya Rojhilat e. Serketina wê ya li Ewrûpayê, di paşvexistina wê ya paganîzmê (dînên qebîleyên xwecihî) û pêkanîna şoreşeke çandî-manewî de ye. Tevgera Xirîstiyantiyê ya Rojava çanda manewî ya Rojhilat a di nava panzdeh hezar salan de pêk hatî bi veguhestina Ewrûpayê, tovên bûyer û pêşketinên piştre biqewimin reşandiye. Di dîrokê de her tevgera civakî pêşî di çanda manewî de weke embriyo pêk tê. Bêyî vê pêkhatinê, pêşketinên çandî yên maddî xweber pêk nayên. Di danîna hîmên Ewrûpayê de bi destê Xirîstiyantiyê veguhestina çanda manewî her tişt nebe jî beşê herî girîng e. Divê mirov li gorî rêzê veguhestina çanda Mûsewîtî û Îslamtiyê jî lê zêde bike. Di Îslamiyetê de guftûgoyên li ser felsefeyê di sedsala 12. de girîngiya xwe namînin, lê di heman deman de li Ewrûpayê guftûgoyên li dora têgînên 'nomînalîzm[1]' û 'rastîparêziyê[2]' pêş dikevin, pêngava dîrokî ji bo derketina felsefeyê dest pê dike. Bi tevgera protestaniyê û bi tevgerên reformê dema dêrên millî bi pêş dikeve. Ev

[1] Nomînamlîz rengekî metafîzîk ê felsefeyê ye. Li gorî wê peyvên giştî û ne berbiçav hene, lê objeyên gerdûnî û ne berbiçav nînin. Bi vî rengî her peyv û sembola heyî bi tenê bi maneya mirov lê bar dikin, heye.

[2] Rastîparêzî ango Realîzm felsefeya ku li seriyê li hemberî nomînalîzmê ye. Li gorî realîzmê fenomen hene ku bandorê li mirovan dikin û mirov wan binav dikin û ev fenomen ne girêdayî têgihiştina mirov in.

tevgerên bi Ronesansê re dibin yek, Rohnîbûna Ewrûpayê amade dikin û bi vê jî hegemonya wê ya îdeolojîk pêk tînin.

Xirîstiyantiya Rojhilat hê di cironeke cihê de diherike. Zimanê Aramî yê tê rîwayetkirin ku Îsa pê dipeyivî bi awayekî zimanê millî yê Asûriyan e. Ji wexta ku dema xwe ya bi heybet a berê ji dest dan û vir ve Asûrî di hegemonya Pers û Sasaniyan de man. Ji lewra gera wan a li rêyeke derketinê, xwezayî bû. Hêza wan a eskerî têra vê yekê nedikir. Ji aliyê çandî ve mîna hafiza û bîra Rojhilata Navîn bûn. Ango di derketina Xirîstiyantiyê de rola wan gelekî girîng e. Ji serî ve Xirîstiyantî weke dînekî millî qebûl kirin. Gelek tiştên girîng lê zêdekirin. Nexasim rahibên Nastûriyan bi rola xwe ya di veguhestina çanda Grek de li ser teolojiya Xirîstiyantiyê bi roleke diyarker rabûn. Antakya navendeke wan a navdar bû. Li gorî rêzê Ûrfa û Nisêbîn (Tûrabdîn) jî navendên wan ên dîrokî ne. Tê gotin Îsa dawetî Ûrfayê hatiye kirin. Rahibên Keldaniyan jî bi sedema koka xwe ya Babîltiyê ji hêzên girîng ên pêşdebirina Xirîstiyantiyê bûn. Rahibên Nastûriyan di sedsalên 4. û 5. de ji Deryaspî heta bi Hindistanê Xirîstiyantî bi awayekî bi tesîr belav kirin. Dîroknas, îdea dikin ku li ser îhtîmala derneketina Îslamiyetê, Îran wê di demeke kin de biketa bin bandora Xiristiyantiyê. Tevî ku dînên Mîtra û Manî li herêmê bi tesîr in, Xirîstiyantî bi rola sereke radibe. Ango mirov dikare derketina Xirîstiyantiyê ji bo Keldanî û Asûriyan bi awayekî weke Ronesansê bihesibîne. Herçiqas di navbera wan de xwelihevrakişandinên mezheban bi hêz bin jî ji bo Asûriyan Xirîstiyantî Ronasanseke pêşwext çêbûyî ye. Mirov dibêje qey rahibên Nastûriyan dixwestin bi vî awayî hîmê şaristaniyekê deynin. Ji pevçûna di navbera Bîzansî û Sasaniyan de hem zivêr bûbûn û hem jî dixwestin jê sûdê wergirin. Dixwestin ji nakokiyên wan sûdê bigirin û bi vî awayî bi hêz bibin. Çawa ku tê zanîn, di vî alî de bandor li Hz. Muhemmed jî kirin.

Qewmê Ermenî jî tevgereke mîna ya Asûran a Xirîstiyantiyê qebûl kir. Ê wan jî hem xwelihevrakişandina Bîzans-Sasaniyan zirarê li wan dikir, hem jî dixwestin jê sûdê werbigirin. Xirîstiyantiyê ji bo vê, zemînekî baş ê îdeolojîk pêşkêş dikir. Ermeniyan di serê sedsala 4. de xwestin bi awayekî

fermî qebûlkirina Xirîstiyantiyê di demeke kurt de bi mezhebê Gregoryan millî bikin. Pêşketîbûna çanda wan a dîrokî derfet û îmkan dida vê yekê. Bi Xirîstiyantiyê milliyetgiriyeke pêşwext pêk hat. Herî kêm encama berçav ev bû. Tevgereke mezin a dêrên Ermeniyan pêşket. Dêrên Xirîstiyantiyê yên ber bi dewletê ve diçûn jî ev rol temam dikirin. Li tevahiya deverên Ermenî lê hebûn, dêrên bi heybet hatin avakirin. Di mîmariya Rojhilata Navîn de ji aliyê avakirina dêran ve tevgerek e ku cihê xwe heye. Asûrî jî kêmî Ermeniyan nebûn. Li ser mijara Gurciyan em ê qîma xwe bi van gotinan bînin û bêjin, Gurciyan jî pêvajoyeke bi heman rengî ya Xirîstiyantiyê derbas kir. Gelek in ku bi bawerî û mîmariya xwe balê dikişînin ser xwe.

Grekî gel û çandek in ku hê di dema derketinê de zêde bi Xirîstiyantiyê re eleqedar bûne. Bi hêza çandî ya ketiye serhev û kom bûyî ya li pişta xwe, bi lez şêwe û şikil didan Xirîstiyantiyê. Di serî de felsefeya Stoa, felsefeyên Arîsto û Eflatûn ji wan hêmanan e ku Xirîstiyantî pêşde birine. Mîna ku bi awayekî senteza teolojiya Rojhilata Navîn û felsefeya Grek distiran. Plotînos (sedsala 3. P.Z.) ji wan kesan bû ku serkêşiya vê tevgerê dikir. Crillos, Simneon, Atanas ji wan ezîzan in ku hêja ne, balê dikişînin ser xwe. Berxwedana wan a li dijî Romayê navdar e. Ango dêra Yewnan jî bi huwiyeteke millî bi pêş diket. Diviyabûn Ronesansa xwe bi Xirîstiyantiya wan hevîrê wê distiran, pêk bi aniya. Ji ber ku navenda împaratoriya Xirîstiyantiyê bû, bi aliyên xwe yên erênî û neyênî ev pêngav bi hêz kir.

Di heman sedsalan de ev hersê gelên Rojhilata Navîn li dijî şaristaniya Roma û Bîzansê bi rêya Xirîstiyantiyê berxwedan û Ronesansa wan mîna kulîlkên buharê yên pêşwext vebûn, bi hatina Îslamiyetê re bi tevgerên bi heman rengî yên dijber wê veguheriya trajediyê. Ev rewş ji aliyê dîroka Rojhilata Navîn ve trajediyeke rastî ye, û ji aliyê çandî ve jî wê destpêka çolbûyînê bûna.

Berxwedaniya Xirîstiyantiyê ji aliyê naveroka îdeolojîk, berfirehî û kapasîteya çînî ve di veguherîna sîstema şaristaniya navendî de bi roleke mezin rabûye. Du hêzên mezin ên hegemon ên li herêmê Împaratoriya Roma û Sasanî ji aliyê îdeolojîk ve pûç bûn û hatin ber hilweşînê. Bêguman

di vê de para Xirîstiyantiyê girîng bû. Bi tevahî li dijî şaristaniyê nîne. Lê tevgereke bi ser navenda şaristaniyê ve jî nîne. Eger zêdetir li ser şêwegirtina siyasî ya xizanan bisekiniya, wê karîbûya rûyê dinyayê bi awayekî din bikirana. Berdêla berxwedana wan diviyabû sîstemeke siyasî ya hê pêşketîtir bibûya. Ketina wê ya xizmeta hêzên şaristaniyê ji bo wê bi xwe erênî nebûye. Hewl da bişibe wan û vê kir ku ji cewherê xwe dûr bikeve. Di pêşketina kapîtalîzmê de divê mirov berpirsiyariya wê piçûk nebîne. Li dijî Îslamê, nikarîbû gelên îman pê anîne, biparêze û ji lewra berpirsiyariya wê ya di nivîsandina pelên herî neyênî yên dîroka Rojhilata Navîn de, mezin e. Di pêşketina diyardeyên civakî de û di hilweşandina wan de hûnandina wê ya îdeolojîk diyarker bû. Rewşên îdeolojîk ên civakan di diyarkirina paşeroja wan de bi roleke embriyonîk radibin.

Tevgera Brahîmî weke encama pêxîrtengiyên şaristaniya Rojhilata Navîn pêşket û pirsgirêkên şaxekî wê Xirîstiyantiyê bi Îslamê re – herweha bi Cihûtiyê re – hê jî dewam dikin. Şaristaniya demokratîk ji vî alî ve bi qasî pirsgirêkên Cihûtiyê ji bo çareserkirin û jihevderxistina pirsgirêkên Xirîstiyantiyê jî dest jê nabe.

Gelekî girîng e ku mirov tevgerên Manî û Mîtra yên di dema Xirîstiyantiyê de bi tesîr bûn, nas bike û li rola wan a di nava sîstema şaristaniyê de serwext bibe. Manî weke kesayeteke hêja di salên 216-276’an P.Z. de jiyaye, û li peravên Dîcleyê xwe gihandiye û perwerde kiriye. Bi sentezeke têkel a Xirîstiyantî, Zerdeştî û Helenîzmê xwestiye ji rewşa Roma û Sasanî têde asê bûne û şerê mîna girêka kor re bersivekê, çareyekê bibîne. Lê ji aliyê hêmanên herî muhafezekar ên şaristaniya Sasanî ve hatiye qetilkirin. Eger sîstema wî bi serketa, belkî li Rojhilata Navîn Ronesanseke pêşwext çêbibûya. Mirov bi temamî nikare îdeolojiya wî di reng û nîşanên dînî de bihesibîne. Bi xisletên têkel ên felsefe û hunerê balê dikişîne. Dikarîbû ji dogmatîzma dînî re bibûya alternatîf. Pêdiviya çanda Rojhilata Navîn gelekî bi vê hebû. Ji Asya Navîn (Dewleta Uygur ew nas kir) heta bi nava Ewrûpayê alîgirên wî hebûn. Bi karektera xwe ya dualîteyî rola xwe di pêşdebirina fikrê de heye. Mirov dikare wî di nava zeviyên çandê de weke kulîlkên pêşwext çilmisîne, binirxîne.

Mîtraîzm hinekî jî mîstîzma Îranê ye. Ji ber ku Zerdeştî weke îdeolojiya fermî hat bikaranîn, Mîtraîzm di nava gel de populer bû. Rêbaz û mertebeyên xwe gihandina heqîqetê belav kirin û bi vî awayî di pêşdebirina exlaqê civakî de gelek tişt li civakê zêde kirin. Li dijî Xirîstiyantiyê stargeha dawî ya çanda Îranê ye. Weke Manîtiyê ji bo pêşîgirtina li şerê di navbera Roma û Sasaniyan de xwedî hewldan bû. Ji bo çandên li derveyî şaristaniya Îranê erdekî bi bereket bû. Mînaka Mazdekiyan hêjayî bîranînê ye. Îslamiyetê weke perdeyekê ser hemûyan nixumand. Bi awayekî homojentiya dewleta netewe ya pêşwext li ser tevahiya dewlemendiya van çandan serwer kir.

## d- Berxwedana Zerdeşt: Li Dijî Şaristaniyê Şerê Exlaqî

Di nava îdeolojiyên dijberî sîstema şaristaniyê de cih û maneyeke taybet a Zerdeştiyê heye. Ew dengê bi heybet, rûyê zelal û rohnî yê sîstema çiyayê Zagrosê ye. Li dijî hegemonya îdeolojîk a xasûk û di bin re ya sîstema şaristaniyê, bi berxwedana civaka exlaqî, xwest bersivê bide. Li dijî derewê rastî bû. Tevî ku nasnameya Îranî çanda wê ya bingehîn bû jî li hemberî Xirîstiyantî û Îslamê nikarîbû xwe nû bike.

Tevgera Zerdeştî ya derketina wê disipêrin salên 1000'î B.Z. ji orjînalbûnê zêdetir, wesfê wê yê reformê xurt e. Mirov dikare bibêje; di rêûresma Ahûra Mazda de ku kevintir e, reform kiriye. Ahûra Mazda baweriya herî kevin a Aryan e. Weke yek ji xwedayên hevpar ên qebîleyên Aryen tê pejirandin. Ji salên 1000'î B.Z. ve li dijî êrişên Asûriyan dibe ku hewcedariya bi reformê derketibe holê. Li dijî hegemonya îdeolojîk a Asûrê gavavêtineke îdeolojîk pêwîst bû. Pêşketina wî bi karekterê exlaqî, bi rastiyê re pêwendîdar e. Di Zerdeştiyê de jiyana rast prensîpek e. Wexta rewş ev be, bersivên îdeolojîk jî neçarin etîk bin. Hûnandineke xwe ya îdeolojîk a cuda heye. Xwe disipêre dualîteyên bi kok ên weke ronahî-tarî, qencî-xirabî, rastî-şaşiyê. Ji vî alî ve derketina diyalektîkariyeke pêşwext nîşan dide. Bi awayekî diyalektîk nêzî dîrokê jî dibe. Li ser hersê Pirtûkên Pîroz jî bandora xwe mezin e. Nefîkirina Cihûyan di dema Babîlan de (596-

540 B.Z.) û ji aliyê Kyros ve efûkirina wan û şandina wan a welatê wan, dibe ku ev bandor bi hêz kiribe. Bi girîngî mirov diyar bike ku bandor li Bûdîzmê jî kiriye. Herçiqasî bê gotin di sedsala 6. B.Z. de jiyaye jî zêdetir weke formeke hevpar a Magan (rahibên Zagrosan) xuya dike. Dibe ku yek ji Magên bi bandor be.

Tevî ku nasnameya etnîk a Zerdeşt pirsgirêkeke girîng nîne jî bi tevahî îhtîmal îşaret bi koka wî ya Med dikin. Peyva Mag di Kurdî de pereng û sotên agir ên di kuçikê de ketine serhev îfade dike. Em dizanin ku di zivistanên sar ên Zagrosê de qebîleyên Medan pirraniya jiyana xwe li dora van Magan derbas dikirin. Sohbet, waz û şevbêrkên herî germ li dora van Magan digeriyan. Ji ber vê sedemê ye ku ji wazvanan re Magî dihat gotin. Di Zerdeştiyê de pîrozbûna agir tê zanîn. Ji ber ku ji jiyana xwe ya rojane dizanîbûn ku bêyî agir jiyan mumkîn nîne. Li gorî qenaeteke belav û zêde, li Bakur-Rojavayê Îrana îro ango li Medyayê jiyaye. Der barê jiyana civakî de prensîp û pîvanên wî yên zelal hene. Girîngiyê bi têkiliyeke têkûz a jin û mêran dide. Di navbera hevjînan de ji hiyerarşiyeke bi kok zêdetir, têkiliyeke nêzî wekhevî û azadiyê heye. Derewkirin bêexlaqiya herî mezin e. Jiyana civakî ya ji têkiliyên evdîtiyê dûr, girîng e. Cotkarî û heywan xwedîkirin xebatên ekonomîk ên herî girîng in. Li hemberî heywanan bi temamî helwesteke hawîrdorparêz heye. Ji xwarina goşt xwe dûr digirin. Karûbarên cotkariyê bi îbadetê re wekhev têne dîtin.

Tê gotin bi cihoka Medan, bandor li çanda Grekan kiriye. Di **Dîroka Heredot** de cihê herî fireh Med digirin. Navê Persan weke gel zêde derbas nabe. Zen tê kirin ku yê herî zêde bandorê li Grekan dike kesayeta Med e. Ji ber ku şexsiyet têkiliya xwe bi exlaq re heye, mirov bandora Zerdeşt fêhm dike. Zor û zehmet nîne ku mirov têkiliya cesaret û rastiyê bi vê çandê re texmîn bike. Dîsa zor nîne ku mirov li pişt Împaratoriya Pers-Med rola mezin a vê çandê nebîne.

Heyraniya Fîlozof Nietzsche ji bo Zerdeşt girîng û hînker e. Nietzsche fîlozofekî welê ye ku bi hêsanî hukim nade. Her mijara hukim lê dide di rengê aforîzm û derb-î meselekê de ye. Xwe weke şagirtê Zerdeşt bi nav dike. Ji ber ku vê çandê nikarîbûye xwe nû bike û bi awayekî gelekî qels

(belkî hinek Zerdeştî jî mabin) gihiştiye roja me ya îro, ji bo mirovatiyê xisareke mezin e. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku monarşiya Îranê nava vê çandê pûç kiriye. Mirov dikare bifikire ku bi sedema xwediyên rastî yên vê çandê Med in, monarşiya Îranê bi helwesteke bi vî rengî rabûye. Xirîstiyantî û Îslamiyet jî di dorgirtina vê çandê de para xwe hene. Herdu dînên aliyê xwe yên dogmatîzma dînî û homojenkirinê bi giranî hene, mirov dikare ji wan vê yekê bipê û li bendê be. Li pêşiya wan weke astengeke ciddî ya îdeolojîk disekine. Ango mirov dikare bibêje ku bi tedbîrên gelekî dijwar hatiye tepisandin, nexasim Îslamê ev yek kiriye. Mirov dikare texmîn bike ku derba herî mezin di dema fethên Îslamî de xwariye. Belgeyên di dest de mane jî weke hûrikên bermayî ne. Rastiyê zêde nîşan nadin. Berxwedan û serhildanên ji aliyê kominvanên navdar ên weke Mazdek, Hurrem û Babek ve hatine kirin, ji ber hêmanên wan ên karekter û deverê, dibe ku nûnerên dawî yên Zerdeştiyê bin. Herdu jî hem li dijî monarşiya riziyayî ya Îran-Sasanî, hem jî li dijî siltanên Abbasiyan ên di nava sefahetê de, bi berxwedanên xwe bûn nîşaneya lehengî û qehremaniyê. Dîsa weke me diyar kiribû bandora wan li ser Mîtraîzm û Manîtiyê girîng e.

Li ser hîmê exlaqî divê mirov di jiyana civakî de bi kesayet be û li dijî şaristaniyê be (Ubermensch 'jor-mirov' yê Nietzsche). Jixwe ev nirxên pîvanî yên şaristaniya demokratîk in ku dest ji wan nabe. Yek ji reh û damarên sereke ku di çanda Rojhilata Navîn de şaristaniya demokratîk divê xwedî lê derkeve û xwe pê xwedî bike, rêûresma Zerdeştiyê ye.

Pirsgirêkeke bingehîn a der barê Zerdeştiyê de jî têkiliya wê bi dînên Brahîmî re ye. Mirov çiqasî dikare weke ekoleke pêxemberan a bi serê xwe bihesibîne? Mirov dikare di kîjan çarçoveyê de li xeleka pêxemberên Brahîmî zêde bike? Bersiva mirov bide van pirsan weha ye, Zerdeşt di nava dînên Brahîmî de bi giranî hatiye dawerivandin û qebûlkirin. Di amadekirina Tewratê de bi rengekî neyekser di Încîl û Quranê de ji sedî sed bandora xwe heye û berfireh e. Dîroknas radigihînin ku dema Cihû ji aliyê Babîlan ve hatin nefîkirin ji fikrên Zerdeşt ên bi rola hegemonya îdeolojîk radibû pirr bi tesîr bûne. Jixwe piştî vê dîrokê di nusxeyên

Pirtûka Muqades ên amadekirî de mirov vê bandorê eşkere dikare bibîne. Ji vê jî wêdetir, Cihû demeke dirêj di qada serweriya Pers-Sasaniyan de û di gelek wezîfeyên girîng de man. Weke bazirgan bandora xwe nîşan dan. Di nava Kurdan de hejmareke wan a zêde hebû. Herweha Cihûyên Kurd hê jî li Îsraîlê weke hindikayiyeke girîng hene. Ango bandorlihevkirina yek li ya din ango beramberî hevdu demdirêj e.

Wexta ku tê gotin çima ji Zerdeşt zêde şop nemane, ji sedî sed divê mirov vê xusûsê li ber çavan bigire. Dînî Zerdeştî tine nebû, dawerivî nava hersê dînên Brahîmî û hê dijî, bi vî awayî mirov bibêje wê rastir be. Jixwe tertîpkarên Pirtûkên Pîroz, di navê de Mûsa û Muhemmed jî bi tevahî pêxemberên beriya Brahîm ji Adem heta bi Nûh û Îdrîs girtin nava çarçoveya dînê Brahîmî. Heta Skender jî weke Skender-î Zulqerneyn li lîsteyê zêde kirin. Mînakên bi vî rengî gelek in. Wexta ku mirov bi vî awayî li rêûresma tertîpkariya Pirtûkên Pîroz serwext bibe, mirov bi hêsanî dikare diyar bike ku Zerdeşt weke pêxemberekî Brahîmî hebûna xwe dewam dike.

## e- Berxwedana Îslamî û Rastiya Wê Ya Êrişê; Şerê Dema Feodal A Çîna Navîn (Bazirgan)

Lêkolînkirina rastiya di bin navê Îslamê de herî kêm bi qasî yên di bin navê kapîtalîzmê de têne meşandin, girîng in. Ne bi tenê ji bo dîroka şaristaniya Rojhilata Navîn, ji bo rast xwendin û nivîsandina dîroka gerdûnî jî hewcedarî bi xebatên bi vî rengî hene. Çawa ku Serdema Navîn a Îslamê nebe cîhana diyardeyan a jê re kapîtalîzm tê gotin û pêkhatina modernîteya wê weke hewcedariyeke diyalektîkî pêk nayê, herdu serdem û diyarde jî rast neyên analîzkirin wê jiyaneke civakî ya manedar di roja me ya îro de jî nikaribe dewam bike.

Eger Îslam hê jî girîngiya xwe ya aktuel diparêze, ev yek ji cewherê wê yê diyalektîk e. Navê Îslamê gelekî tê bilêvkirin, lê ji rêzeke fenomenên cewherê wan nayê fêhmkirin pêk tê. Hîç nehatiye binavkirin û pênasekirin.

Belkî jî komeke fenomenan a ewçend şîlo û tevlîhev e, îmkan nîne were binavkirin, naskirin. Heta çiqas û kîjan rastiyê nîşan dide hîç nayê guftûgokirin. Ji bo wê rojî tê girtin, nimêj tê kirin, zekat tê dayîn, selawat têne kişandin, şer tê kirin, lê ew bi xwe bi temamî bûye mûammayeke nayê zanîn. Pirsa ku divê bê pirsîn ev e: Wê wextê çima evçend di rojevê de tê girtin? Li Rojhilata Navîn Îslamê çi çareser kir? Gelo sîstemeke hûnandî ye ya ku pirsgirêkan çareser dike yan jî pirsgirêkan diafirîne? Ji bingehê maddî ve divê çi bê fêhmkirin? Dewlet e, yan jî cemaet e? Di warê ekonomîk, civakî û siyasî de mane û berdêla wê çi ye? Têgîna fethê ya Îslamê amûrê çi ye? Pirsgirêkên bi vî rengî mirov dikare gelekî zêde bike û hewce ne. Ji ber ku koma fenomenan a jê re cîhana Îslamî tê gotin, bi qasî ku nikare xwe bide nasîn û ji hev derxîne di nava eczê de ye, û dewamkirina wê bi jiyaneke dirize bi întîharên rojane dimeşe yan jî nameşe.

Bi qasî çanda manewî ya vê fenomenê, çanda wê ya manewî jî wenda ye, naverok û sînorekî xwe yê diyar nîne, û komeke alavên belavbûyî û pûç tîne bîra mirov. Ya rast ew e ku divê mirov an vî navî hîç bi kar neyîne, yan jî eger ev mumkîn nebe divê mirov serê wê, sînorên wê, rêyên pirs û çareseriyê ber bi sîstemeke diyar ve bibe. Şaristaniya Rojava baş dizane çi dike û pêngava xwe ya global dewam dike. Herçiqasî krîz û pêxîrtengiyên karekterê sîstemê ne hebin jî bi çanda maddî û manewî xwe gurçûpêç kiriye ji bo ji heqê wan bê der û çareser bike. Rastiyek e ku li Rojhilata Navîn koma fenomenên Îslamî Rojava tengav dike. Ez bi tenê behsa tengasiyên DYE'yê yên li herêmê nakim. Bi tevahî şaristaniya Ewrûpayê nemaze di dused salên dawî de li hemberî Rojhilata Navîn a Îslamî ya weke 'Pirsgirêka Şerqê' bi nav dike, tengav û pêxîrteng dibe. Lê belê zirara vê ya herî mezin, hilweşîn û çeresernebûn li cîhana jê re Îslam tê gotin, dibe. Rewş bi vî awayî nikare dewam bike û ev rewş bi awayekî di çavê dinyayê gişî re biçe, eşkere bûye, derketiye holê. Bêguman çareserî bi qasî analîzkirina zêhniyeta fenomena li hemberî me, ewqasî jî bi jinûveavakirina wê pêk tê.

Wexta ku Îslam tê gotin, navê Muhemmed û Ellah weke du navên girîng ên ji hev cihê nabin, têne cem hev. Ji bo gelên Rojhilata Navîn ti koma gotinan a duberî evçend cihekî heyatî negirtiye. Di rêya van herdu navan de şerên xeternak hatine kirin û ewqasî jî gulokeke hezkirinê hatiye çêkirin. Pirr zehmet e ku mirov komeke din a gotinan a duberî ya ku weke vê, dijberiyan di hinavê xwe de radigire, bibîne. Pirsa bingehîn a divê bê kirin, ev e: ev çima wisa ye? Ya rastî em vê dualîtiyê bi serwextî dibînin û nîşan didin? Ez bi awayekî ji xwe razî dikarim bibêjim ku bersiv neyênî ye. Eger neyênî nebûya, li Rojhilata Navîn dîrok û aktualîte evçend bêrehm nedibûn, rewş asê nedikirin û bi vî awayî pêk nedihatin. Ya ez dixwazim li vir bikim, pêşdebirina şemaya maneyê ye. Yên eleqeya wan ji vê mijarê re heye dikarin ji vê şemayê sûdê bigirin.

Hemin Muhemmed di çarçoveya dînên Brahîmî de fenomenek e. Lê jiyan û gotina wî bi qasî ya Brahîm, Mûsa, Îsa û pêxemberên din (qasidên xwedê, peyamber) şîlo nîne. Agahiyên der barê wî de berçavtir in. Qet nebe mirov dikare diyarde û bûyerên jiyana wî bi pirranî bi awayekî berçav, bişopîne. Lê divê em xwe nexapînin ku ev pozîsyona wî nayê wê maneyê ku wê mijara me xweş zelal bike. Berevajî belkî jî zêdetir rê li ber tevlîheviyê veke. Ya berçav her tim weke ku yeqîn tê kirin, berçav nîne. Muhemmed berçavekî ne li berçav e. Divê em bibin xwediyê helwestekê ku nakokiya ev têgîn îfade dike, timî di bîra me de be. Bi qasî xuya dike yan jî berçav e, Muhemmed, ji qebîleya Haşimî, eşîra Qureyş e. Ji malbateke giregir û eşrafên li pêş ê Mekkeyê ye. Malbata wî bi bazirganiyê re mijûl dibe. Ew kurek e ku ji Abdullah û Amîneyê çêbûye. Bav û diya wî bi xwe xizan bûne. Tê gotin Muhemmed hê di zaroktiya xwe de hin mûcîzeyan nîşan dide. Di çanda Rojhilata Navîn de vegotinên bi vî rengî heta bi Sargon diçin û di derketina her kesayeteke girîng de van mûcîzeyan yan jî harîqayan bi wan ve dikin. Belkî jî wisa ye! Dikeve xizmeta bazirgana wê demê bi tesîr, Xetîceyê. Çend caran sefera Mekke-Şamê dike. Di sefereke xwe de li ser rê li bajarê navdar ê Romayê Bosrayê (Min bi xwe jî çû dît, min xirbeyên bermayî gelek caran ziyaret kirin. Min dêra Rahib Bahîra jî li wir dît. Di nava pîsiyê de bû) ji rahibê Nastûrî Bahîra gelekî agahiyan

digire. Di wê demê de rahibên Nastûrî têra xwe bi tesîr in. Koma herî girîng a pêşketinên îdeolojîk in.

Şam di dema xwe de bajarekî girîng ê çand û bazirganiyê ye. Bajarekî hînker e. Şêweyeke welê ya avahiya wî ya biyolojîk û fizîkî heye ku di ketina çolê de weke devê deriyê cennetê be. Mekke jî bajarekî girîng ê bazirganiyê ye. Bajarek e ku bazirganiyê ew derxistiye holê. Di pozîsyoneke welê de ye ku mîna metropola Şam-Deryasor û wêdetir be. Li bajêr gelek dîn hene û çanda pagan têra xwe heye. Bi navê Henîf û Sabiînan ên propagandaya dînên yek-xwedayî jî dikin kêm nînin. Bi kurtî bajar bi mal, çand, dîn û xwedayan mişt bûye, di ser re diçe. Xizantiya Muhemmed û têkiliya wî ya bi Xetîceyê re bi zewacê bi encam dibe û ev yek girîng e. Bi vê zewacê re ji çînekê derbasî çîneke din bûye. Bi vî awayî Muhemmed xwe digihîne pozîsyona bûrjûwaya navîn. Bêguman wê encamên vê jî bibûna. Zarokên wî çêdibin. Her ku mezin dibe û pêşde diçe, bi milên din ên Qureyşiyan re nakokiya wî zêde dibe. Milên din ên Qureyşiyan di pozîsyona arîstokrasiya eşîran de ne. Rê nadin ku Muhemmed zêdetir pêşde biçe û herroj kelemên nû derdixin pêşiya wî. Ev şerekî ciddî yê çînî ye. Di nava heman eşîrê de diqewime, pêş dikeve.

Wê wextê xusûsa girîng a divê were tespîtkirin ev e, çalakiyên pêşî yên Muhemmed bi qasî ku di nava heman eşîrê de biqewimin xwedî wesfekî çînî ne. Muhemmed şervanekî çînî ye. Lê kîjan çîn? Pirr eşkere ye: Çîna navîn a bazirgan ku ew bi xwe jî di navê de bi cih bûye. Ji sedî sed Xetîce û Muhemmed ji çîna bazirgan a li Mekkeyê li ber derketinê ye, bi rola pêşengiyê radibin. Hêza li hemberî wî kî ye? Arîstokrasiya eşîran a kevneşopiyê ye. Ew bi xwe jî ji bazirganiyê rantê bi dest dixin. Lê rola wan a bingehîn bi desthilatdariya polîtîk re têkildar e. Konfederasyona eşîran a di rengê embriyoya dewleta li ber zayînê de, heye ku şêweyê rêveberiya Mekkeyê be. Sîstema koledar berfireh belav bûye, koletiya jinan a hê hûrûkûr bûye, zarokên keç ewçend bê qîmet bûne ku wan bi saxî dixin bin erdê û ev hemû karektera koledar a rêveberiya arîstokrasiyê eşkere nîşan didin. Herweha hebûna sê pûtên mezin (Laat, Menaat û Uzza) li panteona Mekkeyê nîşan dide ku xwedayetiya sêber a di sîstema şaristaniya

kevneşopiyê de milê xwe yê Mekkeyê jî çêkiriye. Ev xusûs karektera rêveberiyê ya rêûresmî, hiyerarşîk û Sumerîk nîşan dide. Arîstokrasî weke dînê fermî bi paganîzmê radibe û ev jî ji me re têra xwe rave dike ka çima Muhemmed evçend dijwar antî-pûtperest e, antî-paganîst e.

Ez divê bi girîngî diyar bikim ku di her dema dîrokê de şerên çînî û pevçûnên din ên civakî, berê pêşî di cîhana têgînan de nexasim jî di navbera îdeolojiyên fermî û yên ne fermî de diqewimin. Rastiya wan a civakî ya maddî, dihêle ku ew xwe bi çanda manewî îfade bikin û pêşde bibin. Şerên mîtolojîk û dînî, şerên felsefeyê ji Sumerê heta bi şaristaniya Grek weke şêweyên îfadeyê ne ku şerên di çanda maddî de hatine bi kar anîn. Neçar bûn bi kar bînin; ji ber ku wekî din têkoşîn nedibû. Avahiya maddî bi avahiya maddî re şer nake. Ji ber ku lodeke alavên bê îfade û bê can in. Li ser wan bi tenê mirovên bi can, çalakî û gotinên wan dikarin şer bikin. Di pêwendiya hevpar a navbera herduyan de ya girîng ew e ku mirov rast tespît bike, formatên maneyê yên çanda manewî, diyardeyên kîjan çanda maddî bi kîjan mekanîzma yan jî avahiyan nîşan dide, heta pêk tîne.

Wê wextê mirov dikare şerê li Mekkeyê bi îfadeyeke zanistî weha bîne ziman: di navbera arîstokrasiya jor a paganîst, hişk, kevneşop û bazirganê nû yê çîna navîn de bi heman hişkiya îdeolojîk her diçe çalakiyeke vediguhere pevçûnê yan jî şer, diqewime. Li gorî rêzê destnîşankirina herikîna bûyeran wezîfeya van rêzikan nîne. Ya girîng ew e ku mirov cewherê rastiya di binî de bibîne. Ez hîç gumanê jê nakim ku cewherê di binê şer de, ev bedena tazî ya rastiyê ye. Di dema Mekkeyê de şerê îdeolojîk tê meşandin. Brahîm jî şerekî bi vî rengî di dema Ûrfayê de kiribû. Bi koçberî û hîcretê bi encam bûye. Şerê wî jî gavavêtineke çîna bazirgan bû. Şerê Mûsa li bajarê Firewn kir jî di dema xwe ya pêşî de îdeolojîk ango têgînî û manedarî bû. Encam dîsa gavavêtin bû. Qebîleya berê bi heywan xwedîkirin û bazirganiyê re mijûl dibû bi rewşa xwe ya mezinbûyî, gaveke mezin diavêje. Gavavêtina Îsa cuda ye. Bi kêmî berxwedan û gavavêtinên di sê salên pêşî de tevahiya civakên derketine derveyî sîstemê û hatine îzolekirin ji bo bibin cemaeteke nû ya civakî şer kirine. Ev gavavêtinên

gerdûnî ne. Gavavêtina Muhemmed gavavêtineke zelal a çîna navîn a bazirgan e.

Dema Medîneyê pêkhatina peyman û sozgirêdana vê ya siyasî û civakî îfade dike. Ango peymana nû pêşnûmeya dewleteke nû ye. Ji bo li bajarê piçûk dewleta mezin derkeve holê, çalakiyên eskerî û siyasî yên li derdora deh salan têrê kirine. Ji vir û pêve, şer û pirsgirêkên bi awayekî bi lez belavbûna di nava zeman û mekan de ne. Li vir nuqteyeke girîng a divê mirov lê serwext bibe ew e ku divê mirov karibe wan li ber wekheviyên wan ên dîrokî bigire. Di serî de dewleta Asûr li Rojhilata Navîn dewletên bazirganî kirine bingehê xwe, hatine avakirin. Jixwe di avakirina her dewletê de yekdestdariya bazirganiyê weke blokekê ji sedî sed cih û destê xwe heye. Yekdestdariya dewletê nebe dewlet jî nabe. Divê mirov ti carî ji hişê xwe dernexîne ku aliyekî dewletê bi giranî ji yekdestdariya bazirganiyê pêk tê.

Çawa ku di Peymana Medîneyê de em dibînin, cudahiya Hz. Muhammed ew e ku cara pêşî karîbû qebîleyên Ereban ên mîna li ser êgir bin û destê bi hêz ê şaristaniyê hê ne gihiştibû wan, bi awayekî serketî bike hevparê peymanekê. Ya Muhemmed dike bi tenê ew e ku karîbû ji qebîletiya Ereb dewletê biafirîne. Dewletbûyîn ango di sê qadan de bi lez pêkhatina yekdestdariyê bû. Ango yekdestdarî di qada cotkarî, pîşesazî-zenaet û bazirganiyê de bû. Di civaka Rojhilata Navîn de bingehê van hersê qadan beriya derketina holê ya Stenbolê bi sê hezar û pêncsed salan wêdetir diçe û desteserkirin û talana mayeyên civakî ji aliyê van hersê qadan ve îmkaneke mezin a maddî ye. Bi awayekî herî lezgîn pê digihîjin kapîtal û sermayeyeke weke çiyan. Li Erebistana her çûye bûye çol, qebîleyên bi hezarên salan li sînorê birçîbûnê mane, wexta bêhna van hersê qadan kirin, têrê dikir ku 'şerekî weke dînan' bikin. Hostetiya mezin a Muhemmed ew e ku karîbûye sê şaristaniyên mezin ên li dora qebîleyan ango şaristaniya Sasanî, Bîzans û Hebeşistanê bibîne, pê bihise û fêhm bike ka çawa bi hezarên salan qebîleyên Ereb ên li Erebistanê ji çar aliyan ve dorteng û tengav kirine. Aliyekî hê girîngtir ê hostetiya wî ew e ku rastiya maddî bi VEGOTINEKE DÎNÎ YA MUHTEŞEM veguherand rastiyeke

manewî ango ÎSLAMê û di bin vî navî de komên qebîleyan bi heman hostetiyê xistiye nava ÇALAKIYÊ ango DAN ŞERKIRINÊ. Bi pêşkêşkirina bêhna manewî ya yekdestdariyê, qebîle serxweş û bi coş kirin, enerjiya ji vê hatî, herikî qadên şaristaniya navendî û derket ser dika dîrokê û ev jî şerê Îslamî ye. Bi halan, bi şûr, bi xwîn, bi îman û bi xenîmetê!

Ez ji bo şervaniya qebîleyên Ereb piçûk bixînim van têgînan bi kar nayînim. Li gorî min hewce ye ez li vir cihêbûnekê ciddî bikim. Xizanên qebîleyan bi rastî ji îdeolojiya li ser navê Îslamê hatibû tertîbkirin, bawer dikirin, baweriya wan pê hatibû anîn. Gelekî bawer dikirin ku ew şerekî gelekî pîroz dimeşînin. Bi qasî misqalê zerre şik û guman nedikirin ku ew DI RÊYA XWEDÊ DE şer dikin. Lê mirov nikare heman tiştî ji bo tevahiya qademeya arîstokrasiya qebîleyan û fermandaran bibêje. Pirraniya van kesan hê Muhemmed sax li heyatê bû bêhna yekdestdariyê kiribûn û dizanîbûn ku gotinên li ser ELLAH galgalên zêde ne, yan jî propaganda ye. Jixwe van kesan dewleta nû di demeke pirr kin de ango em dema çar xelîfeyan jî bihesibînin, li derdora bîst salan, Xanedaniya Emewiyan kirin destê xwe.

Em divê hinekî li vir bisekinin. Ellahê Muhemmed tiştekî çawa ye? Gelo têgîn e, yan jî rastî ye? Şaristaniya Ewrûpayê bersiva vê pirsa dawiyê têra xwe guftûgo kir û li ser vî hîmî karîbû bibe hegemonê dinyayê. Ji lewra pirr bi derengî be jî kesên bi Îslamê re eleqedar dibin pêwîst e ku vê pirsê heta dawiyê guftûgo bikin û li cem xwe wê hêzê bibînin ku li bersiva wê bigerin, naxwe wekî din rêyeke wan a derketin û gavavêtinê hema hema nîne. Eger hebe jî ew rêya bi tevahî redkirina Îslamê ye. Ji ber ku ev jî pirr mumkîn xuya nake û nabe, ji pêşdebirin û dayîna bersivê wêdetir ti rê namîne.

Di etîmolojiya Semîtîk de Ellah weke nav rabihuriyeke xwe ya gelekî kevin heye û ji koka El tê. Min berê behsa wê kiribû ku bi maneya 'bilindahî û meznahî' tê. Ji bo têgîna xwedayê mucered ê giştî yê qebîleyên Semîtîk xwedî hevmane ye. Tê texmînkirin ku bi rêya qebîleyên Ibranî ji komên Kenanî yên Semîtîk hatiye girtin. Di Tewratê de 'Ellah' û paşê 'Reb', di Xirîstiyantiyê de 'Bav-Kur-Ruhê Pîroz', bi derketina Muhemmed xwe digihîne 'Ellah'. Koka têgînî ya peyvê eşkere ye. Ez ê li vir nekevim mijara

teolojiyê. Min berê jî destpêkeke piçûk kiribû. Ez dikarim vê jî lê zêde bikim: têgîna Muhemmed û Ellah, bi tevahî hêmanên maddî û manewî yên çanda civakî bi semboleke nasnameyî tedarik dikin. Maneya civakê jî rave kiriye. Muhemmed bi xwe jî wexta tevahiya civakê digot, mebesta wî ji vê civaka nû ya pêk dihat an jî dihat avakirin 'civaka Medîneyê' ango 'civaka Îslamî' bû. Ellah bi maneya enerjî û ruhê hêmanên maddî û manewî yên tevahiya vê civakê dihat bikaranîn. Civaka pêk tê, civaka Ellah e. Jixwe îfadeyên bi vî rengî bi awayekî berfireh têne bi karanîn. Şaneyeke bi tenê ya civakê namîne ku Ellah li ser bi bandor nebe. Muhemmed têgînê hê berfirehtir dike. Li ser her tişta hatiye, hatî û wê bê weke hêmanê afirîner ferz dike. Li vir bi temamî metafizîkeke dişibe ya Hegel heye. Xwedayê Ibraniyan hê bi sînor bû. Li cem Grekan 'Demiurg' bi tenê di tiştên heyî de bi rola mîmariyê radibû. Afirîner nebû. Guftûgoya li ser afirîneriyê jî şaş tê kirin. Afirêneriya li cem Muhemmed, afirîneriyeke bi maneya çor nîne.

Xwedayên di panteona Sumer de bi awayekî eşkere berpirsên asta jor a dewleta nû nîşan dikirin. Tertîpkirin besît û bi tesîr bû. Ji bo asta çandî ya manewî ya wê demê tertîbeke bi vî rengî têra xwe dikarîbû bide bawerkirin û rewakirin. Lê ji bo zêhniyeta civakî û çanda manewî ya dema Muhemmed tertîbeke çor a xwedayan têra rewakirineke bi vî rengî nedikir. Jixwe pûtên li Kabeyê yên vê tertîbê tînin hişê mirovan, ne bi tenê weke Brahîm şikandine, belê bi tevahî tesfiye kirine û perestina ji bo wan jî weke gunehê herî mezin hesibandiye. Cezayê wan li vê dinyayê mirin, li dinya din jî cehennema ebedî bû. Xwedayê nû, ango Ellah panteona ji Sumer û Misriyan ve dewam dikir, bi tevahî betal û qedexe dikir û bi vî awayî jî yek ji şoreşên herî mezin ê manewî kir. Beriya her tiştî "şoreşeke Xwedayî" mewzûbehs e. Bi vê, civakê çi bi dest xist, çi wenda kir? Ev pirseke din e ku bi ya min guftûgokirina wê gelekî girîng e. Eger têkiliya pirrxwedayetiyê bi civaka pirranî û demokrasiyê re û têkiliya civaka yek xwedayî bi dîktatoriya monarşîk re li ber hev were girtin, guftûgoyeke li ser vî hîmî were kirin, dikare encamên gelekî girîng derxe holê.

Lê dîsa jî têgîna Ellah a Muhemmed mirov bişibîne têgîna 'îdeya îdeyan' a Eflatûn û 'Entellegya' Arîsto bi ya min hê rasttir e. Mirov asta zanistî ya

roja me ya îro li ber çavan bigire, weke têgîna ‘antî-madde’ li gerdûnê û têgîna ‘enerjiyê’ ya baştir tê fêhmkirin bifikire, di cih de ye. Ev beş, bi wesifkirina Ellah bersiva gerdûna li derveyî mirov tê dayîn. Peyva Ellah weke îfadeya topyekun a nasnameya civakî ji bo Muhemmed ji sedî sed vê bersivê dide. Bi vê, ez hez dikim vê bêjim: Li ser navê Ellah çalakî têgîn an jî propagandeyeke tewş û pûç nîne. Bi rastî maneya wê, îfadeya pratîkeke berfireh e. Nexasim wexta Xwezaya Civakî mewzûbehs be, li ser navê Ellah çalakî ji sedî sed ‘têkoşîna civakî’ îfade dike. Ez hîç şik û gumanê jê nakim ku Muhemmed jî têgîn bi vê maneyê bi kar aniye. Ji vê jî girîngtir, ez bawer nakim ku armanca wî ya bingehîn li Rojhilata Navîn fetihkirina yekdestdariyên karê ye (cotkarî, pîşesazî û bazirganî). Têkoşîna wî ya civakî sosyal demokratiyeke tîpîk a çîna navîn bû an jî bi awayê ez hewl didim bi kar bînim, têkoşîna wî têkoşîna ‘komara demokratîk’ e ku ‘civaka demokratîk’ jî digire nava xwe.

Ti îşaret nînin ku nîşan bidin Muhemmed dixwaze qraltiyeke nû ava bike. Dîsa ti îşaret peyda nabin ku nîşan bidin, dixwaze xanedaniyekê ava bike. Eger bixwesta hêza wî têra vê dikir. Bixwesta ji serî ve dikarîbû li pêşiya muessesa xelîfetiyê jî bibûya asteng. Em helwesta wî ya li Mizgefta Pêşî ya Medîneyê şîrove bikin: Bi temamî pirsgirêkên civakî têne guftûgokirin. Ev xusûseke gelekî zelal e. Ji cemaetê herkes radibe, heta bêyî ku ji cihê xwe rabin der barê mijarên bingehîn ên civakê de fikrên xwe beyan dikin, hesab dipirsin. Tevlîbûn, pêkhatin û meşandina civînan ji sedî sed demokratîk e. Ji jin û koleyan, ji her qewm û koma etnîk dikarin tevlî bibin, dikarin mafê axaftinê werbigirin. Mînak Bîlalê Hebeşî koleyekî reşik ê Efrîkayî ye. Selmanê Farisî sehabeyekî bi koka xwe Fars e. Jin bi mêran re nimêja hevpar jî dikin. Eşkere ye ku di destpêkê de, di derketinê de şovenîzma qewm û cinsiyetê nîne. Dîsa cihêkariya di navbera çîn û qebîleyan de nîne. Tevlîbûna demokratîk a di derketina Îslamê de rastiyek e ku guftûgo li ser nayê kirin. Herweha di civînên pêşî yên mizgeftê de rêveber û fermandarên muhtemel, têne diyarkirin. Ji bo rakirina bêedaletiyan gelek biryar têne dayîn.

Mijara xenîmetê jî mirov dikare wisa şîrove bike: Eger neqelibe talan û îstîsmara şexsî, mirov dikare bi hêsanî îdîa bike ku gelemperîkirina yekdestdariyan, pêngaveke demokratîk û adil e. Mirov dikare diyar bike ku ev herdu mijar bi tenê jî eşkere nîşan didin ku Îslamiyeta di dema hilatinê de ye, li demokrasî û edaleta civakî vekiriye. Jixwe ev tevlîbûna demokratîk nebûya, ne mumkîn bû ku evçend qebîle, xizan û hêmanên çîna navîn biketana nava tevgerê. Rêxistiniya Muhemmed li ser hîmê zorê nebû, rêxistiniyek bû ku li ser navê eşqa Ellah dihat pêşdebirin. Şerê wî jî her wisa bû. Eşkere ye ku şoreşeke berfireh a îdeolojîk, civakî, ekonomîk û siyasî hatiye meşandin. Ez bi vî şêwazî meşandina şoreşê ya Muhemmed gelekî hêja dibînim. Pîvanên şoreşgeriya rastî nîşan dide. Hûnandina îdeolojiya şoreşê têkûz datîne û dikare vê yekê li her asta civakê bi saxlemî belav bike; wexta vê dike di asta eşqê de bi serwextî û baweriyê dimeşîne: ya ez bi cewherî ji ‘rastiya Muhemmed’ fêhm dikim ev e. Jê pêve jî bi gotina gelêrî, galgalên tewş in. Şêweyên zikir û îbadetê jî heta ev cewher nebin ji galgal û tevgerên tewş û pûç wêdetir, ti maneyê îfade nakin.

Hinek xusûs hene ku wexta Muhemmed bi xwe jî kiriye dudilî bûye û ev xusûs li rexneyê vekirî ne. Ya pêşî, piştî Şerê Xendeqê ji ber hevkariya wan a bi Mekkeyiyan re kuştina mêrên qebîleya Cihû ya Benî Qureyza ye. Cihû vê mijarê weke ceribandina ‘qirkirina’ pêşî şîrove dikin. Di vir de bi tevahî Cihû mewzûbehs nînin, mêrên gihiştî ne. Di şerekî heyatî de bi aliyê dijber re hevkarî heye. Li gorî min ev çalakiya kuştinê sînorê xwe derbas kiriye û aliyekî neyênî yê Îslamê ye ku paşê gelekî tê îstîsmarkirin. Ya diduyan, helwesta dudil a berê li hemberî xwedayetiyên Laat, Menaat û Ûzzayê, şûna xwe ji înkar û qedexekirineke radîkal re dihêle û ev jî ji ber ku di cîhana Îslamî de paşê wê rê li ber rejîma siltaniyê ya tofanê rake veke, zêde çûye. Têgîna xwedayekî nermtir, bi qasî Xirîstiyantiyê nebe jî dikarîbû ji bo pêşketina cîhana Îslamê bi pirraniyê gelekî kêrhatîbûya. Mirov rexneyên bi heman rengî dikare zêde bike û pêşde bibe. Ya girîng ew e ku divê mirov zanibe, Îslam yek ji tevgerên mezin ên rexneyê ye, û herçend bi derengî be jî divê mirov karibe vê sîleha rexneyan di çareserkirina pirsgirêkên bingehîn de bi kar bîne.

Ji ber ku mijara me rê nade, ez ê nikaribim der barê 99 sifetên Ellah de şîroveyê bikim. Lê dîsa jî divê berê pêşî ez bibêjim ku ev 99 sifet bi xwe jî 'bernameya veguherîna civakî' ya herî hêja ye. Ez divê diyar bikim ku hîç gumana min nîne, Ellah û 99 sifetên wî ji sedî sed bi qasî ku bernameyeke mezin a demdirêj in, ji bo pêdiviyên rojane yên demkurt jî bernameyeke civakî di nava xwe de dihewînin. Dîsa ez hîç gumanê jê nakim ku ji sedî sed maneya wan a li cem Muhemmed jî bi vî awayî bûye. Ya mirov pê diêşe û cihê xemê ye, li pey şexsiyeteke dîrokî ya mîna Muhemmed ji xayînên herî rezîl bigirin heta bi her cure kesayetên munafiq û durû yên sefîl û sefîh karîbûn sextekariyên xwe yên mezin di bin navê 'Îslamtiyê' de heta roja me ya îro bînin. Ya trajîk e, û divê ji sedî sed mûammaya wê bê çareserkirin ev 'hadîse' ye, ev bûyer e.

Ji vir û şûn ve, em hewl bidin moment û fenomenên girîng ên Îslamî rêz bikin û manedar bikin.

**1-** Dema çar xelîfeyan, bi berhevkirina ayetên Quranê û hedîsan û bi lezeke mezin meşandina tevgerên fethê xwe dide hiskirin. Di vê demê de hê derzeke ciddî li Îslamê neketiye. Arîstokrasiya kevin a Mekkeyê hê di wê hêzê de nîne ku pêngava xwe ya dijî şoreşê pêk bîne. Beriya her tiştî tê guftûgokirin ka Elî çima nebûye xelîfe. Ev guftûgo wê her biçe mezin bibe. Hê jî ti şop û îşaretên seltenatiyê xuya nakin. Demeke nêzî demokrasî û komarê heye. Heta bi salên 650 P.Z. Bîzansî avêtin pişt Torosan, Xanedaniya Sasaniyan bi dawî bû, împaratorî hilweşiya. Osman û Elî têne kuştin. Arîstokrasiya Qureyş di şexsê Muawiye de bi tenê tola xwe ji Îslama şoreşger nehiland; rejîma seltenat a navenda wê Şam jî bi lez ava kir. Ji mirov wer tê xanedan û pêşengiya bi bandor a Împratoriya Sasanî guheriye û dewam dike. Jixwe burokrasiya nû ji burokrasiya kevin a Îranê pêk anîne. Îslam weke nav xuya dike û tê parastin, lê di cewherê xwe de xiyaneteke mezin lê hatiye kirin. Di sala 681'ê P.Z. de endamên malbata Muhemmed ên mayî di şexsê Husên de bi Komkujiya Kerbelayê ya trajîk bêyî ku rehmê li jin û zarokan bikin tev kuştin û bi vî awayî tevgereke tolhildanê ya dilêşane temam bû. Ji vir û şûn ve ya li pey hatî ne Îslam, 'DIJ-ÎSLAM' e.

Mijara dij-Îslamê heta bi awayekî eşkere neyê şîrovekirin, tevahiya dîrokê ti tevgera civakî ya li ser navê Îslamê hatiye kirin û meşandin wê maneyeke rast a şîroveyê nebe. Li ser navê Îslamê gelek rêûresm û terîqet çêbûne, hatine avakirin. Heta li ser navê Ehlîbeytê 'Elewîtî' û 'Şîatî' hatine avakirin. Lê ev hemû wê nikaribin Dij-Îslama serdest ji cihê wê bikin. Ya rastî Dij-Îslam tevgerek e, li Rojhilata Navîn bi ser sîstema şaristaniya navendî ya kevneşopiyê ve dibe. Bi vî awayî Îslama şoreşger, demokratîk û bi temamî dewlet nebûyî ya weke komareke civakî ye, pêşî xiyanet bi nirxên wê yên bingehîn re tê kirin û weke kêliyeke nû wê dikin yek ji fenomenên şaristaniya kevneşopiyê ya sêhezar û pêncsed salî. Abbasî wê weke yek ji rawestgehên girîng ên Dij-Îslamê bi roleke girîng rabin. Bi qasî Xanedaniya Emewiyan nebe jî wê Dij-Îslamê li Rojhilata Navîn bikin hêza herî mezin a hegemonîk. Xanedaniya di dema 750-1250'î P.Z. de pêk hat bi awayekî mîna Babîla nû ye. Bexda wê di sala 760'î P.Z. de weke Babîla nû û paytextê bihata avakirin. Di vê demê de tevgereke felsefe û Teolojiya Îslamî ya destpêkirî lê bi temamî negihiştî encamê, heye. Guftûgo li ser aqilê azad hatiye kirin. El Kindî, Farabî, Îbnî Razî, Cabîr, Îbnî Sîna û Îbnî Ruşt kesayetên girîng ên vê demê ne. Di guftûgoyên felsefîk de (li derdora 800-1200'î) gelekî li pêşiya Ewrûpayê ne. Di pêşketinên zanistî de jî li pêş in.

Dawiya sedsala 12. çi di dîroka şaristaniya hegemonîk a Rojhilata Navîn de, çi jî li gorî ku Îslam navê vê hegemonya dawî bû, qonaxeke krîtîk e. Çarenûsa Rojhilata Navîn û Îslamê pêve girêdayî ye ka gelo ew ê vê qonaxê bi awayekî serketî derbas bikin yan na. Di dîroka Îslamê de mirov dema heta vê qonaxê dikare weke Îslama Ereb binirxîne. Îslama Ereb ne Îslama şoreşger, Dij-Îslamê temsîl dike. Di rêxistinkirina arîstokrasiya qebîleyan weke hêza şaristaniyê û avakirina hegemonya herêmî de bi ser ketiye. Ev navê din ê Îslamê 'Îslama Sunnî' ye. Îslama Sunnî ji aliyê etîmolojîk ve maneya xwe 'Îslama rastgir, rêûresm û arîstokratîk' e. Di dîroka Xirîstiyantiyê de Romaya Rojhilat (Bîzans) piştî sêsed salan Xirîstiyantî weke îdeolojiya fermî qebûl kir û ev mînak rewşa Îslama Sunnî bi bîra mirov dixe. Di vir de cudahiya Îslamê ew e ku vê pêvajoyê bi lez bi cih tîne.

Ne di nava sêsed salan de, lê di nava demeke kin a bi qasî sîh salî de pêk tîne.

Bi şaristaniyê re yekbûyîn bi awayekî xwezayî bêyî dabeşbûneke radîkal pêk nayê. Mîna ku di Xirîstiyantiyê de pêk hat, ev pêvajo di Îslamê de jî bi awayekî berfireh qewimî. Xizanên qebîleyan wê bibînin ku arîstokrasiya qebîleyên hêza desthilatdar in, xiyanetê li wan dikin û wê di vê çarçoveyê de li dijî wan şerekî dijwar ê navxweyî bidin destpêkirin. Mînaka pêşî tevgera ‘Xariciyan’ e. Ev fraksiyoneke mezin û pêşî ye ku ji ber nakokiya di navbera Elî û Muawiye de nerazî ne, çalak dibe. Endamên wê giş Bedewî ne. Gelekî bi hêrs bûn, ji ber ku soz ji wan re hatibûn dayîn û para xwe wernegirtibûn. Ji ber ku wan bi xwe şer dimeşand, lê belê beşê li pey xanedaniya arîstokrasiya jor nîmetên şer desteserkiribûn. Çalakiyên gelekî xwînrij tertîp kirin. Elî bû qurbanê vê pêvajoyê. Ya rastî, Xariciyan li dijî sê kesên şerê desthilatdariyê meşandin ango li dijî Elî, Muawiye û Emr Îbn-ul As reşkujî pîlan kirin. Ji van ji diduyan re li hev hat û xelas bûn. Tevgera Xariciyan bi aliyê xwe yê li dijî şaristaniyê gelek balê dikişîne ser xwe. Ji ber ku gelekî têne reşkirin der barê wan de nirxandineke objektîv nehatiye kirin. Eşkere ye ku beşên herî kedkar û xizan temsîl kirine. Mirov dikare bibêje, dilê wan razî nebûye ew demokrasiya destpêkê û tevlîbûna di derketina Îslamê de hebû, ji dest biçe û di Îslamê de desthilatdarî serdest bibe û ber bi dewletbûnê ve biçe. Ji ber van sedeman jî çalakiyên xwe pîlan kirine. Di nava Îslamê de ji ber ku nîşaneya herî hêja ya xwelihevrakişandina demokrasî û desthiatdariyê ye, girîngiya xwe ya dîrokî gelekî mezin e.

Çawa ku di dîrokê de gelek mînakên wê têne dîtin, mehrûmbûna ji rêbertiya rêxistinî û îdeolojîk hişt ku birizin û pê re di nava çerxên hêzên desthilatdariyê de bihelin. Malbata Muhemmed a jê re Ehlîbeyt tê gotin piştî felaketa li Kerbelayê careke din nikare pişta xwe rast bike. Tevgera Duwanzdeh Îmaman, Tevgerên Simaîlî û Fatimiyan, tevî ku li ser navê malbatê rabûn jî nikarîbûn Îslama Sunnî ji desthilatdariyê bikin. Ev ekola hewl da zêdetir li Îran, Anatolya û Bakurê Efrîkayê bi hêz bibe, herçend hin dewletên temenkurt ava kirin jî ji temsîlkirina Îslama şoreşger dûr bû. Di

serê sedsala 16. de şaxên wê yên Îranê di bin navê ‘Şîa’ de karîbûn bibin hêza fermî ya şaristaniyê. Dewleta Fatimî ya li Bakurê Efrîkayê hat avakirin ji bo dewleta Îslamê û Ehlîbeytê jî ji rêderketineke rastgir bû. Xizanan Elewîtî û yên din ên wekî wan Karmatî, Murebîtûn û Hesen Sebbahî zêdetir weke berxwedanên radîkal li dijî desthilatdariyan, hebûna xwe dewam kirin.

**2-** Bi awayekî bingehîn a Xanedaniyên Emewî û Abbasiyan kir ew bû, arîstokrasiya qebîleyên Erebistanê kirin desthilatdar û hejmareke dewlet ava kirin, bi vî awayî jî bi rola xwe ya dîrokî rabûne. Bi vê riyê enerjiya hundir a sîstema qebîleyên xwedî rêûresmeke hezarê salan mêtine. Ji vê şûn ve Erebên mayî weke kategoriyeke dîrokî bi navê ‘Erebên Bedewî’ ji nû ve dibin xwedî mane. Mirov dikare van weke xizanên qebîleyên derbasî Îslamê bûne û beşên civakî yên bicihbûyî û yên nîvbicihbûyî bide naskirin. Çawa ku dibin misilman, heman dabeşbûnê mirov li cem Tirk û Tirkmenan û li cem Kurd û Kurmancan jî dibîne. Ev dabeşbûn ji hev cihêbûneke girîng a civakî û li Rojhilata Navîn tevgereke ciddî ya çînî ye. Bi giştî li dijî arîstokrasiya qebîleyan a dibe desthilatdar, muxalif dimînin û weke perdeyeke îdeolojîk Îslama şoreşger di serî de jî weke Elewîtiyê wê hewl bidin bi rêya gelek mezheb û terîqetan hebûn û jiyana xwe dewam bikin.

Erebtiya Sunnî weke Dij-Îslamê karîbû Ereban ji komên qebîleyan ên belavbûyî bigihîne qewmekî weke qewmê necîb ango qewmekî weke esilzade were bilêvkirin. Qebîlegiriyeke şoven û hegemon jî timî bi xwe re hilgirt. Bi awayekî proto faşîzma Îslamgiriyê bû. Di roja me ya îro de hêzên radîkal ên Îslamtiya rastgir (Îslama modern a selefî) vê rastiyê piştrast dikin. Di Xirîstiyantî û Mûsewîtiyê de bûyerên bi heman rengî her qewimîn û pêkhatin. Îslama Ereb kengî yekdestdariya siyasî ya şaristaniyê kir destê xwe, bi alternatîfên dîrokî re rûbirû bû. Alternatîfa yekemîn fetihkariya eskerî bû. Ev fetihkarî bi çavê xenîmetê li danehevên civakî dinêre û ji lewra jî desteser dike. Di vê demê de, di civaka Rojhilata Navîn de têra xwe mijarên xenîmetê hene. Ji Xirîstiyan û Mûsewiyan, tevî beşên din ên ji wan re kafir dihate gotin, li gorî rêzê ciziye û zêde xûkî dihat stendin, di dema şeran de jî bi awayekî talanê serî li ‘xenîmetê’ didan, ango danehevên

civakî desteser dikirin. Bacên ji gelên misilman dihatin stendin bi sîstema 'eşar' ve girêdayî bû. Berhemê zêde yan jî hatinên salane yên weke berhemê zêde ji wan ji dehan yek dihat girtin. Samîr Amîn herçiqasî bixwaze vê yekê weke 'xûkîvaniyek' a kategoriyeke sîstemîk pêşkêş bike jî ev pirr alternatîfeke manedar nîne. Bi giştî finasekî şaristaniyê ye.

Alternatîfa duyemîn jî yekdestdariya bazirganiyê bû. Mirov dikare bibêje, di vê mijarê de qonaxeke ciddî hatiye bihurandin. Beşekî girîng ê eşrafên rêûresmê jixwe berê bazirganî nas dikirin. Ji ber ku arîstokrasiya Mekkeyê li ser hîmê bazirganiyê pêk dihat. Li Erebistanê ji bo yekdestdariya cotkariyê atmosfera jeobiyolojîk zêde derfet û îmkan nedidan. Ji ber karektera çolê xwedîkirina heywanan jî pirr bi sînor dihat kirin. Bazirganiya mesafeya dûr ango derfetên karê, bazirganî dikir yekdestdariyeke girîng a karê. Şam, Heleb, Basra, Qahîre, Taîf, Mekke, Qayrewan, Semerqend, Buxare, Xazne, Herat û bêguman paytext Bexda weke navendên nû û girîng ên bazirganiyê ketibûn dema xwe ya bilindbûn û mezinbûnê. Pirr beriya Ewrûpayê şoreşeke 'bazirganî û bajarvaniyê' bi awayekî pêşketî pêk dihat.

Sedsalên 8.-12. P.Z. di heman demê de demên 'şoreşa bazirganî û bajar a Îslamê' ne. Di yekdestdariya cotkarî û pîşesaziyê de kar têra xwe ji nû ve nehatiye birêxistinkirin, ango bi sînor maye. Heman pêngava şoreşê di cotkarî û pîşesaziyê de pêk nehatiye anîn. Nuqteya herî krîtîk ji bo Îslamê di vê mijarê de asê dibe. Çima pêngaveke berdar a pîşesazî û cotkariyê nehat avêtin? Di bingehê xwe de li Rojhilata Navîn di herdu qadan de jî têra xwe derfet û îmkanên ketine ser hev hene. Çemên Nîl, Dîcle, Firat û Pêncavê bi serê xwe ji bo şoreşa cotkariyê av û erdên bi bereket pêşkêş dikirin. Di bingehê şaristaniya Sumer û Misrê de şoreşên pêşî yên cotkariyê hebûn. Herweha şoreşa cotkariyê ya hezar salan a neolîtîkê jî hê li ser kar bû. Ango civakeke gelekî têkûz a gund-cotkariyê hebû. Zenaetkarî û pîşesazî jî bi dîroka bajêr ve têkildar xwediyê danehevên herî demdirêj ên dîrokê bûn (li derdora çar hezarûpêncsed salan). Li ser hîmê zanistî û felsefî yê hewce nexasim di dema Abbasiyan de şoreşa nîv Ronesansê

pêkanîbû. Eger bihata xwestin wê şoreşeke pîşesazî û cotkariyê ya gelekî ji Ewrûpayê pêşdetir pêk bihata.

Sedema bingehîn a pêkneanîna vê şoreşê, bi ya min divê mirov di şêwazê komkirina karê de bibîne û şîroveya herî rast ev e. Sîstem, bêyî şoreşê di cotkarî û pîşesaziyê de bike, bi rêbaza bazirganî û xenîmetê dikarîbû kareke mezin kom bike. Desthilatdarî û xenîmetên şer ango xûkîgirtin hê bêtir bal dikişandin ser xwe û berdar xuya dikirin. Hema bêje li derveyî Çînê tevahiya deverên şên û avabûyî yên dinyayê karîbûn bikin mijara xenîmet û bazirganiyê. 'Fetihkariya Cîhanê' derfet û îmkan didan vê yekê. Artêş û şer veguherîbûn çalakî, rêxistin û yekdestdariyên karê yên herî berdar. Lê li Ewrûpayê weke hêzên pêşeng ên şoreşa pîşesazî û cotkariyê yekdestdarên Ingilîstan û Hollandayê ji bo ji rewşa xwe ya tengavbûyî (Spanya, Franse û ji bo ji rewşa xwe ya ji aliyê Papa ve hatiye tengavkirin) derkevin çare di pêngavên pîşesazî û cotkariyê yên li pey hev kirî de, dîtin. Di rewşeke berevajî de tiştekî dûrî aqilan nebû ku ji aliyê hêzên têne tengavkirin ve ji hev de bêne xistin û veguherin mêtingehan. Yekdestdarên desthilatdar ên Rojhilata Navîn pirsgirêkeke wan a bi vî rengî tinebû. Hegemonya li her alî giraniyeke xwe ya wekhev hebû. Bi awayekî taybet li dijî vê hegemonyayê hêzên bi pey yekdestdariyeke karê bikevin jî zêde nînin. Qewmên Xirîstiyan bi xwe niyeteke wan ji bo vê hebûya jî (nemaze Ermenî, Asûrî û Grek ji bo vê namzet bûn), ji ber Bîzansê (hêza statukoparêz a wê demê bû), şensa pêkhatina vê yekê tine bû. Jixwe Îslamê jî pêşî li wan girtibû. Ji lewra hunerê artêş û şervaniyê weke yekdestdariya desthilatdariyê hê jî di wê rewşê de bû ku rola xwe weke amûrê herî girîng û têr ê karê dewam bike. Veguherandina civaka welatekî weke qada xenîmetê ji bo serketinekê têrê dikir. Çavkaniyên ji bo wan bêne şerkirin jî weke guloka berfê her mezin dibûn.

Naxwe wexta mirov şoreşa cotkarî û pîşesaziyê bi yekdestdariya eskerî û siyasî re bide ber hev, ji ber ku zêde karê nayîne pêş nakeve. Pêşneketina şoreşa cotkarî û pîşesaziyê dihêle şoreşa zanistiyê ango şoreşa hunerî û felsefî ya li pişta wê jî pêş nekevin. Bi ya min Ronesans, reform û rohnîbûna Îslamî ji ber vê sedema bingehîn heta dawiyê nehat pêşdebirin,

pêkanîn. Mînaka ku bi dîroka xwe ya çarsed salî re xiyanetê bike, derfet û îmkan dan ku hegemonya wê ji destê wê bikeve destê Ewrûpayê. Ev yek ji nêz ve têkiliya xwe bi zordayîna wê ya Xirîstiyan û Mûsewiyan heye. Xirîstiyan û Mûsewî di Ewrûpayê de asê kirin. Îslama Sunnî bi vî awayî wexta pêngava xwe ya herî mezin û dawî ya şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn pêk dianî, di heman demê de sedemên bingehîn ên ku wê hilweşîna wê bi xwe pêk aniya jî amade dikirin. Tevahiya hêzên îdeolojîk, ekonomîk, siyasî û eskerî yên di vê de cih digirin, navê nasnameyî yê Îslama Sunnî ya fermî ne.

Şaristaniya Îslamê û muxalefeta wê ya demokratîk a piştî sedsala 12. ji bingehê xwe yê qewmiyeta Ereb derket û ket rengekî pirrqewm. Di vê demê de zêdetir arîstokratên qebîleyên Tirk bi roleke sereke radibin. Di vê pêvajoya girîng de ku heta roja me ya îro dewam dike, serûbinbûnên çînî û etnîkî çêdibin. Hê di dema Emewiyan de şovenîzma Qureyş (şovenîzma qebîleyê) di bin navê Qewmê Necîb de (qewmê esilzade) veguherî şovenîzma Ereb (şovenîzma qewm). Piştî xiyaneta çînî (li dijî qebîle, xizan û Bedewiyan) ya Dij-Îslamê (bi giranî Îslama Sunnî) duyemîn xiyaneta herî mezin li ser bingehê qewmiyetê hatiye kirin. Ev mîrate wê piştre hê hişktir bibe, nakokiyên qewm û çînî kûrtir bike.

Di Dij-Îslamê de piştî arîstokrasiya Ereb di rêza duyemîn de giraniya arîstokrasiya qebîleyên Tirk tê. Berevajî yeqînan, dema Selçûkiyan (1040-1308) dema serdestiyeke tam a arîstokrasiya Tirk temsîl nake û ji vê dûr e. Tê zanîn ku ji ezbetên Tirkan gelek kom û kes, hê ji dema derketina Hûnan ber bi Rojava ve ji ezbetên xwe qut bûne û weke eskerên bi pereyan di îdareyên dewletên wê demê yên Bîzans û Ereban de wezîfe wergirtine. Ev rêûresm wê demê zêde heye. Bi vî awayî ji sedsala 9. ve dest pê dikin dikevin xizmeta Abbasiyan jî û Begtiya Selçûkiyan şêweyekî vê demê yê hinekî pêşketî ye. Siltanên Abbasiyan li gorî berjewendiyên xwe weke prensîpeke stratejîk Selçûkî di ser Îran û Anatolyayê re wezîfedar dikirin. Navenda seltanetiyê ji kontrola Bexdayê demeke dirêj û heta dawiya xanedaniyê qut nebûye. Herçend qutbûnên fiîlî yên demkurt bibin jî weke îdeolojîk, siyasî û çandî bi hev re ne û dewama hevdu ne.

**3-** Divê koka Tirkên Selçûkî ji aliyê arîstokrasiyê ve were lêkolîn û mijareke gelekî balkêş e. Selçûk Beg bi xwe di dawiya sedsala 10. de li bakur-rojavayê Derya Hazarê bi Dewleta Tirk a Yahûdî Hazara re têkilîdanîna wî û heta bi îhtîmaleke xurt yek ji wan kesan e ku têde wezîfe girtiye. Mirov dikare ji navên çar kurên wî jî di vê rastiyê de derxe. Navên kurên wî ez şaş nebim Mîkaîl, Mûsa, Yûsif û Arslan in. Lê belê di dema xwe de kesekî welê ye ku karîbû heta bi sînorên Çînê hukim bike û ji bo di cîhana Îslamê de bi tesîr bibe xwe misilman nîşan daye yan jî hewcedariya bi misilmanbûnê îdrak kiriye. Têkiliya di navbera arîstokrasiya Tirk a li Rojhilata Navîn belav bûye û elîtên Cihû de girîngiya xwe heta roja me ya îro diparêze û pirsgirêkeke dîrokî û rojane ye ku divê baş were lêkolînkirin. Nexasim encamên wê heta ji aliyê eskerî, ekonomîk û siyasî ve neyên eşkerekirin, wê zehmet be ku rastiyên dîrokî û rojane bi temamî bêne piştrastkirin û fêhmkirin.

Begên ezbetên Tirk heta bi Dewleta Anatolyayê ya Selçûkî bi awayê hin xanedaniyan karîbûn li ser desthiltadariyên bi cihbûyî bibin hukimran. Li Misrê Tolonogullarî, Îhşîtî, li Sûrî û Iraqê hin atabegtî, li Anatolya û Îranê jî bi awayê Siltantiyên Selçûkî dewam kirine. Belavbûna begên ezbetên Tirk bi vî awayî li Rojhilata Navîn rê li ber du encamên girîng ên dîrokî vekirine: Yekemîn, piştî Ereban statuya duyemîn qewmê serdest bi destxistine. Stratejiya wan a bingehîn timî li ser desthilatdarî û dewletê bûye. Lê weke encama xwezayî ya vê ekolê tebeqeya jor di nava çanda Ereb û Fars de heliyaye. Pirr eşkere xwedî li tirkîtiyê derneketine. Tirkîtî nuxumandî û objektîv maye. Qurbanên dîrokî yên wesfê vê rejîma siltantiya Ereb û Tirkan, Ermenî, Asûrî, Grek û hinekî jî Kurd bûn. Çawa ku me berê jî behs kiribû, Ermenî, Asûrî û Grek (Helen) weke qewmên zû bûne Xirîstiyan xwe ji nû ve ava kirine. Xirîstiyantî ji bo hersê gelan bi awayekî proto milletperestî ye. Ya rastî, milletperestiya demê ye. Divê mirov vê, ne weke neteweyî, milletperestiya qewmî bide naskirin jixwe ev hê rastir e. Xirîstiyantî li ser vî bingehî hatibû qebûlkirin. Cudahiya xwe ji Katolîktiya Latîn jî (ekumenîk-gerdûnî) di vê rastiyê de ye. Di destpêkê de

bû sedem ku xwe zû bidin serhev û mîna ku hişt zû xwe bigihînin netewebûyînê. Xirîstiyantî bi awayekî, bi rola milletperestiyê rabûbû.

Piştî reformê di serî de Bakurê Ewrûpayê wê tevahiya gelên Ewrûpayê di pêvajoyeke bi heman rengî re derbas bibûna. Xirîstiyantiya Rojhilat ev pêvajo pêşwext dabû destpêkirin. Li pey wê Îslam jî wê veguheriya proto milletperestiyê (Dij-Îslam, desthilatdarî-Îslama seltenat) û bi vê re li ser gelên dîrokî wê kabûsek çêbibûya. Ji ber ku di cildên berê de rola îdeolojiya qewm a Cihûyan hatiye nirxandin di vê de wê neyê dubarekirin. Lê gelekî beriya qonaxa dewleta neteweyî, weke di serdema destpêkê de, di serdema navîn de jî hêmanên qebîletiyê yên di cewherê vê îdeolojiyê de bi awayekî berfireh bandora xwe nîşan dane. Encam ev bû, di dema siltan û mîrîtiyên Ereb û Tirkan de yên ku hêza hegemonîk bi dorê kirin destê xwe, dîrok li Ermenî, Asûrî û Helenan qelibî, çerx kir. Hinekî jî li dijî Kurd û Farsan dîrokê çerxa xwe çep gerand. Gelên Xirîstiyan û çanda wan heta roja me ya îro bi her rêbaza hatî ceribandin, hew nema li Rojhilata Navîn bi temamî bêne tesfiyekirin. Tesfiyekirina van çandên (weke çanda fizîkî, maddî û manewî) pêşketî yên serdema destpêkê û navîn, xiyaneta herî mezin a şaristaniya Rojhilata Navîn e ku bi gelan kiriye. Di warê çandî de Rojhilata Navîn dibe çol, di roja me ya îro de ber bi krîz û întîharê ve gêr dibe. Di vê de rola vê trajediya dîrokî ya bi lanet diyarker e. Kurd weke gelên Xirîstiyan ji aliyê fizîkî ve nehatin tesfiyekirin, lê ji aliyê çandî ve ji wan xirabtir bi xiyanetekê re rûbirû bûn. Kurd gelek in ku hê jî heta bi qirika xwe di nava vê xiyanetê de ne. Ez nikarim bibêjim nasname, ji ber ku hê jî nehatine naskirin. Pirr eşkere ye ku pirsgirêka 'ew ê xwe weke nasnameya azad çawa ava bikin' wê di Rojhilata Navîn a sedsala 21. de bibe pirsgirêka herî sereke.

Ev dawiya trajîk a ku Xirîstiyan nexasim li Anatolyayê pê re rûbirû bûn, bi ya Misilman û Cihû li Spanyayê pê re rûbirû bûn di warê zeman û şêwe de hema hema wekhev bûn. Gelek daneyên dîrokî hene ku nîşan didin, weke bersiva dijber a tesfiyekirina Misilman û Cihûyan a qraltiyên Xirîstiyan ên Spanyayê û Ewrûpaya Katolîk a li pişta wan, Xirîstiyanên Anatolyayê ji aliyê Siltanên Osmanî, Cihûyên banker û hevkarên bazirgan

ve hatine tesfiyekirin. Li ser hîmê hevgirtinên weke heman pêvajoyê di berdêla tesfiyekirina Cihû û Tirkên Misilman ên Balkanan de, Xirîstiyanên li Anatolyayê ji ber mane, tesfiyekirina wan hema hema hatiye temamkirin. Cudahiya vê pêvajoyê ew e ku tesfiyekirin ji aliyê siltan û qraltiyan ve ne, ji aliyê elîtên derketine û çîna bûrjûwa ya nûgihiştî ve pêk hatiye.

Duyemîn encama mezin a dîrokî, ya di plana çînî de pêkhatî ye. Çawa ku Bedewî û esilzadeyên Ereb ji aliyê çînî ve ji hev qut bûn pêvajoyeke bi heman rengî di navbera begên ezbetên Tirk û tebeqeyên xizan ên ezbetan de pêk hat. Beg zêdetir weke Tirk bi nasname bûn, lê ezbetên li jêr xwe weke Tirkmen dan naskirin. Tirkmen, Tirkîtiya qebîleyên li derveyî desthilatdariyê û Misilmantiya Sunnî hatine hiştin, îfade dike. Tirkmenên xwe kişandine herêmên çiyayî û bi heywan xwedîkirinê re mijûl dibin, her biçe wê bibin gundî û li ser erdê cîwar bibin. Tirkîtiya resen ji aliyê ziman û çandê ve, Tirkmen wê xwedî lê derkevin. Begên Tirkan jî hema nema xwe bi esilzadeyên Fars û Ereb re yek bibînin û di nava çand û zimanê Erebî û Farsî de heliyan. Ji Tirkmen dûr dikeve bi guman nêzîk dibe, timûtim pê re şer dike û ev yek di dîrokê de bi rola yek ji têkoşînên girîng ên çînî radibe. Eşkere ye ku mîna Ereban têkoşîneke dijwar a çînî pêk tê. Îslama ku beg û siltanên tirk pêşengiya wê kirin, hewl hat dayîn heta bi sedsala 20. bênavber were temsîlkirin. Heta bi Ewrûpaya Navîn bandora xwe nîşan da. Di çarçoveya modernîteya Ewrûpayê ya bilindbûyî de ji sedsala 17. ve ket pêvajoya paşketinê. Ev paşdeçûna heta bi nava Anatolyayê dewam kir, di 1920’an de bi pêşengiya Mistefa Kemal hat rawestandin û bi Komara Tirkiyê bi encam bû. Elîta desthilatdar a Tirk, di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de bi dewletên netewe yên Ewrûpayê re li hev kir û li ser hîmê qebûlkirina hegemonya Ewrûpayê komar pêk hatiye.

Piştî Îslama Ereb û Tirkan, sêyemîn elîta desthilatdariya arîstokratîk a girîng Farsên bi koka xwe Îranî pêk tînin. Li dijî rêûresma Îslama Sunnî ya Tirk û Ereb, muxalefeta Farisî-Îranî bi bawerî û îdeaya dilsoziya bi rêûresma Duwanzdeh Îmaman û Ehlîbeytê ji Emewiyan ve timî di nava

pêngavan de ye. Li dijî seltenatiya Emewî û Abbasî ya burokrasî têde serdest bû, ji hundir û derve timî serhildan tertîp kirin û xwe ji vê paşve nedan. Tevî gelek ezmûnên desthilatdariyê yên herêmî di sala 1501’ê de Şîatî bi awayekî fermî weke mezheb hat îlankirin û bi vê hewl dan nîzama kevin a împaratoriya Îranê nû bikin. Ev împaratoriya bi pêşengiya Farisên Şîî û Azeriyên bi koka xwe Tirkmen hat pêkanîn, wê nexasim bi siltanên Tirk ên Osmanî re timûtim şer bike. Bi van şeran xwestin hegemonya li Rojhilata Navîn ji dest diçe, ji nû ve bi dest bixin, lê van şeran herdu hêz jî hilhilandin û peritandin, ji lewra jî vê yekê hişt ku hegemonya Ewrûpayê di navbera sedsalên 16.-19. de bi hêz bibe. Desthilatdariyên Şîa tevî ku pozîsyona xwe li dijî desthilatdariyên Sunnî digirtin jî ya rast ew e ku mirov dikare wan weke şêweyekî din ê Dij-Îslamê bide naskirin û bi nav bike. Cudahiya wan bi tenê ew e, rêûresma Elewîtî û Ehlîbeytê zêdetir îstîsmar dikin. Elewîtî heta ku weke antî-desthilatdarî, antî-şaristanî û şaristaniya demokratîk neyê temsîlkirin, li ser navê wê her cure pêkhatinên desthilatdariyê wê weke Dij-Îslamê bêne naskirin û wê nikaribin xwe ji vê rizgar bikin.

**4-** Di dema Îslama seltenat de weke gelekî çaremîn rola Kurdan zêde diyar nîne. Tê zanîn, di qesran de bandora wan heye. Li qesrên Emewî, Abbasî, Selçûkî, Osmanî û Îranî gelek begtî û mîrtiyên Kurdan têne temsîlkirin. Hem weke kes bi rolekê rabûne, hem jî begtî kirine. Xanedaniya Eyyûbî bi Selaheddîn di dema 1168-1250’î de împaratoriyeke navenda wê Şam ava kiriye. Tevî ku bi koka xwe Kurd e, weke xanedanên Tirk, ew jî bi rola Erebên esilzade rabûye û nikarîbûye xwe ji vê yekê bigire. Xanedanê Merwanî hukimdariyeke navenda wê Meyafarqîn (Silîva-Farqîna îro) ava kiriye (990-1090). Paşê ji aliyê xanedaniyên Tirk ve hatiye tesfiyekirin. Gelek begtiyên bi vî rengî yên Kurdan çêbûne. Şerefxanên bi koka xwe Bedlîsî heta bi salên 1560’î hebûna xwe dewam kirine. Ji ber ku begtiyên Kurd zêdetir bi rêûresma Sunnî ya Îslamê ve girêdayî bûn, li dijî seltenata Sefawî ya Îranê bi pêşengiya Îdrîs-î Bedlîsî bi siltanên Osmanî re hevgirtine. Begtiyên Kurd ên di nava sîstema seltenatiya Osmanî de xwedî otonomiya herî berfireh bûn, rewşa wan bi

sedsala 19. re xira dibe. Bi isyana Bedirxan Beg re qerta xwe ya dawî bi kar anîne, firsend ji destê xwe berdan û wenda kirin (1835-1860).

Piştî began, şêxtiyên Kurdan herçend xwestin weke hevkartiyeke cuda ya desthilatdariyê (1826-1926) bi tesîr bibin jî heman aqûbet bi serê wan de jî hat. Weke dewama herdu şax û milan arîstokrasiya qebîleyan a bi pêşengiya Barzanî û Talabanî, di sedsala 20. de li ser hîmê milletperestiya dînî û etnîk xwe spartin têkiliyên bi hêzên hegemonîk ên kapîtalîst re û bi vî awayî bi ser ketin ku di nava Iraqa îro de xwe bigihînin statuya desthilatdariya herêmî.

Xizanên qebîleyên Ereb weke Bedewî û xizanên Tirkan jî weke Tirmen têne binavkirin, xizanên qebîleyên Kurd jî weke Kurmanc têne bi navkirin. Ya rastî mirov dikare wisa pênase bike. Kurmanc, ji xizanbûna qebîleyan wêdetir Kurdê têkiliya xwe bi qebîleyê re qut bûye, ji kesên koçer û gundî re tê gotin. Tebeqeya jêr e. Objektîv karîbûye Kurd bimîne. Jixwe beşê Kurd ê hevkar ê tebeqeya jor, bi pirranî bi elîtên neteweyê desthilatdar ê gelê xwecih re û hinekî jî bi hêzên hegemonîk ên DYE û Ewrûpayê re di nava têkiliyê de ye. Ev Kurdê hevkar bi vê rewşa xwe, li ser hîmê lidervehiştina Kurdê kedkar ê ji aliyê çandî ve bi awayekî hatiye qirkirin û weke civak belav bûye, hewl dide bijî. Ev rastî mohra xwe li têkoşîna neteweyî û çînî ya di diyardeya Kurd de dixe.

**5-** Piştî sedsala 12. bi ser sîstema şaristaniya Îslamê de êrişên Moxolan weke bahozekê radibin. Moxol weke Tirkan nebûn Misilman û êrişî Îslamê kirin, ji bilî Misrê jî her dever bi awayekî xeternak şikandin, hilweşandin. Bi heman lezê bûn Misilman û bûn hêza nû ya hegemonîk a sîstemê. Mirov dikare ji sedsalên 13. û 14. re bibêje, sedsalên xanedaniya Moxolan. Li gorî dîroknasan hêzên Îslamî yên Endulus û hêzên Moxolan, eger bixwestana ji sedsala12. û pêve di wê hêzê de bûn, hê şaristaniya Ewrûpayê pêş neketî tesfiye bikirana. Bûyerek bi vî rengî neqewimiye û sedema bingehîn a vê yekê jî ji xwestin û nexwestinê wêdetir, Ewrûpaya wê demê (1000-1500) di wê rewşê de nîne ku di warê karê de dilê hêzên dagirker û mêtingeran bibijîne xwe. Şensa wê ya herî mezin ew e ku li gorî şaristaniyên mezin Çîn

û Rojhilata Navîn dewlemendiya xwe nîne, pêşkêş bike. Naxwe yê Îslam rawestandiye ne Şarl Martel e, ne jî parastineke bi hêz û ciddî ya li pêşiya dagirkeriya Moxolan e. Mirov dikare guftûgo bike ku Moxol ji bo Îslamê hêzeke hilweşîner bûn an jî xwîneke teze bûn.

Mirov dikare xanedaniya Tîmûr weke dewamkerê Mogolan bibîne. Mohra xwe li sedsala 15. xistine. Bermahiyên herdu xanedaniyan, karîbûn li Hindistanê Împaratoriya Babur a weke hêzeke hegemonîk heta nîvê sedsala 18. dewam kir, ava bikin. Dewleta Îslamê ya Endulus (Spanya 711-1492) ku ji xanedaniyên dawî yên Emewî bû, bi serketibû ku ji Rojava heta bi nava Ewrûpayê ve biçe. Lê weke xwe vekişandina Osmanî, li hemberî şaristaniya Ewrûpayê ya bilind bû, nikarîbû xwe ji tesfiyeyeke zû xelas bike. Serhatiya Îslamê ya li Nîvgirava Îberê şêweyekî din ê trajediya Xirîstiyanên li Anatolyayê ye.

Şaristaniya Îslamê ji sedsala 12. heta bi serê sedsala 19. di serî de qada bazirganî û çandî, nirxên xwe yên erênî hemû bi dest Ewrûpayê ve berdan û di encama vê rewşê hemûyî de veguherî şaristaniyeke qalik a nava wê pûç. Kom û danehevên pênc hezar salî di nava pêncsed salan de hatin veguhestin. Ev cih û hêz guhertina şaristaniya navendî ya hegemonîk a pênc hezar salî, veguherîna herî mezin a dîrokê ye. Dinya hê jî bi erdhejokên piştî vê veguherîna mezin dewam dikin, diheje.

## f- Rola Derketina Dîrokî Ya Dînên Brahîmî

Rola derketina dîrokî ya dînên Brahîmî, bi qasî berxwedanên qewm û qebîleyên antî-şaristaniyê girîng e. Tevî ku ji qebîleyan derdikevin, esasê xwe di çarçoveya tevgerên çînî de ne. Êriş û berxwedanên qewm û qebîleyan ên ji aliyê hêzên şaristaniyê ve weke ‘barbar’ têne nirxandin, mirov dikare wan bêtir weke hêz û berxwedanên aliyê wan ê demokratîk zêdetir xurt û çavkaniya xwe ji derve digirin, şîrove bike. Li beramberî vê bi giştî dîn, bi taybet jî dînên Brahîmî di derketin û gavavêtinên xwe de xisletên qebîleyî û qewmî hildigirin, lê tevgerên navxweyî ne, û aliyê wan

ên çînî zêdetir li pêş e. Herdu tevger li dijî modernîteya kapîtalîst ji derve tevgerên neteweyî û ji hundir ve jî tevgerên çînî tînin bîra mirovan.

Sîstema şaristaniya navendî ya ji pênc hezar salî zêdetir divê weke pêvajoya herî girîng a dîroka gerdûnî bê nirxandin. Dînên Brahîmî li dijî sîstema şaristaniya navendî timî li ber xwe dan û wexta keysa xwe lê anîn û firsend dîtin, êriş kirin. Dînên Brahîmî yên em behsa wan dikin ji aliyê çînî ve naveroka xwe tevlîhev in. Ji proleterê herî xizan heta bi arîstokrasiyê di nava bereyeke fireh de pêk tîne. Sîstema şaristaniya navendî bi orjînên xwe yên Sumer û Misrê ji ber ku xwe weke 'derketineke xwedayî' pêşkêş dike, dibe mijara bingehîn a nerazîbûnan. Avakirinên dînî weke sîstema îdeolojîk a Brahîmî, timî bi guman li xwedayetiya sîstema van xweda-qralan mêze kir û di derketina xwe de ev weke 'îdea' xwe ya bingehîn danîn û vegotina 'ew ti carî nikarin bibin xweda yan jî xwedayî' bi kar anîn. Bi vê gavavêtin û derketinê, bi awayekî herî zelal dibêjin 'mirov nikarin bibin xweda-xwedayî.' Mirov herî baş dikarin bi tenê bibin qasid (pêxember) û evdên xwedê. Ji vê zêdetir îdeakirina wan, mijara gunehekî mezin û lanetê ye. Li ser vî hîmî xebateke îdeolojîk û şerekî hegemonîk ê hezarê salan qewimiye. Li tevahiya xwendin û nivîsandina dîrokê, şopên van îdea, xwelihevrakişandin û şeran hene.

Wexta ku em sîstema şaristaniya navendî binirxînin û xusûsên der barê vê mijarê de bixwînin û binivîsînin, divê em baş bala xwe bidin vê rastiyê û ji aqil û serê xwe (rasyonalîte) ti carî dernexînin. Di navenda derketin û gavavêtina Brahîmî de hewldanên avakirina dîn û xwedê ya qebîle û qewmperestiya Cihûyan cih digire (Ez senteza Zerdeştî û Manîtiyê jî lê zêde dikim). Hewl didin bi têgihiştineke dîn û xwedê ya hê rasyonel li ber hegemonya îdeolojîk a dînî û mîtolojîk a şaristaniya navendî rabin. Ji Brahîm heta bi Muhemmed, rola dîrokî ya tevahiya pêxemberan di vî şerê maneyê de (şerê hegemonya îdeolojîk) heye. Çanda manewî ya dînî ya temsîl dikirin, îfadeya wê ya maddî bi giranî çîna navîn û tebeqeya bingehîn a vê çînê, beşê bazirgan bûn. Asta herî jor a temsîla çînî arîstokrasiya qebîleyê pêk tîne, temsîla herî jêr jî xizanên qebîleyê, her cure proleterê avêtine derveyî sîstemê û komên din yên aware û bi serê

xwe, pêk tînin. Qewmê Cihû ku di statuya navendî de ye, tevahiya dîrokê hewl daye di qada çanda maddî û îdeolojîk de statuya xwe ya rêbertiyê bi israr dewam bike. Pêşengtiya xwe ya îdeolojîk bi 'Ahd-î Atîk', bi Tewratê bi nazenînî hewl daye weke çemê sereke dewam bike. Bi daneheva 'maneyê' ya çi ji sîstemên şaristaniyê çi jî ji hêzên dijberê şaristaniyê berhevkirî, timî hewl daye xwe dewlemend û sînorên xwe berfireh bike. Di şerê maneyê de karîbûye weke hêza hegemonîk heta roja me ya îro bi awayekî serketî bimîne. Di çarçoveya çanda maddî de jî di qada pere û bazirganiyê de hêzeke mezin bi dest xistiye û xwedî ezmûneke mezin e, û zanîbûye hegemonyayê di vê qadê de jî bi tesîr bike.

Eger mirov Cihûtiyê yekpare bibîne wê kêm û şaş be. Hêzên navendî yên Cihû bi giştî bi sîstema şaristaniyê re timî di nava têkiliyên nêz û nakokiyan de bûn, hêzên muxalif ên navxweyî yên demokratîk û sosyalîst-komînîst jî dewamî li dijî şaristaniyê bûn û timî li şaristaniyên nû yên sosyalîst û demokratîk digeriyan. Tevahiya dîroka Cihûyan ev meyla di vî alî de hebû û divê mirov piçûk nebîne. Di nava tevahiya tevgerên radîkal demokratîk, sosyalîst, anarşîst, femînîst, ekolojîst û tevgerên muxalif ên li derveyî sîstemê de bi rolên girîng rabûne. Rastgir û navendgirên Cihû çiqasî pereperest, alîgirê bazirganî û şaristaniya dewletdar bin, beşên wan ên çepgir û kedkar jî ewqasî komin, demokratîk û alîgirê avakirin û îdeolojiyên azadîxwaz bûn.

Îsewîtî (Xirîstiyantî) di vê sîstemê de (di sîstema dînên Brahîmî de) bi giranî beşên herî xizan, her cure kole û xizanên qebîleyan û komên din ên ji sîstemên şaristaniyan hatine îzolekirin, temsîl dike. Tevî ku di pêvajoya desthilatdariyê de dabeşî du komên bingehîn bûbe jî li dinyayê hê jî hêmanekî girîng ê çanda manewî ye. Di pêşketinên bi awayê demokratîk û sosyalîst de roleke girîng a veqetîna vê çandê heye. Sosyalîzm û demokratîzma Xirîstiyan mirov dikare li ser bingehê vê veqetînê binirxîne.

Sêyemîn versiyona mezin a Brahîmî ku bi Muhemmed hilat û di demeke pirr kin de weke Dij-Îslamê bi gewde bû, bêtir temsîla beşên dewlemend ên bazirgan û arîstokratîk ên sîstemê kir. Ya rastî, veguherandin hegemonya maddî û manewî ya vî beşî. Li Rojhilata Navîn hem li dijî hêzên

klasîk ên şaristaniya navendî (Bîzans û Sasanî, heta li dijî Împaratoriya Çînê), hem jî li dijî herdu versiyonên girîng ên dînên Brahîmî, Mûsewîtî û Îsewîtiyê, şerê hegemonyayê bi awayekî serketî meşandiye. Ji sedsala 12. û pêve bi sedema ku nikarîbû kapîtalîzma bazirganiyê derbasî şoreşa pîşesazî û cotkariyê bike, hegemonya xwe di dawiya pêvajoyeke pêncsed salî de bi destê modernîteya kapîtalîst ve berda. Divê mirov Îslamiyetê jî di nava yekparetiyê de weke sîstema çandî ya maddî û îdeolojîk nefikire. Li gorî Mûsewîtî û Îsewîtiyê zêdetir parçe bûye û nikarîbûye xwe bigihîne wesfê sîstemeke yekbûyî. Ellahê penahê wî bûne ji bo yekîtiyê têrê nekiriye. Rêûresma Sunnî ya sîstema şaristaniya navendî bi giranî kiriye bin hegemonya xwe, lê tevî vê, li dijî sîstema şaristaniya navendî tevgerên muxalif ên azadîxwaz, demokratîk û komin hebûna xwe dewamî kirine. Tevgerên behsa wan tê kirin, ti carî bi temamî serî netewandine. Herçend nikarîbûne bibin tevgerên sîstemîk ên şaristaniya demokratîk jî bûne yek ji reh û damarên sereke yên mîrasa azadî, komin, demokratîk û herî zanyar a Rojhilata Navîn û dinyayê.

Bi tevahî tevgera dînên Brahîmî ji şaristaniyên Sumer û Misrê heta bi modernîteya kapîtalîst (şaristanî) di şikandin, parçekirin û veguherandina (bi reform û şoreşê) hegemonya îdeolojîk a sîstema koledar de bi ser ketiye. Tevî ku hêmanên yekdestdar ên di çanda maddî de (yekdestdarî weke dewlet-desthilatdarî û ekonomî) nerm kirin jî bi heman awayî nikarîbû wan di şoreş û reformeke temam re derbas bike. Zêdetir bi rêya derdorên rastgir ên nava xwe bi sîstemê re li hev kiriye û xwestiye sîstemê bixe bin hegemonya xwe. Berevajî, beşên muxalif ên çepgir bi mezhebên dînî yên radîkal ên li dijî şaristaniyê re weke tevgerên gel ên laîk, sekuler çînî û komin timî li pey utopyayên azadî, wekhevî û demokratîk, proje û bernameyan çûne, şer kirine.

Hegemonya çandî ya maddî û îdeolojîk a navendî ya Cihû li dijî Dij-Îslam û gerdûnîtiya Katolîk a dij-reformê (sîstemên şaristaniyê) û yekdestdartiya kapîtalîst a li Ewrûpayê (bazirganî, cotkarî, malî û pîşesazî) nû pêş dikeve û ji gavavêtinên wê yên îdeolojîk re (pêvajoyên Ronesans, Reform û Rohnîbûn) rêbertiyê dike, bi awayekî ciddî li çanda wê ya maddî

û manewî zêde dike û ev di serketina modernîteya kapîtalîst de bi roleke girîng radibe. Lewma ji aliyê herdu şaristaniyan ve bi awayekî were fetisandin û bêhn lê were çikandin, hatiye tengavkirin. Hem li Rojhilata Navîn hem jî li Ewrûpayê tim dixwazin Cihûtiyê di bin kontrol û çavdêriyê de li gettoyan bigirin. Timûtim li pogroman (tevgerên tevkujî û talanê) diqewimînin. Li serê herî rojava yê Ewrûpayê li hemberî îdeayên hegemonîk ên Qraliyetên Franse û Spanyayê arîstokrasî û bûrjûwaziyên cotkarî-bazirganiyê yên Hollanda û Brîtanyayê ku gelekî tengav dibin, ji sedsala 16. û pêve deriyên xwe li sermayeya maddî û manewî ya Cihûyan vedikin û bi vî awayî hevgirtineke dîrokî pêk tînin. Bi vê hevgirtinê, hem îdeayên hegemonîk ên Spanya û Franseyê (di sedsala 16.-18. de), hem jî hegemonya Îslamê ya li Rojhilata Navîn (sedsala 19. û 20.), herî dawî jî îdea û kirinên hegemonîk ên Elmanya Hîtler û Sovyeta Rûsyayê şikandin û bi vî awayî hegemonyayeke dinyayê ava kir û ev hê dewam dike. Ez weke Werner Sombart û yên weke wî nabêjim Cihûtiyê kapîtalîzm vedîtiye û îcad kiriye. Lê bêyî alîkariyên maddî û îdeolojîk ên Cihûtiyê serketina modernîteya kapîtalîst pirr zehmet e.

Îdeaya dîrokî ya modernîteya kapîtalîst ew e ku wê pirsgirêk û pêxîrtengiyên sîstema şaristaniya navendî ya hegemonîk a bêhtirî pênc hezar salan dikudîne (cotkarî, bazirganî, zenaet û îfadeya tevahî yekdestdarên dewlet, desthilatdarî û her cure îdeolojî) çareser bike. Di beşa bê de em ê hewl bidin û hûrbikolin ka ev îdeaya dîrokî çareserî ye, yan jî krîz û pêxîrtengiyên mezin çêdike.

# Beşê Pêncemîn:

# DI SÎSTEMA ŞARISTANIYA NAVENDÎ DE MODERNÎTEYA EWRÛPAYÊ Û HÊZÊN NÛ YÊN HEGEMONÎK

Ji bo mirov krîza global a li Rojhilata Navîn zêde bûye, fêhm bike, pirr girîng e ku mirov li veguherîna şaristaniya navendî ya li Ewrûpayê serwext bibe. Çawa ku mirov heta li Rojhilata Navîn a Serdema Navîn serwext nebe nikare şemitîna şaristaniyê ber bi Ewrûpayê ve, veguherîna wê û ketina wê ya destê hêzên hegemonîk fêhm bike, mirov li serhatiya şaristaniya Ewrûpayê jî serwext nebe di têgihiştina Rojhilata Navîn a îro de jî nikare bi awayekî rast serwext bibe. Di navbera wan de têkiliyeke xurt a diyalektîkî heye.

Di beşên berê de me hewl dabû em rave bikin ku sîstema şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn çima û çawa veguhestiye Ewrûpayê. Der barê veguhestina şaristaniya navendî ber bi Ewrûpayê de pirsa bingehîn a divê bersiva wê dayîn ev e, şoreşa pîşesaziyê çima û çawa dest pê kiriye. Di beşên beriya vê yên parêznameya xwe de min hin bersivên berfireh dabûn, ji lewra heta hewce neke ez ê dubare nekim û ez ê hewl bidim ji hin aliyên cuda ve bersivan bidim.

Ji bo mirov şaşiya K. Marks kirî neke, berê pêşî divê mirov xwe bigihîne maneya civakî û dîrokî ya xwezaya şoreşa pîşesaziyê û pîşesaziya

kapîtalîzmê. K. Marks bi xwe bawer bû ku kapîtalîzmê weke diyardeyeke ekonomîk lêkolîn dike. Di serî de fizîk û kîmya çawa ku zanistên nû diviyabûn xwe bisipêrin diyardeyan, wî jî wer bawer dikir ku divê weke diyardeyekê bi civakê dakeve, lêkole û bi awirekî ekonomîk analîz bike û ji wî wer tê ku ev nêzîkatiya herî bingehîn a zanistî ye. Bi qasî nêzîkatiyên felsefî û dînî yên kevneşopiyê, ekolên felsefeya îdealîst ên Elman, nêzîkatiyên civakparêz ên Fransî û dibistanên ekonomî-polîtîk ên Ingilîzan ên di dema wî de, tatmînkar nebûn. Çawa ku baş tê zanîn, bi F. Engels re bi dibistana jê re 'sosyalîzma zanistî' digotin, hewl didan gavê biavêjin. Bêguman 'şoreşa zêhniyetê' ya dabûn destpêkirinê nayê înkarkirin. Li hemberî kapîtalîzma serketina xwe îlan dikir, weke hest jî dijber bûn, hem jî weke tevahiya gavavêtinên dîrokî yên dijberî kapîtalîzmê, bi awayekî rêxistinî jî xwe paşve nedan û helwesta xwe nîşan dan.

Yek ji encamên girîng ê zanista roja me ya îro gihiştiyê, karektera civakî û dîrokî ya heqîqetê ye (rastiya hatiye fêhmkirin). Bêguman dîrokî û civakî ji gerdûnî û tektiyê qut nînin. Berevajî, di fêhmkirina serhatiya rastiyê de (serhatiya mejiyê gerdûnê ya Hegel balkêş e) hewldana wê ya zêde û gihiştina wê ya encamê, îfade dike. Ji lewra mirov statuya K. Marks û ekola wî di vê serhatiyê de tespît bike, gelekî girîng e.

Li şûna ku mirov sosyalîzma zanistî li hemberî kapîtalîzmê weke ekoleke têkçûyî bifikire, mirov wê weke ekoleke kêm bibîne manedar e. Lewra, tiştên wê bi ser xistî, hene. Ya hewce, divê der barê serneketinên wê de, kêmasî û şaşiyên îdealên wê bêne ravekirin. Di parêznameya min de daxuyaniyên min ên di vî warî de hene. Ya girîng ew e, li şûna dubare bikim, ez ê bi nêzîkatiyeke nû û berfirehtir a rexnegir, helwesta di vî warî de dewam bikim. Ez hewl didim vê bikim û ev a herî rast e.

Di serî de divê em şoreşa pîşesaziyê ji şoreşeke ekonomîk zêdetir weke şoreşeke polîtîk û îdeolojîk bifikirin û bi ya min hizirandineke bi vî rengî wê hê bêtir raveker be. Heta em wê weke şoreşeke aliyê wê yê eskerî girantir, fêhm nekin, em ne derketina şaristaniyê ya Ewrûpayê, ne jî kapîtalîzma kiriye bingehê xwe, dikarin bi hosteyî fêhm bikin. Ya dawiyê bê gotin, em di serî de bibêjin, hêzên şaristaniya navendî, kapîtalîzma

Ewrûpayê bi şoreşa pîşesaziyê seferberiya herî mezin a îdeolojîk, polîtîk û eskerî ya di dîroka wê de pêkanîn û bi globalkirina wê têne karekterîzekirin. Danasîna dîrokî ya şaristaniya Ewrûpayê ev e.

Em heta şoreşa pîşesaziyê weke amûrekî hegemonya îdeolojîk, polîtîk û eskerî di nava yekparetiya dîrok û civakî de fêhm nekin, em nikarin bi hosteyî li serdema xwe serwext bibin. Ji bo serwextbûna li vê rastiyê, mirov bi tenê şerên di nav û navbera civakan de qewimandiye û dîsa bi kurtî encama şerê bi hawîrdorê re kirî bibîne, têrê dike. Di ti serhatiya civakî û dîrokî de bi qasî şerê li ser bingehê şoreşa pîşesaziyê hatiye kirin, encam giran nebûye û ji vê jî xeternaktir tarûmarkirina hawîrdorê cara pêşî ye ku gihiştiye sînorekî welê, civak êdî nikare dewam bike û ev heqîqetek e ku mirov herî zêde lê serwext bûye û nikare înkar bike. Tevî ku bi amûrên îdeolojîk ên awarte û derfetên desthilatdariyê hewl dide bi vegotin û çalakiyên xwe civakê serkorî bike jî heqîqet bi xwe weke krîza global, li dijî wê weke vegotin û çalakî di jiyana rojane de hebûna xwe dewam dike.

## A- MANEYA DÎROKÎ Û CIVAKÎ YA ŞOREŞA EWRÛPAYÊ

Her hegemonya îdeolojîk (weke mîtolojî, dîn, felsefe û zanist) ku em pêkhatina wê di civakên veguherîna dîrokî pêk anî de dibînin, em di qonaxa şaristaniya Ewrûpayê de jî li yeke weke wê rast tên. Em veguherîna maddî ya şaristaniyê ne weke heyî, weke manewî (di çarçoveyeke teng de çandî-îdeolojîk) çawa tê nîşandan, welê dibînin. Ev rastiya ku tevahiya serdemên girîng hemûyan tê nîşandan ji bo serdema Ewrûpayê jî welê ye. Ne bi tenê di hêza me ya fikir de, di hêza me ya jiyanê de jî ev rastî ji yeqînan zêdetir welê ye. Rastiyeke welê ya serdeman a xweserî wan heye. Ne ku mirov nikare ji wan bibihure, lê eger qonaxeke rast a diyalektîk pêk neyê anîn jî xelasiya ji vê rastiyê nabe. Herçiqas em xwe gelekî di pozîsyona dijber de bihesibînin jî ev welê ye.

Eger mirov bi vî awirî li heqîqetên li ser navê zanist yan jî mîtolojiya Ewrûpayê tên gotin binêre, hingî wê qonaxa şaristaniya Ewrûpayê hê rasttir analîz bike. Di bingehê dîrokî yê derketina pîşesaziyê de, li hemberî êrişên îdeolojîk-pratîk ên Îslamê, koçberbûna ji Rojhilata Navîn a Xirîstiyantî û hinekî jî Mûsewîtî, diyarker in. Berî Îslamê bi demeke kin, çi Xirîstiyantî çi jî Mûsewîtî di Rojhilata Navîn a piştî Romayê (Roma Rojava) de weke îdeolojiyên hegemonîk pêş diketin. Ji Çînê heta bi Nîvgirava Spanyayê bi tesîr dibûn. Bajarên piştî sedsala 10. li Ewrûpayê mezin û bilind dibûn li Rojhilata Navîn jî mewzûbehs bûn. Li vir ji çanda kevin a Helen jî sûd tê wergirtin û pêngava nû ya şaristaniya serdema navîn pêş dikeve. Nexasim li cem qewmên Grek, Ermenî û Asûriyan mezinbûneke diyar a şaristaniyê heye. Ronesanseke pêş di rojevê de ye. Manîtî jî di dema xwe ya herî bi hêz de ye. Pûtperestî bi lez têk diçe. Li hemberî van bûyeran Romaya Rojava hilweşiya, lê Romaya Rojhilat kengî Xirîstiyantî weke îdeolojiya fermî qebûl kir, karî di dîrokê de cihê xwe çêke. Di hîmê bilindbûna Romaya Rojhilat (Bîzans) de ev bûyerên îdeolojîk cihekî girîng digirin.

Gavavêtin û derketina bi navê şoreşa Îslamê weke encama bûhrana qebîle û baweriyên li Nîvgirava Ereb pêk hat. Weke mezhebekî radîkaltir ê dînên Brahîmî şikil wergirt. Çi koçberiyên qebîleyan ên hezarê salan, çi jî şikilgirtinên nû yên îdeolojîk, digihêjin hev û dibin bingehê derketina holê. Îslam qonaxa pêş a derketina holê ya Oxûz û Moxolan e. Têkiliya bi şaristaniyê re şens da ji bo bibe hêzeke nû ya hegemonîk. Li hemberî pêşketina Îslamiyetê hêza hegemonîk a kevneşop a Îranê bi lez hilweşiya, Bîzans jî bi lez neçarî xwe vekişandinê bû. Îslam hê ji nîvê sedsala 7'an ve hêza nû ya hegemon a şaristaniya Rojhilata Navîn bû. Hilweşîna Bîzans a her ku diçû bi lez dibû, Xirîstiyantî û hinekî jî Mûsewîtî hê bêtir veguhest Ewrûpayê. Li Rojhilata Navîn Îslam çiqasî bilind û mezin bû, li Ewrûpayê jî Xirîstiyantî ewçend mezin û bilind bû. Xirîstiyantiya Rojhilata Navîn hêza xwe çiqasî kêm bû, Xirîstiyantiya Ewrûpayê bihêzbûn kir pirsgirêkeke xwe ya hebûnê.

Seferên Xaçperestan ên di navbera sedsalên 11.-14. de ji bo berevajîkirina rewşê têrê nekirin. Hêmana bingehîn bi şêweyê avahiya hegemonîk a şaristaniya navendî li Rojhilata Navîn têkildar e. Di mijarên hilberandin, bazirganî û pere de statuya xwe ya pêşeng diparêze û tevî vê hêza hegemonîk di mijarên zanist, huner, siyaset û eskerî de jî hebûna xwe dewam dikir. Encama herî girîng a seferên Xaçperestan ew e ku Ewrûpayê di tevahiya vê demê de bi şaristaniya pêşdebir û pêkanî, fêhm kir ku wê bi Rojhilat û Îslamê re nikaribe serî derxe. Vê rastiyê hêzên şaristaniya Ewrûpayê mecbûrî gavavêtinê kirin. Dersên ji şaristaniya Îslamê ya Endulus a li Nîvgirava Spanyayê (Îberîk) hatibûn girtin hînê teze bûn, hêzên Îslamê yên Osmanî ku di ser Anatolyayê re li Balkanan û heta bi Ewrûpaya Navîn belav bûn di sedsala 16. de bandoreke kabûswarî çêkirin. Kapîtalîzmê jî weke sîstem di sedsala 16. de ber bi mezinbûn û bilindbûnê ve gav avêt û têkiliya vê ji nêz ve bi vê rastiyê re heye.

Hêzên şaristaniya Ewrûpayê baş fêhm kiribûn ku heta şaristaniya Îslamê hem di qada çandî ya maddî û hem jî di ya manewî de derbas nekin, wê nikaribin pirsgirêka xwe ya hebûnê çareser bikin û ji ezmûnên xwe yên sedsalan bi vê baş dizanîbûn. Ji lewra pêşdebirina kapîtalîzmê weke sîstemekê weke çareya herî bi tesîr nirxandin. Bêguman ez behsa dîroka kapîtalîzmê nakim. Ji bo vê bi cildan vegotin divê û yeqîn dikim ku têra xwe jî li ser hatiye sekinîn. Xusûsa divê were destnîşankirin ew e ku divê têkiliya wê ya bingehîn a stratejîk were zelalkirin. Dîroka şaristaniyê bêyî stratejî nayê fêhmkirin. Ne bi rêzkirina bûyeran, ne jî berfirehiya wan ji bo serwextbûna li dîroka şaristaniyê, têrê nakin. Di hêmanên bingehîn ên şaristaniyê de (hilberîn, bazirganî, polîtîk, eskerî, îdeolojîk) heta faktorên stratejîk neyên zelalkirin, pêvajoyên pêşketin û veguherînê wê bi hosteyî neyên fêhmkirin. Her pêvajoya şaristaniyê, li ser hêmanên bingehîn ên temsîl dike, bi stratejiyên derve û hundir ên hegemonîk û reqabetkar, radibe. Bi stratejiyên dijber re timî di zikhev de ye. Têkoşîna di navbera van stratejiyan de encamê diyar dikin. Pêngava kapîtalîst a şaristaniya Ewrûpayê bi têkoşîna hêzên stratejîk di nava xwe de û li dijî derve meşandine, weke alternatîfeke wan a hilbijartî bi pêş ketiye.

Ne mumkîn e ku mirov alternatîfbûna kapîtalîzmê weke encameke 'meşa aqlî' ya Hegel, ne jî weke encama mecbûrî ya îdeolojiya pêşketinê ya rohnîkirinê ya K. Marks binirxîne. Çawa ku min di du beşên pêşî yên parêznameya xwe de hewl dabû nîşan bidim, kapîtalîzm ji Sumeran û vir ve sîstemek e ku hebûna wê tê zanîn. Civakan ew her tim weke diyardeyeke bêyom a bê exlaq û divê ti carî mirov qebûl neke di bîra xwe de hiştine û ew weke hêmaneke civakê xira dike, dîtine. Ji lewra jî timî bi îradeya xwe pê re şer kirine. Car caran derketiye pêşberî rûyê civakê û kengî bi bersivên dijwar re rûbirû bûye di çaviyên herî jêr de li binî bi xasûkî-fisekî û bi dizî hewl daye hebûna xwe dewam bike. Ti amûr û rêbaza mêtinkariyê bi qasî kapîtalîzmê civak xira nekirine, ji hev belav nekirine, timî di nava kaos û krîzê de nehiştine. Tevahiya hêzên şaristaniyê, tevî ku bi xwe jî timî mêtinkar û zordest bûn jî ji ber van xisletên kapîtalîzmê, ji bo domdariya civakê xwe neçar his kirine wê timî bi sînor bikin û li binî bihêlin. Bihêlin ku ew bibe qonaxeke pêş a şaristaniyê, timî laneta civakan lê bûye, weke nexweşiya kansêrê ya civaka exlaqî û polîtîk hatiye dîtin. Krîza di civaka roja me ya îro û li hawîrdora wê de, rastiya hilweşîn û qirkirinê ispat dikin ku nêzîkatiya exlaqî weke wijdanê rastiya civakî, naxape.

Kapîtalîzm derfetê gelek serketinan dide hêzên wê bi hosteyî bi kar bînin. Lê dema vê dike jî civakan dewamî di nava krîzan de dihêle, helwesta wan a polîtîk û exlaqî bêkêr dike, timî wan di nava şerên hundir û derve de dihêle, hilweşîn û qirkirinan bi serê wan de tîne. Di encamê de hêz û dewlemendî di kêm destan de kom dibe. Ev dest bi ser ketine. Di berdêla vê de jî civakeke hilweşiyayî û hawîrdoreke nikare dewam bike, li dawiyê hatiye hiştin.

Em dikarin Kapîtalîzmê bi vî awayî pênase bikin. Niha em serketina wê ya di şaristaniya Ewrûpayê de bi sernavên sereke berbiçav bikin.

## a- Şerê Hegemonîk ê Bajarê Venedîkê

Pirsa sereke ya divê bê kirin ev e, tevî mezinbûn û bilindbûna xwe Venedîk çima nikarîbû bibe Romayeke duyemîn. Ya Romaya Serdema Antîk têde bi serketî, Venedîkê jî dikarîbû pêk bianiya. Venedîk ji Romayê bêkêrtir û bêqabîliyetir nebû. Fazîletên wê ewçend zêdebûn, xweziya xwe bi Romayê nedianî. Di serî de bazirganî, hilberîn, pere, desthilatdarî, zanist û huner di tevahiya kategoriyên bingehîn ên şaristaniyê de di dema xwe de ber bi asta herî jor ve hildikişiya. Ji Çînê heta bi Rojhilata Navîn destên xwe dirêjî tevahiya Rojhilat kiriye, li bakur li qûntarên Sibîrya û Baltîkê karîbû heta bi nava Sehraya Mezin ve biçe û bikeve nava gelek qadan. Deryaspî herî kêm bi qasî Romayê di kefa destê xwe de digirt. Li ser tevahiya van qadan wer xuya bû ku yekdestdariya xwe danîbû. Herî kêm bi qasî Romayê, dewlemendî herikandibûn Venedîkê jî. Navenda nû ya amûrên malî, pere, sened û bankevaniyê bû. Kengî bi kar bidîta hilberîna herî bi kalîte ya pîşesaziyê ya wê demê, dikarîbû pêk bianiya. Nexasim Împaratoriyên Bîzans û Îslamê mîna ku nava wan verotibû, ti nirxa ji nava wan nekişandibe nehiştibû. Mirov Venedîkê weke hêza hegemonîk a sedsala 14. û 15. bihesibîne wê zêde tespîteke nepixandî nebe. Ji vî alî ve mirov dikare wê di dîrokê de weke hêza sereke ya ku nirxên şaristaniya Rojhilat veguhestin Ewrûpayê, şîrove bike.

Ne mumkîn e mirov şaristaniya Ewrûpayê bêyî Venedîkê bifikire. Çawa ku mumkîn nîne mirov Serdema Antîk bêyî Romayê bifikire, Serdema Navîn jî mumkîn nîne ku mirov bêyî Venedîkê bifikire. Mirov Venedîkê di Serdema Navîn de weke malzaroka kapîtalîzm zaye û weke pîrika wê bide naskirin çiqasî rast be, ewqasî jî diyarkirina rola wê ya dîrokî ye. Wê bi tenê zarokê kapîtalîzmê neanî; bi cenînê di hundirê xwe de tevahiya avahiyên bajarên Serdema Navîn jî jê dol girtin û bi vî awayî Ewrûpa ji bo kapîtalîzmê amade kir. Yê Ewrûpa bi kapîtalîzmê avis kir, Venedîk e. Lê tevî vê yekê jî nikarîbû bibe Romayeke duyemîn. Ji ber ku li Romayê Papatî rûdinişt. Di navbera Papa û Venedîkê de timî pirsgirêk û şer hebûn.

Di sedsalên Venedîkê de bilindbûna Xirîstiyantiya Katolîk a Romayê xweber nîne. Tevahiya pêngavên Katolîzma Romayê ber bi Venedîkê ve, mirov dikare bi hebûna kapîtalîzmê rave bike. Xirîstiyantiya Katolîk jî bi giştî bi qasî tevahiya dînên mezin bi guman nêzî kapîtalîzmê bûye û xwe jê venadaye ku li dijî wê bikeve şerê herî mezin ê dînî. Li Ewrûpayê di diyardeyên ji wan re şerê mezheban, engîzîsyon û şoreş tê gotin de bi giranî ya xwe nîşan dide, timî ev rûyê şer bûye. Nexasim şerê wê bi Protestaniyê re ji nêz ve têkiliya xwe bi şerê wê yê bi kapîtalîzmê re heye. Bêguman Xirîstiyanbûna Ewrûpayê bi awayekî berbiçav ji bo pêşketina kapîtalîzmê zemînekî binesaziyê ava kiriye. Lê ev hebûn bi serê xwe nayê maneya kapîtalîzmê. Îslamê ji bo kapîtalîzmê hê zêdetir hêmanên binesaziyê afirandin, lê bi serket ku rê jî nede kapîtalîzmê.

Duyemîn sedema girîng a çima Venedîk nebû Romayeke duyemîn, bi sedema yekemîn ve girêdayî li ser bajarên li Nîvgirava Îtalyayê nikarîbû serdestiya xwe çêke û nikarîbû Îtalyayê weke dewleteke netewe bi rêxistin bike. Bi awayekî îdeolojîk Venedîk ne amade bû ji bo bibe dewleteke netewe. Di warê dewletdariyeke hişk a bajaran de belkî jî di dîrokê de nûnerê herî bi hêz û dawî bû. Ev rastiya wê têra xwe rave dike ka çima kapîtalîzmê nikarîbûye ji serdema zarokatiya xwe bibihure. Venedîk heta bi dawiya sedsala 18. ve hêza dîrokî ya berxwedanê ya esilzadeyên bajaran hem li dijî ekumenîktiya (gerdûnîtî) Vatîkanê û hem jî li dijî dewletdariya neteweyî ya Îtalya-Ewrûpayê, îfade dike.

Divê mirov baş zanibe ku bi qasî dewletdariya bajaran demokrasîgiriya bajaran jî formên temsîlî yên herî bi hêz ên dîrokê ne. Bajaran rasterast ji demokrasîgiriyê re jî şahidî kirine. Sîstemên împaratoriya serdemên berê û nû, û sîstema dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst li ser înkara demokrasîgirî û dewletdariya bajaran hatine avakirin. Ezmûna bajarê Venedîkê di asta herî jor de vê rastiyê piştrast dike. Ji aliyekî ve li dijî împaratoriyên xanedan ên Vatîkan-Habsbûrgê li ber xwe dide, ji aliyê din ve jî li dijî dewletdariya neteweyî ya pêşwext û sîstema wê ya Westfhalia (1648) li ber xwe dide û ev vê rastiyê îfade dikin. Di roja me ya îro de wexta li ser rexnekirina bajaran û ji nû ve vejandin û avakirina wan tê

fikirîn, bêguman ji ezmûna Venedîkê mirov dikare têra xwe xwe hîn bibe. Hemin bi qasî Venedîkê nebe jî di serî de bajarên Îtalyayê, gelek bajarên Ewrûpayê hem weke dewlet hem jî weke demokrasî têra xwe dersên hînker pêşkêş dikin.

## b- Serdema Derbasbûna Ji Dewleta Bajêr Ber Bi Dewleta Netewe ve: Ezmûnên Amsterdam-Hollandayê

Di sedsala 16. de li Ewrûpayê pirsgirêka bingehîn ew e, kapîtalîzm hewl dide li dijî sîstemên împaratoriyên klasîk bi ser bikeve û bibe hêzeke fermî ya mayînde ya şaristaniyê. Hêza stratejîk a sereke ya wê demê, hêzên împaratoriyê yên xwe spartine xanedaniya Habsbûrgê ne. Ji dema bi cihbûn ve şaristaniya Mûsewî û Îslama Endulus (711-1492) a bi wan re di nava şer de bûn ji Nîvgirava Îberîk tesfiye kirin û piştre yên mayî jî koçber kirin, bi desteka Vatîkanê bi pey hegemonya li ser tevahiya Ewrûpayê ketin. Lê li hemberî vê, di çarçoveya Ewrûpayê de gelek dewletên bajaran, prenstî û qraliyetan li ber xwe da. Di serî de Qraltiya Franseyê, Qraltiyên Brîtanya û Elmanyayê, gelek bajarên Îtalyayê bi awayekî dijwar li ber xwe dan. Li dijî ekumenîzma Katolîk a ku hegemona îdeolojîk e, Protestaniya ku serdema dêrên millî bi awayekî fermî îlan kir, derket holê. Ewrûpa ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve ket nava kaoseke mezin. Rengê mezheban tevlî şerên hegemonîk bû. Ji aliyê din ve, di serî de Venedîk, Ronesansa li bajarên Îtalyayê pêk hatibû bi lez li tevahiya Ewrûpayê belav bûbû. Di cewher de Ronesans berhema dewletdariya bajêr û demokrasîgiriya wê bû ku mezin dibû.

Li dijî skolastîsîzma Serdema Navîn a Ronesansê, gavavêtina sekuler-laîk giraniya xwe hebû. Ji lewra mirov dikare fêhm bike ka çima gelek bajar û prenstiyan ji xwe re himayekar û destekdar didîtin. Di jihevcihêbûna felsefe û hunera bi giranî dînî ji ya li ser rêya felsefe û hunera laîk de Ronesansa di sedsala 16. de bi roleke diyarker radibe. Protestaniya di dîn de weke reformê ye, ji nêz ve têkiliya xwe bi derketina Ronesansê re heye.

Şaşiyeke gelekî mezin e ku mirov şoreşa Ewrûpayê ya di sedsala 16. de bi kapîtalîzmê ve girê bide. Şoreşa di vê demê de, mîna şoreşa Sumeran a li dijî civaka neolîtîk a li Mezopotamyayê kirî û dîsa mîna şoreşa bajaran a Helenan li peravên Egeyê li dijî civakên 'barbar' pêk anîne. Şoreşeke mezin a çandê ye. Ji ber naveroka xwe, hê ji serî ve xisletên gerdûnî temsîl dike. Ya kapîtalîzm têde bi serket ew e, di vê kaosa mezin a sedsalê de karîbû xwe weke alternatîf pêşkêş bike.

Li ser navê tevahiya mirovatiyê li rojavayê Ewrûpayê pêvajoyeke mehşerî diqewime. Di vê pêvajoya mehşerî de şaristanî bi giranî hêza xwe ya kontrolê ji dest didin. Di warê kontrolê de valatî derdikeve holê. Kapîtalîzm weke berhema vê valatiyê gava xwe ya mezin diavêje û derdikeve holê. Mîna ku cinawirê bi dirûvê mirov ê ku hêzên şaristaniyê yên dewletdar û yên bê dewlet bi hezarên salan ew di qefesê de radigirtin, xwe ji zincîrên xwe rizgar bike û li ser tevahiya mirovatiyê hegemonya xwe ya xeternak ava bike. Ev derketina holê dişibe vê mînakê û wê temsîl dike. Mirov dikare xwe li kapîtalîzma bêhegemonya rabigire, civak dikare xwe ragire, hawîrdor dikare hilneweşe. Lê wexta kapîtalîzm weke hêza hegemonîk bilind û mezin bû, civak hemû, hawîrdor û sîstemên şaristaniyên berê dikevin tehlûkeyeke gelekî mezin. Xusûsa bingehîn a divê bê fêhmkirin ew e ku ji krîza şaristaniyê ya sedsala 16. kapîtalîzm ne weke hêzeke çareseriyê, lê weke hêzeke hegemonîk a zordest derketiye.

Divê mirov di van sedsalan de şoreşên Ronesans, Reform û Rohnîbûnê cihê, kapîtalîzmê jî weke derketineke cihê bibîne. Di zanista civakî ya navend Ewrûpa de xiyaneta herî mezin ew e ku ev pêvajoyên dîrokî kiriye malên kapîtalîzmê. K. Marks û Marksîzm jî di navê de, bi tevahî zanyar û zanistên bi civakê re têkildar (ango bi tevahî zanist) ji ber ku nikarîbûn rola dîrokî ya hegemonya kapîtalîst rast diyar bikin, derî li tevahiya felaketan vekirî hiştin.

Rola bajar û prenstiyên Amsterdam-Hollandayê di vê trajediya mezin de rewşeke mentiqî ye. Amsterdam bi xwe di serê sedsala 16. de weke bajarên din ên li Rojavayê Ewrûpayê, li peravên Atlantîkê bi masîgirî, bazirganî û cotkariyê pêş dikeve. Ji îhtîşama Venedîkê dûr e. Lê şensekî wê

heye; gelek mirov hene dixwazin ji despotîzmên Ewrûpaya bejahiyê û ji muhafezekariyê rizgar bibin hene. Ji lewra şensê wê heye ku ev mirov li vir bicivin. Di serî de Spînoza, Descartes û Erasmus nûnerên nû yên aqlê azad dewamî diçin bajêr û lê dimînin. Di zanist û hunerê de dahiyên hostekar nas dike. Bi vî awayî serdestiyeke mezin a qabîliyeta fikir û hisê, bêguman wê li ser bûyerên polîtîk û hilberînê bi tesîr bibe. Jixwe di bazirganiya deryayê û masîgiriyê de bi roleke pêşeng radibe. Bi hevrikên xwe yên mezin, bi gavavêtinên bajarên heman rengî yên Qraliyetên Spanya û Portekîzê re bi hêsayî pêşbaziyê dike. Ji vê jî girîngtir, li hînterlanda xwe di dema ji nû ve birêxistinkirina cotkariyê de karîbûye gav biavêje berdariya herî zêde. Serdestiya di warê hilberîn û bazirganiyê de bi lez wê di pîşesaziya manîfakturel de jî nirx û berdêla xwe bibîne.

Prenstiya Hollandayê li ser heman qadê bi eyaletên piçûk ên di nava pêşketinên bi heman rengî de pêkhatineke siyasî ya aliyê wê yê demokratîk girantir pêkanî û bi vî awayî hewl dide şerê xwe yê hebûnê bike. Li dijî kê? Li dijî xanedanên Valois (Fransî) û Habsbûrgê ên dixwazin Ewrûpayê daqurtînin û di nava xwe de parve bikin, û bi vî awayî bigihîjin armancên xwe yên împaratoriya gerdûnî. Li dijî vê Meliktiya Brîtanyayê, Hollanda û Prenstiyên Elman bi awayekî xurt li ber xwe dan. Elmanya Prûsyayê jî hêzeke din a vê berxwedanê ye. Tê xwestin ku împaratoriya pîroz a Roma Germen vê carê li ser hîmê Meliktiya Spanyayê ya ku li Spanyayê li dijî Îslam û Mûsewîtiyê bi ser ketiye, ji nû ve were ava kirin. Ekumenîzma Katolîk vê avakirinê mecbûrî dibîne. Li aliyê din, milê Habsbûrgan ê navend Awusturya li Rojhilat hewl dide hegemonya Osmanî ya Îslamî rawestîne û êrişê bibe ser. Franse jî milekî din ê hevrikê ekumenîzma Katolîk a Xanedaniya Valois e (Valuwa). Dema ji nû ve keşifkirin û mêtingehkirina dinya û Emerîkayê dest pê kiriye. Xwe gihandine Efrîka û Hindistanê; serê piran hatine girtin ango cihên girîng hatine zevtkirin.

Pirr eşkere tê dîtin, ji bo Prenstiya Amsterdam û Hollandayê pirsgirêk şerê man û nemanê ye. Milê herdu xanedanan ji bo van qadan daqurtînin hêzên xwe hemû seferber kirine. Li Ewrûpayê ji bo bidestxistina

serdestiya stratejîk şer di qonaxa herî krîtîk de tê dewamkirin. Di tevahiya demên krîtîk ên dîrokê de şerên bi vî rengî yên stratejîk qewimîne. Ji bo kesên di şer de têk diçin, ev ne bi tenê bibinketina şerekî ye, herweha ji dest dana demekê ye ku wê bi sedsalan tesîr bike. Ji vê jî xirabtir, hebûna civakî bi tesfiyeyê re rûbirû ye. Di serî de Hollanda, hebûnên nû yên civakî ku çarenûsa wan bi van tehlûkeyan re rûbirû ne, hene. Em behsa pêvajoyeke man û nemanê dikin ku têde mirov bi qîrîn dibêjin yan giş an jî hîç, yan azadî yan mirin.

Prenstiyên Amsterdam-Hollandayê ji ber vê rewşa stratejîk şevûrojên xwe dikirin yek û dixebitîn. Gihiştina hostetiya hem di warê îdeolojîk, polîtîk û eskerî, hem jî di warê bazirganî, pîşesazî û malî de bi tenê bi îradeya jiyana azad û saxmayîna li jiyanê dibe. Ev hostetî û hêza îradeyê hatiye nîşandan. Piştre rêzebûyerên em dikarin ji wan re mûcîzeyên Hollandayê bibêjin pêkhatine. Amsterdam û Hollandaya ku ji nîvê sedsala 16. ve ruşt û têkneçûna xwe ispat kirin, di sedsala 17. de li nava dinyayê weke yên mîna xwe ango Ûrûk-Sumer û Atîna-Grek, xwe gihandin asta hêzên hegemon.

Tevî vî aliyê erênî yê dualîteya Amsterdamê, aliyê din ê xasûk û di bin re yê dualîteyê, kapîtalîzm e. Di dîrokê de her derketina holê û hilatina mezin cêwiyekî xwe yê xayîn û xasûk-fisekî heye. Ez weke baweriya Zerdeştiyê behsa dualîteya ronahî û tarîtiyê nakim. Lê ne mumkîn e ku mirov tariyeke kapîtalîzmê di derketina Amsterdam û Hollandayê de nebîne. Di vê nirxandina xwe de şaşiya K. Marks jî kirî ez nikarim qebûl bikim, ango ez nabêjim kapîtalîzm bi ser ket. Ez vê şaşî û xefleta li ser navê zanistê hatiye kirin, red dikim. Di serketinê de para kapîtalîzmê nîne. Lê di îstîsmarkirina serketinê de para wê ya herî zêde ye. Hinek, hin hêz timî dixwazin yên şerên herî giran meşandine îstîsmar bikin, bi kar bînin. Sermayedarên li Hollanda û Amsterdamê di kêliyên herî zor ên şer de derketin ser rûyê erdê û li ser xwîna herî bi rûmet a mirovan (weke îrade û fikir) li pey karê çûn û ev pêkanîna wan a vê yekê, wan nake xwediyê serketinê, hebe nebe wê wan weke îstîsmarkaran, manedar bike. Wexta ku Şoreşa Hollandayê hûrûkûr bê kolan, û li ser navê kedkar û azadîxwazan dîrok ji nû ve were

nivîsandin ji sedî sed ev rastî wê xwe bide qebûlkirin. Kapîtalîzma di dema hegemonya Venedîkê de hê zarok bû, di hegemonya Amsterdam-Hollandayê de bi rola xortekî no û çors radibe. Mîna Skenderê serdemê ye, her cihê diçiyê lê dide, dixîne û dişkîne.

Di bilindbûn û mezinbûna hegemonîk a Hollandayê de guhertinên di teknîka desthilatdarî û hilberînê de rê li ber wan vekir, bi roleke bingehîn radibin. Karûbarên manîfakturel ji nava malê derketin, weke yekeyên serbixwe ji nû ve xwe bi rêxistin dikin. Di cotkariyê de nûbûnên bi heman rengî hatin kirin. Reforma erd û cotkariyê bi awayekî berfireh hat bicihanîn. Ji bo bazirganî û masîgiriyê di çêkirina keştiyan de teknîkên herî xurt ên wê demê hatin bikaranîn. Van faktoran hemûyan kir ku li gorî Ewrûpa û herêmên din ên ekonomîk ên dinyayê hilberîna herî erzan mumkîn bibe.

Weke teknîka desthilatdariyê yekeyên prenstî û bajarên xwe disipêrên avahiyên dewletê ber bi dewleta netewe ve beridîn û veguherîn. Pêkhatina siyasî ya nû cara pêşî bû, pêk dihat. Rêxistinkirina dewleta tîpa dewleta netewe xwe gihand pêşnûmeya xwe ya pêşî. Weke bingeh negirtina dewleta bajêr a Amsterdamê û destkişandina ji modela kevneşopiyê ya Prenstiya Hollandayê, sedem in ku di vê de bi tesîr bûn. Rêxistinkirina desthilatdariyê bi awayekî bi berdarkirina ekonomiyê re di nava ahengê de hat meşandin. Di vê de reformên di avakirina artêşê de jî bi roleke girîng rabûn. Avahiyên pêşî yên moderníteyê hem di warê teknolojiya eskerî de, hem jî di warê rêxistiniyê de pêk hatin. Di warê hêzên deryayî de jî pêşketinên bi heman rengî çêbûn. Herçiqasî welatekî piçûk be jî van bûyeran pêşî lê vekir ku di nava dinyayê de bibe hêzeke hegemon. Ji vî alî ve, Şoreşa Hollandayê ji bo Şoreşên Ingilîstan, DYE û Franseyê ku wê paşê pêk bên, bi statuya pêşeng radibe.

Di şoreşê de ji aliyê kapîtalîzmê bi destxistina hegemonyayê, xwînrij bûye. Tevî ku yên şoreş bi rêxistin kirin û yên ji bo wê têkoşiyan hêzên gel ên civakî bûn, hindikayiyeke xwedî sermayê ya piçûk lê xwe şidandî bi rêxistinkirî, pêşengiya şoreşê xiste destê xwe û divê mirov vê yekê weke du xusûsên cihê bifikire. Ji sedî sed ên şoreş bi rêxistin kirin û meşandin,

yên serxwebûn û yekparetiya Hollandayê pêkanîn, hêmanên kapîtalîst nebûn. Diyardeya di vir de derdikeve pêşiya me ku weke gelek caran di dîrokê de derketiye pêşiya me, di vê veguherînê de jî careke din diqewime. Hêzên şaristaniyê yên berê wexta ku têk diçin jî li şûna ku li hemberî civakê desthilatdariyê bi tevahî ji dest bidin, li gorî berjewendiyên xwe baştir dibînin ku ji xwediyên desthilatdariyê yên muxalif re bihêlin. Di navbera wan de tayên zêde û têkiliyên ji bo berjewendiyan timî hebûn û dewam kirine. Çîna nû ya desthilatdar bûrjûwazî be jî ji hinavên ya berê derketiye. Ev dibe çîna serdest a berê ya ku beridiye.

Sedema girîngiya modela Hollandayê ne ji mezinahiya wê ye; sedem ew e ku modela serdest a paşerojê di nava xwe de dihewîne. Bi xwe re, bi şaristaniya Ewrûpayê jî pêngaveke mezin daye avêtin û kiriye ku ev şaristanî li nava dinyayê bi bandor bibe. Dinya modern, gelek tiştan deyndarê gavavêtina Hollandayê ye. Xeta Venedîk-Amsterdamê, ji sedsala 14. heta bi sedsala 18. şaristaniya Ewrûpayê veguherandiye û li dinyayê serwer kiriye, ev xet di vî warî de bi rola pêşengiyê û pêşî rabûye. Hêza hegemon a dawî ya şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn Împaratoriya Îslamê ya Osmanî wexta xwe ji nîvê Ewrûpayê vekişand, hêzên hegemonîk ên Ewrûpayê yên xwe ji kirasê dînî derxistî û bi giranî laîk ji her alî ve dor li Ewrûpayê digirtin. Ewrûpa bi vê dorgirtinê re rûbirû bû.

Di diyalektîka şaristaniya Ewrûpa-Rojhilata Navîn de hem berdana hegemonyayê bi destê Ewrûpayê hem jî ji aliyê wesifguherîn û cudabûna wê, di wê astê de girîng e ku wê tevahiya serdemê diyar bike. Serdestiya hegemonîk a Hollandayê dema 1650-1750'î di vê bi destberdan û veguherînê de bi rola sereke rabûye. Venedîkê şaristaniya navendî ji Rojhilata Navîn dizî û di ser Îtalyayê re di sedsalên 12.-16. de veguhest Ewrûpayê, Amsterdam-Hollandayê jî ew di demeke kin de li peravên Atlantîkê veguherandin û bi vê li dinyayê bûn fatihên pêşî yên hegemonya navend Ewrûpayê. Sîstema şaristaniya navendî piştî serhatiya xwe ya pênc hezar salan a li Rojhilata Navîn li peravên Atlantîkê navenda wê Ewrûpa vediguhere sîstemeke nû ya dinyayê.

## c- Ezmûna London-Brîtanyayê û Împaratoriya Roj Lê Naçe Ava

Hê di qonaxên destpêkê de heman dijminên stratejîk dor li şoreşa Hollanda-Amsterdamê û London-Brîtanyayê girtibûn. Ji lewra jî têkiliya di navbera herduyan de diviyabû stratejîkbûna. Monarşiyên Spanya û Franseyê ji bo herdu hêzan jî rê li ber pirsgirêka man û nemanê vekiribûn. Ji bo herduyan jî tehlûke hebû, bêne daqurtandin. Di nava dilê xwe de ev rastî his dikirin û ev dibû fikara bingehîn a fikrên wan. Heman rastî ji bo aliyê din jî bi heman rengî bû. Eger bi ser nekevin û nebin hêza hegemonîk, hem wê hegemonya îdeolojiya Katolîk hem jî wê îdeala wan a ji bo bibin Romaya Duyemîn di nava rûpelên dîrokê de bimîne. Dewamî û zêdebûna şer û xwelihevrakişandinên di navbera herdu qutbên hegemonîk de çavkaniya xwe heman tişt bû, ew jî pirsgirêka man û nemanê bû. Di encamê de li ser tewazuna dewleta netewe ya Westphaliayayê gihiştin statuyekê (1648) û vê yekê şerên di navbera wan de bi sînor kirin û bêhndanên ji bo aştiyê demdirêj kirin.

Bilindbûn û mezinbûna Londonê mîna cêwiyekî Amsterdamê ye. Ji ber ku xwediyê heman pirsgirêkên stratejîk in, neçar mane çareseriyên bi heman rengî pêşde bibin. Brîtanya giravek e, û vê yekê karên wê hêsantir kiriye. London weke dewleteke bajêr derneket. Ji vî alî ve ji îhtîşama Venedîkê gelekî dûr e. Qraltî weke navendî hatiye avakirin. Lê hê ji sala 1215’an ve li bin bazkê Magna Chartayê bûye xwediyê otonomiyeke qismî û heta îro hatiye. Ango ji destpêkê ve ji modeleke siyasî ya xweser re dergûşî kiriye. Ji wexta qralê pêşî yê Brîtanyayê Arthur ve yanî ji sedsala 5. ve Brîtanyayê ji arîstokrasiya bi qraliyetê re xwedî hêzeke wekhev bû, dergûşî kir û divê mirov vê jî li rastiyê zêde bike. Ji aliyê din ve, girav xwedî cihêwaziyekê ye ku ji bo mişextkiriyên parzemîna Ewrûpayê pena û star e. Bi navberên zêde, dagirkerî jî çêbûne. Ji dagirkeriya pêşî ya Sezar a li ser navê şaristaniyê ve, bûye pariyekî balkêş ê fatihên parzemînan timî dilê xwe bibijîninê.

Bilindbûn û mezinbûna Londonê bi van rastiyan re ji nêz ve têkildar e. Di hundir de ji bo hêzên arîstokrat ên bi qraliyetê re xwedî hêzeke wekhev otonomiyeke qismî, ji derve jî li dijî her dagirkeriya ji derve tê ji bo parastin û mişextkirinan bûye pena û stareke dawiyê. Li ser bingehê van diyardeyên stratejîk çarenûsa xwe hûnandiye. Wexta ku weke bajar mezin û bilind dibe, ev statuya xwe ya stratejîk timî li ber çav girtiye. Heta roja me ya îro vê statu û rewşa xwe dewam dike. Divê neyê jibîrkirin ku di diyarkirina çarenûsa bajarekî de hê ji sîteya pêşî ya Ûrûkê ve fikarên stratejîk timî bi roleke bingehîn radibin. Kes bajarekî bêbirc û Akropol nafikire û ev jî vê rastiyê îfade dike. Ji bo bajarekî herî kêm bi qasî stratejiyê ya hewce dike, bereyekî cotkariyê yê piştmalê ku wî xwedî bike, bazirganî, zenaet û hilberîna pîşesaziyê ye. Ev faktor jî bêyî dewlet an jî rêveberiyeke demokratîk pêşde naçin û dewam nakin. Mirov dibêje qey London ji bo van faktorên malî, bazirganî, zenaet, pîşesazî û hemû hilberînên stratejîk zêde di zikhev de bimîne, hatibe mehkûmkirin.

Girav heta dawiya sedsala 15. li dijî dagirkeriyên çavkaniya xwe parzemîn û xwestekên fetihkirinê hewl da qonaxa berxwedanê bi dawî bike. Dagirkeriya dawî ya Norman di nîvê sedsala 16. de bi dawî kir û bi vê yekê mîna gihiştibe kesayeta xwe. Brîtanyatî êdî nasnameyeke serbixwe ye. Piştî salên 1550'î Serdema Elisabeth a Yekemîn xwedî wê cihêwaziyê ye ku têde ev nasname hatiye bidestxistin. Nasnameya London a bajêr jî bi vê nasnameya giravê re hêz bi destxistiye û pê hatiye ber rola xwe ya dîrokî ku divê pê rabe.

Di sedsala 16. de pirsgirêka bingehîn a Londona Brîtanyayê ew e ku li Atlantîkê Spanya-Portekîz, li erdên Ewrûpayê dorgirtina Qraliyetên Franseyê divê biqelêşe û karibe li dinya derya û bejahiyê vebe. Bi Amsterdama Hollandayê re xwediyê pirsgirêkên bi heman rengî ye. Eger di çareserkirina van pirsgirêkan de bi ser nekeve wê hebûna wê ya siyasî bi dawî bibe. Ji bo serketinê jî divê di şerê hegemonyayê de ji bo serekiyê gulaşê bike. Tevî ku veguhestina şaristaniya navendî ji bo Ewrûpayê temam bûye jî di navbera hêzên cûrbicûr de şerekî dijwar ê hegemonîk diqewime. Sîstemên şaristaniyan sîstemên hegemonîk in.

Londona Brîtanyayê (Ingilîstan) ji bo serketina di şerê hegemonîk de divê sê amûrên bingehîn ên dîrokî bivênevê pêşde bibe. Ev amûr kapîtalîzm, dewleta netewe û pîşesazî ye. Girav ji aliyê cotkariyê ve herî zêde dikare têra xwe bike. Cotkarî çiqasî bi bereket be jî ji bo şerê hegemonîk ê ketiye navê dewam bike, têrê nake. Bi tevahî şert û mercên hundir û derve guhertineke awarte ya sîstemê ferz dikin. Di dîrokê de gelek mînak hene ku piştrast dikin, wexta hebûna wan dibe mewzûbehs, hêzên civakî yên tengav dibin ji qonaxa lê xwe timî pirr dirêj çip dikin pêş û di warê teknîkên nû, fikrî, polîtîk, eskerî û sîstemên ekonomîk de pêşde diçin. Bi giştî li Ewrûpaya hatiye tengavkirin û bi taybetî jî li Girava Ingilîstanê ya diqewime, pêkhatineke bi vî rengî ye. Girîngiya sedsala 16. bi vê rastiyê re têkildar e.

Bêguman Londona Brîtanyayê ya sedsala 16. hêz û mûcîda bi tenê ya pêngava kapîtalîzm, dewleta netewe û pîşesaziyê nîne. Ev bûyer û pêşketinên sêber, di serî de li bajarên nîvgirava Îtalyayê, li tevahiya bajarên Ewrûpaya Rojava diqewimin. Veguherîna sîstemê di çarçoveya global û parzemînî de ye. Lê bi awayekî xweser ên Londonê lê zêdekirine her diçe bi rola pêşeng û katalîzoriyê radibin. London mejî û katalîzorê nû yê sîstemê ye.

Pirsa bingehîn a divê bê kirin ev e, kîjan hêman di vê de bi roleke diyarker rabûne.

**1-** Bi temamî ji hev nehatiye derxistin ka kapîtalîzm çawa bûye sîstem. Mijar hê jî tê guftûgokirin. Di beşên cuda yên parêznameyê de li ser mijarê me îzahên hewce kirin. Nuqteyên bingehîn ên rexneyê hatine pêşkêşkirin. Bi kurtî, rexneya herî radîkal li ser analîza K. Marks **Kapîtal**ê hat kirin ka çawa têde kêmasî û şaşiyên mezin hene. Kapîtalîzm weke sîstemeke ekonomîk a herî pêşketî û pêşverû tê nîşandan û ev bingehê şaşiya Marks e. Mirov şêweyê ekonomîk weke şêweyê civakê giştî bike, maneya wê ew e ku şaşî jî tê giştîkirin. Ev şaşî jî di bin navê 'materyalîzma diyalektîk' de kirin rêbaz û li dîrokê jî belav bû. Encam, sererastkirina îdealîzma Hegel ne, karîkaturîzekirina wê bû.

Divê mirov baş fêhm bike ku hê kes ji Hegel nebihuriye. Herçend şaristaniya Ewrûpayê rê li Hegel vekiribe jî di heman demê de mehkûmê wî ye. Ji Hegel ve felsefe ji jor daketiye jêr. Berevajiyê Hegel, Nietzsche ye. Ew jî di asta herî jor de rexneya modernîteya kapîtalîst e. Hê kes jê nebihuriye. Xweseriya wî jî ew e, bi awayekî pêxemberwarî qîriyaye û gotiye, ti têkiliya kapîtalîzmê bi jiyanê re nîne. Mezinahiya Fernand Braudel jî ew e, kapîtalîzm ne weke ekonomî, karîbûye weke yekdestdariyê bide naskirin. Kapîtalîzm weke yekdestdarî, ne şêweyekî hilberînê, ne jî qonaxeke civakî û dîrokî ye. Vegotina jê re ekonomî-polîtîka Ingilîz tê gotin di bingehê xwe de amûrê rewakirina kapîtalîzmê ye. Tevî ku ekonomî nîne jî weke 'sîstema herî pêşketî ya ekonomîk' hatiye pêşkêşkirin, di bin navê 'zanistê' de xapandina herî mezin a dîrokê ye. Karekterê spekulator û derbdar ê yekdestdariyê ekonomîze dikin, bi vê xapandinê hewl didin wê rewa bikin. Tevî hemû rexnegiriya xwe K. Marks û peyrewên wî, bi alîkariya pozîtîvîzmê jî bûne destikê van hewldanan û ji wan nehat vê nekin.

Mirov kapîtalîzmê weke dînekî mîna Îslamiyet an jî Xirîstiyantî yan jî yekdestdariya îdeolojîk-pratîk analîz bike, hîç guman têde nîne ku wê heqîqetên gelekî balkêştir raxe ber çavên me. Kapîtalîzm di dîroka şaristaniyê de yekdestdariya herî mezin e. Di dîroka mirovatiyê de yekdestdariya pêşî 'Bi zilamê hîlekar û bi hêz' dest pê kir, eger em vê tespîtê her li ber çav bigirin, em ê bibînin ku kapîtalîzm ev 'destê' rêxistinkirî yê bi sazî bûye îfade dike. Têgîna yekdestdariya bi sazî bûyî, di roja me ya îro de mirov dikare weke hêza desthilatdariyê ya li ser tevahiya qadên civakê jî fêhm bike. Ango divê bi pêşketinê, şêweyên avabûna jêr û jorê civakê û maneya hebûna cewherî re yekser têkiliya wê neyê danîn. Herweha mirov dikare kapîtalîzmê weke sîstema nirxê zêde û zordestiyê ya li ser civakê herî zêde pêşketiye û xwe rewa kiriye, bide naskirin. Bi vê danasînê, bi giştî yekdestdarî, bi taybetî jî yekdestdariya kapîtalîst xwe di kategoriyên ekonomîk, civakî, polîtîk, eskerî û îdeolojîk de bi cih dike û mîna ku ew kategorî ew bi xwe ye, rewa dike. Ev jî ji bo em vê rewakirinê baştir fêhm bikin, derfetê dide me. Weke mînak, yekdestdariya eskerî artêş

e, û di tevahiya şaristaniyan de hêza bingehîn a avakirina hegemoniyan e. Hegemonya jî 'zilamê xasûk û bi hêz' ê xwe li ser tevahiya civakê ferz kiriye, sazîbûna wî ya kolektîf îfade dike.

Li bin rohniya vê danasînê, em bi giştî li kapîtalîzma Ewrûpayê û bi taybetî jî li kapîtalîzma li Londona Brîtanyayê mezin û bilindbû binêrin, em ê karibin baştir maneyê bidinê. Ji bo bersivdana hêzên hegemonîk ên ji çar aliyan ve dor li Giravê girtine ya herî baş yekdestdariyên hegemonîk ên ji wan bi hêztir in. Yekdestdariyên çavkaniya xwe Spanya û Franse, kevneşop bûn. Rengê dîn û qraltiyê li ser wan hebû. Eger Giravê jî ji ber van sedeman bi dîn û qraltiya mîna wan rabûya û weke yekdestdarî xwe bikira dijberê wan, bi îhtîmaleke mezin wê têkbiçûya. Ji ber ku hevrikên wê, ji her alî ve di ser wê re bûn. Ji lewra li dawiyê bi tenê rêyek dima, ew jî avakirina şêweyekî nû yê yekdestdariyê bû, jixwe ya hat kirin jî ew bû. Di vê çarçoveyê de bi vê sedema dîrokî li Giravê di sedsala 16. de ji îdeolojiyê heta bi hilberînê, ji polîtîkayê heta bi eskertiyê di her qada çanda maddî û manewî de yekdestdariyeke nû hat avakirin. Kapîtalîzma Ingilîz navê vê avakirina giştî ye. Ji ber ku li ser mîrateya fikir û teknîka pêşketî ya tevahiya mirovahiyê xwe ava kiriye, ne pêşketin e, ne jî şêweyekî nû yê civakê ye. Bi tenê di yekdestdariyê de formasyona herî baş zevt kiriye. Wexta ku mirov di vê çarçoveyê de li guhertinên hatine kirin binêre, çi bi şoreşê çi jî bi reformê pêk anîbe, di encamê de ya kiriye armanc bi sazîbûna yekdestdariyê ye. London weke navê bajar, Brîtanya jî weke navê welat girtiye, lê ev bi tenê ji ber ku ji ziman re hêsan tê, wisa bûye. Ev şerê hegemonîk ê yekdestdariyê ji salên 1780'î ve bi hevgirtina stratejîk a Amsterdam-Londonê dihat meşandin, piştî şoreşa Franse (1789) û şerên Napolyon, Ingilistan bi serket ku weke hegemonê bi tenê bimîne.

Di bin navê kapîtalîzma Ingilîz de rêzik û sazîbûnên nû yên di qadên cotkarî, fînans û pîşesaziyê de weke dîrokeke dirêj di beşên berê yên parêznameyên min de hatine vegotin. Reformên dînî yên xweserî xwe, saziyên zanistî yên paldayî wan û sîstema perwerde û hunerê jî bi sazî bûye. Bi kurtî weke hêmanê bingehîn ê modernîteyê mohra xwe li şêwazê nû yê jiyanê xistiye.

**2-** Di bilindbûn û mezinbûna hegemonîk a London-Brîtanyayê de duyemîn sazîbûna girîng a bi yekdestdariya kapîtalîst re di zikhev de pêşket, hiyerarşiya civakî û avahiya berê ya dewletê ne ku xwe weke dewleta netewe bi rêxistin kirin. Rêxistiniya dewleta netewe, li ser qada desthilatdariyê bi yekdestdariya kapîtalîst a li ser ekonomiyê re paralel e. Hişk di zikhev de ne. Yekdestdariya desthilatdariyê nebe, yekdestdariya ekonomîk nabe û pêk nayê. K. Marks jî di navê de, zanyarên civakî diyardeya herî zêde pê xapiyan û nikarîbûn zelal bikin ew e, yeqîn kirin ku ekonomî weke qadeke xweser kapîtalîze hatiye kirin. Bi tevahî dîroka şaristaniyê piştrast dike ku yekdestdarên li ser qada ekonomîk wexta bi yekdestdarên îdeolojîk û desthilatdariyê re bikevin zikhev dikarin nirxê zêde pêk bînin. Jixwe divê mirov yekdestdariya desthilatdariyê weke îfadeya yekdestdariya ekonomîk a zêde û bi sazî bûye, şîrove bike.

Mirov bi awayekî fermî ji sazîbûna desthilatdariyê re dewlet bibêje bi ya min vegotineke ji rêûresmê ye. Ev yekdestdariya desthilatdariyê ya rêûresmê bi kapîtalîzmê re di zikhev de xwe neçar dîtiye forma dewleta netewe bi rêxistin bike. Yek ji xisletên bingehîn ê hevgirtina stratejîk a Amsterdam-Hollanda û London-Ingilîstanê ew e, dewlet weke dewleta netewe li ser tevahiya civakê belav kirin. Dewleta ji rêûresmê heta wê demê li ser û nava civakê di danîna sînoran de bi îhtîmam tevdigeriya û xwediyê şêweyekî bi vî rengî yê avabûnê bû. Ji lewra jî vî şewêyî hêza wê bi sînor dikir. Lê di modela dewleta netewe de, ji ber ku dewlet tevahiya civakê digire nava netewe, ji hegemonya îdeolojîk û ekonomîk jî sûdê werdigire, xwe rewa dike û bi vî awayî rê li ber bi hêzbûneke herî mezin vedike.

E. Wallerstein di lêkolîn û lêgerîna xwe ya berfireh a bi navê '**Analîza Sîstemên Dinyayê**' de, destnîşan dike ku di hegemonya Ingilîz de hêmana di dawiyê de serdestiya wê pêk tîne şêwazê nû yê rêxistiniya dewletê ye. Ev destnîşankirin nêzîkatiyeke rast e. Lê çawa ku em di berhema K. Marks de dibînin, li ser kapîtalîzmê gelek analîz hatine kirin û heta mirov dikare bibêje bi analîzê berhema xwe fetisandiye, lê ji aliyê din ve, di asta têgînê de jî nêzî analîza dewleta netewe nebûye û ev yek kêmasiyeke mezin e, û

vê nêzîkatiyê kiriye ku serketina heqê berhema wî ya mezin bû, bi sînor bimîne. Dewleta netewe, gelek tiştan deyndarê millîkirina dînî û tevahiya qalibên dewleta ji rêûresmê ye. Berevajiyê wê jî rast e. Di serî de dîn, millîkirina çanda ji rêûresmê kiriye ku dewletdariya netewe derkeve holê, dewleta netewe jî ji xwe re weke dînê nû milletperestî neqandiye. Ango bi şêweyê kapîtalîzm = netewe = dewlet = milletperestî digihîjin hev û ev cewherê pêvajoyeke nû ya dest pê dike, îfade dike. Cihê bigihîjê jî faşîzm e.

Dewleta netewe, di serdema yekdestdariya kapîtalîst de yekdestdarbûna herî xurt a desthilatdariyê îfade dike. Ew bi xwe yekdestdariya yekdestdaran e. Nexasim di qonaxa destpêkê de bi erka herî mezin û berfireh radibe. Bi îfadeya Hegel xwedayetiya daketiye rûyê erdê ye. Têgîna xwedê di çarçoveya civakî de rewşa berbiçav îfade dike.

Di hegemonya London-Brîtanya de herî kêm bi qasî yekdestdariya kapîtalîst, duyemîn amûra bingehîn a bi bandor weke yekdestdarê yekdestdaran, dewleta netewe ye. Bi vê amûrê xwe gihandine Împaratoriya Brîtanya a Roj Lê Naçe Ava. Eşkere ye ku di vê de mirov nikare sînorên vebirrî di navbera yekdestdariya ekonomîk û yekdestdariya dewleta netewe de xêz bike. Ewqas di zikhev de ne, mumkîn e ku mirov gelek caran bibîne ku yek dikeve şûna ya din. Lê dîsa jî gelekî girîng e ku mirov bi giştî dewletê, bi taybetî jî dewleta netewe bi qasî ku bi kapîtalîzmê re neke wekhev, divê weke joravahiyeke wê ya siyasî ya besît jî nenirxîne. Têkiliya di navbera wan de gelekî xurt û zêde ye, lê belê ji hev nînin an jî yek nîşaneyeke besît a din nîne. Weke hebûnên cewherî yên cuda pêşketinên wan ên dîrokî-civakî pêk tên.

Di rastiya civakî-dîrokî ya London-Amsterdamê de statuya wan a xweser ew e, dawî li dewletdariya bajêr anîne û ji dewletdariya di asta welat-netewe de dergûşî kirine. Statuya wan a stratejîk di vê de bi rola sereke radibe. Ji ber ku ji dewleta netewe re dergûşî nekirin, di berdêla vê de hatin dagirkirin û bûn bajarên ji rêzê yên împaratoriyeke ji derve hatî. Cudahiya wan ji Venedîkê bi vê xweseriyê re têkildar e. Venedîkê kabên xwe ji bo dewletdariya netewe ya Îtalî neavêtin. Lê weke bajar nasnameya xwe parast. Ango di vê çarçoveyê de li London û Amsterdamê mohra

înkara nasnameya bajaran, heye. Ev mohr herî baş xwe li ‘kolana kerxanê-fahîşeyan’ a London û Amsterdamê nîşan dide. Li cem Sumeran jî –li Nîppûr û Babîlê –bûyereke bi heman rengî (mûsaqattîn-kerxaneya pêşî) tê dîtin. Her nasnameya xwe înkar bike, bivênevê wê bibe fahîşe, wê bibe faşîst.

Dewleta netewe ya London-Brîtanyayê, bû sîleha herî bi bandor a kapîtalîzmê. Di hundir de bi nasnameya ‘welatî’ li ser hîmê operasyonên ‘homojenkirin’a tevahiya komikên civakê, ferdên mîna moriyan pêk tîne û wexta proleter vediguherîne koleyê nû, hêmanên hiyerarşîk jî dike bûrjûwazî. Têgînên weke ferd, ferdparêzî, maf û azadiyên ferdî xizmeta rewakirina maskekirina vê operasyona dîrokî dikin. Li hemberî vê, di nava avahiyên komên civakê de şerên ji bo nasnameyê – di serî de etnîsîte, jin, karker, zanaetkar, gundî, entelektuel, komên dînî – derdikevin. Heta ku em dualîteya bûrjûwaziyê bi armanca rewakirin, maskekirin û heta dawiyê bi nakokî li têgîna welatî û ferd barkiriye ji hev dernexin, em nikarin li maneya rastî ya operasyonên dewleta netewe yên ji bo afirandina civaka homojen serwext bibin.

Operasyona dewleta netewe ya di hundir de ji bo afirandina civaka homojen, herî tazî û eşkere xwe di modela dewleta faşîst de dide der. Têkiliya vê modelê bi herdu Şerên Cîhanê re gelekî balkêş e. Dewleta netewe, tektiya ji bo gerdûnîtiyê bivênevê hewce ye (weke têgîna bingehîn a felsefeyê gerdûnîtî-tektî), ango cudatî û cûretî yên jiyan bi xwe ne, dixe ber înkarê û dixwaze weke serwerê bi tenê û tek xwe ferz bike. Slogana Hîtler a tek dewlet, tek ziman, tek welat, tek netewe û tek çand vê rewşê herî baş xulase û bi kurtî tîne ziman û di vî warî de ev slogan xwedî cihekî cihêwaz e. Bi vî awayî, her tiştî dike yek an jî tek, mîna şaneyên bi kansêr ên di bedenê de, tevahiya şaneyên din tine dikin û bi tenê weke şaneyên bi kansêr zêde dibin. Şane bi awayekî anormal zêde bûne. Lê ya pêkhatiye, ruhber bi mirineke herî ne xwezayî ya bi êş dimire.

Di hîmê dewleta netewe de meyla homojenkirinê ya bi şêweyê ‘muhendîstiya civakî’, eger bi huqûq û demokasiyê neyê bisînorkirin weke di qonaxên faşîstbûnê de jî hat dîtin, encam qirkirina civakî û her cure

qirkirin e. Di dewleta netewe de ji qirkirina etnîk zêdetir a pêk tê, di çarçoveya mînîmîzekirina komikên civakê yan jî cudahiyan de qirkirina civakê ye. Li ser vî bingehî bi hêza di elîteke teng a desthilatdariyê de hatiye zêdekirin, bi sazîbûna dîktatoriyê pêk tînin. Bi vî awayî, li hemberî zêde navendîbûna dewletê û bi hêzkirina wê, demokrasî jî vedikişe sînorên xwe yên herî teng û bêhêzbûna civakê derdikeve holê. 'Zanista civakî' ya nû pêşde birine di vê de bi roleke girîng radibe. Di rewakirina kapîtalîzmê de rola ekonomî-polîtîk pê radibe, felsefeya huqûq û dewletê jî (teoriya wê) ji bo dewleta netewe pê radibe. Felsefeya Hegel ji bo dewleta netewe mîna **Încîl**ê ye. Xusûsa herî girîng a mirov karibe ji bo dewleta netewe bibêje ew e ku di qonaxa derketina xwe de muhafezekarên di nava komên civakê de yên êdî hewce nakin û bûne mîna ginciran, maliştine. Parçebûna zêde jî civaka kaotîk îfade dike. Li gorî ku demeke dirêj di rewşa kaosê de mayîn nabe, dewleta netewe di qonaxa destpêkê de hinekî dawî li vê rewşê tîne, di nava xiraban de weke xirabê herî baş derdikeve holê û alternatîfekê pêk tîne.

Dewleta netewe ya London-Brîtanyayê wexta hêzên dewletê yên hegemonîk ên bi ser wê de çûn bi vê amûra nû têk birin, zêdetir pragmatîk tevgeriyaye. Di bingehê pragmatîzma Ingilîz de ev rastî heye. Dewleta netewe ya Ingilîz ji nava jiyanê derketiye. Pirsgirêka dorgirtin û hebûnê, kiriye ku ev amûr di pratîkê de hoste û bi qabiliyet bibe. Ne guh daye galgalên tewş ên teorîk ên ji jiyanê qut, ne jî li xwe daniye bi tevahî bi pratîkên kor rabe. Bi qasî ku hewce kiriye bûye dewleta netewe. Ji vê jî girîngtir, weke yedek, demokrasî û huqûq ti carî ji xwe kêm nekiriye. Rêûresma huqûq û demokrasiyê ya di civaka Ingilîz de timî li dijî mezinbûna dewleta netewe bûye. Huqûq û demokrasî nekirine qurbana dewleta netewe. Duyemîn sedema girîng a Ingilistanê karîbû li dijî dewletên din ên hegemonîk bi hêz be û wisa bimîne, ev e. Bi kurtî, civaka Ingilîz haya xwe ji cinawirê nû yê bi navê Levîathan (dewleta netewe) heye û heta dawiyê li hemberî wî bi tevdîr e.

Hegemonya London-Brîtanyayê bi alîkariya Amsterdam-Hollandayê û heta bi mîrasa wê ne bi tenê hegemonên li nava Ewrûpayê, li nava dinyayê

jî hêzên din ên hegemonîk an ji hev belavkirine yan jî rê li ber parçebûna wan vekiriye, bê tesîrkirine. Jêhatiye, bi awayekî li hegemonekî bê, tevbigere. Li ser xeta 'Yan giş an jî hîç' nemeşiyaye. Nêzî rêûresmên împaratoriyên Roma û Îslamê tevgeriyaye. Li nava dinyayê, li giraveke piçûk, bi şêniyekî gelekî kêm, sedsala 19. xistiye bin fermana împaratoriyeke hiltê.

**3-** Di hegemonya London-Brîtanyayê de rola şoreşa pîşesaziyê (îndustriyê) sêyemîn hêmanê girîng e. Bêyî şoreşa pîşesaziyê hegemonya Ingilîz bêîmkan nebe jî gelekî zehmet e. Wexta em şoreşa pîşesaziyê bifikirin, gelekî girîng e ku mirov nekeve du şaşiyên bi qastîka hatine afirandin, ya rastî kapîtalîzmê bi qasî ku ew weke dîn rewakirine, ewqasî jî veşartine. Yekemîn, şoreşa pîşesaziyê bi kapîtalîzmê û dewleta netewe re tê wekhevkirin. Bêguman hem kapîtalîzmê hem jî dewleta netewe îndustriyalîzm dînî kirine. Îndustriyalîzm vê rastiyê îfade dike. Lê îndustrî bi qasî ku mirov nikaribe daxîne rewşa îndustriyalîzmê diyardeyeke girîng a dîrokî-civakî ye. Ji kevirê di destê mirovê pêşî de heta bi bombeya atomê ya ku civaka mirov pêkanî, rastiyeke îndustriyê heye. Xulase îndustrî, kategoriyek e ku bi qasî dîroka civakê kevn e, û heta civak hebe wê hebûna xwe dewam bike. Mirov bêyî wê ne dikare dîrokê ne jî civakê bifikire.

Bi giştî di qonaxa şaristaniya Ewrûpayê de, bi taybetî jî di rewşa berçav a Ingilîstanê de diyardeya zêde diqewime û ji sedsala 18. ve heta roja me ya îro weke şoreşan diteqe û ji leza xwe tiştekî kêm nake, ji îndustriyê cudatir tiştekî din e. Mirov bibêje şoreşa îndustiriyê, rewşê bi temamî rave nake. Di dîroka civakan de şoreşên ev çend demdirêj û weke şokan dewam dikin, nayên dîtin. Ya pêşketina pîşesaziyê çi ji diyardeyeke şoreşbûnê çi jî ji beridandinê derdixîne, ketina wê ya bin hegemonya yekdestdariya dewleta netewe û kapîtalîzmê ye. Yek ji îcad û vedîtinên sereke yên civaka exlaqî û polîtîk ti carî keys û derfetê nade pêk hatina wê, di herhalî de sîleha atomê ye. Ew jî berhemê îndustriyê ye, lê yê wê vediguherîne sîleha atomê ji sedî sed kapîtalîzm û dewleta netewe ye. Ev rewş cudahiya di navbera wan de diafirîne.

Îndustrîbûn û şoreşa îndustriyê mumkîn û hewce ye. Lê nexasim di van du sedsalan de şokên weke îndustrî zêde dibin, îndustriyalîzm in. Ango bi asteke îdeolojîk radibin. Di vê de hegemonya xwe disipêre kapîtalîzm û dewleta netewe, bi roleke diyarker radibe. Herdu jî zincîrwarî bi qasî ku hêzê didin hev, vediguherin amûrekî civak û hawîrdorê hildiweşînin. Ji lewra duyemîn xusûsa girîng ew e ku îndustriyalîzm ji teknîkekê zêdetir meyleke îdeolojîk e. Yên îndustiriyê dixin rewşeke îdeolojîk jî kapîtalîzm û dewleta netewe ne.

Ji bo kapîtalîzmê pîşesazî tê maneya kara herî zêde. Pîşesazî di sedsala 19. de ji sedî sed diyardeyek bû dihat qebûlkirin. Pîşesaziyeke gelekî zêde, dihat maneya bi destxistina kareke gelekî zêde. Sedema bidestxistina xisleta dîn, îdeolojî ango îndustriyalîzmê ew e ku bûye hêza pêkanînê ya kara herî zêde ya tehrîk dike. Ji bo dewleta netewe jî pîşesazî dihat maneya desthilatdarî û artêşeke bi hêz. Ji lewra ji bo hevgirtina xwezayî ya kapîtalîstan û dewletên netewe ew kêliya dîrokî hatiye. Sedsala 19. li ser hîmê pîşesaziyê serdema hevgirtina herî mezin a kapîtalîzm û dewleta netewe û yekdestdarên ketin zikhev, temsîl dike. Sedsala 19. a bi heybet a London-Brîtanyayê weke Împaratoriya Roj Lê Naçe Ava cewherê xwe ji vê hevgirtin û yekdestdariyê digire.

Hingê Ingilîstan li dijî stratejiyên hegemonîk ên ew ji çar aliyan ve tengav kiribûn, pêşî stratejiya man û nemanê pêşde bir, paşê ev yek ji neçarî li nav dinyayê veguherand serdestiyeke hegemonîk. Sirra hêza Ingilîstanê di yekdestdarî û hevgirtinên li ser hîmê pîşesazî, dewleta netewe û kapîtalîzmê de ye. Di sîstema şaristaniya navendî de rastiya hegemonîk a hê dewam dike, rê dide ber dinyayê û kontrol dike ango dimije û talan dike, ev e.

Bêguman a ji bo Ingilîstanê tê gotin ji bo Ewrûpayê jî tê gotin. Ingilîstan ji ber statuya xwe ya xweser û hêza pêşeng a modernîteya sêberiya kapîtalîzm, dewleta netewe û pîşesazî di bingehê xwe de daniye, di navenda analîzê de cih jê re hatiye veqetandin. Marks û Engels ji bo analîza kapîtalîzmê Ingilîstan dixistin bingehê xebata xwe û bi vê yekê jî ya rast dikirin. Ji ber ku dizanîbûn ku Ingilîstanê ji hev derxin wê Ewrûpayê û heta

dinya paşerojê jî ji hev derxin. Ev sêlingên sêber ên modernîteyê nabe ku bi tenê welatek, heta malê parzemînekî bê hesibandin. Tevahiya parêznameyên min vê rastiyê têra xwe rave dikin. Lê mirov rol û xweseriya bajar, herêm, welat û heta ya parzemînan daneyîne holê, mumkîn nîne civak-dîrokê ji hev derxîne û rave bike. Ewrûpa û bajar, herêm û neteweyên wê pêk tînin, rastiyek in. Bûyîna wan a şaristanî û di şaristaniya navendî de derbasbûn û bûyîna wan a hêza hegemonîk, rastiyek e. Ewrûpayê di hezar salên dawî yê dîroka xwe de, dema pêncsed salên pêşî ji rojhilatê xwe, ango ji Rojhilata Navîn hêmanên hêza hegemonîk a navendî kişand nava xwe û ev pêncdsedsal bi vî awayî bihurandin, pêncsed salên dawî jî bi çîroka bi destxistina hêza hegemonîk derbas kirin.

Mijara vegotina min a li vir, ne bi tenê yek bi yek netewe û welatên Ewrûpayê, ne jî sîstema şaristaniyê ya yekbûyî yan jî modernîteya wê ye. Belkî jî di dîroka dinyayê de qadên herî zêde li ser wan hatine nivîsandin, ev qad in. Dibe ku yên ez binivîsînim jî bi qasî agahiyên dibistana seretayî bin. Niyeta min ev nîne. Ji bo min, ji bo jiyana min a girîng, heta ya diyarker, ev modernîte çi têkiliya wê bi min re, bi civaka min re ango bi herêma min û dinya min re heye. Ez dixwazim bersiva vê pirsê zelal bikim. Eger ez di vê de bi ser nekevim, ev tê wê maneyê ez azad nabim, ango ez ê nikaribim xwe bigihînim maneya jiyanê. Ev erk û wezîfeyeke bingehîn a parêznameyê ye; beriya her tiştî rewşa ez xistimê, divê zelal bikim û nuqteyên xelasî û derketinê ji sedî sed rast tespît bikim. Naxwe di nava çar dîwaran de tu yê bi tenê serê xwe li dîwaran bidî û ji vê bêtir nikaribî tiştekî din bikî. Berevajî yeqînan, derve û hundirê dîwarên modernîteyê amade kirine, çareseriya pirsgirêka azadiyê ne didin mirovan ne jî ji wan distînin. Ji min re girîntir e ku ez bi van dek û dolabên modernîteyê nexapim. Wexta min ev rêzik datanîn fikareke min a rê dida ber min heye, ew jî ev e; ev modernîteya ez hewl didim li vir rave bikim, şervanên mezin ên azadiyê çima û çawa bûne qurbanê wê, ez ê karibim bi cesaret vê pirsê bikim û hewl bidim bersiva wê bidim.

## B- QABÎLEYETA ÇARESERIYÊ YA MODERNÎTEYA EWRÛPAYÊ

Di şaristaniyan de hêza sîstemekê bi çareseriya wê ya bi kok a ji pirsigrêkên civakî re, tê pîvan. Serdema neolîtîkê bi şoreşa cotkariyê hewl da ji pirsgirêkên mirovatiyê yên di nava şert û mercên hov ên hezarê salan de bibe bersiv. Klanên nebat berhev dikirin û yên gerok û nêçîrvan bi şoreşa gund-cotkariyê, ev şert û merc hinekî nerm kirin, qabîliyetên xwe yên civakbûnê pêşde birin û bi vî awayî li çareseriyê geriyan. Bêguman, ev li ser navê mirovatiyê pêngaveke manedar a gelekî pêşketî bû. Dema behsa wê tê kirin bi jiyaneke hezarê salan di wijdan û zêhnê kolektîf ê mirovatiyê de şopên kûr hiştin. Civaka mirov bi giranî rastiyek e ku di vê demê de pêk hatiye. Civaka îro jî xwe disipêre wê civakê. Eger mirov bipirse û bibêje; mirov vê civakê ji binî bikişîne, li paşê wê çi bimîne. Pirseke bi vî rengî têra xwe mirovî difikirîne. Eger hînê em xwediyê xeyalên mîna qûtsiyet, xwedayetî, mûcîze û cennetê bin, divê em ji bîr nekin ku ev ji heybeta vê civakê mane.

Gelek nîşaneyên dîrokî piştrast dikin ku pirsgirêka bingehîn a vê civakê ewlekarî bûye. Dewlemendiya cotkariyê rê li ber vedikir, dihişt ku cihûwar li êrişên ji derve bên, vekirîbin. Ne bi tenê heywanên hov û dirinde êriş dikirin, ji civakên din zilamên xasûk û yên bi hêz jî êriş dikirin. Şoreşa bajêr hê zêdetir bersiv dida ewlekariya bajêr. Kelhe, birc û rêveberiya bajêr ewlekariya xurt dibe, îfade dikir. Di pêşketina civakê de bajar weke destpêka dîrokê tê qebûlkirin û ev yek jî girîngiya wî nîşan dide. Herçend êrişên ji barbaran bên, bi sînor bike jî vê carê diyardeyên çîn û dewletê yên ji navê derketin, cewherên pirsgirêkên civakî pêkanîn. Ji çareseriya pirsgirêkên civakî zêdetir, rê li ber pirsgirêkên nû vekir.

Rêveberiya dewletê û çînayetiya xwe disipêre berhemê zêde, civak bi diyardeya yekdestdariyê da naskirin. Zilamê xasûk û bi hêz weke yekdestdariya kolektîf xwe nû kir. Pirsgirêka ewlekariya civakê, bi hêmanên ji navê derketin veguherî pirsgirêkên hê mezintir. Dewleta xwe

weke amûrê ewlekariyê pêşkêş kir, ew bi xwe bû amûrê bingehîn ê bê ewlebûnê. Dîroka şaristaniyê bi awayekî çîroka dewletê ye, ango dewleta weke amûrekî ewlekariyê ya veguheriye berevajiyê xwe. Têkiliya rastî ya diyalektîkî, bi dualîteya ewle-neewle xwe di sazîbûna dewlet-desthilatdarî-polîtîkayê de nîşan dide. Dîrok weke pêvajoya bajar-dewlet-şaristanî tê maneya dîroka pirsgirêkên civakî yên her diçin mezin dibin û têkoşînan. Mîna du rûyên madalyonekê, li ser rûyekî wê **bajar-dewlet-şaristanî** dinivîsîne, li ser rûyê din jî **demokrasî-wekhevî-azadî** nivîsandiye.

Li Rojhilata Navîn, li Kevana Bi Bereket a rêzeçiyayên Toros-Zagrosan xwe lê badayî tevahiya deh hezar salan dîrokeke qewimî heye û ji vê pênc hezar salên dawiyê em dikarin weke şaristaniya navendî pêşkêş bikin û ev dîrok çemê sereke (dayik) yê mirovatiyê ye. Şaristaniyên din hebin jî, di encamê de neçar in ku biherikin û tevlî çemê sereke bibin. Li Rojhilata Navîn dîroka şaristaniya navendî ya pênc hezar salî, bi sedema gera li çareseriya pirsgirêkên civakî yên pirralî û mezinbûne, vegotina kûrbûn û berfirehbûna hegemonyayê ye. Ev vegotin timî bi mîtolojî, dîn, felsefe, huner û zanistê di zikhev de bû. Min di beşên beriya niha yên parêznameya xwe de hewl dabû vê vegotinê pêşkêş bikim.

Hêzên hegemonîk ên di bin navê Îslamê de bi nûneriya herî dawî ya şaristaniya navendî rabûn, hîç nefikirîn ku şaristaniya navendî wê ji cografya Rojhilata Navîn ji dest derkeve. Têgihiştina çarenûsê ya naguhere, meseleyeke îmanê bû. Pirsgirêkên wan çiqasî mezin bibûna jî weke hezarê salan derbasbûyî wê dîsa li ser van erdan li çareseriyê bigeriyana. Mekanên pîroz bûn, têde xwedayan, malên xwedayan, pêxemberan, zanyaran, hozanan, bi tevahî qebîle û qewmên esilzade, her cure mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û huner bi can bûne û ruh bi wan ketine. Mekanê ku têde zeman pîroz bûye. Hilberîn, bazirganî, bazar û pere weke çanda maddî welatê bingehîn ê ekonomiyê bû. Di serê salên 1000'î yê mîladî de wextê bajarên peravê yên Nîvgirava Îtalyayê cara pêşî derdiketin ser dika dîrokê, Ewrûpa ji şaristaniyê hê gelekî dûr bû. Ji aliyê Xirîstiyantiyê ve ku parçeyekî çanda Rojhilata Navîn bû, fetha wê hê nû temam bûbû. Şoreşên

bajaran gavên xwe yên destpêkê diavêtin. Ji aliyê hegemonên Rojhilat ve hêjayî dagirkirinê jî nedihat dîtin. Bi qasî ku hêjayî lêçûn û mesrefên dagirkirinê nebe, di nava xizaniyê de bû.

Bajarên Îtalyayê ji serê salên 1000'î û pêve seferên birin ser Rojhilata Navîn bi temamî serhatî ne. Beriya Atlantîkê, mîna tevgerên keşfê yên li erdên Rojhilata Navîn hatibin kirin, xuya dikin. Nikarîbûn Rojhilata Navîn fetih bikin, lê têgînên ji bo Ewrûpayê heyatî, îfadeyên rêzik, sazî û teorî beriya her tiştî veguhestin. Ji ber ku ya dihat kirin bazirganiya agahiyê bû. Piştre bazirganiya berhemê maddî hat pêşdebirin. Heta bi salên 1250'î ev veguhestin û barkirinê bi leza xwe hemûyî, dewam kir. Seferên Xaçperestan bi tenê rûyê vê veguhestinê yê eskerî bû. Çîroka Ewrûpayê piştî vê dîrokê baştir tê zanîn. Me xwest em pêşnûmeyeke wê pêşkêş bikin. Ev dîrok di heman demê de nîşan didin ku civakên Rojhilata Navîn li ber singê xwe rûniştine û di nava pirsgirêkan de bist û asê bûne.

Pirsên sereke yên divê bêne kirin ev in: Li perav û hundirê Ewrûpayê, wexta ku di warê hilberîn, bazirganî, zenaet û pereyan de şoreş çêdibûn, Rojhilata Navîn a di heman waran de tevî ku ji her alî ve serdesttir bû çima rawestiyabû? Ewrûpayê ji dîn ber bi felsefeyê ve gav diavêtin, Rojhilata Navîn çima bêhn li felsefeyê diçikand? Em weke ravekirina sereke ya vê yekê dikarin îdîa bikin ku hêzên hegemonîk di desteserkirina berhemê zêde de gihiştine mezinbûnê. Ango civakên Rojhilata Navîn bi fikir û teknolojiyên berê, dikarîbûn ji hêzên hegemonîk re têra wan berhemê zêde hilberînin. Rojhilata Navîn civakeke têra xwe dike, temsîl dikir. Lê li cem civaka Ewrûpayê rewşeke berevajî hebû. Felsefeyê ji dîn derbas nedikir an jî cihê nedibû, mirov vê jî dikare bi têrdîtina teknîka desthilatdariyê rave bike. Dîn têra xwe siltan rewa dikirin, ji lewra hewcedarî bi rewakirina felsefeyê nedihat dîtin. Mekanîzmayên desthilatdariyê ji hezarên salan ve bi pîrozkirinên dînî gihiştibû maneyekê, lewma bi felsefeyê tevlîhevkirina hişê mirovan bi kêra ti despot û hegemonî nedihat. Divê mirov li vî aliyê bawerkirina Rojhilata Navîn baş serwext bibe.

Bawerî weke amûrekî rewakirina desthilatdariyê gelekî bi tesîr e. Ji lewra destûrdana cihêbûna felsefî, ji wê re cih naskirin, ji bo yekdestdarên desthilatdariyên bi cihbûyî hewldaneke bi tehlûke ye ku nikarin li ber çavan bigirin. K. Marks li ser navê zanistê, felsefe ji textê wê daxist xwarê, bi şêweyekî bi heman rengî Îmam Xezalî jî li ser navê dîn felsefe mehkûm kir, wexta ev kirin, herduyan jî bi qasî ku tênegihijin çawa bûn destikê hêzên li dijî wan şer dikirin, muctehîdê bawerî û fikra xwe bûn. Civaka Ewrûpayê deriyên xwe hem li şoreşa çanda maddî û hem jî li ya manewî vekirin. Ji bo vê ji derve çi hewce dikir jê dihat bigirta û herweha di nava xwe de jî jê dihat wan tiştên girtî bistire û bi awayekî serketî jê dihat xwe bigihîne sentezên nû.

Ez hewl didim jidestdana pêşengî û mekanê şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ya Rojhilata Navîn bi nav bikim. Carnan hewcedarî, hêza herî mezin a şoreşgerane ye. Tiştên Ewrûpa bi wan hewce bû, bi rolên şoreşger ên bi vî rengî barkirîbûn. Rolgirtina şoreşgerî tê maneya çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên civakî. Em analîz bikin, bê ka qonaxa şaristaniya Ewrûpayê ya li derdora pêncsed salên dawî veguherî sîstema dinyayê (şêwazê jiyanê yê jê re modernîteya kapîtalîst tê gotin) bi sêlingên distanê yên sereke hewl daye kîjan pirsgirêkên bingehîn çareser bike.

## a- Kapîtalîzm

Kapîtalîzm bi xwe lingê yekemîn ê modernîteyê ye, û di statuya ruh û mejiyê sîstemê de ye. Me hewl da em piştrast bikin ku ev cinawirê bi navê sermayedariyê di tevahiya dîrokê de her xwestine wî di qefesê de bigirin, wexta dibe hêza hest û aqil, dil û mejiyê sîstemê, bihêlin ku ew bibe çareserî, ew bi xwe çavkaniya pirsgirêkan e, tê maneya îflasa sîstemên şaristaniyê. Ya rastî avahiyên şaristaniyê ew civak in ku vekişiyaye pişt birc û bedenên bajaran. Mirov dikare weke tevahiya avahiyên civakî yên li pişt bircên bajaran ji nû ve ava dibin jî bide naskirin. Ji ber ku hebûna fizîkî ya bircan têra parastinê nake û çînîbûn zêde dibe, rêveberiya wê ya sivîl hiyerarşiyê neçar dike ku xwe weke saziya jê re dewlet tê gotin, bi rêxistin

bike. Di beşên pêwendîdar de min ev bûyer û pêşketin analîz kiribûn, ji lewra ez ê dubare nekim. Bihêlin ku bi dewletê pirsgirêkên civakê bêne çareserkirin, hem ji aliyê naverok hem jî ji aliyê berfirehiyê ve dewletê pirsgirêk zêde kirin. Dewlet çiqasî pêşde diçe û mezin dibe, pirsgirêkên civakî jî ewçend pêşde diçin û mezin dibin. Ev yek jî bi awayekî berbiçav dihat wê maneyê ku zordestî û mêtinkarî wê zêdetir bibe.

Heta bi qonaxa kapîtalîst a şaristaniyê di encama şerên li ser civaka mirov û hawîrdorê de felaketên mezin qewimîbin jî di rojevê de guftûgo nedihat kirin ku civak bi vî awayî nikarin dewam bikin. Rêjeya zordestî û mêtinkariyê ji sedî pareke piçûk a mirovan digirt nava xwe. Firewn û Nemrûdê herî serdest jî bi qasî waliyê eyaleteke roja me ya îro bi tesîr nebûn û bi qasî wî xwe negihandibûn hêzeke otorîter. Îro Serokwezîrekî Swêdê yê xwe herî demokrat dihesibîne jî ji Siltan Silêmanan deh qat zêdetir xwediyê hêz û otorîteyê ye. Heta bi qonaxa kapîtalîst yekûna mêtinkariya (yekûna berhemê zêde) di tevahiya dîroka şaristaniyê de hatiye kirin ji destketina salekê ya sermayeya global a roja me ya îro zêdetir nîne. Divê em bi van rastiyan, bi dehşeta mêtinkarî û zordestiya hatiye kirin, bihisin.

Aqilê kapîtalîzmê xistiye serê mirovî dehşet bi xwe ye. Bi şerên pêncsed salên dawiyê, bi teknolojiya van şeran û stratejiya aqlê wan çi pêk anîn? Eger em bibêjin, di tevahiya dîroka mirovahiyê de ji mirovên di şeran de hatin kuştin qat bi qat mirov di dema pêncsed salên dawî de hatine kuştin, wê ev gotinên me bibin mikurhatina beşeke ji rastiyê. Ji vê jî wêdetir felaket ew e, bi van şeran çiqas gel, çand, qebîle, çîn, kom û nirxên maddî hatin tinekirin? Ji bilî mistek olîgarkî, çawa pirraniya mirovatiyê weke koleyên hemdem (proleter-karker) ji nû ve hatin çêkirin û avakirin? Çawa mirov kirin gurê mirovî? Çawa civak topyekûn kirin pîrek? Ji tehekuma civakî heta bi tehekuma li xwezayê, çawa rê li ekolojiyek e ku nikaribe dewam bike, vekirin? Mumkîn e ku mirov pirsên der barê pirsgirêkên bingehîn yên bi vî rengî de zêde bike.

Kapîtalîzm sîstemek e ku hê ji hev nehatiye derxistin. Tevî îddîayên Marks û Marksîstan, mirov nikare bibêje ku di warê analîz û

jihevderxistinê de serketîbûne. Tevahî nîşane didin xuyakirin ku rexnekirina wan a kapîtalîzmê ji mentiqê bûrjûwa piçûk wêdetir neçûye. Rexnegiriya bûrjûwa piçûk jî herî zêde ji burokrasiya sendîka û kapîtalîzma dewletê wêdetir ti encamê nade. Divê mirov baş bizane ku mentiqê serwer ê serdema me, li gorî sîstema kapîtalîst hatiye dîzaynkirin. Zanista heyî û cîhana akademiyan, mekanê hilberîna vî mentiqî ne. Akademiyên zanistî yên roja me ya îro ji zîggûratên Sumeran zêdetir weke mekanên mîtolojiyên tevlîhev, bi ser desthilatdariya kapîtalîst ve bûne. Ji amûrên eşkere yên serweriyê yên desthilatdariyê zêdetir, mîtolojiyên li ser navê zanistê li van mekanan têne hilberandin berxwedana civakê şikandine. Ji xapandinên Serdema Navîn gelekî wêdetir xapandin û reşkirin-tarîkirin mewzûbehs e.

Mîsyona hunerê civakî yê hestên mirovan bilind, bedew û aştiyane dike bi temamî berevajî kirine. Îhtîrasa ji bidestxistina karê wêdetir tiştekî din nafikire, ji bo bigihîje encamê îstîsmarkirina hestên bedewî, aştî û bilindbûnê weke huner nîşan daye. Ji bo diyariya soza wê hatiye dayîn bigire, her mirov kirine mîna hespên li hîpodroman têne bezandin. Şêwazekî jiyanê yê jiyana ti ruhberî qebûl neke heye. Nexweşiya kansêrê çavkaniya xwe ev şêwazê jiyanê ye. Divê neyê jibîrkirin ku kansêr nexweşiyeke tîpîk a modernîteya kapîtalîst e. Bi temamî bi sîstemê re têkildar e, û nexweşiyeke bi koka xwe civakî ye. Ti tişt bi qasî nexweşiya kansêrê bi hêz nikare kapîtalîzmê rave bike. Ji sedî sed encam e, ruhê sîstemê xwe di bedena mirov de nîşan dide. Heye ku di sîstemên berê de û li cem hin ruhberan kêm caran bûyerên kansêrê hatibin dîtin. Di koka van nexweşiyan de jî mirov dikare siya 'yekdestdariyeke' ku li ser jiyanê hatiye hûnandin, bibîne. Lê di kapîtalîzmê de mîna ku ti şane û endamê bedena mirov ê bi cureyekî kansêrê neketibe, nemaye. Kansêra di tevahiya endamên bedena mirov de xuya dike, êdî li sîstema kapîtalîst eşkere dike, wê dide dest û ev rastiyek e ku kes nikare ji nedîtî ve bê.

Hêzên hegemonîk ên Ewrûpayê pirsgirêkên kapîtalîzm û hegemonyayên kevin (dêr, qraliyet, prensan) rê li ber wan vekirin, çareser nekirin. Bi projeya 'civaka homojen' dest û lingên wê birrîn û wekhev

kirin. Civaka homojen civaka koletiya wê herî pêşdebirî ye. Ti civaka çînî bi qasî kapîtalîzmê nikare koletiyê çêke. Koletiyên serdema destpêkê û navîn, berevajî yeqînan şert û mercên wan ji yên kapîtalîzmê xirabtir nebûn. Nîşaneya herî girîng a vê yekê ew e, di van deman de cih ji diyardeya 'koleyê bêkar' re nîne. Şêweyê 'koleyê bêkar' şêweyê herî bêrehm e ku dîrokê şahidî lê kiriye. Koletiyeke bi qasî ya bêkartiyê mirov piçûk bixîne û tine bike, ti carî nehatiye dîtin. Dîroka kapîtalîzmê weke tê gotin bi tenê dîroka gundî, karkerê bûye dikandar û proleterbûyînê nîne, ji van qat bi qat zêdetir dîroka bêkariyê û proleterbûyîna lumpen e. Ma mirov ji bo civakekê li pirsgirêkeke û ji pirsgirêkê jî wêdetir felaketeke ji vê mezintir, dikare bifikire?

Ne bi tenê îdeologên lîberal, ji her rengî civaknas, sosyalîst û Marksîst, ji ber mohra bûrjûwa piçûk a li ser wan bi bandor bûye, nikarîbûne bibin xwedî hêz û wê qabîleyetê kapîtalîzmê bidin naskirin, jê bibihurin û li ser hîmê parastina civakê li dijî wê têbikoşin. Hewldanên wan ên di vê mijarê de nayên înkarkirin; lê rastiyek e ku derketiye holê, asoya fikra wan çeloxwarî û xapiyayî, û îradeya wan a ji bo têkoşînê têra xwe kêm maye. Civaka kapîtalîzmê tine kiriye, bi tevahî di nava rastiya wê ya dîrokî de û bi nêzîkatiyeke tevahiya qadên wê bi hev re yek bibîne û bi helwesteke xweparastinê neyê parastin, gavavêtinê nebe.

Divê em baş bizanin ku bi sedema şaristaniya navendî ya xwe spartiyê gavên ber bi mezinbûn û bilindbûnê ve avêtiye, ji roja ku qefesa xwe parçe kiriye (Têkiliya di navbera Rohnîbûn û ji qefesderektinê de hêjayî lêkolînê ye. Azadiya bi derketina ji vê qefesê wer xuyaye azadiya herî xirab e) û vir ve kapîtalîzm global e, û sîstema global veguherandiye. Herkes li hemberî 'krîza kapîtalîzma fînans a global' a roja me ya îro matmayî dimîne. Bi lîstina amûrên fînansê, bi tenê di dema vê krîzê de berhem û nirxên zêde yên bêyî karkirin û xebatê têne desteserkirin, tê hesabkirin ku ji yên mêtinkariya di tevahiya dîroka şaristaniyê de gelekî zêdetir e. Ti diyarde û krîz nikare bi qasî vê krîza fînansê ya rojane, kapîtalîzmê baş rave bike û nikare evqasî zelal deyne holê ku kapîtalîzm bazar û ekonomî nîne. Aliyekî girîng ê parêznameya min ew e ku bingehê dîrokî yê vê diyardeyê datîne

holê, avahiya bi pirsgirêk a şaristaniyê li ber çavan radixe û nîşan dide ku kapîtalîzm rewşa giştîbûyî ya vê avahiyê ye. Krîza fînansê ya global ku qonaxeke herî balkêş a krîza binyewî ya kapîtalîzmê ye, û roja me ya îro jî hê di navê de ye, vê şîroveya dîrokî bi awayekî bi tesîr piştrast dike.

Wexta ku krîza fînansê ya global ji navendên sereke (DYE-YE) li tevahiya dinyayê belav dibe, wê derketina ji nava kaosa rê li ber vekiriye, çawa pêk bê? Sîstema dinyayê ya kapîtalîst ku şûna şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn girt, bi vê krîza global wexta ji nû ve û bi bandorên bi tesîr ên karibin pêvajoyê bihejînin xwe li herêmê nîşan bide, wê rê li ber reaksiyonên çawa veke? Îslama siyasî çi ye? Desthilatdarî bi temamî Îslamê dikare weke Îslam bihesibîne? Ji nû ve Îslambûn û Îslama Radîkal çiqasî antî-kapîtalîst in? Em çiqasî bi faşîzma bi maskeya Îslamî re rûbirû ne? Ji bo em karibin bi hosteyî bersiva van pirsan bidin, divê em karibin bibînin ku herdu lingên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst rê li ber kîjan pirsgirêkên nû vekirine û kapasîteya wan a çareseriyê çi ye.

## b- Dewleta Netewe

Duyemîn lingê girîng ê modernîteya Ewrûpayê dewleta netewe ye. Herî kêm bi qasî kapîtalîzmê bi xwe ji çareseriya civakî zêdetir, sîstema têde pirsgirêkên civakî mezintir dibin, îfade dike. Kapîtalîzm weke ku tê yeqînkirin, ne pêşketina ekonomîk e, rewşa sîstemîk a înkara ekonomiyê ye. Dewleta netewe jî weke ku gelek carana tê nîşandan forma bingehîn a demokrasî, azadî û mafê mirovan nîne, sîstema înkarkirina van nirxan e. Ji her rengî sosyalîst û Marksîst, di herdu mijaran de herî kêm bi qasî lîberalên bûrjûwayê teorî, bername û rêxistin çêkirine, ji lewra di çeloxwarî nîşandana rastiya civakî de berpirsiyariya wan gelek e. Bêguman hevkêşeyeke rast nîne ku mirov bibêje dewleta netewe ya navendî = kapîtalîzm e. Lê divê mirov baş fêhm bike ku civaka ji nû ve bi şêwazê dewleta netewe hatiye bisazîkirin, nexin bin dîktatoriyê, ev civak wê li mêtinkariya kapîtalîst venebe.

Cewherê têkiliya di navbera kapîtalîzm û dewleta netewe de ew e ku bi tevahî avahiya sosyo-ekonomîk bi awayekî di dîrokê de hemtayê wê nehatiye dîtin, bi kûrahî û firehî li mêtinkariyê vekiriye. Lê weke şêweyê desthilatdariya herî zêde, dewleta netewe mêtinkariya kapîtalîzmê mumkîn dike. Gunehê herî mezin ê Marks ew e, bêyî ku ev şêwazê dewletê yê ji nû ve ava dibe, analîz bike, hewl daye kapîtalîzmê di nava tevahiya ekonomiyên din de weke sîstema herî pêşketî analîz bike. Ji vê jî xeternaktir, nikarîbû karekterê kapîtalîzmê yê antî-ekonomîk tespît bike.

Çawa ku di serdemên destpêkê û navîn de sîstemên mêtinkarî û zordestiyê bi îdeolojiyên dînî û mîtolojîk hatin rewakirin, di serdema modernîteya kapîtalîst de jî li dora dewleta netewe bi hê zêdetir feraziye û doktrînên zêhnî yên hatine pêşdebirin, sîstema nû ya mêtinkarî û zordariyê hatiye rewakirin. Dewleta netewe hê jî girêkeke kor û mûammayek e. Dewleta netewe ya timî tê mezinkirin, ji bo wê xwîn tê rijandin, can û bawerî tê xwestin, û ev vedîtina divê herkes ji bo wê fedekariyê bike, xwedayê rastî yê modernîteyê ye. Ez pirr bi hêsanî dikarim bibêjim ku bi giştî dewlet û bi taybetî jî dewleta netewe di bingehê wê de têgîna xwedê û dîn heye. Ya rastî, xwediyên hêzê û berjewendiyên maddî, vegotinên dînî û mîtolojîk ku tevgerên pêşî yên zêhnê analîtîk ên cinsê mirov in, hewl dane bi şêweyê dewletê berbiçav bikin. Bi wekhevkirina xwedê û dewletê re bûyerên balkêş qewimîn.

Di îdeolojiya Cihûyan de navê efendî û xwedê yek in: Reb. Çendîn Reb ji ferdîbûnê derdikeve û bi sazî dibe, weke dewlet bi mane dibe. Hegel ev pêvajo wergerand zimanê felsefeyê. Anî ziman ku xwedê li rûyê erdê weke dewleta netewe dest bi meşê kiriye. K. Marks jî ji vê vegotinê encamek derxist, ew jî ev e; îdeolojiyên dînî diyardeyên fîktîf in (vedîtinên lihevçêkirî ne). Lewma jî wî ew hêja nedîtin ku mirov bi wan re elaqedar bibe, an jî pirr qîmet bi wan neda. Di ketina wî ya materyalîzma çor de para vê nêzîkatiyê heye. Jixwe pozîtîvîstan bi mehkûmkirina metafizîkê yeqîn dikirin ku ji serdemê bihurîne ango ji serdema metafizîk xwe çipkirine, qevaztine serdema zanistî. Sosyolojî baş bi kar neanîn û bi vê jî civak kirin mîna lodeke malzemeyên bêkêr û ji bo vê jî ketin nava

vegotineke herî tûj û çor. K. Marks û F. Engels dewleta netewe ya navendî ya Elmanyayê ji bo proleteryayê weke şêweya herî kêrhatî îlan kirin û bi vê jî bi destê xwe derbeke xedar li têkoşîna çînî xistin û bi qasî ku vê nebînin noqî milletperestiya çînî bûbûn. Wexta ku li ser navê sosyalîzma pêkhatî, dewleta netewe ya kapîtalîzmê civak daqurtand, xeyaleke kominîzmê ya îflaskirî li paş ma.

Bi qasî kapîtalîzmê û belkî jî ji wê jî zêdetir berê pêşî hewcedarî bi analîza dewleta netewe heye. Bi sînorên hişk dabeşbûna dinyayê, rîtuelên (îbadet) netewe yên modern ji bo civakê mîna qefeseke ji hesin, weke cinawirbûneke burokratîk, artêşên dewamî, artêşa bêkaran, weke dînê modern milletperestî, cinsperestî veguherî cinawirekî çavsor, akademiyên paşverû yên hezar carî ji hişkebawerên serdema navîn zêhnê mirovan reş û tarî dikin, ev hemû weke xwedayê hezar-rû dewleta netewe pêk tînin.

Eger em ji van têgînan hinan berbiçav bikin, em ê bibînin bê ka dewleta netewe pirsgirêk an jî çareserî ye.

## 1- Dewleta Netewe, Welat û Sînor

Civaka mirov tevahiya dîroka xwe ya dirêj ti carî sînorên bi şêwazê dewleta netewe nas nekirin. Sînorên bi vî rengî bi xwezaya çandî ya mirov re li hev nakin. Ji bo erd û zeviyan sînor têne danîn û xêzkirin. Civakên mirov li ser erdê bi cih dibin û kengî mekan bi çanda maddî û manewî re pevdikelin rê li pêkhatina têgîna welat vedibe. Bicihbûnên demdirêj li ser pêkhatinên nasnameyê bi şêweyên qewm û qebîleyan jî bandoreke girîng dike. Di vê çarçoveyê de têgîna welat dibe têgîneke wisa ku destê civakan jê nabe. Pirsgirêkan çareser dike. Tevî ku sînorên xwe yên hişk nînin jî çand û zimanê hevpar, bazara ekonomîk têgihiştina sînorên sist û nerm pêk tîne. Kengî dewleta netewe bi kapîtalîzmê re di zikhev de welat bi civaka di navê de xist bin hegemonya xwe, pirsgirêkê dest pê kir. Çiqasî têgihiştina çand û zimanê homojen tê ferzkirin, bi bilindbûna asta koletiya giştî ya civakê re welat û sînor vediguherin binçavkirin û nezaretxaneyeke mezin. Lê ji bo dewletan sînorên bi vî rengî yên hişk nayên xêzkirin.

Hişkbûna sînoran, hêza zincîrên koletiyê yên li mejî û îradeya mirov xistine, temsîl dike; veguherîna zindana piçûk ber bi zindana welat ve îfade dike. Jixwe sînorên evçend hişk tê wê maneyê ku mirovan dikin milk, wan dikin meta, wan dikin artêş û çawa dixwazin wan wisa bi kar tînin û cihekî welê jî ti cudahiya xwe ji girtîgeh an jî nezaretxaneyeke giştî namîne. Heta sînorên dewleta netewe yên bi vî şêwazî giştî nebin, nikarin ferdan ji civakê qut bikin û wan bikin proleter. Kengî 'sînorên welat ên pîroz' bikin dînî û rewa bikin, bicihanîna van rastiyan mumkîn dibe. Herçî sînorên dewletan in, bi qasî ku bi cografyayê re li hev nakin ewqasî jî bi pirrcuretî û tevgertiya civaka mirov re jî nelihev in, dijber in.

Jiyan bi xwe dewamî bi pirrcuretiyê manedar dibe. Jixwe tevî evqasî têne pîrozkirin jî di serê vedîtinên civakî de yên ku bi lez diguherin, sînorên siyasî tên. Sînorên dewletan ên îro, mirov beriya bi sedsalan nikarîbû xeyal jî bike. Ev cografyayên bi awayekî lihevhûnandî hatine xêzkirin, mîna hebûnên ezelî yên pîroz in, bi welatiyan mîna emanetekî didin qebûlkirin û bi vê yekê pirsgirêkên herî mezin didin çêkirin. Ji lewra di pêncsed salên dawî de ji bo sînorên dewleta netewe gelek şer hatin meşandin û di van şeran de bi sed mîlyonan mirov mirin, nirxên çanda maddî û manewî yên ne serî û ne jî binî heye badilhewa çûn. Ev hilweşandin û talan mezinahiya pirsgirêkê piştrast dikin.

## 2- Civaka Neteweyî ya Homojen a Dewleta Netewe

Çima hemwelatiyê tek tîp? Di xwezaya civakî de têra xwe pirrcure û rewşên têkel hene ango dewlemendiyeke çandî ya xurt heye, wê wextê em çima vê dewlemendiyê veguherînin hemwelatiyên mîna 'tenekeyên hundirê wan vala' û deng derdixînin? Eşkere ye ku hemwelatîbûna modernîteyê derbasbûna ji koletiya taybet ber bi koletiya dewletê ve îfade dike. Artêşa koleyên modern ên bi vî tîpî nebe, kapîtalîzm nikare karê bike. Tevî ezmûnên pîrozkirinê hemûyan, rastiya di cewherê hemwelatîbûnê de avakirina hilberînerê karê ango koletiya modern heye. Pêkanîna civaka neteweyî ya homojen ku ji aliyê ti rejîma firewnî ve xeyala wê jî nehatiye

kirin, berhemê ‘projeya muhendistiya civakî’ ye. Şêweyê civaka herî lihevçêkirî ye. Ummetên pêxemberan jî evçend yek cure nebûn. Muhendisiya civakî bi xwe ji xwedayetiya herî xedar wêdetir, maneyeke din îfade nake. Çavkaniya xwe xwedayê Eflatûn, Demiurg (Xwedayê Mîmar) e. Tevî ewçend pozîtîvîzma xwe, civaka dewleta netewe hûnandin û lihevçêkirineke metafizîk a pûç û seresere ye. Civakên bi vî rengî tinene. Bêne çêkirin jî timî mehkûmî xirabûnê ne. Civaka dewleta netewe di dema faşîzmê de dikeve dema xwe ya herî stewiyayî ango dibe ‘civaka şerker’ û bi vî awayî dibe duyemîn civaka herî mezin a pirsgirêkan. Civaka şerker ew civak e ku pirsgirêkên herî hov ango qirkirina etnîk û qirkirina civakan diafirîne.

## 3- Navendên Çêkirina Hemelatiyan ên Dewleta Netewe

Ev bi giranî dibistan, qişle, mizgeft, dêr, hawra û rîtuelên fermî ne. Ji bo îhtîras û çavbirçîtiya kar û sermaye zêdekirinê ya kapîtalîzmê, nexasim jî ya kapîtala fînansê ya sînor nas nake têr bibe, divê bi tevahî nasnameya welatiyan rojane li dibistan, qişle, mizgeft, dêr, hawra û rîtuelên fermî bikin tek tîp û bi şêwazekî li gorî armancê, ava bikin. Hingê dikare çavbirçîtiya xwe ya zêdekirina kar û sermayê, têr bike. Mirov heta bi perwerdeyê avakirina dewleta netewe û li têkiliya di navbera kar û sermayeyê de serwext nebe, mumkîn nîne ku civaka modern ji hev derxe. Eşkere ye ku bi evçend saziyên pirsgirêkan çêdikin, bi perwerdeyê avakirina civakan, dihêle ku civak her tim di nava pirsgirêkan de bigevizin. Jixwe civakên di nava pirsgirêkan de digevizin û ji bilî vê ti çareya wan nemaye, zêhnekî îflaskirî ne. Pozîtîvîzm pûtperestiya obje ya objektîv a korbûyî ye ku di xwezaya civakî de li dijî kûrbûna maneyê ye. Perwerdekirina hemwelatî ya dewleta netewe jî di dîrokê de ji pûtperestiya herî çor a objektîv wêdetir maneyeke xwe nîne. Bi vê perwerdeyê faşîzmê qirkirina etnîk kiriye û hawîrdor hatiye talankirin. Perwerdeya dewleta netewe sêyemîn hêmanê mezin e ku pirsgirêkên civaka neteweyî mezintir dike.

## 4- Burokrasiya Dewleta Netewe

Moderníteya Ewrûpayê, di nava tevahiya avahiyên civakî de burokrasî mezintir kiriye û di vî warî de xwedî cihekî cihêwaz e. Burokrasî hêmanekî lihevçêkirî ye ku xwezaya civakî dirizîne. Burokrasî weke ûr û qocikekê li ser pişta civakê mezin dibe û yek ji bivênevêya dewleta netewe ye. Çi di sosyalîzma pêkhatî de û çi jî di rejîmên lîberal de burokrasî bi rola amûrê bingehîn ê sîsteman dimeşîne û karê tîne, radibe. Dewleta netewe stûna pişta civakê ye; lê qefesa civaka xwezayî ye. Kapîtalîzm bi vê qefesa hesinî civakê kedî dike û ji bo hilberîna kar-sermayê dibezîne. Ji lewra heta mirov têkiliya burokrasiyê bi dewleta netewe û kapîtalîzmê re ji hev dernexe, çareserkirina pirsgirêkên civakê bide aliyekî, tespîtkirina wan jî mumkîn nîne. Cîhazên burokratîk ên bi qadên civakî ve weke amûrên çareseriyê hatine montekirin, çaremîn çavkaniya mezin a pirsgirêkên civaka modern in.

## 5- Cinsperestî û Dewleta Netewe

Serweriya zilam a ku hiyerarşiya ji rêûresmê li ser jinê pêşde bir, di tevahiya dîroka şaristaniyê de timî hatiye bitesîrkirin. Desthilatdariya di forma dewleta netewe de hatiye mezinkirin, hêza xwe bi giranî ji vê cinsperestiya zêde û belav dike, digire. Cinsperestî fonksiyoneke normal a biyolojîk nîne; îdeolojiyek e ku herî kêm bi qasî milletperestiyê rê li desthilatdarî û dewleta netewe vedike. Ji bo zilamê serwer, cinsiyeta jinê objeyek e ku her cure îhtîras û çavbirçîtiya xwe li ser têr dike. Gotina di Pirtûkên Pîroz de ya dibêje 'Jin erdên we ne, hûn çawa dixwazin, dikarin wisa biajon' û gotina moderníteyê ya dibêje 'Jin mîna sazekê ye, dilê we çawa dixwaze hûn wisa dikarin lê bidin' vê rastiyê tînin ziman. Dîsa gotina 'Ço ji ser serê wê, zarok jî ji malzaroka wê kêm nekin' karektera faşîst a serweriyê nîşan dide.

Cinsperestiya civakî herî kêm bi qasî kapîtalîzmê cinawirekî civakî yê bi tehlûke ye. Lê mixabin, serweriya mêrê xasûk û bêrehm ji bo heqîqeta vê

diyardeyê dernekeve holê û asteng bike, xwedî helwesteke çavkorî ye. Tevî ku bi qasî kapîtalîzmê hewcedariya xwe bi lêkolînê heye, cinsperestî yek ji qadên civakî ye ku di tariyê de hatiye hiştin. Îdeolojiyên dewlet û desthilatdariyê bi tevahî çavkaniya xwe ya pêşî ji helwest û tevgerên cinsperest digirin. Qada civakî ya herî zêde û bi kûrahî mêtinkarî û zordestî, her cure koletî û sernuxumandin lê pêk hatiye, koletiya jinê ye. Objeyeke civakî ye ku tevahiya şêweyên desthilatdarî û dewletê xwe li ser ceribandine û bûye jêder û çavkaniya wan.

Dewleta netewe û kapîtalîzm a bi serwextbûneke hûrûkûr a van xisletên koletiya jinê tevdigerin, bi îhtîmameke mezin jinê weke amûra desthilatdarî û sermayeya herî pêşxistî, bi kar tînin. Divê mirov baş zanibe ku koletiya jinê nebe ti şêweyê koletiyê şensê xwe yê pêşketin û jiyanê nîne. Dewleta netewe û kapîtalîzm, mêrê serwer ê herî bisazîbûyî îfade dikin. Ji vê jî eşkeretir; dewleta netewe û kapîtalîzm, yekdestdariya mêrê zordest û mêtinkar in. Parçekirina vê yekdestdariyê belkî jî ji parçekirina atomê zortir û zehmetir e.

Demografî (zanista serjimar-şêniyan) weke milekî alîkar ê cinsperestiya civakî, bi modernîteyê re artêşa eskerî, artêşa bêkaran, ji bo civaka netewe ya standart jî statîstîkê jî bi kar tîne û zarokanîna jinan bi pîvanên îdeal ve girê dide. Îdeolojiya jê re Malthusgirî tê gotin vê yekê îfade dike. Serjimara mirovan ya ku li civak û ekolojiyê gefan dixwe, di cewherê xwe de pirsgirêkeke biyolojîk nîne, ji ber ku kapîtalîzm û dewleta netewe îdeolojiya cinsperest bi kar tînin, encameke bi vî rengî derdikeve holê. Malbatparêziya modern jî di navê de, kapîtalîzm, îdeolojiya cinsperest a dewleta netewe û kirinên wê ji bo civak û hawîrdorê belkî jî çavkaniya herî mezin a pirsgirêkan e. Ji lewra divê mirov cinsperestiya civakî di çarçoveya dewleta netewe de weke pêncemîn çavkaniya herî mezin a pirsgirêkên civakî bibîne û binirxîne.

## 6- Milletperestî û Dewleta Netewe

Eger xwedayê li ser rûyê erdê digere dewleta netewe be, dînê (sekuler-laîk) li ser rûyê erdê yê wî xwedayî jî milletperestî ye. Mirov heta van herdu têgînan ji aliyê teolojîk û bi awayekî giştîtir ji aliyê sosyolojîk ve ji hev dernexe, rabe modernîteya kapîtalîst bide naskirin, wê gelekî kêm bimîne. Divê mirov baş bizane ku tevahiya dînîtiyên bi koka xwe hiyerarşîk û dewlet di modernîteya kapîtalîst de pêjnên wan li şûna theo (îlah) û teolojiyê (îlahiyat) weke dewleta netewe û neteweperestî (milletperestî) hatine bicihkirin. Analîzkirina cihgirtina şûnahev a van herdu têgînan, wê rûyê rastî yê modernîteyê derxe holê. Dewleta netewe û neteweperestî, tevî diyardetiya (fenomen) xwe ya pozîtîvîst hemûyî jî di karektera herî çor û pûçkirî ya metafizîk de ne. Ji bo bicihanîna kar û sermayeya kapîtalîst têgînên bi sêhr ên avzûnkirî ne. Neteweperestî û dewleta netewe guloka têkiliyên diyardeyî ya bi hezaran mêtinkarî, zordestî û nakokiyan e ku ev têgîn nîşan didin. Ewçend balkişandina van têgînan û karektera wan a hegemonîk ji ber têkiliyên desthilatdarî, kar û sermayê yên di hinavê xwe de vedişêrin, pêk tê.

Divê ez careke din destnîşan bikim ku milletperestî argumana dînî ya bi tenê ya modernîteyê ye, lê xwedayê jê re xizmetê dike û di bin fermana wî de ye, dewleta netewe ye. Eger mirov milletperestiyê weke dînê dînan, dewleta netewe jî weke xwedayê xwedayan (bi maneya sîstema şaristaniya navendî) şîrove bike, wê gelekî hînker be. Ti têgîna bi jiyana civakî re têkiliya xwe heye û diyardeya wê temsîl dike, bi qasî van herdu têgînan û guloka têkiliyên ew nîşan didin, nikarin bi awayekî neyênî bandorê li civakê bikin. Di wê hêzê de nîne ku bandorê bike. Di heman demê de ji bo sergirtin û çeloxwarîkirina heqîqetê, xwedî hêz nîne. Dewleta netewe û milletperestî weke du têgîn û diyardeyên pozîtîvîst, 'rejîma heqîqeta civakî' çeloxwarî dikin û di tariyê de dihêlin, ji lewra ev herdu têgîn di asta herî jor de, hêza vê yekê temsîl dikin. Ji awirê şoreşê ve wezîfeya herî girîng a zanista civakî ew e ku hêza çeloxwarîkirin û tarîkirinê ya li ser heqîqeta civakî tesfiye bike.

Di roja me ya îro de bi qasî sermayeya mêtinkariya xwe zêde dike, dewleta netewe û milletperestî yên bi amûrên ewlekariyê hatine gurçûpêçkirin, Marksîzm jî di navê de, zanista civakî êsîr kirine û çawa dixwazin wisa bi kar tînin. Dewleta netewe ti zanist, îdeolojî û hunerê nekiribe bin fermana xwe, nîne. Rohnîbûneke rastî bi analîz û jihevderxistina van herdu diyarde û têgihiştinên pozîtîvîst û bi jê bihurîna wan, dibe.

Ji lewra gelekî girîng e ku mirov weke çavkaniya pirsgirêkên civakî dewleta netewe û neteweperestiyê (milletperestiyê) bibîne û wan weke şeşemîn guloka mezin a pirsgirêkên civakî binirxîne. Herçiqasî ew xwe weke hêza çareseriyê ya tevahiya pirsgirêkên civakî bibînin û xwe weke navenda balkêşiyê pêşkêş bikin jî hukmê dîrokî yê ji bo heqîqeta civakî, ev e.

## 7- Dewleta Netewe, Desthilatdarî û Faşîzm

Dewleta netewe şêweyekî desthilatdariyê yê ji rêzê nîne. Ji şêweyekî herî pêşketî yê desthilatdariya dewletê wêdetir, maneyeke xwe ya din heye. Şêwegirtineke dewletê ya welê ye, li ser şopa wê faşîzm pêk tê. Kengî desthilatdariya dewletê li ser civakê xwe belav û bi rêxistin kir, mumkîn e ku hegemonya yekdestdariya kapîtalîst li ser ekonomiyê pêk bê. Dewleta netewe bi vê maneyê tê naskirin. Kengî ev şêweyê dewletê ji hundir ve bi beşên civakê yên pelçiqandî û mêtî re, ji derve jî bi hêzên bi wan re di nava hevrikiyê de ne, dikeve şer, faşîzm jî vê qonaxê îfade dike. Cudahiya di navbera wan de dişibe cudahiya di navbera pêvajoya şer û aştiyê de. Di herduyan de jî pêkhatinên siyasî yên cuda têne tesfiyekirin. Di vê rewşê de desthilatdariyê mîna civakê homojen dikin. Civaka homojenkirî, weke desthilatdariya homojenkirî tê konsolîdekirin. Dewleta faşîst jî civaka homojen û yekîtiya herî zêde ya dewletê îfade dike. Tek ziman, tek welat, tek çand, tek al, tek netewe slogana wê ya bingehîn e. Ev şêweyê pêkhatinê eşkere ye ku ji bo xwezayeke mîna ya civakî ya pirrtêkeltiyê û pirrcuretiyê pêşkêş dike, ne çareseriyê, belê wê gelek pirsgirêkên mezin çêke. Pêvajoya

jê re kansêrbûna civakê tê gotin jî ev e. Yan wê tevahiya civakê daqurtîne yan jî wê weke ûr-girêkeke civakî were jêkirin û avêtin.

Tevahiya dîroka civakî çiqas çandên cuda yên komî serhev bûne, çi etnîsîte, ziman, pêkhatinên siyasî, fikir û bawerî hebin, hebûna hemûyan di pêvajoya dewleta netewe de dikeve tehlûkeyê. Çiqasî li ber xwe bidin û bi cudahiyên xwe bijîn, wê rûyê faşîst ê dewleta netewe derkeve holê. Xwe sosyalîst jî nîşan bide, her dewlet, tevger û partiya bi vî şêwazî li dijî cihêwaztî û pirrcuretiya civakê derkeve, bivênevê wê bibe faşîst. Dewleta netewe yan ji aliyê van partî û tevgerên bi vî rengî ve tê avakirin yan jî ew partî û tevgerên bi vî rengî ava dike. Lîberalîzma bûrjûwa herçiqasî li bin sloganên antî-faşîst û antî-kominîst bi têgihiştina dewleta lîberal (dewleta mînîmûm) rabe jî bi temamî dixapîne. Dê û bavê dewleta netewe lîberalîzm bi xwe ye. Dewleta netewe çi di pêkhatina xwe de çi jî di dema gihiştin û stewîna xwe de ji bo lîberalîzmê şêweyê herî îdeal ê dewletê ye. Lewra bi qasî rastiya kapîtalîzmê ya faşîzmê tîne, rastiya wê ya sosyalîzma dewletê (sosyalîzma pêkhatî) tîne jî bi dewleta netewe digihîjin hev.

Di şerên pêncsed salên dawî de, nexasim jî di sedsala dawî ya ber bi roja me ya îro de di asta global de rê li ber şerên neteweyî vekir. Ev şer ji tevahiya dîroka şaristaniyan zêdetir bûn sedema qirkirin, tevkujî û xwînrijandinê. Bela xwe jê vekin ku dewleta netewe û faşîzm ji bo civakê bibin çareserî, ev yek bi aweyekî eşkere û balkêş nîşan dide ku dewleta netewe û faşîzm heftemîn çavkaniya herî mezin û xedar a pirsgirêkan in.

## 8- Dewleta Netewe, Civaka Exlaqî û Polîtîk (Demokratîk)

Dewleta netewe, bi nazenînî û bi îhtîmam hewl dide xwe weke dewleta huqûqê nîşan bide. Ji vê jî zêdetir hewl dide xwe weke cara pêşî ya pêkhatina huqûqê pêşkêş bike. Di bin vê rastiya wê de înkara civaka exlaqî û polîtîk heye. Huqûq kategoriyeke civakî ye ku bi giştî çînên dewletdar û bi taybetî jî bûrjûwazî hewl didin wê li şûna exlaq û polîtîkayê serwer bikin. Şaristaniya Ewrûpayê jî xwe zêde huqûqparêz dihesibîne, di bin vê rastiya wê ya hûrûkûr de ev înkara civaka exlaqî û polîtîk heye. Di teoriyê

de tê gotin, dewleta netewe çarçoveya îdeal a huqûqê ye. Dewleta netewe ya li ser înkara civaka exlaqî û polîtîk ango li ser înkara civaka demokratîk ava bûye, ji bo huqûqa bûrjûwayê çarçoveyeke îdeal e, û ev jî tê fêhmkirin. Lê belê weke ku tê îdeakirin, ne dewleta netewe, ne jî huqûq çarçoveya civaka demokratîk pêk nayîne. Berevajiyê vê rast e. Dewleta netewe û huqûq çendîn di zikhev de zêde bibin û bikevin her qada civakê, ewçend ji civaka exlaqî û polîtîk dibihurin. Civaka demokratîk wê veguhere civaka temaşayê. Di nava rêzik û pîvanên (cîhana rêzikname, qanûn û destûra bingehîn) dewleta netewe û huqûqê de ku hûrûkûr hatin hûnandin û şidandin, qad ji polîtîka û exlaq re nayê hiştin. Jixwe di tehlîla dawî de ev rêzik û pîvan îfadeya yekpare ya parzûnkirî ya berjewendiyên yekdestdariya kapîtalîst in. Demokrasî di nava tevahiya van rêzik û pîvanan de vediguhere lîstikekê. Karekterekî wê yê afirîner û pêkhêner tine dibe.

Polîtîka weke qada çareseriya afirîner a pirsgirêkên civakî fonksiyonel dibe. Rêzika polîtîkayê ew e, ji bo civak bêhtir ber bi başiyê ve biçe, ber bi rastî û xweşikiyê ve biçe divê afirîner be, û divê zanibe bibe ew hunerê payebilind ê vê afirîneriyê nîşan bide. Ev jî eger exlaqê civakî û demokrasî hebe, dikare di vî hunerî de bi ser bikeve. Ji ber vê sedemê li qadeke huqûqa bûrjûwayê bêhn lê çikandiye û fetisandiye, cih ne ji ya exlaqî û polîtîk re, ne jî bi awayekî demokratîk cih ji kirin û avakirineke civakî re dimîne. Zanista civakî ya navend Ewrûpa di tehlîla dawî de weke îfadeyeke mîtolojîk a berevajîkirina vê rastiyê, mirov hukim lê bike, wê zêdetir ji rastiyê re xizmetê bike; wê bi heqîqetên civakî re zêdetir wê bide naskirin.

Dewleta netewe û exlaqê huqûqê yên weke amûrên bingehîn ên çareseriyê ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî yên bi dîroka şaristaniyê re kûrtir dibin weke rêya derketinê bêne pêşkêşkirin û heta ku civaka demokratîk û polîtîk ji nedîtî ve bên, wê veguherin heştemîn guloka mezin a pirsgirêkên civakî û ev yek jî heqîqetek e ku înkara wê zehmet e.

## 9- Dewleta Netewe, Civaka Sivîl û Hawîrdor

Pêvajoya pêxîrtengiyê ya kapîtalîzmê ji salên 1970'î ve kûr bû, di heman demê de weke parçeyekî vê yekê pêvajoya krîza avahiya dewleta netewe jî kûr dibe. Di vê demê de xwedayê dewleta netewe bi awayekî tazî tê dîtin û perdeya wî ya îdeolojîk jî mîna pelên daran pel bi pel tê xwarê. Ji bo pêşîgirtina li hilweşînên mezin, bivênevê xwenîşandana tevgera civaka sivîl dikeve rojevê. Mirov dikare civaka sivîl weke civaka li derveyî civaka malbat û dewletê dimîne, îfade bike. Di demekê de ku dewleta netewe xisleta xwe ya herkesî digire nava xwe ji dest dide û li hemberî vê civak bi temamî demokratîkbûyîn û azadbûyîna xwe nikare pêk bîne, civaka sivîl weke rêxistinên demên derbasbûnê derdikeve holê û maneyeke xwe heye. Ji herdu aliyan ve jî têne tengavkirin. Dikevin rewşekê, yan wê li cem dewleta netewe yan jî di nava refên civaka demokratîk û azad de cih bigirin. Naxwe wê nikaribin xwe ji bêkêrbûnê xelas bikin. Xwediyê kapasîteyeke bi sînor a çareseriyê ne. Herî îdealên wan ew in ku di çarçoveya femînîst û ekolojîst de tevdigerin. Çepgirên kevin, komên anarşîst û pêkhatinên siyasî û sendîkayên ne bi ser dewletê ve jî dikevin vê kategoriyê.

Dewleta netewe ji ber dejenerasyona ketiye navê ji neçarî cih daye civaka sivîl û ji lewra jî timî zextê lê dike û bi vî awayî hêza wê ya çareseriyê di asta herî jêr de digire. Dewleta netewe bi qasî ku di nava civakê de şêweyê herî pêşketî yê tehekuma desthilatdariyê ye, ewqasî jî li ser ekolojiya civakê bi heman rolê radibe. Eşkere ye ku ew çiqasî karibe pêşketina civaka sivîl û demokratîk asteng bike ewqasî jî nehemîn çavkaniya mezin a pirsgirêkên civakî ye.

## 10- Dewleta Netewe, Zanist, Huner û Heqîqet

Pozîtîvîzm bi îhtîmam û nazenîniyeke mezin hewl dide dewleta netewe weke rewşa berbiçav a zanist û hunerê nîşan bide. Modernîteya kapîtalîst bi vî rûyê xwe derewa herî mezin xistiye piyaseyê. Heta dawiyê bi israr

îdîa dike ku diyardeyî, objeyî û zanistî ye. Dewleta netewe tevahiya hêza xwe ji vê propagandayê re vediqetîne. Dinyayeke gelekî mezin a akademîk ava dike. Mîtolojî û propagandaya wê ya ku di dîrokê de ti dîn û xwedayî (qral û meşrûtiyeta wî) nikarîbû pêk bîne, di vê dema modernîteyê de tê pêkanîn û wê dixin bazarê. Ji ber ku tevî çaviyên exlaqî û polîtîk ên civakê navendên maneyê jî hatine hilweşandin ti mejî û dilê bi van mît û propagandayên modern nexape, hema hema nemaye.

Çarçoveya huner û zanistên pozîtîvîzmê danîbû ji krîza piştî salên 1970'î para xwe girtin, ji lewra pê re rûbirû bûn ku maskeyên wan ên qaşo heqîqetê îfade dikin, bikevin. Ev, bi parçebûna dogmatîzma dewleta netewe re ji nêz ve têkildar e. Ya diqewime, rohnîbûneke duyemîn a di nuqteyên tarî mayî yên rohnîbûna yekemîn de ye. Dewleta netewe wexta xwezaya civakî bi projeyên xwe yên muhendistiyê hûrhûrî dike, ne bi tenê rastiya diyardeyî, pêhesîn û têgihiştina wê jî xira dike. Wexta ku diyarde tê tinekirin bivênevê pêhesîn û têgihiştina wî jî derbê dixwe.

Yek ji heqîqetên zanista civakî ya derketiye holê, dîrokbûna civakê ye. Dewleta netewe li şûna dîroka civakî, avakirineke mîtîk a elîteke bûrjûwa ya desthilatdar mîna dîrokê pêşkêş dike. Haya wê ji wê nîne ku ji dîroka dînî û mîtolojîk a gelekî rexne dike, zêdetir derketiye derveyî heqîqetê. Zanista civakî ya Ewrûpayê çendîn dibe îdeolojiya fermî, dibe îfadeya herî paşverû ya mîtolojîk. Tevî hemû îdeaya xwe ya zanistî jî metafizîk e. Rewşa zanistê, ji ya huner têde ye, cuda nîne. Herdu jî bûne qadên sermayeyên pêvek ên bi ser kapîtalîzmê ve. Zanist û huner çendîn dibin meta nirxa xwe ya heqîqetê jî ji dest didin. Tesfiyekirina felsefeyê weke zanista heqîqetê û bi vî awayî ji aliyê maneyê ve têkçûna wê, bi qasî qirkirinên maddî û fizîkî yên civakê rê li ber felaketan vedike. Civaka bê felsefe civaka tayê wê bi heqîqetê re qutbûyî ye. Ev jî tê wê maneyê ku civak bi tenê dibe lod û gidîşeke obje û tiştan. Civaka obje jî ew civak e ku bi tevahî qabîliyetên wê yên parastinê şikiyane, mîna gidîşeke alavan li her cure mêtinkariyê vekiriye. Mirov nikare li felaketeke mezin a bi qasî civakeke qabîliyeta xweparastinê jidestdayî, bifikire. Dewleta netewe civakê ji zanist, huner û

heqîqetê dûr digire, bê xweparastin dihêle û bi vî awayî dibe dehemîn hêmana herî mezin a pirsgirêkên civakê.

Amsterdam-Hollanda û London-Brîtanyayê wexta dewleta netewe weke amûrekî stratejîk pêşde birin, haya wan ji wan hebû çi dikirin. Di nava yên ev amûr çêkirî de yên zanîbûn cinawirekî çiqasî bi tehlûke çêkirine hebûn. Ji bo zirara vî cinawirî bi sînor bikin, kêm be jî ji bo parastina ferd û civakê hinek tedbîrên huqûqî û demokratîk kêm nekirin. Hemin ev yek ji bo binyeya navxwe dikirin. Li ser rûyê dinyayê (bejahiya Ewrûpayê jî di navê de) dewleta netewe jî weke xirabiyên ji Qutîka Pandorayê derketine, reşandin. Bi vê, civaka berê û Ewrûpaya nû parçe kirin û karîbûn wan pê bixin hegemonya xwe.

Îdeologên Elman ên ehmeq û zanyarên pozîtîvîst ên Fransî yên xwe gelekî biaqil dizanin, ev Pandora mêran pîroz kirin û weke ku dîn û xwedayekî rastî be, ew kişandin Panteona modern. Her elîta desthilatdar a ket bin bandora modernîteya kapîtalîst, pûtên xwedayên xwe yên nû li gorî van modelên nû ava kirin û xistin şûna yên berê. Xwediyên herî kevin ên têgîna dîn û xwedê ango elîtên Rojhilata Navîn, ji herkesî baştir dizanîbûn xwe neavêjin bextê vî dîn û xwedayê hegemonên nû, wê nikaribin bijîn.

## c- Şoreşa Pîşesaziyê

Sêyemîn lingê distanê yê modernîteya Ewrûpayê şoreşa pîşesaziyê ye. Şoreşa pîşesaziyê di dîroka şaristaniyê de rewşeke xwe ya xweser heye. Ji sedî sed bandoreke bi qasî ya şoreşa cotkarî û bajêr kiriye. Bêguman dîrokeke kevin a pîşesaziyê bi qasî dîroka mirovatiyê kevin heye. Gelek veguherînên şoreşgerî derbas kirine. Lê li Ewrûpayê nexasim jî li Ingilîstanê ji dawiya sedsala 18. ve veguherînên çêbûn di karektera şoreşên mezin de ne. Me berê jî bi girîngî destnîşankiribû ku divê mirov kapîtalîzm û ekonomiyê bi şoreşa pîşeziyê re wekhev neke û nebîne. Pîşesazî diyardeyeke civakî ye ku hê jî sererast rexne lê nehatine girtin. Beriya şoreşa pîşesaziyê gund-cotkarî-bajar ti carî bi serê xwe negihiştin

wê astê ku gefan li civakê bixwin û wê bixin tehlûkeyê. Berevajî, di qada çanda maddî û manewî de gelek nirx li pêşketina civakî zêde kirin. Hêza sereke ya avakirina jiyana civakî pêk anîn. Li Ewrûpayê diyardeyên bi şoreşa pîşesaziyê qewimîn gelekî cuda bûn û bandora wan li ser jiyana civakê hê jî bi awayekî zanistî nehatiye analîzkirin û yên hatine kirin jî ji analîzên zanistî dûr in. Belkî jî yek ji wezîfeyên bingehîn ê zanista civakî ew e ku bandora pîşesaziyê li ser jiyana civakî bi awayekî hosteyane lêkole.

Ne bi tenê ya zanistê, pîşesazî divê herî kêm bi qasî wê, dabaşa felsefeyê be. Ji sedî sed divê felsefe pîşesaziyê bixe rojeva xwe. Zanista îqtîsadê pîşesazî bi tenê weke qadeke aboriyê kiriye mijar û ev kêmasiyeke hê mezintir e. Pîşesazî weke amûrekî hilberînê yê bi bereket û rabûna ser piyan a aboriyê tê nirxandin û encamên vê weke qirkirinê û dewamnekirina hawîrdorê derketine holê.

Ne mumkîn e ku mirov faşîzmê bêyî pîşesaziyê bibîne. Pîşesaziyên dikarin sîleha atomê û zindiyên genetîka wan guhertî yên îhtîmal heye zirareke mezin bidin civakê, rewşa wan ji niha ve weke tehlûkeyeke mezin tê dîtin. Bêguman em behsa pîşesaziya ku ketiye kontrola kapîtalîzm û ekonomîzmê dikin. Kontrola herdu meylan li ser pîşesaziyê, pirr eşkere derketiye holê ku hem di çarçoveya maneyeke rastî de, hem jî weke metafor rê li ber kansêra civakî û insanî vedike.

Pîşesaziya bi armanca karê di her qadê de gihiştiye ber dewamnekirinê û ispateke din a vê yekê jî bêkarî, hawîrdora ji ekolojîkbûnê derketiye û jihevdeketina civaka gund û cotkariyê ye. Sîstema dinya kapîtalîst li ser textê serweriyê rûnişt, bê guman di navbera vê yekê û pîşesaziyê de têkiliyeke xurt heye.  Tê zanîn ku Ingilîstan bi saya pîşesaziya kapîtalîzmê di warê hegemonîk de mezin bû. Li hemberî hêza serdest a hilberînê ya kapîtalîzma pîşesaziyê zehmet e ku şêweyên din ên hilberînê ango şêweyên din ê civakê li ser piyan bimînin.  Lê hê di vê qonaxê de jî ya mewzûbehs, ne hilberîna ji bo pêdiviyên bingehîn ên insanî ye, hilberîna ji bo serdestiya hegemonîk e.

Pirsa bingehîn ev e: Gelo divê pîşesazî ji bo pêdiviyên bingehîn ên mirovî be, yan jî ji bo serdestiya hegemonîk be? Bi şoreşa pîşesaziyê re li ser navê civaka exlaqî û polîtîk ji bilî pêdiviyên bingehîn ên mutleq, diviyabû pîşesazî misoger nehatibûya erêkirin. Ji aliyê dîroka mirovatiyê ve şoreşa pîşesaziyê wexta ku weke sêyemîn kêliya veguherîna mezin ket rojevê, diviyabû ji bilî pêdiviyên bingehîn, ji sedî sed pêşî lê bihata girtin. Wezîfeya bingehîn a exlaq, huqûq, dîn, felsefe, zanist û polîtîkayê diviyabû ev bûya. Mirovatî ji vê helwestê re xerîb nîne. Di dema pêkhatina şoreşa cotkariyê de cîhana têgînên hatin mezinkirin û bilindkirin, danîna hîmên ezmanî, zanista pêşket û hukmên exlaqî, vê heqîqetê îfade dikin. Di şoreşa bajêr de mîtolojiya Sumer û Misrê, zanist, zanyarî, hunera wan û hîmdanîna dînên mezin, ispateke din a mezin a vê heqîqetê ye. Wexta şoreşa pîşesaziyê zêde û xurt bû, Şoreşa Franseyê û bûyerên mîna wê yên piştre qewimîn di wê rewşê de nînin ku mirov wan weke mînakên dîrokî nîşan bide. Berxwedana dêrê, ekolên hunerê, şoreşên zanist û felsefeyê bihêlin pêşî li kapîtalîzm û dewleta netewe bigirin, ji bo li ser hîmê pîşesaziyê ranebin pêdarê, berevajî ji bo bikevin bin fermana wê, bi awayekî bextreş, mîna bikevin pêşbaziyê ketine nava tevgerê. Di vê de, bêguman hilweşîna civaka exlaqî û polîtîk bi roleke bingehîn rabûye.

Divê em baş zanibin ku wexta şaristaniya navendî ya Ewrûpayê sîstema xwe ji Rojhilata Navîn bi dest xwe ve anî, girîngiya pêşî bi hêmana exlaqî nedabû. Berevajî li pey bi dest ve anîneke bêexlaq bû. F. Nietzsche ji ber ku ev xiyanet baş tespît kiribû, kitêba xwe ya bi navê **'Zerdeşt Weha Ferman Kir'** bi hêrseke mezin nivîsand. Nietzsche di vê mijarê de ewçend bi hêrs e, mîna ku wisa biqîre: "Her tiştê we li ser navê modernîteyê daqurtandiye, verişin." Hemin wî wexta ev digot, wî behsa verişandina modernîteya kapîtalîst a di mejî û dilê mirov de hatiye bicihkirin, dikir. Di velîstin û dînbûna wî de para vê nêzîkatiyê divê piçûk neyê dîtin. Lê çawa ku bi gulekê bihar nayê, bi fîlozofekî jî wê pêşî li dagirkirina modernîteya kapîtalîst a dil û mejiyê mirov nehata girtin. Wexta ku Adorno digot "Jiyana çewt rast nayê jiyîn' dixwest heman rastiyê bîne ziman. Nexasim piştî qirkirina Cihûyan haya xwe jê hebû ku jiyana modern weke heyî dewam

bike, dijberê tevahiya pîroziyên exlaqî yên mirov e. Li hemberî çavsorî û harbûna kapîtalîzm û dewleta netewe slogana ‘yan sosyalîzm an barbartî’ mîna li vê rastiyê hayil bibe. Ev hayjêhebûn girîng in, lê gelekî kêm in.

Mirov şoreşa pîşesaziyê bi nêzîkbûneke teng a ekonomîst bibîne wê bi tenê ne kêm be, wê rê li ber bûyerên gelekî jirêderketî jî veke. Disîplîna jê re polîtîka ekonomiyê tê gotin, mînakekî tîpîk e ku nîşan dide bi ekonomîzmê çawa ser heqîqeta civakî tê girtin û ji rê tê derxistin. Eger mirov baş bala xwe bidiyê, mirov ê bibîne ku ekonomîstên Ingilîz serê vê mijarê kişandine û xweber nîne ku dema wê ya herî bi hêz jî dema şoreşa pîşesaziyê ye. Wezîfeya bingehîn a polîtîka ekonomiya Ingilîzan ew e ku li ser navê zanista civakî cinawirê bi navê kapîtalîzmê rewa bikin. K. Marks û F. Engels jî bûn destikê van hewldanan û ev jî nîşan dide çend serketî û bi bandor bûne. Şêweyê fikrê yê civaka exlaqî û polîtîk li dawiyê tê hiştin û di vê de polîtîka ekonomiya Ingilîz bi rola sereke radibe. Li ser navê zanistê li ser vî bingehî xiyaneta herî mezin hatiye kirin. Ekola zanista pozîtîvîst a Fransî duyemîn hevparê mezin ê vê xiyanetê ye. Ya polîtîka ekonomiya Ingilîz li ser qada ekonomîk kirî, ekola pozîtîvîst a Fransî jî li ser tevahiya qada civakî pêkanî. Ekola pozîtîvîst exlaq, dîn û felsefeyê weke metafizîkên serdema wan bihurî, xwe jî weke dînê sekuler ê serdema nû (modernîteyê) îlan kir û ev jî rastiya em behsa wê dikin gelekî baş rave dike. Derketina fikra pozîtîvîst jî li dema şoreşa pîşesaziyê rast tê û ev jî xweber nîne, ji lewra mijarê têra xwe rohnî û zelal dike.

Şoreşa pîşesaziyê bêyî ku leza xwe kêm bike, dewam dike. Di dîrokê de ti şoreşê evçend dirêj dewam nekiriye. Her dem derbas dibe, leza xwe zêde dike. Li pêşiya xwe ti astengî û kelemî nas nake. Jixwe guloka herdu hêzên mezin ên bêsînor ên ketine bin fermana wan, di pêvajoyeke zikhev de ne, ji lewra jî pêşketin û bûyereke cuda nayê payîn. Ango di demekê de ku kapîtalîzm û dewleta netewe bi awayekî kansêrwarî mezin dibin, nabe mirov bipê ku îndustriyalîzma hebûna xwe deyndarê wê ne, rawestînin. Îndustriyalîzm sedema hebûna wan e. Mirov heta îndustriyê ji îndustriyalîzmê xelas neke, mumkîn nîne ku mirov karibe civakê ji destê yekdestdariya dewleta netewe û kapîtalîzmê rizgar bike. Berevajî, heta ku

îndustriyalîzm weke sedema hebûna kapîtalîzm û dewleta netewe dewam bike, leza xwe ya gihiştiyê wê zêdetir bike û bivênevê wê heta hilweşîna bi mirin a sêlingên bingehîn, bikudîne. Gelekî girîng e ku mirov rola îndustriyalîzmê di pirsgirêkên civakî, qirkirin û hilweşandina hawîrdorê de ji nêz ve hûrûkûr lêbikole.

## 1- Îndustriyalîzm û Hilweşîna Civaka Gund-Cotkariyê

Çawa ku tê zanîn, mirov dikare îndustriyê (pîşesaziyê) weke çalakiya mirov a ne yekser bi destê wî, ya bi amûran tevlî xebatên civakî dibe, bi awayekî giştî bide naskirin. Destpêka wê heta bi derketina cinsê mirov diçe. Tê zanîn ku îndustriya pêşî bi alet û amûrên ji kevir pêk hatiye. Komên nêçîrvan û yên nebat û gîha berhev dikirin, bingehê îndustriya wan xwe dispart alet û amûrên ji keviran. Bi şoreşa gund-cotkariyê re di îndustriyê de jî şoreşeke mezin pêk hat. Tevn, destar, kûzik û dîzik berhemên îndustriya vê demê ne. Piştî vê demê, nexasim li mekanê derketinê yê sîstema şaristaniya navendî li kevanê çiyayê Toros-Zagrosê li Hîlala Bi Bereket di dema 6000-4000 B.Z. de zanist û îndustriyê pêngaveke mezin avêt. Di serî de alet, tekerik, tevrik û sîtil, amûrên îndustriyê yên bibin manîvelayên dîrokê, bi pêş ketin. Gaveke pêştir a vê pêvajoyê, şoreşa bajêr bû. Di vê şoreşê de ku salên 4000-3000'î B.Z. pêk hat, rola amûrên îndustriyê girîng e. Di zanist û huneran de bi zimanê nivîs û hejmaran re di vê pêvajoyê de mirovatiyê xwe ji qonaxekê çipî qonaxeke din kir. Ez van agahiyan bi bîr dixim; ji ber ku îndustriyên behsa wan dikim di vê demê de hê neketibûn bin fermana kapîtalîzm û yekdestdariya dewletdariyê. Di bin çavdêriya exlaqî û polîtîk a civaka gund û bajêr de bi roleke kêrhatî radibûn. Helwesta exlaqî û polîtîk ji sedî sed bi roleke diyarker radibû.

Di sîstema şaristaniya navendî ya salên 3000'î B.Z. de li Mezopotamyayê bi pêş ket, ev çavdêrî her ku çû qels û lawaz bû. Rêveberiya dewletê ya ji sêberiya rahib-rêveber-esker pêkhatî, ji vê demê û pêve li şûna rêveberiya berê ya hîyarerşîk ji nû ve hat avakirin. Îndustrî bi giranî li bajaran pêş ket û ev ji nû ve avakirin ket bin destê rêveberiya dewletê. Girîngiya

îndustriyê ya hem di warê aborî û hem jî di warê tevgerên eskerî de zêde dibû, kontrola dewletê bi giştî li ser civakê û bi taybetî jî li ser civaka gund-cotkariyê ango mêtinkariya wê bi xwe re anî. Dîroka heta bi qonaxa şaristaniya Ewrûpayê, bi awayekî dîroka zordestî û mêtinkariya yekdestdariya dewletê ya bi kontrola îndustriyê li ser civakê pêkanî ye. Di vê qonaxê de kontrola kapîtalîzmê li ser îndustriyê ango mêtinkariya wê bi qasî ku mirov bibêje tineye, kêm e. Zêdetir bi faîzxwerî û bazirganiyê li pey danehev û komkirinê ye. Tevî kontrola dewletê, îndustrî di wê hêzê de nîne ku kontrola civaka exlaqî û polîtîk xira bike. Ya rastî xizmeta pêdiviyên bingehîn ên civakê dikir. Îndustriya eskerî bi xwe jî kêm caran ji vê çarçoveyê derdiket. Ji lewra em bi hêsanî dikarin bibêjin, îndustrî ji bo civakê ne weke çavkaniya pirsgirêkan, weke amûrekî çareseriyê xwedî mane bû.

Qonaxa şaristaniya Ewrûpayê ev balansa civak-îndustriyê ya hem nazik, heyatî, hem jî stratejîk xira kir û bi vî awayî hegemonya xwe misoger kir. Kêliya ku diviyabû têde qiyamet bihata rakirin, li ser navê exlaq, dîn, zanist, felsefe û hunerê serhildan pêk bihata, ew kêlî bû ku têde ev balansa civak-îndustrî li dawiyê dihat hiştin. Ji sedsala 16. û pêve kapîtalîzmê pêşîsaziya fînans, bazirganî û manîfakturê kir kontrola xwe û dest pê kir bû sîstema dinyayê. Kapîtalîzm di dîrokê de cara pêşî digihişt vê ast û statuyê. Kapîtalîstên bi hezarên salan xwe di dehlîz û quncikên tarî yên civakê de veşartibûn û bi rêyên bêexlaq bi îhtîkar û selefkariyê, mayeyên civakî dane hev, di vê sedsalê de bûn xwediyê keys û firsendekê. Dîroknas di pêkhatina vê keys û firsendê de ji derve êriş û dagirkerî (nexasim Îslama Osmanî) û ji hundir ve jî şerê navxweyî yê feodalan û di nava xwe de parçebûna dêrê û şerên mezheban weke sedemên bingehîn destnîşan dikin. Di vê de para rastiyê heye. Kapîtalîzm xweber pêk nehat. Di kêliya herî lawaz a hêza kontrola civakî de derket holê. Ji ber ku min di beşên pêwendîdar de bi xalên sereke behsa vê pêvajoyê kiriye, ez bi tenê destnîşan dikim.

Bazirganî, fînans (pere) û manîfaktura kapîtalîzmê tevî ku balans li dijî gund-cotkariyê xira kiribe jî hê cudahî zêde mezin nebûye. Ango civaka

exlaqî û polîtîk hê hebûna xwe diparast. Dîn, zanist, felsefe û huner jî ji ber ku bi tevahî neketibûn kontrola kapîtalîzmê bi pirranî li dijî wê têdikoşiyan, li ber xwe didan.

Divê mirov şoreşa pîşesaziyê weke berhemê kapîtalîzmê nebîne. Gelekî beriya şoreşa pîşesaziyê di qada fînans û bazirganiyê de bûbû sîstema dinyayê. Bi giştî ev wext û dem têne tevlîhevkirin. Ez hê behs dikim, mijareke din jî heye divê ez bi bîr bixim û destnîşan bikim, pere û bazirganî bi serê xwe nayên maneya kapîtalîzmê. Pere weke amûrekî besît ê pevguhertinê û bazirganiya bi buhayên bi armanca neyekdestdariyê tê kirin di çarçoveya aboriyê de ne, û bi roleke heyatî û kêrhatî radibin. Bazarên li wan buhayên rê nadin yekdestdariyê û cih didin gera metayên besît ji bo ekonomiyê hewce dikin û xwedî xisleta pêşdebirina jiyana civakî ne. Di destê kapîtalîstan de pere bibe weke amûrekî faîzê û li bazaran bi rêya bazirganiyê buhayên yekdestdar deyne ango bi erzanî bikire û buha bifiroşe, hingê sîstem dest pê dike dibe kapîtalîst. Ha ji ber van sedemên destnîşankirî, ev sîstem bi sedsala 16. re gihişt serketinê û bi vê re derî hinekî li qiyametê vekir.

Sedsalên 17. û 18. di dîroka mirovatiyê de weke serdema hegemonya kapîtalîzmê cih digirin. Şoreşa pîşesaziyê ya di sedsala 19. de pêkhatî di bingehê xwe de serketina merkantîlîzmê ye. Li şûna bi destê mirov bibe, bi vedîtin û bi lez pêşdebirina gelek amûrên xwedî kapasîteya otomatîk (di serî de tren û keştiyên bi dûkelê xebitîn û otoyên bi benzînê) bixebitin, cewherê vê şoreşê ye. Têkiliya vê bi kapîtalîzmê re nîne. Ya rastî, pêşdebirina vê şoreşa teknolojîk bi saya daneheva hezar salan a pratîka mirov pêk hat. Di vê qonaxa nû de cudahiya şoreşa teknolojîk ew e, di hilberîn û çûnûhatinê de ango li ser tevgerên bazirganî û pereyan di dîrokê de bi awayekî nedîtî rê vekir û sikurên heyî hilweşandin. Kapîtalîzma bazirganî û fînansê bi lez sermaye razand pîşesaziyê û bi vî awayî kara herî zêde bi dest xist. Kara herî zêde qanûna kapîtalîzmê ya karê ye. Tê maneya pêkhatina herî zêde ya sermayê. Ev jî dihêle ku pîşesazî ji heddê xwe bibihure. Encam, buhrana hilberînê ye. Ji bo li pey xwe hiştina van

buhranan, çare dîsa pîşesaziya zêde ye. Ev harbûn û dînbûna pîşesaziyê heta roja me ya îro weke bivênevêya vê qanûnê her dewam dike.

Pîşesazî bi ketina kontrola kapîtalîzmê, dibe îndustriyalîzm. Zordestiya pêşî ya herî mezin a îndustriyalîzmê li ser civakê, ne li ser pêdiviyên bingehîn ên hilberînê, belê bi zêdekirina zordestiya xwe li ser berhemên kara herî zêde tînin, derdikeve holê. Pirsgirêkên di dîrokê de nedîtî û ji gelek aliyan ve hukim li civakê kirine çavkaniya xwe ji vê rastiyê digirin. Di serê van pirsgirêkan de ji sedsala 19. ve bi lez xirabûna balansa di navbera civaka bajêr û civaka gund de tê. Mezinbûna bi bajarbûnê ve derdikeve holê, têkiliya xwe bi pîvanên civakî re bi lez namîne. Bajarên ji wan re mega tê gotin, ya rastî têne maneya înkarkirina bajêr. Êdî pêvajoya vê înkarê dest pê dike. Ji aliyê rêje û hejmara şêniyên dihewîne, bi mîlyonan mirovî bidin li aliyekî, mekanekî şêniyên wî ji sed hezaran bihurî, pêwendiya xwe bi rastiya civakî re qut bûye. Ev pêvajoya ku em dikarin jê re bibêjin bajarbûna bê bajêr an jî înkara bajêr, zemînê pirsgirêkên herî mezin ên civakî ye. Ne bi tenê mekanê mêtinkariya çînî, bajar weke mekanê herî mezin ê mêtinkariya hawîrdorê, hem weke rastî, hem jî weke metaforîk kansêrbûyîna civakî îfade dike.

Di dused salên dawî de bajar mîna çiyan mezinbûn û bandora wan a hilweşîner bi jimartinê neqade. Lê tespîteke rast e ku mirov li rêza pêşî hilweşîna civaka gund-cotkariyê ya deh hezar salî deyne. Pêvajoya di serê destpêka sedsala 19. de destpêkirî di serê salên 2000'î de wisa xuya ye ku temam bûye. Hilweşîn bi tenê bi maneya fizîkî nîne; tê maneya hilweşîna çanda maddî û manewî ya deh hezar salan a avahiya mirovatiyê ava kiriye. Encamên vê hilweşînê hînê nû derdikevin holê. Ev derbeke welê xedar e ku li mirovatiyê ketiye, ji niha ve dewamkirin an jî dewamnekirina hebûna civaka mirov tê guftûgokirin. Eger bi tenê gazên serayê bi vê lezê zêde bibin, kes nikare texmîn bike ku wê civak û hawîrdor çiqasî li ser piyan bimînin. Zanist ji niha ve senaryoyên qiyametê yên sedsal bi şûn de li hev tîne û nîşan dide. Tehlûkeya bingehîn, bi avahiya hundir a civakê û bi wê bi xwe têkildar e. Avahiya çînî, aqlê dewleta netewe, ekonomiya bê ekonomî, bêfelsefebûyîn, qedandina exlaq û polîtîkayê, krîza avahiya kapîtalîzma

global, rewşeke ji hilweşîna sîstemê wêdetir îfade dike. Ya tevî wê diqewime, rewşa kaotîk a sîstema şaristaniya hegemonîk a pênc hezar salî ye.

## 2- Îndustriyalîzm û Înkara Bajêr

Wexta ku civaka gund-cotkariyê hildiweşe, li bajêr civaka bajêr ava dibe û me karekterê anormal ê vê civakê destnîşan kiribû. Em wexta çavekî li dîroka bajêr bigerînin, em ê bi xetên sereke bibînin ku heta bi serê sedsala 19. bajar neketiye wê rewşê tewazuna bi civakê re xira bike. Tevî ku wezna bi civaka gund re timûtim diguhere jî mirov dikare bibîne ku dabeşkirineke kar a bi bereket û karibe were qebûlkirin, bi awayekî hevpar karine pê civakê dewam bikin. Pirsgirêk bi qanûna kara zêde dest pê dike. Kengî ev qanûn dikeve dewrê, pirsgirêk jî dest pê dike.

Ez nikarim xwe bigirim û neçar im ku şaşî û kêmasiya mezin a Karl Marks timûtim bînim ziman. Ez li ber dikevim, tevî ku haya wî ji tehlûkeyê çêbûbû, çawa ji bextreşiyê nikarîbû wê teşxîs bike. Ji bo gelek fîlozof, dîndar, hunermend û zanyarên di heman rewşê de neçar im ku hukmê xwe yê bi heman rengî diyar bikim. Gund vala nebûn, xira bûn. Keda azad derneket holê, koletiya herî rezîl a bêefendî û bi îradeya azad hat avakirin. Artêşa bêkaran û heqdesta mirov nikaribin pê zikê xwe têr bikin ava kirin. Li şûna firewn û nemrûdên serdema pêşî yên hejmara wan ji çendsedan derbas nedibû, di bin navê çîna navîn û burokrasiyê de nemrûd û firewnên hejmara wan milyon car bi milyonan zêdetir, hatin afirandin. Li şûna xwedayekî bi tenê yê bi maske û qral xwedayan, xwe gihandin serdema bi hezaran xwedayên bêmaske û qralan. Tişta mewzûbehs ew e, çanda maddî û manewî ya bi qasî dîroka mirovatiyê kevin, dikin qurbanê qanûna kara herî zêde. Mirov dikare bipirse, mirov çawa dikare di navbera îndustriyalîzm, xwe înkarkirina bajêr û van hilweşînan de têkiliyekê deyne? Analîza me ya modernîteyê têra xwe vê têkiliyê rave dike.

Bajarê mega bi sedan bajarên ketine zikhev îfade dike. Înkar di vê rastiyê de veşartiye. Ji bo bajar manedar be, şert e ku ew bi tenê be.

Herweha divê yek kopyayê yê din nebe. Berevajî, wê çi maneya kesayeta bajaran nebe. Naxwe yê civaka li derveyî bajêr xira bike, civaka xwe jî xira dike. Mezinbûn û pirraniya hejmarê ti tiştî îfade nake. Ango nakokî bi tenê di navbera bûrjûwa û karker de nîne. Di navbera civaka êrişî wê tê kirin ku karker jî parçeyekî wê ye û saziyên yekdestdar de ye. Li Yekîtiya Sovyetê îndustriyalîzmê bi kapîtalîzma dewletê serketina xwe bi dest xist. Lê hilweşîna sosyalîzma pêkhatî mîna qesreke ji kaxizê jî heman rastiyê piştrast dike, ango piştrast dike ku îndustriyalîzm kapîtalîzm e.

Ji niha ve derketiye holê ku dinya me û civaka mirov gihiştine wê rewşê ku nikaribin barê têrkirina bajarên îndustriyalîst rakin. Ne bi tenê ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî, ji bo civak xwe û hawîrdorê rizgar bike, li dijî îndustriyalîzmê û hêzên li pişt wê kapîtalîzm û dewleta netewe, hewcedarî bi xweparastina topyekûn heye.

## 3- Îndustriyalîzm û Dewleta Netewe

Tevî ku ez timûtim tînim ziman jî dîsa divê ez diyar bikim ku têkiliya di navbera îndustriyalîzm û dewleta netewe de xwe disipêre mijara hebûnê. Sedsala 19. demek e ku herdu diyarde jî têde derketin asta xwe ya herî bilind. Îndustriyalîzm çiqasî dewleta netewe hewce bike, dewleta netewe jî ewçend pîşesaziyê hewce dike. Di bin deh sernavan de pirsgirêkên civakî yên min rêzkirin, dewleta netewe tevahiya wan ji bo civaka îndustriyalîst jî dide qebûlkirin. Marksîzmê îndustriyalîzm û dewleta netewe ne bi tenê di zikhev de analîz nekiriye, li ser navê pêşketinê weke diyardeyeke pozîtîf diyar kiriye û ev yek jî sedûpêncî salan di pêş de sedema hilweşîna sosyalîzma Sovyetê rave dike. Ji ber ku li meştela bajêr û îndustriyalîzmê gihiştiye û heta li wir çêbûye, cîhana akademiyê bêzar e ku li heqîqeteke bi vî rengî serwext bibe. Cîhaneke bê dewleta netewe û dînê îndustriyê lê nîne, nikare xeyal jî bike. Endamên ekolojiyê, tevî koka xwe ya çînî ya diyarkirî bi sînor be jî hêdî hêdî heqîqetê dibînin. Mirov dewleta netewe û îndustriyalîzmê weke kompleksekê êrişê ya eskerî, ekonomîk û îdeolojîk a hevpar û ketiye zikhev bibîne, hê rastir e. Eşkere bûye ku li hemberî vê

rastiyê, siyasetên sendîkatî û partîtiyê yên di çarçoveyeke teng de, bêmane dimînin. Weke me diyarkirî, ya hewce dike, xweparastina civak û hawîrdorê ye.

## 4- Îndustriyalîzm û Faşîzm

Dewleta netewe weke rejîma şer berhemê şert û mercên faşîzm û îndustriyalîzmê ye. Di dîroka kapîtalîzmê de kara herî zêde di serdema pîşesaziyê de hatiye bidestxistin û ji lewra jî zêdebûna şerê navxweyî bivênevê pêk tê. Eger li dijî civakê şer neyê meşandin kara zêde û sermaye nayê bi destxistin. Dewleta netewe ya serdema pîşesaziyê li gorî qanûna kara zêde, neçar e xwe weke rejîma şer bi rêxistin bike. Dewleta netewe jî dikeve û diçizire nava tevahiya çaviyên civakî û ev yek şerê navxweyî yê herî zêde li gelemperiyê belavbûye, îfade dike ku danasîna faşîzmê jî di vê çarçoveyê de ye. Di heman demê de milletperestiya zêde, îdeolojiya faşîzmê ye ku ev jî bi xwezaya şerê navxweyî re têkildar e.

Globalbûna şer di serdema îndustriyalîzmê de, di herdu Şerê Cîhanê de xwe baş ispat kiriye. Şerê navxweyî bi şerê derve tê temamkirin. Di dîrokê de şerên herî zêde yên hundir û derve di dused salên dawî yên serdema îndustriyalîzmê de pêk hatin û milletperestî weke dînê fermî fonksiyonel bû, mirov dikare vê yekê bi têkiliya di nava faşîzm û îndustriyê de rave bike. Qirkirin di vê demê de encama topyekûnbûna şeran e. Li dijî faşîzma dewleta netewe ku şêweyê şer ê serdema îndustriyalîzmê ye, pirsgirêka bingehîn a civakî ew e, divê bereyê xweparastinê yê çîn, gel û neteweyê bindest were pêşdebirin û xurtkirin.

## 5- Îndustriyalîzm, Malbat û Jin

Di serdema îndustriya kapîtalîzmê de piştî civaka gund-cotkariyê duyemîn saziya girîng a civakî ya ji hev hat belavkirin, malbat û jin e. Mijareke girîng a sosyolojiya Rojavayê dîsa ser wê girtiye jî malbat û jin e. Ev sosyolojî naxwaze xwe nêzî ravekirina pirsên çima û çawa malbat

hilweşiyaye, bike. Di serdema destpêkê de mafê koleyan ê malbatê tinebû û mirov jî dikare vê rastiyê bi vê ve girêdayî rave bike. Ji ber bêkarî û xizaniya zêde dibe, di civaka şaristaniyê de şert û mercên maddî yê malbata ji rêûresmê bi pirranî ji holê radibe. Maneya civakî ya malbatê namîne. Wexta ku ferd ji civakê tê qutkirin di vê mijarê de ya para jinê dikeve ew e, zilamê serwer şertên li gorî xwezaya jinê nînin, li ser wê bi awayekî zalimane ferz dike û di encamê de jin radestî wî dibe û jinê diavêje kolanê. Jina kole weke ku reklama wê tê kirin di vê serdemê de azadî bi dest nexistiye. Koletiya jinê ya di dema kapîtalîzmê de, koletiyeke piyaseyê ye, ewçend hûrûkûr e ku şaneyeke wê bi tenê ya nekiribin meta, nehiştine. Yek ji hêmanên herî girîng ên krîzên serdema îndustriyalîzmê, li ser jin û malbatê, diqewime. Ne bi tenê bi awayê hevduberdana zêde û zarokên kolanan, mêtinkarî û desthilatdariya sînornenas a cinsperestiya civakî jî kûrahiya vê krîz û hilweşînê nîşan didin. Malbat û jin hêmanên herî bingehîn ên jiyanê ne. Ji lewra çareseriya pirsgirêkên civakê yên jin û malbatê di asta teorîk û pratîk de hewcedarî bi hewldanên mezin heye.

## 6- Îndustriyalîzm û Ekolojî

Derketiye holê ku îndustriyalîzm nikare dewam bike, di vê yekê de ekolojî bi roleke heyatî rabûye. Ekolojîstan, kêmasî û şaşiyên analîzên sosyalîzma zanistî yan jî zanista civakî li ser pîşesaziya kapîtalîzmê, derxistine holê. Herî baş zanista ekolojiyê derxistiye holê ku kapîtalîzm nikare dewam bike. Encama mirov ji vê derxe jî ew e ku têkiliya kapîtalîzmê bi jiyanê re nîne. Eger sîstemek nahêle hawîrdor ango jiyana dest jê nabe, dewam bike, eşkere ye ku sîstemeke bi vî rengî bi ti awayî nabe were parastin. Eger îndustriyalîzm bi leza heyî dewam bike, ne bi tenê dinya me, sîstema rojê jî wê têrê neke. Di serdema îndustriya kapîtal de sîstem bi awayekî rastî bi tenê barbar nebûye, bûye Ezraîlê rastî yê jiyanê. Ti nirxa civakî nikarîbûye xwe ji îndustrîbûyînê xelas bike. Sê ‘S’yên navdar sinaet, spor û seks bûn îndustrî û ev jî nîşan dide ku civak ji aliyê exlaqî û wijdanî ve qediyaye. Di tevahiya qadên civakê de weke çanda

maddî û manewî kapîtalîstbûn, dewlet-netewebûn û îndustrîbûn li bin guhê dîwarê ekolojîk dikeve û ev ne bi tenê ji bo civaka demokratîk, ji jiyanê bi xwe re jî bangawazî ye.

## 7- Îndustriyalîzm, Zanist û Medya

Bi ekolojiyê maskeya îndustriyalîzmê ji ber rûyê wê hatiye xistin, lê zanistên din xwe nêzî analîza wê nekirine. Ji ber ku zanist weke movikekê bi ser sîstemê ve bûye. Li gorî gotina "kûçik bi xwediyê xwe nagire" yan jî "Şûr kalanê xwe nabirre" cîhana akademî û zanistê jî efendiyên xwe nadirrin û nêzî vê yekê nabin. Herçend hin caran li dijî wan bi ewtin jî wexta hestiyekî biavêjin ber wan yekser bêdeng dibin û xizmeta xwe ya ji wan re dewam dikin. Îdeayeke min heye: bi qasî ku rahibên Sumer û Misrê sîstema zordestî û mêtinkariyê bi mîtolojiyê rewa kirine, sîstema kapîtalîst jî bi 'zanistperestiyê' hatiye rewakirin. Qaşo cîhana zanist û akademiyê bahaneyên teorîk ên rewakirinê amade dike, cîhana medyayê jî bi awayekî bingehîn propgandaya wê dike. Sîstemeke ku derketiye holê ti têkiliya wê bi civak û jiyanê re nîne, mirov dikare fêhm bike ka çima medyaya hemdem pêşde dibe. Ne bi tenê medya, bi tevahî îndustriya cîhana gerdîş-şow, huner, spor û seksê bi tezên zanistê yên ji rê derxistî, yekpare dikin û pê dil û mejiyê tevahiya mirovatiyê kêlî bi kêlî didin ber topan. Ev topbaran nebe, bi amûrên zorê yên eşkere li ber çavan, sîstem nikare bê dewamkirin.

Hegemonya kapîtalîst hêza xwe ya bingehîn ji hegemonya xwe ya îdeolojîk digire. Medya bûye îndustrî û zanista bi ser desthilatdarî û dewleta netewe ve bûyî, sîlehên bingehîn ên vê hegemonyayê ne. Ji bo rizgariya civakê, berê pêşî hewcedarî pê heye ku li van herdu qadan şoreş bê kirin.

## C- KRÎZA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST û ÇARESERIYÊN MUHTEMEL

Teza bingehîn a parêznameya min ew e ku sîstema şaristaniya Ewrûpayê dewama sîstemên hegemonîk ên ji rêûresmê ye, û li ser hîmê kapîtalîzmê veguherî ye. Pêncsed salên dawî yên sîstema şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ya bi koka Mezopotamyayî, hin hêzên pêşeng ên xwe disipêrin cografya Ewrûpayê li ser hîmê stratejiya êriş û rizgariyê ew veguherandin sîstemeke nû ya dinyayê. Xisletên bingehîn ên ji bo tevahiya sîstemên şaristaniyan têne qebûlkirin, ji bo modernîteya Ewrûpayê jî bi heman rengî ne. Ya pêşî, reqabet û hegemonya; ya diduyan, navend-hawîrdor; ya sisiyan, konjonkturî û demên pêxîrtengiyê yên avabûnê ne. Dîsa di her sîstema şaristaniyê de hêzên hegemonîk û hêzên demokratîk-wekhevîxwaz ên di hundir de têne hewandin, di modernîteya Ewrûpayê de jî bi heman awayî ne. Nakokiya bingehîn di navbera van herdu hêzên bingehîn de ye, û her hêz di nava xwe de jî bi nakokiyên dereceya duyemîn di tevahiya dîrokê de her hebû. Ji têkoşîna di navbera wan de bi giştî hêzên hegemonîk serketî derketine.

Kapîtalîzm cara pêşî di şaristaniya Ewrûpayê de ango modernîteya wê de bûye sîstema dinyayê. Bi avakirina yekdestdariyê li ser bazirganî, fînans û pîşesaziyê, bi rêxistinkirina şêwazê dewleta netewe û domdarkirina îndustriyalîzmê, gihiştiye vê hêzê. Ji bo bibe şaristaniya navendî bi giranî xwe li Rojhilata Navîn da rûniştandin, di asta duyemîn de Çîn, Hindistan, Emerîka û Efrîka kirin mêtingeh û bi xwe ve girêdan. Sêlingên distana modernîteya Ewrûpayê xwe disipêrin wan, qabîliyetên xwe yên çareserkirina pirsgirêkên civakî yên sedema hebûna wan in, bi temamî ji dest dane.

Palpişta bingehîn a modernîte xwe disipêriyê ango kapîtalîzm, bi xwe sedema krîzê ye. Ji ber ku qanûna kara herî zêde dike bingehê xwe, pêdiviyên bingehîn ên civak û hawîrdorê û ekolojiya wê ji nedîtî ve tê, ti carî nikare ji krîzê xelas bibe. Hilberîna zêde û tinebûn her tim di zikhev de

ne. Di moderníteyê de desthilatdarî ji nû ve weke dewleta netewe bi gewde dibe, xwe li dijî civakê bi awayekî herî zêde mezin dike û xwe bi heta faşîzmê dibe û bi vî awayî sîstema wê vediguhere rejîma şerê hundir û derve ya domdar dimeşe.

Rewşa timî krîz tenê bi rewşa timî şer dikare bê dewamkirin. Şoreşa pîşesaziyê ya li nava moderníteya Ewrûpayê hat pêşdebirin, bi tenê ji sêlingan duling xwedî kirin û bi vî awayî kir ku krîz hê bêtir kûr û zêde bibe. Sîstema ku weke sê suwarên mehşerê xebitî, di derketina xwe de ji aliyê fîlozof Hobbes ve rê li ber hukmê "mirov gurê mirov e" vekir. Di pêvajoya hilweşînê de ji gurbûna hin kesên din derketin û bûn ew gurên neçar in ku çêlikên xwe bixwin. Qedandina hawîrdor û civaka exlaqî û polîtîk bi tenê mirov dikare welê şîrove bike. Krîza kapîtal a fînansê ya roja me ya îro, rewşa herî berbiçav a krîza avabûnê ya moderníteyê ye ku darîçav bûye. Çavkaniya moderníteyê DYE ye, di serî de YE bi lez global dibe û ev jî piştrast dike ku wê sîstembûna xwe ya dinyayê temam kiriye.

Di sîstema dinyayê de ya diqewime bi tenê krîza fînansê nîne; ji krîza avabûnê wêdetir rewşekê îfade dike. Ya mewzûbehs e, krîza şaristaniyê ya pênc hezar salî ye. Di fînansê de xwe nîşandana wê, çawa ku ji rastiyên civakî qut bûye û maneya xwe ji dest daye, pêkhatina cîhaneke ferazî nîşan dide. Di ti dema dîrokê de sîstemeke şêlandinê ya ferazî di vê mezinahiyê de nehatiye avakirin. Tê texmînkirin ku hecmê vê cîhana ferazî 600 triliyon dolar e. Ev rastî, bi tenê dikare di nava rewşa mezinahiya rojane û dîrokî ya sîstema şaristaniyê de pêk bê. Di krîza roja me ya îro de, ya xweser avahiya wê ya ji sê tebeqeyan e. Bi giştî şaristaniya navendî ya pênc hezar salî û bi taybetî jî şaristaniya kapîtalîst a pêncsed salî, di rewşa objektîv a krîza fînansê ya konjonkturî de di zikhev de û bi awayekî binyewî diqewime.

**a- Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê:** DYE'yê weke hêza hegemonîk a sîstemê karîbû ji krîza avabûnê xwe bi restorekirinê xelas bike. Lê belê xwe ji nava krîzê xelaskirina wê ti carî nikaribe wê bigihîne hêza wê ya hegemonîk a di sedsala 20. de gihiştibûyê. Di serî de YE û Japonya, ew ê

hegemonya xwe ji berê zêdetir bi gelek hêzan re parve bike û hewl bide dewam bike. Hegemonya DYE'yê divê bi tenê weke dewameke Împaratoriya Brîtanyayê û hevgirtiyekî stratejîk ê Ingilîstanê nemîne, di heman demê de divê rêûresma wê ya demokratîk jî dewam bike. DYE hêza xwe bi tenê ji hêmanên hegemonîk nagire, ji gelek komên cihêreng ên xwedî rêûresmên demokratîk, hêza xwe digire. Mirov dikare bibêje, DYE ji ber ku daneheva çanda maddî û manewî ya sîstema şaristaniya navendî bi awayekî serketî temsîl dike, hegemon e. Ango derfet û îmkanên wê yên xwerestorekirinê zêde ne. Şensê wê heye ku ji krîzê bi avabûneke nû derkeve, bi cîbicîkirina hêza heyî, ev yek gengaz xuya dike. Di dema restorasyonê de wê giraniya xwe bide parastina hegemonîk. Ji bilî êrişên çeperî, xwedî wê qabîliyetê nîne ku êrişeke derve ya topyekûn dewam bike.

**b- Yekîtiya Ewrûpayê:** Welatên YE'yê di sîstema şaristaniya navendî de wê weke xwediyê veguherandina kapîtalîzmê, giraniya xwe dewam bikin. Hevgirtina xwe ya stratejîk bi DYE'yê re wê dewam bikin. Lê belê welatên YE'yê divê restorasyona bingehîn û heta reformasyonê bikin. Hêzên herî zêde kapîtalîzmê, dewleta netewe û îndustriyalîzmê reforme bikin wê ji nava van welatan derkevin. Ji ber ku dîroka pêncsed salî ya modernîteyê li koma van welatan hûrûkûr pêk hat. Nexweşî di ku de be, wê di wir de bê dermankirin, bi vê sedemê wê wisa bibe. YE bi xwe di hersê lingên distanê de weke pêdiviyeke reformê û berhema wê derket holê. Di rewşa berçav a Yekîtiya Ewrûpayê de bi sînor be jî kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustriyalîzm wê bi aliyê sosyalîzm, demokrasî û hawîrdorparêziyê ve bêne reformkirin. Gavên têne avêtin her biçe wê bi leztir bibin. Yekîtiya Ewrûpayê di cîhana ragihandinê de weke hêza herî dikare bibihîse û bizane, gelekî serwext e, û haya xwe jê heye ku bêyî van reforman nikare weke berê modernîteyê dewam bike. Jixwe ji tecrûbeya xwe ya pêncsed salî ya modernîteyê gelek tiştan hînbûye. Naxwe, îhtîmaleke xurt e, DYE bi restorasyonê, YE jî bi reformasyonê bi hev re ji krîza sîstemîk derkevin. Mirov nikare gavavêtineke nû di warê sîstemê de ji YE'yê bipê. Ev zêde li cih û rast nîne. Di mijara sîstema nû de di warê

zanista nû û gavavêtina felsefî de wê karibe bi roleke navendî ya hînker û dest jê nabe, rabe. Lê di nava tevger û hêzên muhtemel ên sîstema nû de wê bi roleke bi sînor bimîne û bi roleke sereke ranebe.

**c- Japonya:** Yekemîn hevgirtiyê hegemonya DYE'yê li Asya Dûr Japonya, ji wan hêzan e ku wê ji krîza avabûnê herî zêde bi tesîr bibe. Dîsa ji wan hêzan e ku wê di reformasyon û restorasyonê de herî zêde zehmetiyê bikişîne. Ji ber ku xisletên xwe yên gelekî muhafezekar hene. Di her şert û mercî de wê hevgirtina xwe ya bi DYE'yê re dewam bike. Koreya Başûr wê rola xwe ya Japonya piçûk dewam bike.

**d- Çîn:** Xwediyê yek ji navendên şaristaniya navendî ya kevin a Asya Rojhilat Çîn, bi sentezkirina lîberalîzm û sosyalîzma pêkhatî hewl dide ezmûneke kapîtalîzmeke xweser, dewleta netewe û îndustriyalîzmê pêk bîne. Mirov nikare jê hêvî bike ku ji modernîteya navend Ewrûpayê pêkhatineke cihê, bi cih bîne. Berevajî vê, wê hewl bide di şeweyê wê yê herî paşverû de ku em dikarin jê re şêweyê elman (prûsyayî) bibêjin, jêhatî bibe. Weke ku tê îdeakirin, mirov nikare li bendê be ku mîna hêzeke nû ya hegemonîk a navendî şûna DYE'yê bigire. Mirov dikare jê reformeke kapîtalîst a bi sînor ku jê re lîberalbûn tê gotin, bipê. Ew ê dewletdariya netewe û îndustriyalîzmê bi awayekî herî hişk û çor dewam bike. Ji ber ku wekî din nikare barê kapîtalîzmê rake û dewam bike. Heye ku di warê sosyalîzma demokratîk de veguhere û ev yek bikeve rojeva wê. Wexta ku krîza avabûnê ya kapîtalîzmê kûr bû, mirov dikare pêşbîniya vê îhtîmalê bike. Mirov dikare Vîetnam û Koreya Bakur weke Çîneke piçûk bibîne.

**e- Hindistan:** Welatên mîna Hindistan, Rûsya û Brezîlyayê yên nikarîbûn bi temamî bi sîstemeke hegemonîk re bibin yek, lê dîsa nikarîbûn bi xwe bibin navendeke serbixwe, di demeke dirêj de îhtîmaleke zehmet e ku ji vê statuya xwe bibihurin. Ya rastî, ya pêk tînin modernîteya kapîtalîst e. Heye ku weke Çînê hewl bidin biseridin. Qabîliyeta wan a pêkanîna sîstemeke nû û xweser nîne. Rûsyayê di dema sosyalîzma pêkhatî de ev ceriband û piştî heftê salan rewşa wê ji modernîteya

kapîtalîst wêdetir, ti encam neda. Li Hindistanê dibe ku rêûresmên demokratîk derkevin pêş. Çarenûsa Brezîlyayê mirov dikare bi gavavêtinên demokratîk ên Emerîkaya Başûr ve girê bide.

**f- Emerîkaya Başûr:** Emerîkaya Başûr di dema krîza avabûnê de dikare gavavêtinên demokratîk ên xweser biavêje. Lê belê li van welatan hebûna avahiyên bi hêz ên olîgarşîk, dikare gavavêtinên bi vî rengî asteng bike û heta dikare berevajî jî bike. Herweha ji bo gavavêtinên demokratîk zemînê teorîk û pratîk têra xwe bi pêş neketiye. Tevî ku welatên Emerîkaya Başûr ji koma wan welatan in ku dikarin herî zêde li ber hegemonya DYE'yê rabin, zehmet xuya dike ku sîstemeke xweser a sosyalîst-demokratîk pêk bînin. Ji bo giştîkirina Kubayê, divê şerekî bi DYE'yê re li ber çav bigirin, lê îhtîmaleke kêm e ku karibin vê bikin. Ji ber ku bi serê xwe hêza wan têra vê yekê nake. Sedema qelsiyê, jariyên bûrjûwa piçûk in ku di asta pêşengiya hêzên demokratîk de ye. Lê dîsa jî di lêgerîna sîstema sosyalîst-demokratîk de Emerîka Başûr bi hêzên xwedî herî îdeal, weke laboratuwareke zindî xuya dike.

**g- Efrîka:** Efrîka hê jî hêza wê gelekî bi sînor e ku karibe li ser navê xwe gotinekê bibêje. Di pêvajoya derketina ji mêtingeriya klasîk û qebîlegiriyê de ye. Wer xuya dike ku çarenûsa wê bi çarenûsa dinyayê ve girêdayî ye. Kîjan xweda yan jî hêza gelparêz hukim dike, ew li gorî wê dimeşe. Mirov nikare li bendê be ku weke Emerîka Başûr bibe xwedî ezmûnên laboratuwareke civakî. Ya rastî mirov wê weke dayikeke hêviyê dide bibîne, zêdetir di cih de ye.

**h- Rojhilata Navîn:** Eger mirov Rojhilata Navîn ne weke koma welatan, weke herêma çandeke qedîm bibîne, ev yek dikare encamên manedar bide. Ma ne hêza nûnerî û orjînaliya çanda Rojhilat dike. Ya rastî zemînê wê ye. Çar hezar û pêncsed salan hêza gemonîk a şaristaniya navendî ye. Xwediyê neolîtîka deh hezar salî ye. Dîrokeke bi vî rengî herçiqasî bûbe hewcedarê şaristaniya Ewrûpayê –ew Ewrûpaya ji wê girtiye- divê mirov ne li bendê be ku hema biqede. Modernîteya Ewrûpayê

di dused salên dawî de giraniya xwe daye ser Rojhilata Navîn. Ewrûpayê karîbû moderníteya xwe bi tevahiya dinyayê bide qebûlkirin. Di roja me ya îro de çawa ku bi awayekî gurrûgeş li tevahiya dinyayê pêk tê, mirov bi heman rengî nikare bibêje li Rojhilata Navîn bi temamî bi ser ketiye. Ne ku hêzên xurt ên dewletan li hemberî Ewrûpayê hene, zehmetiyê dikişîne. Eger hêzên bi vî rengî hebûna wê karê wê hêsan bûya. Ya li ber xwe dide û têk naçe, rêûresma çandê ye ku dîtina wê zehmet e. Kesên xwe nûnerên hemdem ên herêmê dihesibînin bixwazin jî weke çandên din yên ku li deverên cuda yên dinyayê xwe teslîmî çanda Ewrûpayê dikin, ev çand wê xwe teslîm neke, ji ber ku teslîmbûnê red dike. Ev redkirin ji hêza temsîlê wêdetir ji hêza rêûresmê tê. Lê ev rêûresm, ne weke Îslama radîkal ne jî weke sosyalîzma pêkhatî, xwedî îfade ne. Herweha kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustriyalîzma moderníteyê di wê qabîliyetê de nînin bi rêûresmê re pev bikelin û bi yek bin. Ya diqewime rewşeke tîpîk a kaotîk e.

Di dîrokê de cara pêşî senteza Rojhilat-Rojava bi Skenderê Mezin pêk hat. Mirov dikare bibêje vê yekê bi awayekî serketî rêûresma pêncsed salî temsîl kir. Rêûresma Helenîstîk weke çandeke serketî bandor li tevahiya şaristaniyên piştî xwe kir. Şûn û şopên mezin di nava çanda Mûsewî, Xirîstiyan, Islam û Hindê de hişt. Zanîbû bibe hevîrê bingeh ê moderníteya Rojava.

Dema, jê re Seferên Xaçperestan tê gotin (1100-1400), prenstî û qraltiyên Rojava weke Ewrûpa (pêngava Skender di bingehê xwe de xwe disipêre çanda bajêr û çanda qebîleyan a Balkanan), kengî weke hêzên serdemê yên gav ber bi mezinbûnê avêtin û giraniya xwe dan ser Rojhilata Navîn, nedihat payîn ku heman serketinê bi dest bixin. Ji ber ku weke çanda maddî û manewî cîhana pişta xwe dabûnê, di her warî de ji Rojhilata Navîn zêdetir paşvemayî bû. Lê ji vê çandê ya ji wan re hewce dikir û pêdiviya wan pê hebû, karîbûn bigirtana. Ev jî bi awayekî serketî kirin û şaristaniya xwe bi vê çanda cihê xwe girtî stran û mezin kirin.

Êrişa dused salên dawî ya Rojava dibe ser Rojhilata Navîn (Napolyon dabû destpêkirin, Brîtanyayê pêşde bir û DYE dewam dike) hê jî dom dike. Ev êriş nexasim di roja me ya îro de ji Afganistanê heta bi Fasê, ji Qafqasan

heta bi Nava Efrîkayê li gelek herêman weke şerên sar û germ tê dewamkirin. Ya diqewime rewşa herî qels a sîstemê ye. Ya rastî, xeleka herî qels a modernîteya Rojava, Rojhilata Navîn a ji rêûresmê ye. Di dused salên dawî de hewl dan sêlingên distanê bidin rûniştandin, lê van hewldanên wan ji kûrkirina kaosê pêve bi roleke din ranebûn.

Hevkarên modernîteyê yên bi Îslamê cîlakirî, çi yên radîkal çi jî yên nerm, di rewşa kaotîk de bûn serê biskê. Ne weke Îslam ne jî bi awayekî din kapasîteya wan a bibin sîstem nîne. Tevî ku li herêmê ji anarşî û kaosê wêdetir rewşek heye, mirov nikare behsa gavavêtinên serketî bike. Ya mirov dikare behsa wê bike û bibêje ew e, rewşa kaotîk her dikele. Her kel di wê rewşê de ye ku xusûsên nû pêk bîne û tevlî xwe bike. Di encama vê kelê de îhtîmalek heye derkeve holê, ew jî dibe ku sentezeke Rojhilat-Rojava be. Ne Rojhilat dikare cinsekî ji şaristaniyên xwe yên kevin ji nû ve zindî bike, ne jî Rojava bi awayekî yekalî dikare modernîteya xwe enjekte bike. Xweseriya senteza pêk bê, wê qabîliyeta bersivdana pirsgirêkên civakî ya tevgerên rêxistinî û avahiyên zanistî diyar bike.

Aliyên mijarê di gavavêtinê de wê hevdu înkar nekin, ev yek îhtîmaleke qels e. Têra xwe eşkere bûye û derketiye holê ku gavavêtineke nû wê bi zanista oryantalîzma Rojava pêk neyê. Zanista xwezaya civakî ya Rojhilat bi tenê li benda pêşengên xwe ye. Gavavêtina tê xwestin, bi hilberîna vê zanistê, bi rêxistinkirin, bi tevgerkirin û civakbûna wî, dikare pêk bê. Beşa ji niha û pêve wê îhtîmala vê çareserî û gavavêtinê lêkole û guftûgo bike.

# Beşê Şeşan:

# DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE KRÎZ Û ÇARESERIYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

## A- LI ROJHILATA NAVÎN RAST PÊNASEKIRINA JIYANÊ

Wezîfeya bingehîn a zanista civakî rast pênasekirina jiyanê ye. Ji rahibên Sumer û Misriyan heta bi zanyarên civaknas ên pozîtîvîst ên îddîa dikin ku bi karê zanistê radibin, tevî ku maneya jiyana civakî pênase nekirine, li şûna vê wezîfeya herî bingehîn, îfadeyên mîtolojîk ên berevajî û mirovan korfêhmî dikin pêşdebirin. Ma ne jiyan heta di çarçoveya civakî de neyê pênasekirin, mirov nikare behsa zanista civakî bike. Tiştekî neyê pênasekirin zanista wî jî nabe ku were pêşdebirin. Bêguman ev rewş jî di sîstemên şaristaniyan de bi avakirina çeloxwarî ya heqîqetê re têkildar e. Di sîstemên şaristaniyan de ji kêliyên destpêkê heta roja me ya îro, heqîqeta jiyana civakî nehatiye eşkerekirin û tevî vê yekê bi kategoriyên mîtolojî, dînî, felsefî û zanistî bi zêdeyî hatiye çeloxwarîkirin û bi şêweyên çewt hatiye avakirin û vegotina wê hatiye amadekirin. Herweha, ev vegotin bi huneran hatine cîlakirin. Çanda maddî ya şaristaniyê bi çanda wê ya manewî re dixin nava têkiliyeke diyalektîkî, bi vegotina dîrokê ya tê zanîn an jî ji bo zanîna wê destûr tê dayîn, di çarçoveya xwestek, bawerî û berjewendiyên xwedayên bi maske û bê maske de, şêwazekî jiyanê bi

evdan dan qebûlkirin. Herçiqasî ev şêwazê avakirina jiyana hegamonîk û awayê fêrkirina wê li nerazîbûn û berxwedanên bê hed û hesab ên zanyarî, tevger û koman, rast hatibe jî dîsa karîbûye hebûna xwe dewam bike.

Min hewl da di beşên cûrbicûr ê parêznameya xwe de, nexasim jî di beşên bi azadiyê re têkildar de bi giştî jiyan, bi taybetî jî jiyana civakî ya mirov, pênase bikim. Li bin rohniya vê bibîrxistinê, li gorî min careke din hewce bû ku der barê jiyanê de pênaseyeke xas bikim. Nemaze li Rojhilata Navîn qirkirin, tevkujî û reşkujiyên rojane bi serê jiyanê de tên, min neçar dikin ku ez der barê jiyanê de pênaseyeke asta wê pêşketî û hê bi kûrahî were fêhmkirin, bikim.

Li gorî min zirara herî mezin a kapîtalîzmê ew e, kiriye ku hema mirov nikaribe pênaseya jiyanê bike. Ji vê jî wêdetir, bêbextî û xiyaneta herî mezin bi têkiliya jiyanê ya bi civak û hawîrdorê re kiriye. Hemin di vê de sîstema şaristaniyê ya li pişta wê, bi qasî wê berpirsiyar e. Tê gotin em di dema herî bi hêz a zanist û ragihadinê de ne. Lê tevî vê pêşketina awarte ya zanistê, gelekî seyr e ku zanist hê jî nikare jiyan û çarçoveya wê ya civakî pênase bike. Naxwe divê mirov bipirse: zanista çi û zanist ji bo kê? Çiqasî bersiva van pirsan were dayîn, ewqasî wê baş were fêhmkirin ka çima zanyarên civakî bersivê nadin pirsa bingehîn a weke "Jiyan çi ye û têkiliya wê bi civakê re çawa ye?" Dibe ku ev pirs gelekî besît xuya bikin. Lê hebûna jê re mirov tê gotin bi qasî jiyana xwe manedar e. Piştî ku ev jî nehat fêhmkirin ma çi qîmeta mirov heye! Di vê rewşê de belkî veguhere mexlûqekî ku ji heywanekî, heta ji jiyana nebatekê bêqîmetir be. Mirovatiyeke maneya xwe, heqîqeta xwe nizanibe yan nîne yan jî hebe jî bi awayekî herî rezîl û herî hov heye.

## a- Jiyan

Belkî jî mirov nikare jiyanê pênase bike; ya rastî mirov bi awayekî îzafî dikare his bike, hinekî fêhm bike. Eger pêşketina beridînê rast be jî şîroveya beridînê ya Darwînîst ji diyarkirina ravekirina heqîqetê ya pêşketina cureyan û jiyanê dûr e. Sê mîlyar sal berê li nava okyanûsê ji

şaneyeke hê nebûye zindî heta mirovê roja me ya îro, jiyana insên bi awayekî zincîrwarî were şopandin jî pirr kêm dikare di manedana jiyanê de bi kêr bê. Zanist niha di pêkhatina jêr perçikên atomê de li sirrên jiyanê digere. Wer xuya ye ku bi vê rêbazê ravekirineke bi sînor a jiyanê wê bê kirin û jê wêdetir neçe. Ji sedî sed têkiliya jiyanê bi van vegotinan re heye. Lê ev, pirsgirêkê tam çareser nakin. Mirov jiyanê bi mirinê re bide berhevdu jî ji bo maneya wê têrê nake. Ango mirov bibêje "Jiyan beriya mirinê ye" ev jî nabe şêwazekî tatmînkar ê ravekirinê. Ya ji vê rasttir ew e, jiyan bi tenê bi mirinê mumkîn dibe. Ez dizanim jiyaneke bêmirin, wê nebe. Lê em ji zanîna maneya mirinê jî gelekî dûr in. Mirin jî herî kêm bi qasî jiyanê nayê pênasekirin. Belkî jî ev encameke îzafî ya jiyana me ye; belkî jî îmkaneke jiyanê, şêwazekî pêk hatinê ye. Tirsa ji mirinê, weke ez ê piştre bi berfirehî pênase bikim, têkiliyeke civakî ye. Mirin belkî jî mîna tiştekî ye ku bi tevahî ji vê tirsê pêk tê.

Ez dualîteya îdealîzm-materyalîzmê hevgirtî û raveker nabînim. Ev dualîteya xwedî karektera şaristanî, di warê ravekirina jiyanê de ti qîmeta xwe nîne. Ji bo şîroveya ez dixwazim pêş bixim, dibêjim, têkiliya vê dualîteyê bi heqîqetê re bi sînor e. Bi heman awayî têgînên bi can û bê can jî di warê jiyanê de ji ravekirinê dûr in.

**Heqîqet 1:** Ji bilî mirovê hewl dide li xwe serwext bibe, her bi can û bêcan bi tenê dikarin kêliyên xwe bijîn. Berxika gurr pê girtiye û galaksiya kuna reş ew daqurtandiye belkî jî heman çarenûsa gerdûnî parve dikin. Ev bi xwe jî ji bo serwextbûna li jiyanê bi tenê di buhaya sirrekê de ye.

**Heqîqet 2:** Ruhberê xwe ji bo çêlika xwe parçe dike û perçikên jêr atoman ên bi lezeke dûrî aqilan pêkhatinên diyalektîkî bi cih tînin, bi heman pêdiviya rêzika gerdûnî dimeşin.

**Heqîqet 3:** Di civaka mirovî de ev rêzika gerdûnî gihiştiye wê rewşê, dikare xwe bixe ber lêpirsînê: Ez kî me? Bi vê pirsê rêzika gerdûnî cara pêşî hewl dide xwe bîne ziman.

**Heqîqet 4:** Bersiva pirsa "Ez kî me?" dibe ku armanca dawî ya gerdûnê be.

**Heqîqet 5:** Tevahiya jiyana gerdûnî ya bi can-bêcan belkî jî ji bo xwe gihandina pirsa "Ez kî me?" ye.

**Heqîqet 6:** Dibe ku armanca dawî ev bersiv be "Ez ez im, ez gerdûn im, ez zeman û mekan im ku pêşî û paşiya wî, nêz û dûrê wî nîne."

**Heqîqet 7:** Fenafîllah, Nîrwana, Enel-Heq zanyariyên wan ên mutleq dibe ku armanca bingehîn a jiyana civakî ya mirovî rave kiribin an jî dikarin eleqeya wî bi jiyana civakî re deynin holê.

Destnîşankirina van heft heqîqetan, nayê wê maneyê ku min jiyan pênase kir. Qada wê ya pêwendîdar lêdikolim, dixwazim lêbikolim. Jiyan dema mirov dijî nayê fêhmkirin. Ji vî alî ve di navbera mane û jiyanê de nakokiyek heye. Wexta aşiqek bi maşûqê re ye, ev di heman demê de ew nuqte ye ku mane lê qediyaye. Mutleq fêhmkirin bi tenêbûneke mutleq ango bi bêmaşûqî mumkîn dibe. Gotina dibêje; yan ji yarê yan ji serî, ne di maneyeke fizîkî de, lê di maneya metafizîk de dixwaze vê rastiyê îfade bike. Ji bo mirov karibe xwe li tenêtiya mutleq ragire, divê mirov ji bo fêhmkirina wê mahir be, naxwe nabe. Tenêtiya mutleq tenê û bi tenê wexta gihişt hêza maneyê ango wexta ji têkiliya hêza maddî derket, dikare pêk bê. Dualîteya hebûn-tinebûnê dişibe dualîteya mane-maddeyê. Herdu dualîte jî muceredkirî ne, û di rastiyê de naqewimin. Jiyan bi îhtîmaleke mezin qabîliyeta bê dawî ya tertîpkirinê ya van dualîteyan e. Navberên tertîpkirinê weke kêliyên kaosê mîna mirinê xuya bikin jî ji bo pêkhatina jiyanê, weke mecbûrî xuya dikin.

Bi vê analîza kurt, min hewl da bi sînor be jî bînim ziman ka çima jiyan tam nabe were pênasekirin: pênaseya mutleq a jiyanê tenêtiya mutleq, hîçtiyê, bêmaddetiyê hewce dike ku ev jî bi tenê di asteke muceredkirî de dimîne, ji lewra çi jiyan û çi jî xwe gihandina maneya wê bi tenê bi dualîte û îzafî pêk tê.

## b- Jiyana Civakî

Jiyana civakî tevî ku têgîneke gelekî besît e, weke têgîna bingehîn a tevahiya zanistan têgînek e ku divê were diyarkirin. Tevî ku gelekî tê

bikaranîn, berevajî yeqînan, têgînek e ku mirov hê negihiştiye maneya wê. Em nizanin jiyana civakî çi ye. Eger me zanîbûya, em ê bibûna parêzvanên jiyana xwe ya civakî ya di bin sîstemên hegemonîk de hatiye parçeparçekirin. Di jiyana civakî de ne zanyarî, cehalet serwer e. Jixwe di qutbê dijber ê jiyana hegemonîk de jiyaneke cahilane heye. Eger perdeyên cehaletê bi ser jiyanên civakî de nekin, sîstemên hegemonîk nikarin dewam bikin.

Ez ê karektera îzafî ya jiyanê li ber çavan bigirim û hewl bidim jiyana civakî pênase bikim. Berê pêşî divê ez bibêjim, jiyanên li her deverê wekhev, bê sînor, monoton û yeknesak nînin. Wexta jiyana îzafî tê gotin, jiyaneke bi tenê û tek tê îfadekirin. Tekîtî weke tê zanîn û weke divê bê zanîn, gerdûnîtiyê red nake. Ne bi tenê tekîtî, ne jî bi tenê gerdûnîtî heye. Tekîtî-gerdûnîtî dualîteyek e ku bi qasî mane-maddeyê têne qebûlkirin. Tekîtî nebe gerdûnîtî pêk nayê. Her tek bêyî gerdûnî nikare bijî. Ji bo baştir were fêhmkirin, dikarim mînakekê bidim: bi sedan gulên cuda yek bi yek, tek in. Lê belê ji bo ev tevahiya cureyên gulan weke gul bêne binavkirin, aliyekî wan ê hevpar heye. Ev aliyê wan ê hevpar gerdûnîtiya wan îfade dike. Di tevahiya cûrbicûrkirina gerdûnê de ev rêzik li ser kar e.

Min di beşên pêwendîdar ê parêznameya xwe de hewl dabû jiyana civakî di nava dîrok û cûrbicûriya wê de pêşkêş bikim, lewma ez ê dubare nekim, bi tenê bi bîr dixim. Bi awayekî çîrokwarî di vegotina serhatiya mirovê difikire ango Homo Sapiens de para rastiyê gelek heye û bi giştî ev vegotina tê qebûlkirin bi kurtî weha ye; tê texmînkirin ku beriya dused hezar salan li rojhilatê Efrîkayê jiyaye, piştre ji dayikekê bûye û tê texmînkirin ku beriya pêncî hezar salî jî gihiştiye zimanê sembolan, bi xelasbûna dema dawî ya qeşayî re ango beriya bîst hezar salan li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê ji civaka berî cotkariyê derdikeve û texmînî ji beriya panzdeh hezar salî û pêve nîzamekî jiyana civakî yê cotkariya qebîleyî û nêçîrvan-berhevkirina nebat-gîhayan di zikhev de pêkaniye. Li vî şêwazê jiyanê yê weke civaka gund-cotkariyê pêş ket, dema pênc hezar salî ya şaristaniya navendî jî zêde bû. Civaka gund-cotkariyê û civaka bajar-bazirgan-zenaet û pîşesaziyê weke dualîteyekê heta roja me ya îro

min behsa wê kiribû û min hewl dabû bi xetên stûr an jî weke dem-dewranan pêşketina jiyaneke hegemonîk a bi bandor, vebêjim. Min di beşa berî vê de behsa qonaxa Ewrûpa ya pêncsed salên dawî ya vê çanda hegemonîk kiribû. Eşkere ye ku ji aliyê pêkhatin û gihiştina wê, heta ji aliyê pêxîrtengiyên wê yên avabûnê, weke bingeh li ser vê çandê mohra civaka Rojhilata Navîn heye. Civak û çanda min hewl da maneya wê rave bikim, ev e. Tekîtiyên wê gelek bin û yek ji tekîtiyên wê yên girîng moderníteya Ewrûpayê pêk bîne jî ji aliyê dem û mekan ve kategorîkirin û bi muceredkirineke teka tekîtiyan her tim mumkîn e.

Rewşa civakê weke tekîtiyekê jiyana cinsê mirov diyar dike. Tekîtî û cudahiya di navbera jiyana mirovê li Rojhilata Navîn û jiyana mirovê li Efrîkayê de, ev rewşa civakê diyar dike. Nijad an jî xisletên din ên fizîkî diyarker nînin. Eger ferdê mirov ê bêcivak zû nemire, wê nebe mirovê zane yê bi tenê, wê bibe cureyekî bi zimanê îşaretan dipeyive yê nêzî heywanan. Mirovê bêcivak antî-mirov e. Avêtina mirovekî derveyî civakê, mirov bêcivak were hiştin ji bo mirovekî cezayê herî mezin e. Mirov tevahiya hêza xwe ji civakê digire. Asta herî pêşketî ya zanistan û zanyaran bi asta civakê ve girêdayî ye. Mirov jiyana civakî weke fenomen û çendayetiyên besît ên fizîkî bihesibîne, ev xiyaneta herî mezin e ku pozîtîvîzmê bi mirov re kiriye. Gihiştina asta civaka mirov bi tenê weke pêngaveke gerdûnî dikare manedar bibe.

Em xisletên karekterîstîk ên bingehîn ên jiyana civakî weke pêngava gerdûnî rêz bikin.

**1-** Beriya her tiştî divê em weke dîrok li ser civakê rawestin. Komên mirovan bi mîlyonan salan, li mekanên zor û zehmet di encama hewldan-têkoşînên mezin, bi êş û elem de komên tek ên pêşketî pêk anîne. Hin mekan û dem ji bo civakê ji qonaxekê çipî qonaxeke din bikin, bi roleke diyarker rabûne.

**2-** Civak weke dîrok, jê re asteke mejî ya pêşketî divê. Asta mejiyê cinsê mirov civakbûna wî diyar kiriye. Civakbûnê jî ev asta mejî di rewşa

zêhniyetê de neçarî xebitandin û pêşketinê kiriye. Xwezaya civakî avahiyeke nerm a asta zêhniyeta wê pêşketî, pêşkêş dike.

**3-** Ziman ne bi tenê amûrê zêhniyeta civakî ye, di heman demê de hêmanekî avakirinê ye jî. Ziman yek ji xisletên bingehîn e ku pê civak heye. Weke amûrê mejiyê kolektîf, nermbûna xwezaya civakî pirr bi lez pêşde dibe.

**4-** Şoreşa cotkariyê di çanda maddî û manewî ya civakê de şoreşa herî bi kok a dîrokê ye. Civaka mirov weke bingeh li dora cotkariyê şikil girtiye. Mirov li civakeke bêcotkarî nikare bifikire. Cotkarî ne bi tenê pirsgirêka debarê çareser dike; di serî de mejî, ziman, şênî, rêveberî, bergirî, parastin, cihwarbûn, dîn, teknîk, lixwekirin û avahiya etnîk, di amûrên çandî ên bingehîn ên maddî û manewî de rê li ber veguherîn û pêşketinên bi kok vedike.

**5-** Ji ber ku jin di domdarkirina civakî de xwediyê hewldana zêde ye, li gorî mêr di civakbûnê de bi rola sereke radibe. Anîn, mezinkirin û parastina zarokan dihêle ku civakbûn li ser rêya dayiktiyê pêş bikeve. Civak bi giranî nasnameya jin-dayikê hildigire. Di bingehê ziman û dîn de hebûna hêmanên mêtiyê, vê rastiyê piştrast dike. Di civaka gund-cotkariyê de deng û nasnameya jinê hêza xwe diparêze û dewam dike.

**6-** Xwezaya civakî bi xwe exlaqî û polîtîk e. Exlaq nîzama rêzikên civakê, polîtîka jî rêveberiya wê diyar dike. Exlaq nîzam û mayîndebûna civakê, polîtîka jî pêşketina wê ya afirîner pêk tîne. Mirov nikare li civakeke bêexlaq û bêpolîtîka bifikire. Dejenerebûna civakê di asta exlaqî û polîtîk de bi pêşketina her cure koletî û newekheviyê re di zikhev de pêk tê.

### c- Hiyerarşiya Civakî û Dewlet

Otorîteya civakî ya bi awayekî organîk li dora jinê pêk hatî bi rêûresma civaka nêçîrvan bi zordarî û hîleyan bi hêz bûye û kengî ji aliyê mêr ve hatiye bidestxistin vê yekê nîzama bingehê hiyerarşiyê pêk aniye. Nîzama hiyerarşîk zordarî û hîleyê bi xwe re tîne nava jiyana civakî. Weke bingeh nûnerê hîlekariyê rahib, yê zordariyê esker û pîremêrê xwedî tecrubeya civakî hiyerarşiyê temsîl dikin. Bi jin-dayikê re dema têkoşîna civakî ya herî mezin dest pê dike. Di dema proto-şaristaniyê de otorîte bi giranî dikeve destê hiyerarşiya mêr. Dewlet bi sazîbûna hiyerarşiyê di nava rêveberiya civaka bajêr de dest pê dike. Di civakê de bi pêşketina beşên hiyerarşîk û dewletdar re nîzama exlaqî û polîtîk jî xira dibe. Bûyerên dijberê civakê bi lez dibin. Em dikarin van bûyeran welê rêz bikin:

**1- Civaka Bajêr:** Civaka bajar bi civaka cotkar re li ser bingehê bazirganî û zenaetkariyê kar û xebatê dabeş dike, di encama vê de rê li ber pêşketineke têkel a civakî vedibe, bi vî awayî beşê hiyerarşîk û dewletdar li jor xwe bi sazî dikin û bûyerên antî-civakî bi bajar re bi lez dibin. Di bingehê pirsgirêk û nakokiyên civakî de ev antî-civakbûn heye.

**2- Civaka Bi Çîn:** Kengî hiyerarşî û dewlet sazîbûna wan zêde û belav dibe, ev yek rê li ber dubeşbûna civakê vedike. Karekterê çînîbûnê hêmanekî biyanîkirinê yê xwezaya civakî ye. Li dijî civakê di her astê de êrişên îdeolojîk û rêxistinî bi tevger dike û pêşde dibe. Hiyerarşî û dewlet li şûna civaka xwezayî civaka çînî ya lihevçêkirî ya derew û zordariya wê pêşdebirî, bi cih dikin. Di rêûresma mîtolojîk, dînî, felsefî û zanistî de li dijî civaka exlaqî û polîtîk vegotinên berevajîker û reşker pêşxistin.

**3- Civaka Mêtinkar:** Saziya hiyerarşî û dewletê weke bingeh li ser nirxên danehevî yên civakan ava dibe. Pêdiviya bi rêveberiyê hinekî tê hiskirin, bi pêdiviya bergirî û parastinê re dike yek û di berdêla vê de desteserkirina nirxên civakî ya her diçe zêde bêdad dibe, pêk tîne. Di vê de hem amûrên zorê û hem jî yên îdeolojîk bi hev re li ser kar in. Civakên

mêtinkar li gorî şêwe û qadên mêtingehan weke bazirganî, sinaî û fînansî dabeş dibin.

**4- Civaka Şerker:** Ji wan şêweyan re tê gotin li şûna razîkirinê, bi darê zorê nirxê civakî desteser dikin. Şer di jiyana civakî de şêweyê herî hov û dijwar ê xerîbketinê ye; xwezaya civakî bi xedarî birîndar û seqet dike. Di vê rewşê de refleksên bergirî û parastinê yên civakan bi pêş dikevin û li dijî şerê xerîbxistinê dibe şêweyê şerê xweparastinê yê bergiriyê li hebûna civakî dike.

## d- Nasnameya Civakî

Tekîtiyên civakî xwedî terkîbeke dewlemend in. Tekîtî di nava xwe de gelek kategoriyên tek ê tekîtiyan pêk tînin. Hewldana ji bo mirov civakan weke tek nasnameyekê bibîne, çavkaniya xwe nîzamên hiyerarşîk û dewletdar in. Têgihiştina nasnameya hişk a sergirtî ji aliyê van nîzaman ve tê ferzkirin. Dewleta netewe şêweyê herî pêşketî yê van nîzaman e. Nasname formên civakî ne. Li xisletên pêşketina civakê rast tên. Bi nasnameyên din re li sentezbûnê vekirî ne. Civaka bênasname nabe. Nasname jî herî kêm bi qasî exlaq û polîtîkayê sedema hebûnê ye. Em nasnameyên civakî yên herî sereke ku xwedî gelek qadan in, dikarin weha rêz bikin:

**1- Nasnameyên Qebîle û Eşîran:** Şêweyê pêşî yê pêşketina civakan nasnameya qebîleyê ye. Zor û zehmet e ku mirov ji klanan re bibêje nasname ye. Ji ber ku klan hê li destpêka cudabûnê ye. Lê mirov dikare klanê weke şaneya dayik a tevahiya proto-nasname, pêşnasname û mîna malbata wê bibîne. Eşîr weke qebîle û yekîtiya qebîleyan nasnameyên herî têkûz ên jiyana civakî ne. Tevî hêzên dijberê civakê, qebîle û eşîrên qelsbûyî, bivênevê wê bi awayekî weke civaka sivîl a serdema xwe pêk bên. Ji ber ku civak çawa bê klan û malbat nikarin bibin, bê qebîle û eşîr jî nabin.

**2- Nasnameyên Qewmî:** Di tevahiya dîrokê de weke şêweyekî asta jor ê pêşketî yê eşîrên xwe spartine zimanekî hevpar û kokeke çandî, pêş ketine. Bi giranî mekanekî hevpar ji xwe re weke war û welat pêk anîne. Têgînên war û welat herî rast divê weke çandê bi mane bibin. Her civak lazim nîne bi qewm be. Di nava qewman de gelek klan, qebîle û eşîrên din û heta qewmên din dikarin bijîn. Faşîzma dewleta netewe têgihiştina nasnameya homojen ferz kiriye.

**3- Nasnameya Neteweyî:** Eger nasnameya qewm bi şêweyekî bi îstîqrar û rêveberiyeke dewamî bijî û di encamê de nasnameya çêbibe mirov dikare jê re bibêje nasnameya netewe yan jî nasnameya neteweyî. Aliyê netewe yê zêde derdikeve pêş ew e, bi îradeya xwe dikare xwe bi rê ve bibe. Dibe ku şêweyên rêveberiyê demokratîk an jî dewletdar bin. Ji tevahiya qebîle û gelên di bin rêveberiya neteweyên din de ya rastî di bin rêveberiya netewetiyên xwedî rêveberiya dewletdar de, ne netewe, belê kole tê gotin. Di civakên mêtinkar de li ser navê neteweyekî bi tenê homojenî tê pêkanîn, şens nayê dayîn ku neteweyên din û heta komên jêr wekhev û azad bijîn. Sîstemên demokratîk ji pirrnasnameyan re derfet û îmkan nas dikin û bi vê xisleta xwe ji sîstemên antî-civakî vediqetin, cihê dibin.

## e- Pîroziyên Civakî

Civak ya ku awarte, mûcîzewî û bi heybet e, bi têgîna pîroztiyê pênase dike. Ya pîroz civak bi xwe ye. Lê civak vê ne bi serwextbûneke zanistî, bi şêweyên serwextbûnê yên em ji wan re dînî û mîtolojîk dibêjin, qebûl dike. Ya rastî civak xwe pênase dike. Mirov eger pênaseya serwextbûna bi mîtolojîk û dînî û pênaseya serwextbûna bi zanistê bide berhev û qiyas bike, dikare baş jê hîn bibe. Divê mirov ji bîr neke ku di koka zanistê de mîtolojî, dîn û felsefe hene. Xebata zêhnî ya civakê çi pîroz çi jî pozîtîv be, her hewl dide xwe pênase bike. Hin ji pîroztiyên girîng ev in:

**1- Xwedatî:** Li cem hersê dînên mezin jî di îdealîzma objektîv de ya berdêla gerdûnîbûnê ye. Li cem Hegel jî ruh (Geist) e. Li cem K. Marks kominîzm, li cem milletperestan jî dewleta netewe ye.

Di zanista civakî de maneya xwedayetiyê bi nasnameya civakî ve têkildar e. Dikare di asta herî jor de bibe têgîna berdêla muceredkirina civakê. Mezinahiya Ellah li derveyî civakê ti maneya xwe nîne. Ellah bi tenê dikare bi civakê hebe. Civak çi wî weke gerdûnê qebûl dike, çi wî weke baweriyekê di hundirê xwe de xwedî dike, ti cudahiya xwe nîne. Di felsefeyê de temsîla vê yekê îdealîzma objektîv û sûbjektîv e. Di zanistê de jî bi tenê weke obje û sûbje dimîne. Bi vê rêbazê, mirov weke temsîlî dikare her tiştî weke obje û maneyê jî weke Xweda (Ellah) bibîne. Eger em bi zimanê zanistê îfade bikin, asta manedanê ya mirov li gorî asta manedana civakbûna wî ye. Hêza manedanê ya mirov bi pêşketina civakîbûna wî re diyar dibe. Manedariya ferd a ji civakê qut a ku lîberalîzma kapîtalîzmê wê ferz dike, bi temamî dereweke mîtolojîk e. Ferdê ji civakê qut, belkî karibe bi tenê bi qasî endamekî keriyê qirdik û meymûnan di warê zêhniyet û manedanê de pêş bikeve.

**2- Pêxembertî:** Duyemîn xeleka pîroztiyên civakî ye. Hewl tê dayîn bi sifetên weke kesê ji xeybê peyaman tîne û qasidê xwedê, wî pênase bikin. Bi çîna jor a rahiban re heman kategoriyê parve dike. Di felsefeyê de berdêla wê fîlozoftî, di zanistê de jî berdêla wê akademîsyen e. Rewşenbîrên di asta jor de heman kategoriyê parve dikin. Xisleta hevpar a hemûyan ew e, xwedî statuyeke welê ne, di asta herî jor de manedariya civakî eşkere û diyar dikin.

Civak di asta herî jor de vê statuya wan a manedanê dinirxîne, ji ber ku ew hebûna civakê tînin ziman. Ew neynika civakê ne, di pozîsyona wijdanê wê de ne. Di şexsê wan de civak xwe teqdîs û pîroz dike. Mirov dikare pîrozkirinê weke xwe binirxkirin, mezinkirin, manedarkirin û delalkirinê jî pênase bike.

**3- Zanyartî, Hozantî:** Di rêza sêyemîn de xelekeke pîrozbûnê ye. Bi heman kêrhatîbûn û fonksiyonê radibe. Barhilgirên gotin, mane û nirxên civakê ne. Helwesta helbestwarî û exlaqî îfade dikin. Nûnerên nirxdarên civakî yên gotin û hunerê ne. Herî zêde ew manedariya civakî dijîn û îfade dikin.

**4- Alavên Pîroz, Fetîş:** Obje û tiştên herî zêde di parastin, li ser piyanmayîn û gavavêtina civakê de kêrhatî bin, ew têne pîrozkirin. Pîroztî derbasî obje û alavan dibe, ji ber ku ji bo civakê pêdiviyeke gelekî heyatî tedarik dikin. Alavek çiqasî bi nirx be, çiqasî hatibe fetîşkirin, ewçend jî para xwe ya pîroztiyê heye. Weke mînak genim, zeytûn, mih, çêlek, hesp û hwd.

## f- Heqîqeta Civakî û Ji Destdana Wê

Xwezayên civakî aliyê wan ê zêhnî, pêşketî û nerm in. Mane barkirî ne. Bi giştî barê maneyê yê li cem candaran ji yê necandaran zêdetir e. Ji perçikê herî besît ê atomê ber bi pêkhatinên herî tevlîhev mane zêde dibe. Zêdebûna maneyê têkiliya xwe bi azadiyê re heye. Di dualîteya enerjî-maddeyê de aliyê jê re perçikê maddî yê hişk tê gotin her tim bi astengkirina maneyê berpirsiyar e. Mîna dîwar e. Dîwar, ên di nava xwe de diparêze, lê di heman demê de wan hepis dike. Di gerdûnê de ev dualîte di her diyardeyê de heye. Dîwar carnan bi temamî dibe amûrekî parastinê, carnan jî vediguhere amûrekî hepiskirin û girtîxaneyê. Beşê maddeyê timî xisleteke xwe ya bi vî rengî heye. Di xwezaya civakî de (di gerdûnê de, di maddeyê de) kombûneke gelekî pêşketî ya maneyê heye. Sîstem, avahî, endam û komên civakî bi xwe weke mane têne diyarkirin. Civakên maneya xwe herî baş tînin ziman, bi gotin û avahî dikin, weke civakên herî pêşketî têne pênasekirin. Ev, civakên asta wan a azadiyê pêşketî ne. Civakên azad ew civak in, xwe pirr baş bi mane dikin, tînin ziman, didin axaftin û li gorî pêdiviyan pirralî xwe ava dikin. Civakên ji azadiyê mehrûm û bêpar jî civakên welê ne, berevajî nikarîne zimanê xwe pêşde bibin, eşkere bidin axaftin û xwe pirralî ava bikin.

Di çarçoveya vê pênaseyê de lêkolîna tevahiya serdeman di warê pêşketina heqîqet û maneya civakî de cewherê zanista civakî ye. Ji ber ku heqîqet, di bingehê xwe de tevahiya serdeman, rewşa manedariya civakî ya di serwextbûna mirov de gihiştiyê, îfade dike. Bi rêyên mîtolojîk, dînî, felsefî, hunerî û zanistî xwe îfadekirin û ji bo xebata di vî warî de em dikarin, lêkolîna heqîqetê û anîna wê ya ziman, bibêjin. Civak bi tenê ji heqîqetan nehatine hûnandin, di heman demê de hêza diyarkirinê ne. Civaka nikaribe heqîqeta xwe diyar bike, ketiye rewşa herî giran a koletiyê, asîmîlasyon û qirkirinê. Bi awayekî maneya vê jî rewşa qutbûna ji hebûnê, û dest berdana ji rastîbûnê ye. Civakek û heta ferdek wexta heqîqeta xwe nebe, ew civak û ferd hatine bêmanekirin, bûne hebûnên welê ku nasnameya xwe ji dest dane û di nava heqîqetên sûbjeyên din de heliyane, ji vê jî wêdetir bûne hebûnên maneya xwe nemane. Di vê çarçoveyê de, di navbera mane û heqîqetê de têkiliyeke xurt heye. Mane, bi awayekî potansiyela heqîqetê ye. Ev potansiyel çiqasî were ziman, bi awayekî azad bipeyive û were avakirin wê bigihîje rewşa jê re heqîqet tê gotin.

Eger timî were gotin ‘heqîqeta di hundirê min de’ û tim bê gotin ‘zarokê di hundirê min de yê nikare bipeyive’ ev yek rewşa herî kambax û xirab a civakî û ya ferd ketiyê, îfade dike. Manedanên civakî (bi rêbazên mîtolojîk, dînî, felsefî, hunerî, zanistî) heta negihîjin heqîqetê, heta negihîjin wê qonaxê û aktîvîteyê, nikarin (ji potansiyelê ber bi entellegyayê) bi cih bên û heyatî bibin. Ev tê wê maneyê ku ji zarokatiyê xelas nabe, ji zimanê Ezop nikare bibihure û ev rewş jî xwe negihandina heqîqetê îfade dike. Rastiyên civakî yên di bin zorê de têne girtin vê rewşê gelekî dibînin. Em wexta ji aliyê heqîqetê ve li rastiya civakî binêrin, bi tenê ev rastî (xwezayên civakî, avahiyên wê) bi yek ji rêbazên heqîqetê (mîtolojîk, dînî, hunerî, felsefî û zanistî) çiqas bê ziman û aktîv bibe, ji nû ve xwe bi rêxistin û ava bike, em ê bibînin ku em karin ji civaka manedar derbasî civaka bi heqîqet bibin. Wexta ku em di çarçoveya heqîqetê de serdemên civakî lêbikolin, em dikarin van diyar bikin:

1- **Serdema Klanên Civakî:** Di vê serdemê de ji ber ku manedan hînê zêde tevlîhev nîne di komên klanan de heqîqet gelekî bi sînor, bi zimanekî

nepêşketî, carnan bi vegotinên devkî û pirranî jî bi zimanê bedenê tê îfadekirin.

**2- Serdema Civaka Gund-Cotkariyê:** Ji ber ku di mijarên bicihûwarbûn, debar, lixwekirin, zêdebûna mirovan û parastinê de şêweyekî tevlîhev ê avabûnê heye, rastiyên civakî yên kapasîteya wan ya manedanê xurtbûyî, mewzûbehs in. Di wezna kapasîteya manedanê de pêşketina serdemeke heqîqetê dest pê dike. Nexasim serdemeke heqîqetê ya mîtolojîk, dînî û hunerî li dora jin-dayikê (serdema heykelên jin-dayika qelew) pêş dikeve, bi pîroziya xwe hemûyî derdikeve ser dikê. Ziman pêş dikevin. Hêza îfadeyê ya mîtolojîk, dînî û hunerî, serdemeke ku qîmeta xwe ya orjînalbûnê zêde ye, dide destpêkirin. Serdema herî bi heybet a prehistoryayê ye. Ew serdemeke welê ye, civak cara pêşî ye ku xwe bi heqîqetên pîroz (bi rêbazên mîtolojîk, dînî, hunerî) diyar dike. Mirovatî hê jî mîrateya vê demê dixwe. Di serî de zanista tibbî û hozantiya felsefî, herdu şêweyên din ên heqîqetê di vê serdemê de hîmê xwe danîne. Hozantiya jinê û tibba wê di vê demê de weke heqîqetên bi tesîr ên demê di jiyanê de cihê xwe girtine. Ji ber ku jinê di pênc qadên girîng ên heqîqetê de hêz bi dest xistiye, xwedawendiya jinê di vê serdemê de serwer bûye. Bêguman di vê bidestxistina hêzê de pêşdebirina wê ya cotkarî û aboriya malê, bi rola sereke radibin.

**3- Serdema Bajar û Civaka Şaristaniyê:** Bi bajarbûnê re civakbûna zêde dibe weke erkekî diyalektîkî, dijberê xwe pêşde dibe. Di vê serdemê de dijberiya diyalektîk çînîbûna civakî û dewlet derxistine holê. Çînîbûn û dewletbûn weke ji rêderketina civakî di mijara heqîqeta civakî de rê li ber dabeşbûn û qelşeke mezin vekiriye. Ji ber ku dabeşbûn û qelş li ser hîmê dijberên şîddetê di xwe de dihewînin pêk tên, serdema bi şîddetê tepisandina heqîqetan jî dest pê dike. Ev rewş bi awayekî berçav xwe weke şerê heqîqetan dide der.

Maneya heqîqetê dibe çîn û dewlet û vê jî dikin cewherê dîrokê. Dîrok çawa û bi kîjan rêbazê were îfadekirin bila bê kirin, bi şêweyekî mohra çîn û dewletê hilgire, hat avakirin, nivîsandin. Rastiya civakî ango wexta qelş li

heqîqeta civakî dikeve, bingehê her cure xerîbketinê tê danîn. Bi jirêderketina maneya civakî ve girêdayî, heqîqeta xerîbketinê jî ji îfadekirina rastiyê dûr tê girtin. Heta rastiya hatiye berevajîkirin, xistine nav şêweyên îfadeyê. Bi awayekî bingehîn xerîbxistina ferdê civakî di dîrokê de xirabiya herî mezin e. Mirov dikare xerîbxistina civakî weke xiyaneta dîrokî şîrove bike. Xerîbketin di her astê de ye. Tevahiya qadên civakî yên çanda maddî û manewî digire nava xwe. Kengî xerîbketina bi kedê re bi xerîbketina zêhniyetê re dibe yek, sîstema şaristaniya hegemonîk dikare xwe dewam bike. Ango sîstema civaka çînî û dewletdar weke serdema şaristaniyê, kengî qadên civakî bi kûrahî qelişîn û xerîbketin pêk tê.

Civakbûna şaristaniyê rastiyeke welê ye, dewamî şer û dabeşbûnê ferz dike. Weke lêgerîneke kûr a heqîqetê û pevçûnê jî hebûna xwe ferz dike. Hêzên tehekumkar ên yekdestdariya zor û mêtinkariyê di destê xwe de digirin, çiqasî heqîqeta civakî bitepisînin û berevajî bikin, ewqasî civakên ji kom, ferd û gelên bindest û mêtingeh pêk tên, ava dikin. Ev beşên civakê maneya xwe ango heqîqeta xwe ji dest dane û weke keriyan têne meşandin. Beşên behsa wan tê kirin, wexta heqîqeta xwe ji dest didin, dikevin rewşekê ku mîna keriyan bêne meşandin. Dîroka şaristaniyê di çarçoveya maneyeke teng de hem weke mane hem jî weke heqîqet, dîroka avakirin û meşandina mîna keriyan e.

## g- Heqîqeta Civakî û Şêweyên Xerîbketinê

Çi di nava xwe de û çi li derveyî xwe, rastiya civakî qadê ji zordestî û mêtinkariyê re nehêle, mirov hingê dikare behsa pêkhatina azad a mane û heqîqeta rastiya civakî bike. Di vê rewşê de mane û heqîqet azad e. Azadbûn bi mane û bi heqîqetê mumkîn e. Ya/yê azadiya wî/wê nebe, nasnameya wî/wê ango mane û heqîqeta wî/wê nabe.

Civakên dikevin bin tehlûkeya tinebûn, xela, heywanên dirrinde, zehmetiyên avhewayê û şewbê yan jî bi hebên zêde yên fêkiyan, mêwe, heywanên nêçîrê, avhewaya xweş, rewşên têkûz û ewlehiyê bikevin nava

bereketa ji ber şert û mercên xwezayî pêk tên û civakên li ser wan mêtinkarî û zordestî têne meşandin, şêweyên heqîqetên wan cuda pêk tên. Em dikarin van şêweyên heqîqetan weha bi xalên sereke rêz bikin:

**1-** Di şert û mercên hê tehekuma civakî pêşneketî de şêweyên sereke yên heqîqetê mîtolojî, dîn û huner in. Di diyarkirina heqîqetê de para zanist û felsefeyê bi sînor e. Şêweyê îfadeyê yê giraniya xwe heye, mîtolojî ye. Mîtolojî weke tê zanîn vegotinên bi şêweyê çîrok, çîvanok, efsane û destanî ne. Di mîtolojiyan de mutleq heqîqetek veşartî ye. Ya rastî, mîtolojî şêweyekî vegotina heqîqetê ye. Dînê di şaristaniyê de hatiye dakirin jî li gorî mîtolojiyê aliyê xwe yê baweriyê zêdetir e, û şêweyekî vegotina heqîqetê ye ku misoger nirxên heqîqetê xurt dike. Dîn ew mîtolojî ne ku baweriya bi rastbûna wan ji sedî sed e. Di hukim û baweriyên dîn de wekhevbûn û yeksanbûneke bi heqîqetê re heye. Tesîreke giran a dîn û mîtolojiyê li ser Zanyartî (felsefe) û zanistî heye. Huner weke şêweyekî heqîqetê bi zêhniyeta dînî û mîtolojîk di nava têkiliyeke xurt de ye. Dixwaze maneyê weke muzîk û xêzan îfade bike. Ji lewra lêkolînkirina maneya li muzîk, resim û heykelan hatiye barkirin, xebateke girîng a heqîqetê ye. Ya girîng resim, muzîk û heykel bi xwe nînin; weke mane û heqîqeta îfade dikin, nirxa wan e.

Bingeh û şert e ku zimanê mîtolojî û dîn helbestwarî be. Ziman bi xwe, ji dema derketina xwe ve demeke dirêj xwedî vegotineke helbestwarî ye. Ango di navbera helbest û heqîqetê de têkiliyeke xurt heye. Helbest ziman û heqîqeta civaka azad a berê ye ku tehekumê nas nake. Hozanên destpêkê pêşiyên zanyar û pêxemberan in ku heqîqet diyar kirine. Hêza vegotinê ya hozanwarî û zimanê helbestwarî yê civakekê nîşan dide ka ew civak çiqasî xwedî rastiyeke manedar û azad e.

**2-** Weke sîstema civaka çînî û dewletdar ji ber ku hem di nava xwe de hem li derveyî xwe li tehekumê rast tê û diqelişe, civaka şaristaniyê weke mane û heqîqet jî parçe dibe. Wexta ku tehekum tevlî vegotina mîtolojîk û dînî dibe heqîqet xerîb dikeve. Xerîbketin der barê cewher û hebûna civaka şareza de ye, bi tenê xwe nasipêre vegotinê. Ji ber ku maneyên di

naveroka xwe de dihewînin weke heqîqet pêşkêş dikin, paradîgmayên rêxistiniyên tehekumê yên jiyana civakî hûrûkûr diguherin. Di civakê de şêweyên paradîgmayên jiyanê yên nakok û yên rê didin ber, pêk tên. Xerîbketin bi kerritandin, verotin û helandina heqîqetê pêk tê. Ji bo pejirandina berevajîkirin, tepeserkirin û reşkirinê yên dikevin nava hewldanê û di encama vê de xerîb dikevin nirxa heqîqeta wan timî kêm dibe. Wexta ku heqîqeteke pê re şer bike namîne, civaka xerîbketî vediguhere lodeke bêmane. Avahiyên behsa wan tê kirin ji bo civakê bi tenê bar in; bi awayekî nexweşiyeke civakî ne. Muhafezekarî, hişkebawerî weke faşîzm bi navên patolojîk têne hildan. Xerîbketin weke rastiyeke civakî ya nexweşketî êdî bêmane ye. Jidestdana maneyê rewşa herî bi tehlûke ya civakê, nîşan dide.

Di tevahiya şêweyên heqîqetê de şer û qelşên di xwezaya civakî ya heqîqetê de pêk hatine, mirov dikare bişopîne. Nirxa heqîqetê ya mîtolojî û dîn çiqasî dikeve, xweda û xwedawendên bi mane û bi hewayeke mîhrîcanên gurrûgeş îbadet ji wan re dihat kirin, şûna xwe ji pûtên qîmeta xwe ketî re dihêlin. Ji serdema xwedawenda pîroz, a bi heybet û mukafat dide gav tê avêtin ber bi serdema xwedayên evdan çêdikin û ceza dikin. Ya rastî veguherîna civakî (ji civaka komin ber bi civaka çînî ve) xwe bi heqîqetê bi vî awayî îfade dike. Di civaka Sumer de mirov dikare vê veguherînê bi awayekî zindî bişopîne. Herweha di nava xwedayan de jî şer derdikeve. Li cihê ku rêûresma Dionysosî xwe weke heqîqeta civakî ya komin a cotkariyê nîşan da, rêûresma Zeûsî jî weke heqîqeta beşê tehekumkar ê vê civaka cara pêşî qelişî û veguherî, nîşan dide. Şerê van rêûresman maneya xwe ya orjînal jî di civaka Sumer de pêk tê. Ev herdu rêûresm bi awayekî balkêş û bi tesîr di hunerên serdemê de têne nîşandan. Serdema xwedawendan heta bi dayika Îsa Meryemê xwe nîşan dide. Wexta ku kapîtalîzmê xwe kir sîstema serdest, 'pîrasêhr' yên nûnerê dawî yê serdema xwedawendan bûn, şewitandin û modernîteya xwe ava kir. Ev bûyer, têra xwe mirov difikirîne û mirov hîn dike.

Di serdema şaristaniyê de zanist û felsefe weke şêweyên îfadekirina heqîqetê girîng dibin. Di vê de têkoşîn û lêgerîna heqîqetê bi roleke

bingehîn radibe. Şûna qral-xwedayên nikarin bi maskeyê, xwe weke berê bi vegotina mîtolojîk û dînî veşêrin, sîstema hewl dide bi metafizîkê xwe binuxumîne, digire. Kengî dînên yek xwedayî têrê nekirin û kêm man, metafizîk û îdealîzma objektîv weke sûbjektîvtiya sîstemên serdest ên şaristaniyê, hatin pêşdebirin. Li şûna xwedê 'îdea' weke heqîqet têne danîn. Îdealîzm, weke dewleta dibe xweda, mîna heqîqetê tê nîşandan. Ji ber vê sedemê, di navbera îdealîzm û xerîbketinê de têkiliyeke xurt heye. Heqîqetên civakî ne bi xwedayan, hewl didin bi îdeayan îfade bikin. Berevajîkirin, helandin û dejenerekirina heqîqeta civakî, bi îdealîzmê re gelekî pêşde diçe.

Gelek dewletên xwe şareza dihesibînin weke sîstema mêtinkarî û desthilatdariya hegemonîk, ji bo manedana civakî ya her diçe teng dibe veşêrin, giraniyê didin şêweyên hunerî yên xemilandî, bi heybet, zêde nepixandî û pirole. Mînak şaristaniya Roma û Grek di qada mîmarî, heykel, muzîk û mozaîkê de weke heqîqet girîngî bi pêşkêşiyeke bi vî rengî daye. Sîstem xwe çiqasî nepixandî nîşan bide, ewçend jî hewl dide maneya civakî (rastiya bindestan û yên têne mêtin) veşêre û berevajî bike. Mîna di dema mîtolojîk û dînî de zanist, felsefe û hunerê bi desthilatdariyê ve girê didin û hewl didin wan bikin dewletî ango pêvajoyeke têkoşînê ya felsefî û zanistî pêk tê ku li gorî qelşa li civakê ketî ye. Zanist û felsefe çiqasî li hemberî jidestdana maneyê li ber xwe bidin, ewçend hêza wan a îfadekirina heqîqetê zêde dibe. Çiqasî bikevin bin fermana xwediyên desthilatdarî û dewletê, ewqasî jî têkiliya wan a bi heqîqetê re kêm dibe, weke amûrekî bi rola vegotina xerîbxistinê radibin. Felsefe û zanista weke îfadeya heqîqetê li dijî îfadeyên mîtolojîk û dînî yên têkiliya xwe bi heqîqetê re jidestdayî, pêş ketine, ji bo civakê bi xwe ne. Ji ber ku ji bo berjewendiyên yekdestdarên mêtinkar û zordestiyê rol guhertine, mîna xerîbxistinên mîtolojîk û dînî yên berê dogmatîk dibin û dikevin pêvajoyeke ku têde bi heqîqetê re têkiliya xwe ji dest didin. Di huneran de jî pêvajoyên bi heman rengî pêk tên. Hunerên bi heqîqetê re têkiliya xwe ji dest didin, dikevin rewşekê ku zêde nepixandî û pûç in, û ji ber ku mînîmalîze dibin ji îfadekirina rastiya civakî dûr dikevin.

Di serdema şaristaniyê de pirsgirêkên civakî yên ji ber tehekumê çêdibin, di tevahiya şêwazên îfadeyê yên heqîqetê de li ser xwe çareseriyê û lêpirsînê ferz dikin. Bi qasî ku çavkaniya pirsgirêkên heqîqetê civakî ye, ewqasî jî çareseriyên wan di çarçoveya zanista civakî de ne. Zanista bi civakbûnê re têkiliya xwe ji dest dayî, xerîb dikeve ango bivênevê têkiliya xwe bi heqîqetê re qut dibe. Civakên xwe di tevahiya rêbazên heqîqetê de kirî hoste, êdî pirsgirêk nînin, ji xerîbketinê xelas bûne, civakên wekhevîxwaz, azad û demokratîk in. Ango civakên exlaqî û polîtîk in.

## h- Di Modernîteya Kapîtalîst de Heqîqet û Xerîbketin

Modernîteya kapîtalîst bi qasî ku herî zêde desthilatdarî û karsermayeyê kom dike, bi vê ve girêdayî sîstema heqîqetê xerîb dixîne jî îfade dike. Derketina wê ya holê weke sîstem bi qasî ku şerên xwînrij ên heqîqetê ferz kirine, dewamkirina wê jî şerên herî mezin ên ku dîrokê şahidî li wan kiriye, bi xwe re anîne. Şerên sîstemê bi tenê şerên desthilatdarî û mêtinkariyê nînin, di heman demê de şerên dijwar ên heqîqetê ne. Weke dewama sîstemên şaristaniyê ya di asta global de pêşketî modernîteya kapîtalîst çiqasî manedan û heqîqeta civakî bipelixîne, berevajî û reş bike, ewqasî pêk tê. Di nava sîstemê de rêjeya karê û desthilatdariyê çiqasî zêde bibe, ewqasî jî qada heqîqeta jiyana civakî mînîmîze dibe û mane gelekî têk diçe. Jiyana civakî bi tenê nabe qurbanê hêrsa karê û desthilatdariyê; di tevahiya şêweyên wê yên heqîqetê de jî xerîbketineke mezin pêk tê. Civak hem ji aliyê maneyê ve hem jî ji aliyê heqîqetê ve bi temamî bi pêvajoyeke tesfiyeyê re rûbirû ye. Li şûna tevahiya rastiyên civakê, rastiyên desthilatdarî û sermayayê hatine danîn.

Yek ji sêlingên distana modernîteyê, kapîtalîzm bi xwe wexta şensê sîstembûnê zevt kir, bi tesfiyekirina civakbûnên sereke yên pêşî û paşiyê dîrokê bûn, dest bi kar kir. Berê pêşî bi slogana ‘nêçîra pîresêhran’ hêza civakbûna jinê ya hewl dida li ser piyan bimîne, di nava agir de bi qirçeqirç şewitandin. Mirov nikare nêçîra pîresêhran ji sermayeyê serbixwe bifikire.

Di avakirina hegemonya xwe li ser jinê de weke koletiyeke kûr, ev gerdîşên şewitandinê heta dawiyê li hesabê wê hatin. Di roja me ya îro de bi vî awayî piçûkxistina jinê û ketina wê ya xizmeta sîstemê, bi pêkanîna van şewitandinên di dema qonaxa derketina holê ya hegemonya kapîtalîst de ji nêz ve têkildar e. Bîranînên dehşet ên şewitandinê, jin li Ewrûpayê bi awayekî bêsînor xistiye xizmeta mêr.

Sîstemê piştî jinê, bi awayekî bêrehm civakbûna gund-cotkariyê jî hilweşand. Heta ku aliyê wê yê komin demokratîk li ser piyan bimana wê desthilatdarî û kara herî zêde bi dest nehata xistin û ji ber vê jî civakbûna gund-cotkariyê bivênevê, bûbûya hedef. Ev civakbûnên bi deh hezar salan bûne zemînên heqîqet û maneya kêfxweşî, êş û berxwedanên mirovatiyê çiqasî bêne tesfiyekirin, şensa sîstemê ya gavavêtinê jî wê zêde bibe. Tevahiya kirinên li dinyayê û yên li Ewrûpaya piştî sedsala 16. qewimîne, vê rastiyê piştrast dikin. Beriya modernîteyê bi sînor be jî dêrê heqîqeta civakê îfade dikir, ji lewra divê mirov şerê modernîteyê li dijî dêrê jî di vê çarçoveyê de bibîne. Herçiqasî gerdûnîtiya Xirîstiyantiyê weke îfadeya xapandina civakbûneke di nava xwe de ye, û di yekdestdariya desthilatdarî û mêtinkariya berê de xwedî par be jî bêguman yek ji çeperên girîng ê parastina civakê ye. Kapîtalîzmê ev çeper jî bêtesîr nekirina, nikarîbû gav biavêta. Şerên mezin ên dîn, îfadeya vê heqîqetê ne.

Kapîtalîzmê koletiya herî terbiyekirî ya jê re proleterbûyîn tê gotin, rewa kir û bi vî awayî derbeke din a mirinê li heqîqeta civakê xistiye. Yek ji şaşiyên mezin ên K. Marks ew e, bi awayekî xafil yeqîn kiriye ku proleterê yek ji hêmanên heqîqetê yê ji destçûyî ye, kirdarê sereke ye. Proleter koleyekî pêşdebirî ye. Heta ku vê rewşa xwe dewam bike ti carî nikare bibe kirdarekî bûye xwediyê heqîqetê. Kapîtalîzm heta bi tevahî xisletên civakî, insanî yên di proleter de nekuje wî nabe ser karê xwe. Cewherê civakî û insanî yê koleyê di serdema antîk de, ji koleyê modern ango proleter bi gelekî zêdetir e. Lê ji ber ku kole ye, payeya xwe ya heqîqetê, kengî bigihîje azadiyê wê bi dest bixe. Hem kolemayîn, hem jî bûyîna xwediyê payeyê, berevajîkirineke mezin a Marksîzmê ye. Di bingehê serneketina sosyalîzma reel de ev heqîqet heye.

Bûrjûwazî weke çîneke civakî ya kapîtalîzmê ew mezinkirî, afeta civakî ya heqîqet li ser hatiye parçekirin, bi xwe ye. Xweda-qralek ji hezar bûrjûwayî zêdetir nêzî heqîqetê ye. Xwezaya civakî ji aliyê heqîqet û manedanê ve dibe du parçe. Bûrjûwazî parçeyê nexweş û patolojîk pêk tîne. Modernîte di objektîvîteya vê çînê de tevahiya heqîqeta civakî ditevizîne û bi vê jî razî namîne, desthilatdarî û sermayeya xerîbkirinê ferz dikin wan vediguherîne cinawirekî ango Levîethan.

Yek ji sê lingên distana modernîteyê, lingê duyemîn, dewleta netewe ye. Mirov dikare wê weke hêzeke di dîrokê de nedîtî, ya heqîqet verotî û kerritandî, pênase bike. Ti nexweşiya civakî ya patolojîk, bi qasî dewleta netewe li ser navê muhendîstiya civakî (Demiurg = Xwedayê Mîmar), nikarîbûye civakê homojen bike û wê ji jiyanê qut bike. Modernîteyê di bin kirasê pêşverûtiyê de (baweriya bi qiyameta ya îlahî bi şêweyê modern) cudahiyên jiyanê yên civakî yên herî pîroz (jiyan = tevî ku cudahî ne) verot, hundirê wan vala kir û avahiyên tekperest ava kirin û ev faşîzm bi xwe ye. Faşîzm li cihê ku heqîqeta civakî diqede, patolojiya civakî ye ku derdikeve holê; yekdestdariya desthilatdariya dewleta netewe û sermayeyê nebin, ti carî zêde nabe. Têgînên sînor, welat, millet, al, srûd û welatî yên dewleta netewe dixwaze wan pîroz bike, bi xiyanetkirina bi pîrozbûnên rastî yên civakî re, têkildar in. Ji bo welat, millet û welatiyên tekperest bêne avakirin, divê mirovatiyeke ku di tevahiya serdeman de jiyaye, were gurandin. Di rewşeke welê de jî mirov bi tenê ji heqîqeta civakî dûr nakeve û jê re xerîb nakeve, civak bi xwe diqede. Dewleta netewe weke naverok desthilatdariyên milletperest, dînperest, cinsperest û 'zanistperest' zêde dike, li hemberî vê rewşê her zerreya heqîqetên civakî li destavêtin, dagirkerî û înkarê rast tê. Di serî de Nietzsche, Foucault û Adorno, hin fîlozofan li ser navê heqîqetê qiyamet rakirine, bi daxuyaniyên xwe qala vê rastiyê dikin û dibêjin; ferdê modernîteyê ew mirov e ku hatiye xesandin û ji civakbûnê hatiye derxistin.

Ji sêlingên distana modernîteyê lingê sêyemîn, îndustriyalîzm e. Tê maneya îmhakirina jiyana ekolojîk û ev heqîqetek e ku bi temamî derketiye holê. Ne bi tenê eko-hawîrdor, civakîbûn jî bi tenê bi wê dikare

hebûna xwe bi dest bixe. Lewra ew vê rastiyê jî tine dike. Civakek e ku her roj hawîrdora xwe ji dest dide, civakek e ku jiyana xwe parçe parçe ji dest dide û bi devê cinawirekî ve ber dide. Civakîbûneke mirov a bi berxwedana mîlyonan salan hatiye avakirin, heye û li hemberî vê dema dirêj demek e ku mirov dikare weke kêlî bi nav bike, di demeke kurt de ev civakîbûna mirov tê tesfiyekirin. Di vê tesfiyekirinê de îndustriyalîzm hevparê vî gunehê kapîtalîzmê û dewleta netewe ye. Di bin navê civaka îndustriyel de îndustriyalîzm bêyî ku şerm bike, girêkeke kansêrê weke civakeke pêşverû pêşkêş dike û ev jî pirr baş diyar dike ku îndustriyalîzm çend bûyereke patolojîk e. Di ti şerî de bi qasî şerê li ser navê civaka îndustriyel (bi destekdana kapîtalîzmê û dewleta netewe) hatiye kirin, kuştinên hov û komkujiyên civakî nehatine kirin, civakîbûn nehatiye birîndarkirin û mehkûmê nexweşiyê nehatiye kirin.

Pêxemberên ku maneyên mezin li têgînên qiyamet û mehşerê bar kirine, herhal xwestine bi van têgînan axirê zemanan bînin ziman ku têde vî cinawirê sêling ê jê re modernîte tê gotin, mane û heqîqeta civakîbûna mirov tine kiriye!

Ji bo li Rojhilata Navîn jiyana civakî ji nû ve were pênasekirin, bi awayekî hişkeber be jî min çarçoveyeke têgîn û teorîk danî da ku bersiva pirsa “Jiyana civakî çi ye?” berfireh bikim. Helwesteke seyr a mirov ji bo jiyana wî bi xwe heye; wer bawer dike ku mîna li ser xeteke rast an jî xelekeke li dora xwe timî dizîvire, ji ezel heta bi ebed diqewime. Bi vê dixape û ev xapandineke bi kok e. Tevî ku xwediyê şensa jiyaneke herî manedar e, mirov cinsekî welê ye, herî zêde dixape û ev bi tenê lîstikeke xwezayê nîne; ez yeqîn dikim ku ev lîstikek e, herî zêde xwe di civaka tehekumkar de nîşan dide. Ti cureyê zindiyan bi qasî mirov naxape. Bi qasî ku ez vê seyr dibînim, ewqasî jî ji bo min lîstikeke balkêş e.

Mirov jiyana civakî rast nas bike û bi zanebûn wê bijî, bi qasî jiyanê bi xwe girîng e. Belkî jî jiyan ji bo rast naskirin û pênasekirinê ye. Divê hema yekser ez bibêjim, bi giştî jiyan, bi taybetî jî jiyana mirov, encama avakirin û mîmariyeke xweser e. Çi bikeve nava vê avahiyê, diyarkirina wê jî wezîfeya bingehîn a zanista civakî ye. Ji bo xusûsa ez dixwazim diyar bikim

baş were fêhmkirin, dikarim pinpinîka sê meh temenê wê heye, weke mînak nîşan bidim. Avahiya wê ya hundir û ekolojiya dewrûberê, jiyana sê mehî ya pinpinîkê diyar kirine. Eger pinpinîk nebe qurbanê qezayekê, wê van sê mehan karibe bijî. Ji ber vê jî bê pêşîbûn û bê paşîbûn (pirsa ezel-ebed) bi van sê mehan bi sînor e. Hîç nafikire ku vê yekê jî bike pirsgirêk. Xwestekeke xwe ya bi vî rengî nîne, hebe jî zêde serê xwe pê naêşîne. Mînaka di nava mînakê de Gilgamêş e. Ez Gilgamêş weke mînakeke neyênî nîşan didim. Ez ê rave bikim. Di xweza û gerdûnê de her hebûn li gorî vê 'rêzika pinpinîkê' pêk tê, dijî. Bi tenê li cem mirovî ev rêzik ters dimeşe. Rewş vediguhere pirsgirêkeke gelekî mezin.

Cinsê mirov ji bo temenê xwe ji lêgerîna ebedî-ezelî heta bi fikirîna buhiştê li ezmên, dojeha li bin erdê dikeve nava gelek hewldanên seyr û balkêş. Ji qral-xwedabûnê heta bi koletiyeke herî rezîl, gelek awayên seyr peyda dike. Herroj ji jiyaneke cinsî ya ji rêderketî heta helwestên xwe weke cinsekî bêalî diyarkirin û gelek helwestên sînornenas, bi tenê xweserî mirov in. Ji plansazkirina qirkirinê heta bi peyketina ava heyatê, gelek helwestên li cem ti ruhberên din nînin, li cem cinsê mirov weke nexweşiyê dewam dikin. Ji bo mirov pêşiyê li van dînîtiyên xwe yên sînornenas bigire û wan fêhm bike, pêdivî bi naskirin û pênasekirina jiyanê heye. Naskirin û pênasekirineke rast dikare bibe gava pêşî ya jiyaneke rast.

Di destpêka dirêj a vî beşî de ji bo rohnîkirina mijarê, min hewl da çarçoveyeke têgînî û teorîk deynim. Bêguman zanisteke civakî ya bi îdeal, bi mezinkirin û bicihanîna vê çarçoveyê wezîfedar e. Wexta ku em hewl bidin krîza avabûnê ya modernîteyê û çareseriyên wê yên muhtemel analîz bikin, ji ber sedemên diyarkirî wezîfeyeke pêşî tê ew e ku divê weke pêdiviyeke dest jê nabe, zanista civakî ji nû ve were pênasekirin, avakirin û rêxistinkirin.

Bivênevêya jiyana mirov, civakîbûna wî ye. Sedema yekemîn a bi israr ez li ser vê mijarê radiwestim ew e ku zanista civakî hê hewl nedaye wê bide naskirin, hewl dabe jî heqîqet û maneyeke qîmeta xwe ya zanistî hebe, daneniye holê, di avakirina wê ya rêxistinî û civakîkirina wê de bi ser

neketiye. Ji vê girîngtir û sedema duyemîn ew e, lîberalîzma modernîteya kapîtalîst ferd û ferdiyet li ser hîmê dijberê civakê wer nepixandî ava kiriye û kiriye cinawir, di erd û ezmên de hilnayê. Bi rewşa heyî, ferdiyet ne bi tenê pê dewam nabe, pê jiyan jî nabe. Jiyana ferdî ya li cem ti cinsê zindiyan nayê dîtin û li her cure jirêderketinê vekiriye, ne hêza civakê ne jî hêza dinya me maye wê hilgire. Ev ferdîtî wisa ji rê derketiye, di bîstûçar saetên rojê de ji kuştina mirovan, kirina seks, spor û sinaetê, bidestxistina karê û meşandina êşkencê bêzar nabe. Eşkere ye ku dawiya vê ferdîtiyê, nexweşiyên weke kansêr û AIDS'ê ne, jixwe ew jî pirr bi lez zêde dibin. Rojên ji wan re mehşer tê gotin û pêxemberan pirr berê xeber ji wan dane vê dema ferdîtiyê îfade dikin.

Naxwe weke rêzgirtina me ji bo jiyanê, wezîfeya me ya yekemîn ew e, divê em zanista civakî ya bi jiyana civakî tê naskirin ava bikin, ya duyemîn jî divê em jiyana ferdî û sîstema li pişt wê rawestînin û şert e ku divê mirov van herduyan bike yek û gavê biavêje.

Bêguman civakîbûn xwe disipêre rêxistinkirin û avakirina jiyana ferdî. Civaka ji ferd qut, nabe. Qiyasa ferd û civakê em dikarin bişibînin liberhevgirtina elementa hîdrojen û ûranyûmê. Atoma hîdrojenê dema bi serê xwe ye, avahiyeke besît e. Di hin cureyên wê de herçend hinek enerjî û perçik belav bibin jî gelekî bi sînor e. Di ûranyûmê de jî ji heman atomên sentez dibin, gelek pêkhate misêwa enerjî û perçikan belav dikin. Jixwe bombeya atomê ji vê xisleta ûranyûmê çêdibe. Di civakê de jî gelek ferd hatine sentezkirin. Lê perçik û enerjiyên belav dike (komên nû û kevin) li gorî mirovê ferdperest (atoma ku bi tenê ji bo xwe dijî û wekî din bi kêra tiştekî din nayê) di astekê de ye ku qiyaskirinê qebûl nake.

Ferd wexta ji civakîbûnê derkeve yan jî wê ji dest bide, herçend fizîkî bijî jî yan xayînek e, yan jî rezîlek e, piçûkketî ye, beredayî ye. Di herdu mane û rewşan de jî mirî ye.

Mirov civakîbûna Rojhilata Navîn weke avabûneke gerdûnî manedar bike, girîng e. Nêçîrvanên gerok û berhevkarên nebatan bi tecrubeyên ji jiyana demdirêj a li qûntara rêzeçiyayên Toros-Zagrosan girtin, gav avêtin civakîbûna gund-cotkariyê û wexta ev civakîbûn pêkanîn, bêyî ku haya

wan jê hebe pêkhatineke jiyana gerdûnî ava dikirin. Ev pêkhatin bi xwe û serdema şaristaniya navendî ya li ser hat avakirin, min hewl dabû di beşên pêwendîdar de analîz bikim. Li vir hinekî din sekna min a li ser maneya vê pêkhatinê û diyarkirina nirxa heqîqeta wê, wê bi kêra mijarê bê.

Kengî dema dawî ya qeşayî dest pê kir û qediya ango ji berî bîst hezar salan û vir ve civakîbûna nû ya li qûntara rêzeçiyayên Toros-Zagrosê hewl da xwe bi rêxistin bike, ji cureyên dewlemend ên nebatan derbasî cotkariyê, ji heywanên dihatin kedîkirin derbasî heywan xwedîkirinê dibû. Ev pêvajoya derbasbûnê beriya deh hezar salan bi jiyana gund a bicihbûyî bi encam bû. Xebatên cotkarî û heywanxwedîkirinê, civakîbûna cotkar û şivan derxist pêş. Serê jiyaneke mîna xewnê, ji bo mirovatiyê xuya kir. Ev kêfxweşiya jiyanê ya mîna xewneke nû, bingehê tevahî merasîm û cejnan e ku şopên wan hê dewam dikin. Ji civaka di nava tinebûnê de gav avêtibûn civaka di nava bereketê de. Beriya li derdora deh hezar salan, bêyî ku tîpên civakên din bêne naskirin, ev şêwe pêk hat. Ev şêweyê cîhanê li tevahiya dinyayê belav bû. Herçiqasî fikrên der barê pirr navendan de hebin jî jiyana nû ya serê wê xuya kir, bi rola navendî ya pêşî radibe û girîngiya diyarker a vê rolê bi gelek belgeyên xurt hê zêdetir tê destekkirin.

Ev civaka di mîhwera jin-dayikê de çêbûye, ji aliyê avakirina civaka xizman a pêşî jî girîng e. Xizmtî bi nêzîkatiya jin-dayikê diyar dibe. Ji klana destpêkê, bi vê xizmtiyê mirovatî digihîje civaka pêşî ya qebîleyê. Weke şêweyê civakeke nasnameya orjînal a bi hêz, şopên qebîleyê hê jî dewam dikin. Saziyên orjînal ên weke ziman, dîn, mîtolojî, huner, hozanî, zanyarî û zanistî bandora xwe heta roja me ya îro anîn û tîrêjên xwe yên destpêkê ji nava vê civakê weşandin, peşikandin. Gavavêtinên orjînal ên weke tevn, dîzik, kûzik, çandiniya erdê, destar û alavên pê mal tê avakirin, di vê demê de pêk hatine. Di vê demê de mirov bi awayekî pîroz bi erd û axê ve hatiye girêdan û pêkanîna welatokan, berhema vê civakê ye. Mirov dikare bibêje; der barê jiyana civakî de ji sedî 90'ê 'cara pêşî' gavavêtinên dema vê civakê ne.

Civakîbûna bi deh hezar salan bi tena serê xwe dewam kiriye, qalibên bingehîn ên ruh û zêhniyeta mirovatiyê, nirxên çandî yên maddî û manewî

pêkanîne. Dibe ku civakeke besît be, lê ji bo mirovatiyê di vê demê de hîmên têkûz û bi kok ên jiyanekê, bi awayekî serketî hatine danîn. Ji vir û pêve her tiştê diqewime, xwe disipêre vê civakê û diqewime. Ti bûyer û pêşketina der barê mirov de xwedî wê qabîliyetê nîne ku li derveyî vê civakê biqewime. Ez nabêjim bûyer û pêşketineke din wê hîç nebe, lê bibe jî wê bi ser vê civakê ve weke şax û milekî wê, biqewime. Civak, hebûnên dîrokî ne. Li derveyî dîrokatiyê, civak nikarin hebin. Modernîteya kapîtalîst dîrokê dide aliyekî û bi tenê bi rêbaza zanistî ya ku xwe disipêre analîzê dimeşe. Ev yek jî dihêle ku tevahiya zanistan, nexasim jî zanista civakî çeloxwarî bibe û bi şêweyekî nirxê heqîqeta wê kêm bûyî, pêş bikeve. Modernîteya kapîtalîst ji vê rewşê berpirsiyar e. Analîz û objektîvîte weke metafizîkeke xirab, qusûrên bingehîn ên zanista navend Ewrûpayê ne.

Eger civak hebûnên dîrokî bin, hingê maneyên wan jî dîrokî ne. Mane jî cewherê jiyana civakî ye; ango dikare weke armanca jiyana civakî, ruh û zêhnê wê bide naskirin, pênasekirin. Heqîqet jî ew e ku manedariya hebûna dîrokî ya vê civakê pêk tîne, bi îfade û şêweyên weke mîtolojîk, dînî, hunerî, hozantî, zanyartî û zanistiyê xwe bîne ziman.

Herçiqasî zirar û ziyanên mezin li civaka mirovî bûbin jî niha jî bi heman rêbazên heqîqetê vê manedariyê pêk tîne. Delîlekî din ê dîroktiya civakî ev şêweyê jiyanê ye. Bêguman ev şêweyê jiyanê her weke xwe nemaye. Pêşketineke diyalektîkî di hinavê xwe de her hilgirtiye. Lê herçiqas hilhilîbe, tesfiye û zirar lê bûbe jî weke formekî bingehîn heta roja me ya îro xwe aniye.

Qelşa mezin a pêşî bi hiyerarşiyê li forma jiyanê ya vê civaka dîrokî ketiye. Hiyerarşî weke tê pênasekirin, texmînî ji salên 5000'î B.Z. û virve hebûna xwe da bihîstin, weke hêmanekê di nava civakê de bi cih bû. Hiyerarşî bi xwe koma kesên neqane yên pêşî, îfade dike. Hiyerarşî weke sêbera rahib + rêveber + esker, hewl da li şûna otorîteya jin-dayikê bi cih bibe. Di nava jiyana civakî de xerîbketina herî mezin a pêşî bi otorîteya van kesên neqane dest pê kir. Pêkhatinên weke malbatên neqane û xanedanî jî çavkaniyên xwe hiyerarşî ne. Xanedanî li aliyekî weke dewletê bi gewde

dibe, li aliyê din jî weke malbatgiriyê jiyana civakî ber bi form û manedariyeke cihê ve bir. Veguherîneke bi kok pêk tê.

Ji salên 3500'î B.Z. ve bi destpêkirina bajar, çîn û dewletbûnê ve, ev qelş, veguherîna form û maneyê kûrtir dibe. Di vê de civaka şareza, bi rola sereke radibe. Yekdestdariyên şaristaniyê (dewlet, gundikên koleyan, bazirganî, yekdestdarên selefkariyê) yên li ser mayeyên civakî ava bûn, jiyan hûrûkûr birîndar kirin. Hêmanên xerîbker ên berê nehatine dîtin, kengî di nava civakê de bi cih bûn, jiyanên xweser ên tebeqeyên jor û jêr ên mane û formên wan her diçe xira dibin û yekparetiya wan parçe dibin, peyda dibin. Hebûna jê re şêwazê jiyana şareza tê gotin, vî şêwazî îfade dike. Di civaka Rojhilata Navîn de şaristaniya li heman qada navendî hilat, xwediyê cihekî navendî ye. Gerdûnî ye. Di nava jiyana civakî de xerîbkirinê xurt bike jî ji aliyê dîrokî û mekanî ve ji Rojhilata Navîn e. Jiyana şareza ya di jiyana civakî ya Rojhilata Navîn de weke tebeqeyeke jor bi cih bû, texmînî demeke hegemonîk a pênc hezar salî îfade dike.

Hegemonya hêmanekî besît nîne. Ketiye û çiziriye tevahiya çavî, kom û organên jiyana civakî. Di vî şêwazê jiyanê de jin weke nasname li herî jêr hatiye bicihkirin. Li ser wê jî koletiya mêr hatiye danîn. Xwestine eşîr û qebîleyên koçer ên li ber xwe didin tevî gundiyên kedkar û zenaetkaran weke tebeqeyeke sêyem tertîp û ava bikin. Lê ev derdor û beş bandorê li herdu tebeqeyên pêşî dikin û tevahiya dîrokê, jiyana têkoşer timî zindî dihêlin. Herweha yekdestdarên şaristaniyê ne bi tenê bi amûrên zorê yên berçav, bi awayekî bingehîn rêbazên îfadeyê yên heqîqetê (mîtolojîk, dînî, hozantî, hunerî, zanyartî û zanistî) bi kar tînin û bi vî şêweyî dixwazin rewatiya xwe weke ku xwezayî be nîşanî jiyana civakî bikin û xwe bêdawî bikin. Bi tevahî qalibên kevin, merasîm û cejn, îbadet û şahiyên jiyana civakî di bin yekdestdariya xwe de ji nû ve şîrove bikin, xwedî li wan derkevin û mohra xwe li wan bixin. Lê qalibên jiyana civakî yên herî kevin, hebûn û manedariya xwe di bingeh de dewam dikin. Herçiqasî parçe bûbe jî heqîqeta xwe tîne ziman. Di serdema şaristaniyê de şaristaniyên Hind, Çîn û Emerîka Başûr di mekanê xwe de pêş ketibin jî rola sereke heta bi

modernîteya Ewrûpayê bi sîstema şaristaniya navendî ya bi koka Rojhilata Navînî re ma.

Sîstema şaristaniya navendî ya bi navê Îslamê gava xwe ya dawî avêt, weke ku tê qalkirin di dawiya pêncsed salên rûniştî de hegemonya xwe bi destê modernîteya kapîtalîst a Ewrûpayê ve berda. Serhatiya civaka Rojhilata Navîn a bi navê Îslamê, bi xwe dîroka kevin bû. Hiyerarşî, xanedan û împaratoriyan hebûna xwe di dema Îslamê de bi navê xîlafet, mîregtî û seltenatan dewam kirin. Hêmanên demokratîk ên têkoşer jî hewl dane weke gelek cemaet û mezhebên cûrbicûr (Elewîtî, Şîatî, Xaricîtî, Êzîdîtî, Mûsewîtî, çand û gelên Xirîstiyan) hebûn, mane û heqîqeta xwe dewam bikin. Tevî van tebeqe û parçebûnan hemûyan, li Rojhilata Navîn jiyana civakî aliyekî xwe yê gerdûnî û yekparetiya wê heye, û ev jî rastiyeke eşkere ye. Civaka dîrokî hebûna xwe dewam dike. Lê bi awayekî mane û heqîqeta wê qelsbûyî û parçebûyî.

Di vê rewşê de pirsa bingehîn a divê were kirin ev e; modernîteya kapîtalîst di civaka Rojhilata Navîn de çima nikare derfet û îmkanê pêşketinê bi dest bixe. Bersiva pirsê, ne astengkirinên dînî, ne paşvemayîna amûrên hilberandinê û ne jî kêmbûna sermayeyê ye. Tê zanîn, di van qadan de gelekî ji Ewrûpayê pêşketîtir e. Dema behsa wê tê kirin, dema navbera sedsalên 12.-15. in. Ewrûpa di van sedsalan de derketin û mezinbûna bajaran nas dike. Bazirganî û pere li bazarên nû vedibin, pêş dikevin. Li Rojhilata Navîn ji çar hezar salan ve, ev pêvajoyên behsa wan tê kirin, bi awayekî xelekwarî, her dewam dikin. Di warê pîşesaziyê de jî fersax bi fersax li pêşiya Ewrûpayê ye. Hegemonya şaristaniya navendî jî di destê wê de ye. Ya rastî, sedemên em rêz dikin, gelekî baş diyar dikin ka sîstema kapîtalîst çima nikare li vê herêmê gavê biavêje. Rojhilata Navîn bi sîstema xwe bawer e, jê piştrast e. Hilberîna berhemê zêde ji bo hêzên hegemonîk ên herêmê têrê dike. Ji derve û hundir ve hêzên dijber ên stratejîk ên girîng û kujer nînin. Hêzên mîna Moxolan ên ji der ve tên jî dikarin bi rehetî û biste di nava xwe de bihelînin.

Di destpêka vî beşî de min hewl dabû sedemên stratejîk ên di gavavêtina Ewrûpayê de bi rola bingehîn rabûne, bînim ziman. Ew fikrên min hê jî di cihê xwe de ne. Kapîtalîzm rejîmeke êriş û parastinê ya stratejîk e; lê ji bo yekdestdarên sermaye û desthilatdariyê yên gelekî tengavbûne û pirsgirêka wan a man û nemanê heye, amûrek e ku serî lê didin. Serhatiyên Hollanda û Ingilîstanê pirsgirêka man û nemanê ya stratejîk ew neçarî kapîtalîzmê kiriye.

Ingilîstana weke hêzeke hegemon mezin dibe, hê di sedsala 16. de li Rojhilata Navîn dest bi tevgerên keşfê dike. Jixwe di serî de Venedîkê, bajarên Îtalyayê û Napolyon rê têra xwe vekiribûn. Herweha sermayeya Cihûyan a Rojhilata Navîn baş nas dike, ji destpêkê ve bi awayekî stratejîk bi herêmê re eleqedar dibe û rê nîşanî Ewrûpayê dide. Sermayeya Cihû ya eleqeya Hollanda, Ingilîstan, welatên din ên Ewrûpayê yên li rêza pêş û DYE ji herêmê re dizane, di warê naskirina Rojhilata Navîn de bûye pispor. Herweha bi awayekî berevajî agahîgirtin û rênîşandana Ewrûpayê jî dîsa heman sermaye dike. Cihû di vê mijarê de ji dema derketina pêşî ya ji Ûrfa û Misrê (1600-1300 B.Z.) ve weke civakeke qebîle ya bazirgan û xwedî tecrûbe tevdigerin.

Sedema duyemîn a kapîtalîzmê nikarîbû bi roleke stratejîk li Rojhilata Navîn rabe ew e, bi mezinbûna Îslamê re Xirîstiyan, Ermenî, Asûrî, Helen û Cihûyên pêşketina wan hat astengkirin, neçarî koçberkirinê hatin hiştin. Ev xelkên behsa wan tê kirin, ji danehevên wan xûkî tê girtin û car caran têne talankirin, ji lewra bi şêweyê Ewrûpayê nikarin bûrjûwaziyeke bajêr pêk bînin, ev jî li dijî herêmê encamên girîng bi xwe re tîne. Bi qasî ku pêkhatina Ronesanseke pêşwext asteng kir, derba li çanda wan a pêşxistî ket, herêm veguherand çoleke hişk û zuhabûyî. Îslamiyet bi tena serê xwe ji statuya temsîlkirina çanda Rojhilata Navîn gelekî dûr e. Mûsewî û Xirîstiyan weke gelên herî bi çand ên herêmê, bi qasî ku hafizeya herêmê bûn, xwediyên danehevên maddî jî bûn. Îslamiyet hinekî jî li ser van nirxan ava bû. Nirx desteser kirin, lê nikarîbû pêşde bibe. Çanda Cihû û Xirîstiyantiyê ku li Ewrûpayê bi hêz bû, di pêşketina şaristaniya Ewrûpayê de bi rola hêmanên sereke rabû. Eger li Rojhilata Navîn bi rola sereke

rabûna, şensê şaristaniya Ewrûpayê wê gelekî kêm bûya da ku weke hêza hegemonîk hilata. Dema ku mirov li cem Osmaniyan dêhnê xwe bide vê rastiyê, ev ê gelekî hînker be.

Li ber rohniya vê vegotin û qalkirinê, mirov dikare baştir fêhm bike ka çima Seferên Xaçperestan ên Ewrûpayê di sedsalên 11-14. de meşandin, bê encam man. Wexta ku bi dersên ji van seferan derxistî û bi nirxên veguhestî, di sedsalên 16.-19. de bi gavavêtinên stratejîk ên bingehê xwe kapîtalîst, berê xwe da Rojhilata Navîn, bi heman sedeman bi ser ket. Ev serketîbûna wê jî ji ber heman sedeman tê fêhmkirin. Di beşên pêwendîdar de mijar têra xwe hatiye analîzkirin. Ya ji bo Rojhilata Navîn girîng ew bûyer in ku modernîteya Ewrûpayê bi êrişên stratejîk ên ji sedsala 19. û pêve dest pê kir, rê li ber wan vekiriye. Ya ji vê jî girîntir hilweşîn û krîzên di avahiya civakî de kûr bûn.

Min timûtim destnîşankir ku şaristanî weke hebûn, çavkaniya pirsgirêkan e. Ji bo analîzkirina bûyeran, gelekî girîng e ku mirov tespît bike, şaristanî bi rengekî strukturel û binyewî ji pirsgirêkê çawa dikeve krîzê. Şaristanî weke avahiyên dema dirêj, bi ketina krîzê re hegemonya û qadan diguherin. Şaristaniya Rojhilata Navîn a nikarîbû derbasî modernîteya kapîtalîst bibe (ji gelek aliyan ve sedemên derve û hundir), bi şaristaniya Îslamê re ket xeleka xwe ya dawî û ji sedsala 13. û pêve ket krîza strukturel û binyewî. Împaratoriya Osmanî ji kûrbûna krîza strukturel û binyewî pêve ti maneya xwe nîne. Belavbûna wê ya di sedsalên pêkhatina stratejiya kapîtalîst de, ji ber avabûna wê ya bi krîz, wê nikarîbûya bi ser keta. Jixwe kengî kapîtalîzmê bi sedsala 19. re giraniya xwe da ser herêmê, ev maneya wê bi zêdeyî derxist holê.

Ji bo civaka Rojhilata Navîn sedsalên 19. û 20., ji aliyê stratejiya kapîtalîst ve sedsalên fetihkirinê ne. Ev dema ku modernîteya kapîtalîst bi sê suwarên xwe yên mehşerî (kapîtalîzm, dewleta netewe, îndustriyalîzm) giraniya xwe da ser herêmê, dema kûrbûna hilweşîn û krîzê ye. Bi jihevdeketina avahiya şaristaniya pênc hezar salî, bi ya ji nava wê derdikeve, bi temamî dor li jiyana civakî û dîrokî ya hezar salan tê girtin. Hevgirtina modernîteya kapîtalîst bi bermahiyên şaristaniya xwe re li

Rojhilata Navîn pêxîrtengiya jiyana civakî misêwa kûr kiriye. Rabihuriya wê ya bi kok û êrişên demdirêj ên stratejiya modernîteya kapîtalîst, ev xislet dane pêxîrtengiyê. Cewherê civakî, wexta weke hebûn tê parçeparçekirin, weke mane û heqîqetê jî dikeve rewşeke kaotîk.

## B- ÊRIŞA HEGEMONÎK A MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST û KRÎZA ROJHILATA NAVÎN

Em sê xistetên sîstemên şaristaniyan ji nû ve bi bîr bixin, yek ji wan reqabet-hegemonya, ya diduyan navend-hawîrdor û ya sisiyan jî karektera wan a xelekwarî dadikeve û bilind dibe. Di bingehê van de jî têkoşîna ku yekdestdar di navbera xwe de li ser desthilatdarî û ekonomiyê dikin, heye. Ev meylên di demên destpêk û stewîna şaristaniyan de xwe bi meşeke cangiran nîşan didin, di serdema modernîteya kapîtalîst de hem bi navberên kin, gelekî zêde û bi lez, hem jî bi şêweyekî gelekî xwînrij xwe nîşan didin. Di encama van meyl û hêmanên li ser jiyana civakî, ekonomîk û polîtîk bi bandor in, reqabet-hegemonya, li hemberî metropolên navend ên gelek pêşketî herêmên kolonî yên hindik pêşketî, hilweşîn û buhranên bi navberên dem kin û dirêj xwe nîşan didin ti carî kêm nabin. Ji hegemonê pêşî yê dîrokê navê wî nivîsî Qral Sargon heta bi hegemonê dawî yê roja me ya îro G.W. Bush, ev xelek her li dora xwe fitilîne.

Modernîteya kapîtalîst ev xeleka her li dora xwe digere, bi awayekî balkêş di destpêk û mezinbûna hegemonya Brîtanya-Ingilîstanê de ji nû ve piştrast û ispat kiriye. Eger mirov hegemonya Ingilîstanê bi tenê weke derketina holê ya çend giregir û neqaneyên yekdestdarên giravekê bibîne, ev ê kêm û çewt be. Hegemonya Ingilîz hê di gavên pêşî yên destpêka xwe de di asteke gerdûnî de tevgeriya û heta roja me ya îro jî her global ma.

Wexta ku mirov modernîteyê binirxîne û li ser raweste, şêwaz û nêzîkatiyeke di tevahiya bingehê şaşî û çewtiyan de heye, divê mirov jê bibihure û ji sedî sed sererast bike. Ew jî ew e, mirov hîn bûne di çarçoveya şexs, bûyer û dewleta netewe de bifikirin û hukim bikin. Nexasim,

nêzîkatiyên pozîtîvîst ên îdeolojiyên dewleta netewe yên bi vî rengî di tarîkirina rastiya dîroka civakî de bi roleke diyarker radibin. Armanc ew e, xwedayetî û dînîtiya dewleta netewe weke heqîqeteke vebirrî pêşkêş bikin. Şêwazê rast ew e, bêyî ku mirov objektîv-sûbjektîv wekhev bibîne, divê mirov xwezaya civakî weke yekpareyeke rastî, heqîqet û maneya hatiye avakirin nas bike. Ev nêzîkatiya ku em dikarin weke nêrîna li jiyanê jî binirxînin, bi qasî ku ji bo tevahiya gerdûniyan divê ji bo diyardeyên taybet û xwezayan jî weke rêbazeke bingehîn were bikaranîn.

Yekdestdariya Ingilîstanê li ser sêlingên distanê –kapîtalîzm, dewleta netewe, îndustriyalîzm –gav avêt, û di nava heman meylan de tevgeriya. Em dikarin yekdestdariyê weke hegemon, sîstema dinyayê, kapîtalîst mêtinger, emperyalîst, împaratorî, modernîte û şaristanî jî bi nav bikin. Krîzên reqabet-hegemonya, navend-hawîrdor û dadikevin-bilind dibin, her hebûn. Karîbû reqîbên xwe bixe kontrolê, navenda xwe li ser hawîrdorê serdest bike û ji xelekên pêxîrtengiyê (pêxîrtengiyên konjonkturel-demên kin û navîn) bi awayekî serketî derkeve. Bêyî ku şert û mercên hundir û derve ji hev cihê bike, ev şêwazê xwe yê tevgerê di tevahiya pêngavên xwe yên taktîk û stratejîk de pêkanî. Em ji vê polîtîkayê re çi polîtîkayên emperyalîzmê yên ‘parçe bike-bi rê ve bibe) çi jî hostatiya wê ya stratejîk û taktîk bibêjin, bi xwe heman nêzîkatiyê îfade dike. Ev yek li gorî mentiq, avabûn û maneya modernîteya kapîtalîst bi vî awayî dimeşe. Ingilîstanê mentiqê pêkhatina sîstemê bi kar anî, reqîbên xwe yên li Ewrûpayê, nexasim jî karîbû hesretên hegemonîk ên Franse, Elmanya û Spanyayê bê bandor bike. Di vê de mentiqê sê sîlehên bingehîn ango kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustrî bi şêweyekî di cih de bi kar anî, û bêguman di vê serketina wê de ev yek diyarker e. Ingilistanê li ser bingehê vî mentiqî ti heqîqeta bi kar neaniye nemaye. Bi xebitandina vî mentiqî wê hewl da Portekîzê li dijî Spanyayê, Şoreşa Franseyê li dijî qraliyeta Franseya li pey hegemonyayê diçû, heta Marks û Marksîstên bi awayekî pirr bi zanebûn li ber sîstemê radibûn, li dijî Împaratoriyên Elmanya-Awisturyayê û bi tevahî mezhebên Xirîstiyaniyê li dijî otorîteya Papatiyê bi kar bîne û bi pirranî jî di vê yekê de bi ser ket. Dîsa li gorî mentiq û ruhê sîstemê heman

stratejî û taktîk di asta global de bi awayekî di cih de bi kar anî û bi vî awayî karîbû hegemonya xwe ya global tesîs bike.

Di nîvê duyemîn ê sedsala 19. de wexta li tevahiya dinyayê Împaratoriya Roj Lê Naçe Ava tesîs kir, ya diyarker a pê gav avêt ne welat, dewlet, netewe û heta mezinahiya çînî bû, hêza wê ya weke nirx mentiq, mane û heqîqeta li dijî reqîbên sîstemê xwe spartibûyê bû. Ji vî alî ve bi awayekî serketî bikaranîna hêzê, em li cem Skenderê Mezin dibînin. Sîstema li pişt Skender şaristaniya Grek bû. Di têkoşîna reqabetê ya sîsteman de ya encamê diyar dike, ew nirx e ku mentiqê maneyê û heqîqetê xwe disipêrinê. Her maneya mentiqî dibe nekeve rewşa heqîqetê. Heqîqet, ew jiyana manedar a di nava tevgerê de ye. Mane dibe ku li cem kesekî bi awayekî bi hêz pêk bê; lê çiqasî were birêxistinkirin û bikeve nava tevgerê, dikare ewqasî veguhere heqîqeteke civakî. Di têkoşînên civakî de rewşên heqîqetê yên xwe di vî alî de bi rêxistin kirî, timî têne beramberî hevdu. Yên nirxê wan ê jiyanê bi awayekî manedar heye zû dereng wê encamê diyar bikin.

Naxwe di Împaratoriya Ingilîstanê de mentiqê tê temsîlkirin, manedartiya sîstema kapîtalîst e, bi tevahî hêza wê ya dîrokî ye, weke sîstem hebûna wê ya avabûyî ye. Hêza dewlet û çîneke xweserî giraveke piçûk nîne. Wexta welatekî mîna Hindistanê parzemîneke jêr bi hêzeke qasî panzdeh hezar kesî rêve dibe ya bi awayekî bingehîn diyarker, eşkere ye ku heqîqeta modernîteyê ya li pişt wê ye.

**a-** Împaratoriya Ingilîstanê di berfirehbûna xwe ya li Rojhilata Navîn de bi heman sedemên stratejîk tevgeriyaye. Pêdiviyên global ên sîstemê, nêzîkatiya wê ya ji bo herêmê diyar kiriye. Di serî de rêya diçe Hindistanê, weke rêya diçe mêtingehên li Rojhilata Dûr, nirxekî xwe yê stratejîk ê Rojhilata Navîn heye, çavkaniyên ekonomîk ên herêm pêşkêş dike û mekanên pîroz ên li herêmê ji bo serdestiyê sedemên wê ne. Ji sedsala 19. û pêve serdestiya bandorê li herêmê dike her diçe zêde dibe û ev gav bi gav hatiye pêşdebirin. Ingilîstanê wexta serdestiya xwe ya li ser qadê dimeşand, armanca wê ew bû ku, herçiqasî lawaz bûbe jî reqîbê xwe yê

berê Franseya hê jî li pey hegemonyayê bi kar bîne, pê namzetên nû yên hegemon Elmanya û Rûsyayê asteng bike da ku nekevin herêmê, hêza wan bi sînor bike û bi pêşengiya xwe nirxên modernîteyê tesîs bike. Ev armancên stratejîk heta roja me ya îro neguherîne. Em weha vê yekê rave bikin:

**1-** Mîna li gelemperiya dinyayê, Ingilîstan berê pêşî hewl dide hêzên serwer ên herêmê bi xwe ve girê bide, bixe bindestê xwe, wexta di vê de bi ser nekeve wan parçe dike; li ser vî bingehî nêzî du hêzên dawî yên li ser piya mayî yên şaristaniya kevin ango Împaratoriya Osmanî û Şahtiya Îranê bû. Li hemberî namzetên din ên hegemon Elmanya, Franse û Rûsyayê hewl dide van herdu hêzên herêmê hîmaye bike, nirxên modernîteyê li wan bar bike û wan bi awayekî mayînde hewcedarî xwe bike. Namzetên din ên hegemonyayê jî destvala nebûn û ji bo bandorê li herêmê bikin tevgeriyane. Armancên stratejîk ên bi heman rengî li cem wan jî hene. Herdu hêzên herêmê jî ji vê têkoşîna serdestiyê ya hegemonan sûd wergirtin û bi polîtîkayên tewazunê hewl dan temenê xwe dirêj bikin. Ingilîstanê weke hêza hegemonîk a zêdetir bi tecrube, ne tenê herdu hêzên herêmê hewceyî xwe kirin û bi xwe ve girê dan, bi polîtîka xwe ya 'dewleta netewe ya piçûk' a ji zû ve dabû destpêkirin, paşeroja demdirêj jî plan kiribû.

Çawa ku gelekî tê yeqînkirin, dewletokên neteweyî vedîtin û afirîneriyeke hêzên millîgir û neteweperest nîne. Berevajî, amûrekî muhteşem ê vedîtina polîtîka 'parçe bike-bi rêve bibe' ya hegemonya Ingilîstanê ye ku li nava dinyayê dimeşîne. Ingilîstanê bi vê sîlehê li împaratoriyên Ewrûpayê hemûyan daye, hem jî li ser navê şoreşgeriyê ango şoreşa millî. Ji sedî sed divê mirov tevgerên rizgariya millî revîzyone bike. Tê yeqînkirin ku ev tevger gerekeke sosyalîzmê ne, lê ev yeqîn şaş e. Afirînerê van tevgeran û yê di serî de pêk aniye, Ingilîstan e. Ingilîstan bi xwe weke împaratorî wexta berfireh dibe, împaratorên hevrik jî weke dewletokên netewe parçe dike, ji hêzê dixîne û parçe dike. Jixwe stratejiya desthilatdariyê ya modernîteya kapîtalîst jî bi awayekî bingehîn pêdiviya xwe bi dewletên vê tîpê heye. Dewleta netewe weke neynûk û goşt bi

modernîteyê ve girêdayî ye. Ingilîstanê xwe spartiye ezmûnên desthilatdariyên bi kok ên li ser vî bingehî û di vê çarçoveyê de her tim girîngî daye amadekirina elîtên desthilatdariyên piçûk. Bi qasî elîtên li desthilatdariyê, elîtên muxalefetê jî ji bo wê lazim in. Wexta hewce kiriye, ji bikaranîna wan jî xwe paşve nedaye. Ji ber vê jî wexta têkiliya xwe bi elîtên fermî yên herdu împaratoriyên herêmê re dewam kiriye, di ber re ji mezheb, eşîr û hindikayiyên curbicur ên bi împaratoriyan re nakokiyên wan hene, bi tevgerên piçûk ên dewleta netewe di warê îdeolojîk û pratîk de ketiye têkiliyê û destek daye wan. Wexta hewce kiriye di avakirina wan de weke hêzeke diyarker tevgeriyaye.

Kengî bi vê nêrtina di revîzyonê re derbas bûye, nêzî tevgerên neteweyî yên Ermenî, Rûm, Asûrî, Ereb, Kurd, Tirk û Farsan bibin, dikarin bi awayekî rasttir li du sedsalên dawî yên Rojhilata Navîn serwext bibin. Îdeolojiyên divê di revîzyonê re bêne derbaskirin, bêyî ku mirov wan weke rastgir-çepgir û dînî-laîk ji hev cihê bike, di bingehê hemûyan de nêrtina oryantalîst heye, oryantalîzm bi xwe ye. Dused salên dawî yên Rojhilata Navîn bi tenê di warê hewcedarbûna hegemonîk de ne, di warê parçebûna herêmê weke dewletokên neteweyî de jî bi kûrahî di nava krîzê de bû. Di vê krîzê de Împaratoriya Osmanî hatiye hilweşandin û li şûna wê gelek dewletokên neteweyî hatine avakirin. Ereb dabeşî bîstûdu dewletokan bûne û parçebûna wan weke bi sedan qebîle û mezheban jî her di rojevê de hatiye hiştin. Tirkên elîta serdest a împaratoriyê li Anatolyayê bi dewleteke piçûk a neteweyî re mijûl dibûn, lê li Balkan, Qafqas û Rojhilata Navîn bi dehan hindikayiyên Tirk û Tirkmenan li naverastê hatibûn hiştin. Ermenî, Rûmên Anatolyayê, Suryanî û Pontûs bi darê zorê ji cihûwarê xwe hatibûn koçberkirin û ji aliyê etnîk ve hatibûn tinekirin. Ketibûn rewşekê ku çanda xwe ya hezarê salan ji aliyê mekan û zeman ve ji dest didan. Cihû hem weke gel û hem jî weke dîn statuya wan, mîna ku dîroka wan ji nû ve bîne serê wan, weke dînamîkeke kaosê ya desthilatdariyê li herêmê bi roleke girîng radibin. Weke yek ji hêzên avaker ên pêşeng ên modernîteya kapîtalîst, di dused salên dawî de vegera wan a herêmê, rewşa kaotîk kûr kiriye.

Cihûtî dînamîkeke kaosê ya bi tenê bi Filistîn-Ereban re têkildar nîne; hêzek e ku ji gelek aliyan ve xisletên xwe hene û aliyê xwe yê rewşenbîrî jî gelekî pêşketî ye. Tevî van aliyên xwe, divê di avakirina demokrasiyê ya li herêmê de, weke hêzeke bingehîn bi girîngî li ser were rawestan. Divê em ji bîr nekin ku di heman demê de yek ji wan hêzên sereke ye; rêûresma pêxembertî û dînên yek xwedayî hem ava kiriye û hem jî hilgirtiye aniye. Gelê herî kevin ê herêmê Kurd, her tim li ber qirkirina fizîkî û çandî hatine hiştin. Destûr nehatiye dayîn ku Kurd ji statuya serê kûnêr û serêşiyê derkevin. Weke qerteke têkûz a polîtîkaya parçe bike-bi rê ve bibe her tim di destê xwe de girtine. Bi vî awayî timî nava Îranê tengezarkirî hiştine û hewl dane bi rê ve bibin. Weke ku ev jî ne bes be, li gorî tehlîla dawî, bi şêwazên laîk û dînî ku herdu jî hevkar û girêdayî ne, kaosa siyasî hê bêtir hatiye kûrkirin.

Eger bala we kişandibe, di krîza hêz û desthilatdariyê de di serî de DYE, Rûsya û Elmanya, me rola nûnerên din ên modernîteyê zêde hûr nekola. Sedema vê yekê ew e, hem me xwest rola diyarker a modernîteyê derxin pêş û hem jî qalkirina navên welatan zêde vegotinê xurt nake. Jixwe di roja me ya îro de baştir tê fêhmkirin ku hêzên bi vî rengî, nexasim jî piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn destwerdanên DYE û Rûsyayê yên zêde bûn, bi tenê krîza desthilatdariyê kûr kirin û ji vê pêve jî ti encam nedan. Di serî de li Afganistan, Iraq, Îran, Sûrî-Lubnan, Îsraîl-Filistînê, asta pêxîrtengiya siyasî ya li welatên Rojhilata Navîn gihiştiyê, vê nêzîkatiya me piştrast dike.

Bi tevahî dewletên hûr û gir ên li herêmê hatine avakirin, çi bi navê millîgir çi jî bi navê dîndartiyê be, eşkere nikarin ji rola fîguran û ajanên dema wan bihurî yên modernîteya kapîtalîst wêdetir biçin û tiştekî din îfade bikin. Eger mirov li dîroka wan a kurt binêre, wê zehmet nebe ku mirov fêhm bike, dewletên millîgir û Îslamî îmalatên emperyalîzmê yên dused salên dawî ne. Ji ber ku berhemên hegemonîk in, bi sedema terora li ser pêkhatina ‘welatiyê seyr-sosret’ dimeşînin, rûyê rastî yê van dewletan bi ti awayî nehatiye fêhmkirin.

Bi qasî hêzên dewleta netewe û desthilatdariyê yên li Rojhilata Navîn qadeke din nîne ku karibe evçend rola xwe ya ajan-fîgurantiyê veşêre. Di

vê de tecrûbe û hegemonya îdeolojîk a di encama dekûdolabên desthilatdarî û dewletê yên hezarê salan de hatine bi dest xistin para xwe girîng in. Yên kûrahiya krîzên desthilatdarî û dewletê li Afganistan, Iraq û Îsraîl-Filistînê dibînin, heye ku ji rewşê loma bikin. Lê belê, ev rastî çiqasî bingehê kûr ê dîrokî yê rewşa krîz û kaotîk nîşan bide û ewqasî jî nîşan dide û piştrast dike ku aliyekî wê yê girîng ê têkildarî hilweşîna şaristaniyê heye. Dewletokên neteweyî yên dused salên dawî bi tenê hilnaweşin, di heman demê de rêûresma deshilatdarî û şaristaniyê ya pênc hezar salî jî hildiweşe.

Krîzên dewlet û desthilatdariyê yên li Rojhilata Navîn, eger li ser bingehê şaristaniyê bêne analîzkirin, mirov dikare li wan serwext bibe. Cîlaya dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst divê nebe sedem ku mirov krîza şaristaniyê nebîne. Jixwe modernîte bi xwe, bi kirinên xwe yên li Rojhilata Navîn, xisletên xwe yên kaotîk bi tevahî û bi awayekî eşkere li naverastê li pêş çavan raxistî ye. Bi qasî van kirinên wê yên li naverastê, tecrûbeyeke din nîne ku hînî me bike ku kapîtalîzm rejîmeke krîzê ye.

**2-** Modernîteya ku bi pêşengiya hegemonya Ingilîstanê belav dibe, rûyê wê yê li ser zemînê civakî yê Rojhilata Navîn hê kaotîktir e. Em dizanin ku bi damezrandina sîstemên şaristaniyê re dînamîkên civakî vediguherin avahiyên xwedî pirsgirêkên giran. Demên Sumer, Aqad, Babîl û Asûrê, ne bi tenê bi krîzên desthilatdariyê, bi krîzên civakî yên canxiraş û xeternak xwe bi bîr dixin. Lawikên şînê, yên bajêr ên Ûr, Nîppûr, Aqad, Babîl û Nînovayê feryad û fîganên krîzên qewimî heta bi roja me ya îro didin hiskirin. Baş e, rewşa îro ya Helebce, Kerkûk û Baxdayê ji van lorîkên şînê, çi cudahiya xwe heye?

Kapîtalîzm bi xwe di avahiya civakî ya herêmê de diyardeyeke nayê zanîn nîne. Kapîtalîzmê ji hezarê salan û vir ve, xwe weke bazirgan-selefkar dabû naskirin. Bi yekdestdarên desthilatdarî û cotkariyê re têkiliya xwe bi awayekî xurt parastibû. Beşê herî zêde krîz îstîsmar kirî, ew bû. Çawa ku ji aliyê tevahiya dînên pîroz ve hatibû lanetkirin, jixwe tê zanîn nîzamên civakên komin bi bêexlaqiyê hukim lê birrîbûn û ew weke

saziyekê, ji xwe dûr digirtin. Ya bi kapîtalîst modernîteyê re qewimî, eşkere derketina holê ya vê beşê ye. Rewatiya çînî ya van beşan li Ewrûpayê bi dest xist, li Rojhilata Navîn jî bi dest xistin û vê yekê jî tewazunên civakî têra xwe tengav kirin. Bûrjûwa weke çîn li ser hîmê rewatiyê hat herêmê û hevkarên xwe çêkirin, bi vî awayî ji bo desthilatdariya hegemonîk beşekî girîng ava kir. Barhilgirê modernîteya Rojava tevî burokrasiyê, ev beşa komprador bû. Bi awayekî bingehîn bi van herdu beşên hevkar, sîstemê hewl da li herêmê bi cih bibe. Di civaka Rojhilata Navîn de beşên herî zêde xerîbketî, ev beş in. Ew aliyê pêxîrtengiyê yê civakî temsîl dikin. Nirxên xerîbxistinê yên van beşan xistin nava çanda herêmê, ji pêşdebirina kaos û pêxîrtengiya civakî wêdetir, bi kêra tiştekî din nehatin.

Bûrjûwaziya di dused salên dawî de li meştela dewleta netewe gihişt, ji bo tahmandinê ji avahiya civakê ya dîrokî re xerîb e, tahmandina tê kirin nagire. Ji ber vê, amûra bi navê dewletê ya di destê xwe de û yekdestdarên xwe yên li ser ekonomiyê bi awayekî faşîzan bi kar tîne û xwe ji vê venade. Ya rastî, yekdestdariyeke sermayeyê ya bi desthilatdariyê re tê, ji xweavêtina faşîzmê pêve, çareyeke wê namîne. Li dinyayê li herêmên din ên bi heman rengî û li Rojhilata Navîn bi vê xisleta sermayeyê û zordariya di avakirina dewleta netewe de cewherê bingehîn ê faşîzmê pêk tîne. Faşîzm weke şêweyê desthilatdariyê yê sermayeya bi dewleta netewe re di zikhev de pêk tê, bi rêya desthilatdariyê weke şêweyê yekdestdarîkirina daneheva zêde ya sermayeyê, dibe xwedî mane.

Faşîzm li gorî naverok û pênaseya xwe, rejîma timî bi civakê re di nava şer de ye. Ya rastî mirov dikare faşîzmê weke rejîma şerê navxweyî jî bide naskirin. Bûyerên rojane li Iraqê diqewimin vê nirxandin û şîroveyê têra xwe rohnî dikin. Eger rejîmek timî bi civakê re di nava şer de be, wê wextê rewşa herî kaotîk û krîza herî bi tehlûke îfade dike. Wexta aliyekî asta krîza di civaka Rojhilata Navîn de bi vî awayî were pênasekirin, wê wextê kûrahî û şîddeta vê krîzê baştir wê were fêhmkirin. Civak çi bêdeng, sakin û sukûn xuya bike, çi herroj bi teqemeniyan biheje, jiyana di rewşa kaotîk

û krîzê de bi xwe hebûna xwe diparêze. Sukûneta di nav civakê de şerê sar, rewşa pevçûnê di nava heman atmosferê de şerê germ îfade dike.

Bi kurtî, modernîteyê bi îxrackirina kapîtalîzm, sermaye û bûrjûwaziyê, krîza civakî ya ji rêûresmê û rewşa kaotîk bêtir kûr kiriye. Bêguman jiyaneke civakî heye. Lê ev jiyan hinekî jî dişibe perpitandina hin heywanên serê wan jêkirî yan jî hin endamên wan hatin qutkirin. Wexta em qirkirinên çandî û fizikî yên li naverastê û van hilweşîn û trawmayên civakî yên rojane diqewimin, pênase dikin, divê ev teşbîhên me zêde nepixandî neyên hesibandin. Eger empatî were kirin, mirov dikare gelekî hîn bibe!

**3-** Di êrişa modernîteyê de divê mirov îndustriyalîzmê jî di heman çarçoveyê de binirxîne. Di dema dawî ya herêmê de îndustriyên hatin îxrackirin di krîza hawîrdor û civakê de bi roleke zêdekirinê rabûne. Îndustriyalîzma ku li şûna ekonomiya pêdiviyên bingehîn, pêşî cih daye kara yekdestdariyan, di bin navê pêşdebirina ekonomiyê de ekonomiya têra xwe dike jî hilweşandiye. Jiyana ekonomîk a bi hezarê salane xwedî tewazuneke navxweyeyî ye, ji bo kara mistek emperyalîst û yekdestdarên hevkar, di demeke bi qasî temenê mirovekî de ji aliyê aborî ve hatiye qirkirin. Tevî artêşeke mezin a bêkaran, gundên hatine valakirin, koçberiyên hundir û derve, enflasyon, krîzên ekonomîk, bajarbûnên bêbajar, hawîrdorên ekolojîk ên bi lez hildiweşin, bi tenê hin nîşaneyên vê qirkirinê ne. Mirov hema bi tenê di qirkirinê de rola yekdestdarên sîleh û petrolê li ber çavan bigire, rastî wê hê baştir were fêhmkirin. Herweha li gelemperiya dinyayê guherînên avhewayê, herêma jixwe beşekî wê yê mezin çol e, asta rêjeya çolbûnê digihîne pileya felaketê.

Belavbûna dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst, li Rojhilat Navîn ji şerên di dîroka tevahiya şaristaniyan de zêdetir rê li ber gelek şeran û mirinan vekiriye û herweha vê yekê rê li ber rewşeke kaotîk û krîzê ya avabûnê ya gelekî kûr û domdar vekiriye û ev rastiyek e ku mirov dikare ji ber sedemên diyarkirî fêhm bike.

**b-** Dubare be jî mirov ji nêz ve li bûyerên berçav ên di roja me ya îro de diqewimin binêre, wê karibe mentiqê êrişê yê modernîteyê bibîne û mirov bi vî awayî dikare gelekî jê hîn bibe. Ji bo vê, mirov ji nû ve li têkiliya di navbera dîrok û niha de binêre, wê rewşê hêsan bike. Bêguman mirov bibêje dîrok = niha ye, wê bibe totolojiyeke gelekî çor. Lê mirov nikaribe bibîne aniha bi pirranî di bin bandora rabihurî û dîrokê de pêk tê, wê rê li ber korfêhmiyên mezin veke. Vî tayê di navbera herdu diyardeyan de mirov dikare bi awayekî balkêş di têkiliya Ereb-Cihûyan de bibîne û mirov dîsa dikare vê têkiliyê di navbera Tirk-Kurd, Tirk-Ermenî, Tirk-Rûm, Tirk-Cihûyan de jî bişopîne. Ev bûyerên rojane yên di navbera van dualîteyan hemûyan de diqewimin, mirov nikare ji dîrokê qut binirxîne. Têkiliya dîrok-civakê di nava xweseriya xwe de pirsgirêka herî heyatî ya rêbazê ye. Bi tevahiya têkilî û nakokiyên xwe mirov wê weke hêmanê avaker ê civakîbûna dîrokî bibîne, divê weke mijara bingehîn a mentiq bi mane bibe. Bi kurtî, mirov nikare niha, rojane, bê dîrok fêhm bike. Ya ji vê jî girîngtir ew e, mirov a nû di niha de nebîne (para dîrokê ji sedî 99 be jî), nikare ya berçav a rojane binirxîne, analîz bike. Belkî di vê mijarê de mirov dikare gelek tiştan bibêje, lê yên bêne gotin ji gotinên tewş û pûç wêdetir naçin.

Dîroka li pişt giraniya rojane ya modernîteyê li Rojhilata Navîn, mirov bi êrişên dawî yên Akayan birin ser Troyayê (1200 B.Z.) bide destpêkirin, dikare bibe destpêkeke di cih de. Pêvajoya Helenîzmê ya bi Skender dest pê kir (330 B.Z.) qonaxeke girîng a fethê ye. Êrişên Xaçperestan (1096-1389) dîrokeke hê nêz a êrişê ye. Li muqabilî vê, Rojhilat jî êrişên berfireh birin ser Rojavayê. Bandora herdu aliyan li hev kirî ji gelek aliyan ve pêk hatiye. Di êrişa modernîteya kapîtalîst de mirov rola hegemonya îdeolojîk nebîne, wê kêmasiyeke mezin be. Eger oryantalîzm li ber çav neyê girtin, serdestiya fizîkî ya modernîteyê bi serê xwe nayê fêhmkirin. Têkoşîna hegemonîk a dused salên dawî rastiyek e ku ya rojane ji herî nêz ve diyar kiriye. Ya rojane jî mîna kevirê aş digere, û timî derdê wê hilberîn û avakirina tiştekî nû ye.

Wexta ku em di çarçoveya vê perspektîfa bingehîn de binêrin, xusûsa pêşî ya der barê rojane de em bibêjin ew e, ne hêzên ji rêûresmê ne jî hêzên serdest ên modern, çi bi giştî ji bo derketina ji nav pirsgirêkên civakî û çi jî bi taybetî ji bo derketina ji nav krîz û kaosê çareseriyeke wan a pêşkêş bikin, tine ye. Hêzên bi xwe çavkaniya pirsgirêk û krîzê ne, hemin nikarin bibin hêza çareseriyê. Çi li ser navê dînperestî û çi jî bi navê milletperestiyê, mirov xwe biavêje dîroka ji rêûresmê, çareserî nabe. Ji ber ku dîroka van hêzan jî dîroka çaresernekirinê ye. Kîjan şaristaniya bi heybet a kevin dikare ji nû ve were zindîkirin? Eger Îslamiyet û Osmanî bêne vejandin jî ev vejandin wê herhal di bin hekîmtî û parastineke xurt a DYE'yê de û bi hêza wê ya mûcîzewî pêk bê ku ev jî wê bibe Îslamiyet û Osmaniyeke din.

Çareseriyên hêzên modern pêşkêş bikin, nînin. Ew bi xwe bi pirsgirêk in, û avakerên sîstemeke dewamî bi krîz in, baş e, wê wextê ew ê çawa bibin çareserî? Krîza fînansî ya rojane bi aliyê xwe yê avabûnê û global, rêya derketinê nabîne. Hîmên Rojhilata Navîn bi hezarê salan xwe berdidin û modernîteyê kiriye ku çareserî û xelasiya ji pirsgirêk û krîzên wê zehmetir bibe. Baş e, naxwe ew ê kîjan çareseriyê pêşniyar bikin? Sîstemeke ku bi tenê bi lîstina hejmar û kaxizên ferazî ji hilberîna dinya heyî deh qatan zêdetir ango li derdora 600 triliyon dolarî dişêlîne, îhtîkar dike, ne çareseriyê, bi tenê dikare deriyê cehennemê veke.

Em hewl bidin îfade bikin, bê ka çawa desthilatdariya îdeolojîk û yekdestdariya dewletê roja me ya îro pêk tên û bi awayekî berçav xuya dikin.

**1- Nakokiya Ereb-Cihûyan:** Ji ber ku di dîrokê de sîstema şaristaniyê, di dîroka nêz de û rojane jî modernîteyê ev nakokî afirandiye, çareser nabe. Heta ku ji çarçoveya desthilatî û dewletê xelas nebin, Îslam û Cihûtî ti carî li hev nayên. Ew heta ji bo hêza desthilatdarî û dewletê israr bikin, herdu hêz jî wê weke di dîrokê û roja me ya îro de hebûna xwe bi tenê di tinekirina hevdu de bibînin. Dîrokên desthilatdariyan bi vî rengî tên avakirin. Modernîteyê ev pêvajo hê zêde dijwar û tîr kir. Heta ku hinek di

bin sêlingên distanê de bipelixin, ji vê re çareserî tê gotin. Ango bi zimanê modernîteyê çareserî, di bin sêlingên sincirandî yên distanê de (kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustriyalîzm) bi pelixandinê gengaz e. Dîroka pêncsed salî ya modernîteya kapîtalîst bi mînakên bê hedûhesab ên bi vî rengî tijî ye. Ev pirsgirêk li derdora sedsalekî ye ku bandoreke herî nebaş li herêmê dike, rê li ber gelek êş, zirar û ziyanê vedike, bi nêzîkatiyên serdest ên heyî, wê hê bandorên nebaş bike û bivênevê wê dewam bike.

Ti mînak bi qasî pirsgirêka Ereb-Cihû nikare rûyê rastî yê xwînrij ê çareseriyên şaristaniyên desthilatdar-dewletdar nîşan bide. Ji vê jî seyr û sosretir, Cihû di avakirina modernîteya kapîtalîst de bi roleke mezin rabûn. Hêzên modernîteyê qirkirina tê maneya 'tenêtî-tekîtî' bi Cihûyan dan tahmkirin. Bi rastî bi qasî vê qirkirina berê hatibû pîlankirin, kêm mînak hene çareserî yan jî çaresernekirina dawî ya modernîteyê çi ye, nîşan bide.

**2- Nakokiya Tirk-Kurd-Ermenî-Asûrî-Rûm-Cihû:** Ev kategoriya nakokiyan bi awayekî bingehîn çavkaniya xwe modernîteya kapîtalîst e. Herçiqasî kokên wê xwe berdin şaristaniyên kevin jî bi belavbûna li herêmê ya sê suwarên mehşerî yên modernîteyê –kapîtalîzm, dewleta netewe, îndustriyalîzm –Anatolya û Mezopotamya bûn dika bêhejmar qirkirinên millet û etnîk ên ti carî di dîroka xwe de nedîtibûn. Ev hêz û çandên bi awayekî hêza bingehîn a avaker a sîstema şaristaniya navendî ne, bi dîroka dused salên dawî ya modernîteyê re ji hev kîn û rik kirin, bi çavên dijminan li hev nêrîn û kirin ku hewl bidin hevdu qir bikin. Çanda bi hezarê salan a ketibû serhev, tesfiye bû, hin gel ji herêmê hatin mişextkirin, hin hatin tinekirin. Yên mayî jî yan bûn qebîleyên çolan an jî qebîleyên çiyan. Ya rastî, nakokî di navbera Tirkan û gelên din an jî navbera gelên din bi xwe de nebû. Eşkere bû, yên ev nakokî çêdikirin hêzên neteweyî yên hegemonîk ên modernîteyê bûn ku bi polîtîkayên xwe yên pêncsed salan ên 'parçe bike-bi rê ve bibe' xwe ispat kiribûn. Van hêzan li herêmê ji bo berjewendiyên xwe yên konjonkturel gelên kokên wan xwe berdidan kûrahiya dîrokê dikin mîna geraseyê ber qirika hevdu

dan. Tevahiya van gelên mîna ku şerê hev bikin xuya dikirin, ya rastî qurbanên mêtinkarî û desthilatdariya kapîtalîzmê bûn. Cihê xemê ye, wexta van gelan hevdu tine dikir, bi kûrahî haya wan ji wan nebû ka xizmeta kê û çi dikin. Di çarçoveya vê nakokiyê de qirkirinên pêk tên bi serê xwe jî têra ispatkirinê dikin ku modernîte di dîrokê de sîstema herî xwînrij a şaristaniyan e. Li gelemperiya Rojhilata Navîn deverên demeke dirêj weke 'baxçeyê gelan' bûn îro veguherîne 'qebristaneke gelan' a bêdeng. Eger li ser navê gelan û çandan, bi wijdan tiştek wê bê gotin û rewşenbîrên rastî wê erk û berpirsiyariyên xwe bi cih bînin, berê pêşî divê berpirsiyarên rastî yên van qebristanên gelan û çandên wan bêne destnîşankirin û hesabê wan were pirsîn.

**3- Nakokiya Şîa-Sunnî:** Herçiqasî kokên wê biçin dema derketina pêşî ya şaristaniya Îslamê (Îslama desthilatdar) jî şerê van herdu mezheban di roja me ya îro de bi modernîteyê ve girêdayî ye. Nexasim şerê dema dawî yê Îran-Iraqê, mirov bi tenê di çarçoveya forma dewleta netewe ya modernîteyê de û girêdana wê bi emperyalîzmê re dikare bi vegotineke rast bîne ziman. Jixwe çi şer û nakokiyên Îslamiyet-Mûsewîtî, çi yên Îslamiyet-Xirîstiyantiyê û heta çi yên Xirîstiyantî-Cihûtiyê di çarçoveya proto-modernîteyê de dikarin werin analîzkirin. Form û sedemên şerên dînan ên beriya modernîteya kapîtalîst, bi kirasê pozîtîvîst, çawane wisa xwe di modernîteyê de nîşan dane. Nexasim divê mirov sê dînên bi koka xwe yek xwedayî yên Rojhilata Navîn weke pêş-milletperestiyê bibîne. Cudahiya van dînan ji milletperestiya modernîteyê ew e, maskeya teolojîk li ser rûyê wan heye.

Tevahiya lêkolînên li ser mijarê di koka vegotinên pozîtîvîst ên dema modernîteyê de hebûna formên dînî di bingeh de ispat dikin. Berevajî îddîayan, di navbera sekulerîzm (dinyewî) û uxrewiyetê (axîretî, dînîtî) de bi xwe cudahiyeke zêde nîne; bi tenê di şêweyê de hin cudahî hatine afirandin û nepixandin. Di encamê de hem dînê dewlet û desthilatdariyê hem jî vegotinên bûne îfadeyên dewleta netewe ya modernîteyê ji heman berjewendiyên yekdestdariyê re xizmetê dikin. Şerên mezheban ên li Rojhilata Navîn û Ewrûpayê, çawa ku di dîrokê de bû, di roja me ya îro de jî

çavkaniya xwe şaristanî û modernîte ne, û bêyî ku ji leza wan tiştek kêm bibe, li ser hîmê heman berjewendiyan têne dewamkirin. Her cure milletperestî û ekolên Mûsewîtî, Xirîstiyantî û Îslamtiya radîkal di xizmeta sê suwarên mehşerî yên modernîteyê de bûne yek.

Rûyên bi xwîn û bazirganên şaristaniyê yên bi hezarê salane çanda dewlemend a gelên Rojhilata Navîn dikerritînin, îro jî di xizmeta modernîteya kapîtalîst de ne, danehevên dawî yên di dest de jî mane bi awayekî bêrehm, bêhesab, di nava xwîn û rondikên çavan de diqedînin; herêmê dikin xirbe û kavil, hawîrdorê vediguherînin çolê û çiyan jî bê kes û kûs, kerr û xalî dikin.

**4- Nakokiyên Dewletokên Neteweyî Bi Her Tiştî Re:** Gotinek navdar heye: Dibêjin qazoxê herî mezin ê kapîtalîzmê daye mirovatiyê, dewleta netewe ye ku wê avakiriye. Ev gotin ji bo netewe û gelên Rojhilata Navîn bi awayekî pirr eşkere rast e; hema hema li her navenda herêmê bi şerên rojane ev yek gavbigav kêlîbikêlî tê piştrastkirin. Dewleta netewe ya bi dewletên din ên netewe re û di nava xwe de bi gelên xwe re şer neke, nîne. Ji Îsraîlê zêdetir ê çand û neteweya mezin a Ereb diqedîne, hesabên desthilatdariyê yên bîstûdu dewletokên netewe ne; lêçûn û mesrefên wan ên mîna serxweçûyan û dûrî aqilan e. Gelên wan şerpeze û perîşan in, lê desthilatdariyên wan ji Firewn û Nemrûdan gelekî wêdetir di nava her cure îhtîşam, zewq û sefayê de ne. Îhtîşama wan jî ti maneyeke xwe nîne. Ya vê hêzê dide wan jî xwedayê nû yê sekuler, dewletokên neteweyî ne. Girêdana wan bi xwedayên wan ên kevin re sexte û qelp e. Qaşo qirêdayî ne. Ingilîstanê, dewletdariya neteweyî ya Ereb, ji bo rêya Împaratoriya xwe ya Hindistanê di bin destan de bigire, xwediyê çavkaniyên petrolê be û Împaratoriya Osmanî di kontrolê de bigire, pêşde bir. Tevî ku rastî ev e, dewletokên Ereb xwe millîgir dihesibînin û sedema vê jî teknîka desthilatdariya modernîteyê ye. Dewletên netewe yên behsa wan tê kirin ji hegemonya kapîtalîst a dinyayê re saziyên bingehîn ên ajantiyê ne.

Di pêkhatina dewleta netewe ya Fars de jî mirov bi awayekî ibretwarî dibîne ku heman dekûdolab hatine gerandin. Fars ji şaristaniya Persan ve

di hunerê desthilatdariyê de gelekî hoste bûbûn, lê ev hostetiya xwe di dema moderniteyê de li ser hîmê hevkariyê bêhtir pêşde birin. Mirov dikare bibêje; xapandinên şaristaniyê û xapandinên moderniteyê (milletperestiya Şîa) di zikhev de baş bi kar tînin û heta di wê hêzê de ne, dikarin bi Çîniyan re bikevin pêşbaziyê. Çîniyan ser kapîtalîzma herî hov bi 'kominîzmê' cîla kirin, modernîstên Îranê jî pûtê dewleta netewe yê îmalata kapîtalîzmê ne, bi awayekî rûşuştî bêyî ku şerm bikin, weke ruhperestiyeke mezin bi navê 'Komara Îslamî' pêşkêş dikin. Îran bi rewşa xwe ya aktuel a li ber çavan mîna neksa sîstema global e, û bi îhtîmaleke mezin li ser rêya Iraqbûnê ye. Tevî ku mîna dewletên netewe yên din ên li herêmê faşîzma bi sazî bûyî temsîl dike jî ji kêmûkurtiyên hegemonya DYE-YE sûdê werdigire û temenê xwe dirêj dike. Lê mîna yên din Îran jî di nava pencê krîzê de ye, û ji bo rê li ber rewşeke kaotîk a Iraqwarî veke têra xwe xwedî potansiyel e.

Dewletên netewe yên Turkî tevî hîmayeya DYE-YE'yê di nava hegemonya Rûsyayê de bûne xwedî hebûn. Zeviyek in, cihê xwe li hev rakişandinê ye. Tevî ku xwe gelekî milletgir nîşan didin jî bêyî hegemonyayê zor û zehmet e ku li ser piyan bimînin. Ji krîza herêmî gelekî para xwe girtine û xwedî potansiyela kaotîk in. Bûyerên di çarçoveya Afganistan-Iraqê de diqewimin, aqûbetên muhtemel ên dewletên netewe yên herêmê eşkere nîşan didin.

Li Rojhilata Navîn rastiya dewlet û desthilatdariyê, ji bo pirsgirêkên giran ên civakî li şûna afirandina çareseriyan, zêdetir dihêle krîzên herêmî bi şeran bi dawî bibin, ji ber ku di çavkaniya pirsgirêkan de cih digirin. Şer jî krîzê mezintir dikin û rewşên kaotîk belav dikin.

**c-** Lingên moderniteyê îndustriyalîzm û kapîtalîzm zirara xwe ya bingehîn rojane di jihevdexistin û xirakirina civaka ji rêûresmê ya gund û cotkariyê de nîşan didin. Li aliyekî lingê din ê moderniteyê dewleta netewe, herêmê topyekûn vediguherîne zindanê di nava xwîn û rondikên çavan de dixeniqîne, li aliyê din jî îndustriyalîzm û kapîtalîzm ji jor ve serî li rêbazên herî talanker ên yekdestdariya hevkar didin, nirxên civakî yên

berhemê danehevên hezarê salan e, bi bahaneya kar û pere nakin bi derbekê bi destê xwe dide aliyekî, wan dike iskarta û gincir, û bi vî awayî wan dirizîne. Hilweşîna civaka gund û cotkariyê pirsgirêkeke besît a aborî nîne. Tinekirin û têkçûna çandeke civakî ya deh hezar salan e. Pirsgirêk jî li şûna cotkariyê girîngiya ekonomiya pîşesaziyê ya zêde karê tîne nîne, hebûna civakî bi xwe ye. Di rewşa krîza avabûnê ya roja me ya îro de bi awayekî pirr bi zanebûn di serî de qadên cotkariyê di gelek qadan de civak bê kar tê hiştin, nebatên genetîk derdixin pêş û bi vî awayî derbê li cotkariyê dixin. Nebatên bi genetîka wan hatî lîstin, bi tenê nebatên xwezayî naşkînin, ji nexweşiyên dawiya wan nayê zanîn re zemîn jî amade dikin.

Pîşesaziya kapîtalîzmê herî kêm bi qasî yekdestdariya dewleta netewe yekdestdariyek e ku êrişê dibe ser civakê. Têkiliya wê ya bi ekonomiyê re şaş tê fêhmkirin û bi zanebûn tê berevajîkirin. Îndustriyalîzm di hegemonya Ewrûpayê de bi roleke dîrokî rabûye. Lê rola wê ya bingehîn li qadên dewrûberê dinyayê bicihkirina vê hegemonya ye. Wexta vê rola xwe bi cih tîne, di bin navê teknîkên hilberîna wan xurt de pîşesaziya xwecihî xira dike. Ekonomîk nîne, antî-ekonomîk e. Civakên Rojhilata Navîn ên di dîrokê de timî dewlemend bûn, di bin êrişên dused salên dawî yên modernîteyê de demên xwe yên herî xizan dibihurînin. Hilweşandina civaka gund û cotkariyê ji ber berhemdariyeke ekonomîk nîne; li ser navê bûrjûwayê bi cihanîna serdestiya çînî ye. Bûyerek e ku têkiliya xwe bi siyaset û desthilatdariyê re heye.

Îndustriyalîzm dikare ji bo metropolên hegemonîk kara herî zêde bi dest bixe. Lê di berdêla vê de qadên gundan vediguherin çolê û gund vala dibin. Ango pêxîrtengiya civakî û ekonomîk zêdetir dibe. Îndustriyalîzm li ser cografya Rojhilata Navîn û jiyana wê ya ekonomîk, teknîkeke êrişê ya îdeolojîk-polîtîk e, belkî jî ji şerên desthilatdarî-dewletê bi tehlûketir encaman dide. Ji guhertina rewşa avhewayê, ji zuhabûna golan, erdên avgîr û çeman berpirsiyarê sereke ye, û zirara xwe bi vê lezê dewam bike, dinyayeke mirov karibe lê bisitire û bijî wê nemîne. Îndustriyalîzm gefan li jiyan û civaka Rojhilata Navîn a bi daneheva çandî ya panzdeh hezar salan

avabûyî dixwe û bi qasî qirkirin û kokqelandina bi rêya şeran dibe, bi tehlûke ye. Ez dubare divê bibêjim, îndustriyalîzm berevajî yeqînan, amûra herî bingehîn e ku êrişê dibe ser civak û ekonomiyê. Hêza hilweşîner a pîşesaziya rastî ye. Kapîtalîzm bi hêrsa kara herî zêde, bi xebatên îndustriyal ên dimeşîne welatan xweşhal û dewlemend nake, berevajî hildiweşîne, xira dike. Ji krîzê wêdetir kavil dike, vediguherîne xirbeyan. Bi tenê îndustriya li Afganistanê ji bo xaşxaşê û îndustriya li Iraqê ji bo petrolê tê kirin, baş û eşkere nîşan dide ku qadên behsa wan tê kirin çawa kavil kirine. Ne bi tenê welat kavil bûne; civaka dîrokî û çand jî kavil bûne.

**d-** Di çaresernebûna pirsgirêkên civakî yên Rojhilata Navîn de rola bajar, burokrasî û çîna navîn ku li tevna modernîteyê hatine xistin, divê bi girîngî bê nirxandin. Di çarçoveya kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustrayalîzmê de sêbera bajar, burokrasî û çîna navîn a ji nû ve ava kir, gelekî hosta ne ku xwe weke navenda balkêşî û çareseriyê pêşkêş bikin. Tevî ku berhemên atmosfera belavbûna modernîteya kapîtalîst in, bi nazenînî hewl didin kokên xwe mîna serbixwe û orjînal bin, nîşan bidin. Weke hêza hegemonîk rûniştina li ser civaka ji rêûresmê ji karên xwe yên berê pêşî dihesibînin. Tevî ku têkiliyên wan bi modernîteyê re li ser hîmê hevkartî û ajantiyê ye, ji bo xwe weke hêzên avaker ên modernîteyê bidin qebûlkirin, her cure dînîtiyê dikin. Mirov dikare van weke bingehê mekanî, sazî û civakî yê faşîzma ji rêûresmê pênase bike. Ji ber ku ji derve li ser civaka ji rêûresmê têne ferzkirin, mîna tahmandina daran a cihê xwe nagire, xuya dikin. Rastiya xerîbketina wan bi kok e. Ji ber vê rastiya wan a xerîbketî di asta man û nemanê de xwe bi modernîteyê digirin. Ji ber ku mêtinkarî û dagirkeriya hegemonya kapîtalîst yekser pêk nayê, ew di statuya hêzên mêtinkar û dagirker ên bi maske yên xwecihî de ne. Ji hundir ve dagirkerî û mêtinkariya civakê dimeşînin. Tevî vê yekê, xwe milliyetgir, dewletparêz û heta civakparêz ê herî tûj dihesibînin û weke îroniyekê derdikevin pêşiya me. Ez wexta hûrûkûr difikirim, ez neçar dimînim ku van beşan weke şaxên navenda kapîtalîzmê binirxînim. Ev beş weke varyasyoneke aktuelbûyî ya prenstiyên qralên serdema navîn xuya dikin.

Bi kurtî, ji ber ku şêwazê wan kopîkirina ji modernîteyê ye, ne çareserî, çavkaniya bingehîn a pirsgirêkan e. Çaresernekeriya modernîteyê bi awayekî eşkere xwe di bikokiya çîna navîn, xetimîna burokrasî, bêbajarbûna bajêr de xwe nîşan dide. Tevî hewldanên maskekirinê hemûyan jî krîza avabûnê ya sîstemê, mirov dikare di van sê diyardeyan de bi awayekî tazî û eşkere bibîne.

**e-** Fîlozof Nietzsche, yek ji wan kêm kesan e ku li maneya zirara modernîteya kapîtalîst li ser mirovatî û hawîrdora wî hûrûkûr serwext bûye. Ew hewl dide mirovê li bêjinga modernîteyê xistî bi metaforên mîna civak û ferdê xesandî, pîrekkirî, dekadan û guvaştî binirxîne. Weke metafor, weke fikreke nêzî rastiyê pê re me. Serê hespekî himbêz dike û li ser digirî, bi vê mîna ku dixwaze bibêje zilma herî mezin a modernîteyê li ser heywanan pêk tê. Daristanan mîna penahekê, weke mekanekî parastina jiyanê dibîne. Timûtim diçe serdana mekanên bi vî rengî. Têgîna 'jor-mirov' (Ubermensch) şaş hatiye nirxandin. Di tevahiya şaristaniyan de tîpên kole yên hatine çêkirin weke piçûkketina mirov dibîne ku bi vê nêzîkatiyê gelekî li pêşiya K. Marks e, nêzîkatiyeke mirovane ye. Bi awayekî gelekî rast destnîşan kiriye ku bi karkertiyê pesin nayê dayîn û karker hebûneke welê nîne li ser polîtîka bêne avakirin. Dîrok vê fikrê piştrast dike. Insên 'jor-mirov' weke pêşxebereke faşîzmê bibîne, propagandayeke gelekî erzan e. Berevajî mirov 'jor-mirov'ê Nietzsch weke têgîneke li dijî her cure koletî, hilweşîna hawîrdorê û bêşexsiyetkirinê şîrove bike, rastir e.

Bûyerên rojane, têkiliyên di navbera krîza global, asta fînansê, bêkarî û bi rêbazên ferazî sîstemên şelandinê yên herî mezin ên dîrokê de (talana di salê de 600 trîlyon dolar) derxistiye holê. Modernîteya navend Ewrûpa bi awayekî herî mezin global dibe, di nava heman xelekê de haya xwe ji krîza avabûnê heye û pê dizane bi vî awayî dewam nake. Ji lewra jî civînên bilind li pey hev pêk tînin. Pirr baş derketiye holê NY, IMF, Bankeya Cîhanê, NATO, YE û kopyayên wan, têra sîstemê nakin ji bo karibe ji krîzê derkeve. Bankeyên navendî, dewletên 7'an, 8'an û 20'an paketekê li pey ya din eşkere dikin, bîlanço, bêkarî, hejmarên deyndariyê, ketina kapasîteya

hilberînê, pirsgirêkên qût û zad bi awayekî ciddî dikevin rojevê û hwd. gelek nîşane têkiliya krîzê bi yekdestdariya ekonomîk re ya li ser qada civakî serdest e, nîşan didin.

Mînakên Afganistan-Pakistan, Îran-Iraq, Îsraîl-Filistîn nîşan didin ku dewleta netewe ne bi tenê ji aliyê Rojhilata Navîn ve, di çarçoveya global de çaresernekirina xwe, bi bandora xwe ya li ser krîz û rewşên kaotîk, hilweşînên rê li ber wan vedike, xwîna dirjîne û rondikên çavan ên dide barandin, derdixe holê. Dewletên netewe ji bo civakên mirovî ne bi tenê amûrên rêveberiyê yên zaliman in, piştrast dikin ku çavkaniyên çaresernekirinê ne. Dewleta netewe ya çanda herêmê ya ji komikan pêkhatî parçe dike, di tevahiya dîrokê de felaketa herî mezin a bi serê herêmê de hatiye, sembolîze dike.

Maneya kapîtalîzm û îndustriyalîzmê ji bo Ewrûpayê bi xwe jî lêdana naqos û defa hewarê ye û bi tenê bi reforman dikare dewam bike. Ev kapîtalîzm û îndustriyalîzm wê bivênevê pirsgirêkên dîrokî yên di civaka Rojhilata Navîn de, ber bi şer û pevçûnên sînornenas ve bibe. Di civaka Rojhilata Navîn de kûrkirina kapîtalîzm û îndustriyalîzmê tê maneya, li dijî civakê bi xwe û hawîrdora wê zêdekirina şer. Bi kîjan kirasî were pêşkêşkirin bila bê pêşkêşkirin, rewşa berçav a rojane ya modernîteyê weke amûrekî şer ê stratejîk timî bi şêweyê sêlingên distanê, vî hukmî piştrast dike.

Hegemonya îdeolojîk, oryantalîzm rastiyan belovajî dikin. Dused salên dawî yên Rojhilata Navîn ji aliyê modernîteya Rojava ve bi fetihkirinê derbas bûye. Dewletokên netewe, pîşesaziyên montaj û sextekariyên mîna ekonomiya gelemperiyê, nikarin rastiya bingehîn veşêrin. Tiştên bi serê Saddam Husên ê kêliyekê wêrîbû ji fermana fethê derkeve hatin, mirov bi tenê dikare bi rewşa Qralê Franseyê Louisê 16. bide berhev. Çawa ku piştî serê Qralê Franseyê hat jêkirin Ewrûpa ket nava agir, darvekirina qralê dewleta netewe Saddam jî wê bihata wê maneyê ku rastiya şerê germ ê jixwe li Rojhilata Navîn hîç kêm nedibû, zêdetir gurr bibûya, li herêmê belav bibûya, dewamî bûya û jixwe wisa jî bû.

Wexta em paradîgmaya oryantalîst parçe bikin, em ê bibînin ku bi hilweşîna sîstema Sowyetê dawiya 'şerê sar' ji bo Rojhilata Navîn wê bibe qevaztina qonaxa jortir a şerê germ. Şerê Kendavê di sala 1991'ê de piştî bi dawîbûna şerê sar bi salekê qewimî û ev jî vê fikrê piştrast dike. Em wexta ji aliyê 'dema dirêj' ve binêrin, ji bo Rojhilata Navîn ev şerê modernîteyê ji serê salên 1800'î bi kêliya Napolyon gav avêt Misrê dest pê dike; afirandina dewletokên netewe, pêkanîna acenteyên kapîtalîst û di serî de petrol bi talana çavkaniyên jeoekonomîk ji aliyê îndustriyalîzmê ve derketiye asta herî jor û bilind. Bi xetên stûr vegotina modernîteyê, ev e. Ji vir û pêve, detay in, çîrokên kurt in ku di heman xelekê de pirr difitilin.

Ji bo herêmê, ez ji bikaranîna têgînên krîz û kaosê direvim, ez hewl didim kêm bi kar bînim. Ji ber ku ya diqewime eger şerê germ be, wê wextê mirov wê daxe krîz û kaosê, dibe ku bixapîne. Bêguman şerên roja me ya îro ne dişibin şêweyê şerên serdema destpêkê û navîn, ne jî şerên modernîteyê heta bi herdu şerên dinyayê dane kirin. Nexasim bi Şerê Cîhanê Yê Yekemîn û Duyemîn re şer bûn girseyî. Piştî Şerê Cîhanê Yê Duyemîn jî bûn civakî. Modernîteyê di meşa xwe ya cinawirî ya sêlingên distanê de şerên diqewimîn weke şerên hundir û derve ji hev cihêkirin û destnîşan kir ku dema şeran a li derveyî civakê bi dawî bûye û serwextbûna wê ya li dema nû dihat wê maneyê ku şerên li derve û hundir di nava civakê de bi hev re wê bêne meşandin û ev pêdivî li gorî cewherê wê yê nû bû. Bi giştî rastiya şer a li tevahiya civaka Rojhilata Navîn diqewime, bi taybetî jî rastiya şerên bi tevahiya rewşa xwe ya derketine holê, şerên Filistîn-Îsraîlê, Afganistan-Pakistanê û Îran-Iraqê di vê çarçoveyê de bê analîzkirin, gelekî girîng e. Bûyer û pêvajoyên bîra mirov hemûyan nikare rake, bi analîzên di vê çarçoveyê de bêne kirin, wê baştir bêne fêhmkirin.

Bi hegemonya DYE-YE'yê şerên nû yên li Rojhilata Navîn têne meşandin, dikarin çawa bi encam bibin? Gelo wê zêdetir bibin û belav bibin? Dibe ku hêzên hegemon herêmê biterikînin? Eger biterikînin an jî neterikînin divê mirov li benda çi be? Eşkere ye ku mirov nikare bersivên zelal û vebirrî bide van pirsên bingehîn. Lê diyar e ku em ji sedî sed bi

qonaxeke dîrokî ya cuda re rûbirû ne. Min di parêznameya xwe de heta bi vê qonaxê der barê xwezaya civakî, şaristanî, modernîte û Rojhilata Navîn a jê re jeoçand tê gotin, pêşnûmeyeke analîzê pêşkêş kir. Ez ê di beşa piştî vê ya parêznameya xwe de ji bo derketina ji nava şer û krîzê li ser modela çareseriya muhtemel bifikirim, biponijim.

## C- LI ROJHILATA NAVÎN ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

Ji bo civakekê felaketa herî mezin ew e ku hêza wê nemîne der barê xwe de bifikire û çalakiyan bike. Hêzên hiyerarşî û şaristaniyê yên bi vê yekê ji mêj ve zanîbûn, berê pêşî girîngî bi serdestiya zêhnî dan ku mirov dikare ji vê re hegemonya îdeolojîk jî bibêje. Di meşandin û dewamkirina hegemonyayê de şîddet bi tena serê xwe nikare bi roleke mayînde rabe. Eger armanca şîddetê ji civakê bi destxistina berjewendiyekê be, ji bo vê hewcedarî bi berhemê zêde heye. Eger civak neyên îqnakirin û razîkirin, divê mirov nepê ku ji bo demeke dirêj werin xebitandin û berhemê zêde biafirînin. Hegemonya îdeolojîk vê îqnayê bi cih tîne û derî li civakê vedike ji bo karibe xwe bigihîne danehev û komkirinên wê. Hegemonya îdeolojîk ji hegemonya şîddetê gelekî zêdetir derî vedike ji bo desteserkirina danehevên civakê.

Oryantalîzm, hegemonya îdeolojîk a modernîteya Ewrûpayê ji bo Rojhilat û Rojhilata Navîn pêşde biriye, bi awayekî zanistî îfade dike. Weke hegemonyayeke fikrê ya gelekî bi bandor, fonksiyona xwe dewam dike. Globalbûna modernîteyê bi globalbûna îdeolojîk re di zikhev de ye. Belkî jî hegemonya îdeolojîk hê li pêştir e. Bi qasî fetihkirina zêhnan, fetheke bi tesîr nîne. Dema min ev rêz dinivîsandin jî min timî ji xwe pirsî, gelo ez çiqasî ji oryantalîzmê bihurîme. Ez baş dizanim ku bi vê zêhniyetê fikirkirina min wê min ji xeleka fasit a koletiyê rizgar neke, berevajî wê bi awayekî min biêşîne û min di heman xelekê de bigerîne. Îslamîstên antî-modernîst ên ji rêûresmê ji sedsala 19. ve bi israr tînin ziman ku şêwazekî

fikrê yê Îslamê heye û li dijî Xerbê serbixwe difikirin. Îslamîstî vegotinek e ku para pê xapandinê zêde ye. Antî-modernîstiya wê ji sedî sed bi tezên oryantalîst dimeşe. Ji Birayên Misilman heta bi El-Qaîdeyê, hêzên Îslamî yên qaşo xwe antî-modernîst dihesibînin hemû bi vî rengî ne. Anarşîst jî di navê de ekolên li pey çepgiriya tûj, tevî îdeayên xwe yên dijber hemûyan, bi giştî bêyî fikra modernîst, der barê Rojhilata Navîn de jî bêyî oryantalîzmê nikarin bifikirin. Sosyalîzma Pêkhatî herî zêde modernîzm bû. Modernîzma Çînê, serketina oryantalîzmê ye. Rewş ji bo rêûresma Hindistanê jî cuda nîne.

Antî-oryantalîst bûn, min hem eleqedar dike û hem jî bala min dikişîne. Ez vê yekê di van rêzan de diceribînim. Azadiya fikrê bi serê xwe antî-oryantalîzmê îfade nake. Ewçend hêsan nîne ku mirov ji oryantalîzmê bibihure. Eger mirov vegotina modernîteya kapîtalîst a li ser sêlingan red bike, belkî bibe antî-oryantalîstî. Lê bi serê xwe ev nayê wê maneyê ku mirov ji modernîzm û oryantalîzmê dibihure. Ji vê jî girîngtir ew e, li şûna ya tê redkirin wê çi bê danîn. Îslamiyet an jî çi rêûresmek dibe bila bibe dikare modernîteyê red bike. Lê dema dor tê wan ji bo bibin alternatîf, dibînin ku ji teslîmbûnê bêtir ti çareya wan nîne. Teslîmiyeta eşkere yan jî sergirtî li gorî berjewendiyên xwe dizanin û bi vî awayî dibin peyrewên modernîteyê. Sosyalîzma pêkhatî, bihêlin ji modernîteyê bihurîbe, bi temamî li ser sê lingan gelekî hewcedarî modernîteyê bûbû û pêve hatibû girêdan, ji lewra jî hilweşiya. Li şûna kapîtalîzma taybet, bicihanîna kapîtalîzma dewletê redkirin nîne. Bi qasî ku mînaka Çînê vî hukmî bi awayekî bi tesîr piştrast dike, kêm mînak hene. Li Rojhilata Navîn çi Marksîzm û çi jî dînperestiyê ji ber ku nikarîbûn ji oryantalîzmê bibihurin, nikarîbûn sîstemeke mayînde pêşde bibin, bihêlin jê bihurînê, oryantalîzm zêde bi cih anîn.

Erê, bihêlin jê bihurînê, xwe nêzî analîzkirina hegemonya fikra modernîst û oryantalîst nekirin. A. Gramsci xwe li ceribandina analîzkirinê rakişandiye, lê ji ceribandinê wêdetir neçûye. Tevî ku di nava ekola fikrê ya anarşîstan de rexneyên wêrek hatine kirin jî ew jî di warê afirandina alternatîf de ji sosyalîstên reel zêde cuda nînin. Herçiqasî di teoriyê de jê

bihurîbin jî di nava avahiya wê de jiyan ji bo wan zêde nebûye pirsgirêkeke ciddî. Li Rojhilata Navîn herî zêde rewşenbîrên Îranê bi fikra modernîst re mijûlbûne, lê ji avakirina Şîa'yeke modernîst wêdetir neçûne. Bi tevahî Îslamîstên din dewamî dubare kirine ku vegotinên modernîteyê hemû berê ji aliyê Îslamê ve hatine gotin. Bi tevahî tevgerên desthilatdarî û ekolên îdeolojîk ên bi israr îdîa dikin ku antî-emperyalîst, antî-kapîtalîst in, ya herî zêde têde bi serdikevin ew e, ji lîberalîzm, kapîtalîzma taybet derbasî payeya demokrasiya sosyal, sosyalîzma reel û rizgariya neteweyî dibin an jî ji guhertina mezhebê wêdetir ti maneyê îfade nakin.

Ekola modernîst û oryantalîst ji yeqînan wêdetir, gelekî bi bandor e. Rexneyeke bi tenê di asta çandî de nayê wê maneyê ji van ekolan mirov dibihure. Eger mirov yekê ji hêzên hegemonîk ên sîstemê têk bibe, heta şoreşeke antî-kapîtalîst bike, nayê wê maneyê ku rexneya wê hatiye kirin û alternatîfa wê hatiye dîtin. Şoreşa Cotmehê antî-kapîtalîst bû, lê antî-modernîst nebû. Berevajî, dewletdariya netewe û îndustriyalîzma moderniteyê herî zêde bi cih anî û bi vî awayî di globalbûna wê de alîkariyeke mezin kir. Şoreşa Çînê di vê mijarê de tîpîktir e: Jê we ye ku dema şêweyên moderniteyê yên sedsala 19. pêk bîne, şoreşê jî dewam dike. Şoreşa Franseyê jî bi heman rengî di van mijaran de xapiyaye û bandorên vê yekê heta roja me ya îro dewam dikin.

Wexta ku em hegemonya îdeolojîk a modernîst û oryantalîst rexne bikin, şert e ku em parametreyên hîmî bikin bingeh. Em dema sêlingên moderniteyê weke parametreyên hîmî qebûl bikin, wê girîngiya mijarê bêtir were fêhmkirin. Ji bo hevgirtîbûnê, divê mirov bi girîngî diyar bike ku mirov dikare rexneya herî radîkal li ser van hîman bike û alternatîfan jî bi tenê li ser van hîman biafirîne. Rexne bi xwe divê yekparebûn û demên avabûnê weke bingeh li ber çavan bigire. Bi tenê rexnekirina pêvajoyên siyasî, rola kesayetan û bûyerên dema kin ji bo serwextbûna li heqîqetê têrê nakin. Eger li vir yekparebûn bi têgîna demê re di bingehê rexneyê de neyê danîn, encamên derkevin holê wê parçeparçebûyî, bêdem ango wê bêmane bin, nikaribin heqîqetê îfade bikin, ji lewra encam wê şaşî û qusûrên mezin di nava xwe de bihewîne. Em çi rexne dikin bila em bikin,

divê em yekparebûn û demîbûna wan di rexneyên xwe de ji sedî sed rast destnîşan bikin. Wexta mijara me modernîte be, ya ku divê em esas bigirin ew e ku herî kêm li ser hîmê sêlingan yekparebûnekê pêk tîne û weke dem, demeke pêncsed salan dirêj, ya avabûnê û sîstematîk dihewîne. Di serî de Marksîst, şaşiya dijberên sîstemê ya herî bingehîn ew e, sîstemeke demdirêj û li ser sêlingan di nava demên kin de, heta carnan demê jî piştguh dikin, bi tenê yek aliyî, weke mînak bi tenê aliyê kapîtalîzmê, rexne dikin. Herçî analîzên di vê parêznameyê de bi awayekî seresere hatine kirin jî nîşan didin ku divê ji bo kapîtalîzm bê fêhmkirin ji sedî sed têkiliya wê bi sîstema şaristaniya navendî, bi dema dirêj a trenda mezinbûna wê û bi du aliyên din ên bingehîn dewleta netewe û diyardeya îndustriyalîzmê re were rexnekirin.

Rojhilata Navîn, heta şaristaniya Çîn û Emerîkayê li ber çavan neyên girtin, kapîtalîzma di sedsala 16. de derket holê wê neyê fêhmkirin. Potansiyela hundir a Ewrûpayê ji sedî sed têra pêkhatina kapîtalîzmê nedikir. Bi heman awayî dewleta netewe neyê avakirin, damezrandina sîstemê jî mumkîn nabe. Ti sîstema mêtinkariyê bê desthilatdarî û bê dewlet nabe. Ne bi tenê desthilatdarî û dewlet, desthilatdariya herî zêde û dewleta netewe ya dewletê pêk neyên, ji bo kapîtalîzmê danahev û komkirina sermaye û karê pêk nayê. Ji bo serketina hegemonîk a sîstemê herweha divê şoreşa îndustriyê bike bin yekdestdariya xwe û weke îndustriyalîzm bi îdeolojîkkirinê (milletperestî) di zikhev de dewam bike, bi rê ve bibe. Eşkere ye ku ev diyarde di nava xwe de bi yekparebûneke şidiyayî û di çarçoveya dema dirêj de modernîteyê serwer dikin. Em wexta li tevahiya ekolên xwe rexneker dihesibînin dinêrin, em dibînin modernîteyê di nava dema dirêj û yekparebûnê de nabînin, bi pirranî haya wan ji têgîna demê çênabe, belawela bi meselê dadikevin, bi giranî li ser çend xisletan (mînak ked, heqdest, kar, sermaye, dewlet, mêtingerî, emperyalîzm, kesayet, bûyer) radiwestin û bi vî awayî hewl didin encamê bigirin. Wexta ku rêbaz ev be, ya derkeve holê jî wê mîna pênasekirina fîlê bi mûyê wê be.

Nexasim sosyalîzma pêkhatî ya em di navê de gihiştin, bi tenê lingê modernîteyê kapîtalîzm xist ber rexneyê, dema ev kir jî têgîna demê şaş bi kar anî û hewl da şoreşgeriyê bike û vê hewldanê rê li ber şikestina qudûmê wê vekiriye. Bêguman bingehekî civakî yê vê nêzîkbûnê heye. Divê mirov baş zanibe ku mirov lingên modernîteyê dewleta netewe û îndustriyalîzmê ji lîberalîzmê jî wêdetir bi kar bîne, ne şoreşgeriyê, wê dîktatorî û heta faşîzmê zêde bike. Mirov ji vî alî ve dikare têra xwe ji ceribandinên welatên sosyalîzma pêkhatî (zêdetir jî dewletên rizgariya neteweyî meşandin) hîn bibe. Niyeta baş, weke Lenîn jî gotî pêşî li çûna cehennemê nagire, berevajî, carnan hêsan dike. Şoreşa Cotmehê ji ber ku di hewldana xwe ya antî-kapîtalîzmê de kêm bû têkneçû; berevajî, di antî-kapîtalîzmê de serketî bû. Lê antî-modernîst, ango antî-dewleta netewe û antî-îndustriyalîzm nebû, bi antî-kapîtalîstiya xwe ji ber ku nikarîbû ji herdu lingên modenîteyê bibihure, dema avabûnê da aliyekî û bi tenê bi demên kin tevgeriya, têkçû. Pratîkên pêkhatî, vê rexneyê piştrast dikin.

Di pêncsed salên dawî de tevger û ekolên îdeolojîk û şorêşên bi armancên demokrasîxwazî û wekhevîxwaziyê rabûne, negihiştibin serketineke sîstematîk, sîstemeke din a dinyayê ya em dikarin weke şaristaniya demokratîk jî şîrove bikin, sedema vê yekê ango kêmasiya wan a bingehîn ew e ku ji pratîkên rexneker ên hevgirtî, yekpare û têgîna demê dihewînin, mehrûm bûn. Ango fîl timî bi aliyekî wî pênase kirine û di pozîsyona danasînê de mane. Di rewşeke bi vî rengî de ne dikarin ji fîl sûdê wergirin, ne jî dikarin jê xelas bibin. Marksîstan wexta kapîtalîzm rexne kir û xwestin jê bibihurin, haya wan ji wan tinebû ku dewleta netewe ya navendî û îndustriyalîzm gihandine faşîzmê û hilweşandina hawîrdorê. Tevger û ekolên rizgarîxwaz ên neteweyî helwesta wan li dijî modernîteyê hê bêtir şîlo ye. Piştî ku dibin dewleta netewe û kengî di hin şaxên pîşesaziyê de pêşde diçin, antî-emperyalîstî û antî-kapîtalîstiya wan şûna xwe ji alîgiriyeke fanatîk a modernîzmê re dihêle. Heta îdeolojiyên modernîst (lîberalîzm, milletperestî, sosyalîzma reel) dikin mîna dîn û di vê de sînor nas nakin. Dewletdariya netewe û îndustriyalîzm weke dînê sekuler bi mane, bi sazî û avahî bûne.

Anarşîstan di çarçoveya sêlingên modernîteyê de rexne pêşde birine, lê weke alternatîf nexwestine sîstematîkeke demokratîk jî bifikirin, ferdê anarşîst tercîhî civaka demokratîk kirine. Di bingehê serneketina wan de ev rastî heye û ji ber statuya wan a çînî, nikarin vê bibînin. Aliyê antî-civakparêziyê yê bûrjûwaziya piçûk, wekî din mirov nikare rave bike. Demokratên sosyal ji ber ku bawer dikin wê modernîteyê bi reforman sererast bikin, gaveke bi tenê jî ji wê wêdetir navêjin. Ekolojîstan bi tevahî argumanên xwe ji modernîteyê girtine û bi qasî ku vê nebînin seresere li mijaran dinêrin. Kengî bi ser îndustriyalîzmê de diçin, kapîtalîzm û dewleta netewe ji bîr dikin. Femînîst sîstema bavikî dibînin, lê zirara modernîteyê daye jinê bi heman tundî û tûjiyê rexne nakin. Wexta rexne dikin jî weke ekol, tevger û sîstem di afirandina civak û jina alternatîf de bi rola neçar û bêzaran radibin. Dijbertiya modernîteyê ya dîndarên radîkal û tevgerên kulturalîst weke ekol û tevger hê lawaztir e. Ya li pey diçin û dixwazin, herî zêde lihevkirin e.

Ez dixwazim vê bêjim: Kapîtalîzma roja me ya îro di krîza fînansa global de bi buhaya 600 trîlyon dolarî di cîhana ferazî de dişêlîne, herhal ev yek ji ber ku avabûn û yekparebûna modernîteya kapîtalîst nehatiye rexnekirin û tevî vê yekê sîstemeke alternatîf nehatiye çêkirin, pêk tê. Bi tevahî şoreş, tevger û ekolên nikaribin tayê kapîtalîzmê bi modernîteyê re deynin, wê di nava modernîteyê de bihelin û wê nikaribin xwe ji vê rizgar bikin. Bi tevahî şoreşên ji her rengî, tevgerên polîtîk û ekolên îdeolojîk ên nikarîbûn antî-kapîtalîzmê bigihînin antî-modernîzmê, wê ji aliyê modernîzmê ve bêne fetihkirin û nikarin xwe ji vê xelas bikin.

Çawa ku antî-kapîtalîzm antî-modernîzm nîne, mirov heta nebe antî-modernîst nikare bibe antî-kapîtalîstekî ku gotin û pratîka wî hevdu digire. Tevger û ekolên radîkal dîndar, kulturalîst, femînîst û ekolojîst nuqteya bingehîn a têde dixapin ew e, yeqîn dikin ku avahiya yekpare ya modernîteyê nekin hedef, wê karibin bi ser kevin.

Ez bi tevahî înkarwarî nêzîk nabim. Parçeparçebûyî û bêsîstem be jî rexnekirina pêncsed salên modernîteyê di nava nîv sedsala dawî de lawaz be jî fikra postmodernîst derxistiye holê. Postmodernîzm, tevî ku nikare

bersivê bide rexneya modernîteya hewl didim analîz bikim jî ji ber ku rewşa kaotîk û krîza sîstem ketiyê nîşan dide, pêşketineke girîng e.

Di dema postmodern de modernîte û faşîzm, qirkirin, totalîtarîzm, otorîtarîzm, cinsperestiya civakî, milletperestî, îndustriyalîzm, guherîna rewşa avhewayê û her cure hilweşîna hawîrdorê, gelekî zêdebûna desthilatdariyê, pîrekkirina civakê û metakirina wê, analîtîkbûna mejî, pûçbûna ruh, gincirbûna ferdan, şerkirina her kesî bi her kesî re, belavkirina civakê, têkbirina cotkariyê, li şûna qral-xwedayên bi maske xweda-ferdên bê maske û tazî bi cih bûn, tahmsarkbûna jiyanê û nemana balkêşiya wê, jidestçûna esilzadetî û bedewiya jinê û pirr zêde fahîşekirina wê, li şûna exlaq serwerbûna destavêtinê, li şûna cihêrengiyên têne maneya jiyanê cihgirtina mirina bi navê homojeniyê, xelasbûna polîtîkayê û li şûna wê bicihkirina desthilatdariyê, êdî derfet û îmkan heye û bêtir hêsan e mirov di navbera bi hezaran neyêniyên bi vî rengî de têkiliyê deyne û analîz bike. Postmodernîte bi serê xwe şoreş nîne. Lê qalibên dînî yên hişk ên modernîteyê tîne rewşekê ku karibin bişkên û atmosferê nerm dike. Şoreşa antî-modernîteyê, eşkere ye ku wê di nava yekparebûnê de parçetî, di nava gerdûnîtiyê de xwecihî, di çarçoveya dema dirêj de nêzîkatiyên kêliyê, li ser bingehê antî-kapîtalîzm, antî-dewletdariya netewe û antî-îndustriyalîzmê li dora avahiyên cuda bi armancên sosyalîst, demokratîk û ekolojîst wê xweparastin, xwebimanekirin û heqîqetkirin be.

Divê mirov oryantalîzmê di çarçoveya maneyeke teng de weke fikrên fikirdarên Ewrûpî yên der barê civak û şaristaniya Rojhilata Navîn de nebîne. Li şûna ku der barê xwezaya civakî de fikrên zanistî pêşde bibe, û bike ku bêne rohnîkirin, zêdetir bi hegemonya îdeolojîk a modernîteyê ve girêdan û avahiya wê ya zanistî weke bingeh dîtin, di çarçoveya maneyeke fireh de oryantalîzm e. Fetha dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst bi tenê di qada çanda maddî de pêk nehatiye, di qada çanda manewî de hê zêdetir e. Şoreş, tevgerên polîtîk û ekolên îdeolojîk ên derketine holê her yek ji wan kopiyekî mirarokî yê pêkhatinên li Ewrûpayê ye. Ji lewra bandora wan a li ser civakê zêde nebûye. Civaka di navbera rêûresm û

moderníteyê de tengavbûyî, ji ber ku timî tengezar e, û nikare xwe nû bike, misêwa di nava krîzê de ye.

Antî-oryantalîstî bi antî-modernîstiyê dibe. Mirov dikare Îslamperestiya siyasî ya radîkal di çarçoveya oryantalîzmê û şêweyê modernîzmê yê oryantal de binirxîne. Ji sedî sed di wê buhayê de nîne ku alternatîfê pêk bîne. Weke nerazîbûna ji milletperestiya laîk, ji bikaranîna argumana milletperestiya dînperestiyê wêdetir naçe. Şoreşên Ereb, Tirk û Fars şoreşên tîpîk ên oryantalîst in. Van şoreşan milletperestiya dînî û nijadî cihê yan jî di nava hev de bi kar anîne û bi vî awayî avakirina dewletên netewe yên modern weke hedefa xwe ya pêşî diyar kirine. Yeqîn kirine ku wexta vê bi kapîtalîzma dewletê û îndustiriya wê re bikin yek, wê mîsyona xwe temam bikin. Li eniya wan nivîsandiye çend sed salan lipaşmayî Ewrûpayê bişopînin. Ji her alî ve xwegihandina wan a nirxên Ewrûpayî di wan de bûye fikreke sabit a mîna nexweşiyekê.

Rastxwendina têkiliyên moderníteya kapîtalîst bi civaka Rojhilata Navîn re ji bo gavavêtineke alternatîf, girîng e. Berê pêşî divê mirov fêhm bike ku moderníteya kapîtalîst êdî bûye diyardeyeke xwecihî. Diyardeyeke derve nîne ya hundir e. Lê ji ya Ewrûpayê cuda ye. Xeleka herî lawaz a kapîtalîzma global e. Di vê rewşê de divê mirov nekeve du şaşiyên bingehîn. Ji van a yekemîn, mîna ku dinyayeke din, şaristaniyeke din mumkîn nîne, moderníteya kapîtalîst weke dînê sekuler qebûlkirin û perestina moderníteyê ye; duyemîn jî bi awayekî topyekûn wê bigire hemberî xwe û mîna selefên sexte yên Îslamî, redkirina wê ye. Di encamê de herdu helwest jî ji bo moderníteya kapîtalîst zêdetir xwecihî bibe, wê xizmeta wê bikin.

Min di cilda parêznameya xwe ya bi navê **Sosyolojiya Azadiyê** de hewl dabû weke alternatîfa antî-modernîzmê, modernîzma demokratîk pêşkêş bikim. Li şûna ku ez wan tezên di wir de weke heyî bigirim vê derê, ez ê hewl bidim wan li gorî herêmê bihûnim û li hev bînim. Armanca rexneyên li sîstemê ew e ku ya divê mirov jê bibihure û ya divê ji nû ve were avakirin, manedar bike. Ji bo modernîzma demokratîk a alternatîf e, hê

baştir bê fêhmkirin, ez yeqîn dikim ku weke rêbazeke rast, divê careke din ez modernîteyê bidim naskirin û li ser sêlingan wê binirxînim.

Mirov careke din dikare modernîteyê weke serdema têde dijî bi nav bike. Her şaristaniya avabûyî heta jê bê bihurîn, modernîteya dema xwe ye. Mînak, avabûnên Sumerîk ên ji du hezar salan zêdetir dewamkirine, modernîteya Sumer e, ango serdema wê ye (4000-2000 B.Z.). Modernîteya Greko-Romen texmînî dema 500'î B.Z.-500'î P.Z. digire. Modernîteya Osmanî-Îslam di dema 1300-1918'an de li ser cografya xwe bi bandor bûye. Eger dema wan li dawiyê mabe û jê hatibe bihurîn, ya rast ew e, mirov ji wan re şaristanî bibêje. Şaristanî modernîteyên berê pêkhatine, pênase dike. Me şaristanî weke sîstema yekdestdar zordar a berhemê zêde desteser dike û li ser dewlet-çîn-bajar di zikhev de mezin û bilind dibe, pênase kiribû. Ez yeqîn dikim ku ev pênase bes e. Cihêwaziyên çandî yên maddî û manewî, rengê şaristaniyan destnîşan dikin, lê wan pênase nakin. Mirov dikare şaristaniyan weke avahî û çandên yekpare û demdirêj jî bi wesif bike. Di çarçoveya maneyeke fireh de mirov ji hemûyan re pênase bibêje, zêde şaş nîne.

Cihêkirina şaristaniyê weke navendî û nenavendî jî mirov hîn dike. Têgîna şaristaniya navendî şaristaniya çemê sereke, bi tevahî avahiyên timî di navendê de, pênase dike. Mirov dikare wê weke sîstema dinyayê jî bi nav bike. Li derveyî navendê jî gelek şaristanî dikarin hebin. Çîn, Hind û Emerîka bûne şaristanî, lê nikarîne bibin navendî. Şaristaniyên Rojhilata Navîn navendbûneke zincîrwarî pêk tînin. Ji 3500'î B.Z. heta bi 1500'î P.Z. li derdora pênc hezar salan şaristaniyeke navendî ya zincîrwarî pêk hatiye. Navên cuda li van şaristaniyan hatine kirin. Navên xanedan û dîn pirranî ne. Navên yekser têne hişê mirov Sumer, Misr, Rom, Bîzans-Xirîstiyan, Ereb-Îslam, Tirk-Îslam. Herçiqas nav û naverokên wan cihê bin jî li gorî pênaseya xwe yekparebûneke hundir û avabûneke xwe hene. Hegemonîk in. Qadên wan ên navend û hawîrdorê hene. Buhran û rewşên koatîk ên demî dibînin. Lê weke avahiyên desthilatdariyê yên zincîrwarî, valatiyê qebûl nakin û domdar in.

Modernîteya kapîtalîst sîstemeke dinyayê ye, em hê jî di navê de ne. Weke şaristaniyeke navendî ya hegemonîk a ji Rojhilata Navîn kişiyaye Ewrûpayê, li derdora pêncsed salan e (ji sedsala 16. ve), hebûna xwe dewam dike.

Ji bo pênasekirina dinyaya ku hêzên kedkar û azadîxwaz ên nava bajêr û hêzên komin ên gundan wê pêk tînin, me têgîna şaristaniya demokratîk bijart. Li dijî şaristaniya ku weke sîstema bajar-çîn-dewletê, di hundir de li dijî çînîbûna koleker, ji der ve li dijî kolekirin, talan û zordestiya li ser qebîle û nasnameya qewman, ev dinya misêwa li ber xwe dide. Tevahiya dîroka şaristaniyê di çarçoveya vê pênaseyê de gelek avahî û pêkhatinên demokratîxwaz, azadîxwaz û wekhevîtîxwaz ên ji hev re timî mîrasê dihêlin û yekparebûneke wan a diyar heye, me weke wezîfe û heqekî dîrokî yê dest jê nabe bi şaristaniya demokratîk bi nav kir.

Wexta em têgîna şaristaniya demokratîk li rewşa berçav a rojane bînin, bi rengê ku dijbertiya modernîteya kapîtalîst jî bigire nav xwe, em vê dikarin weke modernîteya demokratîk diyar bikin. Divê mirov ji nav wêdetir naveroka têgînê li ber çav bigire. Nav were guhertin jî naverok wê mayîndebûna xwe biparêze. Tevahiya parêznameyê min bêtir behsa şaristaniyan kir ku bi vegotinên klasîk têne ziman. Me kêm cih da fenomenên şaristaniya demokratîk. Sedema vê yekê jî ew e, zaviya me ya em pê li dîrokê dinêrin nû ye, û malzemeyên di destê me de têra xwe nehatine bi kar anîn. Ez ê di vî beşî de hewl bidim nirxandina rojane ya civaka Rojhilata Navîn û nêzîkatiya çareseriyê ji pirsgirêkên wê re zelal bikim. Modernîteya demokratîk, li ser hîmê destpêk, pêşketin, krîza avabûnê û bihurîna ji modernîteya kapîtalîst, wê weke alternatîf ANTÎTEZA WÊ YA DIYALEKTÎK mijara analîzê be. Em ê şaşiyên Marksîzmê kirî, nekin. Nexasim jî, em ê nekevin xefika girêdana nakokiya bingehîn bi diyardeyeke mîna bûrjûwa-çîna karker ve ya timî diguhere. Mentiqê diyalektîkê ji Hegel ve cara pêşî wê bi awayekî serketî li ser xwezaya civakî ya Rojhilata Navîn were pêkanîn û wê bê dîtin ku ev ceribandin ê encamên serketî bi xwe re bîne. Gotina K. Marks gotî û bi ser nexistî ya weke 'li ser piyan danîna diyalektîkê' em ê bi awayekî manedartir nêzîkî wê bibin.

## a- Li Dijî Kapîtalîzmê Civaka Ekonomîk

Ji bo yekîtî û dewleta netewe ya Elmanyayê guftûgoyên zêde û ekolên îdeolojîk-polîtîk bandoreke diyarker li mekan û dema K. Marks dikin. Zêdetir di çarçoveya huqûqî, polîtîk û îdeolojîk de dixwazin diyardeyan pênase bikin. K. Marks bi pêşengtiyeke ekonomîk dixwaze bandorê li vê atmosferê bike. Di vegotinên xwe de hewl dide ekonomiyê weke kategoriyeke diyarker bi bingeh bike. Berpirsê sereke ye ku kapîtalîzm kiriye mîna zanistê. Bi vê ve girêdayî xwediyên kapîtalê weke bûrjûwa, kedkarên bi heqdestê dixebitin, weke proleterya, civakê jî weke bi kategoriya civaka kapîtalîst a metabûna kapîtalîst li ser serwer e, mîna stûnên navmalê dihesibîne. Bi vî awayî yeqîn dike ku bi kevirekî sê nîşanan hiltîne. Ji polîtîka ekonomiya Ingilîz ekonomî, ji zanista civakî ya Fransî pozîtîvîzm, ji felsefeya Elman têgîna diyalektîkê digire, bi hev ve dike û bi vî awayî gelekî jixwe piştrast e ku senteza 'sosyalîzma zanistî' pêk tîne. Wê demê di her zanistê de şoreş hatine kirin. Bawer dike ku şoreşa zanistî ya civakî jî wî û Engels kiriye. Herdu jî Darwînê zanista civakî têne hesibandin.

Fikra Marksîst weke bazkê herî girîng ê zanista civakî ya Ewrûpayê derdikeve holê. Wexta ku mirov ji aliyê sîstema hegemonîk ve binêre, zehmet nîne ku mirov fêhm bike, ev zanist ji ber hewcedariya yekdestdariya sermayeyê ya nû mezin dibe û mohra xwe li sîstemê dixe, derdikeve holê, sermayeyê zanistî dike û bi vî awayî rewa dike, ji lewra jî bi qasî şîddeta desthilatdariyê, belkî jî ji desthilatdariyê zêdetir bi kêr tê. Ew çiqasî bi awayekî neyênî behsa kapîtalê bikin jî piştî ku kapîtalîzm weke zanist pêşkêşkirin ji bo rewabûna wê gava dîrokî ya hewcedarî pê heye, avêtine. Mixabin, K. Marks û F. Engels, tevî dijbertiya xwe hemûyî jî kapîtal weke kapîtalîzm, yekdestdarên kar-sermayeyê weke bûrjûwazî, civaka ekonomîk weke civaka kapîtalîst îlan kirin û bi vî awayî bûn berpirsên herî pêşî yên vê gavavêtinê. Em divê hîç ji bîr nekin ku di dîrokê de niyetên baş bi pirranî ji bo encamên berevajî hatine bikaranîn.

Baş tê zanîn, wexta ku K. Marks û F. Engels dest bi vî karî kirin, herî zêde ji felsefeya diyalektîk a Hegel sûd wergirtin. Ez yeqîn dikim ku şaşiya bingehîn, wexta felsefeya diyalektîk li gorî fikra xwe li hev anîn, kirin. Ev jî wexta bi sêberiya tez-antîtez-sentez di serî de li ser kapîtal-heqdestdar ked-kar, bûrjûwazî-çîna karker-civaka kapîtalîst de li ser hin sêberiyên girîng kirin. Ez yeqîn nakim ku antîtêya[3] tez-antîteza (hebûnîtîbûn[4]) Hegel ji aliyê Marksîstan ve (û gelek kesên ev rêbaz bi kar anîne) tam hatibe fêhmkirin. Pirsgirêka bingehîn a felsefî antîtêya tez-antîtez (dibe hebûn) hê jî girîngiya xwe diparêze û li benda pêşdebirinê ye, maneya di zikhev de ya gerdûnî-tekîtiyê ango heqîqetê, îfade dike. Hegel bi xwe dixwaze vê bibêje: her hebûn bi xwe di nava xwe de dijberê xwe dihewîne. Hebûnî bi xwe (cewher) bê dijber nabe. Bê dijbertî hîçtî ye. Tam hîçtî tê maneya nebûnê. Li gorî ku nebûn jî tine ye, hîçtî tam nabe. Naxwe hebûn bê dijber nabin; çawa ku dahfdan bê kişandin nabe. Pirsgirêk ew e, mirov rast li mahiyeta dijbertiyê serwext bibe. Diyalektîsyenekî serketî, dijbertiyê rast diyar dike.

Divê mirov vê xusûsê pirr bi girîngî diyar bike: Ji hebûnekê mirov dikare bi hezaran antîtezan derxe. Li vir ji bo diyalektîkvanekî wezîfeya girîng a bi cih bîne ew e ku rast tesbît bike ka ji van pirr antîtezan kîjan DI SERÎ DE, di rêza pêşî de tesîrê li ya din dike, wê pêk tîne. K. Marks û F. Engels weke diyalektîkvanan wexta xwestin Hegel li ser piyan rast deynin, haya wan jê tinebû bi qasî serê wî jêkin, ketine nava şaşiyeke çor û ne li cih. Ez neçar im ku diyar bikim, tevî ku dusedsal in, li dijî pirr hatiye gotin jî diyalektîka Hegel vegotineke li asta jor e. Sêberiyên K. Marks û F. Engels bêguman aliyê xwe yê diyalektîkî hene, lê di asta sêbertiya diyalektîka rast de ji naveroka vegotinê dûr in.

---

[3] Antîtê ji peyva fransewî *entité* ye. Antîte tevahiya navgînan îfade dike ku tevneke têkiliyên bi hev ve girêdayî ye. Fikra antîte hebûna navendeke bi tenê ya biryardayînê ferz dike.

[4] Ontolojî di fîlozofiyê de lêkolîn û lêhizirîna *hebûnê* weke hebûn e, ango lêkolîna xisletên giştî ya her tişta heyî ye.

Ji aliyê mijara me ve şaşiya herî girîng di warê naverok û cewher de, di warê dijbertiya bûrjûwa-proleterya de hatiye kirin. Bêguman dijbertiya bûrjûwa-proleteryayê heye. Lê weke ku yeqîn dikin ev dijbertî pêk nehatiye û nameşe. Dijbertî û nakokiya kapîtalîzmê di antîtê û verîtêya[5] civakê de rê li ber vekiriye, nakokiya kapîtalîst-proleterya nîne. Nakokiyeke bi vî rengî hebe jî nakokiya bingehîn nîne. Ji vê jî girîngtir, kapîtalîzm bi qasî ku tê yeqînkirin di wê potansiyelê de nîne ku bi serê xwe verîtêtiya civakî kapîtalîze bike. Kapîtalîst bi tena serê xwe xwedî vê hêzê nîne. Herweha civakek ti carî bi rengên weke Kapîtalîst, Îslam, Xirîstiyan û hwd. rengê xwe naguherîne. Civak bi xwe, weke Xwezaya Duyemîn hebûna xwe diparêze. Hin rengên civakê di hin demên curbicur ên dîrokê de weke TEKÎTIYAN bi tesîr bûne, lê ev piştrast nake ku ew civak bi temamî bi destê wê tekê tek bûye; çawa laleyeke reş bi serê xwe nikare bibe civaka laleyan.

Kapîtalîzm weke hêmanekî ji antîtêya civakî bi tenê proleter pêk nayîne. Ji hebûna civakî tîpa bûye proleter, dikişîne. Lê di vê kişandinê de jî bi proleter re li dijî civaka vî proleterî jê dikişîne, bi pirranî îttîfaqê dike. Bûyer û diyardeya marksîstan weke hevgirtina demborî ya proleteryayê bi bûrjûwaziyê re li dijî civaka feodal, destnîşan dikir, ev e. Lê ev vegotinek e ku bingehê şaşiya wan pêk tîne. Ya rastî, kapîtalîzm ji civakê di berdêla tawîzeke jê re heqdest tê gotin, di bin navê proleterya de ajanekî çê dike, pêk tîne. Li dijî civaka kevin ya tê kirin ne hevgirtin, xiyanet e. Jixwe, li dijî xwezayeke mejiyê xwe nerm û harîqaya herî harîqa ya gerdûnê, li dijî civakê îstîsmarkariyek tê kirin, çawa ku bi efendîtiyê li dijî jinê tê kirin. Mîrasa efendiyan (Reban, qralan, zordestan) a hezarê salan jî bi kar tîne û di bin navê karê de bi awayekî sîstematîk û domdar ji tevahiya civakê nirx û buhayên heyatî, vedidize. Bi tenê weke kar ne bi tenê nirx, bi tevahî nirxên çandî yên maddî û manewî yên wê civakê îstîsmar dike. Di vê rewşê de kapîtalîzm dibe ew KOMIKA YEKDESTDAR a herî zêde, sîstematîk û domdar civakê digire hemberî xwe û wê dimije. Di vê çarçoveyê de bi

[5] Veritê ji peyva fransewî *Verité* ye. Maneya wê ya giştî rastîtiya tişta rast e. Di fîlozofiyê de lihevkirina fikir û objeya fikir îfade dike.

civakê re têkildar e, li ser civakê bi bandor e. Lê sîstema xwe ya serdest ava dike, xwediyên desthilatdarî, pereyî û bazirganiyê yên berê di bin pêşengiya xwe de dihelîne, karker û zenaetkaran ji xwe re dike yedek, ji entelektuelan hegemonya îdeolojîk ava dike û bi vî awayî bandora xwe diafirîne û îstîsmara xwe pêk tîne. Eger em dixwazin antîtê û civaka dibe hebûn bigihînin îfadeyeke zanistî, divê em cewher û şêweyê pêşketina komika weke 'civaka kapîtalîst' tê binavkirin, fêhm bikin ku ev pêdiviyeke rast diyarkirinê ye. Mirov heta ku avahiya karekterîstîk a vê pêvajoyê nebîne û li naveroka rêveçûna wê serwext nebe, bi navê 'ZANISTIYÊ' ya bê kirin wê ji 'POZITIVÎZM' a seresere û çor wêdetir neçe.

Mirov heta rêveçûn û meşa kapîtalîzmê li ser civakê rast diyar neke, xwe bi hin objektîvîteyên pozîtîvîst ên seresere rakişandin, li ser navê zanistê li hemberî zanistê şaşiyeke mezin dike, li ser navê zanista civakî li hemberî civakê dikeve nava şaşiyeke mezin. Wexta mijar bibe civak, hingê mirov hemin divê bêhtir li ser bifikire da ku pêşbîniya felaketa encamên wê bike. Ji vê analîza kurt a li ser mijara der barê nakokiya têkildarî kapîtalîzmê de nakokiya gelekî di asta jêr de kapîtalîst-proleter nîne, çarçoveya ev nakokî jî di navê de, eşkere ye ku di navbera kapîtalîzm-civak, kapîtalîst-civakparêzan de ye. Ji Marksîstên zîrek Rosa Luxembûrg bi gotina 'Civaka bi tevahî kapîtalîst ti carî wê pêk neyê' ji nuqteyeke bingehîn K. Marks rexne kiriye û ya rastî bi vê xwestiye vê pêvajoya komikê bîne ziman. Eger bivênevê, em behsa sosyalîzma zanistî (eger mirov bibêje zanista civakî rastir e) bikin, divê mirov li ser vî hîmî reformeke zanistî ya radîkal û şoreşa wê pêk bîne û ev yek wezîfeya me ya sereke ye.

Di çarçoveya maneyeke teng de mirov dikare behsa nakokiya civaka kapîtalîzm-ekonomîk bike. Eger mirov bi tedbîr be, bêyî ku rê li ber şaşiyên ciddî veke, dikare xwe bigihîne hin encamên rast û girîng. Di beşên berê de min bi girîngî diyar kiribû ku F. Braudel ekonomiyê bi bazarê re wekhev digire û dibêje, sermaye bi rêya vê bazarê ji cudahiya buhayan a bazirganiya mesafeyên dirêj sûdê werdigire û karê bi dest dixe ango behsa pozîsyona kapîtalîzmê ya dijberiya bazarê kiribû. Min anîbû ziman ku ev

vegotin kêm e, û têrê nake. Kapîtalîzm bi xwe bi tenê antî-bazar nîne (eger bazar bi ekonomiyê re wekhev tê girtin), divê bi şêweyekî bê gotin antî-ekonomî ye, û bi vî awayî ev nirxandin temam bibe. Antî-civakparêziya hegemonya sîstema kapîtalîst bi şerên mêtinkarî û emperyalîzmê yên rê li wan vedike, bi dewleta netewe ya faşîzmê diafirîne, li ser hîmê îndustriyalîzmê hilweşîna hawîrdorê ya rê didiyê, bi avahiya xwe ya timî krîzê çêdike, bi nakokîkûrkirina di navbera qutbên civakî de, bi awayekî neyê înkarkirin, mirov dikare pênase bike. Eşkere ye ku yê antî-civakî be, wê bi awayekî zêdetir antî-ekonomîk be. Ji ber ku kapîtalîzm 'qanûna kara herî zêde' di qada ekonomîk de pêk tîne. Antî-ekonomîkbûyîna kapîtalîzmê weke sîstem, tevahiya dîrokê bi ceribandinên wê yên di her qadê de hatiye piştrastkirin. Kapîtalîzm weke komikeke dîrokî, ne bi proleterê ku di encama nakokiyeke talî de koleyê wê ye, lê belê bi civaka ekonomîk û civaka weke danehevên çandî yên maddî û manewî were manedarkirin, ya rastî hingê ne bi tenê 'KAPÎTAL', 'DÎROKA KAPÎTALÎZMÊ' jî wê rast bê nivîsandin.

Tevgerên polîtîk û îdeolojîk ên ji cawê koletiyê azadiyê difesilînin ku proleter jî di navê de, xusûsa fêhm nakin ew e, yekdestdarên mêtinkarî û hêza kole weke pêvek û dewama xwe dikin mijara hebûnê (Antîtê, anîna rewşa hebûnê). Ev yekdestdarî wexta kole dikin hebûn, bi wî, avahiya xwe ya civakî çêdikin, dihûnin. Weke hêmanekî wan bikerritîne bi ser avahiyên yekdestdariyê ve nakin. Di dîrokê de bi vê maneyê çîna koleyan a serketî nîne. Spartakus jî bi ser biketa ji bo Romayê ji avakirina xanedaneke koledar a nû wêdetir nediçû. Antî-kapîtalîstekî pirr bi îddîa mîna Lenîn jî hê li ser xwe bû bi Polîtîka Ekonomiya Nû NEPê neçar ma kapîtalîzmê bi cih bîne. Di krîza roja me ya îro de rastiyeke hatiye piştrastkirin ew e ku ji bo pîşesaziya kapîtalîst (cureyên din ên kapîtalîzmê jî di navê de) dewam bike, li ser xwe bimîne, komên ji wan re çîna karker tê gotin ji hewldanên bi dilê xwe (daxistina heqdestên wan jî di navê de) paşve namînin. Yê zirarê dike jî bi giştî tevî civaka ekonomîk, tevahiya nirxên civakî ne. Ferdperestiya kapîtalîst vê rastiyê hê zêdetir piştrast dike. Li tevahiya van qadên civakî li ser hîmê antî-civakparêziyê ferdên bûne mîna girse û lodan,

ji bilî komeke yekdestdarên olîgarşîk ên mistek li serê payeya herî jor, rewşeke ji civakbûnê derketî, diqewime. Pirraniyeke din ya pirr mezin, girse û loda bêkaran e ku nikarin xwe weke koleyên bi heqdest jî bifiroşin û ji vê jî mehrûm in. Yên koleyê heqdestê ne, nikarin xwe ji ketina nispî ya heqdestan rizgar bikin. Eşkere ye ku tabloya rastî bi vî rengî pêk tê.

Rola tevgerên çînî yên teng di vê pêşketin û bûyerê de divê mirov ji nedîtî ve neyê. Sosyalîzma pêkhatî û tevgerên sendîkavaniyê di vê mijarê de xwediyê pratîkên ispatkirî ne. Bi kurtî, wexta nirxandina me ya kole di ber çavan re derbas bikin, divê ne weke hêmana sereke ya nakokiyê, di rola hêmaneke talî ya nakokiya giştî ya civakê de bibînin wê hê zêdetir me bigihîne encamên rast. Diyalektîka kole divê ji nû ve were nirxandin û ev wezîfeyeke bingehîn a civakparêziyê ye. Diyalektîka civakî ji bo heqîqeta civakî di buhaya zanista bingehîn de ye. Lê ji ber ku bi cihanîna wê ya rast tevahî girîngiya xwe diparêze, berê pêşî pêdivî bi analîzên wê yên hosteyane hene.

Bi qasî giştî (gerdûnî) di nava xweseriya (tekîtiyê) xwe de jî texrîbkariya kapîtalîzmê di civaka Rojhilata Navîn de gelekî li asta jor e. Bi awayekî fetihkar ketina wê ya herêmê weke sîstem di antî-civak û antî-ekonomiyê de bi şêweyê navenda sereke, bajarê metropol û mêtingeriya welatan e. Ji dema Xaçperestan ve, ji ber ku şaristaniya hegemonîk ji Rojhilata Navîn girt, divê bêhtir bi plan bimeşe û xwe ava bike. Li pey karên zêde yên yekdestdariyê ye. Ji bo pêdiviyên bingehîn ên civakê ne, berê xwe dide çavkanî, usûl û rêbazên karê zêdetir dikin. Bêguman divê mirov behsa milîs û ne milîsê kapîtalîzmê ne, behsa milletperestiya wê bike, mirov ê ji vê zêdetir hîn bibe. Diyardeya ku jê re kapîtalîzma millî tê gotin bi xwe xerîbtiya kolektîf a herî zêde ye û divê mirov li vê rastiyê hûrûkûr serwext bibe. Kapîtalîzm bi xwe weke tevn û zumre xerîbketin e. Bi îdeolojiya milletperestî dixwaze xwe weke civaka neteweyî û millî nîşan bide. Têgînên neteweperestî û milletperestiyê amûrên îdeolojîk in, bi giştî yekdestdarî, bi taybetî jî yekdestdariya kapîtalîst ji bo hegemon û bi maske bikin, hatine vedîtin.

Rojhilata Navîn bi sedema ku ji şaristaniya navendî ya pênc hezar salî re bûye mekan ji tevahiya yekdestdariyên mêtinkarî û hêzên yekdestdar re xerîb nîne. Yekdestdariyên kapîtalîst jî di nava vê de ne. Lê derfet ji wan re nehatiye dayîn ku bibin sereke û ji bo vê firsend jî nedîtine. Gelekî bi mane nîne ku mirov kapîtalîzma Ewrûpayê ji bo Rojhilata Navîn weke nûbûnekê bifikire. Ya nû ew e, weke sîstema fetihkar gav avêtiye. Li derdora dusedsalên vê gavavêtinê sedûpencî salên wê yên pêşî li ser hîmê kapîtalîzma malî û bazirganiyê pêk hat, di dema wê ya dawî de jî pîşesazî bi lez bû. Li gorî civakên Rojava serdestiyeke wê ya hê sivik û seresere heye. Bi hevgirtina yekdestdarên mêtinkar û hêzên ji rêûresmê re hegemonya xwe dewam dike. Li Rojhilata Navîn sîstema hegemonîk a kapîtalîst a navend Ewrûpa-DYE serwer e. Hebûna civaka kevin (komên qebîle, eşîr, mezheban) û dîroka şaristaniyê ya dirêj a Rojhilata Navîn, dibe sedem ku hegemonya navend Rojava li ser hîmekî qels rûnê. Herêm ji ber vê rastiya xwe xeleka qels û lawaz a sîstemê ye.

Me civaka ekonomîk weke dijberê kapîtalîzmê diyar kir, ji ber ku encamên wê yên girîng hene.

**1-** Divê nakokî ne weke di navbera kapîtalîzm-sosyalîzmê de, weke li ser bingehê civaka ekonomîk-kapîtalîzmê were fêhmkirin. Civaka ekonomîk tevahiya hêzên civakî yên ekonomîk ên bi awayekî neyînî ji hevgirtina yekdestdaran bi bandor dibin, dike bingehê xwe. Ekonomiya sosyalîst hêzên ekonomîk ên şert û mercên modern esas dibîne, civaka ekonomîk hêzên ekonomîk ên ji rêûresmê digire nava xwe. Ji vê jî girîngtir, ekonomiya nebûye piyase û xweza, meta nebûye û li bikaranîneke berfireh a bi nirx vekirî jî dikeve vê çarçoveyê. Nexasim keda jin û gedeyan berfireh e, û bi pirranî nirxa bikaranînê çêdike. Sosyalîstên reel ekonomiyê ji bo kapîtalîzmê di asta hilberîna metayan de dibînin û ev nêzîkatiyeke gelekî teng e. Jixwe yek ji şaşiya wan a herî mezin ew e, ekonomiyê weke xebateke seraktoriya kapîtalîzmê nîşan didin. Ji vê çêtir xizmeteke baş ji kapîtalîzmê re nayê kirin. Kapîtalîzm di warê zirardayîna ekonomiyê de dikare bibe seraktor, lê di warê avakirinê de nikare bibe.

**2-** Me diyar kiribû ku nakokiya bûrjûwa-proleterya ne weke hebûnên civakî bingehîn, belê nakokiyeke talî ye. Nakokiya civakî di navbera yekdestdaran û tevahiya civaka li derveyî wan de ye. Ji bo serwextbûna li xwezaya têkoşîna demokratîk, azadîxwaz û wekhevîxwaziya civakî, ev ji hev cihêkirin, girîng in. Bi ezmûna sedûpêncî salî ya sosyalîzma pêkhatî, eşkere derketiye holê ku têkoşîna bûrjûwa-proleterya lihevçêkirî ye. Xizmetkar û berdestî (çînên kolekirî), ti carî nikarin bibin xwedî wê hêzê ku di aliyê îdeolojîk-pratîk de ji efendiyên xwe bibihurin. Weke hebûn ev qabîliyeta wan nîne. Lê wexta xizmetkariyê red dikin, dikarin bibin xwedî qabîliyet û wê demê jî xizmetkar nayên hesibandin. Ji bo mirov bi awayekî rast li têkoşînên civakî yên dema modernîteyê serwext bibe, divê mirov zumreyên yekdestdar û yên li derveyî wan rast ji hev cihê bike û li ser vî hîmî çeperên xwe bigire, li ber xwe bide û xwe li avakirina civakî rakişîne. Ev yek têra xwe, di asta heyatî de girîng e.

**3-** Li jor, me du têgîn ji hev cihê kirin, li ser vî hîmî, li dijî 'civaka kapîtalîst' civaka nû ya were avakirin, dikare bi gelek navên cûrbicûr bê binavkirin. Li vir a girîng nav nîne, naverok e. Ji vê civaka nû re çawa ku em dikarin bibêjin civaka sosyalîst a demokratîk, em dikarin weke navekî baş, civaka demokratîk jî bi kar bînin. Ya girîng ew e ku civak û ekonomiyeke di bin serweriya yekdestdariyê de nebe, were avakirin. Mirov xebatên wê yên ekonomîk dikare di çarçoveya bazarê de weke ekonomiya metayê pênase bike û ev dibe ku hinekî rast be. Ekenomiyeke gelekî mezin a nirxên bikaranînê ya nakeve kategoriya metayê, heye. Ya divê ji aboriya civakî bi rastî were fêmkirin jî ev beş bi xwe ye. Polîtîka ekonomiya kapîtalîst (em lê binêrin kê ew tesewir kiriye, em ê çawaniya wê ya rastî çêtir fêm bikin) ekonomiyê heta ku bi tenê weke xebatên karê tînin kêm dike, teng dike. Ev yek dereweke mîtîk e ku rastiya naveroka ekonomiyê çeloxwarî dike. Cihêkirin û kategorîzekirina ekonomiyê bi navên weke ekonomiya kapîtalîst, ekonomiya millî, ekonomiya dewletê, ekonomiya bazirganî, fînansî an jî sinaî, ekonomiya cotkarî, gund an jî bajêr û ekonomiya global, zêde rastiyê raber nakin. Jihevkirina ekonomiya taybet û kolektîf jî lihevçêkirî ne. Ekonomî weke nirxa bikaranîn û bazarê

zêdetir pênaseyeke nêzî rastiyê ye. Berî dîrokê, pîvana bi tenê ya ji bo ekonomiyê, nirxa bikaranînê bû, ekonomiya ji bo pevguhertina li bazarê zêdetir di dema dîrokî de belav dibe. Modernîteya kapîtalîst pirraniya nirxên civakî bi armanca karê dike meta û îstîsmar dike, ev diyardeyeke nû ye, lê belê kansêrî ye. Jihevbelavkirina civakê, timî di rewşa kaotîk de hiştin û xistina wê ya nav krîzê, çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire. Cinsê mirov tevahiya bi hezarên salan ekonomiyeke li dora nirxê bikaranînê avabûyî, nas kiriye û bi kar aniye.

Civaka Rojhilata Navîn ji bo pêşengiya herdu nirxên ekonomiyê yên berî û piştî dîrokê bike bûye xwedî şens. Ango dizane ekonomî çi ye. Vampîr û xwînmija jê re kapîtalîzm tê gotin, bi navê ekonomiyê felaket li ser serê wê kom kirine û ev qirkirinên rastî yên ekonomiyê ne. Civaka Rojhilata Navîn zehmetiyê dikişîne li vê serwext bibe û tê bigihije. Hebûna sereke ya kapîtalîzmê ji bo jiyana ekonomiyê bivênevê nîne, ew bela serê ekonomiyê ye, kanserojena wê ye. Mirov bi tenê xebatên wê yên bi armanca karê yên li qadên mîna petrol, gaz, av û otomobîlê yên ku hawîrdorê hildiweşînin û civakê bi şeran dixeniqîne, ji hev derxe wan analîz bike, hingê rastî wê baştir bê fêhmkirin. Dîsa bêhtirî nîvê civakê bêkar, bê pîşe, koçber dihêle û vediguherîne girseyên bêmalbat û ev jî dike ku mezinbûna felaketê çêtir bê fêhmkirin.

Naxwe ji bo mirov bibe antî-kapîtalîst berê pêşî divê mirov antî-yekdestdarî be. Ev jî bi xwe re civakbûna demokratîk, sosyalîst (Mirov vê têgînê weke civakparêziyê fêhm bike hê rastir e) û azad-wekhev tîne. Ya behsa wê tê kirin di bin van sifetan de ji nû ve vedîtina civakê nîne. Civak weke koman (malbat, qebîle, mezheb, eşîr, netewe) ji hezarên salan ve hene. Ya pêdivî pê heye ew e, ji bo parastina van komên di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de divê mirov şert û mercên wan bi yên modernîteya demokratîk re li hev bîne û heta hewce bike wan ji nû ve ava bike. Bi vî awayî mirov civaka sosyalîst a demokratîk, civaka ekonomîk, civaka komên demokratîk ên antî-kapîtalîst û antî-yekdestdar dixe çarçoveya alternetîfa modernîteya demokratîk. Em dubare bikin: ya girîng pirrbûna navan nîne, hebûna cewherî ye. Di vê de zelalbûn yekemîn

pêştira bernameya modernîteya demokratîk e. Civakên Rojhilata Navîn ji vê nêzîkatiyê re xerîb nînin. Ya behsa wê tê kirin ew e ku mirov xwezaya civakî ya bi hezarên salan heye, bi îfadeyeke zanistî pêşkêşî wan bike. Ev xwe bi îradeya jiyana azad birêvebirin e, û di neynika zanistê de li xwe temaşe kirin e.

Divê mirov komên qebîle û eşîran hîç piçûk nebîne. Heta civak hebin wê formên bi vî rengî her hebin. Mirov dikare di roja me ya îro de jî rêxistinên civaka sivîl weke qebîle û eşîrên modern binirxîne. Mirov dikare mezhebên ji rêûresmê di plana rojane de weke akademî û enstîtuyan bibîne û ev manedar e. Mirov dikare neteweyan ne bi tenê weke dewleta netewe, weke civakên demokratîk ên bi pirr zimanî, etnîsîteyî, dînî û welatî ava bike û bibîne. Yê ku li nava Rojhilata Navîn ev şêweyên komên ji rêûresmê xistine nava pevçûnên xwînrij û di çaresernekirinê de asê kirine, bi giştî yekdestdarî, bi taybetî jî yekdestdariyên kapîtalîst, modernîteya kapîtalîst e. Modernîteya demokratîk divê van koman weke formên kevin ên paşverû û bêne tinekirin, nexe çarçoveya xwe, berevajî divê weke nirxên bingehîn ên civakî yên divê bi demokratîzekirinê ji hebûna wan sûd bê girtin, bibîne.

Ji ber ku di civakên Rojhilata Navîn de binyeya eşîran her çû teng bû ji qewmiyeta Ereb gelê Bedewî, ji qewmiyeta Tirk gelê Turkmen, ji qewmiyeta Kurd gelê Kurmanc derketine holê. Ev gelên rengê qebîletî û eşîrtiyê her diçe ji wan çû, ji bo demokratîkbûn û civaka demokratîk xerca bingehîn in. Tevgera polîtîk û îdeolojîk a demokratîk berê pêşî divê van beşan bi rêxistin bike. Beşên behsa wan tê kirin, hêzên bingehîn ên modernîteya demokatîk in. Dîsa weke mekanê sereke yê dînên yek xwedayî, mezheban hemûyan, nexasim jî yên hindikayî hatine hiştin weke Êzîdî, Elewî, Suryanî, Ermenî, Helenî û Cihûyan, mirov wan mîna xezîne û gencîneyên çandî binirxîne û wan bi enstîtuyekê yan jî akademiyekê ava bike û di her şert û mercî de derfetên jiyana azad, wekhev û demokratîk bide mensûbên wan û wan di çarçoveya modernîteya demokratîk de binirxîne, wezîfeyeke dîrokî civakî ya dest jê nabe ye ku li pêşiya me ye.

Civaka neteweyî ya mezin a herêmê ya Ereb, Tirk, Kurd û Farsan divê ji nexweşiya milletperestî û neteweperestiyê dûr bê girtin û hewl bê dayîn ji feqa dewleta netewe were rizgarkirin û di nava çarçoveya modernîteya demokratîk de bi qasî xweseriya wê bi gerdûnbûna wê ya mezin a neteweya neteweyan (nûkirina ummetê bi awayê modern demokratîk) ji nû ve were avakirin (ji dewleta neteweye wêdetir), wezîfeyeke bingehîn a dîrokî civakî ye. Îslam û ummeta wê divê di çarçoveya modernîteya demokratîk de bi awayekî rastî bêne reformekirin, ji îstîsmarkariya desthilatdar (Îslama Seltenetê) û fetihkar bêne rizgarkirin û bi awayekî ji dewleta netewe wêdetir weke ummeteke wekhev, azad û demokratîk werin nûkirin; ev ji wezîfeyên herî pîroz ên dîrokî civakî ne.

Naxwe li dijî moderîteya kapîtalîst û palpişta wê şaristaniya ji rêûresmê, moderîteya demokratîk a nirxên wekhevî, azadî û demokratiyê dike bingeh û palpişta wê ya dîrokî nêzîkatiya şaristaniya demokratîk û paradîgmaya wê, ne ku bi tenê mumkîn e, heqîqeta jiyanî ya azadiya hebûna civakî ye. Heqîqet îfadeya azadbûyîna hebûna civakî ye. Ji bo berbiçavbûna wê, ya pêdivî pê heye ew e ku divê mirov di heqîqeta zanista civakî de (di îfadeya wê ya rast de) berê xwe bide avakirina wê ya zanistî. Çawa ku di tevahiya dîrokê de hatiye dîtin û di roja me ya îro de jî ti îdeolojî û tevgera xwe bi heqîqeta xwe bi rêxistin neke û ji bo jiyana azad a dest jê nabe nemeşe, serketî nabe. Divê mirov dîroka civaka Rojhilata Navîn a bi qasî mirovatiyê kevin, bi tevahî hêza dewlemendiya wê ya civakî bi nirxên civakî yên moderîteya demokratîk ve bikelîne, divê mirov nexasim li dijî hegemonya moderîteya kapîtalîst a di roja me ya îro de ti çaviya civakî ya bi îrade û zêhniyeta xwe neketiyê nehiştiye, rabe, xwe biparêze û ji nû ve ava bike; ev wezîfeya herî pîroz e.

## b- Li Dijî Îndustriyalîzmê Civaka Ekolojîk-Ekonomîk

Serdestiya pîşesaziyê, ya moderîteya kapîtalîst li şoreşa pîşesaziyê bar kirî, bi tenê weke hegemonya ekonomîk pêk nayê, bandorên girîng li yekdestdariya îdeolojîk û yekdestdariya desthilatdariyê jî dike. Bi gotineke

din, eger mirov îndustriyalîzmê di çarçoveya maneyeke teng de weke mentiqê teknolojîk analîz bike û qîma xwe bi vê bîne, ev yek ê bike ku mirov şaşiyeke bingehîn bike ango wê bike ku mirov kapîtalîzmê weke ekonomî bibîne. Fonksiyona kapîtalîzmê li îndustriyalîzmê barkirî, bi giştî hilweşandina civaka ekonomîk, bi taybetî jî hilweşandina civaka gund-cotkariyê ye. Îndustriyalîzm di vê mijarê de weke yekdestdariya îdeolojîk û yekdestdariya desthilatdariyê çalak dibe. Civaka ekonomîk çiqasî ji hev de bikeve, qanûna kara herî zêde ya kapîtalîzmê dixebite. Ev yek ê bi yekdestdariya dewleta netewe re di zikhev de pêk bê, bimeşe. Mirov heta kapîtalîzmê di çarçoveya sêlingên distanê yê modernîteyê de analîz neke, di polîtîka pratîk û li ser navê zanista civakî de bivênevê şaşî û kêmasî yê bêne kirin.

Civaka mirov û ekonomiya wî ya li gorî qanûna kara herî zêde, bi ketina bin hegemonya îndustriyalîzmê ji hev de ketiye û hilweşiyaye. Encamên vê zirarê, bi kirinên wê yên dused salên dawî têra xwe derketine holê. Bi tenê hilweşîna germbûna global rê li ber vedike bi serê xwe, her sala derbas dibe mehşerê nêzîk dike ku ev encamek e, zanist jî tespît dike. Ji ber şovenîzma îndustriyalîst çavên zêhniyetê yên kor dibin, nikarin avahiya ekolojîk a tevna civak û ekonomiyê ya dest ji wan nabe, bibînin. Li maneya vê avahiyê serwext nabe. Ji bo domdarkirina qanûna kara herî zêde, bikaranîna îndustriyalîzmê li ser tevahiya komikên (mirov dikare bibêje qad û saziyên civakî jî) civakî û jiyana ekonomîk ji şîddeta desthilatdariyê bi tehlûketir e.

Îndustriyalîzm bi xwe tê maneya bikaranîna rêzik û prensîpên pratîk-teorîk ên fizîk, kîmya û biyolojiyê li ser civakê, nemaze jî li ser avahiya wê ya ekonomîk. Ev jî dibe sedem ku xwezaya civakî ya gelekî cuda ye, ji nedîtî ve bê. Xwezaya civakî sîstemeke timî li pey kara herî zêde baz dide nikare demeke dirêj hilgire. Nexasim demeke dirêj bikaranîna rêzikên xwezaya objektîv ji civakbûnê derketin e. Ferdperestiya kapîtalîzmê vê rastiyê piştrast dike. Karkirin û meşa rêzikên xwezaya civakî xweser in. Weke exlaqî û polîtîk dixebitin. Nêzîkatiya îndustriyalîst çi zû çi dereng divê karkirina exlaqî û polîtîk tesfiye bike. Ji bêkarî, krîz û newekheviya

zêde ya hatinê yên di ekonomiyê de berpirsiyar e. Sedemên sereke yên zirarê didin ekolojiyê, çavkaniya xwe rastiya îndustriyalîzmê ya me bi kurtî anî ziman e. Eger civaka serdemê ya îndustriyel li tevahiya qadan ekolojiya xwe pêşde nebe, nikare jiyana xwe dewam bike. Çawa ku destûrên bingehîn ên demokratîk bi armanca bisînorkirina Levîathan in (cinawirê bi navê dewleta netewe), ya cinawirê bi navê îndustriyalîzmê bi sînor bike jî ekolojî ye. Divê mirov baş zanibe ku di dema beriya serdema îndustriyel de, cinsê mirov jî di navê de jiyana bi tevahî ruhberan bi serwextbûneke ajoyên hundir (mejiyê hisî yê herî dijwar) ekolojîk e. Zindiyê ekolojîk nebe ji tesfiyeyê xelas nabe. Bêguman her zindî û ruhberek mejiyekî xwe yê ekolojîk ê xweser heye. Mirov dikare îndustriyalîzmê weke serdema serî li ber ekolojiyê rakirî jî binirxîne. Serîrakirina li ber ekolojiyê çûyîna ber bi qiyametê ve ye. Mehşera ku dînan hê berê jê xeber dane, bi xwe ew civaka ji ekolojîkbûnê derketî îfade dike.

Civaka Rojhilata Navîn di warê xwe lihevanîna ji bo jiyana ekolojîk de xwedî rola pêşengiyê ye. Çîrokên Nûh, Adem û Hawa behsa felaketên ekolojîk dikin. Di çanda pêxemberiyê de jiyana ekolojîk bi rola sereke radibe. Pêxemberan jiyaneke rengê ekolojîkbûnê êdî pê nediket, bi sifetên weke mehşer, firewn, nemrût û lanetê nirxandin, îro jî divê ev weke rêzikeke bingehîn a civakî pêk bê. Ev rêzik û pîvan nebin, domdarkirina civakan dikeve tehlûkeyê. Di civaka Rojhilata Navîn de teknîka sinaî bi hezarê salan tê bikaranîn, tevî vê yekê veneguheriye îndustriyalîzmê, ev yek bi avahiya exlaqî û çanda manewî ya herêmê re têkildar e. Serîrakirina li ber Xwezayê weke serîrakirina li ber Xwedê hatiye hesibandin. Lê di çanda Rojava de serîrakirina li ber xwezayê û hukimkirina li wê, ji prensîpên wê yên gavavêtina felsefeya wê (Felsefeya Descartes) ye. Di civaka Rojhilat de jî ahenga bi xwezayê re, prensîpa bingehîn e. Li ber xwezayê rabûn, ji hukimkirina li wê danegerîn, cewherê mezinbûna modernîteya kapîtalîst e. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, ji niha ve jiyana civakî ya di her qadê de gihiştiye ber sînorên nikare dewam bike, îfade dike.

Ango rêûresma civakî ya Rojhilata Navîn li hemberî ekolojiyê hestyar e, û pê re li hev e. Wezîfeya divê bi cih were anîn ew e ku divê mirov nêzîkatiyên dagirker, tineker û fetihkar ên kapîtalîzm û îndustriyalîzmê bi jinûveavakirina civaka ekolojîk ji holê rake. Sîleha bingehîn a modernîteya demokratîk civak û ekonomiyeke bi cewher ekolojîk esas digire. Li Rojhilata Navîn rola dîrokî ya îndustriyalîzmê jihevdexistin û tesfiyekirina civaka cotkariyê ya rêûresmê ya deh hezar salî ye. Civaka gund-cotkariyê û ekonomiya wê ya ku heta beriya pêncî salî beşa sereke ya civakê û ekonomiya wê pêk dianî, ber bi roja me ya îro ve bi lez ji hev tê xistin, ber bi bêkarî û tesfiyeyê ve tê birin, di nava deynan de tê hiştin û hedimandin. Ji ber dijmintiya bi vê civakê re wê ji hev de dixin, dihedimînin û tesfiye dikin. Heta civaka gund-cotkariyê ji hev neyê belavkirin, serketinên kapîtalîst ên global wê mîna yên li herêmên din ên dinyayê dubare nebin û çawa ku ji niha ve pêk tê, wê bikevin tehlûkeyê û rewşê gefan li wan bixwe (Tirsa ji civaka Îslamî, Îslamofobî).

Di şerên li Rojhilata Navîn ên hegemonya modernîteya kapîtalîst ên emperyalîzmê de îndustriyalîzm bi rola sereke radibe. Şerên av û petrolê tîpîk in. Ev şer wê di demên pêş de bêne zêdekirin. Di bikaranîna erd û axê de jî veguherîn ê li ser hîmê kapîtalîst bibe û ev jî qadeke din a bingehîn e ku şer ê li ser biqewime. Divê mirov qetandina gundiyan ji erd û axê, weke şerekî fêhm bike. Armanca fetha dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst ew e ku hebûna çanda jiyanê ya çemê sereke yê mirovatiyê yê panzdeh hezar sal temenê wê heye û civaka cotkariyê ya beşê wê yê mezin pêk tîne, bi dawî bike. Bergiriya vê civakê tê wê maneyê ku divê mirov vê çanda mezin a jiyanê li hemberî qirkirina modernîte dike, azad û demokratîze bike. Eger mirov dîroka şaristaniyê weke şerên yekdestdariyê şîrove bike, wê girîngiya bergiriya cemaetên dînî û qebîleyan a hebûna xwe weke formên hêza bingehîn a şaristaniya demokratîk baştir were fêhmkirin. Eşkere ye ku dîroka şaristaniyê bi diyalektîkeke wisa were bimanekirin, analîza şerên niha wê rasttir were kirin. Bûyerên weke şerên eşîr û mezheban têne binavkirin jî herçiqasî hatibin berevajîkirin di vê çarçoveyê de bêne analîzkirin, wê bê dîtin ku

têne maneya bergirî û parastina nasname û hebûna xwe. Ji vê vegotina tevlîhev encama divê mirov derxe û lê serwext bibe ew e, îndustriyalîzma ku weke amûrê herî kêmdîtî û bêhempa yê rizgariyê tê pêşkêşkirin, Levîathanê rastî ye.

Wexta behsa şaristanî û civakên Rojhilata Navîn tê kirin du hêmanên bingehîn ên ekolojîk têne hişê mirov, sîstemên li rêzeçiyayên Toros-Zagrosê û çemê Nîl-Firat-Dîcle-Pêncavê ye. Civaka van herdu sîsteman xwedî dikir, niha di dema herî trajîk a jiyana xwe de ye. Milletperestî, dînperestî, ekolên sosyalîzm û kominîzma reel timî xwe weke xelaskar raber kirin. Encama niha derket holê ew e, mirov qat bi qat xweziya xwe ji niha bi berê tînin. Analîz wexta şaş be, bivênevê encam ê bi vî rengî be. Ev îdeolojiyên yekdestdar, ne bi awayekî yekpare modernîteya kapîtalîst, ne jî weke 'dema avabûnê' nêzî serwextbûnê nabin, lê wexta dor tê îndustriyalîzmê mîna di xwedayê xwe yê hevpar de gihiştibin hevdu, li ber diçin sucûdê. Îdeolojiyên behsa wan tê kirin, wer îbadetê ji îndustriyalîzmê re dikin jê piştrast in ku wê deriyê cennetê li wan veke. Piştî xwedayê sekuler dewleta netewe, duyemîn sifetê herî mezin ê îndustriyalîzmê ye. Mirov dikare herî zêde ji vê rewşa kaotîk a ummeta xwedayê nû yê sekuler têderxe ku jiyana şaş hatiye hûnandin wê rast neyê jiyîn. Mirov bêyî dudilî bibe dikare bibêje, ev xweda ji xwedayên serdemên berê gelekî zêdetir bêrehm e. Bidawîkirina çanda jiyaneke panzdeh hezar salan ji mirovatiyê re pêşengî kiriye, mirov dikare bi awayekî weke mehşerê şîrove bike. Modernîteya demokratîk wexta weke antîtez ji modernîteya kapîtalîst bibihure, divê ji vê perspektîfa dîrokî binêre. Berpirsiyar e ku xwe weke aniha vê dîrokê, bi awayekî demokratîk, azad û wekhev ava bike, xwe bigihîne avahiya rêxistiniya wê û tevahî îfadeyên wê yên zanistî.

Piştî şerên xeternak ên mezheban, ji bo ji rewşa kaotîk a derket holê re çareyê bibîne sîstema Westphalia'yayê ya 1648'an tenzîm bû (dendika pêşî ya tewazuna dewleta netewe) di pêvajoya wê ya hişk a tam sêsed salî de bîlançoya hilweşîn û şerên ji tevahiya dîroka mirovatiyê zêdetir, ders hatin girtin û di encama vê yekê de xwe li avakirina Yekîtiya Ewrûpayê rakişandin, ceribandin. Çawa ku sîstema Westphalia'yayê weke antîteza

şerên mezheban bi pêş ket, sîstema YE'yê jî weke antîteza sîstema dewleta netewe Westphalia'yê ya hewl dide hişkbûna wê ne bi şoreşê, bi reforman biguherîne, tê pêşdebirin. Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de faşîzma dewleta netewe bi qirkirinan bi encam bû û derket asta xwe ya herî jor. Bi reforman hewldana rizgarbûna ji vê, navê ji nû ve avabûnê weke koma dewletên netewe yên demokratîk û huqûqê, mafê mirovan e. Lê ji ber ku li ser bingehekî şaş dest bi gavavêtinê kir, nikare di armanca xwe de hûrûkûr bibe û nikare konfederasyoneke gelekî sist jî pêk bîne. Sedema vê yekê jî ew e ku bi zêhniyeteke bi temamî îndustriyalîst a weke 'Yekîtiya Komir û Pola' ketiye ser rê. Li dora yekîtiyeke bi vî rengî, di çarçoveya hedefên mafê mirovan û dewletên neteweye yên demokratîk de civaka azad û wekhev nayê avakirin. Ya girîng ew e, modernîteya kapîtalîst li welatê xwe yê esasî bi hewcedariya reformekirina xwe hesiyaye. Yekîtiya Ewrûpayê bi tecrûbeyên xwe tê derxist ku bi avahiya xwe ya hegemonîk a hişk û kevn nikare pêşengiya sîstema dinyayê bike. Piştî vê YE kete pêvajoya reforman. Ev yek dîsa jî bûyerek e ku wê tesîreke diyarker li sîstemê bike. Ji bilî Yekîtiya Ewrûpayê ji ti hêza modernîteyê nehat ku bi xwe, xwe reforme bike û bi hewcedariyeke bi vî rengî nehisiyaye. Sedema vê jî şêwebûna hişk a hegemonyayê ye. Hêzên din ên modernîteyê heta bi sêlingên bingehîn ên sîstemê ve girêdayî bimînin, ji bilî şopandina YE'yê mîna ku ti çareyeke wan a din nîne.

Ango ji modernîteya kapîtalîst a dused sal e, hewl dide xwe li Rojhilata Navîn ava bike, bendawariya ji wê ya xwe reformîze bike, bendewariyeke rast xuya nake. Lê dikare bi hevkariya bi YE'yê re bibe xwedî derfetên reformê. Di vê rewşê de jî wê rewşa kaotîk û bi krîz a herêmê timî kûr bibe. Rastiya rojane vî hukmê me piştrast dike. Ji ber vê sedemê, bihurîna ji sîstema YE'yê şert e. Ne rêveçûna dîrokî ya Rojhilata Navîn, ne jî şert û mercên wê yên civakî yên roja me ya îro derfetê didin reformên mîna yên YE'yê. Ji ber vê rastiyê, gera li rêyên nû xwe ferz dike. Me gelek caran destnîşan kir: Îslama Radîkal, Komara Îslamî, lêgerînên cemaetan, çi teorîk çi jî pratîk ji xwe re nakin derd ku ji modernîteya kapîtalîst bibihurin. Bernameya wan a herî pêşketî modernîteyeke kapîtalîst a bi Îslamê cîla

kirî ye. Ango derdê wan ew e, yan bibin selefên nû yên Îslamê yan jî Protestanên wê –Calvînîst-, û li ser vî bingehî civak û dewletê bixin destê xwe. Ya bi milletperestiya dînê laîkên sekuler nikarîbûn tam bikin, bi maskeya Îslamî dixwazin temam bikin. Ew bi xwe heman tişt in, cewherê wan yek e, modernîteya kapîtalîst e.

Sosyalîzma pêkhatî weke milê çepê yê laîktiyê jixwe pirsgirêkeke wê ya weke dijberiya modernîteyê nîne. Bi tevahî ya dixwaze bi ser bixe ew e, li şûna kapîtalîzma lîberal kapîtalîzma dewletê bi cih bike. Encama vê jî avakirina modernîteyeke hilweşîner a ji kapîtalîzma lîberal bêrehmtir bû.

Naxwe li Rojhilata Navîn li dijî antîteza modernîteya kapîtalîst, pêşdebirina modernîteya demokratîk ji bo bihurîna ji rewşa kaotîk û krîza her roja diçe kûrtir dibe, li serê îhtîmalên kêrhatî tê ku divê bêne kirin. Şert û mercên dîrokî û civakî ji bo pêkhatina vê îhtîmalê, şensê zêde didin. Di çarçoveya şert û mercên berbiçav de slogana mirov dikare diyar bike ev e; “Yan dewamî krîz û kaos, yan jî modernîteya demokratîk.” Ji ezmûna YE’yê dersa girîng a mirov kare bigire ew e ku ji bo gavavêtinê mirov dikare bi xelekeke reformkar bigire ya bi koka xwe ji civaka ekonomîk. Bi mesafeya mirov li vir biçe, dikare di warên din ên siyasî û civakî de avahiyên hewce dikin, pêk bîne. Em wexta ji bîr nekin ku komir û pola malzemeyên bingehîn ên îndustriyalîzmê bûn, em ê nakokiya wê ya bi civaka ekolojîk re baştir fêhm bikin. Sedema avabûnê ya YE’yê ya ku çûna wê ya ber bi civaka ekolojîk ve asteng dike jî ev e. Komên li ser komir û polayê hatine avakirin, antî-ekolojîk in. Naxwe di sîstemê de kirina reforman bi serê xwe qîm û têrê nake. Eger armanc civaka ekolojîk be!

Eger li Rojhilata Navîn gaveke berbiçav a rojane ya modernîteya demokratîk li gorî şert û mercên dîrokî û civakî yên herêmê bê avêtin, şensê wê yê pêşdeçûnê wê hebe. Bêguman wê bi kopîkirina ji der ve negire û nemeşe. Kopîkirinên dused salên dawî yên modernîteyê xwe negirtin û ev jî vî hukmê me piştrast dike. Atmosfera ekolojîk a lê civaka neolîtîk û antîteza wê şaristanî seridîn, wê bibe qada şaristaniya demokratîk û modernîteya wê. Şaristaniyên navendî yên pênc hezar salî yên li geliyên çemên Nîl, Dîcle, Firat û Pencabê pêşketin niha qadên herêmî yên krîzê ne.

Di van dused salên dawî de dewletên netewe yên weke lingên herî muhafezekar ên modernîteya kapîtalîst hatin avakirin, sedema bingehîn a vê krîzê ne. Dewletên netewe yên dixwazin li ser şopa YE'yê biçin, ji ber ku qabîliyeta wan nîne xwe li reforman rakişînin, bi awayekî dijwar dişkin, krîz û neqeba kaotîk mezin dibe. DYE-YE weke hegemonên bi sîstemê re hevgirtî ne, tevî ku giraniya xwe didinê jî di warê dîtina rêya derketinê ji neqeba kaosê de zehmetiyê dikişînin û ji ber vê yekê ji nû ve avakirina dewleta netewe pêk nayê. Ev rewş hem krîza global kûr û dewamî dike, hem jî berevajî bandor lê dibe, tevlîheviya kaotîk zêde dike. Ango krîza avabûnê ya sîstemê herî zêde li welatê esasî yê şaristaniyê, mayînde dibe. Mîna ku heyf û tola xwe hiltîne.

Di roja me ya îro de Şerekî Cihanê yê Sêyemîn, li gorî xwe diqewime û nabe ev yek were înkarkirin. Ev şer hem ji aliyê naverokê û hem jî ji aliyê demê ve ji herdu şerên din kûrtir û dirêjtir e. Li herêmê ji bo sîstem xwe nû bike, ne potansiyela wê heye, ne jî pêk tê. Ya pêk tê jihevbelavbûn û rizîn e. Di van şertan de em li îhtîmala herî xurt a rêya derketin û xelasiyê digerin. Ji şaristaniya Sumer a weke antîteza serdema neolîtîkê pêş ket û heta modernîteya kapîtalîst a roja me ya îro demeke pênc hezar salî derbas bûye. Eger modernîteya demokratîk di nava vê dema derbasbûyî de bi tevahî danehevên çandî yên hatine tepisandin ji xwe re weke bingeh bigire û berê pêşî xwe bike tez û paşê jî weke antîtez giraniya xwe bide ser sîstemê, dibe ku ev yek bibe îhtîmala herî xurt a ji bo rêya derketin û xelasiyê.

Di rêveçûna navendî ya dîrokê de çerxa tez-antîtez-sentezê divê careke din bigere. Eger em rewşê berbiçav bikin, berê pêşî li ser çanda di nava geliyên Dîcle-Firatê de rabûye û di dîrokê de timî yekpare bûye, ji nû ve bi şîddet hewcedarî bi gavavêtinekê heye. Sînorên ji wan re îro Sûrî, Iraq û Komara Tirkiyê tê gotin, xêzên lihevçêkirî ne. Ji serketiyên Şerê Cîhanê yê Yekemîn hegemonên Ingilîz û Franse ve mîrate mane. Bi vî awayî parçekirina çanda dîrokî civakî, pêdiviyeke polîtîkaya jeostratejîk a parçe bike bi rê ve bibe ye, û ev rastiyek e ku êdî hewce bi guftûgokirina wê nîne. Mirov heta li encamên van sînorên lihevçêkirî bi tevahî û hûrûkûr serwext

nebe, nikare li Hîlala Bi Bereket a dîrokî yekîtiyên manedar ên çandî ava bike. Ehmeqiya herî mezin ew e ku mirov ji pîrozbûna van sînoran bawer bike (xêzên herî bêyom ên hegemonya xerîb in, yên herî ne pîroz) û li ser vê yekê bîra gavavêtineke çandî ya yekpare nebe û niyeta wî ya vê yekê nebe. Mebesta me ji yekparebûna çandê, li dora nirxên wekhevî, azadî û demokratîk hûnandina çanda maddî û nanewî ye. Çandeke bi vî rengî divê bi netewetiyeke ne milletperest, bi dîndariyeke ne dînperest, bi civakparêziyeke ne cinsperest û bi zêhniyeteke zanistî ya ne pozîtîvîst şîrove û ava bike.

Di vê mijarê de weke gava pêşî mirov dikare Komina Cotkarî-Av-Enerjî ya Dîcle-Firatê ava bike. Gavavêtineke bi vî rengî dikare ji bo pêşketina yekpare ya dîrokî û civakî bibe bersiveke di cih de. Wexta ev yekîtî pêk bê, em dizanin civaka dîrokî mûcîzeyan diafirîne û ji tevahiya pîroziyan re dergûştî kiriye. Eşkere ye ku ev komin ê di pêşketina civaka ekolojîk-ekonomîk de bibe hîmekî têkûz û potansiyeleke bi hêz pêk bîne. Bi vê modela kominê ya ekonomîk di her qada civakê de mirov dikare kominên bi heman rengî pêk bîne. Li Îsraîlê modela Kîbbûtzê jî hêza xwe ji vê xisleta kominê digire. Tevahiya dîrokê jiyana ekonomîk, bi giranî bi şêwazê kominan e. Lîberalîzma kapîtalîst herçiqasî mohra 'hewldana taybet' bi ferdperestiyê lêxe jî hilberîn bi giranî di serî de li fabrîkeyan li ser hîmê kominan pêk tê. Cudahî di sîstema karperest û ferdperest de ye. Kengî ji bidestxistina karê bê bihurîn an jî mirov wê daxin asta herî jêr, hingê li dawiyê bi tenê nîzama komin wê bimîne. Sîstema komin ne bi tenê di qada ekonomîk de, di tevahiya qadên civakî de dikare pêk bê û xisletên wê yên avabûnê yên gerdûnî hene. Pirsgirêka bingehîn a kominan ew e, divê karibin exlaqî û polîtîk bin. Divê mirov bi modernîteya demokratîk xwe bigihîne wan nirxan ku şaristanî û modernîteya kapîtalîst dûrketina ji wan ferz dikin.

Tejaneyên Dîcle-Firatê ji bo pêdiviyên bingehîn ên berhemên cotkariyê av, enerjî û zeviyên hewce bi zêdeyî raber dikin. Heta ev materyal bi qasî hewce dikin tedarik neyên kirin, civakbûna ekonomîk û ekolojîk a Rojhilata Navîn pêş nakeve. Lê eger daneheva maneya zêhnî bi qasî têrê

bike neyê pêkanîn, materyalên avabûnê bi serê xwe tenê nikarin avabûna civakê pêk bînin. Ango mîna civakên sosyalîst ên pêkhatî wê ji xizmetkirina modernîteya kapîtalîst û helandina di nava wê de wêdetir neçin û nikaribin ji vê aqûbetê xelas bibin. Daneheva maneya zêhnî ya hem di dîrokê de, hem jî ya di kefeya modernîteya demokratîk de pêk hatiye, ji aliyê akademîk ve were birêxistinkirin dibe ku bibe destpêkeke têkûz. Divê mirov ji bîr neke ku weke akademiyên pêşî zîggûratên Sumeran, Malên Hozan û Zanyaran ên li Nîppûr, Babîl, Nisêbîn, Ûrfa û Bexdayê rastiyekê nîşanî me didin ku debara şaristaniyê bêyî wan nabe. Modernîteya demokratîk bêyî akademiyayê nikare bi pêş bikeve. Dinyaya nû ya manewî û zanistî ku divê weke alternatîfa dinya akademîk a modernîteya kapîtalîst a di nava krîzê de were birêxistinkirin, bivênevêya civaka ekolojîk û ekonomîk e. Bi tenê eger civaka wekhev (divê hay ji xwe hebin), azad û demokratîk were avakirin û bi jiyana wan a di nava hev de, mumkin e ku zanist nebe yekdestdariya îdeolojîk û weke amûrê desthilatdariyê neyê bikaranîn. Her koma ekolojîk, kengî bi rêxistinî û serwextbûneke ji modernîteya kapîtalîst bihurî bê avakirin, hingê dikare manedar be. Heta serwextbûn, rêxistin û îradeya çalakiyê ya ji kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe bihurî pêk neyên, civaka ekonomîk û komên ekolojîk pêk nayên. Têgihiştina dibêje, zanist û serwextbûn cuda, civak cuda ye, belovajîkirineke şaristaniyê ye. Têgihiştinek bi vî rengî armanc û têkiliya bi kolekirina civakê re heye.

Civaka azad û demokratîk bi tenê bi têgihiştina maneya jê re pêwîst, dikare bijî. Her komika ekonomîk bi têgihiştina xwe ya ekolojîk dikare bijî. Jiyan û komikên xwe nesipêrin têgihiştin û serwextbûna ekolojîk wê di nava modernîteya kapîtalîst de bihelin û wê nikaribin xwe ji vê aqûbetê xelas bikin. Divê mirov komên ekolojîk-ekonomîk weke komên besît ên ji teknolojiyê mehrûm û bêpar nefikire. Wexta hewce bike, teknolojiyên herî pêşketî û tevlîhev di yekîne û komikên ekolojîk-ekonomîk de wê bêne bikaranîn. Heta komikên ekolojîk-ekonomîk komikên herî îdeal ên teknolojîk in. Teknolojî herî bi awayekî kêrhatî li van qadên civakî tê bikaranîn. Di civaka Rojhilata Navîn de şoreşa teknolojîk herî zêde ji bo

civaka ekolojîk-ekonomîk hewce dike. Di vê çarçoveyê de şoreşa teknolojîk antî-îndustriyalîst e. Teknolojiya di xizmeta îndustriyalîzmê de civakê hildiweşîne, dibe koletiyê, lê teknolojiya di xizmeta civaka ekonomîk û ekolojîk de civakan zêdetir ber bi jiyana azad û demokratîk ve dibe. Bi kurtî mirov dikare bibêje; şertên modernîteya demokratîk dikarin tewazuna herî manedar a di navbera teknolojî û ekolojiyê de pêk bînin. Ji bo vê, şerê îdeolojîk di navbera modernîteyan de bivênevêya şeran e. Eger ev têkoşîn bi awayekî serketî neyê kirin, li hemberî modernîteya kapîtalîst şensê mayîndebûn û jiyanê yê modernîteya kapîtalîst wê timî weke îhtîmaleke lawaz, hêvî û utopyayê bimîne.

Li cografya Rojhilata Navîn a ku ji serdema neolîtîkê dest pê dike û tevahiya serdemên şaristaniyê bi çanda maddî û manewî xwedî dike, jiyana civaka ekonomîk û ekolojîk e. Modernîteya kapîtalîst weke sê suwarên mehşerê bi sermayedarî, îndustriyalîstî û dewletdariya netewe, ev çanda civakî pelixandiye, xencer û parçe kiriye. Li hemberî vê yekê wezîfeya bingehîn a divê bi cih bê anîn ew e ku ji bo modernîteya demokratîk li ser sêlingên distanê ango lingên sosyalîst-demokratîk, ekonomîk-ekolojîk û polîtîk-exlaqî bê danîn, têkoşîna avakirinê were kirin.

## c- Li Dijî Dewletdariya Netewe Civaka Exlaqî û Polîtîk

Modernîteya kapîtalîst civakên Rojhilata Navîn bi tenê bi dewleta netewe bi qazoxekî qehîm ve girê neda; ji bandora bombeya atomê ya avêt Hîroşîmayê bi deh qatan zêdetir, bi dewletokên netewe bombe kir. Mirov dikare bibêje; nirxên çandî yên hevpar ên ji hezarên salan ve pêk hatine, bi bombebarandina dewleta netewe ya dused salên dawî hat parçeparçekirin. Bandora ti sîleha fizîkî nikaribe nîşan bide, kir û rê li ber ji hev belavbûn û parçebûnekê vekir. Civakên Rojhilata Navîn çi weke sîstemên şaristaniyên dewletdar, çi jî weke dijberên wê sîstemên kominî, di ti dema dîroka xwe de bi qasî dema di bin hegemonya modernîteya kapîtalîst de ji nasname û yekparebûna xwe nehatin kirin, nehatin parçekirin ji xwe û hebûna xwe re xerîb neketin. Împaratoriya Brîtanyayê

ev sîstema herî bi bandor (bombeya atomê ya rastî) bi tenê li Rojhilata Navîn ne, li her aliyê dinyayê pêk anî û bi vî awayî hegemonya xwe domdar kir.

Yek ji pêkanînên herî trajîk li dijî Qralê Franseyê Louis'ê 16. bi cih anîn. Bila şaş neyê fêhmkirin, ez Şoreşa Franseyê weke komployeke Împaratoriya Brîtanyayê nanirxînim. Lê Brîtanya wê demê ji bo armancên hegemonîk ên Qraltiya Franseyê betal bike, serî li her dekûdolabê daye û kes rola van dekûdolaban di jêkirina serê qrêl de nikare înkar bike. Di dest de gelek dane hene ku vê piştrast bikin, lê ji vê jî wêdetir belgeyeke girîng a vê rolê destnîşan dike ew e, bi jêkirina serê qral re di terora Jakoben a 1792'an de dewleta netewe bi awayekî fermî dest pê dike. Bi dewletoka netewe ya di 1792'an de bi awayekî fermî hat destpêkirin, bi tevahî armancên hegemonîk ên Franseyê bi awayekî berbiçav hatin pûçkirin. Teror bi kêra Brîtanyayê hat. Derketina holê û şerên Napolyon bi tenê Ewrûpa bi erdê re nekir yek, di heman demê de bi tevahî hêzên karîbûn serî li ber hegemonya Brîtanyayê rakin jî bê tesîr kirin. Napolyon bi xwe jî bû qurbanê van şerên dewleta netewe. Ev komara pêncan e ku Franseyê heta roja me ya îro pêk aniye. Lê eger di van hemûyan de hêza wê kêm bûbe û li pey Brîtanyayê mabe, di vê de para dewletdariya netewe ya burokratîk û çîna navîn a mohra Hollanda û Brîtanyayê li ser wan, heye. Heman rastiyê mirov dikare ji bo Împaratoriyên Spanya, Awûstûrya-Macarîstan, Rûs, Osmanî, heta Çîn, Hind û Japonyayê jî bifikire.

Ya seyr ew e, ev dekûdolabên di dawiya çaryeka sedsala 20. û serê sedsala 21. de weke li gelemperiya dinyayê, nexasim li Rojhilata Navîn kengî dewletên netewe li pêşiya hegemonya global a modernîteya kapîtalîst (ya bi pêşengiya Ingilîstan-DYE'yê) êdî bûn asteng, ji nû ve bi awayekî dijwartir û trajîk li dijî dewleta netewe hatin gerandin. Mîna ku Louisê 16. hatibe aktualîzekirin û li Rojhilata Navîn li dewleta netewe ya Iraqê ji nû ve hatibe vejandin, weke sembola wî, dawiya trajîk a Saddam Husên bû versiyoneke temam a heman dekûdolabê.

Mirov heta di çanda Rojhilata Navîn de rola dîrokî-civakî ya dewletdariya netewe hûrûkûr analîz neke û lê serwext nebe, ne mumkîn e

ku ji ti pirsgirêka civakî re çareseriyê bibîne. Eger mirov kirinên dewletdariya netewe yên dused salên dawî bi tenê weke komployên 'parçe bike-bi rê ve bibe' yên hêza hegemonîk a moderníteya kapîtalîst Împaratoriya Brîtanyayê bibîne, ev ê bibe nêrtineke gelekî besît a li diyarde û bûyeran. Ji bo mirov nekeve vê şaşiyê divê bi nazikî tevbigere. Bêguman dewleta netewe ji bo komployê şêweyekî dewletê yê di cih de ye. Lê ji vê jî girîngtir divê mirov weke heqîqet nirxa wî bi berfirehî diyar bike. Tevî propagandayên dijber ên pozitîvîst hemûyan, naveroka dewleta netewe bi hemanên herî bi sirr û metafizîk tijî ye. Rola wê ya di dîrokê de nehatiye rohnîkirin. Bandora wê ya li ser civakê jî hê tarî ye. Tevî îdeayên antî-teolojîk hemûyan jî şêweyê dewletê yê herî zêde bi xisletên teokratîk barkirî ye.

Gelekî girîng e ku mirov ji gelek aliyan ve rohnî bike bê ka dewleta netewe li Rojhilata Navîn çawa xuya dike. Çiqasî were rohnîkirin wê wezîfeyên exlaqî û polîtîk baştir bêne diyarkirin.

**1-** Dewleta netewe tevî îdeayên zanistiyê hemûyan jî weke heqîqeteke civakî antîteyek ango dibe hebûneke herî lawaz û neyênî. Rola wê ya bingehîn ew e ku şîfreyên xwezaya civakî yên gelekî dewlemend in, bi navê homojenkirinê bike tek û yek. Ji lewra tek ziman, tek dîrok, tek al, tek millet, tek tîp siyaset, tek tîp jiyan û tek tîp îdeolojî, bi homojenkirina xwezaya civakî di zikhev de dimeşin. Kengî avahiyên civakî yên cihêreng û tevlîhev bêne besîtkirin û tek tîpkirin, heqîqet şûna xwe ji dualîteyeke mîna reş û spî ya hatiye lawazkirin û neyênîbûyî re dihêle. Nêrtina li dinyayê ya jê re herî muhafezekar, şoven, hişkebawerî û faşîst tê gotin, li ser vê dualîteya besît pêş dikeve. Sedema van kirinên tektîpçêker ên desthilatdariya dewleta netewe, meyla kara herî zêde ya kapîtalîzmê ye. Komên jiyanê yên gelekî cuda yên civakê heta rûmet û azadiya xwe biparêzin, meyla kara zêde nikare dewam bike. Lê tevahiya qadên jiyanê yên xwe disipêrin berjewendiyên cuda, heta di bin serdestiya neteweyî de bi tektîptiyê bêne helandin, civak ê ber bi du çînên weke bûrjûwa û proleter ve biçe. Pêvajoya karê ya kapîtalîst bi van tîp çînîkirinan pêş dikeve û giştî dibe. Tevahiya dîrokê danehevên çandî yên maddî û manewî

yên ketine serhev dikin qurbanê du çînên bi homojenkirinê hatine çêkirin. Ev qurbankirineke rastî ye. Çiqasî ziman, bawerî û fikirên cuda, zêhniyet û avahiyên polîtîk-exlaqî hebin di çarçoveya vê qurbankirinê de ne. Du rêbaz têne pêkanîn: qirkirina çandî û fizîkî û asîmîlasyon. Eger asîmîlasyon encama tê xwestin nede, qirkirinên fizîkî û çandî dikevin dewrê. Bi giştî rêbaz di zikhev de têne meşandin. Pêvajoya jê re heqîqetkirina tektîp a lawaz û neyênî tê gotin bi vî awayî dimeşe.

Civaka du çîn a ku Marksîzmê bi şaşî hewl da weke erênî nîşan bide, rastiya heqîqeta wê ev e. Çîna jê re proleter tê gotin nirxê heqîqeta wê gelekî lawaz û neyênî ye. Bi giştî ferdê hatiye kolekirin heqîqeta wî ya civakî bi qasî ku mirov bêje tine ye, hatiye lawazkirin. Bi xwe di nava çîna efendiyan de hatiye helandin û ji ber ku ketiye rewşa pêvek û dûvikê wî, heqîqeta wexta azadbûye hilgirtiye jî derbasî beşa efendiyan bûye. Kêmasiyeke gelekî mezin e ku Marksîzm li vê serwext nebûye. Nuqteya Marks têde bûye şagirtekî xirab ê Hegel, herî zêde di vê mijara heqîqetê de derdikeve pêşiya me. Hegel li gorî Marks gelekî di asta jor de xwedî qabîliyet e ku heqîqetê destnîşan bike. Berhemên wî weke bingeh ji bo diyarkirina heqîqetê ne. Ji ber ku K. Marks kole weke hêmanê heqîqetê hildigire, destnîşan kiriye, beşa din a girîng a doktrîna xwe ku gelek rastî têde hene, bêkêr hiştiye. Kapîtalîzm bi tenê li ser hîmê kara maddî hêzê nade serhev. Tevî wê, heqîqeta civakî jî (hêza zêhniyeta civakê) desteser dike. Li gorî berjewendiyên xwe li parzûnkê dixe û dike malê çîna efendiyan. Ji aliyê heqîqetê ve jî xwe gelekî bi heybet bi hêz dike. Diyarde û bûyerên ji wan re bi xwe dewleta netewe tê gotin, pêvajoya veguherandin û veguhestina vê heqîqetê ne.

Naxwe di maneya heqîqetê de ne didu, tek çînek heye. Hebûna fizîkî ya çîna karker, heta rêxistiniya wê ya teng bi tîpa partî û sendîka, di nava yekparebûna rêxistiniya demokratîk a civakî de weke parçeyekî neyê nirxandin, li derveyî kurtêl û hûrikên heqdestê, nirxeke xwe ya heqîqeta civakî çênabe. Di mijara bidestxistin û jidestdayîna heqîqetê de jî mirov dikare têra xwe ji dîroka sosyalîzma pêkhatî hîn bibe. Xulase, dewleta netewe çiqasî homojen bibe, li ser navê çîna olîgarşîk a yekdestdar ewçend

heqîqetên tektîp ê bên diyarkirin. Naveroka van diyarkirin û destnîşankirinan herçiqasî hûnandî û spekulatîf be jî ev nayê wê maneyê ku ew heqîqet nînin. Divê mirov baş zanibe ku metafizîk jî cureyekî diyarkirina heqîqetê ye. Nirxê heqîqetê yê mîtolojiyan jî heye. Di xwezayê de nedîtina berdêla wan, tinebûna nirxa wan a heqîqetê piştrast nake. Divê mirov ji bîr neke ku her tim têkiliya heqîqetê bi pêkhatina zêhniyeta mirov re heye. Mirov heta li zêhniyeta insên weke şêweyê heqîqeta herî pêşketî ya tê zanîn serwext nebe, xebatên ji dil ên zanistî, hunerî û felsefî nabin. Bêguman şertê zêhniyeta mirov civakîbûna wî ye, lewma di heman demê de ev yek têkiliya heqîqetê bi civakê re ferz dike. Di ti forma civak û dewletê de heqîqet bi qasî ya li cem dewleta netewe bi tehekumê re têkildar, lawaz û neyênî nehatiye kirin.

**2-** Divê mirov bi girîngiyeke hê mezintir li ser hêmanên teokratîk û teolojîk ên dewleta netewe rawestin. Hegel wexta dewleta netewe weke xwedayê daketiye ser rûyê erdê dida naskirin, bi tenê nirxandineke sembolwarî nedikir. Wî dewleta netewe, weke fikrên tevahiya serdeman li ser navê xwedê ketine serhev û kombûne, şîrove dikir. Ji bo mirov vê fêhm bike, bes e ku bi tenê fikrên kombûyî yên rê li ber Şoreşa Franseyê vekirine lêbikole. Wexta pozîtîvîstan digot, bi dewleta netewe serwerî ji xwedê hatiye girtin, dewrî netewe hatiye kirin, haya wan ji wan nebû çawa xwedatî dikirin. Ji ber ku yan jê haydar nebûn serwerî tê çi maneyê yan jî eşkerekirina wê bi awayekî rast li gorî berjewendiyên wan nebû. Di tevahiya dîrokê de tevahiya desthilatdariyên hiyerarşîk û dewletên çêbûn, li ser navê xwedê (efendî) tehekumên yekdestdaran li ser civakê û li ser vî bingehî bi destxistina berhemê zêde û mêtina nirxan, serwerî bi xwe ye. Bi qasî ku hewce bi analîzê nebe eşkere ye ku çavkaniya serweriya xwedayî, mirovên xwe kiribûn efendî (bi maneya Reb e) bûn. Mirov rabe bibêje; “Bi Şoreşa Franseyê re Çavkaniya serweriyê êdî xweda nîne û netewe ye” ev li ser navê zanista civakî sextekariya herî mezin e. Pozîtîvîzm mûcîdê vê sextekariyê ye.

Tehekum û serweriya serdema destpêkê û navîn çiqasî çavkaniya xwe xwedê be, serweriya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst jî qat bi qat

zêdetir xwe bi heman çavkaniyê xwedî dike. Li vir a divê mirov li ser rawest e, têkiliya têgînên millet û milletperestiyê (netewe-netewetî) bi xwedatiyê re ye. Çawa ku tê zanîn di Îslamê de millet bi maneya dîn tê. Xwedê û millet bi xwe yek in, wekhev in. Millet dibe netewe û ev encamê naguherîne. Lîstikeke bi gotinan hatiye kirin û hew. Çi di Pirtûkên Pîroz de çi jî di doktrînên lîberalîzma kapîtalîzmê de derbas bibe, millet an jî netewe, civak an jî cemaeta fermana xwedê (efendî, reb, yê serwer, yê fermanê dide) bi cih tîne, îfade dike. Kapîtalîstên sekuler, bi têgîna laîk ji dîn, ji xwedê û serweriya wî dernakevin, wî înkar nakin. Bi milletperestî, neteweperestî yan jî bi navê mezhebekî nû yê dînî li gorî berjewendiyên xwe dînekî pêk têk tînin. Heta milletperestiya li ber sînorê faşîzmê di tevahiya dîrokê de ji dînên herî muhafezekar bêtir hişkebawerî ye. Ya girîng ne ew e, dîn bi formên berê yên weke Xirîstiyantî, Îslamiyet, Bûdîzm û Mûsewîtiyê be. Her fikir û baweriya civakê bîne asta perestinê, bi hêsanî mirov dikare weke dîn îfade bike. Di vê rewşê de xwedayê xwe heye tineye, zêde diyarker nîne. Cewherê wê bi xwe ew e ku karibe endamên civakê di asta pîroztiyê de bike hevpar, li ser hîmê cîhana fikir, bawerî û hisên zêde pev keliyayî bi şêweyên tevgerê yên ji wan re îbadet tê gotin û merasîmên wan ve girê bide. Di çarçoveya dewleta netewe de eşkere ye ku netewe û neteweperestî bi awayekî gelekî zêde li gorî van pênaseyan hatiye avakirin. Ango ev têgîn û doktrîn ewçend zêde eşkere ne, hewce nake mirov karekterê wan ê dînî guftûgo bike.

Di teolojiya netewe û neteweperestiyê de xusûseke divê em bi girîngî li ber çav bigirin ew e, pozîtîvîzm maskeya zanistiyê li rûyê xwe dixe û xwe mîna ku dîn û metafizîk nîne nîşan dide. Heta dijbertiya dîn û metafizîkê weke rêzik û pîvaneke bingehîn qebûl dike û bi vî awayî li ser navê ‘zanistiyê’ xwe ji rakişandina li muceredkirineke dînî paşve nade. Heqîqetperestî û dînperestiya dewleta netewe hişk bi hev ve girêdayî ne. Armancên wan yên hevpar ew in ku şêweyên jiyanê yên cihêreng û cudahiyên rastiya civakî bihelînin, tesfiye bikin, reş bikin û bêdîrok bihêlin. Li ser vî bingehî hewl didin îfadeyên dewlemend ên heqîqetê lawaz bikin û sîstema xwe ya hegemonîk weke heqîqeta bi tenê ya rewa raber bikin.

**3-** Avahî û zêhniyeta dewleta netewe ya li ser jiyana çandî ya Rojhilata Navîn hatiye ferzkirin, mijarek e, hê encamên wê bi awayekî yekpare û bi perspektîfa dema dîrokê nehatiye vekolan. Xwediyên van avahî û zêhniyetan bi xwe jî bi temamî haya wan ji wan nîne çi bi cih tînin. Ew jî di nava mekanekî teng û demeke kin de berjewendiyên bi sînor ên desthilatdarî û maddî ne. Ya rastî, yên dewleta netewe weke avahî û îdeolojî pêk tînin mentiqê wan weha ye "Em ji hegemonya modernîteya kapîtalîst çi biçirpînin, bibin kar e." Bi tevahî nêzîkatiyên taktîk û stratejîk bi vê nêrtinê bi sînor in. Sîstema hegemonîk wekî din firsend û keysa pêşketinê nadê. Ji ber ku ji heqîqeta me hewl da wê bi xwe bidin naskirin û teolojiya wê xebera wan nîne, li aliyekî timî dogmatîkên neteweyî yên dijwar û tûj in, li aliyê din jî timî mîna gumanbar dimînin û nikarin xwe ji vê rewşê xelas bikin. Eger em hewl bidin rewşê hê berbiçavtir bikin, em ê li nîzama dînî û qebîleyî ya Ereban binêrin. Yek ji rastiya civakî ya herî kevin a Rojhilata Navîn e. Li ser wan ji bîstan zêdetir dewletokên netewe têne ferzkirin. Ev bi tenê jiyana çandî ya hevpar parçe nake, li hebûna wan bi xwe jî di asteke nedîtî de xerîbketinê enjekte dike. Nasnameya nû ya Ereb a derketiye holê ji nasnameya wê ya serdema navîn an jî ya kevin ku gelekî tê rexnekirin, baştir nîne. Erebê li ser hîmê dewleta netewe hatiye dabeşkirin û parçekirin, Erebê herî lawaz, belovajîkirî û ji heqîqeta xwe ya dîrokî-civakî hatiye veqetandin e. Ew çiqasî bawer dikin ku bi dijwarî li dewleta netewe xwedî derkevin ji yeqîna wan cudatir ew xurt nabin, berevajî hê lawaztir û qelstir dibin. Jixwe Erebtî jî ne sedema bi hêzbûnê, sedema dûrketina ji heqîqetê û qelsbûnê ye.

Ti milletperestiya bi heqîqetê neyê xwedîkirin nikare bibe hêmana bi hêzbûnê. Ev rewş bi awayekî balkêş di pratîka Hîtler de pêk hat. Ji awirê dewleta netewe ve sînorên têne pîrozkirin bi temamî lihevçêkirî ne, û li gorî berjewendiyên hegemonya global hatine diyarkirin. Têgînên millet û welat ên di naveroka wê de, weke sembolên teolojiya nû di çarçoveya heman berjewendiyan de ne. Wexta derkevin derveyî çavçoveyê pirr zor û zehmet e ku ji xezeba xwedayê hegemonîk xelas bibin. Ya rastî, bi tevahî sînor, welat, millet, burokrasî û çîna navîn ên hewl didin di van dused

salên dawî de ava bikin, bi xwedatiya dewleta netewe serkorî kirine. Rastiya ku dibînin, yeqîn dikin ku rastiyeke ezel û ebed e. Lê kesekî hinekî zêhnê wî/wê li heqîqetan vekirî, dikare bibîne û zanibe bi tevahî rastiyên behsa wan tê kirin, vedîtinên fantastîk in, bi armanca rewakirina berjewendiyên hegemonîk ên dused salên dawî li hev hatine çêkirin. Avakirina dewletên netewe yên Turkî û Îranî berhemên heman berjewendiyên hegemonîk in. Tevî ku mohra fethê ya modernîteya kapîtalîst li ser pişta wan heye jî hewl didin ji krîza xwe ya rewabûnê bi îdeolojiyên milletperest û radîkal-dînperest bibihurin. Li cem hemûyan milletperestiya laîk û dînî dixin nava hev, û bi vî awayî hewl didin bi zirxekî têkûz ê îdeolojîk ser dewleta netewe bigirin. Etnîsîte, dîn, mezheb û çandên dîrokî yên di rewşa hindikayiyan de hatine hiştin li hemberî dewleta netewe bi pirsgirêka man û nemanê re rûbirû ne.

Yekparebûna çanda Rojhilata Navîn bi parçekeriya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst re di nava nakokiyeke bi kok de ye. Modernîte li ser rastiyên jiyana hevpar qefesa ji hesin ferz dike. Ji lewra di rojevê de misêwa şîddet cih digire û ev jî vê rastiyê piştrast dike.

Hêza çareserî û analîzê ya modernîteya demokratîk li hemberî dewleta netewe zelaltir e. Hêzên hegemonîk ên kevin û yên nû, rastiyên wan ên civakî xistin xewê û timî hewl dan dîroka wan bidin jibîrkirin. Ew bi nêzîkatiya modernîteya demokratîk dikarin di nava dîroka xwe de van rastiyên xwe yên civakî weke heqîqeta hebûna xwe îfade bikin. Analîzên der barê hêzên hegemonîk de, der barê dijberê wan de weke heqîqet û dîrokê bersivê dibîne. Rastiyên civakî çawa ku di ti demê de bê dîrok nebûn, bê heqîqet jî nînin. Li ser çanda civakî ya Rojhilata Navîn ku xwedî karekterê yekparebûneke dîrokî ye, hegemonya dewleta netewe hatiye ferzkirin, li dijî vê, antîteza modernîteya demokratîk civaka exlaqî û polîtîk e.

**a-** Dewleta netewe weke înkara civaka exlaqî û polîtîk pêk tê. Li şûna exlaq rêzikên hêzê yên ji wan re huqûqa neteweyî tê gotin bi cih dike, dide danîn. Huqûqa ku tertîbkirina hêzê îfade dike, herî zêde pêşketina xwe di

çarçoveya dewleta netewe de pêk tîne. Dewleta netewe jî li şûna civaka polîtîk îdareya hişk a burokratîk serdest dike. Înkara civaka polîtîk bi awayekî berbiçav di nemeşîna sîstema demokratîk de xwe nîşan dide. Herçend hilbijartin û parlement hebin jî ya dimeşe avahiya îdarî ya olîgarşiya burokratîk a destûra bingehîn a ne nivîskî ye. Desthilatdariya dewleta netewe ya heta mûrehkên civakê belav bûye xwe bi kirasê huqûqî weke îdareya gelemperiyê raber dike. Hilbijartin û parlement ji bo rewakirina vê îdareyê bi rola cîlakirinê radibin û jê pêve jî ti maneyê îfade nakin. Civak, gel û netewe bi dewleta netewe re wekhev dikin. Li hemberî vê rastiya hegemonîk a modernîteya kapîtalîst weke ku gerdûnî be ferz kiriye, ji bilî parastin û bergiriya civaka exlaqî û polîtîk rêyeke din a çareseriyê nîne.

Xwezayên civakî weke cewher exlaqî û polîtîk in. Mirov nikare li civak û ferdê bê exlaq û polîtîk bifikire. Dikarin civakê neçarî bêexlaqî û bêpolîtîkabûnê bikin. Dikarin qabîliyeta exlaqî û polîtîk kotrimî bikin û ewçend lawaz û qels bikin ku nikaribe bi rola xwe rabe, lê ti carî nikarin tine bikin. Tinekirina wê bi tenê bi awayekî mumkîn e, ew jî kengî ji civakbûnê derkeve. Exlaq û polîtîka amûrên bi hêz ên heqîqeta civakî ne. Mehrûmbûna ji exlaq û polîtîkayê rê li ber bêheqîqetiyê vedike, li qadên çalakiya bi hêz a exlaqî û polîtîk jî hebe, şêwazên xweîfadekirinê yên heqîqetê jî bi hêz û şefaf dibin. Yek ji mijarên girîng ên Marksîst têde xapiyan ew bû ku wan exlaq û polîtîka weke avahiya jor raber kirin. Ti ferd û komika civakê nîne exlaqî û polîtîk nebe. Her komik û ferdê civakê hem exlaqî hem jî polîtîk e. Demokrasî bi civaka exlaqî û polîtîk re di wezn û rêjeyekê de ye. Demokrasî rewşa civaka exlaqî û polîtîk a dixebite îfade dike. Heqîqetên civakî xwe herî zêde weke civakên demokratîk nîşan didin. Îfadeyên heqîqetê bi awayên felsefe, zanist û hunerê herî baş bi civaka demokratîk bi ser xwe ve tên. Ev tespît diyar dikin, bê ka çima heqîqet herî zêde bi civaka exlaqî û polîtîk bi ser îfadeyên xwe ve dibin.

Hêmanên berxwedanê yên li Rojhilata Navîn hê bi hêz in, nîşan didin ku hêmanên exlaqî û polîtîk weke yeqîn tê kirin, lawaz û qels nînin. Ferd û komikên bêexlaq û bêpolîtîka nikarin li ber xwe bidin. Ew bi tenê hînî

serîtewandinê kirine. Hewldanên ji bo hebûnê, koçberî û berxwedanên di asta malbat, qebîle, eşîr, mezheb û netewe de bi qasî redkirina dewleta netewe di heman demê de ji bo avakirina civaka demokratîk jî bangewaziyek in. Di çanda Rojhilata Navîn de bûyerên di vê astê de diqewimin mîna oryantalîzm dixwaze bide qebûlkirin paşverûtî, perestina serdema navîn û anarşî nînin, potansiyela dewlemend a moderniteya demokratîk pêk tînin. Nedîtina dewlemendiya diyardeyên civakî, di encamê de bi xwe re kêmbûna hêza heqîqet û maneya civakî tîne. Dewlemendiya çandî çiqasî were homojenkirin, ewçend di maneya wê de û di îfadekirina wê ya heqîqetê de kêmasî çêdibe.  Rêveberiya dewleta netewe ya ku welatiyê tektîp diafirîne ferdperestiyeke ji aliyê maneyê ve potansiyela xwe ji dest daye, ji bilî çend dogmayên jiberkirî pêve zêhnê xwe naxebite, merasîmên fermî weke şêweyekî îbadetên nû fêhm dike û ji aliyê heqîqetê ve ferdiyeteke nava xwe pûç pêk tîne.

Nirxên exlaqî û polîtîk ên bi civaka demokratîk bi kêr tên, ji potansiyeleke dewlemendiya wê ya maneyê heye heqîqetê pêk tîne. Civakeke timî bi heqîqetan xwe xwedî bike jî dikare di tewazuna îdeal a kom û ferd de pêk bê û hebe.

**b-** Li hemberî teolojiya pozîtîvîst a dewleta netewe, civaka polîtîk û exlaqî jî bi maneya zanist-zanyariyê felsefeyê esas digire. Laîktî û sekulertî weke prensîp ji dogmayên dînî zêde guhertîtir nînin. Bi lixwekirina kirasê dewleta netewe ji dînperestiyê xelas nabin; bi tenê şikil û şema diguhere. Dogmayên dewleta netewe yên zanistiya pozitivîst wan bi lez çêdike ji dogmayên dînî yên serdema navîn hişktir in. Rastiya mêtinkarî û şerên rê li ber wan vedike, vê xusûsê piştrast dikin. Divê mirov baş bizane, teolojî, moderniteya kapîtalîst jî di navê de, weke amûrê rewakirinê yê îdeolojîk ê şaristaniya çînî-dewletdar hatiye avakirin. Li dijî hêmanên zanist-zanyartiya di nava civaka exlaqî û polîtîk de weke antîtez pêk tê. Nirxên exlaqî û polîtîk rê li ber zanist û zanyartî-hozantiyê vedikin, zanist û zanyartî jî civaka exlaqî û polîtîk dewamî xwedî dikin. Îfadeya civakî ya xwe ji der ve ferz dike theo (Xwedê) û logîk (aqil) dewleta qral-xwedê ye. Ji ber ku sosyolojiya Rojava bi heman cewherê dewlet û çînê xwe xwedî dike

nikare vê rastiyê bi awayekî zelal îfade bike. Bi gava xwe ya pozîtîvîst teolojiyê digihîne qonaxa herî bi tehlûke. Ma kî dikare înkar bike ku dinyewîbûna xwedê ji ezmanîbûna wî hezar qat zêdetir mêtinkarî, rondikên çavan û xwîn nerijandiye! Nexasim ezmûna dused salên muhteşem ên dawî yên xwedayê dewleta netewe hê li ber çavan be. Ma sifetên van xwedayan çi bûn? Sînor, millet, al, surûd, burokrasî û çîna navîn û welatiyên monolotîk. Di bin van sifetan de xwedayê dewleta netewe çi kir? Mêtinkarî û şerên di dîrokê de hemtayê wan nedîtî pêkanîn. Demiurg weke Xwedayê Mîmar li dinyayê nîzama dewleta netewe ava kir. Bi vî awayî piştrast kir ku ew xwedayê herî pêşketî yê xwedî xisletên pûtperestiyê ye.

Civaka exlaqî û polîtîk ji bo bijî hewcedariya wê bi xwedayetiyên bi vî rengî nîne. Zanyartî û hozantiyê ji teolojiyê binirxtir dihesibîne. Hikmet, zanyartî, hozanî ne ji teolojiyê, ji zanistiyê çêdibin. Bi awayekî sosyolojî ne. Di civaka Rojhilata Navîn de tevî ferzkirinên teolojîk hemûyan, rehên zanyartî û hozantiyê her hebûn û heta îro hatin. Divê mirov zanyartiyê weke yekparebûna felsefe û sosyolojiyê û rewşa wan bi jiyanê re di zikhev de binirxîne. Zanyartî heta bi Sokrates jî formekî bingehîn bû, lê paşê bi ekolên piştre hatin ev rêûresm rizandin. Jiyan û doktrîn ji hev qut bûn. Vê yekê jî derb li civaka exlaqî û polîtîk da. Zanyartî weke felsefe xistin xizmeta dewletê. Di rêûresm û kevneşopiya pêxemberan de tevî ku aliyê serwer timî zanyartî û hozantî bû jî gavavêtina wan ber bi teolojiyê ve rizîn û dejenerebûn bi xwe re anî. Qasid, waiz û rahib çiqasî bikevin ser rêya teolojiyê, wê ewqasî jî ji zanyartî û hozantiyê qut bibin û ji civaka exlaqî û polîtîk dûr bikevin. Di çanda Rojhilata Navîn de, di navbera hêmanên van herdu dualîteyan de têkoşîneke zêde heye. Ev têkoşîn bi xwe tengezariya di navbera dinya şaristaniya demokratîk û şaristaniya dewletdar de nîşan dide.

Bi awayekî vedizî qraltî û despotî di têgîna xwedê de hatiye bicihkirin û li ser civakê hatiye ferzkirin. Li dijî vê, bi tesewifê ya berbiçav bûye ew e, bi zanyartiyê nasnameya civakê hatiye diyarkirin û ev karê bingehîn ê zanyaran e. Bi vî awayî civaka exlaqî û polîtîk tê parastin. Di civakê de li

keramet û hikmetê tê gerîn. Bi vî şêwazî şîrovekirina dîroka Rojhilata Navîn girîng e. Wê rojanekirina wê, bihêle ku moderníteya demokratîk baştir bê fêhmkirin.

**c-** Civaka exlaqî û polîtîk, civaka neteweyî înkar nake. Civak misêwa weke pêdiviyeke xwezaya xwe şêwe û awa diguherînin. Cûrbicûriya form, dewlemendiya jiyanê ye. Ya li dijî wê tê derketin ew e, hişkîbûn û girtîbûna li formên civakî ye. Muhafezekarî weke bingeh israra di girtîbûn û hişkîbûna form de ye. Formên azadîxwaz li nermahî û şefafiyê vekirî ne. Nasnameyên civakî çiqasî nerm û serê wan vekirî bin, ewçend jî cihêreng dibin ango azad dibin. Têgihiştina dewleta netewe li nasnameyê tekperest e, serê wê girtî û hişk e. Çavkaniya faşîzmê ji vê têgihiştina nasnameyê ye. Ji ber ku nasnameyên civakî bi vî awayî têne fêhmkirin, li derve û hundirê civaka neteweyî, misêwa rewşa şer pêk tê. Nasnameyên civakî yên serê wan vekirî û xwezaya wan a nerm, nasnameyên lihevçêkirî, hişk û girtî li ser wan bên ferzkirin, bivênevê şerên bi vî rengî wê biqewimin. Çi şerên dînî çi jî şerên neteweyî (Li cem herduyan jî xisleta bingehîn a nasnameyan serê wan girtî û hişk in) vê pevçûna nasnameyan îfade dikin. Di dused salên dawî yên Rojhilata Navîn de şerên nasnameyên neteweyî gelekî qewimîn û ev yek têkiliya xwe bi wê nasnameyê re heye ku moderníteya kapîtalîst ferz dike. Nasnameyên ku dewleta netewe di parzûnka xwe ya hegemonîk re derbas kirî, dûvikên nasnameya navendî ne, û di pozîsyona ajanên wê de ne. Nasnameya navendî timî weke biryargeha sereke dixebite. Bi acenteyên xwe yên hewcedar û mêtingeh ji nêz ve eleqedar dibe. Dema hewce bike wan ji nû ve tertîp dike.

Çawa ku li gelemperiya dinyayê bûyî, li Rojhilata Navîn a roja me ya îro jî nasnameyên dewletên netewe yên dused salên dawî peritîn û hilhilî ne, li pêşiya kapîtalîzma dixwaze globalbûnê zêde bike, bûne kelem û asteng. Di bingehê krîza avabûnê de berxwedana muhafezekar a dewleta netewe heye. Nakokiya sereke ya di nava sîstemê bi xwe de ev e. Lê nikare çareseriyê bibîne. Ji Afganistanê heta bi Fasê, ji Qafqasyayê heta bi Okyanûsa Hindê li aliyekî nakokiyên di navbera dewletên netewe û kapîtalîzma global de zêde dibin, li aliyê din jî rê li ber şerên timî

diqewimin vedike. Belavbûna kapîtalîzmê bi giranî bi xêra dewleta netewe ye, lê niha baş dizane ku wê bi temamî nikaribe wê tesfiye bike. Dema ku dixwaze wê reformê bike, misêwa bi berxwedana van dewletan re rûbirû dibe. Beşên bi dewleta netewe re gelekî zêde gir û dewlemendbûn, li dijî kapîtalîzmeke rasyonel li ber xwe didin. Di encama vê de krîz û şer hê zêdetir dibin. Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a dawî ya DYE'yê ji ber vê rastiyê bû sedema nemeşandina vê projeyê dîsa em li heman rastiyê binêrin, em ê fêhm bikin. Xetimîn û asêbûna li herêmê ji pêxîrtengiya sîstemê ya di Şerên Cîhanê ya Yekemîn û Duyemîn de kûrtir e. Ji ber ku welê ye, bi ti awayî çareser nabe. Têgîna krîza avabûnê jî maneya xwe ji vê xisleta rastiyê digire.

Naxwe çi ji ber pêşketina çanda yekpare ya civakî-dîrokî, çi jî ji ber nakokiyên hundir ên modernîteya kapîtalîst, heta ku Rojhilata Navîn ji nasnameya dewleta netewe ya girtî û hişk nebihure, îhtîmal nîne ji ti pirsgirêkê re çareseriyeke manedar peyda bike. Li Iraq û Afganistanê tevahiya hewldanên ji bo jinûveavakirina dewleta netewe têk diçin, tewş in. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ji bo Ewrûpaya hilweşiyayî alîkariyeke bi sînor a DYE'yê di çarçoveya Plana Marshall de dayî têra jinûveavakirinê kir, lê ji bo mekanekî piçûk ê mîna Iraqê tevî ku alîkariyeke qat bi qat zêdetir hat pêşkêşkirin, ji nû ve avakirina vî welatî pêk nayê. Ya rastî bûyerên li Iraqê diqewimin bi tevahî rastiyên li herêmê nîşan didin. Ew jî ew e, nûçeya krîz û îflasê ya modernîteya kapîtalîst a li ser sêlingan dide. Weke encam mirov dikare bibêje; tevî ewqas dewletên netewe, îndustriyalîzm û kapîtalîzma xwe, Rojhilita Navîn wê bi tenê krîz û şer çêke.

Lê belê divê ez dubare destnîşan bikim ku krîz û şerên diqewimin ne bi tenê yên dused salên modernîteya kapîtalîst in, di heman demê de krîza avabûn û şerên şaristaniya dewletdar-çînî ya pênc hezar salî ne. Çareseriyên muhtemel divê van rastiyan bikin esas û li ber çav bigirin.

## d- Li Rojhilata Navîn Li Dijî Moderníteya Kapîtalîst Moderníteya Demokratîk

Di cîhana zêhnî ya Rojhilata Navîn de li ser moderníteyê têra xwe guftûgo hatine kirin. Ev guftûgo yan bi tenê li ser bingehekî teknîk û zanistî hatine kirin û hêmanên din li derve hatine hiştin an jî bi temamî ew qebûl kirine, lê yên van guftûgoyan dikin nizanin bi çi re rûbirû ne, û ji aliyê zanistî ve ji serwextbûna li vê yekê dûr in. Jixwe tercîh ne girêdayî wan bû. Moderníteya kapîtalîst weke hegemonya, çiqasî xwe li wan aland û bada, ji bilî pê re lihevkirinê çare nedîtin. Bêyî cudahiya fikra çepgir-rastgir, hê jî fikreke ji oryantalîzmê bihurî û xwe gihandî cîhaneke zêhniyetê, nîne. Pirr kêm fikir hene ku di nava moderníteya kapîtalîst de nehatibin helandin û pê re li hev nekiribin. Bêguman serketina di fikrê de nebe wê di jiyanê de jî serketin nebe. Ji ber ku me der barê dijberiya sîstemê de nirxandin di beşên berê de kiribû, bi tenê kengî hewce bikin em ê dubare bikin.

Bi paradîgmaya moderníteya demokratîk analîzkirina pevçûnan û krîza avabûnê û pêşkêşkirina çareseriyên muhtemel, mumkîn e. Yekparebûna dîrokî û asêtirbûna dewleta netewe, şensê pêkhatina çareseriyên muhtemel ên bi vî rengî hê zêdetir dikin.

**1-** Jeoçanda Rojhilata Navîn bi parçekeriya dewleta netewe re bi awayekî kûr di nava nakokiyê de ye, û ev yek hêzê dide meylên yekparebûn û entegrasyonê. Di ti dema dîroka xwe de herêm bi qasî di dema dewletên netewe de parçe nebûye. Parçebûnên pêkhatî jî di asta desthilatdariyê de mane, zêde bandor li jiyana çandî nekirine. Cihêrengî û cudahiyên dînî û etnîk bi hezarên salan di nava hev de man û ev bi yekparebûna jeoçandî ve têkildar e. Heta mezinbûnên hegemonîk ên têkildarî desthilatdariyê jî timî di nava herêmê de bi pêş ketine. Ji hegemonê destpêkê yê dîrokê nivîsandiye û qeyd kiriye Qralê Aqad Sargon heta bi hegemonya dawî ya Osmaniyan weke desthilatdarî jî aliyê zêde giraniya xwe nîşan daye yekparebûn e. Her hêza nû ya mezin û bilind bûye, bi lez bûye hêza herêmê. Çi şaristaniyên bingeha xwe çîn û dewlet bin, çi jî

şaristaniyên demokratîk ên nikarîbûne ji etnîsîte, dîn û mezheb bibihurin, bi tevahî weke çanda herêmî hebûn û şop hiştine. Nasnameyeke serê wê girtî ya şaristaniyê mîna li Japonya, Çîn, Hind û heta Brîtanyayê di jeoçanda Rojhilata Navîn de pêk nehatiye. Bêguman, tevî ku jeoçandên bi heman rengî li Efrîka û Emerîkayê hene jî bi qasî Rojhilata Navîn di asta şaristaniya navendî de pêşketî nînin. Hêmanên modernîteya kapîtalîst bi herdu meylên jeoçandên dîrokî yên herêmê re di nava pevçûn û nakokiyê de ne. Gelekî guftûgokirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn û bi ti awayî çaresernebûna wan, bi vê nakokiya kûr ve girêdayî ne.

Hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk civaka ekonomîk, ekolojîk, exlaqî û polîtîk, jeoçanda herêmê esas digirin. Ev jeoçand çi hêmanekî parçeker ferz nake. Berevajî alternatîfên hêmanên parçeker ên heyî pêk tîne.

Modernîteya demokratîk di têgihiştina netewe de nerm e. Bi perspektîfa avakirina neteweyê ne li ser bingehê ziman, etnîsîte, dîn û dewletê, belê di nava xwe de hêmanên pirr ziman, etnîsîte, dîn, mezheb û pêkhatinên siyasî digihîne hev û bi roleke mezin a çareserker radibe. Li dijî têgihiştina netewe ya li ser bingehê etnîsîte, ziman, dîn, mezheb û dewletê, modernîteya demokratîk bi têgihiştina neteweya hevgirtî a bi pirr hêmanan li jeoçanda Rojhilata Navîn hîmê biratî û aştiya pêdivî pê heye, bi awayekî pirr bi hêz datîne. Dikare bê gotin, mirov dikare ji hersê dînên mezin ên yek xwedayî, ji her cure ziman, etnîsîte û pêkhatinên siyasî muteşekil milletekî mezin ê herêmê, ango neteweya Rojhilata Navîn jî çêke. Çawa neteweyekî Emerîka (DYE), neteweyê Ewrûpayê (YE) heye, neteweyê Rojhilata Navîn jî dikare pêk bê. Bingehê çandî yê vê yekê ji herdu blokan zêdetir derfet û îmkanan dide, û bi hêztir e. Pirsgirêkên hindikayî-pirranî, parçebûna neteweyên mezin (Ereb, Tirk, Kurd, Fars), tecrîda neteweyên piçûk têne hesibandin (gelên Ermenî, Cihû, Suryanî, Qafqas) dikare bi têgihiştina neteweyekî bi vî rengî mezin û serê wî nerm, çareseriyên nêzî îdealê bêne dîtin.

Gelekî eşkere ye ku paradîgmaya neteweya demokratîk xwediyê wê kapasîte û naverokê ye, dikare şer û pirsgirêkên ku yekdestdarên

mêtinkar û desthilatdariyan bi awayekî hişk rê li ber wan vekiriye û zêhniyetên homojenker, şerker, milletperest, cinsperest, dînperest û pozîtîvîst ên dewleta netewe, ji holê rake.

Ya kapîtalîzm û îndustriyalîzm ferz dikin, ne bi tenê ekonomî û hawîrdorê li krîzan diqewimînin, li ser bingehê dewleta netewe parçe dikin û bi vî awayî gelekî zêde hatinê kêm dikin. Hêmanên ekonomîk û ekolojîk ên moderNîteya demokratîk van bandorên girîng û neyênî bi tenê ji holê ranakin, di heman demê de hevgirtina ku pêdiviya civaka ekolojîk û ekonomîk pê heye jî pêk tîne, derfet û îmkanan dide hatina herî zêde û çarçoveya zirara herî kêm bide jî pêşkêş dike. Derfet û îmkanan dide her cure yekîtiyên kominî yên ekolojîk û ekonomîk ên li dora kominên cotkarî-av-enerjiyê pêk bên, dîsa derfetê dide palpiştiya ku pêdiviya civaka ekolojîk û ekonomîk pê heye û çanda dîrokî ferz dike, pêşiyê li bêkariyê digire, xebatê azadbûn dihesibîne û rê vedike li ber nîzamekî bereketê mumkîn dike.

Hêmanên civaka exlaqî û polîtîk a moderNîteya demokratîk, ji hegemonya dewleta netewe ya fetîşîzma desthilatdarî û huqûqê diafirînin, dibihurin û bi vî awayî rê li ber pêşketina civaka demokratîk vedikin. Li şûna yekdestdariyên desthilatdar ên bi nasnameyên hişk û serê wan girtî yên jeopolîtîka herêmê parçe û bêber dikin, bi têgihiştina siyaseta demokratîk, nerm, serê wê li herêmê û heta nava dinyayê vekirî radibe, di nava hevgirtina xwe de cihêrengî û cudahiyan dihewîne û bi vî awayî xuşk û biratiya gelekî pêdivî pê heye, mumkîn dike.

**2-** Li ser bingehê van analîzên sereke, em dikarin der barê hevgirtin û yekbûna neteweyên demokratîk de pêşniyarên berbiçav bikin.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku moderNîteya kapîtalîst rê li ber wan vekiriye, di rabihuriya nêz de yekîtiyên mîna Pakta Bexdayê, CENTO û RCD (Rêxistina Hevkariya Herêmî ya Pêşdebirinê) ji ber sedemên wan ên binyewî, tê zanîn çareserker û temendirêj nebûn. Rêxistinên mîna Yekîtiya Ereb û Rêxistina Konferansa Îslamî RKÎ ku dixwazin hê jî li ser piyan bigirin, ji bo ti pirsgirêka girîng a herêmê çareseriya wan nîne û bê tesîr in,

û ev xusûs jî ji ber wesfê wan ê dewleta netewe tê fêhmkirin. Jixwe her dewleta netewe ya herêmê bi awayekî li gorî xwe bi navendeke hegemonîk a kapîtalîst ve girêdayî ye. Di wê kapasîteyê de nînin ku karibin derkevin derveyî navenda di bin kontrola wê de ne. Tevî ku civîn li ser civînê, civîna bilind li pey civîna bilind pêk tînin jî dîsa çareseriya wan nîne û bê tesîr in, ev jî bi vê rastiyê ve girêdayî ye.

Hêza çareseriyê ya modernîteya demokratîk der barê yekparetiya polîtîka herêmê de ji kapasîteya hêmanên çareserker ên dike bingeh, tê. Hêmanekî hundir ê li pêşiya polîtîka yekpare raweste, û bibe asteng nîne. Berevajî, di çarçoveya yekparebûna polîtîk de hêmanên polîtîk, exlaqî, ekolojîk û ekonomîk hemû dikarin civaka ekonomîk a ku ji dil dixwazin, ava bikin. Li beramberî destwerdanên hegemonîk ên ji derve yên modernîteya kapîtalîst, hêzên civakî yên herêmê hemû di nava yekparebûna polîtîk û hevgirtina wê de bi hêsanî û bi awayekî serketî, dikarin bersivê bidin û pirsgirêkan ji hev derînin, çareser bikin.

Ji lewra Komina Demokratîk a Rojhilata Navîn dikare weke pêkhatina siyasî ya komina kominan a di her qadê de were pêşniyarkirin. Hemin mirov nikare bi zêhniyeteke ku bi xwe çavkaniya pirsgirêkan e, pirsgirêkên Iraq, Îsraîl-Filistîn û Afganistanê yên di nava lepê zêhniyeta dewleta netewe de ne, çareser bike. Zêhniyetên dibin sedema pirsgirêkan bi nêzîkatiyên xwe yên pirsgirêkên civakî-siyasî yên li tevahiya herêmê di dused salên dawî de gelek zirar û ziyan kirin, û mirov ji van zirar û ziyanên wan kirî têra xwe dikare dersan bigire. Eşkere derketiye holê ku hem laîkê wê, hem jî dîndarê wê, bihêlin çareser bikin, ji astengkirina çareseriyê wêdetir bi ti rolê ranebûne.

Jeoçanda Rojhilata Navîn divê di jeopolîtîka wê de bê raberkirin. Ji bo vê jî çarçoveya herî di cih de eşkere ye ku wê komina demokratîk û konfederatîf be (Ez behsa federasyon û konfederalîzma dewletê nakim). Ji ber ku çiqasî komin û yekîtiyên cuda hebin, ji hemûyan re di çarçoveya konfederasyon û komina sereke de cih heye. Di çarçoveya vê nêzîkatiyê de mirov bi hêsanî dikare fêhm bike ku dewleta netewe çiqasî bi qusûr e, û li derve dihêle. Dewleta netewe di gotinê de xwe ‘serxwebûnxwaz’

dihesibîne, lê bi xwe jî bi hezar ta û benî bi navendên hegemonîk ên kapîtalîst ve girêdayî ye. Pirr girîng e ku mirov zanibe li astengên dewleta netewe nealiqe û bimeşe. Li her qada herêmê mirov dikare pêkhatinên siyasî damezrîne, lê divê rengê nasnameya hişk û serê wê li komên sivîl ên demokratîk, kominên ekonomîk û ekolojîk girtî daneyne, divê xwe weke serbixwe nehesibîne, felsefeya bingehîn gerdûnî-tekane weke prensîp esas bigire, hewce ye ji besîtê ber bi tevlîheviyê avahî û tevnên gelekî berfireh werin danîn û ev mumkîn e.

Yek ji navendên yekparebûna polîtîk a muhtemel bi Komina Cotkarî-Av-Enerjî ya Dîcle-Firatê ve girêdayî, ne li ser bingehê xirakirina Komara Tirkiyê, Komara Ereb a Sûrî (Sûriya Mezin, Lubnan, Urdun, Filistîn-Îsraîl jî di navê de) û Komara Federal a Iraqa îro, bi pêvajoyê re bi reforman bi veguherandinê weke yekîtiyekê were avakirin. Komarên heyî herçiqasî di destpêkê de naveroka xwe ya dewleta netewe biparêzin jî bi pêvajoyê re wê nerm bibin û veguherin nasnameyên serê wan vekirî yên dewleta netewe û bi vî awayî dikarin gav biavêjin nava yekîtiya demokratîk. Pêkhatina siyasî ya derkeve holê divê li demokrasiyeke ji ya DYE û YE'yê pêşketîtir vekirîbe. Ji ber ku wê giraniya hêmanên demokratîk ên komin hebe, ev yek ê wisa be. Tevahiya nasnameyên mozaîka herêmê pêk tînin, wê karibin di nava wê de cih bigirin. Berê pêşî ev nasname dikarin weke komikên neteweya demokratîk bêne avakirin. Avakirineke bi vî rengî wê rîska şerê çavkaniya xwe ji milletperestiya serê wê girtî, hişk, tek ziman û tek etnîsîte ya dewleta netewe digire nava xwe, dikare herî kêm bike. Rastiya jiyana di nava hev de ya bi hezarê salan tevahiya dîrokê dewam kiriye, wê mumkîn be ku were nûkirin.

Gelên çanda qedîm ên herêmê Ereb, Kurd, Ermenî, Cihû, Asûrî (Suryanî-Keldanî), Tirk, Tirkmen, yên bi kok Qafqasî, hin etnîsîteyên (êl û eşîr) bi kok Fars dema bi nasnameya neteweyê demokratîk bêne avakirin, hem ev ê bibe bersiva wan li gorî çanda wan a dîrokî, hem jî wê ji asêbûna parçe bike-bi rê ve bibe, pevçûn û şerên wê yên ku bi destikê modernîteya kapîtalîst dewleta netewe hatiye sorkirin, rizgar bibin. Ji ber ku ehemiyet û girîngiyê bi nasnemeyên nerm û serê wan vekirî didin, di nava xwe de

dikarin yekparebûn û hevgirtinên gelekî dewlemend û berdar pêşde bibin ango xuşk û biratiyê çêkin. Çawa ku di dîrokê de gelek mînakên wê hatine dîtin, ji bo nasnameyên dînî jî heman nêzîkatî dibe. Ji ber ku pirraniya wan xwediyê baweriyeke teolojîk a hevpar in, yekparebûn û hevgirtin hêsantir pêş dikeve. Dînên Brahîmî weke Mûsewîtî, Xirîstiyantî, Misilmantî bi tevahî mezheb û terîqetên xwe, çawa ku di dîrokê de gelek caran hatiye dîtin, bi têgihiştina nasnameya dînî ya nerm û serê wê vekirî, nêzî hev bibin û rê li ber sentezên bi xêrûbêr vekin. Di nava hevgirtin û yekparebûna siyasî ya siberojê de gera li pirr ziman û nasnameyan an jî sembolan bi netewe û welatê hevpar ve girêdayî, pirsgirêk nîne. Bajarîtî, xwecihtî û herêmtî, ji ber ku wê li gorî xisletên çanda dîrokî, weke nasnameyên demokratîk bi wesfên komikan bêne avakirin, ji cudahiyên heyî re wê weke mekanên sînerjiyê yên îdeal bi mane bibin. Rengê polîtîk û exlaqî yê van nasnameyan hemûyan wê esas be. Huqûq wê di xizmeta exlaq û polîtîkayê de be; wê şûna exlaq û polîtîkayê negire.

Konfederasyona Demokratîk (mirov dikare navên weke Federasyon, yekîtiyên demokratîk û hwd. lê bike) a weke navenda cazîbê ya herêmê were pêşdebirin, ji ber ku wê kominên ekonomîk û ekolojîk bike esas (ji ber ku erd-av-enerjî wekî din berdar nabin), li dijî sê suwarên mehşerî yên modernîteya kapîtalîst karperestiya kapîtalîst, îndustriyalîzma wê û li beramberî rewşa pevçûnan û şer, rewşa kaotîk û krîza avabûnê ya dewleta netewe rê li ber vekirî, wê bibe bersiva dîrokî û herî îdeal a bê dayîn.

Jeoçand û jeopolîtîka Kurdistanê (di nava Ereb, Tirk û Farsan de cih digire, li nuqteyekê ye, çand hemû li digihîjin hev) mîna ku yekparebûn û hevgirtineke siyasî ya bi vî rengî neçar û mecbûrî dike. Di dema modernîteya kapîtalîst de polîtîkayên hegemonîk ên Brîtanyayê li ser Hindistan û Rojhilata Navîn meşandin, Kurdistan timî bi statuya welatekî çareserî lê nabe hiştin û bi vî awayî kirin weke destikekî pê kontrola xwe li ser herêmê misêwa dewam bikin. Bi vî awayî ji bo otorîteyên desthilatdar ên Ereb, Tirk û Fars di kontrola xwe de bigirin, Kurdistan kirin destikekî gelekî bi kêra wan bê. Di roja me ya îro de bi DYE'yê re li Başûrê Kurdistanê ya jê re Bakurê Iraqê dibêjin, li ser parçeyekî wê yê piçûk bi

avakirineke dereng a dewletokeke netewe ya mîna Ermenistan û Yewnanistanê, dixwazin heman rolê dewam bikin.

Weke ku dîrokê pirsgirêka Kurd û Kurdistanê veguherandibe duyemîn pirsgirêka Cihûyan. Herî kêm îro pêvajoyeke bi vî awayî dimeşe. Bêguman di vê de polîtîka modernîteya kapîtalîst a afirandina dewleta netewe ya newekhev, bi rola diyarker radibe. Dewletdariya netewe ya Ereb, Tirk û Fars jiholêrakirina Kurdistanê û qurbankirina Kurdan ferz dike. Di sêgoşeya îmhayê ya bi vî rengî de mirov bi dewlotekeke netewe ya Kurd a mînîmal bersivê bide, nabe. Eger bersiveke weha bê dayîn jî weke ku hê gelekî pêk tê, wê bi komkujî û qirkirinan bi encam bibe. Ji vê paradoksa dîrokî dersa divê were girtin ew e ku divê bi pêkhatinên siyasî yên demokratîk ên nebûne dewleta netewe de, bi kominên ekonomîk û ekolojîk, di serî de neteweyên cîran gelên herêmê hemûyan di çareseriya modernîteya demokratîk de bike hevpar û tevlî vê çareseriyê bike.

Wexta mirov guh bide dîrokê, mirov ê bibîne li newalên Dîcle-Firatê li Kevana Bi Bereket serdema neolîtîkê ya panzdeh hezar salî, şaristaniya navendî ya pênc hezar salî û çanda modernîteyê ya dused salên dawiyê tişta bi mirov didin hiskirin pêkhatinên siyasî yên yekpare û hevgirtî ne. Otorîteyên siyasî yên bi navê Sumer, Aqad, Gotî, Asûr, Hûrrî, Mîtannî, Ûrartû, Hîtît, Med, Pers, Helen, Sasanî, Bîzans, Emewî, Ebbasî, Selçûqî, Moxolî, Osmanî û dijberên wan ên her hebûn, otorîteyên demokratîk ên bi heman navî yan jî bi navên cihê pêk hatin, timî pêkhateyên siyasî yên yekpare û hevgirtî bûn. Jixwe otorîteya dayikî ya serdema neolîtîkê ya bi cihêkariyê nizane û koletiyê nas nake, cewherê pêkhatinên wekhevî, exlaqa xwezayî û polîtîk e. Di dused salên dawî de provakasyên dewleta netewe yên bi şer û bi parçekirinê yên navend Ewrûpa, di nava vê pêvajoya dirêj a dîrokî de kiteyeke piçûk e. Ji bo dîrok careke din karibe di cironeka xwe ya sereke de li gorî rastiya xwe ya jeoçand û jeopolîtîk biherike, divê li ser mîrateya şaristaniya demokratîk modernîteya demokratîk were pêşdebirin.

Li dijî pirsgirêkên mîrateya dîrokî ya dewlemend a şaristaniya Rojhilata Navîn xistine serhev û li dijî krîz, şer, tevkujî û qirkirinên rojane, gava

hevpar a pêşî ya çareseriyê ya divê bi awayekî berbiçav bê avêtin, dikare proje û fikra Konfederasyona Demokratîk a Dîcle-Firatê be. Projeyeke bi vî awayî di navbera neteweyên pirranî mîna Ereb, Tirk, Kurd û Fars û neteweyên hindikayî û çandan de pêvajoya bi şer û asîmîlasyonîst berepaş bike bi pêkhatinên siyasî yên demokratîk komin û piştgiriyê, dikare bibe sedema hevpariyên ji dewleta netewe wêdetir. Projeya Konfederasyona Demokratîk a Dîcle-Firatê, li gorî rêveçûna vê dîrokê wê bibe gaveke herî girîng û pêşî ya were avêtin. Ez qet şik û gumanê jê nabim ku bi vê projeyê kominên civaka demokratîk, ekonomîk û ekolojîk ên bi awayekî berfireh û gav bi gav bêne pêşdebirin, wê di buhaya zêr de Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk li gorî dîrok û çanda wê bide destpêkirin. Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk wê hem bibe hişyarbûna dîroka qedîm, hem jî bibe bextewarî û qêrîna jiyana azad a dîroka nû.

Dema mirov di çarçoveya vê projeya sereke de li rastiya Rojhilata Navîn binêre, derfet û îmkan çêdibe behsa hin projeyên di dereceya duyemîn de bike. Çawa di serdema neolîtîk û şaristaniyê de her pêk hat, li serê rojava yê Kevana Bi Bereket ê xwe dirêjî Misr û Bakurê Efrîkayê dike, mirov dikare li Misr an jî navend Lîbyayê (navend Geliyê Nîlê) Projeya Konfederasyona Demokratîk a Bakurê Efrîkayê bi pêş bixe. Li serê rojhilatê Kevana Bi Bereket navend Pencab Projeya Konfederasyona Demokratîk a Rojhilatê Îranê, li Afganistan û Pakistanê (ev navên dewletên netewe li gorî jeoçand û jeopolîtîkê di cih de nînin) xwedî rewşeke lezgîn e. Di Modernîteya Demokratîk a Rojhilata Navîn de duyemîn projeya din a manedar divê mirov bifikire, li serê rojhilat navend Ozbekîstana îro li ser Geliyên Seyhûn û Ceyhûnê wê Konfederasyona Demokratîk a Asya Navîn be. Li Başûrê Erebistanê cemaet û qebîleyên hê gelekî şên û bi hêz hene, ji lewra mirov dikare weke projeyeke din a manedar li Konfederasyona Demokratîk a Başûrê Erebistanê bifikire.

Ji tevahiya van projeyan hemûyan, mirov dikare weke utopyayekê li projeyeke mezin ango li Projeya Modernîteya Demokratîk a Rojhilata Navîn bifikire. Bêguman ev proje ji Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a Emerîkayê DYE’yê zêdetir rastî xuya dike. Ya rastiya projeyekê diyar dike,

bingehê wê yê çandî û plana dîrokî ya li pişt wê ye. Wexta mirov li berê herikîna sereke ya serdema neolîtîk û şaristaniyê binêre, wê qebûl bike ku bingehekî welê yê dîrokî û çanda hevpar pêk hatiye. Di çanda Rojhilata Navîn de yekîtiyên bi awayê Yekîtiya Ewrûpayê ji utopya û projeyê wêdetir, li her qada krîz û şer, parçebûn û xerîbketin, lêgerînê neçar dikin rastiyên jiyanê yên gerdûnî-tekane ne, divê gav bi gav bêne avakirin.

Bêguman ev proje niha her yek ji wan utopyayek e. Lê bingehên wan ên dîrokî û civakî bi hêz in. Divê neyê jibîrkirin, bêyî utopyayên mezin pratîkên jiyanên mezin pêk nayên. Çanda Rojhilata Navîn utopya cennet û cehennemê diyarî mirovatiyê kiriye û çandeke welê ye, bi destana nivîskî ya pêşî bi Destana Gilgamêş beriya bi hezarê salan timî li gihayê nemiriniyê geriyaye. Ez niha fêhm dikim ku jiyana dikare bi jina azad pêk bê, nifşên Gilgamêş ên bi nexweşiya desthilatdariyê ew wenda kirî, ev jiyana timî li pey wê ne, ne bi tenê bi awayê nemiriniyê, di pêvajoya jiyana rastî de jî wê nikaribin wê bibînin. Ji ber ku mirov tiştekî li çi deverê wenda bike, dikare li wir bibîne. Li cem cinsê mirov volkanê jiyana mezin li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê, li geliyên Dîcle-Firatê teqiya. Jiyana bi heybet û balkêş li vir hilat; li Kurdistanê weke Jin û Jiyan pêk hat. Jiyana di nava hezarê salan de pêk hat, bi derketina holê ya hiyerarşî û desthilatdariyên dewletan di rewşa berçav a Jin û Jiyanê de li heman mekanî hat wendakirin.

Piştrast bûye ku destan hemû kopiyên Destana Gilgamêş in. Tesewirên cennet û cehennemê tev bi van jiyanên pêkhatî û wendakirî re têkildar in. Nexweşiya desthilatdariyê, bi rastî jiyanê dikuje. Bi serwextbûna li vê rastiyê, divê mirov zanibe, projeya Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk di heman demê de projeya wê rastiyê ye ku li devera jiyan bi nexweşiya desthilatdariyê hat wendakirin, jiyana jina azad a nebû desthilatdar weke civaka ekolojîk û ekonomîk ji nû ve hatiye keşifkirin û dîtin. Her proje di heman demê de utopya paşerojê ye. Civaka Demokratîk û Moderníteya Demokratîk di nava cudahiyan de utopya pêkhatî ya paşerojê ne (di nava cudahiyan de bi awayekî azad û wekhev).

Ji bo yên xwedî utopya jiyana azad û mezin, şertê şêwazekî jiyanê heye yê ku dema mirov lê bigere dikare li herêmê gelek mînakên wê bibîne. Ew jî ev e: ji bo heqîqeta civakbûnê mumkîn dike, tu yê bijî. Tu çiqasî heqîqetê bibînî, tu yê karibî ewqasî bijî. Tu çiqasî heqîqetê belav bikî, tu yê karibî ewqasî civaka exlaqî û polîtîk ava bikî. Ji bo vê yekê jî tu yê li dijî astengiyên hundir û derve yên derkevin pêşberî te, rast têbikoşî. Li Rojhilata Navîn Akademiya Zanyartiyê timî bi vî awayî dibêje. Îradeya jiyanê ya bi vê vegotinê azad dibe, timî wisa dike!

## D- DI CIVAKA ROJHILATA NAVÎN DE HIN PIRSGIRÊKÊN ROJANE û RÊYÊN ÇARESERIYÊ YÊN MUHTEMEL

Ji ber ku hewcedarî pê heye, ez gelekî li ser têkiliya xurt a di navbera **niha** yan jî **aktualîte** û **dîrok**ê de radiwestim. **Rojane**ya berçav a ji **dîrok**ê qut û **niha** ya pêk tê, analîza wan çiqasî li şaşiyan vekirîbe, analîza dîroka nebe niha jî ewqasî li şaşiyan vekiriye. Rastiya rewşa **niha** ya bê dîrok gelekî kêm tê fêhmkirin. **Dem** herdem hêmana avakirina rastiyê ye. Rastiya bê dem hebe jî lê nayê fikirîn. Ev belkî jî sirra jê re mutleq tê gotin e. Di rastiya civakî de qabîliyet û hêza avakirina demê, bi qasî prensîpeke bingehîn bi qedr e. Fêhmkirina rewşa jiyana civakî ya weke mohlet ku bi demê sînorkirî ye, divê sosyolojî wê bike mijara sereke ya ji heqê wê were. Qusûra herî mezin a felsefeya analîtîk, belkî jî xirabiya wê ew e, mîna ku zanisteke civakî ya bê dîrok mumkîn be, analîz kirine. Li beramberî vê rêbaza jê re bêdîroktî tê gotin, li **niha**'yê serwext nabe, fikra zêde determenîst a bûyeran ji tekîtiyên dîrokî dihesibîne, nikare li derfetên niha dibexşîne, weke pêşketina azad û nûtiyê serwext bibe. Îradeya mirov dikare li nihayê destwerd e. Mirov heta afirêneriya awarte ya nihayê di warê kêlî yan jî anê de fêhm neke, ti avakirina civakî ya xweser pêk nayê. Ji bo mirov nebe bêîradeyekî di bin fermana dîrokê de, ne jî bibe bêpirsiyarekî nihaya ji dîrokê qut, dikare bibe îfadeyeke prensîp a

heqîqeta civakî û jiyana wê. Gotina ‘dev ji rabihuriyê berde’ çiqasî gotineke şaş û bêberpirsiyarî be, gotina ‘li paşerojê binêre’ jî ewçend şaş û bêberpirsirî ye.

Xwezaya civakî ya Rojhilata Navîn nihaya wê lawaz e, dîroka wê jî gelekî mezin e. Ev jî nakokiya wê ye. Nihaya herêmê li pêşiya dîroka wê ya mezin mîna xefikekê hatiye danîn, hûnandin. Çiqas nirxên dîrokî hebin xistine vê xefikê û bi vî awayî wan bê tesîr dikin. Ji bo mirov pêşiyê li vê dîroka mezin a herêmê veke, divê mirov ji vê xefika hatiye danîn û hûnandin, bibihure. Maneyeke din nihayê jî qabîliyeta wê ya çareserkirina pirsgirêkan e. Dîrokê çiqas pirsgirêk dabin serhev û komkiribin, hemûyan weke lodekê datîne pêşiya nihayê. Niha jî ji wê loda van pirsgirêkan ên karibe çareser bike, dineqîne û hewl dide veguherîne jiyaneke bêpirsgirêk, yên nikaribe çareser bike jî ji nihayên paşê re dihêle.

Çareserkirina pirsgirêkan bi rast pênasekirina wan ve ji nêz ve girêdayî ye. Cudahiya hebûna bûye mijara pirgirêkê û hebûna hatiye analîzkirin ew tişt e ku nihayê ew bi awayekî erênî ava kiriye; ango tişta bi pirsgirêk pêk tê vediguhere tişta analîzbûyî. Min beşekî mezin ê parêznameya xwe ji bo rast pênasekirina xwezaya civakî ya li Rojhilata Navîn pêkhatî, veqetandibû. Ez yeqîn dikim ku di van parêznameyan de analîzkirina nirxandinên teorîk û ezmûnên pêkhatî, pirsgirêkên civakî û rêyên çareseriyê yên muhtemel têra xwe rohnî û zelal dike. Ez ê hin pirsgirêkên hatine rohnîkirin û rêyên çareseriyê yên muhtemel bi rewşa wan a heyî kitebikite pêşkêş bikim û bi vî awayî parêznameya xwe ya der barê Rojhilata Navîn de bi encameke kurt temam bikim. Bawer dikim ku bi vî awayî wê hîn bike û bikêrhatî be, li hewldanên di vî warî de zêde bike û alîkariyê bike.

## 1- Pirsgirêkên Neteweyên Pirranî û Hindikayî ne, û Çareseriyên Muhtemel

Mirov dikare behsa çar neteweyên pirranî yên Rojhilata Navîn bike. Ev neteweyên Ereb, Tirk, Kurd û Fars in. Li şûna gotina mezin min pirranî bi kar anî, sedema vê jî bi demografyayê re têkildar e. Naxwe cudakirina neteweyan weke mezin-piçûk ji aliyê etîk ve rast nîne. Têgîna neteweya hindikayî jî bi demokrafyayê re têkildar e. Hindikayî-hindikbûn qusûrek nîne, yan jî sedemeke piçûkbûnê nayê hesibandin ango ev li gorî etîk û heqîqeta civakî ye.

Wexta li ser pirsgirêkên neteweyî radiwestim, divê ez bi girîngî cudahiya xwe di mijara rêbazê de destnîşan bikim. Her ku diçe diyardeya neteweyî zêdetir derdixin pêş û ev jî bi pêşketina modernîteya kapîtalîst ve ji nêz ve girêdayî ye. Diyardeya neteweyî di pêkhatina yekdestdariyên îdeolojî, desthilatdarî û sermayeyê de diyardeyeke stratejîk e ku divê derxin pêş. Vê diyardeyê zêde mezin dikin û dinepixînin, ji ber ku ev pêdiviyeke vê stratejiyê ye. Di analîzkirina diyardeya neteweyî de mirov dikare behsa du nêzîkatiyên şaş û kêm ên bingehîn bike. Ya pêşî, nêzîkatiya pozîtîvîst e ku xwe disipêre cihêkirineke vebirrî ya obje-sûbje ya felsefeya Descartes. Xisleta diyardeyî ya pozîtîvîzmê tê zanîn. Şaşiya wê ya bingehîn ew e, diyardeya netewe jî mîna diyardeyeke fizîk, kîmya û biyolojiyê bi temamî bi rengekî objektîv dihesibîne. Ev helwest ji sedî sed guh nade kirdartî û nermtiya di xwezaya civakî de ye. Pirsgirêkên neteweyî heta bi qirkirinan diçin, ev bi têgihiştina nasnameya neteweyî ya hişk, serê wê girtî û tûj re gelekî ji nêz ve têkildar e. Objekirina hem xweza hem jî civakê di pêşketina kapîtalîzmê de qonaxa herî girîng a îdeolojîk e.

Divê baş bê fêhmkirin ku şoreşa mezin a pêşî ya modernîteya kapîtalîst di qada zêhnî de bi vê cihêkirina obje-sûbjeyê, weke şoreşa felsefî-îdeolojîk pêk hatiye. Yek ji têgînên ku şoreşa îdeolojîk a modernîteyê herî zêde derxistiye pêş, neteweperestî ye. Hilbijartina vê têgînê vala û tewş nîne. Ev têgîn prensîpa sereke ya teolojiya kapîtalîst e. Neteweperestî û

dewleta netewe ya ku wê hê bi pêş bixin têgîna herî girîng a xwedayî ye, heta li ser rûyê erdê wê xweda bi xwe be. Li Akropola teolojiya pozîtîvîst xwedayê herî mezin, ji sedî sed wê weke neteweperestî û dewleta netewe cihê xwe bigire. Xwedayên din ên modernîteyê wê li gorî rêza girîngiya xwe û kêrhatinên xwe yên sîstemê, cihê xwe bigirin. Teolojiya pozîtîvîst bi qaşo zanistiyê diyardeya netewe û dewleta netewe zêde nepixand û li şûna diyardeya ummeta dînî bi cih kir, ji lewra vê carê li şûna pirsgirêkên dîn û mezheban şer û pirsigirêkên neteweyî cih girtin. Hem jî rê li ber pêvajoyeke bi qirkirin û şerên xwînrij tijî vekir. Divê mirov baş zanibe ku pozîtîvîzm îdeolojiya pîroz a kapîtalîzmê ye.

Duyemîn nêzîkatiya şaş di bin navê 'kirdarîtî, zêde manedanê' de tê raberkirin. Di serî de diyardeya neteweyî, ev têgihiştin hewl dide gelek diyardeyên di dema modernîteyê de derketine holê weke vedîtinên xeyalî û fantastîk pêşkêş bike. Weke vedîtina rêûresmê têgihiştineke şîroveker bi pêş dixe. Bêguman diyardeyên civakî bi sedema di karektera Xwezaya Duyemîn de ne, derfet û îmkanê didin ku bibin diyardeyên vedîtî. Lê di vê çarçoveya destdana derfet û îmkanan de bi şik û guman nêzîkbûna nirxên hebûnî yên diyardeyên civakî û mîna lîstikên zêhnî li wan temaşekirin, herî kêm bi qasî nêzîkatiya objektîv rê li ber encamên şaş û divê mirov xwe jê dûr bigire vedike. Îcar di vê rewşê de diyarde li şûna nirxên objeyî yên hişk û vebirrî ji têgînên xeyalî, ber bê dikevin diçin û hebûna wan pirr nediyar, têne hesibandin. Bi vê jirêderketina duyemîn a ciddî ya di navbera rastî û heqîqetê de xwe gihandina encamên zanistî, mumkîn nîne. Sûbjektîvîte, şêweyê nû yê îdeolojiya modernîteya baweriya wê bi xwe nemayî ye ku di postmodernîteya dereng de pêketiye. Îfadeya postmodernîteyê ya objektîv e. Weke encam mirov dikare bibêje, pirsgirêkên civakî weke pirsgirêkên xeyalî dîtin û bi seansên rojane yên terapiyê (rêbazên derûnî û psîkolojîk) ji bo çareserkirinê hewldan, qonaxa ev nêzîkatî gihiştiyê nîşan dide, ku jiyan bi xwe têkçûna xwe rojane piştrast dike.

Mirov heta sîstematîka avahî û diyardeyî ya dema modernîteya kapîtalîst hûrûkûr fêhm neke, gelek zor û zehmet e ku li pirsgirêkên civakî

yên rê li ber wan vekiriye serwext bibe û wan çareser bike. Pirsgirêka krîtîk a sîstematîkê, têkiliya di navbera diyarde û têgihiştinê de ye. Nêzîkatiyên cudatî û wekhevtiyê yên di navbera diyarde û têgihiştinê de têne danîn, gelekî bi pirsgirêk in. Ev jî rewşek e ku bi cewherê sîstemê re têkildar e. Sîstem bi tevahî felsefeya xwe li ser cudatî û wekhevtiya di navbera diyarde û têgihiştinê de ava dike û rabûna di bin vî barî de mumkîn nîne. Felsefeya sîstemê bi ekolên xwe hemûyan, di nava xwe de xwedî çareserî nîne.

Ez bi xwe alîgirim ku mirov çareseriyê li derveyî cudatî û wekhevtiyê bigere. Diyarde û têgihiştin bi dualîteya di bingehê gerdûnê de têkildar e. Dualîteyên mîna madde-enerjî, avahî-kêrhatîbûn, perçik-pêl di navbera têgihiştin û diyardeyê de jî dibin. Li gorî vê yekê, ev dualîte şêweyê di navbera beden û ruhê mirov, gerdûn û zêhnê wê de pêk tê, îfade dike. Bi temamî serwextbûna zêhn li gerdûnê, dikare mirov ber bi têgîna zanîn û agahiya mutleq ve bibe. Doktrînên weke Fenafîllah, Nîrwana, Enel-Heq, Zanîna Mutleq (Hegel) bi vê îdeayê radibin. Ev encameke nêzî mumkîn nebûnê xuya dike. Bi temamî cudabûna têgihiştin û diyardeyê jî qutbûna tayê di navbera zêhn û rastiyê de û derketina derveyî heqîqetê îfade dike. Awamî, kesên fikra wan kêm pêşketiye digire nava xwe. Zêhniyetek e ku para xwe ya heqîqetê gelekî lawaz, nirxa xwe ya avabûn û avakirinê gelekî kêm e.

Di rewşa pêkhatina zanîn-agahiya mutleq de dualîteya têgihiştin-diyardeyê ji holê rabe, ev jî tê wê maneyê ku hadîs (qewimîn) ji holê radibe. Bi temamî jihevqutbûna têgihiştin û diyardeyê jî xerîbketineke tam îfade dike. Agahî û zanîna felsefî ji cewherê agahiya hebûna navbera van herdu seriyan û mentiqê wê pêk tê. Divê mirov di navbera herdu seriyan de ber bê nekeve. Ya ji vê jî girîngtir ew e, gera li heqîqetê, bêyî ku mirov ber bi seriyekî ve bişemite, zanyartî, hozanî û helwesta felsefî îfade dike, jixwe helwesta rast jî ev bi xwe ye.

Eger em careke din li pirsgirêka neteweyî vegerin, bi vê analîza kin a felsefeyê em ê têkiliya vê pirsgirêkê bi karekterê hegemonîk ê zîhniyeta modernîteya kapîtalîst a dused salên dawî re baştir fêhm bikin. Netewe ji

tinebûnê, weke xeyalî nehatiye vedîtin. Lê kes nikare înkar bike ku bi awayekî zêde nepixandî û mezinkirî netewe weke cawekî îndustriyal li xwezaya civakî hatiye kirin. Civaka neteweyî ya li şûna ummeta dînî hatiye îqamekirin, bi şertê ku mirov bi herdu seriyan ve neşemite, dikare di zanista civakî de bike mewzûbehs. Ji bo ku mirov têgîna civaka neteweyî di çarçoveya zanista civakî de bigire, divê ji modernîteya kapîtalîst bibihure. Heta ji modernîteya kapîtalîst neyê bihurîn, civaka neteweyî wê ji bûyîna perdeya banê yekdestdarên mêtinkarî û zordestiyê wêdetir, ti maneyê îfade neke.

Di paradîgma modernîteya demokratîk de ji bo bihurîna ji avahiya bi pirsgirêk a têgînê, têgîna dijber a hatiye çêkirin, têgîna neteweya demokratîk e. Têgîna civaka neteweyî bi paqijkirina ji herdu seriyan û bi rizgarkirina wê ji îstîsmarkirina modernîteya kapîtalîst, bi têgîna neteweyê demokratîk dibe. Di çarçoveya hêmanên modernîteya demokratîk de avakirinên civakî pîvanên neteweyî esas nagirin. Çawa ku berê hatibû diyarkirin di modernîteya demokratîk de, rola sereke nadin berjewendiyên neteweyî; zêdetir karekterê exlaqî û polîtîk ê civakê tê destnîşankirin. Ji bo ji nû ve avakirina têgîna herî di cih de, li şûna dewleta netewe, komintiya demokratîk e.

Li Rojhilata Navîn di meseleya netewe de zêde destnîşankirina netewetiyê çiqasî neyênî be, aliyê civakbûnê yê netewe jî paşguhkirin ewçend pirsgirêkê giran dike. Mirov bi kîjan pirsgirêka netewe dakeve bila dakeve, weke rêbaz divê ji bo neketina van herdu şaşiyan tedbîr bêne girtin û paşê du nêzîkatiyên din ên erênî divê derxe pêş ku ew jî aliyên din ên girîng ên rêbazê ne. Ev îdeolojîk nînin, nêzîkatiyên zanistî ne; ne bi armanca desthilatdariya dewleta netewe, xwedî nêzîkatiya neteweya demokratîk û komintiya demokratîk in. Naveroka herdu nêzîkatiyan ji hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk pêk tên.

Di civakên Rojhilata Navîn de meylên dewleta netewe û milletperestiya di dused salên dawî de hatine hişyarkirin, weke ku tê îdeakirin rê li ber çareserkirina pirsgirêkên neteweyî venake, berevajî dibe sedema mezinbûna pirsgirêkan û dagirkirina tevahiya komik û çaviyên civakî.

Sermaye li şûna reqabeta erênî şerê dewleta netewe yê texrîbkar ferz dike. Rewşa şer a di avahiyên hundir ê civakan de û di têkiliyên wan ên derve de pêk tê, sedema bingehîn a pirsgirêk, krîz û rewşa kaotîk e. Wexta ku ezmûnên tevahiya pirsgirêkên neteweyî yên li herêmê pêkhatî bêne lêkolan, destnîşankirina vê rastiyê zor û zehmet nîne.

Moderníteya demokratîk a ku armanca wê yekdestdariya desthilatdariyê (dewleta netewe) nîne, bi têgîna neteweya demokratîk weke alternatîfa kapîtalîzmê bi teoriya komintiya civakparêz modela îdeal e, wê bike ku herêm êdî ne qada şerên xwînrij, tevkujî û qirkirinan, kaosê û krîzên domdar be.

**a-** Hêmanên bingehîn ên pirsgirêka neteweyî ya Ereb giran dikin, civakbûna Ereb misêwa parçe dikin, wan ji nirxên wan ên cewherî re xerîb dikin, bi şeran wan diqedînin û nirxên wan ên maddî dadiqurtînin, dewletên netewe ne ku hejmara wan ji bîstan bihurîye. Ev dewletên netewe ku nikarin di nava xwe de konfederalîzmekê jî pêk bînin, pirsgirêka neteweyî ya Ereb bi xwe diafirînin. Bi van ve girêdayî milletperestiya dînî û ezbet-qebîlegirî, cinsperestiya civakî ya bi serweriya mêr qada civakî bi tevahî reş û tarî dikin, difetisînin, dikin ku bêhnê lê diçikînin. Civakê bi awayekî dijwar mehkûmê koletî û muhafezekariyê dikin. Li ser navê Ereban çi li hundir û çi jî li derve şensê nade çareseriyê.

Ji bo pirsgirêkên Ereban divê li modeleke çareseriyê ya berfireh a li ser hîmê neteweya demokratîk û komintiya civakparêz were gerîn. Hêza Îsraîla reqîb bi tenê ji hegemonyadariya dinyayê nayê; di hundir de saziyên komintî û demokrasiyê jî di vê hêzbûnê de xwedî roleke girîng in. Civaka neteweyî ya Ereb a ku sedsala xwe ya dawî bi milletperestiya radîkal û Îslamtiyê bi avê de berda, dikare bi komintiya di dîroka xwe de û bi nîzamê qebîletiyê ku jê re ne xerîb e, bi têgihiştina neteweya demokratîk re bike yek û bi vê, ji xwe re rêyeke rizgariyê û çareseriyeke demdirêj û ewle bibîne, xêz bike.

**b-** Li Rojhilata Navîn neteweyekî din ê pirraniyeke girîng pêk tîne Tirk û Tirkmen in. Li gorî Ereban tevî ku belav in, xwedî têgihiştinên

desthilatdarî û îdeolojîk ên bi heman rengî ne. Bi awayekî hişk li dewletdariya netewe xwedî derdikevin, zêde bi milletperestiya ezbet û dînî ve xwe digirin. Pîroztiya dewlet û xwedê jî weke milletperestiya ezbet û dînî di zikhev de pêk tên. Di nava kategeriyên Tirk û Tirkmenan de cudahiyên girîng ên sosyolojîk hene. Li hemberî arîstokrasiya Ereb Bedewî di çi rewşê de bin, Tirkmen jî bi awayekî parelel li hemberî arîstokrasiya Tirk a xwedî desthilatdarî-dewlet di heman rewşê de ne. Tirkmen ew beş in ku berjewendiyên wan bi komintî û demokrasiyê re li hev dikin.

Pirsgirêkên neteweyî yên Tirkan hê zêdetir bi hecm in. Ji Tirkên Ûygûr ên li Çînê heta bi yên di bin hegemonya Rûsyayê de, gelek Tirkên xwedî dewlet û otonom, ji Tirkên Komara Tirkiyê yên li Anatolyayê heta bi yên li Balkan, Qafqasya û Rojhilata Navîn, heta bi Tirkên li Ewrûpayê li cem tevahiya wan pirsgirêka neteweyî heye. Me gotibû çavkaniyên pirsgirêkan mîna hev in. Nexweşiya desthilatdariya dewleta netewe, milletperestiya zêde ya ezbet-dînî û cinsperestiya civakî ya bi serweriya mêr, civakên Tirkan jî reş û tarî dikin, muhafezekar dikin. Civak, meylên komin û demokratîk ewqasî ji renê xwe bûnemîna ku di nava yekdestdariyên hegemonîk îdeolojîk û zêde dewletdar de heliyane. Malbat bi xwe jî ne ya civakê, kirine mîna şaneyeke dewletê. Her sazî û ferd dewletê teqlîd dike. Ev meylên dîrokî di navbera komên Tirk û Tirkmenan de rê li ber şerên dijwar ên desthilatdariyê vedike. Bi siyaseta fethê di nava civakên din de jî şerên bi heman rengî yên desthilatdariyê diqewimin.

Hişkbûna îdeolojiya fermî û avahiyên desthilatdar ên navendparêz ên hişk, di pirsgirêka neteweyî ya Tirk de şensê rêvekirina li ber pêşketin û çareseriyê nedane meylên demokratîk û komin. Peyama dane civakê ew e, bê dewlet nikarin bijîn. Civak û ferd nikarîbûye bi dewletê re bikeve weznekê, timî di rola zarok û koleyê dilsoz ê dewletê de maye.

Di roja me ya îro de ji bo komên neteweyî yên Tirk, teoriya modernîteya demokratîk çarçoveya herî di cih de pêk tîne. Projeya Konfederasyona Tirk a Demokratîk a bingehê xwe civak e, hem di nava xwe de dikare yekpare be, hem jî di zikhev de dikare bi cîranên xwe re di nava aştî û yekparebûnê de derfet û îmkanê bide jiyaneke hevpar û ji bo vê yekê fikreke îdeal e, û di

cih de ye. Ji bo yekîtiya civakî girîngiya berê ya sînoran nemaye. Tevî sînorên mekanên cuda, derfet û îmkanên ragihandinê dikarin kom û ferdên li her qada dinyayê bigihînin hev û yekpare bikin. Projeya Konfederasyona Demokratîk a komên neteweyî yên Tirk ji bo aştiya dinyayê û sîstema modernîteya demokratîk wê gelekî bi kêr bê.

**c-** Civaka neteweyî ya Kurd çavkaniya xwe ji potansiyeleke dewlemend a nû pêş dikeve digire. Li dinyayê gelê herî mezin ê bê dewleta netewe ye. Tevahiya dîrokê di serdemên neolîtîk û şaristaniyan de timî li qadeke stratejîk zêde bûye. Di xweparastin û bergiriyê de Kurdan xwe spartiye çiyan û bi saya çanda xwe ya xwedîkirina bi heywên û cotkariyê weke gelekî otantîk heta roja me ya îro hebûna xwe parastiye. Cihûyên li dinyayê belav bûne çawa li her quncika dinyayê bi awayekî xwevedizî di qadên jor ên civakên din de cih girtine û hebûna xwe heta roja me ya îro anîne, Kurd jî berevajiyê wan ji cihûwarê xwe hîç neliviyane û çav ber serê ti civakeke din nedane, xwe di binî de ragirtine (di plana duyemîn de) û xwe gihandine heta roja me ya îro. Di navbera wan de tam paradoksek heye.

Pirsgirêka neteweyî ya Kurd pirsgirêkeke welê ye ku gelekî kêm tê dîtin. Destûr nehatiye dayîn bibin netewe. Çavkaniya pirsgirêkê jî ev e. Tevahiya dîrokê û roja me ya îro hêzên hukim li Kurdan dikin û dûvikên wan ên hundir, ji bo Kurd ji objebûnê dernekevin û nebin sûbje, çi rê û rêbazên nehatine ceribandin nehiştine. Dewletbûyîn bi maneya erênî yan jî neyênî belkî hinek tişt li pêşketina neteweyî zêde kiribin. Lê ji bo Kurdan derfeteke bi vî rengî kêm caran hatiye dîtin. Ango Kurd xwedî cihêwazî ne ku şaristaniya çînî û dewletdar pirr kêm dîtine û qebûlkirine. Ji bo şensê modernîteya demokratîk, ev cihêwaziyeke gelekî girîng e. Li navenda cografya Rojhilata Navîn bicihbûna wan, girîngiya wan zêde dike. Di dema modernîteya kapîtalîst de serweriya dewleta netewe ya ji derve hatiye ferzkirin, bi qasî ku hêza wê têrê kiriye, xwestiye bi qirkirina çandî û car caran bi fizîkî qira Kurdan bîne û wan di nava xwe de bihelîne. Di dema şaristaniya Îslamê de jî xwestine heman polîtîkayê bi rêya dîn rewa bikin. Kurd bi hêza dewlet-desthilatdariyê ji bo bibin civaka neteweyî zêde

xwedî şens, derfet û îmkan nînin. Ji vî alî ve tiştên hêmanên modernîteya kapîtalîst pêşkêş bikin, gelekî bi sînor û kêm in. Di roja me ya îro de jî ji pêkhatina siyasî ya li Kurdistana Iraqê mirov tam nikare bibêje dewleteke netewe ye. Mirov wê weke nîv dewleta netewe bi nav bike wê di cih de be.

Hindikayî bin jî cografya Kurdistanê, nexasim jî di rabihuriya nêz de, di serî de ji bo Ermenî û Suryaniyan, ji bo hin gelên din, niştimana dayik e. Yên ji Ereb, Fars û Tirkan jî hatî, gelek ji wan li vir bi cih bûne. Ji aliyê dîn û mezheban ve jî li ser vê cografyayê Kurd pirranî ne. Di çanda Kurd de şopên zêde xuyayî yên çandên êl û eşîran hê hene. Çanda bajêr zêde pêş neketiye. Ev xislet hemû li ser cografya Kurdistanê şensekî mezin didin pêkhatina siyaseta demokratîk. Qadên cotkarî-av-enerjiyê ji bo yekîneyên kominî hem îdeal in, hem jî ev yekîne xwe weke pêdiviyekê ferz dikin. Şert û mercên pêşketina civaka exlaqî û polîtîk jî têra xwe li cih in. Herweha çanda xwedawend-dayikê berê pêşî û bi awayekî herî bi hêz li vê cografyayê pêk hatiye. Zemînê bingehîn ê çanda xwedawend-dayikê ye ku bi navên Star, Îştar û Înannayê li tevahiya Rojhilata Navîn û dinyayê belav bûye. Tevî hemû hewldanên qedandin û qelandinê yên li ser hatin meşandin, jin xwedî potansiyel e ku bi wêrekî, têkoşerî û rûmetî mînakên jiyanê nîşan û raber bike. Tevî hewldanan hemûyan jî îdeolojiya civaka cinsperest bi qasî civakên din ên cîran bi sazî nebûye. Di avakirina civaka demokratîk de ku wekhevî (bi cudahiya xwe) û azadiya jinê pîvana bingehîn e, ev xisletên çandî yên dewlemend di nava hev de dijîn, potansiyeleke mezin di nava xwe de dihewînin. Ango di bin paradîgma modernîteya demokratîk de ji bo pêkhatina neteweya demokratîk û civaka ekolojîk-ekonomîk şert û mercên herî di cih de ev cografya pêşkêş dike. Projeya Konfederasyona Demokratîk a Kurdistanê hê ji niha ve şensê pêkhatina wê heye. Kirinên dewleta netewe yên girêdayî hegemonya kapîtalîst, ji ber neyêniyên ji bo civakê çawa di rabihuriyê de nebû û îro nîne, sibe jî şensê pêşketina wê nîne. Lê bi veguherîneke demokratîk, dikare bibe xwediyê şensekî bi sînor.

Bi tevahî xisletên wê yê hatin jimartin, pêkhatinên demokratîk ên siyasî wê wan bikin bingehê xwe û Kurdistanê weke konfederasyoneke

demokratîk a ji kominên ekolojîk û ekonomîk pêkhatî, pêşde bibin, û ev karekî girîng ê dîrokî ye. Avakirina neteweya demokratîk a xwe disipêre pirrnasnameyên neteweyî, li beramberî xetimîna dewleta netewe, çareseriyeke îdeal e; dikare ji bo tevahiya pirsgirikên neteweyî û hindikayiyên Rojhilata Navîn bibe modeleke çareseriyê. Eger mirov neteweyên cîran bikişîne nava vê modelê, şensê guhertina çarenûsa Rojhilata Navîn û pêkanîna alternatîfê ya modernîteya demokratîk jî wê bi hêz bibe.

Dîrokê Kurd û Kurdistan gihandine statuyeke welê; gelê Kurd ê ji bo azadî, wekhevî û demokratîkbûna xwe têdikoşe, neçarî yekîtiyeke çarenûsî bi gelên herêmê yên dîsa ji bo azadî, wekhevî û demokratîkbûna têdikoşin, dike.

**d-** Çavkaniya pirsgirêkên di civaka neteweyî ya Fars an jî Îranê de, hewldanên şaristaniyan ên dîrokî û modernîteya kapîtalîst a dused salên dawî ye. Li Îranê şaristaniyeke ji rêûresmeke ji sê îdeolojiyên rahibên Sumeran zêdebûyî jî bi tesîr bûye, heye. Rêûresma Zerdeşt û Mîtra tevî ku nasnameya orjîn pêk tînin jî bi ya ji Îslamê zêdebûyî hatine bêtesîrkirin. Manîtî ya weke sentezeke ekolên felsefeya Mûsewîtî, Zerdeştî, Îsewîtî û Grekî derket holê, li beramberî îdeolojiya fermî ya şaristaniyê bi tesîr nebû. Ya rastî, bi tenê rêûresma isyankariyê xwedî kir û ji vê wêdetir neçûye. Îranê rêûresma Îslamî veguherandiye mezhebê Şîa û dema dawî weke îdeolojiya şaristaniyê hatiye fesilandin, lihevanîn. Di roja me ya îro de jî hêmanên modernîteya kapîtalîst di parzûnka Şîa re derbas dike (weke şêweyê modernîst ê Konfuçyustiya Çînê) û hewl dide modern bibe.

Civaka Îranê hem ji aliyê etnîk hem jî ji aliyê dînî ve bi xisletên xwe yên pirrnasnameyî xwedî çandeke gelekî dewlemend e. Ji tevahiya nasnameyên dînî û neteweyî yên Rojhilata Navîn re malovaniyê dike. Zehmetiyê dikişîne pirrnasnameyan bi tenê bi hegemonyayên îdeolojîk ên dînî yan jî ezbetî li cem hev bigire. Bi şêwazekî gelekî tenik, şêweyê milletperestiya ezbetî û dînî pêk tîne. Li aliyê din, tevî ku modernîteya

kapîtalîst pêk tîne, wexta ku li hesabê wê nayê ji serlêdana propagandaya antî-modernîst jî paşve namîne. Di warê helandina pêşketinên şoreşgerane û demokratîk di nava çanda şaristaniya ji rêûresmê de gelekî bûye hoste. Li vir a em behsa wê dikin, rejîmeke despotîk e ku bi hosteyî tê bicihanîn. Di binyeya Rojhilata Navîn de li serê civak û dewletên herî tengezar û nakok tê. Çavkaniyên petrolê herçiqasî tengezariyan hinekî kêm bikin jî hebûna dewletdariya netewe ya Îranê ji bo jihevdeketinê xwedî statuya herî di cih de ye. Di vê de lihevnekirinên wê bi hegemonya DYE-YE'yê re ku aktorên sereke yên moderniteya kapîtalîst in, têra xwe bi tesîr in.

Îran di pirsgirêkên xwe yên civakî de teoriya modernîteya demokratîk bi hosteyî bi cih bîne, dikare rê li ber encamên gelekî çareserker veke. Tevî hewldanên navendparêziyê hemûyan jî di bin re mîna Îraneke federal pêk tê. Hêmanên şaristaniya demokratîk bi hêmanên federalîst re (Azerî, Kurd, Ereb, Belûcî, Tirkmen) bigihêjin hev, projeya Konfederasyona Demokratîk a Îranê dikare manedar bibe û bi hesanî bibe navendeke balê bikişîne ser xwe. Di çarçoveya vê projeyê de tevgera azadiya jinê û reûresmên kominî wê rolên xwe yên girîng hebin. Ji bo Îran paşeroja xwe ya rohnî û rola xwe ya dîrokî ya li Rojhilata Navîn ji nû ve bi dest bixe, kengî bi hêmanên modernîteya demokratîk re (civaka demokratîk, ekonomîk û ekolojîk) bû yek û gav avêt mumkîn e. Potansiyela civaka neteweyî ya Îranê ji bo vê yekê têra xwe bi hêz e, û rastiya neteweya demokratîk a Îranê jî vê hewce dike.

**e-** Bi ketina modernîteya kapîtalîst ya Rojhilata Navîn re yek ji trajediyên sereke yên ew bû sedema wan pirsgirêka neteweyî ya Ermenî ye. Ermenî ji gelên qedîm ê herêmê ne. Bi giranî bi Kurdan re di nav hev de cografyayekê parve dikin. Kurd çiqasî gelek bin ku bi heywanxwedîkirin û cotkariyê debara xwe kirine, Ermeniyan jî ewqasî ev ekonomî li bajaran bi zenaetkarî xwedî kiriye û xwe pê xwedî kirine. Çandeke aliyê wê yê hunerî pêşketî jî temsîl dikin. Tevî ku weke Kurdan xwedî rêûresmeke berxwedanê ne, ji bilî mînakên çeperî û demborî, zêde nikarîne bibin xwediyê saziyên dewletê yên mayînde. Ermenî yek ji gelên pêşî bûne Xirîstiyan in. Di vê de nasname û baweriya bi rizgariyê, bi roleke girîng

radibin. Mîna Cihûyan li dora qesrê nexasim jî bi nasnameya xwe ya zenaetkar bi tesîr bûne.

Di ketina Rojhilata Navîn a modernîteya kapîtalîst de weke amûr bikaranîna Ermeniyan bûye şaşiyeke stratejîk. Ji ber Xirîstiyantiyê di nava dorgirtina Misilmanan de tengav bûn û di encama geşbûna dualî ya milletperestiya dewleta netewe de her çû serhatiya wan veguherî trajediyekê. Di vê de roleke girîng a eşrafên Ermeniyan ên zû bûn bûrjûwa heye. Milletperestiya cureyê Ewrûpayê û hevkartiya hegemonîk, sedemên hundir ên felaketa bi serê wan de hatî ne. Ermeniyan ji aliyê çandî ve gelek tişt li çanda Rojhilata Navîn a pênc hezar salan tê şopandin, zêde kirine. Ermeniyên di dîrokê de bi roleke welê rabûne, ji sedsala 19. heta bi çaryeka pêşî ya sedsala 20. di encama dekûdolab û bêbextiyên modernîteyê de bûne qurbanê qirkirinekê, bûne qurbanê felaketeke mezin. Piştî Cihûyan duyemîn gelê girîng ê dîasporayê ye ku li dinyayê belav bûye. Li rojavayê Azerbegcanê Ermenistaneke piçûk ava kirin, ev nayê wê maneyê ku pirsgirêka neteweyî ya Ermeniyan çareser bûye; ev pêkhatin serhatiya trajîk a Ermeniyan nikare telafî bike. Ermenî wê timî li welatê xwe yê wendakirine bigerin.

Ango di roja me ya îro de pirsgirêka Ermeniyan dibe xwedî maneyekê û ew jî bi vî awayî ye; yên welatê xwe wendakirine divê bibînin. Lê li cihê welatê lê digerin, gelên din jî dimînin. Mirov welatê yekî ji yê din bistîne û bide yê din çiqasî şaş be û gunehekî mezin ê neyê efûkirin be, berevajiyê wê jî ewqasî guneh e. Xeternakiya dewleta netewe bi pirsgirêka Ermenî careke din derdikeve pêşberî me. Têgihiştina wê ya sînoran û çûna wê ya li pey neteweyê homojen, sedema rastî ya vê xeternakiya wê ye. Sîstema li pişt wê, moderntîteya kapîtalîst e. Şêwazê jiyan û zêhniyetê yê ji modernîte û Xirîstiyantiyê têkel bi tenê wê Ermeniyan biqedîne. Dijminên wan çiqasî rezîl û bi zêhniyeta faşîst dibin bila bibin, divê ne bi tenê sedemên qirkirinan ên para wan dikevin keşif bikin, di heman demê de pêwîst e ku bi dîtina rêyên çareseriyê jî mijûl bibin û ev wezîfeyên wan ên heyatî ne. Pêkhatinên konfederalîst ên li ser hîmê kominî, demokratîk û pirrnetewe bêne avakirin, belkî jî herî zêde ji bo Ermeniyan û yên weke wan derfetên

çareseriyê yên nêzî îdealê pêşkêş bikin. Eger li ser bingehê hêmanên modernîteya demokratîk biponijin û xwe weke Neteweya Demokratîk a Ermenî nû bikin wê di çanda Rojhilata Navîn de hem ji nû ve bigihîjin rola xwe ya dîrokî, hem jî wê rêya rast a rizgariyê bibînin.

**f-** Pirsgirêka neteweyî ya Asûriyan çîroka xemgîn a dêwekî şaristaniya Rojhilata Navîn tîne ziman. Gelekî ku xwe weke xwedayê Mezopotamyayê yê bi navê Asûr wekhev dîtiye, bi qasî trajediya bi serê Ermeniyan de hatî bi encameke felaket û xeternak re rûbirû bû. Divê mirov jidestdana Asûriyan ji bo çanda Rojhilata Navîn weke têkçûn, zirar û ziyaneke mezin bibîne. Mirov dikare bibêje, dijminê herî mezin ê Asûriyan, şaristaniya Asûr bi xwe ye. Çawa ku şaristaniyên Sumer, Aqad û Babîl bûn dijminê Sumer, Babîl û Aqadan. Çima? Ji ber ku şaristaniyeke di encama desteserkirinên yekdestdariyê de çandek yan jî gelê wê mezin kiribe, wexta yekdestdariya wê şaristaniyê ji holê rabe, ew gel ji gelek tehlûkeyan re bêyî bergirî û parastinê li naverastê dimîne. Eger gel û çanda li naverastê mayî bi lez tevdîra vê rewşa bêbergirî û parastinê negire, hêza bê wê heyf û tola xwe ji gel û çanda bermahiya wê şaristaniyê, hilîne. Asûrî bûne qurbanê rewşeke bi vî awayî. Asûrî hafize û bîra çanda Rojhilata Navîn in, nexasim jî ya Sumer, Aqad, Babîl, Hîtît, Fenîke, Mîtannî, Ûrartû, Med, Pers, Helen, Sasanî, Bîzans û Îslamê ne. Ne bi tenê hafize bûn, wan ev hafize pirr baş xwedî kir û xwe pê xwedî kirin. Di rêza yekemîn gelên afirîner ên Xirîstiyaniyê de tên. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de hêmanên afirîner ên yekdestdariya bazirganiyê bûn. Ji ber ku evçend bi şaristaniya Rojhilata Navîn re di nava hev de bûn, bêguman wê çarenûsa wan bi vê şaristaniyê ve girêdayî bûya. Bi bilindbûn û mezinbûna wê re wê bilind û mezin bibûna, bi ketina wê re jî wê biketana.

Asûriyan hewl da mîna Ermeniyan bi modernîteya kapîtalîst re hevkariyê bikin û vê yekê jî rê li ber tesîreke berevajî vekir. Ji ber ku Xirîstiyantiyanbûn a bi serê wan de hat, bi modernîteyê re hê bêhtir şidiya û vê yekê serencama wan a xemgîn amade kir. Hesabên taktîkî yên besît ên hegemonên kapîtalîst bi Xirîstiyantiyê geş bûn, fikra dewleta netewe û çalakiya wê pêşwext xistin rojevê. Di vê felaketa mezin a bi serê wan de

hatî de, ev sedema herî girîng e ku para wan têde heye. Asûrî jî weke gelê Ermenî bi giranî gelekî qedîm ê cografya Kurdistanê ne. Felaketa bi serê herdu gelan de hat, ne bi tenê ji ber kirinên milletperestiyê yên faşîst û qirkirinê yên Îttîhad û Teraqiya Tirk a bi ser dewletê ve pêk nehat, di vê de rola hevkarên Kurd jî girîng e.

Pirsgirêka civaka neteweyî ya Asûriyan bi qasî ku koka xwe diçe şaristaniyê jî bi îdeolojiyên modernîte û Xirîstiyantiyê re bi pêş dikeve. Çawa ku ji bo Ermeniyan jî hat diyarkirin, ji bo çareseriyê veguherîneke radîkal divê. Pêwîst e ku hewes û xwestekên xwe yên ji bo derfetên maddî û zêhniyeta modernîteya kapîtalîst û şaristaniya klasîk bişkînin, li ser hêmanên modernîte û şaristaniya demokratîk (civaka demokratîk, ekonomîk û ekolojîk) biponijin û xwe ji nû ve weke Neteweya Demokratîk a Asûriyan ava bikin, dikare li dijî tinekirinê bibe rêyeke nû ya jiyana azad û gavavêtina hebûnîparêz (eksîstansiyalîst). Eger hafiza xwe ya mezin a ji çanda Rojhilata Navîn kombûyî weke çanda modernîteya demokratîk nû bikin, ev yek hem dikare bibe sedem ku ji nû ve li rola xwe ya dîrokî vegerin, hem jî dikare pêşî li rizgariyeke rastî veke.

**g-** Pirsgirêka Cihûyan çiqasî pirsgirêkeke civakî ya Rojhilata Navîn e, ewqasî jî pirsgirêkeke dinyayê ye. Tevahiya dîrokê, şopandina Cihûyan tê maneya şopandina serhatiya pirsgirêkbûyîna çanda Rojhilata Navîn. Cihû çima bûn pirsgirêk, çawa belavbûn, li ku belavbûn, çi pêk anîn, bi kîjan encaman re rûbirû bûn? Bersiv û sedemên van pirsan bi dadgehkirina şaristaniyan re yek tişt e. Di beşên berê yên parêznameya xwe de min xwe neçar û hewcedar his kiribû ku ez bi awayekî berfireh li ser pirsgirêka Cihû û Cihûyan rawestim, ji lewra divê ez qîma xwe bi çend hukmên temamker bînim.

Saziya pêxembertiyê ya li çanda Rojhilata Navîn gelekî zêde kir, bi giranî pêkhatineke Cihû ye. Bêguman di vê de ji çanda qedîm a Sumer û Misrê, bi tevahî jî ji çanda êl û qebîleyên herêmê sûd hatiye wergirtin. Cihûyan ev çavkaniyên çandê, weke ku reforme bikin, veguherandin çanda qebîleya xwe û ji vê re qabîliyet û jêhatîbûneke mezin divê. Bi awayekî

bingehîn Cihûtî vê qabîliyetê îfade dike. Ev carnan veguherandine pereyan, carnan jî veguherandine sîleha atomê û bi vî awayî karîbûne li nava dinyayê serketî bibin.

Di çavkaniya pirsgirêka Cihûyan de ev qabîliyeta wan bi roleke girîng radibe. Di dîrokê de û di roja me ya îro de xwedayetiya qebîleyê di dema modernîteya kapîtalîst de xwe weke milletperestî û dewleta netewe bi xwedatiya sekuler pêşkêşkiribe ev yek ji nêz ve bi Cihûtiyê ve têkildar e. Cihû jî mîna Asûriyan bûn qurbanê rêûresma modernîte û şaristaniya afirandin. Levîathanê (cinawir) di Pirtûka Pîroz de behsa wî tê kirin, weke metafora dewletê vedîtina wan bi xwe ye. Levîathan di modernîteya kapîtalîst de weke dewleta netewe bi gewde bû, pêşî Napolyon û paşê jî di kesayeta Hîtler de hat temsîlkirin û ev yek bi çanda xwedatiya (teolojiya) Cihûtiyê re ji nêz ve têkildar e. Divê baş bê zanîn ku yek ji van şêweyên cinawirê modernîteyê qirkirina Cihûyan pêk anî. Jixwe di serdema destpêkê û navîn de jî bûyerên bi heman rengî kêm bi serê wan de nehatin. Felaketên mezin ên bi serê Cihûyan de hatine, ji aliyê cinawirê bi destên xwe afirandine pêk hatine û ber ser serê wan dane. Divê mirov vê rastiyê bîne ziman, ji ber ku sedaqeta bi heqîqeta vê çandê hîn kiriye, welê dixwaze.

Derketin, beşa pêşî ya Pirtûka Pîroz e. Ji bo Cihûyan gelekî girîng e. Ev girîngî hê jî dewam dike. Bi kêmî, hewcedariya wan bi derketin û gavavêtinên bi qasî derketina wan a ji Misrê beriya wê jî ji Ûrê (Ûrfayê) heye. Li cihûwarên Kenanên berê bi Filistiniyan û bi cîhana Ereb a li pişta wan re bûyerên rabihuriyê û îro diqewimin hema hema şer û nakokiyên sê hezar salî ne. Ji bo ji nava van şer û nakokiyan derkevin, divê rêyekê bibînin. Ez weke Ûrfayiyekî ji wan re nacîzane fikra xwe weha dibêjim; di tevahiya parêznameya xwe de (bi girtina min a rê li ber vê parêznameyê vekir, cezakirin û hukimxwarina min re têkiliya dewleta netewe ya Cihû ya îro Îsraîlê di dereceya yekemîn de heye) hewl didim modernîteya demokratîk xurt bikim. Ew jî dikarin bi hêmanên vê modernîteya demokratîk li rêya derketinê bigerin. Bêguman rewşenbîrên bi koka xwe Cihû di vî warî de xwedî fikrên pêşketî ne. Lê mesele bi tenê bi

xwedîfikirbûnê çareser nabe. Divê Cihû bi çanda demokratîk a Rojhilata Navîn re ji nû ve bi awayekî bi pîvan û prensîp dest bidin hevdu. Di jeopolîtîkeke Rojhilata Navîn a bi dewleta netewe de, Îsraîl weke dewleta netewe divê timî di nava şer de be. Mumkîn nîne ku agir bi agir were vemirandin. Herçiqasî bi palpiştiya hêza hegemonîk a modernîteya kapîtalîst ji xwe razî be jî ev yek têra çareseriyeke bi kok nake. Ti sîstema ji modernîteya kapîtalîst nebihure nikare bi awayekî mayînde ewlekariyê pêk bîne.

Bi giştî Cihû û bi taybetî jî pirsgirêka Îsraîlê heta çareser nebe, ne li Rojhilata Navîn ne jî li dinyayê civak nikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin. Perspektîfên bi dewleta netewe giş, pirsgirêkan çareser nakin, giran dikin û der barê vê de mînakeke ku mirov bi qasî mînaka Îsraîl û Filistînê jê dersê bigire û hîn bibe, nîne. Dinyayek pere li şerê Îsraîl-Filistînê hat dayîn û ewqas xwîn hat rijandin. Ji van hemûyan a li dawiyê mayî, mîrateyeke guloka pirsgirêkan a ji berê girantir e. Di mînaka Îsraîl-Filistînê de ya îflas kirî û têkçûyî modernîteya kapîtalîst û paradîgmaya wê ya dewleta netewe ye.

Cihû yek ji hebûnên sereke yên çanda Rojhilata Navîn in. Înkarkirin û qirkirina wan ji bo her kesî zirar e. Eşkere bûye ku bi Levîathanên ew bi xwe jî qirkirine, di nava aştî û ewlekariyê de jiyan nabe. Cihû jî weke Ermenî û Asûriyan dikarin weke Neteweya Demokratîk xwe ji nû ve ava bikin û di nava Konfederasyona Demokratîk a Rojhilata Navîn de bi hêsanî cih bigirin. Di vê mijarê de weke fikir, ez dibêjim projeya Konfederasyona Demokratîk a Rojhilatê Deryaspî, dikare bibe destpêkeke baş. Têgihiştinên nasnameyên neteweyî û dînî yên hişk û serê wan girtî di çarçoveya vê projeyê de dikarin ber bi nasnameyên nerm û serê wan vekirî biberidin. Îsraîl jî dikare ber bi neteweya demokratîk a karibe were qebûlkirin, veguhere. Bêguman divê cîranên Îsraîlê jî bi heman awayî veguherin.

Şer, pevçûn û tengezariya zêde ya li Rojhilata Navîn veguherîna modernîteyê mecbûrî dikin. Pirsgirêkên civakî û neteweyî yên giranbûyî heta modernîte veneguhere, çareser nabin û li dawiyê namînin. Bi serê xwe nakokiya Ereb-Îsraîlê jî pêdiviya bi veguherînê ya modernîteyê,

destnîşan dike. Eger sîstema serdest nikaribe pirsgirêkên bingehîn çareser bike, ya divê bê kirin çareserkirina sîstemê ye. Modernîteya Demokratîk ji bo vê çareserkirinê alternatîfê pêşkêş dike.

**h-** Çanda Helen ji Rojhilata Navîn, nexasim jî ji Anatolyayê tesfiyekirin zirareke mezin e. Vê tesfiyekirinê li pey xwe pirsgirêkên trawmatîk hiştine. Di çaryeka pêşî ya sedsala 20. de dewletên netewe yên Tirk û Yewnan li ser bingehê koçberkirina bi darê zorê li beramberî hevdu tesfiye meşandine û ketine nava hewldanên qirkirinê. Tesfiyekirina Helenan jî bi qasî van tesfiye û qirkirinan şopeke bi êş li pey xwe hiştiye. Bi vî awayî qutkirina gelan ji mekanên wan ên çandî yên hezarê salan, erka ti dewletê nîne. Di dîrokê de zêde mînakên wê nayên dîtin. Bi vî awayî bi tesîr û balkêş kêm mînak hene ku rûyê ne mirovane yê dewleta netewe nîşan bide. Ma ne Helenîzmê di dema navbera 300 B.Z.-300 P.Z. de senteza çandî ya herî bi heybet a Rojhilata Navîn pêk anîbû.

Pêvajoya tesfiyekirina çandên Helen, Cihû, Asûrî û Ermeniyan a bi Îslamiyetê re bi lez bû di hilweşîna şaristaniya Rojhilata Navîn de bi roleke mezin rabûye. Çanda Îslamê ti carî di wê hêzê de nebû ku valatiya van çandan tijî bike. Modernîteya kapîtalîst di serê sedsala 19. de, di ketina xwe ya Rojhilata Navîn de mîna li dîmenekî çolê rast bê. Ev çolbûnek bû ku erezyona çandî ew afirandibû. Çand tê maneya berxwedanê; dema çand bi hêz nebe berxwedana wê jî bi hêz nabe. Fetihkirina herêmê hîç zehmet nebû. Di hilweşîna Rojhilata Navîn û rewşa wê ya îro de tola tesfiyekirina çandê, divê piçûk neyê dîtin. Projeyên neteweyên homojen ên dewleta netewe, berpirsê sereke yê tevkujiyên çandî ne. Di serdema ummetên dînî de jî ti carî evçend bez û çûnek li pey homojenkirinê çênebû.

**f-** Pirsgirêkên komên etnîk ên bi koka xwe Qafqasî jî girîng in. Ev kom tevahiya dîrokê timî herikîn Rojhilata Navîn û li dewlemendiya çandî ya herêmê para xwe zêde kirin. Alîkariya wan a di yekparebûn û dewlemendiya çandî de divê ti carî piçûk neyê dîtin. Modernîteyê li van çandên hindikayiyan jî bêhn çikand.

Weke encam mirov dikare bibêje, pirsgirêkên civakî yên bingehîn ên Rojhilata Navîn kokên xwe diçin heta bi şaristaniya çînî-dewletdar û bi modernîteya kapîtalîst re gihiştine qirkirinê û bi krîza avabûnê ya global re di dema xwe ya herî giranbûyî de ne. Acenteyên herêmî yên modernîteya serdest, bihêlin ku karibin pirsgirêkan pênase û çareser bikin, zêde haya wan ji wan nîne temsîla çi dikin. Milletperestiyên etnîk-ezbet û dînî yên ji bo çareseriyê herî zêde serî li wan tê dayîn, li şûna pirsgirêkan çareser bikin wan zêdetir gurr dikin.

Çanda Rojhilata Navîn di heman demê de şêwazekî jiyanê ye, şoreşên mezin ên dîrokî pêk anîne. Dewletên netewe yên ku amûrên qirkirina çandî ne, çiqasî karibin heqîqeta civakî bikujin ewqasî jî jiyanê dikujin. Hêmanên modernîteya demokratîk ên me hewl da wan pênase bikin ji bo rawestandina qirkirinan û parastina jiyanê di pozîsyona hêzên teorîk-pratîk de ne. Wexta ku li ser hîmê civaka demokratîk-ekonomîk-ekolojîk gav bêne avêtin, Serdema Neteweyên Demokratîk, di çanda Rojhilata Navîn a xwenûkirî de jiyan dikare ji nû ve bigihîje heybet û balkêşiya xwe ya berê.

## 2- Çînên Civakî û Pirsgirêka Burokrasiyê

Di nava rastiyên civakî de ku îdeolojiyên pozîtîvîst ew zêde nepixandine û ew di tariyê de hiştine, çîn û burokrasî cihekî girîng digirin. Diyardeya çînî ya ku pozîtîvîstên çepgir ew zêde mezinkirine, weke heqîqeteke civakî têra xwe nehatiye manedarkirin. Ji civakê bêtir rol dane çînê. Mîna ku civak ji çînan hesibandibin. Têgihiştineke civakî ya weke tevahiya çînan be, bi pêş xistine. Ya rast jî berevajiyê vê ye. Diyardeyên çînî li gorî bedena civakê divê rewşeke obezîte ango zêde qelew bêne hesibandin. Car caran zeîf û qelew dibin. Mirov civakan weke çînan bibîne, ev yek ê bi temamî mirovan serkorî bike. Heqîqeta civakî biqedîne. Îdeolojiyên çîngir di dema şaristaniyan de rengekî yekdestdar girtin; rastiya civakê bi berevajîkirin û jirêderxistinê, kirin mentiq û rêzik. Pîşeyê zanyartî û felsefeyê bi xwe hunerê gera li heqîqeta civakî ye.

Divê mirov çînîbûna tevahiya dîrokê pêş ket ne weke diyardeyeke normal a civakî, weke jirêderketinê binirxîne. Bi vî awayî mirov bi mijarê dakeve girîng e. Zanista civakî û îdeolojiya modernîteya kapîtalîst bi awayekî bingehîn li ser hîmê diyardeya çînî, radibe. Xwe weke çînên serwer û mehkûm dihûne, li hev çêdike. Îfadenekirina wê ya heqîqetê, timî dogmatîk û rexnegir mayîna wê ji vî rengê wê ye. Di tevahiya demên şaristaniyên çînî de mirov dikare heman xisletê bişopîne û bibîne. Di herdu rewşan de jî (çînên serdest û bindest) doktirînên bi awayekî îdeolojîk û zanistî hatine hûnandin, heqîqet gelekî zêde berevajî kirine. Lêgerînên rastî û heqîqetê yên ti carî kêm nebûn ji sedema zêhniyet û jiyanên di ser çînîtiyê re dihatin hûnandin. Guftûgo û xwelihevrakişandinên li ser mijara heqîqetê jî çavkaniya xwe heman rastî ne. Ango pirsgirêka civakî bi awayekî bingehîn weke diyardeyeke çînî derdikeve holê. Wexta li ser jiyana ekonomîk ava dibe, weke yekdestdariyeke di ser ekonomiyê re berbiçav dibe. Jixwe ekonomî zêde pêşde neçe çînayetî pêş nakeve. Berhemê zêde û nirxê zêde çiqasî zêde bibin, bingehê maddî yê çînî jî ewqasî zêde dibe. Pevçûn û nakokiyên hişk ên çînî li ser vê zêdeyiyê pêk tên. Di bingehê wê diyardeyê de ku jê re pevçûn û tengezariya civakî tê gotin, ev rastî heye.

Herweha her tim hêmanên deklase û lumpen ên ji wan re beredayî û aware tê gotin û beşên ji hilberandinê qut pêk tînin, hevalbendiyê bi diyardeya çînî re dikin. Bi modernîteya kapîtalîst re ev beşên kirine ‘artêşa bêkaran’ laneta sîstemê ne. Bi vî awayî diyardeyeke di cîhana heywanan de jî nîne, bi destê mirov diyarî civaka mirov tê kirin. Ji bo xebitandina sîstemê ji sedî sed hewcedarî bi artêşeke bêkaran heye. Di rewşeke berevajî de qanûna kara herî zêde nameşe. Mezinbûna sermayeyê bêyî mezinbûna artêşa bêkaran pêk nayê. Encameke din a vê diyardeyê şêniyên zêde dibin û tevgera şêniyan a rê li ber vedike. Şêniyên misêwa zêde dibin, bi tenê bêkariyê xwedî nakin; rê li ber felaketeke mezin a ekolojîk a dinya û hawîrdor nikare rake, vedikin.

Yek ji şaşiyên herî mezin ên Marksîzmê (û bi tevahî îdeolojiyên modernîteya kapîtalîst) ew e, ji bo pêşketinê çînîbûn weke mecbûriyetekê

hesibandin. Şaşî yan jî qelsiya bingehîn a di sîstema wan de jî di vî hukmî de ye. Ev jî bivênevê rê li ber rewakirina tehakum û mêtinkariyê vedike. Diyardeyeke mecbûrî jî were dîtin, bivênevê wê rewa jî bê qebûlkirin. Ev hukim weke heqîqet di jidestdana nirxê de bi roleke bingehîn radibe.

Diyardeya burokratîk îfadeya sazî-dewletî ya diyardeya çînîtiyê ye. Amûra zordestî û kontrolê ya çîna serdest e, li ser tevahiya civakê û çîna mehkûm. Lê di nava pêvajoyê de dibe xwedî hêzeke mezin û xwe digihîne statuyeke xweser. Bi xwe dikeve rewşa çînekê, dikeve rewşa çavkaniya çînîtî jê zêde dibe. Misêwa ji hev cihê dike, çînîtiya jêr û jor xwedî dike. Ev rewş dihêle ku timî di binya wê de rê li ber çêbûna dualîteyekê vebe. Ji aliyê din ve, ji bo xwe timî di ser civakê re bihesibîne, ji xwe re cihekî cihê pêk tîne. Yekdestdariya çînî zêdetir bi rêya burokrasiyê pêk tê. Tevî ku tevahiya dîrokê bi pêş ketiye jî nemaze bi dema modernîteya kapîtalîst re burokrasî dibe mîna cinawirekî civakê dadiqurtîne. Belovajîbûna çînî di vê demê de bi burokrasiya zêde dibe re diyardeya civakî dixe rewşa wê ya herî qels û lawaz. Mîna ku civak ji çîn û burokrasiyê pêk hatibe, tê qebûlkirin. Di vê demê de ku zext û mêtinkarî herî zêde dibin, nakokî û pevçûn gelekî zêde dibin. Pevçûn û nakokiyên zêde dibin bêhtir dibin sedema burokrasiyê û ev jî dihêle ku pirsgirêkên civakî veguherin bûyerên diberidin û cih bi cih jî teqînên şoreşane.

Çînîtiya mehkûm weke heqîqet bê nirx û qîmet e. Kole, heqîqeta mirovê ferd ê şopa wî jêçûyî, îfade dike. Ango tevgerên polîtîk û îdeolojîk ên xwe disipêrin kole, nikarin berdar bin. Lê eger tevgerên çînî yên bindest bibin parçeyekî tevgerên li dijî zordestî û mêtinkariya tevahiya civakê yên li heqîqetê digerin û dixwazin wê bi dest bixin, hingê manedar dibin. Çînparêziya teng weke heqîqet bê qîmet e, û herweha weke tevger şensê xwe yê serketinê zêde nîne. Di vê mijarê de rastiyên dîrokî bi mînakên hînker tijî ne.

Ev nirxandinên der barê çîn û burokrasiyê de ji bo dîroka civakî ya Rojhilata Navîn bi zêdeyî li cih in. Çînîparêzî û burokrasî xwe li ser çar şêweyên bingehîn rewa dikin. Ev dînperestî, milletperestî, cinsperestî û zanistperestiya pozîtîvîst e. Di navbera şêwegirtina îdeolojîk û

çînîparêziyê de têkiliyeke xurt heye. Ji ber vê sedemê ye ku zêde heqîqetê nikarin pêşkêş bikin. Pêşketina civaka demokratîk li dijî çînîparêziyê alternatîf û berdêla herî di cih de ye. Bi nêzîkatiya çîn li dijî çînê, timî çîn zêde kirine, lê belê têkoşîna demokratîk a bi çînîparêziyê re çînê di nava civakê de kêm dike û dihelîne, digihîne civaka wekhev û azad. Ango bi civaka ekolojîk û ekonomîk pêşî li yekdestdarên sermayeyê digire da ku nebin xwediyê zêdeyiya zemînê maddî yê çînîgirî ye. Di dema şaristanî û modernîteyê de danehevên nirxê zêde yên weke hêmanê di bingehê pirsgirêka civakî de bûn, wê ji aliyê hêmanên modernîteya demokratîk ve bêne helandin û wê çareseriya civaka demokratîk dest pê bike. Bi vî awayî wê bê piştrastkirin ku têkoşîna çînî ya hevgirtî, têkoşîna demokratîk e.

## 3- Hiyerarşî, Desthilatdarî, Pirsgirêka Dewletê û Şoreş

Şoreş para bêhtir bi armancên xwe re li hev nakin û berevajî wan bi encam dibin; ji ber ku pirsgirêka hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê rast ji hev dernaxin. Di vê mijarê de jî dîrok bi enqaz û xirbeyên gelek şoreşên berevajî armancên xwe ketine tijî ye. Ji Şoreşa Îslamê ya herî zêde bi îdeaya xwedatiyê rabû heta bi Şoreşa Fransî ya xwe şoreşa rohnîbûnê ya sedsala 18. hesiband, dîsa heta bi Şoreşa Bolşevîk a Rûs a sosyalîzma zanistî bi dehan mînakên bi heman rengî, ji wan nehat ku di dema kin de berevajî armancên xwe bi encam nebin. Sedema bingehîn a vê diyardeyê jî ew e, di ‘dema kin’ de têkbirina dewletekê yan jî hêzeke desthilatdariyê ya hiyerarşîk nayê maneya têkbirina şaristanî û modernîteya çand û saziya ‘dema dirêj’. Heta, eger dewleta têkçûyî di nava sîstema şaristaniyê yan jî modernîteya heyî de bûbe asteng û kelemek, hingî ya ku wê karektera xwe bide tevahiya dewletên wê demê yên ku bi şoreşê wê bi hêztir bibin, wê şaristanî û modernîte bin. Têkbirina dewletê, têkbirina desthilatdarî û modernîteyê nîne. Di binê para bêhtir bi hêzbûna desthilatdariyê de ev rastiya bingehîn heye.

Hiyerarşî û desthilatdarî weke diyardeyên di zikhev de demên hezar salan didomin. Dewlet berhemên demên kintir in. Şoreş jî bûyerên demên

kêliyan in. Ev rewş nayê wê maneyê ku şoreş bi roleke girîng ranabin. Lê tehlûkeya ku şoreş dema dirêj û navîn di nava avahiyên şaristanî û dewletan de xwemalî bibin weke îhtîmaleke xurt a bi tehlûke, her heye. Mînak, Şoreşa 1917'an a Cotmehê li hemberî ti dewletê têkneçû. Lê li hemberî sîstema avabûna dema dirêj a modernîteya kapîtalîst têkçû. Bêguman di vê de şerê wê yê bi tenê li dijî hêmana modernîteyê, kapîtalîzmê diyarker bû. Ji ber ku wexta li dijî wê têdikoşiya di bin navê kapîtalîzma dewletê de bi şêweyekî herî paşverû û muhafezekar têdikoşiya û di têkçûna wê de para vê yekê diyarker bû. Hewl da hêmanên îndustriyalîzm û dewleta netewe di asta herî jor de pêşde bibe. Bêyî ku modernîteyê ji hev derxe û bi peyketina wê ya fikrên sabit û di mejiyê wê de bistbûyî, jixwe wê di encamê de şoreş bikira berevajiyê armancên wê. Sedsala 20. bi enqaz û xirbeyên şoreşên bi vî rengî tijî ye. Ji bo têkoşîna li dijî çanda hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê, hewcedarî bi bikaranîna şîroveyeke rast a dîrokê (dîroka hêmanên demokratîk) û hêmanên wê yên dijber ên rast hatine pênasekirin, heye. Eger şoreş li ser vî bingehî hîmê xwe deynin, wê berevajiyê armancên xwe bi encam nebin û bi sîstema dema dirêj a modernîteya demokratîk re bi yek bin, dikarin serketî bin.

Eger em di vê çarçoveyê de şîroveya şoreşger a sê dînên yek xwedayî yên Rojhilata Navîn bikin, em ê baştir fêhm bikin ka çima berevajiyê îdealên xwe yên bilind û mezin bi encam bûne. Dilê xwe bijandine hiyerarşî û desthilatdariyên avahiyên dema dirêj in, û tavilê bûne dewlet, ev jî sedema bingehîn a serneketina şoreşên wan ên dînî ye. Mîna ku qanûneke dij-şoreşê be; yên yeqîn dikin ku bi wan re şer dikin, bi pirranî dikevin ser rêya wan û bêhemdê wan be jî xwedî li armancên wan derdikevin. Ev hersê dînên yek xwedayî jî ketin ser rêya dijberên xwe û ji rê derketin. Di vê çarçoveyê de jî mirov dikare li rewşa wan serwext bibe û fêhm bike. Ev dekûdolab, ev fenûfût di dema modernîteyê de hê eşkeretir têne gerandin û têne kirin. Bi tevahî şoreşên neteweyî wexta bi dewleta neteweyî bi sazî dibin û bi armancên xwe re dikevin nakokiyê, êdî bi êş û hêrs têne bibîranîn.

Di civakên Rojhilata Navîn de weke dem û zêdebûn, şaristaniyên herî zêde dirêj û bi hêz dewam kirine, asta herî bilind a çanda hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê îfade dikin. Hê ji wexta Gilgamêş ve tê zanîn ku desthilatdarî nexweşî ye. Zanyar û hozanan timî behsa nexweşiya desthilatdariyê kirine, û ew di rola fahîşeyeke cazib de dane naskirin. Hiyerarşî li Rojhilata Navîn hilat. Rojhilata Navîn bû dergûşa çanda herî dirêj a çavkaniya tevahiya desthilatdarî û dewletan. Ji lewra em dikarin baştir fêhm bikin, bê ka çima li Rojhilata Navîn çanda demokratîk timî di binî de dimîne. Di civakekê de ku her sermiyanê malê xwe împaratorekî piçûk bihesibîne, mirov dikare fêhm bike ka çima rola şoreşan bi sînor dimîne. Bi tevahî qebûlkirina modernîteyê weke şoreş, dihêle ku asta pirsgirêkên civakî yên roja me ya îro gihiştinê, em baştir fêhm bikin. Eger hûn sîstemeke fetihkar a çavkaniya pirsgirêkan e, weke çareserkerê bingehîn ê pirsgirêkan bi cih bînin, weke encam bêguman hûn ê pirsgirêkên civakî yên hê giranbûyî bibînin.

Di sedsala dawî de bûyîna xwediyê dewleteke netewe, hema hema weke pêkhatina hevdîtina herî mezin a bi xwedayê xwe re hat fêhmkirin. Xwedayên kevin jî bezandin xizmeta xwedayê dewleta netewe. Dewletên netewe yên Rojhilata Navîn hê haya wan ji wan nîne ku hem li beramberî hev hem jî li beramberî kesên mîna hemwelatî hîn bûne, weke amûrekî şer têne bikaranîn û nikarin bibînin ku hegemonya sîstemê ev kiras li wan kiriye. Navendîkirina desthilatdariyê û zêde neteweyîkirina dewletê weke rola li şoreşa neteweyî hatî barkirin, dihesibînin. Şoreşeke bi ev çend nakokiyan barkirî, şensê wê yê serketinê bidin aliyekî, bi hêsanî dikare bibe derbeke li azadî û wekheviya bi îdeaya wê radibe, bikeve. Şoreş kengî bibin antî-navendîparêz û antî-desthilatdarî hingê dikarin ji civakeke azad û wekhev re xizmetê bikin. Li Rojhilata Navîn çanda demokratîk çiqasî karibe ji çanda dewleta netewe ya zêde hatiye nepixandin bibihure wê şensê xwe yê pêşketinê hebe. Avahiyên desthilatdarî û dewletê yên bi xwe sermaye û yekdestdariyên din ên mêtinkariya wan zêdebûyî îfade dikin, çiqasî bi civaka demokratîk a ku civaka ekolojîk û ekonomîk a zêdebûyî îfade dike li dawiyê bêne hiştin, eşkere ye ku çareseriya rastî ya

pirsgirêkên civakî jî wê ewqasî durist bimeşe. Modernîteya demokratîk weke îfadeya neteweyên demokratîk û sîstematîka wan e ku nûneriya serdema bihurîna ji pirsgirêkên çavkaniya wan hiyerarşî, desthilatdarî û dewlet e, dike.

Ji bo şoreş karibin manedar bibin û bi armancên xwe re nekevin paradoksê, divê piştî şoreşê bi nexweşiya desthilatdariyê nekevin û bi dewletparêziyê nexapin. Şoreşên tavilê dibin desthilatdarî û dewlet bi tenê qediyayî nayên hesibandin; bi îdealên xwe yên wekhevî, azadî û demokrasiyê re xiyanetkirî têne qebûlkirin. Di vê çarçoveyê de dîroka şoreşan xwedî trajediya dîroka xiyanetê ye. Ji vî awirî ve Şoreşên Franse, Rûs û Îslamê bi dersan tijî ne. Ango gelekî girîng e ku şoreş li şûna tavilê bi şertê desthilatdarî û dewletê ve werin girêdan, ji bo dema dirêj bi nirxên civaka exlaqî û polîtîk ve bêne girêdan. Bingehê civaka exlaqî û polîtîk jî mirov bi tenê dikare bi siyaseta demokratîk deyne, bideribîne. Siyaseta demokratîk heta civakan raneke ser piyan, di her komê de rêxistinên demokratîk ava neke û pêşengên demokratîk negihîne, şêwazê jiyana demokratîk a dema dirêj neceribîne û nede rûşkandin, civakên exlaqî û polîtîk nayên avakirin; weke îfadeya berbiçav a civaka exlaqî û polîtîk civakên demokratîk ango neteweyên demokratîk pêk nayên. Pêvajoya modernîteya demokratîk bi vî awayî bi dema dirêj weke serdemeke nû ya ji yekparebûna neteweyî ya komên demokratîk pêkhatî tesewirkirin û bi sazîkirin, divê weke şêweyekî nan, av û hewaya ku bêyî wan nabe, were nirxandin.

Pirsgirêkeke din a girîng bi hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê re têkildar bi wesfê van saziyan bi xwe re eleqedar e. Bi paldana van saziyan, xwe rakişandina li gera wekhevî, azadî û demokrasiyê, di serî de Marksîzm, paradoksa herî mezin a îdeolojiyên armanca xwe bi vî awayî îlan dikin e. Ev diyardeyên behsa wan tê kirin bi înkara nasnameya wekhevî, azadî û demokrasiyê hebûna xwe bi dest dixin, ji lewra bi paldana wan, hewldana ji bo xwe gihandina armancê, paradoksa herî mezin e ku di dîrokê de qewimiye. Îronîk e: amûrên pala xwe didinê çînîbûnê bi sazî dikin û ji bo lawazkirina yekdestdariyên sermayeyê yên li ser ekonomî û eko-civakê, ji

bo qelskirina otorîteya hiyerarşî û desthilatdariyê ya li ser civaka demokratîk, panjahr bi huqûqê bi sînorkirina dewletê ye. Lema siyaseta demokratîk bi roleke welê radibe ku dest jê nabe. Ji bilî siyaseta demokratîk bi amûrekî din (di nava cudahiyan de) xwegihandina civaka wekhev û azad nabe. Tu çiqasî bibî desthilatdarî tu yê ewqasî bibî çînparêz. Berevajiyê wê jî tu çiqasî bibî demokratîk tu yê ewqasî bê çîn bibî. Mirov heta amûrekî berfireh ê siyaseta demokratîk li ser çanda Rojhilata Navîn ferz neke, civakê timî bi vî amûrî hişyar neke, raneke ser piyan û çalak neke, mirov nikare xwe bigihîne civaka demokratîk. Mirov heta xwe negihîne civaka demokratîk jî nikare ti armanca wekhevî û azadiyê pêk bîne û nikare xwe bigihîne serdema şaristaniya demokratîk.

## 4- Li Rojhilata Navîn Bajar, Çîna Navîn û Di Civaka Gund-Cotkariyê de Pirsgirêkên Hilweşînê û Çareseriyên Wan

Zirar û ziyana rastî ya modernîteya kapîtalîst di hilweşîna bajar, mezinbûna kansêrolojîk a çîna navîn û tesfiyekirina civaka gund-cotkariyê de xwe nîşan dide. Şoreşa îndustriyel a bi sedsala 19. re bi lez bû û li ser navê bajar bi zêdebûna sînornenas a şêniyên rê li ber xirakirina bajêr vekirin, bi nepixîna anormal a çîna navîn re kir yek û ev yek bi jihevdeketina civaka gund-cotkariyê ya hezar salan di zikhev de meşiya. Civaka gund-cotkariyê bi awayekî bingehîn xwediyê şêniyekî bajêr ê bi sînor e, xwediyê şert û mercên di cih de û avahiyekê ye ji hawîrdorê re nabe tehlûkeyeke derba kuştinê lê bide. Bajarên serdema destpêkê û navîn bi civaka gund re di weznekê de bûn û bajarên kêrhatî bûn. Wezna hezar salan a di navbera gund û bajêr de zêde xira nebû û bêyî ku zirarê bide hawîrdorê, karîbû hebûna xwe dewam bike. Pirsgirêkên derketin holê, negihiştin wê astê ku gefan li civaka gund û bajêr bixwin. Bajarên berî îndustriyalîzmê di civakbûna dîroka bajêr de xwediyê roleke mezin bûn. Ji sîteya Ûrûkê (3500 B.Z.) heta bi Venedîkê (1000-1800), em dikarin şahidiyê li gelek civakên bajarên xwedî rabihuriya wan a bi heybet bikin.

Rola bajaran di pêşketina zanist, huner, felsefe û îndustriyê de nayê înkarkirin. Dewleta bajaran jî bi temamî dewlet nayê hesibandin; nîv demokrasî ye.

Bi awayekî, weke çîroka şaristaniyê ya li dora bajêr pêk hatiye, behsa dîrokê hatiye kirin. Jiyana bajêr a beriya îndustriyalîzmê timî hewl daye bi jiyana gund-cotkariyê re di nava weznekê de be. Herçiqasî di navbera wan de nakokî pêk bihata jî di astekê de ku gefan li yekparebûna civakê bixwe, dijwar û tûj nebû. Ev gefxwarin û tehlûke ti carî negihişt wê astê ku civaka gund-cotkariyê hilweşîne. Wezna di navbera wan de li gorî hewcedariya yekê bi ya din û hevxwedîkirinê bû. Ji aliyê binyewî û kara herî zêde xirakirina bend û sukuran a îndustriyalîzmê ne tenê ev wezn xira kir; di dused salên dawî de bi rêvekirina li ber mezinbûna anormal a bajaran, bi rastî li ser navê bajaran bê bajarbûn û bajarbûneke bêmane peyda kiriye. Bi hilweşandina civaka gund-cotkariyê di bin navê qaşo ‘civaka bajar-pîşesaziyê’ de rê li ber bûyereke kansêrolojîk vekir. Ev diyardeya jê re çîna navîn tê gotin, bi kêra tiştekî nayê. Bi tenê hejmara wan heye.

Têgîneke seyr a weke bêkariya çîna navîn derxistin holê. Ji bo vê çînparêziya sosret û seyr rewa bikin, hin îdeologan hewl da wê mîna bingehê maddî yê têkûz ê civaka demokratîk, weke rêçete pêşkêş bikin. Bajarên şêniyên wan gihiştine mîlyonekê li aliyekî, bajarên şêniyên wan gihiştine deh mîlyonan û ewqas jî çîna qaşo navîn a mezinbûyî pêk hatin. Sedema ez jê re ‘qaşo’ dibêjim ne ew e ku diyardeya maddî nîne; ji ber ku mane û hebûneke wê ya xweser tineye. Rastiya bi diyardeya bi navê çîna navîn tê temsîlkirin, ji hev cihêbûna civakê weke çîna jêr û jor yekparekirina wê ye. Diyalektîka ‘efendî-kole’ ya çînên jêr-jor, nexasim di felsefeya Hegel de bi awayekî mukemel ji hev hatiye derxistin û maneya wê li ber çavan hatiye raxistin. Lê heman Hegelî weke dewleta netewe çîna navîn weke pêkhatina azadiyê pêşkêş kir û ev encama herî riziyayî ya felsefeya wî bû. Karl Marks heman şaşî li ser navê çîna ‘proleteryayê’ kir. Diyardetiyeke du-çînî di civakê de weke jirêderketinê hat çêkirin û timî hebûneke wê ya xweser nîne, ew hê bêtir anormalkirin û weke hebûneke civakî pêşkêşkirin, sextekariya herî mezin a civakî ya modernîteya

kapîtlîst e. Bi tevahî zanistên civakî û îdeolojiyên kapîtalîst bi rewakirina vê sextekariyê wezîfedar in. Ew hewl didin ji diyardeyeke heqîqeta xwe nîne, heqîqetekê çêkin. Jidestdana heqîqeta mezin bi metafizîkeke pozitîvîst û pêşkêşkirina wê weke 'heqîqeta objektîv', armanca bingehîn a pîşeya xwe dihesibînin.

Beriya îndustriyalîzmê alternatîfa dewleta bajêr an jî dewama wê sîstemên împaratoriyê bûn. Împaratoriyan bi awayekî bingehîn xwe spart civaka gund-cotkariyê û di berdêla ewlekariya pêk dianîn de, xwe xwediyê zêdehiyên civakî (nirx û berhemên zêde) dihesibandin. Bi şoreşa pîşesaziyê re kombûna sermayeyê domdar bû. Hem dewleta bajêr û hem jî sîstema împaratoriyê li pêşiya vê kombûna sermayê bûn asteng. Ji ber hewcedariya bi bihurîna ji vê rêûresma dewletê ya kevn a ku li pêşiya sermayeyê dibe asteng, dewleta netewe dikeve dewrê. Dewleta netewe çiqasî ji astengî û gefên li pêşiya daneheva sermayeya kapîtalîst bihuriye, ewqasî jî bûye şêweyê dewletê yê serdest. Ango kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe bajarbûna bêbajar, bi bendşikandina çîna navîn û burokrasiyê re tesfiyeya civaka gund-cotkariyê diyardeyên ketine zikhev in. Ne bajarê şêniyên wan bi mîlyonan, bajarên bi sed hezaran jî û diyardeya çîna navîn a ewçend mezinbûyî ne ku bi tenê weke nexweşiya herî mezin a moderníteya kapîtalîst, encama wê ya krîz û kaotîk e; dike ku jiyan li dinya û hawîrdorê nebe. Postmodernîte bi şêweyê gelekî fediyokî be jî ji ber ku hinekî haya xwe ji vê rastiyê çêbûye, qonax derbas kiriye. Di bin bandoreke giran a modernîteyê de ye; lê dîsa jî bi sedema ku îşaret bi sê suwarên mehşerê kiriye, bi roleke erênî radibe.

Çîna navîn û bajar li navenda modernîteyê diyardebûyîneke bi vî rengî bi dest xistine û ev xwe li Rojhilata Navîn hê bêhtir bi awayekî birizîne nîşan dide. Ev diyarde ne ku maneya wan nîne. Em wexta dibêjin maneya wan nîne, em behsa tinebûna aliyê wê yê erênî dikin. Naxwe bi qasî lod û gidîşan maneyên neyênî di nava xwe de dihewînin. Bajar û çîna navîn bi tenê xwe bêkar nahêlin; civaka gund-cotkariyê jî bi lez ji hev dixin û bi vî awayî neyênîbûna xwe piştrast dikin. Çîna navîn û bajarên Rojhilata Navîn ji pêkanîna îndustriyalîzm û burokrasiya li Rojava gelekî dûr in, ji lewra di

diyardebûyîna xwe de tevahiya civakê dixin rewşeke lumpen, deklase û beradayî dikin. Rewşa vê çînê ya ji rastiya xwe ya civakî qutbûyî û daketî acentetiya hegemonya kapîtalîst, rewşa herî lawazbûyî ya heqîqeta civakê derdixe holê. Ji ber ku nikare heqîqeta xwe pêşde bibe, diyardebûyîna wê hê bêhtir neyênî dibe. Ne dikare şaristaniya Ewrûpayê bi temamî qebûl bike, ne jî şaristaniya navendî ya kevin dikare zindî bike. Hilweşîn û rizîn diyardebûna di vê navberê de mayî, teswîr dike. Çîna navîn û bajarên Rojhilata Navîn li ser çavkaniyeke mîna petrolê konjonkturel roj bi roj xwe xelas dikin, rewşa pirraniya wan tirsnak û giran e. Wer xuya ye ku piştî petrolê hilweşîn ê bêtir dijwar û bi êş be.

Ya ku maneya rastî dide civaka herêmê, jiyana civakî ya gund-cotkariyê ya li derdora panzdeh hezar salî ye. Tesfiyekirina vê jiyana civakî ya derfet û îmkan dayî şaristaniyeke navendî ya li derdora pênc hezar salî, wê ji texmînan wêdetir encamên hilweşîner bi xwe re bîne. Bi hêmanên modernîteya kapîtalîst a niha derengmayî re ji bo dema kin îmkanê îdarekirinê hebe jî her roja diçe rewşa bajêr û çîna navîn a bûye barekî nayê hilgirtin, wê timî tengezarî, pevçûn û şeran xwedî bike. Ev pêvajoya rojane diqewime, her roja derbas bibe wê tempo û giraniya xwe zêde û dewam bike.

Ji ber vê, bajarbûna bêbajar, kansêrbûna çîna navîn û hilweşîna civaka gund-cotkariyê bi tenê weke pirsgirêkên herî giran ên civakê dernakevin holê; ew her weha îfade dikin ku civak gihiştiye ber sînorê nikare dewam bike. Hêmanên modernîteya demokratîk li hemberî hebûna van pirsgirêkan û nikarîbûna dewamkirinê, bi tenê bi rola çareserkirina pirsgirêkan ranabe; dike ku civaka ketiye rewşeke teqinî û kaotîk jî gavê biavêje. Berê pêşî li civaka ekonomîk-ekolojîk xwedî derdikeve, li ser bingehê kominî civaka gund-cotkariyê ya kapîtalîzm û îndustriyalîzmê hilweşandiye ji nû ve hewl dide ava bike. Cotkariya ekolojîk hewcedariya civakê ya qût û zad deman dike û bi vî awayî beşekî mezin ê pirsgirêkan çareser dike. Belkî di cih de be ku mirov ji vê re bibêje ‘Duyemîn Şoreşa Gund-Cotkariyê’. Bi rastî bi sedsala 21. re hewcedarî bi duyemîn şoreşa gund-cotkariyê heye. Ev şoreş bi tenê bajêr rizgar nake, civakê jî ji

kansêrbûna bi çîna navîn diparêze. Faşîzma dewleta netewe ya li ser bajêr û çîna navîn hatiye avakirin çiqasî li ser vî bingehî qels bibe, şensê pêşketina civaka demokratîk wê zêde bibe. Bi rastî jî gelekî zor û zehmet e ku bêyî duyemîn şoreşeke gund-cotkariyê civak karibe dewam bike. Ev şoreş wê cihê teknolojî heq dike jî bidiyê û li hemberî texrîbatên îndustriyalîzmê, wê bergiriya wê bike. Bajar ji nû ve û di nava şertên pêşketîtir yên teknîkê de dikarin bigihîjin jiyana xwe ya berê ya bi heybet. Bi tenê wê ji şêniyên gelekî zêdebûyî xelas nebin; tevî vê wê bi civaka gund-cotkariyê ya bi awayekî manedar kêrhatî bûyî, karibe ji nû ve bikeve weznekê. Gund û bajarên ji nû ve avabûyî yên modernîteya demokratîk wê bibin mejî û du lingên têkûz û di weznekê de yên civaka demokratîk. Di warê dewlemendî û cûrbicûriyê de wê hevdu temam bikin û ji bo ji faşîzma civaka homojen a dewleta netewe bibihurin, wê zemînê rastî û bingehîn pêk bînin.

Hem şens û hem jî çarenûsa Rojhilata Navîn bi pêkhatina duyemîn şoreşeke gund-cotkariyê ve girêdayî ye. Zirar û ziyanên dused salên dawî yên modernîteya kapîtalîst ji krîzê jî wêdetir di asta hovîtiyê de ne. Modernîte li ser sêlingên xwe ne ku bi tenê hukim dike û mêtinkariyê dimeşîne, civakbûnê jî hildiweşîne. Çawa ku agir bi agir nayê vemirandin, rawestandina vê hilweşînê bi heman modernîteyê mumkîn nîne. Modernîteya demokratîk weke duyemîn şoreşa gund-cotkariyê bivênevê, divê bi pêş bikeve. Hê ji niha ve şerên li ser av-enerjî-erdan gihiştine astekê ku pêşîgirtina li wan bê îmkan bûye. Civaka Sumer karîbû li ser kolektîvîzma av û erdê rabe; dîroka mirovatiyê bide destpêkirin. Civakên Misr û Harappa jî welê ne. Îsraîla îro jî beşekî girîng ê hêza xwe ji kominên bi navê Kîbbûtz ên li ser bingehê teknolojiyeke hemdem avakirî, digire.

Di serî de li Dîcle-Firatê li ser tejaneyên erd-av-enerjiyê komikên civakê yên ekolojîk û ekonomîk wê bibin bingehê duyemîn şoreşa gund-cotkariyê. Li ser vî bingehî avakirina gund û bajarên hevdu temam dikin û bi hev re di weznekê de ne, wê rengê nû yê mîmariya modernîteya demokratîk pêk bîne. Komik û yekîneyên civakê yên ekonomîk, ekolojîk û demokratîk yên li ser vê mîmariya nû bi pêş bikevin, îndustriyalîzm û şaristaniya bajêr a

dewleta netewe wê weke avahiyên xweser ên demokratîk ji nû ve bilind bibin, serê xwe rakin. Li hemberî vê, gundê bi şert û mercên nû yên teknîkî re lihevkirî wê weke gundên ekolojîk bi ser duyemîn şoreşa xwe ve bibin. Duyemîn şoreşa bajêr û gund-cotkariyê wê di çanda Rojhilata Navîn de vê carê di bihurîna ji şaristaniya çînî-dewletdar û ketina serdema şaristaniya demokratîk de, wê bi rola xwe ya dîrokî rabe. Bi têgihiştina nasnameya nerm û serê wê vekirî, her cure nasnameya çandî di konfederasyona neteweyên demokratîk de bi awayekî aştiyane, wekhev û azad weke yek bi yek endamên civaka demokratîk wê cih bigirin. Ferdê ji aliyê çanda ferdperest a modernîteya kapîtalîst ve hatiye kuştin, wê weke ferdê exlaqî û polîtîk ê modernîteya demokratîk ji nû ve zindî bibe û bi awayekî azad bijî.

## 5- Pirsgirêkên Xwecihî û Herêmî û Çareseriya Neteweya Demokratîk

Bi qasî dewleta netewe di ti dema dîrokê de rejîmeke din a dewletê ya çanda xwecihî û herêmî hilweşandiye, nehatiye dîtin. Dewleta netewe bi tenê li beramberî dewleta bajêr, demokrasî û sîstema împaratoriyê û weke dijberê wan bi pêş neketiye. Belkî jî ji van herdu diyardeyan zêdetir bi tevahî xisletên nasnameyî yên xwecihî û herêmî bi qedexekirin, bi hilweşandin, bi dawerivandina hinavê xwe, hewl daye wan ji civaka dîrokî bibe. Tevî vê rewşê, împaratoriyên herî navendî jî timî guh dane huqûqê xwecihî û herêmî. Pê dizanîn ku ya xwecihî û herêmî dewlemendî ye, bi îhtîmam û girîngî hewl dane ku civak ji van neyên mehrûmkirin. Jixwe rêveberiyên herî navendî jî ya xwecihî û ya herêmî heta otorîteyên wan red nekin, li dijî wan nebûn ku bibin xwediyê rêveberiyên otonom ên bi erkên herî berfireh kemilandî. Dîroka şaristaniyê heta bi modernîteya kapîtalîst, dîrokek e ku bi awayekî nasnameyên xwecihî û herêmî dike esas. Her împaratorî û şaristanî, bi hêza qadên xwecihî û herêmî yên dibe xwediyê wan, diyar dibû.

Tevî ku dîrok ji tevahiya van nasnameyan pêk tê, dewleta netewe radibe wan înkar dike, hewl dide xwe homojen û weke otorîteya bi tenê, ava bike. Bêguman ev yek jî bi têkiliya wê ve ya sîstema mêtinkariyê ya jê re xizmetê dike, girêdayî ye. Kara herî zêde û meyla komkirina dewamî ya sermayeyê têdigihêje ku nasnameya xwecihî û herêmî çiqasî tesfiye bike, ewqasî jî wê xwe deman bike û bigihîje ewlekariyê. Dewleta netewe ya homojen bi tesfiyekirina çand û şikandina hêza xwecihî û herêmî îdea dike ku netewe bi hêz dike û yekîtiya çanda neteweyî pêk tîne. Ya pêk tê jî yekdestdariya mêtinkarî û hêza misteke olîgarkan e. Tevî ku yekîtiya çand û huqûqê weke amûrê rewakirina mêtinkarî û hêza vê yekdestdariyê bi kêr tê di nava xisletên bingehîn ên netewe û dewletê de tê hesibandin. Ji vê jî xeternaktir û wehîmtir, îdea tê kirin ku ji bo demokrasiyê jî homojeniyeke bi vî rengî şertekî îdeal e. Weke şertê giştî yê koletiyê mirov dikare maneyekê bide vê yekê. Eger demokrasî xwe birêvebirin û îfadekirina azad a xwecihî û herêmî nebe, hingê mirov çawa dikare wê pênase bike? Eşkere ye, eger şertên neteweya homojen weke bingeh werin qebûlkirin, demokrasî nayê avakirin. Heta ya ferdî, ya xwecihî û ya herêmî xwe îfade neke û berjewendiyên xwe yên çandî neparêze, demokrasî wê pêk neyê. Neteweparêziya bi destê dewletê çiqasî înkara demokratîkbûna ferd, ya xwecihî û ya herêmî be, neteweparêziya demokratîk jî berevajiyê wê ewqasî demokratîkbûna ferd, ya xwecihî û ya herêmî ye.

Di çanda Rojhilata Navîn de ya xwecihî û herêmî di her dema dîrokê de nasname û huqûqa xwe bi hêz parastiye, xwedî lê derketiye. Di tevahiya sîstemên şaristaniyan de rêz ji nasnameyên xwecihî û herêmî re hatiye girtin û cih dane huqûqê wan. Tesfiyekirin û tine hesibandina nasname û çandan di rêveberiyên herî despotîk de jî weke siyasetekê, heta dawiyê nehatiye meşandin. Kirinên bi vî rengî ji nîzama tesfiyê ya ferdî û malbatî zêde nebihurîne. Em dibînin ku bi awayekî sîstematîk tesfiyekirina xwecihî û herêmî careke din rengê faşîst ê dewleta netewe piştrast dike. Di dused salên dawî yên herêmê de dewleta netewe her ku bi hêz bû tesfiyekirina xwecihî û herêmî jî di zikhev de pêk hat û ev jî rastiya em behsa wê dikin, nîşan dide. Bi tenê şerên ji bo pêkanîna dewleta netewe ya

Iraqê û şerên li dijî wê ji bo bêrehmiya sîstemê û tinekeriya wê têra xwe delîl û ispat e. Eger derfet û îmkan hatiba dayîn ji bo xwecihî û herêmî bi awayekî demokratîk xwe îfade bikin, belkî jî dewlemendiyeke çandî ya maddî û manewî ya ji Swêdê bihurî, pêk bihata. Şerê Iraq hê jî di navê de ye, der barê çaresernekeriya modernîteya kapîtalîst, zirardayîn û tinekeriya wê de bi gelek dersan tijî ye.

Hêmanên modernîteya demokratîk sîstematîkek in ku têde herî zêde ya xwecihî û herêmî girîng dibin, esas digirin. Hêmanê civaka exlaqî û polîtîk diyardeyek e ku li xwecihê pêk tê. Hêmana civaka ekonomîk, bi giranî xwecihî û herêmî ye. Herçiqasî rewşa wê ya di nava netewetî û navnetewetiyê de hebe jî li ser bingehê xwebihêzkirinê radibe. Civaka ekolojîk hêmanek e ku jixwe her tim û li her deverê li qada xwecihî bi mane dibe û tê pêkanîn. Civaka demokratîk di serê wan hêmanan de tê ku li ser komikên xwecihî pêk tê. Hêmana ferdê ji xwecihî û herêmî qut, ji aliyê nasnameyê ve bi qasî ku qels e, ji heqîqetê jî mehrûm û bêpar e. Berevajiyê wê jî çiqasî çanda xwecihî û herêmî temsîl bike, nirxa wî/wê ya heqîqetê jî ewqasî bilind e. Neteweya demokratîk eger karibe derfet û îmkanê bide nasnameya ferdî, xwecihî û herêmî bi awayekî azad xwe îfade bikin, hingê pêk tê.

Neteweyên xwediyê nasnameyên pirrçandî û cihêreng biqasî ku meyldarê demokratîkbûyînê ne, ewqasî jî li gorî dewlemendî û aştiyê ne. Di civaka Rojhilata Navîn de eger şensê demokratîkbûnê bide xwecihî û herêmî, eşkere ye ku wê beşekî mezin ê pirsgirêkan bi hêsanî bê çareserkirin û li dawiyê bê hiştin. Tevî ku rêûresma dîrokî jî vê rastiyê timî destnîşan dike, dewleta netewe ya bûye bela li hemberî dîrokê xwe kerr dike. Bi berçavkên xwe yên homojenîk ên hespan her li dîrokê dinêre, dewlemendiya mezin tekreng dibîne û dike tekreng bê dîtin û encama vê jî faşîzm û înkara rastiya civakî ye.

Di civaka Rojhilata Navîn de hêmanên çanda xwecihî û herêmî zêde û di zikhev de ne. Modernîteya demokratîk weke kirin, bicihanîn û teorî çareseriyên mayînde ji vê rastiya wê re pêşkêş dike. Rastiyên xwe bi

îfadeya azadiyan çiqasî veguherînin heqîqetê, weke civak û ferd wê di nava aştiyê de zêdetir şensê jiyaneke wekhev û azad bi dest bixin.

## 6- Li Rojhilata Navîn Jin, Xanedantî, Malbat, Pirsgirêka Şêniyan û Şoreşa Jinê

Di dema şeveqavêtina dîrokê de bi nasnameya xwe ya civakî ya bi heybet, jina ku rola dayik-xwedawendiyê bi xwe ve danî, mixabin di Rojhilata Navîn a roja me ya îro de daxistin rewşa metayeke herî bêqîmet û bênirx. Ev dîroka ku diviyabû bi serê xwe çîrokeke wê ya trajîk hebûya, em zêde nikarin wê bînin ziman û ji derfetên vê yekê mehrûm in. Lê em dikarin encamên wê rexne bikin. Ewrên ji mijê yên bi destê mirov li dora jinê hatine çêkirin, divê ji hev bêne belavkirin û bi vî awayî keşifkirina rastiya wê, yek ji erk û wezîfeya pêşî ya lezgîn a civakî ye.

Divê ez eşkere diyar bikim ku ez analîzên der barê cinsperestiya civakî de pozitîvîst dibînim. Ez yeqîn nakim ku em karibin bi nêzîkatiyên objektîv ên seresere û çor mijara jinê analîz û çareser bikin. Nexasim em bi şîfreyên koletiyê yên dawerivandine hinavên jinê nizanin. Ez yeqîn dikim ku pirr zêde bi zêhniyeta fallus-vajînayê hatiye kirin û ev zêhniyet qabîliyetên din ên mirovî kotrimî dike. Di vê babetê de nuqteya balê dikişîne ew e, di cîhana nebat û heywanan hemûyan de diyardeya têkiliya cinsî ya şêwe, dem û fonksiyona xwe ya diyar heye, li cem cinsê mirov ev şêwe, dem û fonksiyon ketiye rewşekê ku zêde hatiye dejenerekirin. Ji sedî sed diyar e ku çavkaniya dejenerebûnê civakî ye. Ya rastî, mirov dikare bibêje; bi derketin û giştîbûna pirsgirêka civakî (zordestî û mêtinkarî) bi pêş ketiye. Ji ber ku civaka dayikê ji her alî ve ji hev hatiye xistin, pirsgirêka jinê pirsgirêka sereke ya civakê ye. Ji bo pênaseyeke rast, bi vî awayî destnîşankirina pirsgirêkê hewce ye.

Di mijara jinê de mirov dikare li egoîstî û çavkoriya zilam weke diyardeyeke rojane, her saetê çav bidêre. Di vê babetê de zilamê ji her tebeqeya civakî, bêyî ku rêzikeke huquqî û exlaqî nas bike, çavê xwe

namiçîne dikuje, qetil dike. Ma kesê xwedî wijdan dikare vê rastiyê nebîne. Helwestên hov ên bi vî rengî jî pirranî li ser navê eşqê têne nîşandan. Ji ber ku têkiliya eşqê bi heqîqetê re kêm zêde hatiye şîrovekirin, yekser wê bê fêhmkirin ku vegotineke bi vî rengî dereweke herî rezîl e. Çi di cîhana heywanan çi jî di ya nebatan de û heta di cîhana fizikî ya em weke 'bêcan' bi nav dikin de çi kirdareke dibe mijara eşqê, nakeve nava hewldaneke bi vî rengî. Herçiqasî hin jirêderketinên hê nehatine analîzkirin bêne dîtin jî eşkere ye ku li cem cinsê mirov sedem û maneyên kuştin û cinayetiyên bi vî rengî, gelekî cuda ne. Berê pêşî divê mirov têkiliya van kuştin û cinayetan bi serwerî û mêtinkariyê re weke yek ji xusûsên sereke destnîşan bike.

Pirsa bingehîn a divê bê kirin ev e, zilam çima di mijara jinê de evqasî hesûd, çavnebar, tehekumkar û kujer e, çima tevahiya bîstûçar saetên rojê ji rewşa xwe ya destavêtinê nagere. Bêguman destavêtin û tehekum têgînên îstîsmarê yên civakî ne. Rengê civakî ya diqewime îfade dike, hiyerarşî zêdetir bavikparêziyê û desthilatdariyê bi bîr dixin. Maneyeke wê ya din a kûrtir, xiyaneta li hemberî jiyanê îfade dike. Girêdana pirralî ya jinê bi jiyanê re dikare helwesta cinsperestiya civakî ya zilam zelal bike. Cinsperestiya civakî, bi bandora cinsperestiya diqedîne û kor dike jidestdana dewlemendiya jiyanê, helwesta bi hêrs, tecawizkar û hakim a ev yek dibe sedema wê, îfade dike. Têkiliya xerîze û ajoya cinsî bi domdariya jiyanê re eşkere ye. Lê mirov nikare bibîne ku ti zindî û ruhber bîstûçar saetan ji aliyê cinsî ve dewamî birçîye û xwediyê vê zêhniyetê ye. Eşkere ye ku jiyan bi tenê ji têkiliya cinsî pêk nayê. Berevajî, mirov dikare bibêje têkiliya cinsî bi awayekî kêliya mirinê ye, ya rastî li dijî mirinê pêngaveke kujer a jiyanê ye. Ango mane ev e; çalakiya cinsî çiqasî zêde be, ewqasî jiyan ji dest tê dayîn.

Ez nabêjim çalakiya cinsî bi tevahî kujer e. Îdeala bêserûbinî ya jiyanê jî di nava xwe de hildigire. Lê ev îdeal, jiyan bi xwe nîne. Berevajî, li dijî tirsa mirinê tevdîrek e ku mirov dikare bibêje zêde qîmeta xwe ya heqîqetê nîne. Mirov dikare vegotinê welê zelal bike: Gelo dubareyên xelekên jiyanê girîng in, yan jî weke tekxelek ew bi xwe girîng e? Piştî ku heqîqeta ya

tektam hat îfadekirin, dubarebûna bêserûbinî ya xelekê zêde maneyê di nava xwe de nahewîne. Eger bihewîne jî ev ji hewcedariya xwe gihandina ‘agahî-zanîna mutleq’ e. Di vê rewşê de xelek çiqasî xwe baş nas bikin, pêdiviya bi agahiya mutleq jî wê ewqasî hatibe tedarikkirin, hingê jî xelek ango zêdebûna cinsî zêde qîmet û maneya xwe namîne.

Ji van nirxandinên kurt encama mirov dikare derxe ew e ku ji dema dayikî û vir ve, jin di nava sîstema bavikan de bi awayekî sîstemîk û sazî bi mêtinkarî û zordestiyeke civakî re rûbirû bûye. Koletiya jinê bi qasî ku bi ti şêweyê koletiyê re mirov nikaribe bide berhev, tevlîhev û heyatî ye. Di nava dîroka şaristaniyê de bazarên koleyan ên jinê, cariyetî û saziyên hareman belkî hinekî diyardeyê nîşan bidin. Lê kirinên modernîteya kapîtalîst li ser jinê ewqasî zêdebûne, hed û hesabê xwe nînin. Ti şaristaniyê bi qasî kapîtalîzmê bi jinê nelîstiye û îstîsmara xwe li ser bi sazî nekiriye. Diyarde ewçend hatiye îstîsmarkirin, pirraniya jinan, kirinên ew xistine rewşên herî rezîlane, weke xisletên bingehîn ên nasnameya jinê nîşan didin. Ne tenê ev, dekûdolab li ser serê wê tê gerandin û ew xwe weke parçeyekî destê vê dekûdolabê digerîne, qebûl dike û ew wer ketiye dest, ji gerandina vê dekûdolabê ti fikarê nake. Em bi tenê behsa mêtinkarî û zordestiyeke diyardeyî nakin. Koletiyeke dawerivandine her şaneyên jiyanê, weke şêweyên deng, reng, beden û zêhniyetê bêxem û fikar bi dilê xwe pêşkêş dike. Hay ji xwe nîne têkiliya xwe ya bi heqîqeta civakî re ji dest daye û kirine ku bi tenê jiyaneke li ser dikê tê lîstin be. Ya rastî, vê îmkanê jî nabîne. Ji bo bidestxistina heqîqet û rûmeta jiyanê, ji hev belavkirina mija li dora jinê, bi tevahî girîngiya xwe diparêze.

Tevî ku rastiyek e ku bêyî jinê jiyan nabe, lê eşkere ye ku bi jineke evçend hatiye xistin jî jiyaneke manedar û rûmetdar nayê parvekirin. Jiyana bi jina heyî re her kes û giştî heta bi qirika xwe ketine nava koletiya herî rezîlane; bi vê zanîn û têgihiştinê divê mirov çareserker û çalak be, wê ev bibe rêya rast a rizgariya jiyanê. Divê mirov ti carî ji bîr neke ku bi jinê re jiyaneke bi mane û bi anor bi zanyartî û hozantiyeke mezin dibe. Yên îdeaya xwe ya eşqê hene, divê kêliyekê jî ji bîr nekin ku bicihanîna vê eşqê, bi çûyîna di rêya vê zanyartî û mezinahiyê de ye. Naxwe bi awayekî din

meş û çûyîn bi eşqê re xiyanet e, û ji koletiyê re xizmet e. Mirov heta xwe negihîne heqîqeta civakî, nikare bigihîne eşqê.

Di çanda civakî ya Rojhilata Navîn de bi belge û delîlên xurt piştrast bûye ku nîzama dayikê pêk hatiye. Piştî vê nîzama bavikanî (ji salên 5000 B.Z. ve her bi pêş ketiye) ceribandina sîstema îstîsmar û zordestiya pêşî îfade dike. Şoreşeke bi kok a li dijî jinê ye. Mal û zarok dikevin bin serweriya mêr ango saziya bavtiyê. Ji ber ku rê li nîzama muhafezekarî, zordestî û îstîsmarkariyê vedike zêdetir dijşoreş e. Wer xuya ye ku bûyîna xwediyê gelek zarokan nîzama pêşî ya mal e. Çiqasî zarok zêde bibin hêz, mal û milkiyet jî ewqasî zêde dibin. Têkiliya bavikantî û xanedantiyê bi milkiyetê re eşkere ye. Xanedantî saziya malbatê ya herî berfireh e; ji klanê mezintir e, hay ji xwe çêbûye û milk nas kiriye. Şêweyê pêşî yê baviktiyê ye. Bi paşveketina xwedantiya jinê li ser mal û zarokan re parelel dimeşe. Çanda dayik-xwedawendê şûna xwe ji çanda qral-xwedayên zilam re dihêle. Di çanda Sumeran de mirov van bûyeran bi awayekî balkêş dikare bibîne. Tevahiya dîroka şaristaniyê zewac û saziya malbatê di bin bandora modela xanedantiyê de bi pêş dikeve. Ji ber ku xanedantî weke yekdestdariya desthilatdariyê û îdeolojiya mêrê serwer hat qebûlkirin an jî dan qebûlkirin, zewacên serdest neçar man otorîteya bav nas bikin. Bi kurtî, saziya malbatê ya xwe dispêre xanedantî û zilam xwezayî nehatiye avakirin, belê nîzamê mîkro yê otorîter û îstîsmarkar ê avakirî ye.

Modernîteya kapîtalîst ev nîzam hê zêdetir pêşde biriye. Di qada huqûqî de nîzamname û sererastkirinên qanûnî yên ji bo başiya jinê hatin kirin ji bicihanîna wekheviyê dûr in. Serwertiya zilam di bin mohra şaristaniyê de zewac pêşde bir, ji lewra mirov dikare wê weke saziyeke civaka cinsperest rewa dike, pênase bike. Hiyerarşî, desthilatdarî û yekdestdariya dewletê xwe di komika xwedî rengê şaneya civakî û herî zêde de nîşan dane. Di navbera wê bi xwe, bi awayê xuya dike û rewakirina wê de nakokiyeke sergirtî heye. Di şexsê jinê de saziya herî baş koletiya giştî ya civakê kamûfle û şapinêz dike, saziya zewacê ye. Pêvajoya pîrekkirina jinê (piçûkxistin, rezîlkirin, dûvikê zilam) dikin bingeh û civakê jî gav bi gav dikin pîrek. Koletiya zilam piştî pîrekkirina jinê û bi wê re di zikhev de

hatiye meşandin. Koletî û pîrektiya li ser jinê hatî ceribandin û encamgirtî, paşê bi zilam û çînên bindest dan qebûlkirin. Ev pêvajoya bi şaristaniyê re bi pêş ket bi modernîteya kapîtalîst re derket asta herî jor û bilind. Faşîzm di pêvajoya pîrekkirina civakê de xwedî maneyeke taybet e. Civaka teslîmgirtî îfade dike. Modernîte civaka giştî ya pîrekbûyî îfade dike; ango her kes hatiye xesandin, qabîliyeta xwe ya parastin û bergiriyê ji dest dane, her kes êdî zilam û pîreka hev in. Komkirina sermayeyê ya dewamî bûyî, êdî wê bi awayekî din bi qasî keys û firsendê nede civakê, êrişkar û hov bibe. Zewac ew qad e ku lê destavêtin û koletî bi navê namûsê hem tê rewakirin hem jî hûrûkûr tê bicihanîn.

Ya maskeya rûyê modernîteyê tîne xwarê, dîsa rewşa îflasê ya malbatê ye. Di şaristaniya Rojava de îflasa malbatê bi tenê qelsbûna têkiliyên civakî nîşan nade; nakokiya bi civakê re, rewşa kaotîk û krîzê jî bi kûrahî nîşan dide. Çawa ku koletiya jinê asta koletiya civakî diyar dike, rewşa kaotîk a di têkiliyên mêr-jinê de jî rewşa kaotîk û nakokiya modernîteya kapîtalîst a roja me ya îro nîşan dide.

Cinsperestiya civakî têgîneke bi desthilatdariya di têkiliyên mêr-jinan de bi sînor nîne. Desthilatdariyeke di her astê de li civakê belavbûyî, îfade dike. Desthilatdariya dewletê ya bi modernîteyê herî mezinbûyî nîşan dide. Ti obje bi qasî jinê tehrîk nade kirin û ji bo desthilatdariyê nabe mijar. Jin weke hebûneke kirine obje, xwedî wan xisletan e ku desthilatdariyê herî zêde bike. Timî di rewşa tehrîkkirin û pirrkirina desthilatdariyê de tê hiştin. Mirov di vê çarçoveyê de têkiliya jinê bi desthilatdariyê re analîz bike, ji bo eşkerekirina heqîqeta wê girîng e. Her zilam bi zêdeyî xwedî wê zêhniyetê ye ku hêrsa xwe ya desthilatdariyê li ser jinê pêk bîne. Heman zêhniyet weke hêrsa desthilatdariyê ya cinsê jinê ya li ser jinê û li ser zarokan pirrtir dibe û tê bicihanîn. Vê carê jin dibe gurê jinê. Bûyera jê re reaksiyona zincîrwarî tê gotin, ev e. Rola jinê di sîstema kapîtalîst a mêtinkariyê de gelekî bêhtir dest dide û eşkere ye. Ji bo sîstemê, bi tenê zarokan bêheq nayîne û mezin nake, bi heqdesteke herî kêm baz dide her kar û suxreyî. Li ser artêşa bêkaran di pozîsyona zextê û timî kêmkirina sîstema heqdestan de tê girtin. Cihê xemê ye, tevî ku

xwediya keda bi cewr û cefayê ye, Marksîst jî di navê de, ti doktrînê hewce nedîtiye behsa ked û mafê jinan bike. Ji bo vê, analîzên hewce û helwesta polîtîk pêşde nabe. Nîşaneyeke din a berfirehiya cinsperestiya civakî ya serweriya zilam piştrast dike, der barê keda jinê de ye.

Demografya, pirsgirêka şêniyan, ji pirsgirêka çînî qat bi qat zêdetir ji bo dinya û civakê tehlûke ne. Pirrbûna şêniyan ji nêz ve bi civaka cinsperest û modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Bîstûçar saetên rojê xwesteka cinsî ya natemire, çanda xanedanî û malbatê, polîtîka kapîtalîzm û dewleta netewe ya ji bo kara herî zêde û hêzê bi xwe re bend û sukurên li pêşiya pirrbûna şêniyan diteqîne, radike. Wexta ku alîkariya teknîk û tibbê li vê bê zêdekirin, rastiya derdikeve holê, ji aliyê dewamkirina civak û hawîrdorê ve rewşa herî bi tehlûke îfade dike. Kaosa demografîk bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Dinya me û hawîrdor ji mêj ve hecmê wê yê heyî (eger zêdebûna şêniyên 6,5 mîlyar bi vî awayî dewam bike) gihiştiye wî sînorî ku nikare barê wê rake. Ji vî alî ve jî nirxandina îflasa sîstemê girîng e.

Divê mirov baş zanibe ku jin weke amûreke zarokanînê xistine bin barekî xeternak û xwelêragirtina wê gelekî zehmet e. Ji bûyîna xwediyê zarokan wêdetir, çavkaniya pirsgirêkê sîstemeke nanozikê û suxrekar a girankirî ye. Herweha divê mirov baş zanibe ku zarokanîn ne biyolojîk e, diyardeyeke sîstemwarî û çandî ye. Her zarok ji aliyê çanda heyî ve ne carekê, gelek caran tê maneya mirina jinê. Çandeke zarokanînê hewce ye ku qîma xwe bi hindikî bîne, bi tevahî tevdîrên tenduristiyê bigire û beriya her tiştî divê ji aliyê zêhnî ve ji bo zarokanînê hatibe amadekirin. Fikra hêzê û bêserûbinîbûnê ne bi rêya zarok, divê mirov bisipêre agahî-zanîna mutleq û bedewiyê, gihiştina civaka exlaqî û polîtîk, eger mirov bi van xusûsên pêştir, gihandina zarokan bi awayekî yekpare analîz bike, wê hê manedartir û baştir bibe. Xulase, divê mirov mezinkirin û gihandina zarokan li gorî pêdiviyên civaka ekonomîk û ekolojîk û li ser bingehê felsefeya azadiyê analîz û çareser bike.

Sîstemê ji mêj ve şensê xwe yê sererastbûnê bi reforman ji dest daye. Ya pêdivî pê heye 'şoreşeke jinê ye' ya ku wê li tevahiya qadên civakî were meşandin. Çawa ku koletiya jinê koletiya herî kûr e, divê şoreşa jinê jî bibe

şoreşa herî kûr a wekhevî û azadiyê. Şoreşa jinê divê hem di teorî û hem jî di çalakiyê de gavên bi kok biavêje. Beriya her tiştî li dijî îdeolojiya cinsperest şerekî dewamî û dijber hewce dike. Şoreşa jinê ferz dike ku li dijî zêhniyeta destavêtin û tecawizkar a bîstûçar saetên rojê li ser kar e, di warê exlaqî û polîtîk de jî şer were xurtkirin. Ji bo şoreşa jinê, divê diyardeya zarokanînê ya bi armanca mêtinkarî û desthilatdariyê were mehkûmkirin û redkirin. Şoreşa jinê ferz dike ku îradeya zarokanînê bi temamî ji jina azadbûyî re were hiştin. Divê di îdeolojiya xanedantî û malbatê de şoreş pêk bê. Herçî ya herî girîng jî divê mirov ji felsefeya heyî ya jiyana bi jinê re, belkî jî ya ji vê rastir, ji vê bêfelsefetiyê bibihure. Divê mirov hêza jiyanê, bi jinê re ne di têgihiştina zarokanîn û amûra têrkirina xwestekên cinsî de, weke tayê herî xurt ê dostaniyê, hevaltiyê û civakbûnê di afirandina bedewî, sedaqet, aştî û esaletê de ji bo parvekirina bi awayekî azad û wekhev bibîne.

Bêguman bi jinê re parvekirina jiyaneke azad û wekhev, hewce bi zanyartiya beramber bi heqîqeta civakî ya mutleq rast dimeşe, heye. Eşqa rastî bi tenê di tewazuna hêzê ya heqîqeta civakî de bi beramber hev, dikare pêk bê. Bi kesayetên bi koletî, destavêtin û desthilatdariyê bûne, eşq ti carî pêk nayê. Îflasên malbatan û ezmûnên serneketî yên dewamî û zêde pêk tên, vê rastiyê piştrast dikin. Heger jin jî herî kêm bi qasî mêr bibe xwediyê hêza civakî û zanyartiyê, hingê dibe ku evîn û xweşikî, bi awayekî azad û wekhev di nava aştiyê de û bê desthilatdarî çêbibin û bi parvekirinê pêk werin. Roja me ya îro ferz dike ku şoreşa jinê ya sedsala 21'ê li pêş were girtin. Slogana “Yan jiyan an jî barbartî” vê şoreşê ferz dike.

Civaka Rojhilata Navîn bi qasî ku hewcedariya xwe bi duyemîn şoreşeke gund-cotkariyê heye, ewqasî hewcedariya xwe bi duyemîn şoreşeke jinê heye. Şoreşa jinê, dayiktiya neolîtîkê ye. Ya rastî, şoreşa neolîtîk a muhteşem şoreşeke jinê bû. Şoreşa neolîtîkê şoreşek e ku hê jî mirovatî bi mîrateya wê debara xwe dike. Ev dij-şoreşa mezin a ku li ser bingeha dij-şoreşa baviktî, şaristanî û modernîteyê civaka xwezayî bi paş ve xist, bû encama koletiya herî kûr a jinê û ev li tevahiya civakê belavkirî, di roja me

ya îro de li qadên civakî hemûyan di nava rewşa xwe ya kaotîk û krîza sîstematîk de ye, ji hev de dikeve. Mirov fêhm dike ku ya li ser jinê tê ferzkirin xiyaneta bi jiyanê re ye. Eger jiyan tê xwestin, divê berê pêşî di tewazuna hêzê ya zanyartiya beramberî de ji nû ve bi jinê re di çêkirina hisên bedewî û mezinahiyê û parvekirina wan de bi ser bikeve. Divê mirov vê rastiyê ava bike û xwe bigihîne heqîqeta wê. Di vê mijarê de divê tek û gerdûnî, ango jin û mêrê berbiçav, mêr û jintiya mucered a îdeal di zikhev de pêk bên. Ji bo pêkhatina vê jî divê îrade û têgihiştina wê bê pêkanîn. Weke milk û weke xwedî divê mirov hevdu ji binî ve biterikînin. Li şûna namûsa rêûresm û kevneşopiyê divê mirov balkêşbûna kesayeta esîl û bedew pêk bîne.

Eger şoreşeke jinê ya bi kok, ango di jiyan û zêhniyeta mêr de guhertin çênebin, rizgariya jinê mumkîn nîne. Ji ber ku heta jina bi xwe sereka jiyanê ye rizgar nebe, jiyan timî wê weke leylan û serabekê pêk bê. Heta mêr bi jiyanê re jiyan jî bi jinê re li hev neyên anîn, şadûmanî û bextewarî jî wê tim xeyaleke tewş bin. Ji bo jinê û jiyana azad rastiyên civakî bê sînor in. Civaka Rojhilata Navîn û jina wê, bi şaristaniya bihurandî û bi moderníteya li fetha wê rast hat, çiqasî karibe bê xistin ewqasî hat xistin, ew bi xwe êdî ew nîne, ew xistin rewşa objeyekê. Mirov pirsgirêka civakî bi diyardeya jinê analîz bike û bi heman diyardeyê li çareseriyê bigere, rêbazeke rast e. Eger mirov şoreşa jinê ku çareseriya dayikan e, li ser dayika pirsgirêkan ferz bike, hingê dikare gav bi gav bigihîje heqîqetê.

Moderníteya demokratîk di pirsgirêka jinê û şoreşê wê de bi îdeal û bi çalakî ye. Di çarçoveya hêmanên moderníteya demokratîk de bêyî jinê nabe ku proje bêne amadekirin û bi cihanîn. Berevajî, ev şoreşên welê ne ku di her gava xwe de bi parvekirina zanyartî û çalaktiya bi jinê re pêk tên. Tevî ku ji bo avakirina civaka ekonomîk hewcedarî bi pêşengiya jinê heye, ji nû ve avakirina wê jî hewcedariya xwe bi hêza jinê ya kominî heye. Ekonomî pîşeyê civakî yê jinê bi xwe ye, çalakiya wê ye. Ekolojî zanistek e ku bi tenê bi hestyariya jinê dikare bigihîje civakê. Jin weke nasname, hawîrdorparêz e. Civaka demokratîk civakeke welê ye ku hewcedariya

xwe bi îrade û zêhnê azad ê jinê heye. Eşkere ye ku modernîteya demokratîk serdema şoreşa jinê û şaristaniya wê ye.

## 7- Divê Mirov Çawa Bijî, Çi Bike û Ji Ku Dest pê bike?

Di çanda Rojhilata Navîn de heqîqet û di rêya wê de mirin û jiyîn têgînên girîng in. Di çanda Ewrûpayê de ev têgîn weke dualîteya teorîk-pratîk tê nîşandan naverok û cewherê wê hatiye pûçkirin, parçekirin û yekparebûna xwe ji dest daye. Di modernîteya dereng de ev xusûs hê bêtir diyar e. Heqîqet mehkûmê ekonomîzmê hatiye kirin.

Gera li heqîqetê herî zêde wexta pirsgirêkên civakî serî rakirine, ketiye rojevê. Di van deman de vegotinek û çalakiyekê ji sedî sed hewl daye xwe weke heqîqetê pêşkêş bike. Analîza sosyolojîk a heqîqetê, têkiliya wê ya bi neheqiyan re eşkere datîne holê. Desteserkirina ked û nirxa civakî weke neheqiyê hatiye pênasekirin, ji lêkolînkirin û bi cihanîna pêdiviyên wê re jî xebatên heqîqetê hatiye gotin û tim hatine mezinkirin, bilindkirin. Mirov neheqiyê bi heq re, heq jî bi xwedê re wekhev bike, ev yek têkiliya civakî ya van herdu têgînan nîşan dide. Têgîna xwedê ji bilî muceredkirina metafizîkê bi vî awayî têkiliya wî bi wijdanê civakî re careke din tê piştrastkirin.

Ketina ser rêya heqîqetê, bi xwe re hesabpirsîna ji neheqiyê jî tîne. Nasnameya civakî ya xwe weke hebûna xwedayê herî mezin pêşkêş kiriye, bi vî awayî bersiv daye neheqiyên li hemberî xwe û weke cezayê xwedê ew mehkûm kirine. Ji hundirê civakê û ji xwezaya derveyî wê gef û neheqî çiqasî li ser nasnameya civakî zêde dibin, destnîşankirina nasnameyê jî ewçend zêde dibe, ji bo wê nezerî (nêrîna xwedayî = teorî) û çalakiyên mezin (karên xwedayî) hatine pêşxistin. Ji ber van sedeman gelekî girîng e ku mirov serwext bibe, di çavkaniya dîn û felsefeyê de nasnameya civakî heye. Ji lewra li devereke din gera li çavkaniya dîn û felsefeyê hewldaneke tewş û badilhewa ye.

Di hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst de yek ji armancên sereke ew e, rastiyên civakî dîrokî yên der barê têgîna heqîqetê û çalakiya

wê de tarî bike û bitepisîne. Dîn û felsefe kirine amûrên welê ku pê milletperestiyê mezin dikin û dewleta netewe dikin xwedê. Di têgîn û kirinên dewleta netewe yên tên mezinkirin û nemirkirin de dor li teorî û pratîkê tê girtin. Zanist di bin ferman û rêveberiya felsefeya pozîtîvîst de xistine rewşekê ku pirsgirêkên ji sêlingên modernîteyê çêdibin analîz û çareser dike. Şervaniya heqîqetê ya bi qasî dîroka mirovatiyê kevn, berê wê dane peydakirina berjewendiyên besît û sivik. Pirsgirêka bingehîn ew e, gefên li nasnameya civakî têne xwarin mijara heqîqetê ne, lê ev yek ji mijara wê derxistine û hewl dane li şûna wê ferdperestiyê bi cih bikin. Di vê çarçoveyê de mafê mirovan hatiye îstîsmarkirin. Fikrên dijberê sîstemê yên xwe weke îdeolojiyên rastparêz pêşkêş dikin jî newêrin ji paradîgmaya modernîteyê bibihurin û xwe nêzî vê yekê nakin. Lîberalîzm weke îdeolojiya fermî ya sîstemê li ser rastgir û çepgiran yekdestdariya xwe heta roja me ya îro karîbû dewam bike.

Lîberalîzmê weke yekdestdariya îdeolojîk a modernîteyê ji aliyekî ve enflasyona fikrê diafirîne, ji aliyê din ve jî tevî ku şêlandina herî mezin di enflasyonê de dike, di enflasyona fikrê de ya herî bi kêra wê bê bi kar tîne û bi rêya medya xwe, zêhnan bombebaran dike û hewl dide encama herî zêde bi dest bixe. Têkûzkirina yekdestdariya fikrê, armanca dawî ya şerê wê yê îdeolojîk e. Sîlehên wê yên bingehîn dînperestî, milletperestî, cinsperestî û weke dînê pozîtîvîst zanistîperestî ye. Bêyî hegemonya îdeolojîk, bi tenê bi zordestiya siyasî û eskerî meşandina modernîteyê mumkîn nîne. Lîberalîzm bi rêya dînperestiyê hewl dide civaka beriya kapîtalîzmê kontrol bike, bi rêya milletperestiyê hemwelatîbûna dewleta netewe û çînparêziya li dora kapîtalîzmê pêş dikeve, kontrol dike û di bin destê xwe de digire. Hedefa cinsperestiyê ew e, nehêle jin bêhna xwe bide. Fonksiyona bi bandor a îdeolojiya cinsperestiyê ew e, hem mêr bike nexweşê desthilatdariyê, hem jî jinê di bin hisa destavêtinê de bihêle. Bi zanistîperestiya pozîtîvîst cîhana akademîk û ciwanan bê tesîr dike û nîşanî wan dide ku ji bilî yekbûna wan bi sîstemê re, ti alternatîfa wan nîne û di berdêla tawîzan de yekbûna wan bi sîstemê re misoger dike.

Li hemberî êrişên îdeolojîk ên lîberalîzmê divê bi lez bersiv bê dayîn pirsên; divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku dest pê bike. Bersivên dijberên sîstemê dane van pirsan herî kêm heta roja me ya îro bê tesîr hatine kirin. Bersivên modernîteyê dane van hersê pirsên girîng, bi tesîr bûne. Şêwazê jiyanê yê modernîte pêncsed salên dawiyê pêk tîne, bi giranî mohra xwe li pirsa 'divê mirov çawa bijî' daye. Di serdema modernîteyê de bi qasî ku di ti serdema dîrokê de nehatibe dîtin şêwazên jiyanê welê dane qebûlkirin û dawerivandine hinavên mirovan, ew homojen kirine. Qalibên jiyanê yên herkesî di bin navê rêzik û pîvanên gerdûnî de tektîp kirine. Cudahî û cihêrengî li hemberî tektîpkirinê zelûl in. Serîrakirina li ber şêwazê jiyanê yê jê re jiyana modern tê gotin, yekser mohra 'dînîtiyê' lê tê xistin û bi surgûnkirina derveyî sîstemê tê mehkûmkirin. Kêm kes diwêrin serîrakirina li hemberî vê surgûnê û gefxwarina wê dewam bikin.

Pirsa 'divê mirov çi bike' jî ji mêj ve, pêncsed sal e ku kitebikite bersivên wê hatine dayîn: "Tu yê ferdî bijî, timî li xwe bifikirî, 'rêya bi tenê rêya modernîteyê ye' tu yê bibêjî û ya dikeve ser milê xwe bi cih bînî. Rê diyar e, usûl diyar e: herkes çi dike tu yê jî weke wan bikî. Eger tu patron î, divê tu karê bikî. Eger tu kedkarî divê tu li pey heqdestekê baz bidî, bibezî. Wekî din li pey tiştên din ên divê bêne kirin bazdan û bezîn ehmeqî ye." Eger israr û serhişkî bê kirin encam avêtina derveyî sîstemê ye, bêkar hiştine, bêçare hiştin e, rizandin e. Jiyan kirine bezeke bi tehlûke ya hesp û bergîran. Bihêlin bersivdayîna pirsa divê mirov çi bike, ji bo bersiva pirsa divê mirov ji ku dest pê bike, sîstem weha dibêje "Ji cihê ku tu yê xwe baş perwerde bikî, dest pê bike." Ji bo serketina di nava sîstemê de dibistan û zanîngeh mekanên destpêkirinê ne ku dest ji wan nabe.

Li hemberî sîstemê, gera li heqîqetê ya modernîteya demokratîk, helwesta wê ya îdeolojîk û bersivên wê yên dide sê pirsên bingehîn bi qasî sîstemeke alternatîf bi qîmet in. Ji hemû aliyan ve gera li nasnameya civakî, ji hev derxistina wê û pêşkêşkirina çareseriyên wê, şerê min ê heqîqetê bi xwe ye, cewherê wê ye. Parêznameya min bi xetên stûr be jî encamên vê lêgerînê û vî şerî pêşkêş kirine. Hewce bi dubarekirinê nîne. Sekna îdeolojîk bi rexnekirineke berfireh, ji hegemonya îdeolojîk a modernîteya

serdest bihurînê, îfade dike. Xwedîderketina li heqîqetên civakî yên di dest de sekna îdeolojîk e. Nîşandana mehrûmbûna modernîteya kapîtalîst ji heqîqetê (ferdparêziyê tercîhî civakê dike, nasnameya civakî dike hedefa êrişan), nîşandana heqîqeta civaka ekonomîk, ekolojîk û demokratîk, nîşandana heqîqeta netewe û nîşandana hêza heqîqetê bi vê seknê re têkildar in.

Bersiva pêşî ya hevpar a ku mirov bide pirsên; divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku dest pê bike, divê ji nava sîstemê û li ser bingehê dijberiya wê, dest pê bike. Lê belê, ji bo dijberbûna sîstemê ji nava wê, di asta zaneyên berê de pêdivî bi şervaniyeke heqîqetê heye, ya ku her kêlî dibe ku mirov têde bimire. Pirsên divê mirov çawa bijî û ji ku dest pê bike, divê tu di zikhev de bersiva wan bidî. Ji bo vê jî divê tu vê jiyana modernîteyê weke kirasekî dînan ê fena zirxekî li te kirî biçirînî, jê nefret bikî û jê bigerî. Wexta hewce kir, tu yê her kêlî verîşî, dil (mîde), mejî û bedena xwe ji vê jiyanê bimalî, paqij bikî. Eger ew xwe weke bedewa cîhanê pêşkêşî te bike jî divê tu bi verişandina ya hundir û hinavên xwe bersivê bidiyê. Eger mirov bersiva pirsa ‘divê mirov çi bike’ bi du pirsên din re di zikhev de bide, divê mirov bibêje; ez ê li dijî sîstemê timî di nava çalakiyê de bim. Bersiva pirsa divê mirov çi bike, pratîka bi serwextî û rêxistinî ye.

Ji aliyê sîstema modernîteya demokratîk ve bersiva hersê pirsan xwegihandina hêmanên îdeolojîk û çalakî yên sîstemê îfade dike. Berê, têgîna jê re partiya pêşeng tê gotin, weke mîsyona pêşengiya teorîk û çalakiyê ya modernîteya demokratîk bêhtir bi tesîr hatiye kirin. Mîsyona bingehîn a pêşengiya nû ye ku pêdiviya îradî û zêhnî ya sêlingên bingehîn ên sîstemê ango civaka ekonomîk, ekolojîk û demokratîk (rêveberiya bajar, xwecihî, herêmî, neteweyî û ji netewe wêdetir demokratîk konfederalîst) tedarik bike. Ji bo vê jî divê hejmareke têr û naveroktijî avahiyên akademîk bêne lêkirin. Divê komikên akademîk ên nû bi tenê qîma xwe bi rexnekirina cîhana akademîk a modernîteyê neyînin, tevî vê alternatîfa wê jî pêşde bibin û li gorî naverokên wan bi navên cûrbicûr akademiyan ava bikin. Di serî de ekonomîk-teknîk, ekolojîk-cotkarî, demokratîk siyaset, ewlekarî-parastin, jin-azadî, çand-nasname, ziman-

dîrok, zanist-felsefe, dîn-huner, li gorî girîngî û pêdiviya civakê li her qadê avakirina akademiyan erk û wezîfe ye. Kadroyên akademîk ên bi hêz nebin, hêmanên modernîteya demokratîk ava nabin. Çawa ku bêyî hêmanên modernîteya demokratîk ti maneya kadroyê akademîk nebe, hêmanên modernîteya demokratîk jî bêyî kadroyên akademîk wê ti maneyê îfade nekin û wê bi ser nekevin. Yekparebûna di zikhev de ji bo mane û serketinê şert e.

Têgihiştina moderniteya kapîtalîst a fikir, zikir, çalakiyê ji hev cuda dike û weke kincekî bi lanet li ser pişta mirovî disekine, divê ji sedî sed bê terikandin û li dawiyê bê hiştin. Fikir-zikir-çalakî nîşaneyên mezinahiyê ne, ti carî yek ji ya din cihê nabe, divê mirov wan yekpare li xwe bike û pêk bîne, heqîqetê timî hilde pişta xwe. Kesa/ê hersêyan bi hev re bi bersiva pirsên divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku dest pê bike nikaribe temsîl bike, divê şerê heqîqetê neke. Şerê heqîqetê berevajîkirin û belovajîkirina moderniteya kapîtalîst qebûl nake. Bi wê re nikare bijî. Bi kurtî, kadroyê akademîk mejî ye, rêxistin e, û a di mûrehk û rayên zîro yên bedenê (civak) de belav dibe. Rastî yekpare ye. Heqîqet rastiya yekpare ye ku tê îfadekirin. Kadro heqîqeta rêxistinkirî û çalakkirî ye.

Wexta ku çanda Rojhilata Navîn xwe nû bike, divê bê zanîn ku rêya vê di şoreşa heqîqetê re derbas dibe. Şoreşa heqîqetê, şoreşeke şêwazê zêhniyet û jiyanê ye. Şoreşa xwe rizgarkirina ji şêwazê jiyanê û hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst e. Divê mirov bi dînperest û şovenîstên ezbetperest ên sexte yên xwe bi rêûresmê digirin, nexape. Ew bi modernîteya kapîtalîst re şer nakin. Mîna kûçikê nobedar hinekî para xwe dixwazin. Ti carî mirov nikare li van kesan weke şervanên heqîqetê bifikire. Jixwe li hemberî modernîteyê ne bi tenê têkçûyî ne, di heman demê de şelaq û şelaf in jî. Eger çepgirên kevin, femînîst, ekolojîst û tevgerên kulturalîst dixwazin antî-modernîstên gotin û gavên wan hevgirtî bin, divê zanibin şerê heqîqetê di nava yekparebûna xwe de pêk tê û divê wê di şêwazê jiyana xwe de jî bi cih bînin, bimeşînin.

Eger şerê heqîqetê di her kêliya jiyanê de, li tevahiya qadên civakî, li komikên kominî yên ekonomîk û ekolojîst, li bajarên demokratîk, xwecihî,

herêmî, neteweyî û mekanên ji netewe wêdetir hat meşandin, wê mane û serketinê bi dest bixe. Çawa ku di derketina destpêkê ya dînan de jiyana qasid û hewariyan hebû, yên li pey heqîqetê diçin mîna wan nejîn, şerê heqîqetê nayê kirin, were kirin jî bi ser nakeve. Rojhilata Navîn hewcedariya xwe bi hozaniya xwedawendiya jina xwe nûkirî, Zerdeşt, Mûsa, Îsa û Muhemmedan, Saint Paulan, Maniyan, Weysel Qeraniyan, Hellacê Mansûran, Suhrewerdiyan, Yûnis Emreyan û Brûnoyan heye. Şoreşa heqîqetê bi xwedîderketina li mîrateya kevnên kevin nabin, lê xwe nû dikin pêk tê; naxwe bi ser nakeve. Şoreş û şoreşger namirin, ev yek piştrast dike ku bi tenê heke mirov li mîrateya wan xwedî derkeve dikare bijî. Çanda Rojhilata Navîn çanda yekkirina fikir-zikir-çalakiyê ye û ji vî alî ve têra xwe dewlemend e. Modernîteya demokratîk bi zêdekirina rexneya xwe ya li şaristanî û modernîteya kapîtalîst li vê çandê, wê bi rola xwe ya dîrokî rabe.

Ferdê şaristaniya demokratîk bi qasî ku li dijî sê suwarên mehşerî yên modernîteya kapîtalîst (kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe) timî têkoşîneke bi hev re ya fikir-zikir-çalakiyê bimeşîne, divê timî bi sê melekên rizgariyê yên modernîteya demokratîk (civaka ekonomîk, civaka ekolojîk û civaka demokratîk) têkoşîneke jiyanê ya bi hev re ya fikir-zikir-çalakiyê di kesayeta xwe de bike, naxwe nikare xwe pêk bîne, nikare xwe weke pêşengê heqîqetê çêke. Bi qasî komika akademiyayê, di yekîneyên komin ên civakî de jiyan û têkoşînê bi hev re nemeşîne, nikare bibe pêşengê (murşîdê) bicihanîna cîhana dad, azadî û demokrasiyê. (Wexta ku weke amûrên şaristaniya serwer û modernîteyê bêne bi kar anîn) Rexnekirina Pirtûkên Pîroz û hozanên xwedawend giranbuha ye. Jixwe yên ji ber mayî, mîrateya me ya jiyanê ne, nasnameya me ya civakî ne. Milîtana/ê heqîqetê ya/ê serdema demokratîk ew kes e, vê nasnameyê li şexsiyeta xwe diniqirîne, dikole, mîrateya jiyanê bi awayekî azad dijî û dide jiyîn ango pêk tîne û dide kirin.

# ENCAM

Çanda Rojhilata Navîn bi zanist û îdeolojiya pozitîvîst a modernîteya Ewrûpayê çareser nabe. Dema îdea tê kirin ku çareser bûye, encama derdikeve holê oryantalîzm e. Di dused salên dawî de ya ev paradîgmaya tê pêkanîn derxistiye holê û berbiçav nîşan daye, ne bi rastiyên dîrokî ne jî bi rewşên berbiçav ên rojane yên civaka Rojhilata Navîn re ti têkiliya xwe nîne. Cudahiya di navbera wan de bi qasî newal û geliyekî mezin e. Nêzîkatiyên ji rêûresmê yên ji nû ve di bin bandora xurt a oryantalîzmê de pêk tên (di serî de ekolên Îslamî her cure nêzîkatiyên kulturalîst) têgihiştina wan a heqîqetê ji rastiyê gelekî dûr e, ji wêjevaniyeke hişk û zuha wêdetir naçin.

Modernîteya kapîtalîst a xwe bi vê paradîgmayê di zikhev de ava dike, rengên digire hem bi dîrokê hem jî bi rewşa berçav a rojane zêdetir bi nakok e. Bi cudahî û nakokiya heyî re newal û geliyên kûr ên pêk hatine, xwe ji hovîtiyekê wêdetir bi cureyên şer ên kêm hatine dîtin, îfade dikin. Ji vê ne xerîzeyên hundir ên kûr ne jî paşvemayîna çandî berpirsiyar in. Pirsgirêk bi şêwazê pêkanînê yê modernîteya kapîtalîst û bi şêwegirtina wê re têkildar e. Çandek e ku bi hezar salan di zikhev de pêk hatiye, ji bo bi vî rengî pêk bê hatiye avakirin (weke çanda maddî û manewî), modernîteya kapîtalîst bi pergeran wê parçe dike û radibe, hewl dide acenteyên xwe (kapîtalîzm û îndustriyalîzma dewleta netewe) di nava wê de bi cih bike. Encama vê yekê sedema bi rastî ya hovîtiya diqewime û wê biqewime ye. Jixwe rabihuriya nêz ya qewimî, ji hovîtî û qirkirinê zêde ne cudatir bû.

Dînên yek xwedayî (Mûsewîtî, Xirîstiyantî û Misilmantî) çi di nava xwe de, çi jî di şerê bi dînên kevn û pûtperestiyên wan re, ti carî bi qasî

moderníteya kapîtalîst nebûn sedema hovîtiyê. Têgihiştina ummetê ya li cem her yekî ji wan, ji bilî cemaetên pûtperestan ên ji mêj ve tesfiyebûyî, her gelî û çanda wî di nava aştî û aramiyê de dikarîbûn bihewînin. Heta di navbera xwe de weke Ehlê Kitêb (Xwediyên Pirtûkên Pîroz) paşvemayî be jî derfet û îmkan didan yekîtiyeke di ser ummetê re. Qirkirin û kokqelandin, têgîn û kirineke ne naskirî bû. Îdeayên dijber çiqasî bêne kirin bila bêne kirin, li gorî serdema nû ya pozîtîvîst mirov rabe serdema navîn weke serdemeke tarî bi nav bike, ev yek bi tenê vedîtineke mîtolojîk e. Ev mîta serdema nû ye, bi vê hewl dide bahaneya xwe ya weke sedema rohnîbûnê nîşan dide bi hêz bike.

Dewleta netewe weke ku bi kêrê birrî be, çanda Rojhilata Navîn qelaşt. Ji lewra mirov çiqasî li ser vê dewleta netewe ya li ser çanda Rojhilata Navîn hat ferzkirin raweste, kêm e. Ji ber ku ev kêr bû sedema trawmaya herî nakewe. Em destê xwe biavêjin kîjan trajediyê biavêjin, encam naguhere. Ji hundirê Hindistanê heta bi Sibîryayê, ji çolên Fasê heta bi çolên Erebistanê bicihbûyî yan jî koçer, her cure çandê para xwe ji derba vê kêrê girtiye. Birîn misêwa hê xwîn jê diçe. Şerê Hindû-Misilmanan ê her roj li nava Hindistanê diqewime, Keşmîr, herêma Ûygûr a Çînê, geraseya li Afganistan û Pakistanê, li Rûsyayê şerên çavkorî yên Çeçenan û yên din, Îsraîl-Filistîn, Lubnan û pevçûnên li welatên Ereban hemûyan, şerên Kurdan bi Tirkan, Ereb û Farsan re, şerên mezhebî yên li Îranê, hevgewixandina etnîk a li Balkanan, tesfiyekirina Ermenî, Rûm û Suryaniyên li Anatolyayê û hê gelek mînakên din ên bi hejmartinê naqedin û hê ev şer û pevçûnên bêyî ku guh bidin rêzik û pîvanekê dewam dikin, kî dikare înkar bike ku berhemên hegemonya kapîtalîst nînin?

Eger destwerdanên Neteweyên Yekbûyî NY ya yekîtiya dewletên netewe ye, encamê nadin, Rêxistina Konferansa Îslamî RKÎ ya yekîtiya dewletên netewe yên Îslamî ye, eger bi tesîr nabe, û eger her roj gerûgeştên bêhejmar ên dîplomatîk ên dewletên netewe yên ji zivêrkirinê wêdetir bi ti rolê ranabin û çareserker nabin, sedema vê dîsa bi zêhniyet û avabûna dewleta netewe re têkildar e. Eger ev rastiya sosret û seyr a ji dînperestiyên serdemên destpêk û navîn qat bi qat muhafezekartir û

girtîtir hatiye avakirin, timûtim weke faşîzmê bi xwe û weke şêweyên bicihanîna wê li her deverê derkeve pêşiya me, divê em hîç matmayî nemînin. Avakirina dewletên netewe bi xwe her tim bi şer pêk hatiye. Dewleteke netewe bi tenê nîne ku bi şer nehatibe avakirin. Ji vê jî xeternaktir, gelo mirov dikare behsa dewleteke netewe bike ku di hundir de bi civakê re, li derve bi dewletên din ên netewe re timî di nava şer, pevçûn û tengezariyê de nebe?

Ji bo mirov rûyê rastî yên dewletên netewe yên Rojhilata Navîn fêhm bike, mirov çend mînakên der barê avakirina wan de pêşkêş bike, ev yek dikare me hîn bike. Welatekî bi navê Iraqa îro beriya salên 1920'an di nexşeyê de tinebû. Dewleteke bi navê Iraqê weke utopya jî tinebû. Pêdiviyên stratejîk ên Împaratoriya Brîtanyayê û berjewendiyên wê yên petrolê li ber çavan hatin girtin û dewleta netewe ya Iraqê hat avakirin. Rewşa komikên çandî yên di nava wê de li ber çav nehat girtin. Ji bo di nava xwe de bi awayekî lihevkirî û di nav ahengekê de bijîn, prensîpeke dadiyane danenîn. Qralekî ti têkiliya wî bi rastiyên wan ên civakî re tinebû anîn serê wan. Ev qral ji aliyê elîtên eskerî yên xwe zêdetir neteweparêz dihesibandin, ji text hat daxistin. Cumhûriyeta hat îlankirin, ji ber ku zêde têkiliya xwe bi cumhûrê re nebû, tim di nava şert û mercên dîktatoryal de ma. Dîktatoriya Saddam Husên a li xwezaya dewleta netewe serwext nebû, dema bi darvekirina wî re ji hev de ket, pîsîtî hemû li naverastê belav bûn. Çi teoriyeke sosyolojîk nîne ku Iraqa îro pênase bike. Heye ku weke mekanekî kaotîk hebûna xwe dewam bike.

Ji bîstî zêdetir welatên din ên weke Ereb têne bi navkirin, avakirina wan ji ya Iraqê cuda nîne. Bi rastiyên dîrokî û civakî yên wan manedar bikin, têkiliya xwe nînin. Mîna sînorên wan, dîroka wan, surûdên wan, alên wan, rejîmên wan û civakên ji wan re netewe dibêjin, bi temamî hebûnên xeyalî ne, û li gorî berjewendiyên hêzên hegemon hatine diyarkirin. Li vir xusûsa gelekî girîng ew e, ev hebûnên xeyalî yên darîçav nînin, pîroz têne dîtin û bîstûçar saetan ji wan re serî tê tewandin, ya rastî ti têkiliya wan bi civak û dîrokeke rastî ya jê re rêz bê girtin, nîne. Ya ne heqîqet e, payeyeke mezin a heqîqetê didinê. Bêguman bi tenê weke propaganda. Hemin mirov nikare

jê li bendê be ku pirsgirêkekê çareser bike û jiyaneke civakê ya bextewar pêk bîne. Ya heqîqeta xwe tinebe, çareserî û bextewariya wê jî xeyal e.

Avakirina Îsraîlê hê balkêştir e. Herçiqasî bê îdeakirin ku encama utopyayeke sê hezar salî ye jî ew jî hebûneke lihevçêkirî ya dused salên dawiyê ye. Ji gavên destpêkê yên avakirinê heta bi gavên dawî yên avakirinê, pêvajo ji destpêkê heta bi dawiyê xwînrij e. Ji bo gel û çanda Cihû, diyar e ku gelekî zehmet e, mirov xeyala rêyeke ji vê bi êştir bike. Avakirina Lubnana li ber serê wê hê seyrtir e. Mirov nikare texmîn bike ka rewşa şer a li vê herêmê wê çawa bê rawestandin. Jixwe zêde nayê fêhmkirin ka navê Sûrî çawa hatiye neqandin. Berî sedsalî li şûna van welatan hemûyan têgîneke Wîlayetên Osmanî hebû. Ev têgîn zêdetir ji rêûresmê dihat û belkî jî maneyeke xwe ya diyar hebû. Di dîrokê de mirov ber bi pêşiyê ve biçe, ne navê wîlayetan ne jî navê welatan dimîne. Bi Îslamiyetê re li ser bingehê hisa aliyan, binavkirinek hatiye qebûlkirin. Belkî jî bêtir rast bû û maneyeke xwe ya diyar hebû û ji lewra binavkirina ‘Beled-ul Îslam’ ango bi navê giştî Welatê Îslamê tê qebûlkirin û bi vî awayî ev binavkirin zêde nabe pirsgirêk. Perestina welat, tinebû. Hebûna bi tenê ya perestinê Ellah bû. Ew jî wijdanê hevpar ê civakê bû. Bi sifet û navên xwe, têgîneke xwe ya diyar çêbûbû. Belkî jî ya rastir ev bû.

Eger em rûyê erdê dema ku hê parzemîn çênebûne bînin bîra xwe, pîrozkirina navên dever û welatan zêde heqîqeteke kûr îfade nake. Ev nayê wê maneyê ku ti maneya xwecihî, herêmî, welatê netewe û erdê ummetê nîne. Maneya wan heye, lê bi qasî ku mirov wan di asta xwedatiyê de pîroz bike, nîne. Li vir a neyênî ew e ku zêde mezinkirin, biqasî ku heqîqeta hebûna erênî jê bibe, serdest dibe. Em heman şîroveyan dikarin ji bo nasnameyên din (al, surûd, netewe, dîrok) ên dewletên netewe jî bikin. Bêguman di ragihandin û vegotinê de cihekî girîng ê sembolan heye. Lê weke rastiyên pîroz pêşkêşkirina wan, derfet û îmkan nade agahî û zanîna rast a sosyolojîk. Pêşkêşkirineke bi vî rengî civaka şikil bidiyê, wê bi pirsgirêkên gelekî mezin re rûbirû bihêle. Jixwe bi zêdeyî hiştiye. Di vê de bi awayekî bingehîn, mentiqê avakirinê berpirsiyar û pirsgirêk e. Dewletên netewe yên dinya û herêmê, ji ber ku bi temamî li gorî berjewendiyên

hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst hatine diyarkirin, têkiliya xwe bi heqîqetên xwecihî, herêmî, neteweyî, bajarî û gundî re (ev hemû rastiyên mayînde û gerdûnî ne) nînin. Ji lewra bivênevê, di navbera wan de nakokiyên ciddî û pevçûn-şer ê pêk bên. Ji ber ku li ser dad, azadî û demokrasiyê nehatine avakirin, wê her tim bi naveroka van têgînên gerdûnê re bikevin nakokiyê û pev biçin, şer bikin.

Encama derdikeve holê ew e, wêjeya di dused salên dawiyê de li ser dewleta netewe hatiye kirin, pirr kêm nirxê xwe yê heqîqetê heye. Belkî jî bi qasî mîtolojiyeke serdema destpêkê ya zêde mane nedihat dayînê zêdetir, em bi vegotineke bêmane ya mîtolojiyê re rûbirû ne. Li gorî bîrûbaweriya min, hubra li ser navê dewleteke netewe bi tenê hatiye rijandin, nirxê wê ji tevahiya dewletên netewe hêjatir û zêdetir e. Ji vê nirxandina min divê neyê fêhmkirin ku ez dewlet û netewe bi tevahî înkar dikim û hebûnên wan bêmane dibînim. Her yek ji wan weke rastiyekê, dewlet û netewe maneyên xwe yên gelekî girîng hene. Rast analîzkirina wan girîng e. Ev hebûnên welê tavilê xira bibin û divê bêne xirakirin nînin. Yên em bi tehlûke dibînin ev nînin, mentiqê avakirina dewleta netewe û şêwazê dewamkirina wê ye. Ji ber ku timî şer, qirkirin û xemgîniyê bi bîr dixe; pejinandina heqîqetên civakî û yên qîmeta wan nîne, zêde mezin dike bi bîr dixe.

Kapîtalîzm bi xwe weke sîstem nirxekî xwe yê bi awayekî erênî nîşanî çanda Rojhilata Navîn bide, nîne. Herêmê li yên bi heman rengî, hezarê salan şahidî kiriye. Cotkarî, bazirganî, pere û pîşesaziya kapîtalîzmê li herêmê pêk hatiye û xwediyê dîrokeke herî dirêj e. Cihê civaka exlaqî û polîtîk di nava çanda herêmê de hatiye tehlîlkirin. Şoreşa pîşesaziyê belkî dikarîbû li vê çandê hinekî zêde bikirana û alîkariya wê bikirana. Lê ji ber ku di derketina wê de weke îndustriyalîzm kirasê îdeolojîk lê hat kirin, bi awayekî hilweşîner tecellî kir. Di çanda Rojhilata Navîn de encama îndustriyalîzmê rê li ber veke ew e, wê hawîrdora jixwe bi zor û zehmetî li ser piyan dimîne, bêtir neyênî bike. Jixwe ji roja ku li herêmê pêşketiye û bi cih bûye, bi rewşên xwe yên çolbûyîn, tinebûn, bêkarî û qirêjiya zêde

dibe (di hewa, av û bejahiyê de) bi tevahî neyêniyên xwe bi tempoyeke zêde dike vedirişe.

Mirov 'Îslama nû' ji rêûresmekê wêdetir weke diyardeyeke modernîst a dused salên dawiyê di çarçoveya dewleta netewe de bibîne, wê manedartir bibe. Mirov wê weke Îslama ji rêûresma dîn ne, weke milletperestiya avabûna wê fêhm bike gelekî girîng e. Ji ber ku ji bo serwextbûnê ev nuqte kilît e. Prototîpiya milletperestiya herêmî ye, û mohra oryantalîzmê li ser e. Vedîtineke oryantalîstan e, ti têkiliya xwe bi jiyana Îslamî re nîne. Bi belavbûna li herêmê ya hêzên hegemonîk ên Ewrûpayê, nexasim jî bi hegemonya Elmanyayê re ji nêz ve têkiliya xwe heye. Di dema dawî de li dijî Rûsya Sovyetê bi hegemonya DYE'yê ve girêdayî ye. Gelekî girîng e ku mirov fêhm bike, Îslama siyasî ya hatiye vedîtin têkiliya xwe bi çanda Îslama dîrokî re nîne, ev cureyê Îslamê milletperestî ye, armanca wê jî parçekirina berxwedana çanda wê ye, û bi vî awayî dixwaze herêmê ji hêz û taqetê bixe.

Îslama siyasî îdeolojiyeke milletperestiyê ye, olîgarşiyên dewletên netewe yên dused salên dawiyê maske dike. Komara Îslamî ya Îranê vê rastiyê bi awayekî balkêş nîşan dide. Îslama Şîa ji serî heta dawiyê milletperestiya Îranê ye; îdeolojiya hegemonîk a rêûresma împaratoriya Îranê ye. Lê weke çanda orjîn, weke dîrok Îslam hem cuda ye, hem jî girîng e. Mirov heta Îslama bi vê rastiyê ji hev dernexe, mumkîn nîne çanda Rojhilata Navîn analîz bike , dabeş bike û bike mijara hin çareseriyan. Deryayeke mezin a çandê ye, weke wezîfe li benda çareserkirinê ye. Nexasim di serî de Hz. Muhammed, ji roja derketina holê heta roja me ya îro weke hêmaneke demokratîk Îslam û weke hêmaneke desthilatdar Îslam, dîrokek e ku wan ji hev dike, li ser vî bingehî dîroka gelan, hebûnên xwecihî û herêmî ji nû ve li benda nivîsandinê ne. Dîroka civakî bi vê paradîgmayê were pêşdebirin ji bo rohnîkirina roja me ya îro, nirxa xwe zêde û misoger e. Şîroveyên bi heman rengî ji bo Cihûtî, Xirîstiyantî û Zerdeştiyê jî (sentezên mîna Manîheîzmê jî girîng in) bêne pêşdebirin, çanda Rojhilata Navîn wê bi awayekî nêzî rastiyê bê analîzkirin û ev yek ê rê li dewlemendiya maneyê veke.

Ji bo analîzên çandê, orjînên Sumer û Misrê bi qasî ku kilîta mijarê bin, girîng in. Rastiyek e ku piştrast bûye, dînên yekxwedayî û Pirtûkên Pîroz çavkaniya xwe ev orjîn in. Çanda Serdema Neolîtîkê ji hemûyan re dayiktî kiriye, ji lewra heta bandorên dîrokî yên vê çandê neyên analîzkirin, ti çand têra xwe rohnî û zelal nabe. Hegel analîza çanda dema xwe di wê demê de spart heta çanda Serdema Antîk a bi sînor dihat bibîranîn û çanda Misrê. Wexta ku dîroka çandî were tomarkirin û şîrovekirin a derkeve holê wê Ronesanseke çandî be. Di rastiya çanda Rojhilata Navîn de ev wezîfe hê bi awayekî serketî bi cih nehatiye anîn. Fikrên dîroka dînperest û milletperest ji pêşkêşkirina dogmayan wêdetir, vegotinekê pêşkêş nakin. Kirina sosyolojiya çanda Rojhilata Navîn çiqasî girîng be, encamên derkevin holê jî wê ji bo alîkarîdayîna zanista sosyolojiyê jî ewçend mezin bin.

Rexnekirina dewleta netewe weke avahî û îdeolojî çiqasî girîng be, pêşkêşkirina alternatîfa wê wezîfeyeke ji wê jî girîngtir e. Di herhalî de wexta alternatîfek were danîn, ji prensîpên bingehîn a divê li ber çav bê girtin a yekemîn, yekparebûna çandê ye. Mirov dikare bibîne ku di tevahiya serdemên dîrokê yên ji panzdeh hezar salî zêdetir de çanda civakî di nav hev de bi awayekî yekpare pêk hatiye. Rewşa bi awayekî yekpare pêşketin di tevahiya qadên civakê de bi heman rengî ye. Pêve girêdayî prensîpa duyemîn, modelên çareseriyê divê bi têgihiştinên nasnameyên çandî yên nerm û serê wan vekirî bêne pêşdebirin. Îdeolojiya li dijî dewleta netewe ya asîmîleker û entegrasyonê ya ne li jêr û ne jî li jor xwedî têgihiştina nasnameya yekpareker e, dikare bi têgihiştina nasnameya çanda nerm û serê wê vekirî, jê bibihure. Di çarçoveya rastiya çandî de dewletên netewe heqîqeta xwe nînin, ji lewra modelên karibin ji vê dewleta netewe bibihurin girîngiyeke xwe ya prensîpî hene. Dewleta netewe weke avahî û zêhniyet çiqasî li dawiyê were hiştin, modelên çareseriyê yên li ser bingehê yekparebûna çandî jî wê ewqasî bi bandor bibin. Bandorên yekdestdar û xerîbker ên modernîteyê yên li ser bingehê dijberiya çanda herêmê têne ferzkirin, weke di rastiyê de, divê di heqîqetê de jî bêne destnîşankirin. Hingê prensîpa sêyemîn, li ser hîmê ku

sembolîzma li derveyî heqîqetê ya dewleta netewe ji xwe re bike hedef û jê bibihure, weke heqîqet pêşdebirina şêwazê îfadeyê û vegotinê ye. Li dijî yekdestdariya ku modernîteya kapîtalîst li ser sêlingan pêşde dibe, divê di ser sê hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk re yekparebûn û entegrasyon esas werin girtin. Di tevahiya dîroka şaristaniyê û herî zêde jî dused salên dawî yên modernîteyê de xerîbxistin, parçekirin û jihevbelavkirina li ser çanda herêmê hat ferzkirin, bi tenê bi avahiyên yekpareker û vegotinên heqîqetê dikarin li dawiyê bêne hiştin.

Em nirxandin û analîzên xwe yên der barê çanda Rojhilata Navîn de hewl bidin bi pêşniyara bernameya siyasî ya demokratîk bigihînin encamê.

**1-** Rêxistina ban an jî sîwan a yekparebûna çandî divê weke Konfederasyona Neteweyên Demokratîk a Rojhilata Navîn were avakirin. Mirov avakirina neteweyên demokratîk nasipêre sînorên dewletên netewe yên heyî. Ya ji vê jî girîngtir, sînorên xêzkirî yên neteweyên demokratîk çênabin. Gund, xwecihî, herêmî û bajarên neteweyî lê zêdebûyî dikarin hebin. Lê xwecihî, herêmî û bajarên pirrnetewe û têkel jî dikarin hebin. Ya bêtir asayî jî ev e. Dîrokê timî li bajar û herêmên bêhejmar ên mezheb û dîn, qewm û qebîle di nava hev de mayî, şahidî kiriye. Di dîrokê de bê sedem behsa Babîla navdar a heftê û du milletan, nehatiye kirin. Welatê hevpar ê neteweyan jî dikare hebe. Dîrok bi rastiyên van mînakan tijî ye. Herweha têgihiştina civakên safî û neteweyên safî hîç zanistî nîne. Bêguman çawa ku neteweyên bi zimanekî bipeyivin wê karibin hebin, yên bi pirrzimanan bipeyivin jî dikarin hebin. Mînakên der barê neteweyên xwedî gelek sembolan de jî kêm nînin. Di dîrokê de modela mînaka wê nîne yekdestdariya dewleta netewe û homojeniya wê ye. Me karektera hov û nemirovî ya vê modelê bi sedemên wê re analîz kir. Ji lewra konfederasyona neteweyên demokratîk a xwe disipêre nasnameya neteweya nerm û serê wê vekirî ne bi tenê li gorî rastiyên dîrokî û civakî ye, di heman demê de îfadeya wê ya îdeal e. Divê mirov li konfederasyonê ne weke yekîtiyeke dewletan, belê weke yekîneyên kominî yên demokratîk bifikire. Divê mirov li kominên demokratîk weke rêveberiyên yekîneyên civakî neteweyî yên di nava wan de cih digirin bifikire. Pêkhatinên wê di

warê bicihanîna prensîpên demokratîk de xwedî cihekî cihêwaz in. Mînaka bêqusûr a rêveberiya demokratîk a civakê ye.

Neteweyên demokratîk ne bi hêza desthilatdarî û dewletan, bi kirin û prensîpên demokratîk tên avakirin. Avakirinên xwe disipêrin hêzê, nexasim jî avakirina neteweyan a xwe disipêre hêza desthilatdarî û dewletê, çiqasî îdea bê kirin bila bê kirin, li gorî berjewendiyên tevahiya neteweyê nînin; ji bo berjewendiyên egoîst ên zumreyeke olîgarşîk in. Avakirina neteweyan a xwe disipêre demokrasiyê, ji ber ku her kes bi rizadilê xwe tevlî dibe, bi îdeala dadî û azadî pêk tê, bersivê dide berjewendiyên tevahiya neteweyê.

Têgîna neteweya demokratîk û rastiya wê, li dijî çavsoriya dewleta netewe, ji bo paşerojê civaka herî manedar a di nava aştî, dad û azadiyê de îfade dike.

Konfederasyona demokratîk li yekîneyên konfederal ên hem ji xwe mezintir û hem jî li yên ji xwe piçûktir vekirî ye. Ew konfederalîzma demokratîk di asta parzemînî de û li nava dinyayê teşwîq dike. Bi tenê nabêje dinyayeke din mumkîn e, xwe weke dinya herî rastî, dadî û azad îlan dike.

**2-** Civaka ku konfederasyona demokratîk ji xwe re dike bingeh, civaka ekonomîk û ekolojîk e. Ekonomîkbûna wê tê wê maneyê ku bazarê nas dike, yekdestdariyê red dike. Ji ber ku yekdestdarî bi her cure mêtinkarî û zordestiyê ve girêdayî ye, tê redkirin. Bazareke civakî mumkîn e. Bazareke ketibe hakimiyeta yekdestdariyê, ti xêra wê li civakê nabe, bi tenê wê ji mêtinkariyê re xizmetê bike. Ekolojîkbûn tê wê maneyê ku jiyana ekonomîk bi hawîrdorê re di nava têkiliyekê de ye, hewcedariya yekê bi ya din heye. Ekonomiyeke hawîrdorparêz nebe, nikare civakî bibe. Xebateke timî li pey karê û komkirinê dibeze, hem dijberê ekonomiyê, hem jî dijberê hawîrdor-ekolojiyê ye.

Pîvana komikên ekonomiyê komin in. Di serî de ne erdên li gorî malbatan hatine dabeşkirin, ne milkiyetên li gorî amûrên hilberînê, ne jî berevajî milkiyeta yekdestdaran a erd û amûran, ekonomî ye. Ev amûrên

şaristanî û moderníteyê ne, gefan li ekonomiyê dixwin. Di her qada xebata ekonomîk de, di berdêla kêrhatin û hatina zêde de bi awayekî komin bikaranîna erd û amûran di cih de ye, îdeal e. Jina li derveyî ekonomiyê hatiye hiştin bi xwe afirênera rastî ya ekonomiyê ye. Jin û ekonomî hêmanên mîna goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne. Ji ber ku aboriyê li gorî pêdiviyên bingehîn dimeşîne, ne bi pêxîrtengiyê re rûbirû dibe, ne hawîrdorê qirêjî û gemarî dike, ne jî gefan li avhewayê dixwe. Kengî dawî li hilberîna bi armanca karê bê anîn, rizgarbûna dinyayê jî wê bi rastî dest pê bike. Ev jî rizgariya mirov û jiyana wî ye.

**3-** Têkiliya konfederasyona demokratîk bi dewletên neteweyî re ne heta dawiyê şer e, ne jî di navê de asîmîlebûn e. Di vê têkiliyê de rewabûna hevdu qebûlkirin heye, têkiliyeke bi prensîp e; du kirdarên di nava aştiyê de hebûna hevdu qebûl dikin, hene. Herçiqasî bi şoreşan dewlet bêne rûxandin û li şûnê ya nû bê avakirin jî di warê xizmetkirina azadî û dadê de zêde guhertinek çênabe. Li beramberî vê, bûyerên li ser bingehê konfederalîzma demokratîk weke lingê siyasî yê moderníteya demokratîk di demên kin, navîn û dirêj de xwedî wê qabîliyetê ne ku dikarin dad û azadiyê pêk bînin.

Bi tevahî redkirin an jî qebûlkirina dewletan ji armancên azadî, wekhevî û demokratîk re xizmetê nake. Ji dewletê, nexasim jî ji dewleta netewe bihurîn karekî pêvajoyê ye. Konfederasyonên demokratîk serdestiya xwe û qabîliyeta xwe ya çareserkirina pirsgirêkan çiqasî bidin qebûlkirin, wê dewleta netewe jî bi xwe li dawiyê bimîne. Ev nayê wê maneyê ku di serî de yên dewleta netewe, li hemberî êrişên moderníteya kapîtalîst wê xwe neparêze. Ji bo bergirî û parastina civakê wê her tim hêza konfederasyonên demokratîk hebe.

Konfederasyonên demokratîk qîma xwe bi tenê bi rêxistiniya di nava dewletekê de nayînin. Li derveyî sînoran jî heta bixwazin dikarin xwe bi rêxistin bikin, yekîtiyên xwe yên jor ên konfederal pêk bînin û bibin xwediyê dîplomasiya xwe bi xwe.

**4-** Li Rojhilata Navîn ji ber neheqiyên dîrokî-civakî gelek şer, pevçûn û tengezarî hê jî dewam dikin, ji bo bidawîkirina vê rewşê, konfederalîzma demokratîk îmkaneke çareseriyê ye. Li dijî astengiya modernîteya kapîtalîst û dewleta netewe ku berpirsên rastî yên şer û pevçûnê ne, rêya çareseriyê ya konfederalîzma demokratîk rêya aştî, dadê û azadiyê ye. Di vê çarçoveyê de berê pêşî divê şer û pevçûn bêne rawestandin, mirov tengezariyan bide aliyekî û neheqiyên dîrokî ji navê bêne rakirin. Ji bo vê jî hewldan û xebat gelekî girîng e. Çareseriyên demokratîk ên ku kirin û prensîpên dewleta netewe esas nagirin, divê bi lez bikevin rojevê. Ji bo çareserkirina pirsgirêka Ermeniyan bi tenê vekirina sînoran têrê nake; divê Ermenî karibin bibin xwediyê cihûwarên komin ên demokratîk. Ji bo vê jî dikarin rewşê hêsan bikin. Ji bo Asûrî, Rûm, Tirk, Kurd, Ereb, ji bo komên din ên Xirîstiyanan, ji bo Cihû û Elewiyan jî divê heman prensîp û kirinan esas bigirin. Çiqasî di nêzîkatiyên dewleta netewe de israr bikin, wê li Îsraîl-Filistîn, li Iraqê Kurd-Şîa-Sunnî, Keşmîr, Berberî, Pakistan-Afganistan, Belûcîstan, Kurdistan, Lubnan, Sûdan û li gelek qad û deverên din, bivênevê şer ê dewam bikin. Ji ber vê, bi awayekî lezgîn hewcedarî bi avahiyên konfederatîf demokratîk heye. Çareseriyeke demokratîk a li qadeke şerê germ lê heye pêk bê, dibe ku bandora wê bi awayekî zincîrwarî li tevahiya qadên pirsgirêk li wan hene, belav bibe. Ji ber vê sedemê paşeroja Rojhilata Navîn konfederalîzma demokratîk e.

**5-** Hewcedarî heye tevgerên dijberê sîstemê rewşa xwe ji nû ve binirxînin û xwe di ber çavan re derbas bikin. Eger li cihekî pirsgirêk gihiştibin sînorê dawî û tevger nikaribin çareser bikin, li wir sîstem ji hev de bikeve jî pirsgirêk ji hev dernakevin, çareser nabin.

Tevgerên pêwendîdarê pirsgirêkên jinê û hawîrdorê heta ji modernîteyê nebihurin mumkîn nîne bi awayekî gav û gotinên wan hevgirtî, bimeşin. Ji bo gav û gotinên hevgirtî û serketinê şert e ku ev tevger xwe bi yekparebûna tevgera civaka demokratîk ve girêbidin.

Tevgerên çepgir ên berhema pêvajoya sosyalîzma pêkhatî ya berê ne û berê wan li desthilatdariyê ye, divê êdî berê xwe bidin rêxistiniyên demokratîk û ev yek ê rêya rast a rizgariyê be. Tevgerên em behsa wan

dikin, divê tevgerên xwe yên sendîkayî û partiyî ji ekonomîzma teng rizgar bikin û wan bi yekparebûna tevgerên civakî demokratîk ve girê bidin, ji bo karibin gav biavêjin û bi ser kevin ev divê.

Tevgerên din ên ji rêûresmê, kulturalîst, xwecihî, herêmî û neteweyî divê ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe, avahiyên berê wan li sazî, teorî û têgînên curbicur ên modernîteyê û heqîqetên xwe yên îfadeyê biguherin, bi hêmanên avahî û saziyên modernîteya demokratîk re bi yek bin, ev ji bo gavavêtin û serketina wan şert e. Enternasyonalîzma nû çiqasî ji modernîteya kapîtalîst, nexasim jî ji dewleta netewe bibihure, wê pêkhatina wê ewqasî mumkîn be.

**6-** Ekolên polîtîk û îdeolojîk ên dijberê modernîteya kapîtalîst divê xwe bisipêrin xebatên zanista civakî yên ji sosyolojiya pozîtîvîst bihurîbin. Sosyolojiya pozîtîvîst di mezinbûna hegemonîk a kapîtalîst de ji hevparên yekdestdariyê ye. Berhemên hewldanên pêvajoya erênî û zanistî yên hêja weke sermayeya hevkartiyê pêşkêşî yekdestdariyên desthilatdariyê û sermayeyê kirin û ew kirin hevpar. Ji lewra divê mirov yekdestdariya zanistî ya xistine xizmeta sîstemê bişkîne, mîrateya erênî bigire û bi rexnekirina rewşa heyî ya berbiçav sentez bike û wê weke heqîqetê pêşkêş bike, cewherê xebatên zanista civakî ya nû bi xwe ye. Her xebata ekonomîk, polîtîk û îdeolojîk a dijberê sîstemê, van xebatan esas bigire, wê karûbarên xwe bi awayekî serketî dewam bike. Komikên bingehîn ên xebatên zanista civakî, dikarin weke saziyên akademî û enstîtu werin avakirin. Ev sazî di çarçoveya pêdiviyan de li her qada têkiliya civakî dikarin bêne damezrandin. Mirov dikare ekola îdeolojîk weke agahiyên di pêvajoya saziyê re derbasbûne û xebatên li gorî qadên civakî têne bicihanîn, pênase bike. Di çanda Rojhilata Navîn de xwediyê mîrateyeke dewlemend a tecrûbeyê ye. Di demên pêşî yên belavbûna dînan de avabûna terîqet û mezheban, van xebatan nîşan didin.

Civaka sivîl a roja me ya îro di van xebatan de herçiqasî kêm be jî mirov dikare mînakeke vê yekê bihesibîne. Ya rastî femînîzm tevgereke civaka sivîl a girîng e, û di bingehê xwe de ekoleke îdeolojîk e. Ji lewra jî hewce

dike ku xwe li ser bingehê zanistî ava bike. Lê ekolên femînîst, di warê analîzkirina civaka cinsperest a zilamê serwer de ku hêza hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê ji xwe re dike palpişt û bi giranî hukim li jinê dike, di warê pêşkêşkirina modela çareseriyê de û di vê çarçoveyê de hewldanên têne kirin, di jiyana xwe de ji aliyê pêkanînê ve misêwa bi bêhêzî û serneketinê re rûbirû dibin. Kesayetên awarte nebin, milîtaniya jina azad zehmet e ku xwe bigihîne serketinê. Hin serketinên bêne bidestxistin jî wê bi êrişên rojane û berfireh ên civaka cinsperest re bêne asîmîlekirin. Ji lewra pêkanîn û pratîka kominên ekonomîk, îdeolojîk û polîtîk ên di mîhwera azadiya jinê de bivênevê hewce dikin.

Dema ku mirov çanda Rojhilata Navîn demokratîze bike, divê civaka sivîl mîna klan û qebîleyên dema nû binirxîne, heman nêzîkatiyê ji rêûresma dînî re jî nîşan bide, xulase divê mirov zanista civakî bi awayekî jiyana damezrandina klan, qebîle, mezheb, terîqet û dîn bi bîr bixe, pêk bîne, wexta hewce bike bi mîrateya van rêûresman re bike yek, wexta hewce bike xwe mîna wan bi rêxistin bike û bimeşîne, ev ji bo serketinê şert e.

Tevger û ekolên polîtîk herçiqasî cudahiyên xwe ji tevger û ekolên îdeolojîk hebin jî di navbera wan de têkiliyeke xurt heye, divê hebe. Ekolên polîtîk ên ne îdeolojîk zêde qîmeta xwe nînin û ekolên îdeolojîk ên xwe di rastiya polîtîkayê de nîşan nadin jî nikarin xwe bigihînin mertebeyeke hêja. Armanca bingehîn a têkoşîna îdeolojîk pêşdebirina civaka exlaqî û polîtîk e. Pêşdebirina civaka exlaqî û polîtîk jî bi tenê bi çalakiya îdeolojîk a xwe disipêre zanista civakî mumkîn e. Ya rastî, çalakiya exlaqî û polîtîk bêyî zanista civakî pêşde naçe. Li dijî yekdestdarên desthilatdarî û sermayeyê, em civakê bi tenê dikarin bi zanista civakî ya xwe disipêre çalakiya îdeolojîk û polîtîk biparêzin, pêşde bibin. Heta mîrateya hiyerarşîk, desthilatperest û dewletperest ji nava çanda polîtîk a Rojhilata Navîn neyê derxistin û paqijkirin, li dijî rastiyên wan ên rojane çalakiyeke îdeolojîk û polîtîk a bûye şêwazekî jiyana rojane neyê meşandin, demokratîkbûyîn pêk nayê.

**7-** Hêzên yekdestdar ên Ewrûpayê ku navenda hegemonîk ên moderniteya kapîtalîst in, li ser bingeha dersên ji şer, pevçûn û tengezariyên pêncsed salî derxistin, piştî salên 1950'î di binyeya xwe de xwe li reformên bi kok rakişandin. Yekîtiya Ewrûpayê YE encama van dersan e. Hedefa wan ji moderniteya kapîtalîst bihurîn nîne, dixwazin bikin ku jiyan pê re bibe û karibe dewam bike. Bi bandora van reforman di çanda Rojhilata Navîn de demokratîkbûyîn zehmet e. Modernîte wê bi encamên herî neyênî yên yekdestdariyê, çanda herêmê bikişîne nava rewşa bêhtir nakokî, şer û pevçûnê. Lê belê bi qutbûneke bi kok a ji avabûn û têgihiştina moderniteya kapîtalîst û bi moderniteya alternatîf, dikare ji vê rizgar bibe. Moderniteya demokratîk ji vê hewcedariya dîrokî û bi kok derdikeve holê. Moderniteya demokratîk bi civaka ekonomîk, civaka ekolojîk û alternatîfa konfederalîzma demokratîk dijbertiya kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe dike, ji lewra moderniteya demokratîk di çanda Rojhilata Navîn de hêmana bingenîn a demokratîkbûyînê ye. Hêzên moderniteya demokratîk, civaka gund-cotkariyê, ezbetên qebîleyan ên koçber, zenaetkar û dijberên koletiyê yên li planê pişt a dîrokê timî li ber şaristaniya serdest rabûn û dijberên modernîteyê sentez dike, di encama hewldanên reform û şoreşên li ser bingehê civaka ekonomîk, civaka ekolojîk û civaka neteweyî ya demokratîk de wê li dijî sê hêmanên moderniteya kapîtalîst bi têkoşîneke dema dirêj, serdestiya xwe ispat bikin.

Nêzîkatiyeke rast nîne mirov bibêje "Di navbera du modernîteyên bi nakok û cuda de timî şer an jî aştî wê hebe." Şoreş û reform çawa ku dikarin tevî pêngavên dijber bi şer û pevçûnan bi pêş bikevin, herweha di nava aştiyê de jî bi awayên lihevkirinê karin pêşketina xwe dewam bikin. Modernîte avahiyên welê ne, di navbera xwe de carnan dikevin pêvajoyên şer di wan de zêde dibin, carnan jî li hev dikin û li pêvajoyên aştiyê deriyên xwe vedikin, ango xwedî têkilî û nakokiyên tevlîhev in. Alternatîfbûna wan a ji hev re bi siyaset û bûyerên rojane yên bi têgînên 'dema kin' û ' navîn' têne îfadekirin û guhertinên pêvajoyên stewîna sîsteman pêk nayên. Di encama krîzên sîstemîk û avahî yên dema dirêj de guhertinên bi kok ên bi

vî rengî dikarin pêk bên. Di navbera şaristanî û moderniteyan de têkoşîn û hewldanên ji bo alternatîfbûnê pênc hezar, pênc sed, du sed sal in, karekî pêvajoyê ye ku bi tevahiya leza xwe hê dewam dike. Çawa ku li her qada dinyayê wê bibe, li qada çandî ya Rojhilata Navîn jî bi şêwazê jiyana alternatîf, bi têgihiştinên çalakî û rêxistinî (stratejî) û kirinan (taktîk) moderniteya kapîtalîst a di nava krîzê de wê li dawiyê bê hiştin, moderniteya demokratîk bi nirxên xwe weke serdema sereke wê pêk bê û manedar bibe.

Bi vî awayî, divê ez beşa Rojhilata Navîn a parêznameya xwe bi dawî bikim. Ev beş çaremîn cilda mezin pêk tîne. Ez weke cilda dawî **Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de** tesewir dikim. Ez dixwazim di vê cildê de pirsgirêkên Modernîte û Şaristaniyê li Kurdistanê tevî modelên çareseriyê pêşkêş bikim. Ez yeqîn dikim ku ji bo ez a di şexsê min de dibe hedef û tê mehkûmkirin çi ye û çi nîne rohnî bikim, ev vegotinên cildan tijî dikin, hewce ne. Eger ferd weke kêlî gihiştina hev a dîrok û civakê be, xwe rast îfadekirin û parastina ferd jî wê gavavêtina azad a dîrok û civakê be.

**04.08.2009**
**ABDULLAH ÖCALAN**
**Girtîxaneya Îmralî ya Yek Kesî**